
ABDULAH OCALAN

# LI MUXATABEK DIGERIM

(Vegotinên Agirbesta 93)



# ABDULAH OCALAN

# LI MUXATABEK DIGERIM

## (Vegotinên agirbestê)

**Weşanên Komîteya Rêbertî**

Werger: Hacer Hilal
Redekte: Nûman Amed

Cihê çapê : Çapxana AZADÎ
Dîroka çapkirinê : Nîsan 2019

**PÊŞGOTIN**

**BI AGIRBESTEKE YEKALÎ RE ŞANSEK DIDIN KOMARA TIRK**

**DIBE ÇEK BÊN BÊDENGKIRIN LÊ EM ÇEK BERNADIN**

**EM DI NAVA QONAXEKE HERÎ TIJE Û ENCAMGIR DE TÊN DÎTIN**

**BÊÇARESERIYA PIRSGIRÊKA KURD BÊÇARESERIYA PIRSGIRÊKA DEMOKRASIYA TIRK'E**

**HERÎ KÊM BI QASÎ XWE ÎDAYA ME YA GUHERTINA TIRKIYÊ JÎ HEYE**

**FAMBÛ EM ÇIQAS SERWER Û GIRÊDAYÎ RÊXISTIN, GEL Û GOTINA XWE NE**

**BILA BIDEH HEZARAN MIROV NEMIRIN**

**JI DERVEYÎ SERKEFTINÊ TI RÊYEKEDIN LI HEMBER DÎROKÊ ME NADE BEXŞANDIN**

**AGIRBEST DI ÇARESERIYA SIYASÎ DE BÛ DESPÊKEK BINGEHÎN**

**EM JI ŞEREKE HERÎ ASTA JOR RE AMADENE**


**RASTIYA OCALAN FÊM NABE**

## PÊŞGOTIN

Di bihara 1993'ê de dengvedana agirbesta yêkalî ya ji hêla PKK'ê ve hatî îlankirin, weşanên Agirî kiribûn pirtûk û ji raya giştî re pêşkêş kiribû. Berhevkirineke berfireh bû. Dîsa ji derveyî vê axaftinên rêheval Abdulah OCALAN yên girîng û hevpeyvînên pê re hatibûn kirin hebû. Di axaftin û hevpeyvînên me berhev kirîn de, daxuyanî û nêzîkbûnên dîrokî yên pir girîng di derbarê pirsgirêka Kurdistanê ya ku di bihara 1994'an de çareseriya wê pir lezgîn hewce dikir hebû. Di vê wateyê de ev pirtûka di destê we de ji rojaneyî û çareseriya pirsgirêkê re rê vedike û perspektîf dide. Bangawaziya ev pirtûka bi navê "***LI MUXATABEK DIGERIM***" Îro, ji roja gotî hîn derbaztir û biwate ye. Yê ji çareseriyê re dibêje "*erê*" kiye û di "*na*" de israr dike kiye? Bersiva vê pirsê evqas hêsan bû ku, êdî hewcedariya wê bi ravekirinê nema.

Ev ne pirsgirêkeke nayê famkirine, ji ber kes nikare ji bo Komara Tirk baş bifikire. Ya rastî tiştên ji pêşkeftinên dawî tên peytandin, beşeke rastiyan yê sînordarkiriye. Hemû rêyên ku PKK'ê muxatap nagire, rêyên bidawî bûne. Bidawîbûna polîtîkaya kemalîst tê jiyîn. Dubendî û şerê di navbera serdestên Tirk de ji ber vê ye. Bi axaftina keştiya penîr nemeşiya û bi awayeke careke din nikare bi ber behrê ve vebibe li bejahiyê rûnişt. Herkesî rastî dîtin. Neçarman bawer bikin ku hêza PKK'ê têra çareseriyê dike. Hemû hêzên di pirsgirêka Kurdistanê de li gorî xwe aliyek diyar kiribûn, rêgihên xwe dan guhertin. PKK hêza ku tenê rêya xwe neguhertiye, di rewşa navenda pirsgirêkê de ye û hemû rêyên din neçarin biçin wir.

Ev ne nepeniyek û ne jî suprîzeke. Hevpeyvînên di pirtûkê de cî girtine û pirsên di vê derbarê de hatine kirin bi awayeke giştî bersivên xwe dibînin. Şerê te çi siyasî, çi jî leşkerî dibe di qonexeke ku gav bi gav nirx qezenc dike, kes û hêzên rastîbin nêzî vê berhema girîng dibin û jê encam derdixin, wê di meyzandina xwe ya li hember pirsgirêka Kurdistanê û muxatabên wê de bibin xwedî perspektîfên baş.




**“Pir vekiriye ku pêdivî bi agirbestek berfireh heye. Li naverastê pirsgirêkên weke çiya hene. Em ji asta zagona bingehîn bigirin heta xebatên rojane yên heyî ku em li dijî ne û bi rastî jî zerar û ziyanê dide gelê me, heta ku rêya hevdîtinê ji hemûyan re neyê vekirin, yek alî xwe bêçek kirin hûn jî dizanin ku ji xwekuştinê xirabtire.”**

**“Ya rastî ne ku em ê bibin muxatap an na,
pirsgirêkek weke li Tirkiyê muxatap peyda nekirinê heye.”**

**Civîna yekem a çapemeniyê**

**BI AGIRBESTEKE YEKALÎ**
**RE EM ŞANSEKÊ**
**DIDIN KOMARA TIRKIYÊ**

Xebatkarên Çapemeniyê yên hêja; destpêkê xêrhatina we dikim. Dema em serdemeke pir girîng jiyan dikin û şîretên Mam Celal yên binirx digirin berçav, em berpirsyartiya lidarxistina civîneke bi vî rengî ya çapemeniyê guncav dibînin.

Ya rastî yek ji pirsgirêkên herî tevlîhev yên roja me ya îro, pirsgirêka gelê Kurd-Tirk e. Ji vê pirsgirêkê re çareserî dîtin em weke deynê xwe dibînin. Di qedera gelên Rojhilata Navîn de gelê Kurd û Tirk du netewên herî girîngin. Ji ber gelek sedemên dîrokî û siyasî pevçûneke mezin û tevlîheviyek tê jiyîn. Bi rastî jî PKK, demeke dirêje hewl dide rastiya xwe ya netewî ragihîne û di riya azadbûnê de pêşengtî ji têkoşîna gelê Kurd re bike. Me nedixwest pirsgirêkan bi tundiyê çareser bikin. Lê li Tirkiyê polîtîkayeke înkarê ya ku hikûmetên heyî jî derbas dike û heya bêjî bingeha xwe ji sedemên dîrokî digire mijara gotinêye. Ev, bi taybet di dema komarê de hîn zêdetir pêşket û heya roja me ya îro hatiye. Polîtîkayên kapitalîzmê tenê ne di pirsgirêka netewî de, di roja me ya îro de di pirsgirêka demokrasiyê de jî rê li ber xetimandinekê vekiriye. Û herî kêm bi qasî gelê Kurd, hatiye qonaxeke êdî zirarê dide gelê Tirk jî. Û çareseriya bingehîn xwe ferz dike.

Pêngava nû ya me di 15 Tebaxê de destpêkirî yan jî bi wateyeke din îsyana Kurd, berxwedaniya Kurd di vê sala 9.de, yanî di bihara 1993'ê de destpêbûye hatiye qonaxeke girîng. Serdema biharê, di heman demê de dibe destpêkirina xeteriya pêvçûneke germ. Yek jî wê piştî çend rojdin Newroz bê pîrozkirin. Çi Tirkiye, çi jî gelê Kurdistanê çavê wan li vê rojê ye. Ji bo pîrozkirineke aşitiyane, bêriyên xwe tênin ziman. Li ser me

jî heya bêjî zextek heye. Di rojên dawî de çapemenî me xistiye rojeva xwe û heta em dikarin bêjîn ku awir hemû veguherîne ser me.

Ji ber daxwaza we ya zêde a hevdîtinê me hev dît. Bêguman em li pirsên we gudar bikin. Hinek nêzîkatiyên min ên irf û adetê hene. Naxwazim li vir wan dubare bikim. Pirsên we dikare hîn vekirî bin. Ya rastî ji bo hatina we ya vir me fedekariyeke girîng da nîşan. Anîna Mam Celal a vir heya bêjî zehmet bû. Fersendeke girînge, em ê li benda pirsên we bin.

–Ji bo Newrozê deklarasyona agirbestê çêbû?

**Abdulah Ocalan**: Di vê mijarê de biryareke ku me di vê derbarê de girtî dikarim li vir rave bikim. Bi taybet li devdora hikûmetê dîtineke belav heye; dibêjin "*dibe ku PKK, ahengên Newrozê veguherîne serhilanên bi çek*." Di serî de dikarim bêjim ku, îdîayeke bi vî rengî nederbasdare. Heya ku yêkineyên artêşê neyên ser me û bi awayeke mecbûrî nekevin rewşek parastina rewa, ji 20'ê Adarê heya 15'ê Nîsanê em çekan bikarnaynin, hêrîşek pêk naynin. Çi di kêliya xwepêşandanan de be, çi jî di dema vê qewlê de be, hêrîşên çêbibin bi mîsogerî wê bingeha xwe ji me negire.

Bi vî awayî hewl didin bersivek bidin daxwaza raya navnetewî, Tirkiye û Kurdistan ya ji bo aşitiyê derfetek dide. Em didin diyarkirin ku xwe ji bo riya çareseriyeke siyasî amade dibînin. Yek jî em dibihîsîn ku rayedarên Tirk jî di nav bendewariyê de ne. Bawer dikim ku pêwîstî bi nirxandina rewşa niha dibînin. Ji bo wê jî derfet amadekirin ji bo qewlek wisa û biryarek bi vî rengî li gorî me di cî de ye. Bi vî rengî bendewariyên raya giştî ya ji me jî bicî tênin.

– Birêz Ocalan, dema nameya Talabanî di raya giştî a Tirkiyê de hat peytandin, da diyarkirin ku hûn berê di sê xalan de cuda fikirîne. Ya yekem, "*agirbesteke bêşert*;" ya duwem, "*hûn naxwazin ji Tirkiyê qut bibin*" ya herî dawî jî "*ev kar wê di nav sînorên Misak-ı Millî de*" bê çareserkirin. Di derbarê vê de dixwazim vê bipirsim: Niha bûyera agirbesta hûn qal dikin ji 20'ê Adarê heta 15'ê Nîsanê ye?

**Abdulah Ocalan**: Girîngiya vê di vir de ye: Weke min gotî, divê weke nirxandineke nû û niyeteke baş bê famkirin. Hûn jî baş dizanin bi awayeke yekalî bê çek-kirina me xususeke nayê aqlê

mirov. Vekiriye ku pêwîstî bi agirbesteke berfireh heye. Di holê de pirsgirêkên mîna çiyan hene. Weke hûn jî dizanin ji asta makeqanûnî bigirin heta gelek tiştên li beramberîn û ji pevçûnên rojane yên ziyanê didin gelê me, bêyî ku ji hemûyan re riya hevdîtinê vebikin xwe bêçekirina me ya yekalî wê ji întîharê xiraptir be. Ev xususeke pir vekiriye. Li vir ya muhîm, ji bo derxistina rêbaza siyasetê ya pêş hikûmeta Tirk jêre heye, an nîne? Dixwaze xwînê bide sekinandin, an na? Dixwaze hinek ewleyiyên zagonî bide gelê Kurd, an na? Riya demokratîk vedike, an na? Di vê mijarê de hîn vekirîtir bêjîn; hebûna me ya netewî qebûl dike, an na? Sînordar jî be, wê firsendê bide pêşveçûna azadiyê an na? Wê bi awayeke wekhev, biratî û di riya aşitiyane de derfet bide pêşveçûna me, an na? Bi kinahî, wê şêwazê demokratîk û siyasî esas bigire, an na? Heke bersivên diyar ji van pirsan re bê dayîn, em dikarin agirbestê heya dawî bibin, wê ti pirsgirêk çavkaniya xwe ji me negire. Tundî bi serê xwe ne amûreke çareserkere. Weke me diyar kirî dibêjin ji pirsgirêkên siyasî yên pir girîng re jî çareseriyê dixwazin. Ji vê rêbaza siyasî re ji her demê zêdetir amadene. Jixwe ev hevdîtina bi we re jî, ji bo ji hemû raya cîhanê, Tirkiye û gelê Kurd re bê ravekirin dikim.

Belê, fam bû? Ji bo yêkîtiyê jî vê bêjim: Em, ne di nava nêzîkatiyeke “*hema ji Tirkiyê veqetîne.*” Di vê mijarê de em li gorî rastiyan tevdigerin û rastîbînin. Divê ev jî mîna nêzîkatiyeke taxtîkî ya ji rêzê neyê famkirin. Gelek sedemên vê hene; yên ku dîroka herdu gelan, siyasî û rewşa wan ya aborî fam dikin, wê bizanibin ku parçebûn çênabe. Weke goşt-neynok ketine nav hev. Min di gelek hevpeyvînan de destnîşan kir; dixwazin careke din pêwendiyên me baş bibin. Peywendî û nakokiyên bi hezarî salan bûne girêka kor hene. Ji nû ve bi awayeke azad û wekhev vesazkirin, feraseta me ya bingehîne. Hema her gav me weke “*cudaxwaz*” îlankirin, berevajî helwesteke cudaxwaziyê kur dike. Pergala niha heyî, him xwîna gelê Kurd, him jî gelê Tirk û malê wê dide windakirin, lewaz têxe. Bi mîsogerî ne di wê baweriyê de me ku ev pergala pêwendiyan li gorî berjewendiyên netewa Tirkin jî bin. Ev, gelê Kurd jî di rewşeke niv mirî de digire. Bi rastî jî dixwazin vê derbas bikin. Baweriya me heye ku careke din pêwendî li ser bingeheke azad û wekhev ji nû ve bê birêkûpêkirin. Em ji bo vê jî pir amade ne, lê di rewşa heyî de pergala

makeqanûn-zagona Tirk ji bo vê girtiye. Heke wê qala serdemeke reforman bê kirin, dibêjin bi temamî niha dema sererastkirina van pêwendiyane. Divê nêzîkatî li ser vê bingehê bin.

Em qala vesazbûneke makeqanûnî dikin. Em, qala girîngiya Kurd jî cihê xwe di van vesazbûnan de bigirin dikin.

Bawerim bersiva pirsa we baş hat dayîn. Xususa sêyem çibû? Yan jî ji pirsa we re bersiv baş hat dayîn?

– Belê. Ma ez dikarim wisa fam bikim? Hûn ê ji 20'ê Adarê heta 15 Nîsanê agirbest bikin, heke hêrîşê we nekin hûnê bi ti awayî dijrabûneke raber nekin û bersivek nedin…

**Abdulah Ocalan**: Rast e...

- Hûn dibêjin dema em li pêşkeftinên vê demê temaşe dikin em dikarin vê agirbestê hîn dirêjtir bikin.

**Abdulah Ocalan**: Niyeteke me bi vî rengî heye.

– Başe bi domandina vê agirbestê re di vê navberê de pêwîste bi awayeke şênber çi bêkirin? Abdulah Ocalan: Min pirsên pir vekirî pêşkêş kir. Yanî bi temamî ji hêla berpirsyar û rayedar ve nêzîkatiyeke berpirsyarî tê xwestin. Dibêjim, pirsgirêkên mîna çiyan hene. Ji bo çareseriya van pirsgirêkan mixatabê me kiye? Wê di seviyeya serok-komar de nêzîkatî bê raberkirin? Di asta hikûmetê de nêzîkatî bê raberkirin? Yan jî di asta artêşê de nêzîkatî bê raberkirin? Bi rastî li ***MUXATABEK DIGERIM***.

–Li hember ev teklîfa we di nava vê qewlê de weke serok-komar û hikûmet-her kî be- di berteka bê de, hûn li bendêne we weke-Abdulah Ocalan- bikin muxatap? Wê bi kîjan mekanîzmayê çêbibe? Yan jî wê bi parlementerên Kurd yên li Tirkiyê re çêbibe? Hûn ê kîjan saziyê di derbarê van daxwazên xwe de weke muxatap qebûl bikin? Yanî merceke we wisa heye? Di hevdîtineke bi vî rengî de, îla PKK bê muxatap girtin…

**Abdulah Ocalan**: Ji bo Mam Celal jî "*vekîle, nevekîle*" nîqaşek hat kirin. Dîsa "*HEP vekîle, nevekîle*,"nîqaş çêdibin. Niha di vê mijarê de jî pêwîst nake erzan bê fikirîn. Muxatabeke vî karî emin, aliyê din jî Komara Tirk e. Wê astên xwe diyar bikin. Ez naxwazim li vir jî cudahî bikim. Muxatabê me dibe serok-komar, hikûmet yan jî bibe serfermandarê giştî? Ev pirsgirêka wan e. Lê ez ji bo aliyê me dibêjim; em muxatabê vê ne û amadene dest bi vê pêvajoyê bikin. Heke amrazeke hîn baştir pêwîst dike, bê gotin

ku ev kar vê bi amrazeke hîn baştir pêşve biçe, di vê de jî lihevkirin wê zehmet nebe. Ya girîng rêgeza kare. Heke em rêgezê qebûl bikin, em ê di mijara amrazê pêkanînê de zehmetî nejîn. Ya girîng li vir ne li hember hev taxtîk bikin û hevdu vale derxînin, cewherê pirsgirêkê girtine.

–Di vê de roleke Surî çêbû?

**Abdulah Ocalan**: Ti roleke wan çênebû. Di vê mijarê de Surî heya niha ne baş, ne jî nebaş tiştek negotiye. Li Surî ti riyeke vekirî nîne.

– Di hevdîtineke beriya niha we bi min re kirî, we Kurdistaneke xweser dixwest. Niha jî hûn qala Kurdistaneke di nav yêkbûna Tirkiyê de dikin.

**Abdulah Ocalan**: Li gorî min di navbera wan de nakokî nîne. Serxwebûn-weke min pir carî destnîşan kirî-ji gotineke me kirî bigirin heta pêvajoyeke miletek xwe di warê aborî, sosyal, siyasî û asta netewî de bi awayeke azad îfade bike digire nava xwe. Rê li ber cudaxwaziyeke teng, neteweperestiyeke teng û bendewariyeke zêde vedike. Serxwebûna Kurdistaneke digihe federasyonê heya bêjî wê bikaribe bersivên girîng bide. Di çarçoveya yêkitiyê de mayîn, ne dijberî xweseriyê ye. Di roja me ya îro de pirsgirêka hemû netewan ya bingehîn, ne ku ji bo di nav sînorên neteweperestiyê de hepis bûye, ji bo yêkitiya berjewendiyên xweseriyê saxlem negirtine.

Her wiha di çarçoveya sînorên di navbera me û gelê Tirk de, lêgerîna me ya ji bo yêkîtiya azadî û wekheviya gelê Kurd, weke "*dijberî xweseriyê*"neyê şirovekirin.

-Hûn dewleta federe ya Kurdên li Iraqê baş dibînin?

**Abdulah Ocalan**: Li gorî me hewldana federasyonbûna li Başûrê Kurdistanê neyêniye. Em feraseta otonomiyê teng dibînin. Em Kurdistaneke ji tevahiya Iraqê qutnebûyî zêde rastîbîn nabînin. Lê di nava xwe de heya bêjî demokrasiyeke berfireh disepîne, bi gelên Ereb û gelên din yên kêm re federosyonbûnek li ser bingeha wekhevî û azadiyê li gorî me bi wateye, gaveke dîrokî ye. Li vir ya girîng, gelê Kurd jî di warê siyasî û leşkerî de xwe bixe bin temînatê, ji bo vê bûna xwedî hêze. Ji dervî vîna xwe bêyî bi îmhayên ku di dema borî de pê re rûbirû bimîne dikare di Iraqê de sererastkirinê saxlem serbixe.

– Birêz Ocalan, em carekedin bên ser Tirkiyê; hûn serwerî hemû komên xwe yên biçekin? Hinek gotegot hene.

**Abdulah Ocalan**: Pêwendiyên min rojane hene. Di wateya giştî de wê hemû pêwîstiya talîmatan bicî bênin. Weke tê qalkirin di PKK'ê de cudabûn û qutbûnek nemijara gotinêye. Ev nûçeyên sansasyonelin. Mînak tê qalkirin ku Cemîl Bayik muhalefet kiriye bi komeke mezin re qut bûye. Cemîl Bayik niha li gel me ye. Nêvga wî ketiye, emeliyat bûye. Beriya çend salan dibe ku hinek qutbûn çêbûbin, lê ev qutbûn birastî jî provakasyonan li ser partiya me ferz dikirin. Di roja me ya îro de PKK, li her qadê serwere, zîncîreke jor ya emir-komîte heye û wê hemû PKK'yî biryarên partiya me bicî bênin. Heya mirinê bi biryaran ve girêdayîne.

– We qala Newroza par kir. Di derbarê bêdengkirina çekan de hûn Newroza îsal weke mercek dibînin. Yanî hûn qala bistûpênc rojên di navbera meha Adar û Nîsanê de dikin. Niha ev helwest, di pratîkê de çiye? Mesela, li aliyê çiyayên hawirdora Tirkiyê operasyonên ewlekariyê yên didomin hene. Yanî dawî li van operasyonan anîn merceke vê agirbestêye, yan jî wê ev agirbest bi her awayî 25 rojan bidome?

**Abdulah Ocalan**: Em li vir ti şarteke nadênin. Lê heke operasyon me bi îmhayê re rûbirû bihêle, em ê parastina xwe bikin. Ji derveyî vê wê ti tevgereke me ya din çênebe.

– Birêz Serok, dixwazim du pirsan bikim: Ya yekem, heke di navbera van 25 rojan de hêviyek neyê dîtin-xwedê hezke wisa çênabe- wê têkoşîn çawa, bi çi şeklî û li kî derê bidome? Ya duwem,-we herduyan li gel hev dîtin pir xweşe- wê pêşeroja Kurdên li Bakur û Başûr çi bibe û şekleke çawa bigire?

**Abdulah Ocalan**: Bi rastî jî ev qewl, qewleke niyeta başe. Heke bê diqatkirin şerteke wê nîne. Şartê tenê bi awayeke îmhayê bi ser me de neyên. Û bi taybet jî Mam Celal jî got û bawerim di çapemeniya Tirkiyê de jî pir cî girtiye, "*herkes ji bo çareseriyek aşitiyane gavek dixwaze*." Ji bo li beramberî vê rêzdarî hebe ev hatiye diyarkirin. Bi taybet ji bo pêşiya hinek provakasyonên li hember agirbestê bê girtin, bi mîsogerî ji bo hêcetan nedin pêş em difikirin agirbestê beriya Newrozê pêş bixin. Yek jî heke niyeta hikûmetê pirsgirêkê di asta siyasî de girtina dest hebe, ji bo fersendeke bidin wê jî didin diyarkirin.

Heke ev hemû vale derbikevin, hema diyar bikim ku, wexta min dest bi vî kare kir, ne pênc quruş pereyê min hebû, ne jî mermiyeke min tenê hebû, lê tevî vê jî me karî şer heya vir bînin. Û hema bidim diyarkirin, bi vî şerî pir zehmetî dijîm. Li vir dixwazim nirxandineke Birêz Yalçın Küçük Xoce libîr bênim: Dibêje "*min di helwesta APO ya li hember şer de çi dît*?" Û wisa didomîne: "*Min helwesta qehremanên Yunan yên serdema pêşîn dît*." Tevî ku pir li hember şer jî bûn, egîdên bi zor em didin şerkirin… Bi rastî jî wisa ye. Tevî ku em pir li hember şerin jî, di rewşa heyî de tengav dibin. Dubare vê bêjim; heke bê gotin ku di vê cîhanê de kesê herî zêde ji şer diçe paş kiye, dikarim bêjim ez im. Hîn jî wisa ye. Min-dibe ku sembolîk bê- çekeke tenê jî nedaye destê xwe. Çalekiyeke min tenê jî nîne. Lê wexta mecbûriyeta hebûna gelê Kurd ya derketina holê çêbû, weke pêwîstiyeke mirov devjê naberde dema ji hêla min ve ev hat fêmkirin, neçar mam ku şer bênim vê astê.

Dubare dibêjim; hema dev ji vî şerî berdin! Û min hinek pirsên mutewazî kirin; ji bo hebûna gelê xwe bigirin bin ewlahiyê û pêşkeftina riya azadiyê vekin, dibêjim pêwîste muxatap hevdu bibînin.

Mesela, ne ku bi min re hevdîtin çêbikin an na. Ez ê ji navberê jî derbikevim. Bila ji vî gelî re mafê demokratîk yê xwe îfadekirinê bê naskirin, nûnerên xwe bi awayeke azad derxin holê, çawa dixwaze bila pirsgirêkê wisa çareserke, bi ti awayî derdeke min ku şer ferz bikim nîne. Ji bo min îşkenceye û bi vî awayî hûnê min jî ji îşkenceyê xilas bikin.

Lê heke mîna berê bê gotin "*hûn nînin, hûn ê bên teslîm bibin*," di vê mijarê de bi rastî jî ez ê pêwîstiya xweparastinê bifikirim. Difikim di radestkariyê de qet jiyan nîne. Tê gotin "*dewleta Tirk*." Ev edalet, ji dara darazê zêdetir tiştek neaniye. Wisa difikirim. Em ê li hember polîtîkaya "*tine hesibandinê*" xweparastinê bidomînin. Pirsgirêkeke me ku em dewleta Tirk, netewa Tirk îmha bikin nîne. Berevajî, bi sînor jî be dixwazin mafê hebûna xwe ya netewî biparêzin û dibêjin bila mafê pêşxistinê bê naskirin. Li vir xaleke lê şaş mame heye: Teror çiye? Kî li hember kê çawa bikar tîne? Evqas berevajikirina vê, ne li ser navê xwe, bi rastî jî min li ser navê raya navnetewî dide şermkirin, bihêrs dike. Heke mîna berê bêjin; "*em ê Kurd tine*

*bihesibînin, vê carê jî îsyanê bitepisînin, yên man jî îdam bikin*," em ê jî berxwedanê bidin domandin. Dikarim bêjim ku di vê mijarê de amadekariyên me yên îsal, bi qasî ku bi ti salan re neyê qiyaskirin di asteke jor de ye. Hêzên gerîla; li çiyayê Agirî, Muş û zozanên Erzorûmê, çiyayên Dêrsimê, Torosan, Mêrdîn, Botan, dîsa li Amed, Bîtlîs hêjmara wan digihe deh hezarî. Ev sal jî bilezgînî bigihe pêncî hezarî. Heke biryara hikûmetê, "*misoger şer be*," ez jî bi misogerî diyar dikim ku, wê cara yekê gerîla bigihe pêncî hezarî û şereke mayînde pêk bîne.

Dîsa wê serhildan li Kurdistan û Tirkiyê belav bibe. Li Tirkiyê jî şerê gerîla bidin belavkirin. Lê dubare bidim diyarkirin, ev ne tercîha me ye. Heke bi israr "*teslîmkarî û îmha*"bê ferzkirin, hemû rêbazên siyasî bidin aliyek, derfet ji aşitiyê re nedin wê ev bibin.

Ger em bên ser têkiliyên bi Başûr re; ev 14 sale me bi Mam Celal re dest bi van pêwendiyan kiriye. Weke hûn îro jî dibînin careke din di asteke jor de hevdîtinên me çêbûn. Bawerin heya bêjî hewceyî hevin. Beriya hertiştî Mam Celal eleqeyeke mezin daye van têkiliyan. Me bersiva vê ya pêwîst daye. Bawerim ji niha şûnde ji bo careke din nehilweşe wê ev têkilî bi biratî bidome. Gelê Bakurê Kurdistanê jî, ji niha şûnde wê bi gelê Başûr re pêwendiyên mayînde pêş bixe, bi taybet li hember tehdît û zextên di derbarê tinekirina wê de bisekine û dê hêza wê têra parastina wê bike. Yanî gelê Başûr hatibû tecrîtkirin, bi tenê bû, lê niha ne wisa ye. Heya dawiyê em ê hebûna wê biparêzin û di derbarê azadkirinê de tişta ji destê me bê em ê bikin. Ji bo vê -weke min diyar kirî- ji min zêdetir Mam Celal xebitiye. Bila Mam Celal temam bike.

**Celal Talabanî**: Weke hûn dibînin niha ji bo aşitî û ji hemû pirsgirêkan re çareseriyeke polîtîk pêk bênin gelek nêzî hevin. Weke Birêz Ocalan jî diyar kirî, pêwendiyeke me pir demdirêj heye. Ji bo dawî lixwînrijandin û şerê li Tirkiyê yê di nav birayan de çêdibe bênîn fersendeke dîrokiye. Di Kurdistana Iraqê de em, bi baweriya ku bi mirovê Tirk re birane û bi ti awayî naxwazin ew mirov xusarê bibînin. Weke Birêz Ocalan jî diyar kirî aşitî û biratiyeke nû ya bi Tirkiyê re afirandin û ev şansê biarmanc divê ji dest neyê berdan. Ev, destpêkê li Tirkiyê û bawerim wê piştre li Rojhilata Navîn aşitî, pergal û demokrasiyê bêne. Û ev

bangawazî, divê ji hêla hemû kesên li herêmê ku ji Tirkiyê hez dike, ji bo Tirkiye di nav demokrasî û yêkitiyê de be bawer dikim qebûl bê dîtin. Weke hûn jî dizanin gelê li Kurdistana Iraqê pir kişandiye, îmhaya topyekûn jî di nav de bi gelek zextan re rûbirû hatine. Ji anîna vê ya ser ziman kêfxweşim; pêwendiya me didome û me heya roja îro anî. Bi baweriya ku ev li gorî berjewendiyên hemû kesên li Rojhilata Navîn jiyan dike bibe. Tenê ne ji bo gelê Kurd, ji bo gelê Tirk, gelên din jî, ji bo berjewendiyên wan yekitiyeke.

– Di encama ev peyam û bangawaziya we ji hikûmeta Tirk kirî de, hûn li benda çine? Heya 15'ê Nîsanê têkiliyên dîplomatîk yên ji raya Tirk veşartî, wê di ser kesan re pêşbikeve, yan jî weke hikûmeta Tirk ji raya Tirk re pêşkêş kirî "*na em PKK'ê qebûl nakin, ne mixatabê me ye*" bêje, di vê navberê de bi we re ev pêwendiyên cuda, ji raya giştî veşartî bimeşînin? Yanî wê bi we re vê aşitiyê yan jî bangawaziyê çawa darizîne? Yanî hûn weke kes çavrêyî çine? Herî kêm hûn kêfxweşin? Bi awayeke kesî bersiv dixwazim, yanî ne li ser navê PKK'ê, li ser navê we Abdulah Ocalan dipirsim.

Ez pirsa xwe ya duwem jî bikim; we cilên medenî li xwe kiriye, hûn sivîl dest bi têkoşînê dikin; taxima cilan, qrewat hwd… Yanî ji ber hat gotin "li Tirkiyê Hizbullah û PKK li hev kirin" hevalan vê kirin qepaxa kovarê.  Tiştek wisa heye? Ji ber ku hat  gotin "*Hizbullah û PKK li Tirkiyê, Amed, Batman û Batonê*"li hev kirin. Lê pirsa min ya yekem girîngtire.

**Abdulah Ocalan**: Pirsa yekem girîngtire?

– Ji bo min pirsa yekem girînge. Hûn weke Abdulah Ocalan ji vê bangawaziyê çi hêvî dikin? Yek jî di wê baweriyê de me ku li Tirkiyê hertişt ji me veşartine. Yanî heke hûn weke Cengîz Çandar bibin hûn hertiştî fêr dibin, lê heke hûn bibin zilamên mîna me hûn fêr nabin. Ez weke Tirkek û weke mirovek ji bo têkoşîna we ya li wir gelek xemgîn dibe, yanî ji bo şerê gelê Kurd û Tirk gelek xemgîn dibe dibêjim, fêrbûn mafê mine.

**Abdulah Ocalan**: Hûn dihesibînin ku çi diveşêrin?

–Yanî hikûmeta Tirk, ji raya Tirk a giştî re wisa dibeje: "*Em PKK'ê muxatap nagirin*." Gelo dema dibêjin "*nagirin*," wexta ji gelê Tirk re rewş wisa dide peytandin, bi hinek minavreyên dîplomatîk yên em nizanin bi we re hevdîtinên îlegal dimeşîne?

**Abdulah Ocalan**: Ez bi hemû jidiliya xwe dibêjim, di holê de hevdîtineke veşartî nîne. Di derbarê mijara hikûmeta we li hember gelê xwe di nav hinek menavreyan de ye an na jî, di wateya hûn fam dikin de, vekiriye dixwazin hinek rastiyan li gorî armanca teng ya polîtîk biparêzin. Mînak, helwesteke Demîrel ya beriya niha du rojan dibêje, "*em hinek din bisekinin, wê ev daxuyanî çawa bibe, em ê li gorî wê helwest bidin raberkirin*." Roja duwem bi temamî helwesteke berevajiyê vê avabû. Dîsa axaftina Ozal ya di televizyonê de ji min re ragihandin gotin, "*axaftineke hîn cidî ya nêzîkî pirsgirêkê bû*." Niha ez diyar bikim, bêjim çawa be jî di navbera herduyan de nakokiyek heye û pirsgirêkeke min jî wisa nîne ku bêjim ka ez alîkariyeke bidimê. Li gorî min jî Ozal… yek ji kesên herî sereke yê berpirsyartiya ev şerê giran rakiriye. Dikare bê gotin ku ji bo vê giyana xwe jî daniye holê û bi hemû hêza xwe ve jî xebitiye. Niha di mijara çareseriyê de jî giranî daye hinek dîtinan.

Têkiliya vê ya bi taxtîk re çiye yan jî ferzkirina hinek hawirdorane? Ne di rewşa vê jî diyar bikim de me. Hemû arezûya min, bi awayeke bawer bi rastî jî di nav nêzîkatiyeke bi vî rengî de ye, yan na? Ji ber min berê vê di hinek hevdîtinan de jî diyar kir. Gelo hêz û wêrekiya Ozal ya pêşkeftinan bide dest heye, an na? Di vê mijarê de bi rastî jî di derbarê pêşveçûnê de dixwaze hinek gavan bavêje, an na? Heke ez bawer bûma, minê li hemberî xwe weke muxatabeke binirxandiba bigotiba; "*fermo ji bo çareseriyê pêşve biçin*." Hêza min jî, wêrekiya min jî ji vê re heye. Lê heman tişt ji bo yê beramber nabêjim.

Ger em bên ser Demîrel, dikarim bêjim heya dawî binakoke û nebawerim jî bi îradeya xwe ya azad daxive. Tu yê evqas salên dirêj -nêzî sîh salan- di navendeke polîtîk de cî bigirî, li Tirkiyê bibî yek ji kesên sereke yên polîtîkayê, lê di derbarê pirsgirêkê de gotineke tenê yê derve eleqedar bike nebêjî. Dema bû serokwezîr got, "*nasnameya Kurd nas dikin*." Dema serokwezîrek vê gotinê kir, ma wê yek-du gotindin neyne? Mixabin neanî. Li şûna vê 20'ê Kanûnê destpê kir-20 rojan piştî bû serokwezîr şûnde- heya roja me ya îro bi serdema Ozal re jî neyê qiyaskirin bombardumaneke zêde û weke li Şirnex jî hatî dîtin çend provakasyonên qetlîaman ceriband.

Niha nizanim ev jî rasterast bi daxwaza Demîrel çêdibin, an na. Ev bûyera li Şirnex, li gorî min tam provakasyoneke, ji ber min dizanî êrîşeke me li hember Şirnexê çênabe. Heke mirov neketibin bin erdê, wê nêzî hezarî bimiriban. Kî ev ferman da? Ev derneket holê. Heke hinek tişt ji gelê Tirk hatibe veşartin, dibêjim di vê mijarê de hatiye veşartin. Di holê de hinek ferman tên dayîn û kes xwedî li wan fermanan dernakeve. Demîrel dibêje, "*nasnameya Kurd*,"roja din tiştek nabêje. Ev guhertin çima wisa dibin?

Hinek hawirdorên din hene; em nizanin dîtinên artêşê çine. Qala Konseya Ewlekariya Millî tê kirin. Rewşa vê saziyê çiye? Li Tirkiyê pir tê nîqaşkirin. Tê gotin ku hikûmeta esas ev e. Dibêjin meclîs bê vîn û îrade ye û dîsa hikûmet jî wisa ye. Ev hemû mijara spekûlasyonê ne. Lê li Tirkiyê li gel gelek bêhêzbûnên îqtîdara siyasî, dikarî qala parçebûna wê jî bikî. Li vir ji pirsa tiştek ji gelê Tirk diveşêrin an na zêdetir, dikarim bêjim vê bêhêzbûna zêde û parçebûnê bênin ber çavê xwe bese. Yek ji wan jî bi serê xwe li ser bingeha rêgezek polîtîkayek pêşve nabe. Jan û bêçareserî li vire. Pir arezû dikim; li Tirkiyê navendeke polîtîk hebe, wiha weke me îro danî holê, nîqaşên gelek vekirî yan jî bikaribe hinek rêgezan bêjin, ji me re jî ji derveyî "*teslîmiyet*" û "*îmhayê*" rêyek din pêşniyar kiriba. Tiştek wisa nîne. Bi wêrekî kes gotineke tenê jî nake. Kî ji kê ditirse divê bê ravekirin. Pir li ser kontirgerîla tê axaftin. Hebûna vê saziyê çiye. Di welatên NATO yê de gladîo, li Tirkiyê jî kontirgerîla û evqas cinayetên kujernediyar! Ma wê di vê mijarê de tiştek neyê gotin?

Belê, ez ê bêm ser Hizbullahê. Di holê de cînayet hene. Berpirsyarê vî tiştî yê sereke hikûmete, wê demê bila xwedî lêderkeve. Mafê me yê van pirsan kirin û bersiva wan girtin heye. Di derbarê pirsgirêka Kurd de nirxandinek dike, bila xwedî li ev nirxandina xwe ya kirî derkeve. Niha tu yê bibî siyasetmedarek sîh salan û tu yê sîh salan ji pirsa "*hene,nînin*" re bersivek nedî! Li hemberî gelê Tirk bêrêziya herî mezine-herî zêde ya li gelê Kurd tê- di vir de ye. Li vir dixwazim hinek tişt ji bo gelê Tirk bêjim: Bi rastî jî ev nûnerên we ne? Heke nûnerên we bin, hûn çiqas di nav ev şerê tê meşandin de ne û hûn çiqas erê dikin? Min ji bo gelê Kurd qala hinek daxwazan kir yan jî di vê mijarê de di derbarê pratîka xwe de hinek nirxandinan kir. Gelê Tirk, dixwaze

me îmha bike? Bi temamî Kurdan înkar dike? Mînak, ji gelê Kurd re sînordar be jî mafê televîzyon-rodyo nas dike daku bikaribin di vir de mafê azadiya daxwazên xwe anîna ziman wê nas bikin?Niha him hûnê bêjin "*hezar sale di nava yêkîtî û hevgirtinek de weke bira jiyan dikin*," him jî li Tirkiyê -duh Demîrel bi xwe got; "*çar hezar radyo heye*"- û wê radyoke tenê yê Kurdan nebe! Ma biratî bi vî rengî dibe? Wiha dibêjim di vê mijarê de hêzeke we ku bersiv bidin nîne. Di derbarê qada navnetewî de hûn evqas weşana radyo, televizyonê dikin- we dest bi Komara Tirk jî kir-, lê di derbarê gelê Kurd de weşaneke biçûk yê televizyonê nayê kirin? Heke gelê Kurd bira be, heke nasnameya wê tê naskirin, wê demê mafê me yê kirina vê pirsê heye. Gelê Tirk ji vê re çi dibêje? Heke wijdana gelê Tirk hebe, gelê Tirk li gel biratiyê be, gelê Tirk dixwaze gelek xwe bi awayeke azad îfade bike,-berdin avakirina dewleteke cuda- wisa bi awayeke dilnizm dixwaze xwe bigihîne mafeke xwe îfadekirinê, ma dikarin ji rêveberên xwe re bêjin hinek "*cidî bibin*." Nezelalbûna bingehîn û bêrêziya bingehîn li vire. Li Tirkiyê demokrasî nîne, li Tirkiyê rêz ji gel re nîne. Belê tenê ne li hember gelê Kurd, rêz li hember gelê Tirk jî nîne. Polîtîkayeke rast nayê kirin. Di derbarê gelê Tirk de ti pêşkeftineke polîtîk nemijara gotinêye. Ez, dibêjim jan di vir de ye. Nizanim, gelo ma weke tê xwestin fam nabe?

Di derbarê raya navnetewî de jî dikarim vê bêjim: Wê li ser Komara Tirk zext zêde bibin. Li gorî çavdêriya me jî, wexteke diyar ji hikûmeta Tirk re hatiye danin. Ev dem-tabî tam nizanim lê li gorî çavdêriyên me bidest xistî-bidawî bûye. KT bi awayeke cidî ji bo çareseriyeke siyasî tengavkirin heye. Di serî de Emerîka, di wê baweriyê de me ku Avrupa jî ji bo çareseriya siyasî Komara Tirk tengav dike û dibêjim dibe ku ev pêşkeftina neasayî girêdana xwe bi vê re hebe. Û bawerim wê ev pêşkeftin girantir jî bibe. Tişta min ji Mam Celal jî fam kirî ev e; wê ev bi awayeke zêde pêşve biçe. Ev neku ji bo "*Rojava ferz dike*," divê Tirkiye di nava xwe de ji çareseriyeke siyasî re vekirîbe. Heke vekirî nebe, wê pir bê tengkirin. Di qada dîplomatîk de wê pêvajoya li hemberî me berevajî bibe. Di vê li bendê bin ku wê ev jî rê li ber tengavbûnek girîng veke. Di vê mijarê de bêyî ku

daneyeke diyar hebe, li gorî min di vê mijarê de pêşkeftinek mijara gotinêye.

–Birêz Ocalan, di vê meseleya *"muxatabê"*de di nameya birêz Talabanî de hêmanek heye; hûn dibêjin ku, "*parlementerên Kurd yên di meclîsê de,"* heta "*HEP*(Partiya Kedê a Gel*)jî dibe, dikarin bibin muxatap*." Yek, ez ê daxwaz bikim ku hûn vê jime re zelal bikin û baştir vekin. Yek jî di pêvajoya pêşiya me de dibe ku roleke navbeynkariyê ya Talabanî çêbibe?

**Celal Talabanî**: Na, PKK heye, hikûmeta Tirk heye. Birêz Ocalan pir vekirî diaxive…

– Dibêje heke Birêz Ocalan bixwaze, ez ê bikim...

**Abdulah Ocalan:** Di vê mijarê de çi HEP, çi jî Mam Celal dest bi hinek pêvajoyan kirine yan jî hinek pêvajoyan hîn jiyan dikin. Di vê mijarê de nêzîkatiya HEP'ê sînordare. Beriya hertiştî bi xwe ne di asta organize û temsîlê de ne, lê, dikarin di mijara pêwendiyan nermkirin û di derbaskirina platformeke siyasî de fonksiyon bigirin. Nêrînek me ya wisa hebû û di vê çarçovê de hevdîtinên meşandine em xeter nabînin. Di vê mijarê de dem bi dem jî hewl didin hêz bidin. Ev jî şaş hat famkirin gotin; "*Apo fermanê dide HEP'ê."* Ne ferman bû. Di vê mijarê de tişta me dixwest ev bû: Bila derbikevin hinek platformên siyasî, di vê mijarê de hinek jî xwe derxistibûn holê, ji bo vê yekî em hêz bidinê. Yanî em fikirin me got him dikarin ji demokrasiyê re xizmet bikin, him jî navêndê hinek hînî rêbaza siyasî bikin. Lê heke hûn bi temamî qala roleke nevbeynkariyê bikin, ev hinek zehmete. Bi xwe jî ne amadene. Bêguman çarçoveya me ya pêwendiyan jî vê hinek teng dibîne. Dikarim vê diyar bikim.

Ji bo Mam Celal jî, heke weke hatî gotîn, rayedarên li Tirkiyê di çarçoveya pirsên beriya niha min kirî amade bikin û heke pêwîstî bi pêwendî danîneke wiha û navbenykariyeke wiha bike, ji bo me astengek nîne. Ji bo rê li ber têgihiştineke hîn baştir veke tecrûbeyên Mam Celal hene. Demeke dirêje bi me re di nav peywendiyan de ye, dibe ku ji bo avakirina feraseta navendeke hîn baştir alîkariya wî çêbibe. Lê di vê mijarê de pêwîste mirov zêde nelibenda tiştekê be; tenê dikare di avakirina rêveberiya nû û derxistina pêş de rol bilîze. Weke ku me di vê de ti fikarek nedît, em ê hewl bidin bibin alîkar jî.

Ma bersiva pirsa we baş hat dayîn?

-Belê, spas dikim.

**Abdulah Ocalan:** Lê dixwazim li vir xaleke biçûk lê zêde bikim: Çi partiyên li Tirkiyê yên li ser îqtîdarê, çi jî partiyên mixalefetê çarçoveya me danî holê, mijara pirsgirêkê di asta siyasî û demokratîk de girtina dest nebesin û ne amadene. Vê diyar bikim: Nezelalbûn heye. Ji bo fam bibe diyar dikim. Bawerim bi pirsa we ve pêwendîdare. Di mixalefet û îqtîdarê de jî kêmbûnên cidî hene. Mîna kes, mîna bernameya partiyê, yek jî di warê tecrûbe de ceribandine; ez jî di derbarê bibin hêza çareseriyê de ne bihêvî me. Nirxandineke Ozal weke "*avabûna nû*" ya di çapemeniyê de hatî peytandin heye; hinek jî kar hatiye wê astê, heta qala nîqaşên têgeheke "*Komara Duwem"* dikin. Ez van pirsan û ev têgehên bersiva van pirsan vale nabînim; li gorî min partiyên heyî -çi li ser îqtîdarê bin, çi jî di mixalefetê de bin- gelek dûrî hêza famkirina pirsgirêkêne. Gelek li paş asta Tirkiye hatiyê dikevin. Di mijara têgihiştina pirsgirêkên giran bûyî de zehmetiyan dikişînin yan jî derdeke van yê têgihiştinê nîne. Her wiha zêde ne bi hêvî me. Yanî we qala ez bi hêvî me yan na kir, min dixwest gelek bi hêvî bim. Sedemên vê hene. Mînak dema Akbulut çû, Mesut hinek lîberale, hinek jî Almanparêze, min got wê hinek tiştan bike. Lê mixabin hîn zêdetir bombe barand. Ew çû Demîrel hat, min got dibê ku ev hinek din lîberal be -hinek jî bi alîkariya me bibû serokomar-, wî jî xweziya xwe bi Mesut ne anî. Yanî dema me xwest ji em şiliyê xilas bibin, ketin ber şirikê. Niha qala pêkhatineke nû dikin; heke pêkhatina nû, bi rastî jî pêkhatineke nû be… Yanî ji ber şirikê çûn ber mezrîbê.

– Hêviya we komara duweme...

**Abdulah Ocalan**: Belê, nîqaşên komara duwem heye, dixwazim bi hêvî bim. Wexta komara nû pêş dikeve-tabî hewl tê dayîn li ser bingeha mekeqanûnî bidin dest-heke di nava zagonê de Kurd û Tirk azad û wekhev tê de bên bicîkirin û di vê çarçovêyê de hinek sazkirinên zagonî çêbikin, avabûna nû dikare bi komara duwem re pêkbê. Û ev, dibe bibe gaveke pir baş. Li gorî min jî Tirkiye, êdî dikare bi veguherîneke bi kokdar û radîqal re ji pirsgirêkên giran re çareserî bêne.

Gelo Ozal, dixwaze di vê mijarê de tiştnan bike, birastî jî heza wî heye? Ez her tim van dibêjim-lê negirin, ji ber raboriya wî heye-, hemû nêzîkatiyên bi niyeteke baş, piştre bi awayeke pir

trajîk, bi bomberdumanên biêş û dijwar, bi rêbazên şerê taybet bersiv dît. Heke bersiveke rast bê dayîn, alîkariya ji destê me bê em ê bidin. Dibêjim ji nîqaşên komara duwem, avabûna nû, ji çarçoveya wê ya mekeqanûnî re di hêla siyasî de têkoşîn ragihandin, ji bo rêbaza demokratîk bê bikaranîn wê PKK, heya dawî bi afirînerî nêz bibe, alîkarî bide. Lê di vê mijarê de dikarim bêjim ku pirsgirêk ne di PKK'ê de ye, di avaniya siyasî ya Tirkiyê a hatî xetimandin de ye. Li Tirkiyê avaniya siyasî xetimiye, aborî xetimiye, demokrasî pêşnakeve û ne ez vê dibêjim, her roj hemû nivîskar-xêzkarên Tirkiyê vê dibêjin.

Hinek jî dixwazim çareseriyê di vê de bibînim. Hêvî hinek jî ev e. Yanî hêviyek pir teqeze ango hûn bêjin heke tu tenê girêdayî vê yî, na lê dixwazim di vê çarçoveyê de bi Tirkiyê re hêviyek biparêzim.

Belê pirsa we ya duwem a di derbarê Hizbulahê de bi encam bikim: Bawerim hûn ê di derbarê Hizbulahê de nirxandineke kurt bixwazin.

Li gorî min heke şîroveya ez bikim rastiya Hizbulahê hemû negire nava xwe jî, di asteke girîng de -û ji bo girêdana wî li gel emniyetê heye dibêjim-MHP ya di Kurdistanê de ye yan jî MHP'yek kirine Kurdistanî heye. Di rojên dawî de hinek nirxandinên wan-bi giranî Batman min di bûyera Hizbulahê de-xwend; fam dibe ku pêkhatineke heya bêjî emniyet ketiye navê. Min texmîn kiribû; ev rast dibe. Bi rastî jî lîstîkeke pir xetere; tenê di 1992'an de rê li ber 500 cînayetan vekir. Ev kesên lê hatin xistin jî bi rastî jî ti têkiliyeke wan li gel PKK'ê nebû, hemû mirovên bêguneh bûn û hêjmarek zêde ji wan jî nebawerim siyasî bin. Rêbazeke wisa ye: Hîzbullah, di rewşa gel xwe nêzîkî PKK'ê kirinê de, jê re bibe taban dê çi bê serê wan ji bo ku nîşanî gel bide tevgereke taxtîkî hatiye pêşxistine.

MHP demek li Tirkiyê li hember çepgiran vê erka termisandinê digire ser xwe. Di vê mijarê de dixwazim şiyariyek li hikûmetê bikim: Demîrel bixwe, li Tirkiyê demek dirêj li hember çepê Tirk MHP'ê weke amûra termisandinê bikar anî. Di pêkhatina MHP'ê de bi gelek hikûmetên heyî re, bi taybet berpirsyariya Demîrel heye. Heman lîstik, di Hizbulahê de jî daye nîşan. Rêxistinbûna Hizbulahê ya di hikûmetên berê de evqas pêşneketibû, "*cînayetên kujernediyar*" evqas belav nîne. Lê ev

cînayet di 1992'an de mîna şapê mezin bû. Yan ne di kontrola hikûmetê de ye, yan jî hikûmetê çavê xwe girtiye. Û ev, rewşeke pir giran îfade dike. Mirov nikare wisa bên qetilkirin. Diviya ev hikûmet, ji van qetlîaman herî kêm çend kujeran dîtiba derxistiba holê. Wê demê du encam derdikeve holê: Ya hikûmet bi rastî jî di nav emniyetê de neserwerî hinek hêzane, yan jî şewqa kest pê xistiye. Di vê mijarê de raya giştî vekirîbûn dixwaze. Yek ez vê dipirsim.

Ya duwem, hewirdorên Hizbulahê yên dibêjin"*em jî Kurdin, li hember kemalîzmêne*" heye û qala gelek saziyên Îslamiyetê dikin. Em bi hinek -nerasterast jî be- hawirdorên van re di nav pêwendiyan de bûn. Peyama ji min çûyî ev e: Bi rastî jî heke hûn wisanin û naxwazin xwîn birijînin, em jî gule li we nabarînin. Bi taybet hemû meha remazanê û pêvajoya piştî wê jî di nav de em ê çek bikar neynin. Me got; hûn dixwazin em bi ser pêwendiyeke hîn baştir de biçin. Min agahî da hemû yêkîneyên me da ku şer nekin. Her wiha şer çênebû. Yek jî li ser navê merkezê belavok hat weşandin. Bawerim niha di van "*cinayetên kujernediyar*"de kêmbûnek çêbûye. Hawirdoreke Hizbulahê dixwaze durî van cînayetan bisekine. Ev, gaveke erênî ye. Hêvî dikin ji niha şûnde jî pêşve bibin. Lê hinek "*cînayetên kujernediyarên*"din hene. Jixwe li vir yek ji armanca me birastî jî yên dixwazin tevlî van cinayetan bibin û yên naxwazin tevlî bibin ji hev cudakirine. Ev, gaveke sînordare. Dixwazin vê gavê hinek din pêş bixin. Hêvîdarin ku em ê pêşî li gelek cînayetên li hember rojnemevanan jî pêş dikeve bigirin û em ê serdeçûyîna xwe ya di vê mijarê de jî bidomînin.

– Başe ev, di têkoşîna li hember Tirkiyê de dibe lihevkirineke hevkariyê?

**Abdulah Ocalan:** Hîn rewşeke wisa nîne.

– Niha mijar hinek derket derveyî rewşa rojaneyî. Dixwazim pirsek bipirsim: Piştî sê-çar roj din Newroz heye. Weke we beriya niha rave kir, we biryarek girt û bi taybet jî xaleke ku we bal kişandî ser we qala provaqasyonan kir. Yanî "*di Newrozê de wê hinek hawirdor provaqasyonan bikin. We got em ê li hember van tedbîran bigirin.*" Par jî çi ji hêla Enqerê ve çi jî ji hêla we ve hinek daxuyanî çêbûn, lê qet daxuyaniyeke zelal nebû. Mesela îro daxuyaniyeke Enqerê hebû; dîsa hefteya derbasbûyî

daxuyaniyeke ku ji hêla hikûmetê ve hatî kirin, bi vî rengî bû,“*em ê di Newrozê de destura alên PKK'ê nedin*-ji bo qanûn destûr nadin- *em ê li hember vê tedbîran bigirin*.” Ji ber vê yekê di cihek de dikarin wisa bifikirin? Yanî ya ku hûn qala wê dikin, ew xusûsên ku hûn jê re dibêjin nêvengên provakasyonê dibe ku kêrî van bê?

Di Newrozê de bendewariya we ji mirovên Başûrê Rojhilat û Kurdên li Tirkiyê jiyan dikin çine? Hûn li bende ne ku di Newrozê de çawa tevbigerin û divê çi bikin? Bi awayeke vekirî dikarin bêjin? Ji ber heya ku ev nezelalî hebe, her sal xwîn tê rijandin.

**Abdulah Ocalan**: Bi awayeke vekirî bêjim: em dixwazin Newroz bi awayeke aşitiyane bê pîrozkirin. Tişta ez ji gelê Kurdistanê re bêjim; Newrozê bi awayeke pir berfireh û azad jiyankirine. Rengên wan yên netewî hene, bila bikar bînin. Vê jî bêjim; ev rengên netewî me dernexistine. Rengên kesk, sor û zer rengên ji sedsalan ve hene. Ji wan rengan cil lixwe dikin, kofî girê didin. Ji ber girêdana kefiyekê êrîşkirin, ne li gorî şaristaniyê ye.

– Belê ezbenî, navend evqas tengezar bûye, -niha li Tirkiyê nêveng heta radeya dawî ewqas tengezare- di hinek derdoran de ajîtasyon çêbûye. Bêguman ez ji wan rengên te gotin cuda vê dibêjim. Mînak sala borî bi wêneyên we bi ser hêzên ewlekariyê de çûyîn, vaye wê demê nêvenga ku ji xwe ajîtebûyî hîn zêde ajîtekirine…

**Abdulah Ocalan**: Niha fêm dikim; ji ber ku çend wêne hatine bikaranîn, ji ber çend durişme hatine avêtin ji vê re bi gulebarandinê bersiv dayîn pir zêdeye.

(Ji bo Celal Talabanî) Tiştê min gotî tu tê gihiştî? Ez dibêjim ku liberkirina cilên kesk û sor û zer, nepêwîste. Dîsa kesên dibêjin yekê din “*Bijî Apo*” nemecbûrin. Ez vê yekê dibêjim.

Yanî divê bersiva qêrîna çend durişmeyan negulebarandin be. Bila bigre! Yên me wê çek bikar neynin. Qet, leşkerek nekujin. Mane ciwane? Ger dijberî qanûnên wane, bila hêzê din yên ku diruşme avêtiye bigre û bavêje girtîgehê. (Bila bigre hepsê ke, çima dikuje.) Tahrîk di kî dera vê de ye, bila deh salan ceza bidiyê, ma cezayê tahrîkê kuştine? Pêwîste di vê mijarê de hinek biferaset bin; li Avrupa hezar gotin tên gotin. Em li demokrasiya Avrupa binêrin; ma herkes durişma ku dixwazin navêje, heta ji

dewletê re dujîndayînê jî naçe? Ev hemû dibin. Ma di yek ji van de jî cezayê li navbirinê tê pêkanin? Di Newrozê de ya ku ji me bê xwestin, “*bila PKK çek bikar neyne*” ye. Em jî bersiva erênî didin vê. Em ê serîlêdaneke berevajiyê vê nekin. Bila ti leşker û polîs netirsin. Em ê bêjin yê ku li wan da, bila ew jî lêdin.

– Yanî di vê Newrozê de ji hêla we ve bi ti awayî çek nayê bikaranin…

**Abdulah Ocalan:** Dibêjim yên ku berpirsyartiya PKK'ê radikin wê vê nekin. Yên me gudar nekin wê hêzên hikûmetê jî lê bidin; em ê jî bigirin û hesabê wê bipirsin. Ev pir vekiriye. Lê weke min gotî ji ber dirûşma avêtiye, cilek lixwe kiriye, alek hatiye vekirin lêdan jî neraste. Dîsa dibêjim bila bigire, ceza bidê. Ev rêbazeke hîn rast û aqilane ye.

– Belê, sipas dikim.

– Em dikarin mijarê biguherin? Ev çend sale hûn bi taxima cilan ve derneketine pêşiya çapemeniyê?..

– Ji kengê ve we qrawat girê nedaye?

– We ev tirgal hilbijartiye?..

**Abdulah Ocalan**: Bistûsê sale.

---.: Cara yek lixwe dikin?

**Celal Talabanî:** Zamanê nuhe. Sala nuhe. Newroza nuhe.

–Bistûsê sale cara yek girê didîn û li xwe dikin?

**Abdulah Ocalan**: Na, dem bi dem di hevdîtinên dîplomatîk de bikar tênim. Wexta min gelek ji we wisa dît, min jî ji bo rêzdariyê îfade bikim lixwe kir. Her kêlî cilên min yên leşkerî li aliyê dine, heke bixwazim dikarim li xwe bikim bêm…

– Em bi vî rengî tercîh dikin...

**Abdulah Ocalan:** Min li Tirkiyê memûrtî kiriye. Ya rastî min gelek caran qrewat girê daye. Ya din min şoreşa cil û bergan çêkir.

– Birêz Ocalan, madem me meseleyê hinek nerm kir, yên cara yek bi we re raportaj kiribûn hatibûn darazandin, heke bê bîra we; niha ji Tirkiyê komeke mezin yê rojnemevanan tê û hûn civîna çapemeniyê lidar dixin, ma ev jî ne pêşkeftinek başe?

**Abdulah Ocalan**: Bêguman ev pêşveçûnekê îfade dike. Gaveke başe. Dema min cara pêşîn dest bi hevdîtinê kir jî ev gotibû;-bawerim birêz Birand-ev ji bo min jî hevdîtineke di nirxandina wê de zehmetî dikişînime; lê wêrekiya we, cesaret da

min jî. Min got bi vê rêbazê bi çapemeniya Tirk re xebitîn li gorî min neşaşe. Heqeten wê demê hinekan ecêp lê temaşeyî kiribû, heta rexne kiribûn; digotin “*çapemenî wisa, çapemenî wilo*.” Min got ez, vê çarçovê girîng dibînim û heke em ê li Tirkiyê di derbarê azadiya çapemeniyê de tespîtekê bikin, wê ev gaveke girîngdiyar bike. Û ev baweriya xwe hîn jî diparêzim. Girînge û îşareteke girîng ya azadiya çapemeniyê ye jî. Tabî gelek rexne hene, lê weke min gotî girînge û dikare bê pêşxistin.


– Birêz Ocalan, we ji sala 1988’an ve bi hemû rojnemevanên we li gel wan hevdîtin çêkirî re, li gel pêşxistina hinek şartan, bi navbeynkariya wan bangawaziya agirbestê kir. We peyamên bi vî rengî da; “*em ji bo agirbestê amadene, ne alîgirê çekanin û bi baweriya ku ev kar bi riyên demokratîk bê çareserkirin*.” Niha ez, ev bangawaziya agirbestê ya beriya Newrozê, herî kêm lêrastanîna 25 rojan ya çek bêdengkirina we mereq dikim. Çima ne Newroza derbasbûyî niha? Çima ne piştî du mehan niha? Li hinek cihan îşaretek ji we re hat?

**Abdulah Ocalan**: Vebêjim: Na, li ser esasê îşaretên taybet pêşneket. Li gel Mam Celal rûniştin. Nabêjim tenê ji Mam Celal jî pêşkeft. Li gorî çavdêriyên min bidest xistî, raya navnetewî êdî dixwaze rêveberiya siyasî derxe holê. Bawerim bandora guhertina Serok wezîriyê li Emerîka jî li ser vê heye.Dîsa gotineke pir tê gotin heye; qewla ji Tirkiyê re hatiye diyarkirin êdî bi dawî bûye û ev qewl heya bihara 1993 tijî bûye. Ez di vê mijarê de jî ne xwedî agahiyeke zelalim, lê bawerim di têkiliyên dîplomatîk de bi Tirkiyê re hevdîtinên bi vî rengî çêbûne; “*heke tu meseleyê bi zorî çareser bikî, heh ji te re heta bihara 1993 qewl, heke çareser nekî pêwîste tu êdî giranî bidî çareseriya siyasî.* ” Ev, hinek bandorker bûye.

Ya duwem, di 1992’an de pêvajoyeke tasfiyê-îmhayê li ser me hat ferzkirin. Ev, bi şerê Başûr re û di Bakur de jî bi operasyonên hûndurîn re xilaskirina me bû. Bawerim pêknehatina herduyan jî dîtin û heta derket holê ku Kurdistan bi pêşveçûneke mezin ya şoreşgerî re rûbirû ye. Çavdêriyên pêşkeftine ev e. Pêşkeftineke pir zêde ya şoreşgerane heye. Dîsa derbazî pêvajoyeke pir bixwîn bûyîn heye. Di mijara derbasî pêvajoyeke bi xwîn bûyîn him di nav welat de him jî ji derveyî welat gelik hawirdor hemfikirin. Ji bo ev pêvajoya bixwîn hinek bê

astengkirin bawerim hinek qenalên dîplomatîk pir zext pêş dixin yan jî pir daxwazan pêş dixin. Rewşeke wisa ya hikûmetê jî dikare bibe mijara gotinê-serokomar, heta serkantiya (kurmaya) giştî jî di nav de; weke ku difikirîn kar pêşve neçû, tasfiye nehat pêkanîn, dibe ku pevçûn hîn zêdetir bixwîn bibe. Ev bi qasî xetimandina siyasî wê lez bide îflasa ekonomiyê jî û li gorî min têgihiştina wê bi qasî liba genim rê negire bandorkere. Vê jî diyar bikim; çavê hemû Tirkiyê û qada navnetewî li vire, ez evqas ne li bendê bûm. Diyare li benda pir encamanin. Yanî tenê ne rojnameyên we, bi taybet ji dewletên herî mezin bigirin heta hawirdorên fermî yên Tirkiyê hemû dixwazin vê weke xala werçerxê bibînin. Hemû wisa dibînin. Min jî -vê bi me dan hîskirin, jixwe çapemenî jî vê dişûxulîne- wiha bi vê behanê, heke ku wê veguherînên nû yên bingehîn çêbibe û ji bo carekedin PKK bi her aliyê wê ve bê ziman me biryara vê civînê da. Dibêjim îhtîmale bi van sedeman zivironeka davî bê fikirîn. Yanî nabêjim xala dawiye, lê ev fikir bilez pêşdikeve. Dibêjim navend vê disepîne.

Bi vî rengî bi encam dikim. Derfeta yek bi yek ya hevdîtinê heye, em ê bi hinek ji we re cuda hevdîtin çêkîn. Dubare sîpas dikim.



**“Em ê deriyê polîtîkayê ji bo Tirkiyê jî vekin.”**

## DIBE ÇEK BÊN BÊDENGKIRIN
## LÊ EM ÇEK BERNADIN

**Xal:** Hûn di bangawaziya xwe ya aşitiyê de jidilin?

**Abdulah Ocalan:**Peyama min ya aşitiyê vekiriye û misogere. Di cîhanê de mirovê ji min zêdetir ji şer nefret dike nîne. Em ji pirsgirêkan re çareserî dixwazin. Ji rêbaza siyasî re vekirîne. Li beramber xwe li mixatabek digerim. Heke hikûmet min nexwaze, ez ê ji navberê derkevim. Şartê ku îlehî ez bim nîne. Bi awayeke guncav wê hevpeyvînek bê avakirin. Rijandina xwînek zêdetir feyda wê ji gelê Tirk re jî ji gelê Kurd re jî nîne. Ev di dema derbasbûyî de derketiye holê. Bi misogerî em li hember rijandina xwîneke hîn zêdetirin. Peyama min ya aşitiyê derketina min a ji navbeyngê ye. Pêvajoyeke siyasî destpê dike.

– Rêxistin wê we gudar bike?

---.: Ez li ser rêxistinê serwerim û dikarim kontrol bikim. Di Newrozê de kî li ser navê PKK'ê çek bikar bêne ew provaqasyone. Heke dewleta Tirk wan nekuje em ê bikujîn. Bi mîsogerî em ê cezayê wan bidin.

– Di vê pêvajoya siyasî de wê rewşa ARGK'ê(yêkîneyên PKK'ê yên gerîla)çi bibe?

---.: Pozisyona ARGK'ê ne pozisyoneke wisaye hema zû fêr bibe. Pozisyoneke wê polîtîk heye û wê ew pozisyona xwe bidomîne. ARGK hêzeke parastina gele. Wê hemû vesazbûn bên çêkirin, xeterî ji holê rabin, di artêşê de tedbîrên bingehîn bê girtin. Heke artêş ji bo me ne amûreke tehdîtê, îmhayê be, berevajî bibe navbenykarê parastinê, wê hinek erkên ARGK'ê jê re bê dayîn. Hinek erkên xwe dikare weke hêza parastina gel bigire. Yanî ber bi çareseriyeke ve çûyîn wê zehmet nebe. Bele axaftina van zû ye. Min gotineke tenê ku ARGK'ê bêçek bikim yan jî belav bikim bikar neaniye. Min got ji bo rêbaza siyasî hîn zêdetir derbikeve pêş, çek dikare bêdeng bibe.

– PKK bi awayeke şênber gihiştina çareseriyeke siyasî çawa pîlan dike?

---.: Meclîs û hikûmeteke federal dikare bê fikirîn. Vesazbûna artêşê ji nû ve dikare bê fikirîn. Dîsa xwe parastina Kurdistanê dikare bê fikirîn. Di van mijaran de tişta herî zêde bê dîqatkirin hebûna mirov girtina garantiyê ye û pêşveçûna azadiyê bidest xistine. Û ev bi qinyatek ewlehî ve girêdane.

– Bi we re hikûmeta Tirk qet “*off the record*” peymanek ceriband?

---.: Na. Qet teklîf nehat.

– Li gor we tevî ku Talabanî bi awayeke tund li beramberî we ye, çawa gihişt mîmarê navbeynkariyê?

---.: Hinek sedemên wê hene. Bi taybet asta têkiliyên di navbera Tirkiyê û Iraqê de pêşdikevin. Dîsa di vê navberê de giraniya didin Barzanî, bixwe di nav rewşeke lewaz de bûyîn û yek jî di raya giştî de têgihiştina ku PKK di 1992’an de nayê tasfiyekirine. Îhtîmaleke mezine, li gorî min ji hêla hinek dewletan ve peyama ku di nava nêzîkatiyeke bi vî rengî de bibe wê hîn baştir be girtiye.  Ji ber vê germ nêz dibe.

– We di civînê de helwesta Ozal û Demîrel rexne kir. We got; her tim ji aliyê wan ve topê diavêjin cem kesên ku xwedî nasnameya Kurdin. Niha jî we top avêt wan, hûn çi difikirin?

---.: Tişta para min dikeve erkeke dilnizme. Bila bixwe hinek famdar bin, min cidî bigirin. Naxwazim wan bêxim rewşeke zehmet. Lê heke vale bibînin û bên ser me… Me xwest biqasî wan Tirkiyê bênin rewşa jiyankirinê. Wan vê fam nekir. Wêrekiya wan nîne. Berdin peymanê, gelek tengav bûne. Me xwest herî kêm bi qasî wan gelên bira nêzî hev bikin. Wêrekiya wan nîne. Berdin peymanê, gelek tengav bibûn. Hûn bawer dikin, li ser navê wan xemgîn dibim. Ma siyasedmedarek xwe tîne vê rewşê? Xwe têxe rewşeke wisa teng û nikaribe polîtîkayê biafirîne?  Çawa dikarin tehmûl bikin? Xweska min bikariya hinek alîkarî bi wan re bikim.

– Hûn dibêjin we qet çek nedaye destê xwe. Ji ber dema hûn vegeran Tirkiyê ji bo hûn neyên dadgehkirin destnîşan dikin?

---.: Di vê mijarê de difikirim ku zilmeke mezin li min hatiye kirin. Yê pirsgirêkê têne asteke evqas xeter bi gelê min yê kole re hewl tê dayîn hertiştî bi awayeke zordar bi rêbaza leşkerî çareser

bike. Ez hinek gelê me, hinek jî avaniya siyasî, endamên meclîsê suçdar dibînim û pêwîstiya darizandinê dibînim. Di vê mijarê de dilasanim. Miletek xwe evqas kole kirin ti hêcet qebûl nake. Û li ser gelek bi ti hêcetan ve nikare evqas zext bisepîne. Van hemûyan suçdar dikim.

– Ma bi şêweyek medenî hatina pêşberî me heta radeya dawî neguhertinek radîqale?

---.: Berevajiyê vê ev derbaskirina xetayekê ye. Ocalan bixwe bi awayê ku we dîtî pir cudatire. Kes biqasî min li ser jiyanê, bi ziraviyên jiyanê û kitekitan re eleqedar dibe nîne ango pir kême. Yên tên gel min mîna enkazêne. Hêvî û hertiştê xwe tine kirine.

– Di wargehên we de jiyan pir zehmete. Bi taybet yên di nava Tirkiyê de jî. We yê di van wargehan de çiqasî karîba li ber xwe bidin?

---.: Bi rastî jî ev qehremantiyeke mirovên me ne. Li ber van mercan xwe ragirtin heta li Vietnamê jî nehatiye dîtin. Hêza min ya xweragirtinê hêza wan ya xweragirtinê îfade dike.

– Ji lixweragirtina hêza siyasî zêdetir, qala mercên zehmet yên fizîkî dikim...

---.: Ev zehmetî birastî jî heyrantiyê ava dike. Mirov li wir pir zehmetî jiyan dikin, me bi pariyên nan mehan derbas kir. Ev ji bo min encama mekanîzmayeke mezin ya jiyaneke hatî biserxistin bû. Ez piştevanê wê jiyanê me.

– Hûn ji zarokan hez dikin?

---.: Hezkirina min a li hember zarokan ji ya gelekan cudatire. Di hevpeyvîna min ya dawî de nirxandinek hebû. Ez kesê li zarokan xiyanet nakime. Dikarim hezkirina zarokan wisa rave bikim: Bêyî ku li hest û ramanên zarok îxanet bikin, înkar bikin bi van mirovan, bi vê civakê dana qebûlkirin pir bi wan ve girêdayîme.

– Zarokê we heye?

---.: Ji hêla xwe ve vê mijarê hinek biçûk û kêm dibînim. Fikreke min bi vî rengî heye: Dema di navbera gel de evqas zêde zarok dibînim û nebûna cîhaneke wan difikirim gelek hestyar dibim. Tişta ji destpêkê ve difikirim ji van zarokên di rewşeke wisa zehmet de divê cîhanek çawa bê avakirine?

– Wê demê we tercîh nekir zaroka we çêbibe.

---.: Ev hizrê min, min tengav kir. Li hember vê mijarê bi eleqedar nînim. Lê bi misogerî divê pêşerojeke zarokên din hebe û ji bo dayîk û bavan vê pêknanîne jî pir suçdarin, di vê mijarê de hinek nêzîkatiyên min hene. Hemû mirovahî suçdare.

Dibêjin em pir ji zarokên xwe hez dikin, lê ez pirî caran wan li hember zarokên wan bêrêz dibînim. Tenê ne gelê Tirk, di vê mijarê de hemû cîhan suçdare. Ez li hember tiştên li hember zarok û jinan tên kirinim. Zilaman suçdar dibînim? Dibêjin pir ji zarokan hez dikin, lê ez tevgera wan pir bêrêz dibînim. Yê ji zarokên xwe hez dikin divê cîhaneke wisa ji bo zarokên xwe qebûl nekin. Tiştên bi vî rengî ji bo jinan jî derbazdare.

–Piştî vê qonaxê şûnde hûn ê çawa jiyan bikin? Yeqîn dikim dê ne weke fermandar Ocalan be?

---.: Bêguman ji jiyaneke fêr bûme derbasî jiyaneke pir cuda bibim. Dibe ev min tengav bike. Lê pozîsyona min bi qasî hilweşîna têkiliyan, dikarim xwe bidim ji nû ve çêkirina wê jî. Ji nû ve çêkirin xebateke pir cazîbe û bawerim ez ê bikaribim xwe bi awayeke lez adepte bikim. Bi qasî xirakirinê ji bo kirinê jî dildayîme

– Çi aliyên Ocalan yên însanî heye?

---.: Min ji Tirkiyê hez kiribû. Di sala 1970'î de li Enqerê bûm, pê eleqedar dibûm û amadebûm xwe bidimê. Lê cîhana ku her diçû teng dibû û pêşkeftinên qet ne li bendê bûn me ji wir qut kir. Niha vegera min hinek jî girêdayî veguherîna Tirkiyê ye. Ez ê vê her tim bidim. Di vegera min de hesabên bipirsim hene, li hember wan erkên min yên bînim cîh hene. Em ne nankorin, ne jî di rewşeke de ku stuyê xwe li hember bêmafiyan xwar bikin de ne. Hûn dibînin bi pirsgirêkên Tirkiyê re pir têkildarim. Wê encamên vê jî bê peytandin. Pêwîste Tirkiye di vê mijarê de xwe amade bike. Ne ez. Niha hinek hîs dikin, lê ez ê vê hîn zêdetir bi wan bidim hîskirin.

– Ev hemû tiştên we kirî û taploya hûn dixwazin danin holê ma pir utopîke?

---.: Na, ji utopîkbûyînê zêdetir, bidestxistina rojên wisa tişteke me hemûyan bêrî kiriye. Jixwe ji bo ew roj bên min hewldanek derwêşane kir. Ji bo cewherê rojên berê ziyanê nebîne, min van çalekiyan pêk anî. Ji bo min gotiye divê ev bi serê van zarokan neynin, min van pêk anî. Û hîn jî li duv gotina xwe me.



*"Ger hewce bike em ê berçav birigin ku Çil salan jî li çiyan bimînin."*

"Bû destpêkirinek baş bi temamî destxistina rojeva agirbestê û pêşvebirina wê. Ango pêngaveke siyasî bû. Şêwazê nêzîkbûnek ku dijmin ne li bendê û jê re ne amade bû."

*Axaftinên têlsizê yên di 14' Nîsana 1993'ê de bi fermandarên eyaletan yê ARGK'ê re kirî:*

## EM DI NAVA QONAXEKE HERÎ TIJE Û ENCAMGIR DE TÊN DÎTIN

Em ê pêşkeftinên siyasî yên herî dawî ku bi we re derketine holê û di nava şênberiya rastiyên tê de jiyan dikin û di derbarê serdema pêşiya me de bikaribin çawa gavên guncav bavêjin binirxînin. Dîtinên hinek ji we-Derya Andok û Derya Sor-hatine û dîtinên wekhevin. Bi taybet pêşkeftinên heyî dikarin bi kinahî binirxînin.

Rewşa derketiye holê, bi temamî di bin însiyatîfê de ye û rewşeke ku em pêşkeftinên siyasî biqulipînin aliyê xwe ye. Rojevê bi temamî desteserkirin û ji bo ji aliyê wê ve pêşbikeve bû destpêkirinek baş. Yanî gava pêngava siyasî bû. Şêwazê nêzîkatiyeke ku dijmin ne li bendê bû û ne jî amadeyî wê bû. Loma însiyatîf di dest me de bû. Me bi hêzên din re nêzîkatiyên navnetewî jî bandor kir û kêm-zêde me karî rewşa heyî veguherînin aliyê xwe. Û li ser vê bingehî hîn jî rista xwe dilîze.

Bawerim di warê leşkerî de jî rê li ber rewşeke rahavêj vekiriye. Heke têgihiştineke baş çêbibe û nêzîkatiyeke rast ji xebatê re bê bidestxistin, diyare bi destxistina tevgereke baş derfeta pêşvebirana karê artêşbûnê daye. Li gel wê jixwe parastineke tesîrdar digire nava xwe. Parastineke aktîf her tim mûmkûne û girêdayî ti mercan nabe. Kes jî wê vê bi awayekedin tênegihe. Loma derfeta çalekiya kêm wundahî jî dibe encameke din yê vê serdemê. Bi taybet derfetên perwerde û rêxistinkirina artêşbûnê jî pir zêde dibin. Tabî ev girêdayî famkirinê ye. Weke di demên derbazbûyî de jî hatî dîtin, heke heqê pêvajoyan neyê dayîn derfet dikare vale jî derxe. Mesela, bingeha xwe ji baş nirxandina fersend û derfetan digire.

Şiyarîbûna raya netewî, navnetewî û rojava hemû pêşkeftinan îşqalkirin, bawerim rê li ber hinek daxwazên nû vedike. Bi qasî fêm dibe ev daxwaz, ji navenda siyasî re hinek din şansê pêşkeftinê dayîne. Naxwazim ji bo gel di wateya him ji hêla siyasî him jî ger hewce kir bikare bi vîna xwe ve beşdarî şer bibe, ev dibe şêweyek ku xwe ji hêla leşkerî ve jî amade bike. Dîsa ji bo qada dîplomatîk rista xwe bilîze, pêwîstiya xwe bi hinek din wext dibîne. Ji bo pratîka heyî baştir bibîne, li ser vê bingehê hinek polîtîka û biryarên nû ava bike bêxe meriyetê, hinek din dem dixwaze. Dibêjin ji bo li hember polîtîkaya Komara Tirk ya li quncikê teng bûye, nikare henaseyê bigire û heke helwest bi awayeke vekirî bên raberkirin dikare wisa bibe. Tê zanin ku pêşkeftin di vê hêlê de ye û bi şêwayê tê xwestin dibe. Ev, ji bo raya Tirkiyê jî wisaye. Tê dîtin ku kesîmê baweriya xwe bi çareseriya demokratîk heye hinek henase girtiye, ev rê ji bo wan jî fersendeke pêşkeftinê afirandiye. Di vê mijarê de çapemenî cara yeke hinek din hêza nêzîkatiya serbixwe dide nîşan. Wisa fam dibe ku, kurkirina vê pêvajoyê girîngî qezenc dike.

Yek jî, dema gaveke bi vî rengî tê avêtin, di destpêkê de em jî ji hêla aliyê din ve zêde ne li benda tiştekê bûn. Me neyê li beramber, lê me esas digirt ku hêjmarek zêde rewşa hêzan bi bandor bikin. Bi temamî gihiştina vê armancê çêbûye. Jixwe rewşa me bi xwe jî parastineke aktîf bû û di vê navberê de vesazkirina perwerde û rêxistinkirina hêza heyî jî pêwîst dikir. Ev gav ji vê re fersend dayîn kir armanc ku, gihiştina vê armancê çêdibe. Dîsa aliyê dijber dixwestin operasyonên hîn bandortir pêş bixin, bi taybet jî bi qetlîama Newrozê re termisandina girseyê dihesibandin û belkî jî heke ev gav nebûya dikarin vê hîn zêdetir bidest bixin. Ev jî di asteke girîng de pêşî lê hatiye girtin. Lewra gava tê avêtin, pêşkeftineke neyê hêvîkirin derxistiye holê.

“*Serdem fersendeke girsehêz dide artêşbûnê*.”Niha em ê vê gavê çawa kûr bikin? Pirsgirêk di vir de ye. Bi qasî fam dibe nêzîkatiyên we, li gel hinek şartan vê pêvajoyê hîn pêşvetir bibe dibe. Bi qasî tê fêmkirin nêzîkbûnên we bi hinek mercan ve, bi şêweyek hîn zêdetir pêşvebirina vê pêvajoyê ye. Li gel me jî feraseta serwer ev e. Lê li vir pêwîste xwe ji du xetayan dûr bihêlîn. Yek ji van bêyî serî li derfetên taxtîk manevra bide di nava feraseteke rast ya hêrîşê de bûyîn, yan jî di bin her mercî de

bikaranîna hemû hêza xwe ye. Ev nêzîkatiyeke teng ya leşkeriye. Weke ku ev nêzîkatî neraste, hêzek wisa mezin, cî û derfet jî nînin. Yên di nava feraseteke bi vî rengî de, diyare hêza heyî rast bikar neanîne û pêşnexistine. Jixwe ev jixweberbûn dibe şêwazeke wê ya cuda û ev jî negengaze pêşkeftin bidest bixe. Bûyera ev şer pêşnexistin, vesaznekirin û rê li ber gelek wundahiyan vekirin, rewşeke hinek kesên bê berpirsyar derxistiye holê ye. Diyare êdî vê ji şêwazê şereke wisa re destûr neyê dayîn û vê dizanin. Bi zehmetî hêza me ava kirî anîna vê rewşê bi ti awayî wê neyê qebûlkirin û pêvajoya zivistanê sax li ser vê hat rawestandin. Hinek hişmendî û kesayetên ji hêzê bêxeber, ji amadekirina hêzê bê xeber û mîna makanîzmaya xerckirinê tenê li ser dirûnin hene. Hêz bi destê van kesayet û şêwazî ve berdan, tê wateya destberdana artêşê û bi tasfiyê encamkirine. Ev, di me de êdî dibe nêzîkatiyeke ku mafê jiyanê nebîne. Ya rastî li vir şervantiyeke cidî jî nîne, planlameya hedefeke rast û rastîbîn nêzî hedefê bûyîn jî nîne; tenê hêza bi zehmetî me aniye gel hev bi erzanî xerckirina wê heye. Êdî di nava artêşê de ji vê ferasetê re cî dayîn nabe mijara gotinê.

Feraseta duwem a şaş;(bi ya yekem ve girêdaye û rûyeke din yê wê yê) demên wisa jî di nav de hemû deman bi bendewariyeke erzan, bêxîretî, çewtî û awayê rizandinê tê nirxandin. Feraseta çalekî û jiyanê çiqas erzan be, qonaxên wisa jî wisa erzan dinirxîne. Diviya qonaxek bi perwerdeyeke zêde û pêvajoyeke înşayê bûye, lê vediguherînin qonaxeke çewtî, çilvirîşî û rizandinê.  Hêz belav dike û heta nikare nêzî erkên xwe yên artêşbûnê bibe. Yanî pêvajoyên wisa, pir xirap tên bikaranîn. Dikarin bi şêwayê tasfiyekariyeke rast a lîberal jî bê nirxandin. Ev feraset jî pir hatiye dîtin û tenê ne divê qonaxê de, di her qonaxê de derketiye holê. Bi taybet di demên pêngavan de ev feraset pir ziyan daye. Ev nêzîkatî, hêzê ji bo xwe mîna belayê dibîne; hewl dide bi hêzeke ku jê re pêwîst bike jiyana xwe û kesayeta xwe têr bike. Ev feraset pir baş hatiye destgirtin û ev zivistan hemû bi darizandinên hatin kirin re êdî wê bi ti awayî destûra van neyê dayîn.

Weke min gotî, ev feraset, berdin bila qonaxa nirxandinê li vir bimîne; dikarin bi awayeke erzan, serenser û neberpirs nêz bibin, veguherînin bêberhemiyê. Bêguman artêşbûn di nav şerê

germ de pêş dikeve.  Ev, rastiyeke ku nîqaş li ser nayê kirine. Lê di qonaxeke henase girtinê de, vekiriye wê artêşbûn jî bi lezeke mezin pêş bikeve. Jixwe şerê germ ceribandineke şêweya wê ye. Beriya wê jî perwerde û rêxistinbûne. Her wiha  serdemek wisa, fersendeke pir baş dide artêşbûnê. Di warê pêşkeftina wê ya çawanî û çendanî de firsendeke başe. Di vê mijarê de merc hinek hatiye rewşeke îdeal. Dibe şervantiyeke pir zêde neyê jiyîn. Jixwe çiqas ji vê re pêwîste û derfetên me jî çiqas dest dide mijareke cudaye. Lê heta bûyîna vê jî, bi înşaya artêşeke pir baş hatî pêşxistin ve gengaze. Di me de înşaya artêşê sînordar pêş dikeve dema em vê didin ber çav, fam dibe ku di vê mijarê de hîn gelek karên em bikin heye.  Bihêzbûna artêşê û artêşê ji bo şer anîna rewşeke amade xwedî wateyeke mezine. Me jî vê di gelek qadan de çawa pêk aniye, ji bo hemû şêweyên şer him di warê çawanî û him jî çendanî de çiqes amade kiriye xususeke hêjayî pirskirinê ye. Derfetên heyî çiqas hatiye nirxandin û sengergirtin çiqas rûniştiye? Bawerim hîn jî hewleke vê pir mezin tê jiyîn.

Ev rastiyeke: Em di nava serdemeke pir giran û encamgir de tên dîtin. Zemîneke xwe dispêre zemînê siyasî ye. Ev du salên dawî şerê psikolojîk çiqas rûxîner nêz dibe û tê zanin ku ji bo girseyê pasîfize bike pir dixebite. Ev zemîna siyasî zindîkirin û carekedin anîna rewşa xebatê, di artêşbûnê de girîngiyeke mezin îfade dike. Di vê mijarê de hinek erk di dema xwe de nehatibûn cî û ya rastî artêşbûna siyasî jî heya bêjî darbe xaribû. Tevî ku artêşbûna gel a siyasî pir pêş ketibû, rêxistinbûn û pêywendiyên nebes gel bêxwedî hiştiye. Û ev jî rê li ber tirsê û pasifikasyonê vekirîbû.

Niha divê ev jî bê derbaskirin û dibe ku ev serdem ji bo derbaskirina vê bibe alîkar. Yanî divê baş bê nirxandin. Di vê mijarê de pêşkeftineke ku gerîla bidest nexistî mijara gotinê ye. Li hember pêşkeftina girseyê şiyarbûn, parastin, rêxistinkirin û di warê pêşkeftineke li beramber de girînge. Bawerim ji bo vê jî serdemeke başe. Bele xebatên din jî bi awayeke kur tê destgirtin. Qala zîvironekekê dikin; qada dîplomatîk êdî ketiye nava kar û êdî em ê di qadên cur be cur de binirxînin. Dîsa pêşkeftinên yêkîtî-îtîfaqê ketiye nava qonaxeke bingehîn; wê ev jî bê pêşxistin. Ji bo ev hemû di pêşengatiya tevgerê de çêbûye, çiqas hawirdor kom bibe wê tevger ewqas xwe bispêre qadeke berfireh

a siyasî dîplomatîk. Ev jî, wê encamên şer herî zêde veguherîne aliyê me û hîn zêde serkeftî bike.

Hawirdorên Tirkiyê yên fermî, çi artêş çi jî hawirdorên siyasî, çiqasî bêjin "*me nebihîst, me nedît jî*," di riya nerasterast de her tim hewl didin peyama xwe bidin. Di navbera xwe de pir nîqaş dikin. Û pêşkeftina heyî jî dide diyarkirin ku rê li ber dubendiyeke vekiriye. Nirxandinên mîna sekinandina operasyonên hûndirîn, efûya giştî, navenda demokratîk hîn zêdetir pêşxistin, ger mûmkûn be rewşa neasayî rakirin, dikin. Bêguman, bi vê re dixwazin tengbûna heyî derbas bikin; hekane bingeha xwe ji niyeteke baş nagire û birastî jî ne ku çareseriyek dixwazin. Tabî ew jî di hewcedariya pêşxistina taxtîk de ne. Ev taxtîk çiqas di derbarê hêsanîkirina rewşa wan de jî be, heke bersiveke baş bê raberkirin dibe ku ji me re jî hêsanî bike û derfetên çareseriya siyasî pêşbixe. Niha ev hîn baştir tê dîtin. Heke çareseriya siyasî bibe malê raya giştî, dibe ku dawiya bêpolîtîkabûna heyî bêne. Êdî tundiya artêşê ya kor bawerker nabe. Dîsa bê polîtîkabûna hikûmetê bertekan kom dike. Ev rewş û derfeta çareseriya siyasî jî dibe malê raya giştî, zilam neçar dimînin hinek gavan bavêjin. Nikarin demeke dirêj bi raya hûndûr û derve re rûbirû bên; xwe rabigirin. Nerasterast jî be ya me rê li pêşî vekiriye encameke başe. Wexta dixwazin derketinek bikin, neçar dimînin tawîzekê bidin. Divê ev jî baş bên dîtin û ji vê re şansê pêşveçûnê dayîn jî nêzîkatiyeke raste. Belê ger weke rastgerî neyê fêmkirin û nêzîkbûnek reformîstî neyê kirin, dikare xizmeta pêşkeftinan bike.

Li ser vê bingehê pêvajoyeke giran tê jiyîn û di vê mijarê de pêvajoya di pêşiya me de diyare wê roleke jiyanî bilîze. Him daxwazên li ser me, him jî zextên li ser aliyê dijber, wê pêwîstiya meşandina vê pêvajoyê hîn zêdetir kur bike û ev jî di rewşeke bi tendûrst de ye. Aliyê dijber çiqas nehevgirtî û di armancên xwe de nedûrist jî bin, dibe ku sextên zêde pê hinek gavan bide avêtin. Û dibe ku wan ji bo hevdîtineke wisa siyasî, rêbezake siyasî tengav bike. Sînyalên heyî gengazbûna vê jî dide nîşan. Ji derveyî îradeya wan jî be ev wisa ye. Belê daxwazên wan ne ev bû, lê weke min gotî, bi cîhanek re û bi rayeke giştî a mezin re nikarin demek dirêj rûbirûyê hev bên. Diyare, em ê vê pêvajoyê, di vê

çarçovê de bi aqilane binirxînin, dibe ku polîtîka me ya mafdar hîn zêdetir encam bigire.

Belê dema vê qutkirin jî girînge. Em ê vê pêvajoyê çiqas bidominin? Di vê mijarê de nêzîkatiyên we yên digihin me ji hev cudane; hinek ji we wextek kin guncav dibîne, hinek ji we jî pêşkeftinan bi halê vê ve berdan guncav dibîne. Di derbarê wext de jî hema vê bêjim: Ev wext ne wexteke tiştek neyê kirine, berevajî di artêşbûna siyasî û leşkerî de wextê pêngavê ye. Bila kes vê şaş fêm neke û wiha neyê nirxandin,"*wê qet çek neyên bikaranîn, wiha di xebatan de rihetbûnek heye û serdama bi rihetî li ser kar rûniştine.*" Berevajî, demeke xebatê bi ti deman re neyê qiyaskirine. Aliyê vê demê yê di derbarê me de herî girîngev e: Tiştên sala derbasbûyî hatin jiyîn û heya bêjî rê li ber wundahiyan jî vekir û hinek şêweyên êrîşên ne bi pîlan jî hebû, niha em wan şêwazên êrîşan didin pîlana duwem û em ê wisa êrîş bikin. Ya rastî heke ev pêvajoya di bin navê agirbestê de nebûya jî, me yê êrîşên bi vî rengî nekiriba. Ji ber par jî, me ev şêweya êrîşê pir rexne kiribû. Dema em riya li ber wundahiyan vekirî digirîn ber çav, diyar dibe ku wê ev êrîşên bi vî rengî neyê rakirin û neyê meşîn. Yên vê kirine bi rastî ji bo rastparêziya xwe veşêrin kirine û tiştên kirine niha baştir fam dikin. Yanî ew şêweyên êrîşê yên bi vî awayî ne şêwazê me yê şer bû. Ev pêvajo hebûya jî nebûya jî wê bi vî şêwazî nehatiba kirin. Niha em vê tînin rewşek taxtîk yê hîn diyartir. Ji derveyî vê şerê xwe yê taxtîk didin meşandin.

Mînak, zextên me yên li ser hevkariya sivîl bêguman wê bidome. Çi di vê pêvajoyê de çi jî di pêvajoyeke din de be, wê her tim kontrola siyasî ya li civakê, rêxistinkirina wê û meşandina hinek hedefan bê domandin. Jixwe em ê hinek mercên wisa jî pêş bixin: Mesela, her ku hemleyên wan li hember gerîla û girseya sivîl pêş ket, wê bersiva vê duqet bê dayîn. Zilam hewl dide bigire, belê welatparêzê li bajêr jî wê xwe biparêze. Ji bo neyê girtin wê mafê xwe yê rewa bikar bîne. Dema cerdevan hewl dide lê bide, tabî wê ew jî lê bide. Wexta sîxûr-hevkar, di pey welatparêz de be, wê ew jî pêşiya wan neberde. Yanî tenê ne li ser gerîla, her ku li ser gelê sivîl zext û operasyon berdewam kirin, wê çalekiyên me jî bêguman bidomin. Ev, berê jî wisa bû, niha jî wisa ye û wê ji niha şûnde jî wisa be. Yanî bila kes van nêzîkatiyan bi awayeke din fam neke û nebêje "*agirbeste, wiha ji*

*bo wê me çalekî nekir*” xwe nexapînin. Li bajêr jî her ku îşkence û operasyon dewam kirin, wê çalekiyên me jî bên domandin. Tabî bi awayeke herî guncav û bi wundahiyeke kêm re.

Dema ew jî bi zext û operasyonên zêde bên ser gerîla, wê gerîla jî ji her holê ve tedbîrên wê bigire û heta beriya operasyonên bi xeter derbikeve wê agahî bigire, ji bo van vale derxîne hemû şêweyên xwe yên çalekiyan bikar bîne. Mêrik îmhayê pîlan dike û êrîşeke mezin pêş tixe; di her astê de bersiva vê dayîn her tim pêwîst û gengaze. Beriya vê jî gengaz bû, ji niha şûnde jî gengaze. Yanî divê ev jî şaş neyê famkirin. Heke bê dîqatkirin, wê ev nêzîkatî vekirîbûn ji taxtîkên rast bikeve dewrê re bîne. Wê dijmin bi rihetî êrîşên bi vî rengî bibîne; ev jixwe vekirîne û li hinek cihan bidome. Heke domiya, wê demê dê li wir bi her şêwayî çalekî bê meşandin. Eve jî, mîna min gotî, vekiriye ku derfeta hemleyeke hîn birêkûpêk û taxtîkeke bi pîlan hatiye amadekirin. Yanî di vê demê de xususa ku em tê de bifikarin, a rastî heke ev pêvajo nebûya jî fikara me, hêza xwe pir xirap bikaranîn, bêyî tedbîrek bê girtin û di bin navê êrîşê de hêza ku me bi tehlî zehmetî amade kirî neberpirsyarane bikaranîne. Yanî di bin navê şerkirinê de quwetê tinekirine. Bi misogerî em dawî li vê helwestê tînin. Dîsa erkên perwerdê û rêxistinkirinê yên nayên cî hene. Dawî li vê jî tînin û serkeftina van erkan esas digirin.

Tê dîtin ku, pêvajo çi bila dirêj bike çi dirêj neke, ev, taxtîk jî nayên wateya cudahiyek cidî. Berevajî, şansê taxtîkên rast esas girtin û meşandin bi awayeke zelal pêşkêş dike. Bi rastî jî yên dixwazin di bûyera şer û artêşê de li ser esasê taxtîkan rol bilîze dibe nêzîkatiyeke bikaribin bikar bînin. Bi rastî jî ji bo kesên di asta taxtîk de dixwazin di rastiya şer û artêşê de rol bidin lîstin, dibe nêzîkbûnek ku pir bikar bînin. Dema wisa dibe, pirsên “*wêev qewl çiqas dirêj bike, wê di me de diltengî çêbike, çêneke*” zêde ne biwatene. Ya girîng sazkirina taxtîke, dîsa pêşiya pêşkeftinên siyasî (tabî hedefa gerîla jî pêşkeftina siyasiye)vekirî hiştine, bihêzkirina artêşbûnêye, di warê çendanî û çawanî de mezinkirine. Em di pêvajoyeke parastinê de ne; ji polîtîkayên aktîf yên dema parastinê re vekirîbûn dana qezenckirine, ev polîtîka cara yek bi awayeke rêkûpêk xistina meriyetê ye, bi ser hedefên siyasî de çûyîne, di asteke mezin de bi ser hedefên leşkerî de çûyîne. Ev di bajêr de jî wisaye, di qada çiya de jî wisa ye.

Hema vê diyar bikim; em nikarin bêjin hêza me çêbû bikevin nava êrîşeke nîvenîv bişkînin. Em nikarin bikevin nava êrîşeke ku nivbiniv bişkîne. Di salên derbazbûyî de hinek wisa hat kirin, lê ev şaş bû û di asteke girîng de ji derveyî taxtîk bû. Qonaxa wê ya herî dawî jî be, diyare dema parastina stratejîk jiyan dikin û qala taxtîkên vê dikin. Bêguman wê şerên tevgerdar jî bikevin nav, lê bigiranî wisa ye. Wateya xwe xistina rewşên derveyî rastiyan nîne.

Dema em van hemûyan tînîn ber çav dibînin ku, dîrêjkirin û nedirêjkirina vê pêvajoyê ewqas girîng nîne. Ya girîng însiyatîfa heyî di destê me de bûyîne û vê bi awayê dixwazin bikaranîne. Belê ev hatiye pêkanîn û ji bo ji niha şûnde jî hewl didin pêk bînin. Ez naveroka wê wisa diyar dikim. Yanî heke wê îla qala pêvajoyeke bê kirin, dema konjonktora heyî tînîn ber çav dibe qewlên wisa bê gotin û ev jî sembolîke. Gumanên hinek hevalan heye û ji bo ji wan re vekirîbûn bînim van dibêjim. Dikare ji bo kurtkirina pêvajoyê û lez qezenckirinê hinek dîrok bên diyarkirin… Em dikarin vê pêvajoyê jî bi awayeke sembolîk binirxînin. Bi taybet dema rewşa yên dijber tînim ber çavê xwe vê dibêjim. Ji bo bidestxistina kurbûna taxtîkeke baş bê diyarkirin. Bi kinahî rewşê wisa dinirxînim. Bawerim we fam kir.

"*Nêzîkatiya hêzên me bikorane bikaranîn nayê efûkirin*"

Niha em ê bi kinahî hewl bidin nerînên we jî bigirin. Yanî hûn jî dikarin ji bo nirxandina rewşeke objektîf alîkarî bikin. Ji bo we rewşa şênber jiyan kiriye nerînên we girîngin. Em ê hewl bidin van bigirin û bigihîn encameke hevpar. Dikarin destpêkê ji Derya Zaxros destpê bikin. Zaxros, we tiştên me gotî fam kir?

**Derya Zaxros**: Belê, fam bû Rêberê min. Silav û rêz. Tiştên hatî diyarkirin me gudar kir û di vê mijarê de tişteke lê zêde bikin nîne. Di serî de, ji bo li ser mijarê hîn serwer bibin, di wê baweriyê de ne ku wê Rêbertiya Partiyê hîn baştir alî bide pêvajoyê. Lê em, yanî hevalên berpirsyar nirxandina me ya li ser pêvajoyê pir girînge. Niha dibe taxtîkên dijmin wisa bibe: Quwetê demeke betal bihêlin û piştre derbazî serdeçûyînek berfireh bibin. Di vê mijarê de gumanên me hene. Li gorî me îhtîmaleke mezine amadekariyên dijmin bi vî rengiye. Her wiha dema ev pêşkeftinên polîtîk û destkeftî tê esasgirtin, divê em quweta xwe bitedbîr bicî bikin, amade bikin, ji bo hemû qonaxên şer di

rewşeke amade de bigirin û ertêşbûnê kûr bikin. Bi baweriya ku em ê bikarin pêvajoyê wisa bidestkeftî binirxînin. Em ê di qada xwe de giranî bidin vê. Bi awayeke pozîtîf tişteke din cuda lê zêde bikin nîne.

---.: Ji bo hûn hêza xwe hîn baştir vesaz û saxlem bikin, bawerim rê li ber navendeke hîn destdayî vedike. Jixwe hêza we ya di qadê de hinek nêzîkatiyên wan yên ji artêşbûnê dûr hene. Demek dirêje ne dikarin şer bimeşînin û ne jî artêşbûnê pêş dixin. Bi salane ev feraset tê jiyîn. Ji bo derbaskirina vê, ev pêvajo dikare mîna fersendeke bê nirxandin. Yanî di vê mijarê de rexne û darizandin hatine kirin. Yên li ser quwetêne bi salane perwerdeyeke kêm jî nedayîne û gelê me jî ji çar hêlan ve hertiştê xwe daniye holê, hêza ku me bi zor zehmetî li wir kom kirî bi vî rengî li ser raketin, rewşeke bi tundî bê cezakirine. Jixwe ez ê vê ji hemû qadan re bêjim. Em ê şev roj derfetan pêş bixin û mirovan amade bikin, wê li wir jî vala bê derxistin û li ser bê raketin; yê vê dike vekiriye wê bi erdê re bibe yek. Êdî hûn berpirsin ku çavdêriyê bikin. Perwerdeyeke quwetê, vesazbûn û sengergirtinek nîne, lê bi awayeke korane bikaranîn heye; ev, pir tê dîtin, lê nêzîkatiyeke nayê efûkirine. Kêmaniya we hemûyan ya herî mezin, di dema wê de li hember xwediyê van nêzîkatiyan nebûna xwedî helweste. Fermandar di vê mijarê de derî vekiriye girt. Fermandariya wisa sexte pir çêbûye. Bi misogerî wê bi ti awayî destûr neyê dayîn ev serdem jî wisa bê nirxandin. Wê tedbîrên wê bi her awayî bê girtin. Yanî divê quwetê bînin rewşa hêzeke şer ya bandorker û artêşeke rasteqînî ya gerîla bê avakirin. Di vê de pêwîste herkes rol û fonksiyona xwe baş bizane. Ji şervaneke ji rêzê heta fermandarê komînê û dîsa ji asta herî jor rista herkesî çiye, fonksiyona wê çiye, bistûçar demjimêran çawa girêdayî erka xwe ye? Qed nebe di vê demê de divê avaniyeke wisa bê afirandin. Dibe ku demên derbazbûyî ji ber kêmbûn û zehmetiyên cur be cur ji vê re derfet nedihat dayîn, lê niha heta bêjî derfet ji bo vê bese. Em di nava pêşkeftina qonaxeke ku îradeya mirov herî zêde jê encam bigirin de nin. Di qada xwe de, tenê ne artêşbûna leşkerî û serwerî, artêşbûna siyasî û serwerî jî dikare heta dawî bi bandor bê rûnişkandin. Lê heke hûn hinek ferasetên berê yên şaş esas bigirin bêjin "*em dikarin xwe hîn zêdetir bigirin*

*saxlamiyê,"* ev tê wateya dawî lê anîne. Pêwîste ev rastî baş bên famkirin.

Dîsa hemû şêwazên çalekiyan mijara gotinê ye. Dibe ku di qadê de ji sedî heştê him îqtîdara leşkerî, him jî siyasî bê rûnişkandin. Yanî hema hema em ê xwe li gorî rewşeke dewletbûnê eyar bikin. Ez ji we hemûyan re dibêjim: Li ser hêza rêxistinê ya amade bûna îqtîdar, yeqîn dikim ne taybetmendiyeke baş yê bûna îqtîdare. Em îqtîdarê li hember dijmin, dîsa li hember paşverûtiya heyî didin rûnişkandin. Îqtîdara leşkerî jî, îqtîdara siyasî jî, li ser zemînê gel û welat li hember dijmin tê meşandin. Yên dixwazin bibin îqtîdar wê xwe li ser vê bingehê îspat bikin. Yan na li ser hêza amade fermandarokên axa avakirin, vê bi qurnastiyên gundîtî û burjuvayê biçûk îşqalkirin, ne rewşeke ku kes cesaret bike. Kî dibe bila bibe, di nav avaniyê de di nav helwdana dîtina cihek xwe tê de bide jiyîn, lewra di vê qonaxê de rewşeke neyê qebûlkirine. Yanî ji herkesî re ciheke guncav dayîn û pê dan kirin rih û cewherê vê deme ye. Karê herkes jî bike pire. Qala nivdewletbûnê dikin, dîsa qala hêza hikûmeteke him di warê leşkerî, him jî di warê siyasî de dikin. Yên bawerî bi xwe tînîn wê hemû şêweyên vê yên çalekiyê bikin. Yanî çalekiya leşkerî jî di nav de, wê xwe bidin hemû şêweyên wê yên sazkirinê û wê bînin rewşeke besbûnê. Niha ev mijar heya bêjî şênberin. Bila ti kes, sistbûna xwe, hişkbûna xwe û rastgeriya xwe ferz neke û wan tiştan ferdperest neke.

Jixwe vesazbûnên me çêkirin hene. Raporên we dawî şandî me nexwendine, gihiştin me lê nikarî vekin. Bawerim ev tiştên tên gotin tê famkirin. Li ser vê bingehê vesazbûna quwetê, mezinkirina wê, hêz bicîkirin û rêveberiyê dibe serkeftinê. Nizanim, di vê mijarê de astengek cidî heye?

**Derya Zaxros:** Di vê qonaxê de astengek cidî nîne. Jixwe di destpêkê de ev xebata vesazbûnê ku me danibû pêşiya xwe me hema hema xilas kiriye. Yanî quwet, hemû qadên ku pêwîst bû bigihiştbanê gihiştinê. Û niha ji derveyî hêza qadekê, hêzên me hemû di rewşeke tevgerdar de ne. Bi kinahî, rêkûpêkbûna pêwîst hatiye dayîn. Her wiha  di vê qonaxê de em xebatên weke hîn zêdetir kurkirin, xurtkirin, perwerdeyek zêde, dîsa li hember hemû îhtîmalan hinek hedefan tesbît kirin û di vê mijarê de

amadekariyan temamkirin dimeşînin. Rewşa me ya heyî ev e û astengek cidî nîne.

---.: Em ê hinek din jî hewl bidin qadê binirxînin.

**Derya Andok**, rewşa we çawaye, hûn çawanin? We tiştên me gotî fam kir?

**Derya Andok**: Roja we bixêr, silav û rêz Rêberê min. Me tiştên hatine diyarkirin girt.

---.: Hûn ji vê nêzîkatiyê re çi dibêjin? Me nirxandinên we xwendibû; bawerim tiştên dişibin wan dibêjin. Li gel we pêşkeftina nû çiye? Perspektîfên hîn şênbertir dikare çawa bê dayîn?

**Derya Andok**: Rêberê min, me beriya niha vê rewşê di navbera xwe de nîqaş kir. Nevaroka nîqaşê di raporê de hatibû peytandin. Nirxandinên we niha kirî, hinek xalên ku negihiştibûn ronî kir. Ji hêla me ve têrker bûye. Di holê de taxtîkeke ku bi rastî li ser kurahiya wê bê fikirandin heye. Em hinek serenser nêzî vê bûn û me gelek aliyên wê jî nedît. A rastî mîna dijmin em jî bê amadekarî hatin girtin. Yek jî em di dema wê de lê gurîvîn nehatin û baş nenirxand. Dîsa me xwest ji gelek hêlan ve binirxînin, lê bi rastî jî ji hêla me ve pratîkeke nû pêwîst bû û di vê mijarê de kêm man. Lê hinek amadekariyên baş jî hat nirxandin. Dîsa bi xebatên mîna perwerdeyeke zêde, afirandina derfetên teknîkê û teqwiyekirina quwetê pêvajo hatiye nirxandin. Di rojê de nêzî mangeyek tevlîbûn çêdibe. Mezinbûneke wisa heye. Vesazbûna van û pêkanîna biryarên konferansê tê pêkanîn.

Meyldariya dijmin jî ya vê pêvajoyê nirxandin heye. Yanî bi sûdwergirtina vê rewşa agirbestê heta bêjî bi ser gel de çûn, gelek gund şewitandin û heya bêjî zext meşandin. Berê zêde nedikarin tevbigerin, ji bo vê rewşa agirbestê tevgerbûneke wisa heta bêjî rakêşayî bû. Bi taybet ji agirbestê sûd wergirtin hîn zêdetir dan sepandin. Ji ber vê sedemê em vê fikirîn; heke wê agirbest bê dirêjkirin(ku feyde heye,) wê demê dê li gel xwe însiyatîfa parastina gel bide gerîla jî. Ji ber gundên hema li kêleka yêkîneyên gerîla tên şewitandin; li hember vê bêtomar mayîn, him ji hêla girseyê, him jî gerîla ve bandoreke nebaş dide afirandin.

---.: Fam bû. Belê, heke we pêwîstiya parastina aktîf baş fam bikiriba, dema êrîşî gerîla yan jî gel dikir mafê we yê

bersivdayînê hebû. Heta darbeyên hîn baş û bi amadekarî lêdan nehatibû vederkirin. Bawerim bingeha xwe ji feraseta serenser û kêm digire. Yek jî hinek kêmanî ji ber zehmetiya hinek mercan pêş dikeve ku, niha pêşiya van hatiye vekirin. Dema me vê daxuyaniyê da em ê vê xususê jî bi awayeke vekirî diyar bikin. Heke êrîşa li hember gel û gerîla neraweste, wê demê dê bi awayeke hîn çalektir û bi şêwazeke ji berê hîn serkeftîtir bersiv bê dayîn. Parastineke pasîf ti demê ne taxtîka me ye û wê nikaribe bi ti hêcetan jî biparêze. Divê ev neyê jibîrkirin. Em ê di derbarê qada we de jî piştre hewl bidin hinek tesbîtan bikin. Niha tenê bi girtina nêrînên we re dimînin.

---.: Çiyayê Sîpan, rewşa we çawa ye, hûn çawa nin?

**Çiyayê Sîpan**: Silav û rêz Rêberê min.

---.: We tiştên me gotî girt?

**Çiyayê Sîpan**: Me tiştên hatine diyarkirin fam kir. Me beriya niha bi hevalan re hinek nirxandinên diyar kiribû. Di heman berfirehiyê de nebe jî, gihiştibûn xalên diyar. Em ê niha hîn baştir bikevin nava famkirina ramanên hatine diyarkirin û xebata wê ya sepandinê. Lê dixwazim li ser vê rewşê tiştek zêde bikim: Nêzîkatiyeke van cerdevanan ya çek berdanê heye. Di vê povajoyê de heke bê gotin ku wê ew jî bên afûkirin, wê li ser wan rê li ber bandoreke diyar veke. Em dikarin vê bêjin.

Di pêvajoya pêşiya me de wê xebata me bibe rêxistinkirina girseyê, amadekariyên cîh, sengergirtin, saxlemkirina sengeran û rûnişkandina pergala artêşê. Di rewşa heyî de hemû quweta me pêvajoya perwerdê û darizandinê temam kirin, di pêvajoyeke wisa re derbas bûn. Hemû hêza me hema hema di rewşeke amade de ye. Niha bi hêjmareke sedûsîh hevalî re ber bi vesazbûnekê ve diçin. Li ser bingeha pîlansaziyan hewl bidin hêza xwe li qadên guncav bidin rûnişkandin. Ji hêla me ve ti pirsgirêkek nîne. Di rêveberiyan de hinek guhertinan didin çêkirin, ji ber rewşa xwenedayîna hinek hevalan hinek guhertinên diyar çêdikin. Di vê hêlê de xebateke me heye. Van diyar dikim.

---.: Jixwe di derbarê cerdevanan de propaxanda tê kirin. Bawerim bi rakirina rewşa awarte re wê dawî li hebûna wan bînin. Ango pişta xwe didin wan. Pêvajoya agirbestê hemû wê ev bê gotin. "*Çekên xwe teslîm bikin. Heta dikarin bên gel me. Heke hûn bên gel me hûn ê bên efûkirin. Dev ji çekan berdin, dewlet jî*

*êdî ketiye nava vê pêvajoyê. Heke hûn çek neberdin yê herî zêde ziyanê bibîne hûn ê bin*.” Li ser vê bingehê dê bilavokek bê amadekirin û bi nêzîkatiyeke nû ve serdeçûyîn çêbibe. Ev, dibe ku hawirdorên din yên hevkar jî bigire nava xwe û wê li ser bingeha dawî li hevkariya xwe anîn be. Jixwe ji bo Hizbûlahê hatibû kirin. Di vê pêvajoyê de ji bo van jî tiştên mîna van dikare bê kirin û dibe ev hîn bi bandortir bibe. Jixwe pêwendiyên me yên îtîfaqê yên din tên pêşxistin. Li wir jî dibe hêzên din yên reformîst bibin, wê bi wan re pêwendî pêş bikeve û ew jî di asteke girîng de bên vesazkirin.

Ji bo cihê we bêguman rûnîşkandina artêşê girînge. Dibe we niha fersenda wê baş bidest xistibe. Him ji nû ve vesazkirin û him jî hêz mezinkirin, ji bo wir girîngiyeke mezin îfade dike. Piştî pêjoyeke zehmet ya zivistanê şûnde, hûn di rewşa qadeke ku herî baş vê binirxînin de ne. Bawerim ji Başûr bi hêzeke baş ve hûn ê bên teqwiyekirin, dîsa hûn ê hêzeke nû bigirin û bi vî rengî di warê siyasî û leşkerî de ji bo îqtîdarbûnê çi pêwîst be bigihinê. Ji ber dijmin vê dizane xwest hinek zêde bi ser wir de bê. Dibe ji niha şûnde jî bixwazibe bi ser de bê. Her wiha him ji bo şer xwe amadekirin û wê pêşwazîkirin, him jî ciheke zêde ji artêşbûn û vesazbûnê re dayîn girînge. Hûn di rewşa qadeke ku hêza heyî bi awayeke baş binirxînin de ne. Hûn dikarin ji herdu aliyan, ji Bakur û Başûr hinek hêz bigirin. Him di asta rêveberiyê de, him jî di asta çawanî û çendaniya hêzê de hinek lewazyên we hene; ev dikare bê derbaskirin, li gelek çeperên dîn hîn baştir bên vesazkirin û dikarin kordînasyona wê pêş bixin. Dîsa dikarin pêwendiyên xwe yên bi gel re baş bikin û zextên xwe yên li ser bajaran zêde bikin. Yanî gelek tiştên hûn bikin hene û ji min re wisa tê ku fersendeke baş tê afirandin. Bêyî gafîl bin, bi awayeke kur vê pêvajoyê nirxandin girîngiyeke mezin îfade dike. Di derbarê rewşên girêdayî we de em ê pirştre agahî bigirin.

“*Li wir erka me ya dewletbûnê heye.*”

---.: Çiyayê Sor hûn çawanin?

**Çiyayê Sor**: Silav û rêz Rêberê min.

---.: Tiştên min gotî we girt? Hûn çi dibêjin? Me nirxandinên we jî xwend û hewlda ronî bikin. Dibe xususên ku diyar bikin hebin?

**Çiyayê Sor**: Rêberê min, berê hinek gumanên me hebûn. Bi taybet di mijara nejidilbûna dijmin de. Bi gelek tiştên demogojîk re helw dida girseyê bandor bike. Gumanên me hinek ji vê hêlê ve bû. Daxuyaniyên niha tên dayîn heya bêjî me ronî kir. Ev rewş ji hêla me ve têrker bû. Em ê li ser kurahiya van rawestin û weke tê xwestin binirxînin. Di vê mijarê de hemû biryarên ku Rêbertiya Partiyê bigire em ê heta mirinê pê ve girêdayî bimînin. Ev rewş wisa ye. Heke bên ser pêvajoya din, mercên vir yên zivistanê hinek direng vebûn. Lê em zû gihiştinê. Bi gihandinê re dijmin hat ser me, lê ev taxtîka dijmin vala hat derxistin. Niha di perwerdeyê de her tim domdarbûnek heye û xebatên me didomin. Dîsa hema hema em gihiştine hemû qadan. Lê encamên wê hîn pir zelal ne di destê me de ye. Dema ev hatin em ê hîn zelaltir binirxînin û li gorî wê agahî bidin.

Xususeke din ku diyar bikin, hevalê alîkarê kordînatore, ya rastî ev heq nekiriye. Ev rewş heya civîna me, yanî pêşniyareke me yê demî ye. Ji bo hevalên din yên guncav li qadê nebûn ev wisa bû. Mijareke din, quweta me di asteke baş de komî ser hev bûye. Di perwerde, vekirîbûna girseyê û birêxistinkirina hêza me de xebatên me yên girîng hene. Ji bo tevlîbûnan jî bi her alî re pêwendî hatiye danîn û rê vebûne; êdî li benda hatina wan in. Hêjmareke kêm hatiye û ji niha şûnde dibe hatin zêdetir bin. Dîsa qomîteya kevin hebû; ew hevalên tên zanîn, ji temsîlkirina rih û şervaniya partiyê pir dûrin. Tevî ku me alîkariyeke mezin da wan jî nejidilin. Em ê rewşa wan jî zelal bikin. Dikarim niha van diyar bikim.

---.: Fam bû. Ji hêla we ve jî bigiranî gihaştina navendeke guncav a xebatê çêbûye. Ji ber zehmetiyên derve û derenk hatina talîmat-perspektîfan xebatên we hinek giran derbas bû. Lê hûn niha di rewşeke bi temamî li ser pêvajoyê serwer bibin û wê bi giranî pêk bênin de ne. Li gorî perspektîf hatine girtin, êdî diyare wê nêzîkatiya ji serdemê re çawa be û di qadê de çawa bê pêkanîn. Dîsa kesayetên ku di wê astê de rast nabin hene. Niha dema wan êdî derbaz bû. Em ê ji wan re bêjîn êdî miqateyî xwe bin. Dewra qedemeyên cur be cur yên wisa dixetimînin û kesayetên xwe dana axaftinê derbaz bûye. Heke israr bikin wê bi sepandineke hişk re rûbirûyê hev bên. Nizanim, ev ferdperestî û xwe dana axaftin çima evqas bandorker dibe, çawa dikarin cesaret

bikin? Na, asta pêşkeftina heyî fersanda vê êdî nade. Di ti qadê de kesayetên bi vî rengî nikarin xwe bidin axaftin. Yên bi israr vê helwesta xwe didomînin wê li hember wan serdeçûyîneke bi tundî çêbibe û ger pêwîst bike bên perîşankirin. Ya rastî ti sedemeke vê helwestê nîne, pêwîstiya wê jî nîne. Her tişt fehmbare, dikare hertişt pir bi rûmet û bi awayeke pîroz bê cihê wê. Hîn jî nefamkirina wê tê çi wate yê? Em ê evqas ked bidin û bi kedeke mezin pêvajoyê bînin vê rewşê, tu yê jî rabî vê bixetimînî û li gorî kêfa xwe bikar bînî; ev rewşeke nayê qebûlkirin û efûkirine. Yên di vê rewşê de vekiriye ku pêwîste êdî bi şêweyek vê kasayetê derbaz bikin. Li gel vê gelek hêmanên girîng hene. Ev hêmanên binirx yên kevin û nû dikare hemû şêweyên pêşkeftinê bidest bixe. Jixwe her tim hêz jî tê dayîn.

Di derbarê qada we de jî dikarim hinek tezbîtan bikim. Qadê li gorî ferehbûn û kurbûna wê girtin girînge. Di vê mijarê de wê pêşkeftinên bilez çêbibe. Hûn ê quweta nû bigirin û ger pêwîst bike hinek cudabûnan çêbikin. Bi kinahî wê qad bê girtin. Cara yeke derfeta vê evqas çêdibe. Ya rastî hêjî ev qat bi kuranî û berfireh girtin û dîsa çêkera rêxistinê dana rûniştandin re sînordare. Lê hûn niha gihiştine vê astê. Ger pêwîst bike dikare xwe bigihînin hinek kesên li bajaran nasdikin, dîsa hinek kesên legal bêxin dewrê û hînek pêwendiyên bajaran jî bên danîn. Ev êdî ji niha şûnde zehmet nîne. Bawerim bi alîkariya hevalên din wê ev bên serxistin. Heke hûn di qadên hûndir de û di qada xwe de pêwendiyan pêş bixin, hûnê ev kar tehlîl bikin. Pêwîstiyên xwe yên amûr û alavan jî dikarin rehetî bi alîkariya eyaletên din derbas bikin. Bi kinahî pirsgirêk nîne û ji bo pêşkeftina we demeke destdayî mijara gotinê ye.

Me di derbarê pêvajoyê de nerînên xwe diyar kir û we van girt. Li gel mafdarbûna gumanên we, piştî vê vekirîbûnê bawerim we baş fam kir. Bêguman dijmin wê ti carî dirûst nebe û wê pêvajoyan her tim xirap bikar bîne. Tabî em ê jî fersenda vê nedin. Çi dema êrîş dike, çi dema êrîş nake em ê her tim wisa bikin. Yanî bê ku bê ser me wê bixwazibe me bîne rewşeke ku me xwe bi xwe re bide mijûlkirin, em ê bizanibin. Dema ew êrîş dike em di pozîsyoneke çalek de yî, dema êrîş nake jî bawerim em di rewşeke li ser xwe hikim bikin de yî. Yanî em ne kesên ketî û beredayîne bêjîn “*dijmin nîne, êrîş nake, wê demê em xwe bidin*

*axaftin*.” Dibe şer dehsal jî bisekine; yanî şer sekinî ma em ê artêşê belav bikin? Welatên bi salan şer nekirin hene, artêş hene; ma van artêşa xwe belav kirine? Bêjîn ku şer xilas bû, wê demê em ê artêşa gel belav bikin, birizînin? Ma dibe ev bê fikirandin?

Tişta dixwazim bêjim, tu kesek, bi ti hincetan nikare cuda nêzî artêşbûnê bibe. Heskî bila serdemeke şer ya pir zêde be, heskî bila şer bisekine serdemek aram derkeve holê, em her tim li ser artêşbûnêne û ya herî baş dikin. Parastin jî şer jî baş tê kirin. Hema hema dibîn îqtîdar. Yanî li wir erkeke me dewletbûnê heye. Dibîn îqtîdara gel û bi hezaran erkên wê li pêşiya me ye. Wê herkes berê xwe bide van erkan. Çawa bi dewlet dibe û dibe îqtîdara gel? Qala erkên wê yên mezin dikim. Heke vî barî bi temamî deynin ser milê me, ma wê kesayet bi çi re mijûl bibin? Ma wê bi çetegeriyeke asî eware re mijûl bibin? Wê me wisa bidin mijûlkirin? Ev erkên wisanin nayên hizirîn lê herkes dikare di astek bêhempa de pêk bine. Heya niha dibe xwedî li van erkane nehatibe derketin, pêwîstiya van erkan nehatiye cî. Lê ev, ne di wateya qebûlkirinê de ye. Erkên gelek giran bide ser milê hinekan, bila hinek jî ji bin vê xwe xilas bike û bijî! Dibêjim dema vê derbas bû. Li gorî hêza herkesî erk dayîn esase. Bi awayeke disiplîn karkirina herkesî esase. Êdî ev nayê nîqaşkirin. Heke hûn vê bi awayeke zelal deynîn holê hûn ê encam bigirin. Belê, heke fersenda me çêbibe, em piştre dikarin di vê hêlê de nirxandinan bikin.

---.: Derya Kesk, rewşa we çawa ye? We fam kir?

**Derya Kesk:** Silav û rêz Rêberê min. Ji hêla me ve jî fam bû. Di qada me de dijmin herî zêde ser gel de çû û hîn jî wisa ye. Me xwest li hember vê tedbîr bigirin û hîn jî li ser vê lêhûr dibîn. Êdî wê li gorî çarçoveya hatî diyarkirin tevgerîn çêbibe. Ev pêvajo ji hêla gerîla ve jî bi perwerdeya hatî vesazkirin re tê nirxandin.

---.: Rewşeke nû heye?

**Derya Kesk:** Na Rêberê min.

---.: Hûn dikarin bigihin GAP’ê?

**Derya Kesk**: Gihiştinê...

---.: Çêbû, başe. Çarçoveya hatî dayîn ji bo we jî derbasdare. Ji pirsên heyî re vekirîbûn dide qezenckirin.

---.: Derya Serhad, hûn çawanin?

**Derya Serhad**: Silav û rêz Rêberê min.

---.: Rewşeke nû heye? Ev hêrîşa dawî heye, agahiya we di derbarê wê de heye?

**Derya Serhad**: Belê Rêberê min. Duh topbaran hebû, îro jî operasyoneke mezin heye. Bi taybet hêza ku çûye sînorê Ermenîstanê ketina wan ya operasyonê mijara gotinê ye.

---.: Dibe ev hêza Tendûrekê be?

**Derya Serhad**: Na na, hêza çiya ye. Rewşa li Tendûrekê başe.

---.: Me bihîst ku êrîşê wir kirine.

**Derya Serhad**: Niha ti hêrîşek nîne.

---.: Dibêjî hêza Tendûrekê saxlame?

**Derya Serhad**: Belê Rêberê min.

---.: Başe li ser kîjan hêzê operasyon pêk tîne?

**Derya Serhad**: Hêza li çiyayê Agirî.

---.: Dikare bê nêzî we?

**Derya Serhad**: Di wê qadê de hêzên me hene. Nikarin bên nêzî me.

---.: Yanî niha di bin xeteriyeke cidî de ne?

**Derya Serhad**: Na Rêberê min, xeteriyeke cidî nîne. Jixwe hêza me di rewşeke parastina aktîf de ye. Yanî li ser talîmatên beriya niha yên Rêbertiya Partiyê, me jî di vê mijarê de hevalan ronî kiribû, ji wan re talîmat ragihand bû. Wê heval di rewşeke êrîşê de bersiv bidin.

---.: Bawerin bi tevgerbûnek diyar re ev operasyon dikarin bên derbaskirin. Heke pêwîst bike hûn dikarin Rojhilat jî bidin bikaranîn. Hûn hinek dizanin û bawerim hûn ê bikarin vekin jî. Her wiha hûn ê di mijara vale derxistina operasyonan de zehmetiyan nekişînin.

**Derya Serhad**: Na Rêberê min. Nikarin zêde ziyanê bidin me.

---.: Cuda dikarin çi bêjin? Ev tiştên me gotî fam bû?

**Derya Serhad**: Belê Rêberê min, fam bû. Bi taybet di demê dawî de xebatên me li ser qadên xweser meşiyan. Ji bajaran beşdarbûn heye. Lê ji ber van operasyonan em neçar man bidin sekinandin. Di nava du-sê rojan de ji qada me jî beşdarbûn çêbû. Bi taybet di dema dawî de bi derfetên xwe di mijara teknîk de jî hewl didin xwe têr bikin.

---.: Di herêma 3. de hinek hêz heye. Hûn dikarin bi wir re pêwendî danin?

**Derya Serhad**: Em li benda hevalên ji Başûr bêne. Heke ev bigihin me, piştre em dikarin bi hevalên wê qadê re pêwendî dênin.

---.: Li wir nêzî pêncî berendam heye. Heke derfeta we hebe hûn dikarin wan berendaman bigirin. Di demeke nêz de wê ji Başûr jî hêz bê. Heval Su… gihişt wir. Hûn ê bi Su… û Ma… re di nava pêwendiyeke nêz de bin. Em bi wan re axivîn, hûn di asta rêveberiyê de hinek teqwiye digirin. Hûn ê bi yên ji bo rêveberiyê tên di derbarê rastiya qadê de baxivin. Xerîbê qadêne, heta dibe hinek nêzîkatiyên wan yên şaş jî hebe; hûn ê bi nîqaşê wan derbas bikin. Bi vî rengî hûn ê rêveberiyeke bihêz û ahengdar avabikin. Lê wê ev rêveberî ne rêveberiyeke bêfonksiyon be. Divê herî kêm herkes bi hêzeke asta taximê re tevbigere, bi perwerde û rêxistinkirina wê re eleqedar bibe. Weke li gelek deveran bûyî, di bin navê fermandare, kurmaye avaniyê wisa bikaranîn û xwe li ser dayîna jiyîn wê neyê jiyankirin. Fermandarê herî baş, fermandarê li gel avaniya xwe cî digireye. Rêvebertiya herî rast, ya ku yêkîneyeke herî baş perwerde dike, rêxistin dike, diparêze û dide şerkirine. Wê baldarî li ser vê sekinîn. Êdî pir vekiriye dê fermandarî ji hêlek din ve neyê fêmkirin, ji bilê xebatên ku dibêjin "*em pîlansazkarin, payedarin*"ji derveyî xebatên çalek ti jiyanek takekesî neyê jiyîn. Yên tên dibe hinek fêrbûnên wan yên bi vî rengî hebin û divê şiyar nêzî vê bibin. Hinek hevalên li wir jî, dikarin cihê xwe di rêveberiyên berfireh û fermandariyê de bigirin. Ji ber hêza we hinek mezin dibe û divê pirsgirêkên fermandariyê ya hêza mezin dibe û qedemeya mezin dibe bi awayeke herî rastîbîn bê pêşwazîkirin.

Yek jî meseleya belevbûna li herêman heye. Hûn vê girêdayî demsalê çareser dikin. Ji bo wir dersên salên derbazbûyî girîngin. Xebatên şaş û ketine bin kontrolê mijara gotinê ne. Êdî bi ti awayî ketina van rewşan çênebe û tedbîrên pêwîst tên girtin. Li gel vê hûn xwegihandina girseyê pêş dixin. Bi awayekî lez vebûna şansê têkiliyên gel heye. Xetên Rojhilat û Bakur baş tên bikaranîn û hûn wan pêwendiyan hîn zêdetir berfireh dikin. Ji niha şûnde dibe ku derfetên hîn berfirehtir bibin mijara gotinê. Peywirdarên li wir hene, yên nû biçin hene; hûn ê bi wan re di nava pêwendiyeke

xurt de bin. Çi alavên teknîkê, çi jî weke piştçeper(herêma li paşiya bereya şer), heta dikare weke qada wargehê jî bifikirin. Pêwîstî pir nebe jî, dikare wisa bê dîtin û pêwîstiyên di vê derbarê de bên derbaskirin. Ji ber, dibe operasyonên hûn ne li bendê bin bi ser we de pêşbikevin. Ew Artêşa 3. ber bi wir ve tê û di vê navberê de wê bixwazin pêwendiyên me jî qut bike. Yanî wê bi pêşkeftinên Kafkasya ve û pêşkeftinên em jiyan dikin bê fikirîn. Ango girêdana pêşkeftinên li Kafkasya rû didin û pêşkeftinên em dijîn dihizire. Ji ber wisa tê fikirîn jî dibe ev operasyon pêş bixin. Ji ber vê, rewşa wê artêşê jî girtina berçav hûn ê hewl bidin parastina xwe baş pêşbixin. Yanî dijmin çavnêrîkirin û li gorî wê di nava tevgerbûnek de bûyîn divê hûn hîn ji niha ve pêş bixin. Wê him ji bajaran, him jî ji xwecihî pir hêzên nû bên. Dema ev zêde bûn dikarin bişînin Rojhilat, riya wê jî vekiriye. Lê herî zêde hûn ê hewl bidin di nava xwe de perwerde û birêxistin bikin. Niha ev dikarin bên gotin. Hûn ê di derbarê vê pêvajoyê û mijarên hatin ziman de tişteke nû bêjin?

**Derya Serhad:** Na Rêberê min. Tiştek niha bêjîn nîne.

“*Yên bi temamî xwe nedin giyana rêxistinê û şêwazê jiyan-fermandariyê wê pir xirap winda bikin.*”

---.: 44, rewşa we çawa ye?

**44**: Silav û rêz Rêberê min. Ew xebatên dihatin zanîn xilas bû. Hêz hatin vesazkirin. Koma Serhetê ket rê. Niha pirsgirêka me ya quwetê gihandina qadên wan heye û bi wê re eleqedar dibin. Bi taybet yên ku ji Cudî hatine û 3-4 sal di nava têkoşînê de ne xwe ferz dikin dibêjin, “*pêwîste îla em dîsa biçin wir.*” Ji derveyî vê rewş başe.

Di Başûr de bandora vê agirbestê zêde çêbû. Rêxistin bi awayeke zêde digire rojevê û nîqaş dike. Eleqedariya gel pir zêde ye. Em jî di nava nîqaşan de ne. Yanî nêzbûna ji rêxistinê re saz kiriye û encamên wê jî başin. Di rojên dawî de helwesta Rojhilat jî hinek başe. Di destpêkê de hinek bi fikar bûn, gumanên wan yên weke agirbest li ser bingeha pîlaneke li hember wan hatiye pêşxistin de bû. Dibe ku di asteke diyar de ev fikarên wan derbas bibe. Dikarin rewşa wan jî wisa diyar bikin.

Li gor me jî ev taxtîka agirbestê bandorker bû, lê encamên wê baş nehatiye girtin. Dirêjkirina wê dê baş be. Bi taybet li ser dijmin zext avakirin wê bi bandor bibe. Em ji bo wê li vir in. Wê

bandora navnetewî aktîf bibe. Ji vê hêlê ve jî sûdmende. Di vê pêvajoyê de hêzên me di nava parastineke aktîf de bûyîn û bi rêbazên kemîn, serdefirtinê zextên hêzên operasyonê şikandin li gorî min sûdmende. Ev pêvajoya agirbestê dikare wisa bê nirxandin. Hevalên din jî beşdarî vê dibin. Bi kinahî dikarin van bêjin.

---.: Heval Su… di derbarê xebatên we yên wê derê de hinek tişt got. Lê beriya hertiştî meseleya rêkirina wê hêza hatî amadekirin heye. Ji Derya Sor re ewqas hêza zêde şandin çiqas guncave, nizanin. A rastî pirsgirêka Derya Sor û Derya Şîn quwet derbazî hûndir kirine. Yanî difikirin ku hêza li wir zêde ye. Yên nû biçin jî pirsgirêk dîsa derbaskirina hundire.

Difikirin ku vê hêzê hinek bişînin eyaletên din, bi taybet Garzan dibe. Yê din jî hêza Cudî, nizanim hêza kî derê, hêza hemû welate. Wê ev hêz li gorî pêwîstiya qadan bê belavkirin.Hêza Serhetê dibe. Jixwe ji wir re hêz tê şandin û ev dikare bi şêweyê bicî anîna pêwîstiyan bêfikirîn. Yanî ber bi bakurê welat ve dişînin û dema qenal destdayî bû dikarin vê hêzê bêxe tevgerê. Tişta dibû bihatiba girtin hatiye girtin û di meşandinê de gihiştiye biryarbûneke baş. Hîn zêde girtina vê hêza zêde wateya xwe nîne. Êdî hemû hêz divê biçe hûndir. Jixwe bi konferansê re we xebatên xwe temam kiriye.

Komek yê teknîkê tê wir. Dibe komek wisa jî pêşbikeve. Lê ew jî hêza şere, wisa di bin navê em bi teknîk re eleqedar dibin de xwe mijûl nekin. Hêza muhafizê weke yêkîneyek girtin wê guncav be. Jixwe li qadê wê her tim hêzeke parastinê hebe. Lê weke min gotî, ew jî hêzeke şere û nikare rewşa xwe ji derveyî vê bide dest. A rastî yên demeke pir dirêj li wê qadê mayîn pêwîste hîn zêdetir li wir nemînin. Bandora kêmaniyên wir, di yên demeke dirêj li wir mayîn dîtin mûmkûne. Dibêjin hêjmareke zêde çûyîna van ya hundir başe. Yên ev dejenerebûna li derdora sînor pir zêde jiyan kirine divê hemû biçin hûndir.

Kordîneya we pêş xistî wê çiqas bixebite, nizanim. Feraset û helwest diyarin, li ser wê bingehê wê bimeşe. Hevaleke ku qal dihat kirin hebû. Em, ev meseleya girtîgehê hinek din ji nêz ve dinirxînin. Di hinek kesayetan de jiyana li wir di asteke pir xeter de ye. Em lêpirsînê hinek din kûr dikin. Dema dibêjin lêpirsîn, heskî bila zêfîndar be yan jî nebe, rewşa ava dibe em weke

helwesteke ji derveyî rêxistinê dihesibînin. Di nava rêxistinê de nahelin. Dixwazin belavbûneke pir zêde pêşbixin. Ev kesayet nayê rêxistîbûnê, hewl dide rêxistîbûnê belav bike û ji xwe mîsyonên pêşengatiya nû dide. Tevî ku ti behreyeke wan jî nîne, hewl didin xwe wisa bidin nîşan. Û pir zêde belav dikin. Çi bi xwestek çi jî bê xwestek pozisyonek wisa derdikeve holê. Divê bandora yên wisa belav dikin bên sînordarkirin. Wê li pêşiya wan di nava rêxistinê de erka xwe helandinê bê danîn. Ji derveyî vê weke komikên taybet tevnegerina wan girînge. Ji bo pêwendî ne girêdayî pêwendiyên kesan bin divê tedbîr bên girtin. Xebatên dikin wê weke xebatên partiyê bên pêşxistin. Ev, ji bo yên hemû qadan derbazdare. Fêrî jiyaneke pir bê berpirsyar bûne; fêrî jiyaneke rêxistîbûnê belav dike hatine kirin. Ev şiyariya me giştiye. Heskî bila bi zanebûn heskî jî bê zanebûn be, divê dawî li van helwestan bê. Rewşa yên di vê de israr dikin wê bên lêpirsînkirin. Di vê mijarê de bikinahî ev dikare bê gotin.

Di dema derbazbûyî de fermandariyên biryargehên li Başûr heta bêjî bê berpirsyarbûn kur kirine. Ev berpirsyarên gelek wundahiya ne û ya rastî suçê wan jî pir girane. Dema gafîlbûna heryek ji wan digirin ber çav, em tenê dikarin şansekê bidin wan. Yan ne yên wisa rast, şeklî û bê berpirsyar nêz dibin wê wisa hêsan nayên efûkirin. Yek jî rewşên wan yên neserkeftî mijara axaftinê ye. Vê anîna rewşa helwest û fêrbûnek bi mîsogerî wê neyê qebûlkirin. Ya li Başûr pêş ketî hinek ew e. Tenê ne ji derveyî taxtîk, nêzîkatiyeke ji derveyî rêxistinê jî hinek hatiye jiyîn. Ev, weke di giştî de jî wisaye, li wir hîn zêdetir hatiye jiyîn. Ew kesayet wê vê bi temamî bizanibin û bi zanebûna vê tevbigerin. Wisa xwe bi qurnastiya gundîtî veşartin û weke heyî domandin divê bizanibin ku wê hesabê vê giran bi serê wan de biteqe. Heke bêjin "*em ê dîsa bi ya xwe bikin û dîsa bi bandor bibin*,"ev hesabeke xirabe. Yên ku xwe bi temamî nedin giyana rêxistinê, jiyan û şêwazê fermandariyê wê xirap wunda bikin. Dibêjim pêwîste di vê mijarê de me zêde tengav nekin. Hîn jî ji bo rihê xwe yên zarokane, amatorî tatmîn bikin derdikevin pêşberî me. Wisa nabe! Nêzîkatî wisa ji rastiyên me re çênabe. Heke wê hêz ji erkan re bînin û wate bidinê bila erk bigirin. Bikaribin soza rêxistinê bidin bila soz bidin. Bikaribin mafê xebatek bidinê bila di wê xebatê de berpirsyartî bigirin. Ev

girîngin. Dibêjin êdî ji niha şûnde di raporên ku ji me re ragihînin veşartina van rewşan û van rewşan weke gazindan dana peytandin wê neyê qebûlkirin. Di vê mijarê de jî ev dikare bê gotin.

*"Ji bo Bakur em ê eniyê pêş bixin"*

Ji bo xebatên li Başûr jî navend baş vebûye. Dikare îtîfaqa bi wan hêzan re yan jî faliyetên lihevhêner hîn zêdetir bên pêşxistin. Em hewl didin wan li ser vê bingehê hinek di bin kontrolê de bihêlin, ne dijberê şoreşê bênin rewşeke alîkar. Ya berê dihat kirin jî ev bû. Derfetên wan anîna rewşa yedekek baş yê şoreşê tê pêşxistin. Kesayetên bikevin nava wê xebatê jî divê mirovên gihiştî û giranbiha bin. Divê dîsa mîna berê wir veguherînin qadeke jiyanê. Niha hêza li wir bimîne, dikare weke hêza PAK'ê (Partiya Azadiya Kurdistan) ya gerîla bê fikirin, ne li gorî çarçoveya pêşniyariya PAK qal kirî, divê weke hêzeke îtîfaqê bê dîtin. Heke bikeve nava pêvajoya îqtîdarê dîsa hêzeke îtîfaqê ye, heke di mixalefetê de bimîne jî dikare weke hêzeke mixalefetê ya şoreşgerî çalekiya xwe bimeşîne. Hinekdin pêşxistina vê mûmkûne. Ew komên biçûk-mezin jî pêwîste di vê çarçovê de bê fikirîn. A rastî weke baskeke şoreşgerî tevdigerin. Li hember reformizmê baskeke şoreşgerî pêşxistin û hêz qezenckirine.

Nameya hêza din gihişt me, name bi riya malbatê gihişt. Name nameyeke giştiye. Nizanim, em dikarin ji vir bersiva nameyê bidin, lê dikarin bi devkî jî ragihînin bêjin *"nameya we hatiye girtin."* Naveroka wê dikare hîn bê berfirehkirin. Dikare hinek tiştên mîna "*em ê dîqat bikin, hûn ê jî dîqat bikin*" bê gotin. Bawerim ew jî neçarin nerm bibin. Divê her tim şiyariyên mîna divê "*weke berê di sînoran de ne em, ne jî hûn astengiyan dernexînin û neyên tehdîtên dijmin"* bên kirin. Jixwe ji bo têkiliyên dostane pêş bikevin û xebatên yêkîtiyê hîn berfirehtir bê meşandin bangawazî tê kirin.

Bawerim bangawaziya yêkitiyê û civîneke dihat hizirîn hebû. Ew ji bo eniyê dikare bê fikirîn. Heke bi nûnerên Kawayiyan re bê axaftin, bawerim dikarin di dîroka têkildar de bên civînê. Weke bi Kemal Burkay re hatî çêkirin, dikarin bi me re belavokeke hevpar binivîsin. Me bi Hevgîrtû re jî çêkir, wê ew jî bejdarî pêvajoya yêkitiyê bibin. Heke ew Rizgarî hebin ew jî dikarin bejdar bibin. Ji niha de wê bangawaziyên bi hev re tevgerîn û çûyîna civîna cephe bên kirin û bi awayeke nivîskî bê

weşandin. Ger hêzên din hebin wê bangî wan jî bê kirin. Niha wê ew karê meclîsê di pîlana duwem de bê destgirtin û xebatên cephe di pîlana yekem de tê meşandin. Ji bo Bakur em ê eniyê hinek pêş bixin. Hêza meclîsê bila xwe hinek amade bike, em ê xebatên wan di gava duwem de binirxînin. Piştî ev karê cephe hat çareserkirin şûnde, bawerim ber bi kongreyeke cephe ve çûyîn çêbibe û li wir cihek çalek ji hêza meclîsê re bê dayîn. Jixwe wê hêjmareke girîng carekedin biçin xebatên li welat. Lê ji bo vê pêwîste gîhayîbûnên xwe yên siyasî pêş bixin. Di vê wateyê de mayîna wan ya li wir bi wateye û bi mîsogerî wê encamên baş bide. Em ê bi hêzên parçeyên din re jî platformeke kongrê ya hevpar pêş bixin û di asteke herî jor de li ser wan platformeke kongrê ferz bikin. Belkî bibe hêz, lê têkiliyên me yên bi wan re ne dubendî wisa bi şêwaya pêşxistina kongrê de ye. Ev dikare bên gotin.

---.: Derya Şîn, hûn jî digirin?

**Derya Şîn**: Silav û rêz Rêberê min.

---.: Tiştên hatin gotin baş fam bû?

**Derya Şîn**: Belê Rêberê min, fam bû.

---.: Tişteke bixwazin bêjin heye?

**Derya Şîn**: Na Rêberê min. Piştî daxuyaniyên hatîn kirin şûnde tişteke bêjîn nîne.

---.: Rewşa mercên demsalê çawa ye? Tê rewşeke destdayî?

**Derya Şîn: ...**

---.: Yanî hûn dibêjin wê hinek din wext bixwaze.

**Derya Şîn**: Raste Rêberê min.

---.: Karê vesazbûna quwetê pêşve çû? Karê rûnişkandina taxtîk pêş dikeve?

**Derya Şîn**: Rêberê min, di rewşa heyî de...

---.: Zêde nehat famkirin. Hûn qala rewşa rêkirina quwetê ya hundir dikin. Divê hêjmar li gorî şertan be. Di vê mijarê de hêza 44 jî bide heye; divê ew, rastîbîn bê bikaranîn. Jixwe we rexneya pratîka derbasbûyî kir û raporên we digihin me. Em ê zêde pêşniyaran pêş nexin. Texmîn dikim we plansazî û vesazbûn rastîbîn çêkiriye. Di derbarê meseleya van cerdevanan de jî hûn li ser bingehên nû digirin dest. Ji bo nefamkirina taxtîk ti sedemek nîne. Dîsa ti sedemek ya nehatina vê jî nîne. Kordîneya herî dawî we vesaz kirî dibe guncav be, lê ew hevalê we girtî gel xwe hinek

ji bo Başûr pêwîst bû. Dîsa hevalê biçe qada din jî dikariya li gel we bima. Di wê mijarê de hinek hevalên din jî dikare bê fikirîn. Yanî hûn dikarin kordîneya herdu kesîman û bihêzbûna wan weke fikirîne bikin, bi awayeke hîn cudatir jî dikarin bimeşînin. Di vir de ya girîng Başûr jî wê rewşa giran ya hûn dijîn nejîn û mîsoger tedbîrên wê bên girtin. Û hêza pir zêde li wir mayî derbazî hûndir kirine.

Ew qad, çi dibe bila be qadeke ku divê bigirin bin bandora xwe. Têkiliya wê êdî zêde bi hêzê re jî nîne. Bi qasî bixwazin derfeta hêz û têkilî di destê we de ye. Lê weke min gotî, quweta zêde bêfonksiyon negirtin jî girînge. Ji dêla bêkar bimîne, divê ev hêz li qadeke din bê nirxandin. Jixwe hûn bi Zaxrosê re di nava pêwendiyeke xurt de yî. Ji ber ew qad hemû yeke û hûn li dûv serweriya tevahîbûna wê qadê ne. Ger pêwîst bike hûn dikarin quwet bikin yek û li ser bingeha kordîneyekê tevbigerin. Li ser hinek qadan hûn ê zextên xwe bihevbeşî pêş bixin. Yên nû tên wir jî wê bibin. Hevalên hinek wê qadê nas dikirin bûn û bawerim wê alîkariya wan çêbibe. Li ser wê bingehê em ê hewl bidin girseya wir bi temamî bidin girêdan. Bawerim hûn ê nekevin rewşên berê û hûn ê biser bikevin. Fam bû Derya Şîn?

**Derya Şîn**: Belê Rêberê min, fam bû.

---.: Dengê we zêde nayê. Di vê çarçovê de tiştekedin ku hûn bixwazibin bêjin heye?

**Derya Şîn:** Na Rêberê min, tiştek din nîne.

---.: Derya Sor, hûn çawanin? We deng girt?

**Derya Sor**: Silav û rêz Rêberê min. Tiştên hatine diyarkirin ji hêla me ve fam bû. Hevalên li Rojhilat û Zaxrosê hatin vir. Me hewlda li vir bi wan re eleqedar bibin.

---.: Ji feraset û helwestên berê berhem maye? Keseke di rewşa muhafezekartiya kevin û ji derveyî rêxistinê tevbigere heye?

**Derya Sor:** ...

---.: Wê tenê şeklî nebe, dê tevlîbûneke jidil û resen çêbibe. Hûn tenê bi tedbîrên şeklî yên leşkerî nikarin mirovan bidin girêdan. Qusureke mezin û kêmaniyeke we berê kirî eve. Niha ev fam dibe. Ji cewher de tevlîbûn, partîbûn û pêşxistina partîbûnê tê pêkanîn. Ev girînge. Dîsa fermandarên yêkîneyên me yên bi tenê dimînin neberpirsyartiyên wan yên mezin heye. Bi vî rengî

bikaranîna fermandartiyê yek ji suçên herî girane. Û serê vê heta îxanetê diçe. Em careke din vê libîr bînin. Dîsa di fermandartiya çalekiyan de, yêkîneya xwe şandina çalekiyan xwe 30 km paşde hiştin, nizanim 10 km şûnde hiştin suceke mezine. Tabî ketina van rewşan wê çênebe. Fermandartî wisa weke laşgiranî wê neyê bikaranîn. Zilamê vê bike, wê kefenê xwe bike stûyê xwe bike. Ji ber ti kes vê qebûl nake, divê şerkerên me jî vê efû nekin.

Dîsa vekiriye ku wê ew Başûr carekedin mîna berê neyê bikaranîn. Li wir derfetên pir makûl û yên bi ser erkan de çûyîn hebû. Wê ev rewş bê nirxandin. Êdî ji bo wir wê ne nêzîkatiyên çep, ne jî rast carekedin xwe dûbare neke. Nabêjin zû bikin, lê erkên di pêşiya we de şênberin û erkên bên biserxistinin. Hûn ê wisa serde biçin û hîn zêdetir hêza zêde bişînin hûndûr. Hêza li Başûr bimîne dikare weke hêza PAK'ê bi bandor bibe. Ew dikare hinek ji armanca polîtîkayê re xizmet bike. Dîsa hêzeke biçûk ya îrtîbatê dibe. Ji derveyî vê pêwîst nake hêzeke zêdetir li wir bê girtin. Li gorî terzê berê hêz girtin, dane sekinandin neguncave. Ji bo perwerdê dibe nabe, ewqas girîng nîne. Wê li gorî pêwîstiyan li herêm û qadan hêz bê girtin. Kargeriyek li gorî armancên bingehîn ên polîtîkaya me bidestxistin ji bo polîtîkaya hêz di dest de girtinê girînge. Yan na wê li gorî rewşa kesan hêz neyê girtin. Tişteke wisa bi ti hêcetan nayê qebûlkirin. Divê perwerde bi şêwazê ku bi temamî bixê nava jiyana partî û artêşê bide pêşxistin. Hûn ê ji vê re pêşengtî bikin. Jixwe ji rexne-rexnedana we ev fam dibe. Tiştên hatin diyarkirin we fam kir û bawerim hûn ê bikaribin di şêwazeke bi wate de pêşbixin.

---.: Derya Dîcle, we jî guhdar kir?

**Derya Dîcle:** Belê Rêberê min, me guhdar kir.

---.: Li gel we tiştek heye?

**Derya Dîcle:** Na Rêberê min.

---.: Dibe îro-sibe komek hatiba. Ev koma bê ya dawiye.

**Derya Dîcle**: Hîn nehatiye, Rêberê min.

---.: Yanî ewên ji 44'an tên gel we, gelo dikarin bi ser me de werin?

**Derya Dîcle:** Derfet hene Rêberê min.

---.: Ti mûşkûleyeke we heye? Wekî din kesî weke berê bilîzin hene?

**Derya Dîcle**: Na Rêberê min.

---.: Hûn dikarin him li Bakur û him jî li Başûr xebatên xwe bi hev re bimeşînin. Bila mîna berê nebe û ketina nav kêmaniyan çênebe. Wiha derfet jî tên afirandin. Hêza xwe mezin bikin û ji bo hedefa we çi pêwîst dike wê bikin. Bila şaşitî astengan çêneke. Li gorî berê derfeta meşandinê niha pir zêdetir heye. Temaşekin, dikarin çawa hîn baştir bimeşînin wisa bikin. Dijmin jî paşçav nekin. Wê li wir xebatên siyasî bên meşandin, ji vê re derfet heye. Mîna berê nikarin bên ser me. Bakur wê ji berê zêdetir rista xwe bilîze, li wir jî xebatên xwe bihêz bimeşînin. Heke hûn wisa bikin hûn ê bikaribin welat bêxin bin serweriya xwe. Yanî heke hûn bi ser de biçin hêza we besî vê ye. Belê hûn bi hev re tevdigerin, yanî bi Zaxros re mûşterek tevdigerin. Li herdu aliyan jî derfet û pêwendiyên we heye.  Weke berê bila ev neyên qutkirin. Mîna berê li ti deverê rê ji tengavî û tengbûnê re neyê dayîn. Ev Başûrî mîna berê nikarin bên ser me. Divê bi xebatan re hêdî hêdî bandora xwe zêde bikin.

Derya Şîn, yek jî axayê wir tê. Bawerim em ê hevdîtin çêkin. Di vê mijarê de dixwazin tiştek bêjîn?

**Derya Şîn: ...**

---.: Hinek ji yên di wan bajaran de dixwazin bi vir re pêwendî dênin hinek tiştan bixwazin. Dibêjin; “*yên di çiya de bi me re nabin alîkar*.” Tabî pêwendî dibe îstîxbarat dibe, divê ev hinek bên pêşxistin. Yên di wan bajaran de hinek bi tenê dimînin yan jî kêmaniyan jiyan dikin? Di vê qonaxê de pêwîste ev bi lezgînî bên derbaskirin. Li wir çend bajar hene, dikare li ser wan baş bê sekinandin. Pir hêza nû tê û weke bê xwestin wê vesazbûna wê hêzê bê çêkirin. Dîsa perwerdeya wê jî girînge. Bi taybet hinek perwerdeyên sereke dikare bên dayîn. Wê hêzên me di derbarê hêzên ku ji qadên cur be cur hatine û di derbaskirina wan ya welat de, nirxandinek rasteqînî bi şêweyeke guncav pêş bixin. Dîsa dikarin xebatên li ser bajaran hinekdin bên xurtkirin. Dikarin van niha bêjîn.

Derya Zelal, hûn dikarin gudar bikin? Tiştên me gotî we girt? We fêmkir?

**Derya Zelal:** Me femkir, Rêberê min.

---.: Tişteki din heye?

**Derya Zelal**: ...

---.: Ew kesê şehît bûye, welatparêz bû?

**Derya Zelal:** Raste, Rêberê min.

---.: Başe.

Derya Zağros, em dîsa bên mijara we. Bawerim niha meseleya hêz şandina Garzanê heye. Di vê mijarê de vesazbûn çêdibin, hêz tê eyarkirin?

**Derya Zaxros**: Belê, raste Rêberê min. Em hevalên bijare dineqînin. Lê me dixwest di derbarê çawanî û bergeha vê hêza biçe Garzanê de agahî bigirin. Yek jî me ji bo Mêrdînê jî amadekarî kiriye. Bi taybet di vê qadê de me tenê du-sê hevalên di asta jor de erk bimeşîne li gel xwe girtiye. Yek jî du yêkîneyên Derya Şîn yê di şer de hatibûn vir hebûn, ew jî hatin amadekirin. Di rewşa heyî de ji bo tevgerekê amadeye. Ji bo derve ev hatine amadekirin.

---.: Jixwe ji bo Garzanê ji jêr jî hêz tê. Beriya niha me jî hêzeke di asta taximê de diyar kiribû. Dîsa ji gel we jî dikare pir quwet bigire. Hûn ê vê bi wan re nîqaş bikin. Bawerim wê hêzeke baş bikaribe ji pêwîstiyên wir re bibe bersiv ava bibe. Ev him hêza bihêzkirina fermandariyê ye û him jî hêza bihêzkirina şere. Armanc mezinkirina asta wire. Ji ber, ji niha şûnde wê hêzeke wisa li wir bê bicîkirin. Yek jî rewşa we ya pevgihandinê heye, hûn ê herdu araziyan bikin yek. Bi pêwendiyên beramber re hûn ê wê xetê bixin bin kontrolê. Ev pir girînge. Hêza heyî wê bi esasgirtina vê re pêşve here. Yanî divê êdî li wir jî pêwendî hinekdin xurt û zincîrkî be. Hûn ê bi hev re nîqaş bikin diyar bikin. Jixwe ji berê ve tişta dijmin dixwest asteng bike ev bû. Bawerim ev pêwendî dikare îsal bi temamî serbikeve. Tabî riyên cuda jî dikare bê hizirîn. Yanî mirov bi tiştеke tenê ve xwe sînordar nake. Di salên derbazbûyî de xetên dihatin bikaranîn yên rê li ber wundahiyan vedikir nehevgirtî bû; ev rewş wê bê derbaskirin û kontralkirina rê pir baş bê bidestxistin. Bi venêrîneke diyar ya rê re mirov dikare hêz û nirxeke girîng ragihîne. Ev ne zehmete û hûn ê di navbera xwe de pîlan bikin. Heta Mêrdin dibe, Garzan dibe, Derya Zelal dibe, herêma 4. dibe, wê bi hev re hîn zêdetir di nav pêwendiyê de bin û dikarin di navbera xwe de hêz bidin û bigirin. Hevalên eleqedar wê li ser vê bisekinin.

Bawerim lojîstîk tê pêşwazîkirin û di vê mijarê de tengaviyeke we cidî nîne. Çiqas dikarin bigirin. Lê divê ne bi

mecbûrî be. Hema her cî dikare bigire. Bawerim ev lojîstîk dikare we pir îdare bike. Her tim tê û divê hemû bê girtin. Derya Sipî vê digire, bawerim pir girtiye. Hûn jî dikarin pir bigirin, komî ser hev bikin. Divê di vê mijarê de tengaviyeke cidî nebe. Pirsgirêka pere heye?

**Derya Zaxros:** Niha tengaviya pere nîne. Pirsgirêka lojîstîkê heya niha hinek hebû, lê niha bi rêxistinkirineke baş re çareser dikin. Di rewşa heyî de hema hema hatiye amadekirin. Di vê qonaxê de tengaviyek cidî nîne. Jixwe bi awayeke rêkûpêk wê bikaribe bê girtin. Bawerim em ê bikaribin pirsgirêkê bi awayeke bingehîn çareser bikin. Di rewşa heyî de hertiştê me wisa ye.

---.: Başe.

Cuda deryayên me gudar dikin heye? Bawerim nîne. Dikarin hinek nirxandinan hîn zêdetir pêş bixin. Nirxandinên giştî yên me niha kirî bawerim besin. Lê bi hinek deryayan re divê hinek din bê axaftin.

"*Ji bo qezenckirinê hemû derfet hatiye gel hev*"

---.: Çiyayê sor, deng baş digire?

**Çiyayê Sor**: Deng baş tê Rêberê min.

---.: Hinek din li ser qada we rawestin. Dema ji nû ve ber bi vesazbûnê ve diçin hêmanên zêde paşkeftin çêdike û neyên jiyan û xebatên heyî hene? Hinek navên we qal kirine heye, ew navên kevnin. Belê hema hemû suçên şer jiyan dikin. Êdî şanseke wisa dayîna kesayetên wisa nemûmkûne. Hema wisa nêzî hemû erkan dibin. Mînakên dişibin van heye? Ya rastî di nava we de gelek hevalên hêja hene. Gelek hevalên baş yên partiyî hene. Valetiyên heyî bi rihetî bi wan dikare bê dagirtin. Di vê mijarê de pêwîste hûn zêde tengav nebin. Êdî wê dawî ji tîpên ku ji kevin de bûne bela serî û asteng dawî lê bê anîn. Hûn di rewşeke bikarin pirsgirêke ji bingeh ve çareser bikin de ne. Divê astengên cidî nebin. Hûn di vê mijarê de çi dibêjin? Yek jî li aliyên Erzînganê qala hinek wundahiyan hat kirin; têkiliya vê bi me re heye? Dîsa wundahiyê li Pûlûmûr yê me ye, yan jî yê TÎKKO (Artêşa rizgariya karker, gundî ya Tirkiyê) ye? We di vê mijarê de agahiyeke zelal girt?

**Çiyayê Sor: ...**

---.: Hûn dibêjin jiyana xwe spartî jiyana gundewariyê. Di wan mercan de pêwîstî êdî bi vê nîne. Wir bi temamî qadeke çiya

ye. Li gund jiyankirin û pêwendî bi jiyana gundîtî anîn ti wateyeke xwe nîne. Yanî ya herî kêm lê hebe wire, wir qadeke çiyaye û hemû jiyan li gorî wê tê eyarkirin. Lê bizanebûn di nava wan malbatan de li hember jiyanê pêwendî pê kirin bê wateye, sedema gelek wundahî û paşvemayîna ne. Tabî wê ji van re derfet neyê danîn. Tê zanîn ku dijmin baldariyeke taybet daye ser wir. Weke qetilkirina wan welatparêzan nêzîkatiyên tirsandinê heye. Bi vî rengî dixwazin girseyê pasîfîze bikin. Li hember vê girse dikare hîn bileztir vebe. Dema vê rewşê digirin ber çav divê nêzîkatiya li hember girseyê bê pêşxistin. Ji bo Xarpêt divê hinek din baldar be. Rêxistinkirina wir ne li gorî terzê berê, di asta legal û îllegal de yê ku wir baş nasdike û pêwîstî bi hinek nêzîkatiyên di demeke kin de encam bigire heye. Em ê îsal him li ser Amed û him jî li ser wir bisekinin. Û em ê ew gerûyên paşketî belav bikin. Îsal hinek darbe bi rihetî dikare bên danîn. Dikare di derbarê Xarpêt de bernameyeke hedefan bê pêşxistin. Bi vî rengî girtina hemû bajaran a bin otorîteya xwe wê zehmet nebe.

Yek jî divê hûn vê havinê sax xwe berfireh bikin. Dibe ber bi Başûr, ber bi Meletî û ber bi Koçgirî ve xwe belav bikin. Lê bêyî bê ecelekirin û nêzîkatiyeke gav bi gav pêşveçûnê esas digire bê raberkirin. Hinek wundahî çêdibin. Dibêjin bê amedekarî û bêşêwazî. Ya rastî divê hertiştî hesab bikin û wisa biçin. Qada eyaleta we berfirehe. Hûn ê li her şûneke stratejîk komek bicî bikin. Herî kêm di asta herêmê de divê hûn hêjmara xwe zêde bikin. Gelek qadên lêbên bicîkirin hene û divê li wan deran hemû xebat bên bicîkîrin. Divê şûneke stratejîk ku piştre bêjîn neçûnê û me negirtiye bin venêrîna xwe nemêne. Hinek zeman bigire jî pêwîste di vê mijarê de bigihe encamê.

Dubare destnîşan dikim; wê nêzîkatiyên hemû heval, şervan û fermandarên di qadê de ji serdema heyî re esas be. Ji derveyî van nêzîkatiyan bila ne hincetek bibînin û ne jî ji me daxwazek bikin. Bila me jî, xwe jî bi taybetmendiyên xwe yên hingovî(saplanti)yên kronîk bûne mijûl nekin. Heke birastî jî layîq bin, mijûlkirina me deynin aliyek, wê bi hêsanî bikaribin ya herî baş bikin û bimeşin. Ji bilî vê bila ne li benda tiştek bin. Bila nebêjin, "*me çima zehmetî kişand, çima rêxistin bersiva daxwazên me nade*." Û rûbirû hatina rewşên hîn zehmetir jî bila ji aqilê xwe dernexin. Lê dibêjim pêwîstî bi van hemûyan jî nîne. Divê piştî

evqas zehmetiyan encamên ku hatine bidestxistin neyê lîstîn. Divê taybetmendiyên xwe yên asê mayî bidin helandin. Bidilxweşî vê ji herkesî re didin diyarkirin û dibêjîn êdî bese. Dev ji nexweşiyên kesayetên xwe yên kronîk bûyî berdin, ev bi mirov tiştek nade qezenckirin. Peywîr û şêwazê xebatê diyare, wê demê bi ser de biçin. Helwesta tenê bi we bide qezenckirin ev e.

Hûn dizanin tevgerê bi çi zehmetiyên mezin gav avêtiye û derfetên îro berhemên xebata bist salene. Wê demê, nirxên vê texdîr nekirin, bi ti hincetan nayê îzahkirin. Bi erzanî li ser pêşkeftinên heyî razan, dibe helwestê herî neyê qebûlkirine. Yanî hûn ê di nava giyana rêxistinê de bihelin û di nava fermandariya rast de cîhê xwe bigirin. Yek jî hûn ê bi zimandirêjiyê rewşê pişt çav nekin. Her şervan û fermandarê me, neçarin wacibê soza pratîka dayîn pêk bînin. Divê di nava pêşbirka peywirên xwe bi serkeftineke mezin pêkanînê de bin. Vê rêxistin ev heq kiriye. Evqas zoriyên hatine kişandin vê ferz dike. Bangî we hemûyan dikim: Bivê şêwayê xwe bi rêkûpêk bikin! Hûn di qonaxa pêşkeftineke baş de ne û dikarin salê mezin qezenc bikin. Ji bo qezenckirinê cara yek di dîrokê de hemû derfet hatiye ba hev. Ev derfetên wisa yên serkeftinê bi awayeke zaroktî, hinek jî lûmpentî, jiyan û fêrbûnên kesayeta xwe ya em her tim rexne dikin ve vale dernexin. Em bi nêzîkatiyên xwe yên kronîk bûyî bi awayeke nexweş xwe li ser avaniyê ferz nekin. Ev xirabiyên ku em li xwe bikine û ji vê re jî mafê me nîne. Her wiha hûn di rewşeke ku ev şans pir baş binirxînin de nin. Di dîrokê de cara yek derfeta xebat û serkeftineke wisa bi rêkûpêk hûn ê di asta nirxê zêr de bizanibin. Û hûn ê bikin têkariya xwe. Gelek şehîdên wir yên bi nirx hene, hûn ê girêdayî bîranînên wan bimînin û bi temamî bersiv bidin. Ji derveyî vê wê ti nêzîkatiyên me yên subjektîv, kêf û helwesta me nebe mijara axaftinê. Bendewariyên gel, fermana dîrok û rêxistin wisa ye. Em li ser vê bingehê ji hemû xebatkarên li wir, weke şêwaza xebat û tempoya demê serarastkirî pêk anîne, di erkên wan de serkeftinê hêvî dikin. Em ji hemûyan re silav û rêzên xwe pêşkêş dikin… Çiyayê Sor, fam bû?

**Çiyayê Sor:** Gudar dikin Rêberê min.

---.: Vê li gel nirxandinên me yên din weke talîmatek, peyamek pêşkêşî avaniyê bikin. Hûn dikarin ji yên rewşên cuda

jiyan dikin re jî weke talîmatek pêşkêş bikin. Bawerim wê ev hinek bihêz bike. Rewşeke din cuda hûn diyar bikin heye?

**Çiyayê Sor: ...**

---.: Baş fam nebû. We qala Elazixê kir?

**Çiyayê Sor: ...**

---.: Em ê li gel Amedê peywendî dênin û di derbarê wir de pîlanek pêş bixin. Ev hêzên heyî, bi rewşên heyî ve nikarin îdare bikin. Hûn rewşa wir ji nû ve binirxînin. Pêwîstî bi xebateke li ser lingan bimîne û encam bigire heye. Em ê ji bo Elazixê pîlaneke xweser pêş bixin. Wê Amed jî rista xwe bilîze.

Derya Andok, hûn li me gudar dikin?

**Derya Andok**: Belê Rêberê min, guhdar dikin.

---.: Bawerim we vesazbûna avaniyê çêkiriye. Hevalên nû hatine bawerim hatin erkdarkirin û valetiya rêveberiyê hatiye dagirtin. Nizanim, rewşeke cidî ku yên neyên vê tempoyê û pirsgirêkan derdixin heye?

**Derya Andok**: Na Rêberê min. Jixwe hêjmara hevalên nedihatin tempoyê pir kême û bi awayê tê xwestin nêzîkatî ji wan re çêdibe. Me di rapora şandî de vesazbûna quwetê jî nivîsandiye. Li cihên ku hatine destnîşankirin gav bi gav vebûn heye… Keda bi eyaletên din re bûna yek heye. Yanî piştî li ser qadek lêhûrbûnek baş çêbû şûnde, pêngavek kirin wê baş be. Berevajî encamên nebaş yên ev bi xwe re biafirîne heye. Yanî piştî me valetiya di navbera xwe de dagirt şûnde, em ê gav bi gav li her deverê vebûnekê bidest bixin.

---.: Fam dibe. Bi wan re hat axaftin, hûn ê hinek wan tengav bikin. Ji bo valetiya di navbera Dêrsim û Orta de bê girtin hûn ê bi ser de biçin. Beriya niha jî di vê mijarê de çarçove hatibû xêzkirin. Bawerim wê ew jî hinek bi ser de biçin û mesafeya di navbera xwe û we de bigirin. Qenalên vê hinek vekirîne û rewşeke ku astengeke cidî derxîne nîne. Bi têqez divê ew qenala li Bakur bê girtin. Qadên ku hûn hersê jî lêbigihin hev heye. Divê li van deveran lêhûrbûn çêbibe. Dîsa bêyî ku Orta lêhûrbûnek jiyan bike xwe bi awayê komên biçûk belavkirin, tabî wê rê li ber wundahiyan veke. Jixwe em dizanin gelek wundahiyan wisa jiyan kirine. Hûn ê tecrûbeyên xwe ji wan re ragihînin. Wê ew jî we hinek gudar bikin. Komên biçûk wisa rasterast û ji derveyî kontrolê şandin bifikare. Me beriya niha xebatên bi vî rengî

mehkûm kiribû. Hûnek tecrûbeyên we jî heye. Ji ber berê heman xeta hat jiyîn û gelek wundahî hatin dayîn. Lê niha hîn rastir û baştir belav dibe. Bêguman pêwîstiya wan jî bi xebateke bişibi vê heye. Wê tedbîrên vê bigirin. Ew komên biçûk yên heyî, li cihê diçinê jî xwe ji jiyana gundewariyê xilas nakin. Ev rewş ji hêla feraset ve ji derveyî me û yeksek di asta windakirinê de zerarê dide me. Hêza we heye, hûn ê hinek bi tehdê bikin yek û bikişînin rastiyê. Weke min gotî, ew tedbîrên vê digirin. Nabêjim bila hema belav bibin; piştî tedbîrên baş girtin, lêhûrbûna ser qadê û keşif kêm zêde serkeftî bûn şûnde wê belavbûn pêk were. Bêyî ku lêhûrbûna ser qadê, xwe bicîkirin û keşif bên kirin, bi vî rengî koman şandin bixetere. Tabî wê ev rewş bê diqatkirin.

Dîsa hûn ê, bi heman şêwayî bi GAP'ê re jî di nava pêwendiyeke dişibe wê de bin. Divê pêwendiya we hîn zêdetir bibe. Me ji hemûyan re got. Jixwe bi Garzanê re jî pêwendiya we pêş dikeve. Wê lêhûrbûn li ser ew qada me gotî zêdetir bibe. Dê beşeke girîng yê şer li wan qadan bimeşe. Li vir rewşeke ku neyê taxtîk û taxtîk neşixûlandin nabe mijara gotinê. Pir tecrûbe û derfet jî komî berhev bûye; hûn neçarin van pir baş bikar bênin. Di vê ne xwe ber bi helwesta serkeftineke erzan ve berdan çêbibe, ne jî xeterî biçûk bê dîtin. Serdemeke ku her roj li ser bûyera taxtîk lêhûrbûn çêbibe ye. Kurahiya wê artêşbûn, belavbûn û kurahiya wê çalekî her tim derbazdare. Li wir pêşkeftin tenê di aliyek de çêdibe. Ew der ji yek hêlê ve pêş dikeve. Di herêman de hinek vê dibînin. Di nava ferasetekе teng ya leşkerî de mane û kapasîteyên xwe berfireh nakin. Divê hinek din bêxin nava berpirsyartiyên giran. A rastî heke hinek din xwe tengav bikin, dikarin hîn zêdetir berhemdar bibin. Heya bêjî pêwîstiya wan bi kurbîn, artêşbûn, pêşkeftinên li gorî rêzikan heye. Di vê mijarê de derfetên wan fereh bûne û bi mîsogerî wê pêşveçûn çêbibe.

Hevalê nû hatiye gel we divê taybetmendiyên wî yên baş hebe. Piştî we demek li gel xwe girt, li gel tecrûbeyan bawerî girt şûnde, hûn dikarin her karekî bidinê. Hinek din bê bihêzkirin bawerim wê pir tiştan parve bike. Yanî hinek aliyên wî yên erênî hene. Tabî hinek bandora girtîgehê jî heye. Lê piştî we rastiyê pê da têgihandin û hinek jî pijiya, piştre hûn dikarin di mijara bar sivikirinê de binirxînin. Daneheva ew hevala jin jî pir heye. Lê li gorî me hinek aliyên wê yên bên rexnekirin jî derket holê. Lê

gelek xwedî tecrûbeye û piştî rastiyan pê da famkirin şûnde dikarin di xebatên cephe de peywîrdar bikin. Lê belê divê ew têkilî bê dîqatkirin û şekil rast bê dayîn.

Bawerim li qada we di mijara xebatên cephe de tengaviyeke cidî heye. Berê hinek xetayên ku ketibûnê hebûn û rê li ber wundahiyan vedikir. Hûn dizanin, xebatên cephe, ne xebatên eşkere û bêkontrolin, xebatên herî nêz û tund yên di bin venêrîna gerîla de ne. Di vê mijarê de nirxandinên hatine kirin başin, wê hewl bê dayîn bikevin meriyetê. Rêveberiya rêxistinê ya li wir di asteke ku xwe baş biparêze de ye. Ji ber, dijmin pir bi ser wir de tê û dixwaze derb lê bide. Di vê ev jî bê beralîkirin. Ev dikare bê gotin. Bawerim pêwîstiya we pir zêde bi quwetê nîne. Ji bo quwetê bendewariya we ji Başûr heye?

**D. Andok:** Na Rêberê min. Hêza heyî bese. Jixwe tevlîbûn çêdibe û yên tevlî dibin hema ji bo perwerdê tên girtin. Niha pêwîstiyeke me cidî nîne.

---.: Her yek ji wan hevalan dikarin tabûrek jî bimeşînin. Êdî tecrûbeyên wan têra vê dike. Di vê mijarê de pêwîste hinek feraseta berpirsyariyê bê rûnişkandin. Heke hinek pratîkîbin wê kapasîteya wan rake. Dikare ji van hevalan re perwerdeya hêzên zêde û rêvebirinê bê dayîn. Dîsa dikarin di nava xwe de perwerdeyan pir zêde bimeşînin. Bi taybet hinek şêwayên perwerdê yên destdayî ku pratîkê bi xwe re anî heye, wê ew bingeh bên girtin. Wê bi dewreyên perwerdê yên demkurt bên destpêkirin û bi demê re her ku biçe wê perwerde bê kurkirin. Piştî perwerdeya leşkerî ya yekem, hinek pratîk û dîtina perwerdeyeke şeş mehan şûnde wê pêşveber bibe. Yanî hûn perwerdê jî mîna qonaxeke bidin dest, hûn ê zehmetî nekişînin. Her wiha quweta me ya heyî dikare bi pêkhatina rêveber û perwerdeyeke baş re xwe mezin bike. Yanî di nava xwe de derfeta xwe mezinkirinê heye. Wê beşdarbûn hîn zêdetir bibe. Hûn deriyan her tim vekirî bihêlin. Bi taybet nûfusa ew bajar pir girînge û beşdarbûneke baş ji wan dibe. Lê divê ew bi hostayane bên girtin. Diyar dibe ku hinek xebatkarên li wir, bi yên di asta legal de zêde li hev nakin. Dibe hinek asteng hebin, girtin çêbibin. Tabî divê ev bên derbaskirin. Di derbarê wir de, di derbarê Elazixê de, bi kinahî di derbarê bajarên din yên mezin de dibe di dema pêş de pîlanek bikeve rojevê.

Ew serî kêliyê dibêjin “*werin teslîm bibin*.” Em, dikarin hinek yekeyên wan yên reveberiyê bi temamî teslîm bigirin. Planeke ku baş bê pêşxistine û dikare darbeyeke mezin li rêveberiya wir ya heyî bide. Tabî em ê ecele nekin, wê ev hemû ji bo pêşerojê bên fikirin. Yanî hûn ê pîlana xwe ya çalekiyê pir berfireh pêş bixin. Dubare destnîşan dikim; ev agirbest, bi temamî şereke taxtîke. Nêzîkatiyeke ku bi ti awayî rê nade pazîfîzmê, di peywiran de paşxistin û rihetbûnê. Ji bo rast hatiye famkirin zêde li ser nasekinim.

“*Nêzîkatiya rêbertiya ku seviyeya jor girtî girîngiyeke mezin îfade dike*”

Ji derveyî van di derbarê giştî de xaleke ku hûn diyar bikin heye? Bi hevalên din re jî hevdîtinên me çêbûn. Di derbarê îtîfaqên dawî û pêşkeftinên di astên cuda de tiştek diyar bikin heye?

**Derya Andok**: Rêberê min, a rastî dubare vegotina rewşên tên zanîn zêde pêwîst nake: Li gorî min dema Rojhilatê Bakur hinek kombûn jiyan dike, ev kombûn di Eyaleta Navîn de hinek di asta paşde dimîne. Lê birastî jî GAP yan jî hinek rewşên li Başûrê Rojava jî hinek aşîkarin. Li gorî min divê Botan destwerdana Wan, Mêrdîn û Başûr bike. Ji nêzîkatiyên ji gel re bigirin heta şêwazê jiyanê, şêwazê têkiliyan û rewşên di gelek mijaran de dilnerihetî diafirîne heye.

---.: Ji bo Mêrdîn çi dibêjin?

**Derya Andok**: A rastî ji bo mîna Başûrê Rojava nebe jî zêde sedemek nîne. Li gorî min hinek yeke ji hêla dijmin ve bi awayeke zanebûn tên jiyandin. Û heta ev rewş me jî tengav dike. Yanî hinek revên li vir, ji bo şêwazê wir tê jiyîn. Şêwazê jiyana li wir pêşdikeve artêşbûnê xira dike. Bi taybet yên ku dixwazin erzan jiyan bikin, wir tê rewşa cihê wan yê revê. Stembol jî zêde ne cuda ye.

---.: Vê ji bo kîderê dibêjin?

**Derya Andok**: Divê em li ser vir bisekinin. Yanî rewşeke di vê em di navbera xwe de çareser bikine.

---.: Bi taybet hûn qala kîderê dikin?

**Derya Andok**: Rêberê min qala Mêrdînê dikim.

---.: We got Stembol.

**Derya Andok:** Stembol jî di rewşeke dişibe wê de ye. Yanî zêde cudahiyek nabînim. A rastî Başûrê Rojava û GAP jî di rewşeke heman rengî de ye. Yê Başûrê Rojava bi encam bûye. Lê divê ev dever jî bigihe encameke bi wî rengî.

---.: Zanebûn zêde nebe jî, bilezûbez şêwazê jiyanê ber bi wê ve dibe. Diyare ku şêwazê jiyana neyê şoreşgeriyê, wê deriyek vekirî ji van pêşkeftinan re bihêle. Pratîka D. Ya sala derbazbûyî hinek wisa bû. Ew şêwaz yanî belavbûna li gundan a rastî quwetê ber bi îmhayê ve birine. Çiqas bizanebûne, tabî em wê nizanin. Zêde bi zanebûn nebe jî, weke feraset û helwest wê îfadeya xwe li wir bibîne.  Ev, xeta navîn di nava me de ye. Ev nêzîkatiyeke ku ji kevin ve pêsîra me naberde ye. Ev rewşeke di hinek pratîkên we yên berê de jî derdiket holê. A rastî bi zanebûn yan jî nebizanebûn zêde negirînge. Di rewşa heyî de navê vê meylê tasfiyekariye. Mirinê didin ber çav, lê devji vê jiyanê naberdin. Ev derket holê. Di nava wan de dema yên xwedî niyeteke baş jî xwedî li peywirên xwe dernakevin,  loma xwe ji qurbanbûna van şaşitiyan rizgar nakin. Bêguman ev rewş we hemûyan eleqedar dike. Di vê mijarê de ya erzan esas girtin û vê bi qurnastiyên gundîtî re derbaskirin nemûmkûne.

Ev neyênî li gelek cihan hat jiyîn, li Başûr jî hat jiyankirin. Dîrok vê da nîşan ku, yên herî zêde di vê rewşê de ne xwe bi xwe bi erdê re dikin yek. Yanî îmha bûn. Tê zanîn ku yên xilas bûne û yên jiyan dikin jî bi tesedûfî hatin vê rewşê. Ji bo em vê derbaz bikin, em hertiştê xwe danî holê. Şoreş, şaşî û kêmaniyan efû nake. Gelek heval vê dibînin. Di vê mijarê de me hinek nêzîkatiyên berfireh pêş xist û tedbîrên wê jî girt; lê pêkanîna wê lewaz ma. Heke hinek dirûst bûban, hinek îtîbar dabûna tiştên tên gotin a rastî wê rewş wisa nebûba. Hefteyeke daxivin, zilam ji cihê xwe naqete. “*Başe başe*”dibêje, lê tedbîreke herî biçûk jî pêş naxe. Yên jiyan dikin rewşa gelekan ev e.  Li GAP’ê, Başûrê Rojava û deverên din jî tiştên jiyan dibin hinek wisa ye. Bawerim hinek yekeyên Herêma Navîn jî rewşeke dişibe vê jiyan dikin. Tabî wê ev ji daqurtandinê rizgar nebin. Weke min gotî, vê jî anîne rewşa helwestek. Li hember rêxistinê rûyek heye, li hember jiyanên xwe yên rastî jî rûyek didin nîşan. Yanî hinek dirûtî heye. Wê van derbaz bikin. Divê herkes li her derê destwerdana van rewşan bike. Ji ber yê rê li ber vê vedike,  ziyanê tenê bi xwe re

sînordar nahêle. Ziyana tiştên kirî qad bi qad bi rêxistin û gel dide kişandin. Rewş vekiriye û divê ev bên derbazkirin.

Di her mijarê de nêzîkatiya şoreşgerî bi awayeke vekirî û mîsogerkirî hatiye danîn. Dîsa ûslup hatiye diyarkirin. Divê ûslubê we heta bêjî siyasî û bi hostayî be. Dîsa divê hêjmareke zêde mirov tevlî berpirsyartiyên bilind bikin. Weke berê jî bûyî ji dêla ku kes pir zêde bi ser xwe de biçe, hêza xwe têkilî berpirsyartiyê kirin girînge. Mîrov wê dîsa bi ser xwe de biçe, nêzîkatiya pêşengtiyê girîngiyeke mezin îfade dike û yan ne nêzîkatiyeke hemalwarî ye. Wê hewldan dîsa mezin bibe, lê ev, wê di asta meşandina karan û bi hezaran bide şerkirin de be. Yanî wê çawaniya lêhûrbûn û keda we bilind bibe. Bawerim hûn di ferqa vê de ne, hevalên din jî di ferqa vê de ne. Di vê rewşê de wê hilfekîneke biwesf derkeve holê. Em ji avaniya hemû şervan û fermandarên li wir hilfekîneke bi vî rengî dixwazin. Di vê mijarê de bila li hemberê xwe jî stemkar bibin, şerê herî mezin li hember xwe bidin meşandin û di meşandina şerê li hember xwe fikaran jiyan nekin. Bila destpêkê serkeftinê di xwe de pêk bînin û xwe bînin asta mînak. Bila destpêkê herikbariyêdi kesayeta xwe de bibin serkeftinê ku, ev rewş rê li ber hawirdor jî bixin nava pêşbirkê veke. Ev girînge. Yê ku xwe baş nede xebitandin, nikare hawirdora xwe jî bide xebitandin. Yê ku xwe neke pêşeng, nikare hawirdor jî bike pêşeng. Xwe û hawirdor xebitandin û kirina pêşeng girînge. Heke herêm ev şêwa bidest bixe, heta pêşkeftinên mezin jiyankirin wê ne ji dil be. Dibêjim rê û rêbas hatiye diyarkirin û qad vebûye. Wê demê bimeşin! Hûn ê hemû bi meşê bikaribin pêşkeftinên mezin bidest bixin. Bendewariyên gel jî bi vî rengî ye. Ger herêm vê şêwazê bigirin, dê pêşkeftinên pir mezin bijîn.

Ev rêxistin û hêzên legal dixebitin, dibe ku bixwazibin hinek ferastên nû pêş bixin. Tabî em ê hewl bidin wan jî di bin venêrînê de bigirin. Dixwazin gelek spekûlasyonên mîna wiha "*gel aşitiyê dixwaze, şer naxwaze*" pêş bixin. Ew kesîn şaşin, rast nadanin holê. Em ê vê rewşê bi hinek daxuyaniyan zelal bikin. Ango derfet heye ku girse jî ji bo xetê guncav be û niha hîn berfirehtire. Dibe ku vê berevajî bikin û em ê fersenda vê nedin. Hûn ê jî bi belavokên cuda cuda vê helwestê mayînde bikin. Bi taybet ji bo wê qadê girînge. Bi ew rêbaza name nivîsandinê gengaze ku

gelek hevkar bên sererastkirin. Li şûna komên wisa bi gelemperî li ser civaka sivîl bi serê xwe dimînin, pêşxistina rewşên ku di bin venêrîna şoreşê de ne girîngtirin. Dîsa pirsgirêka we ya belavbûna Rojave hebû, hûn ê di vê pêvajoyê de wê jî gav bi gav pêk bînin. Yanî wê hemû eyalet, îsal bi pîlaneke rêkûpêk re encam bigire. Ev, asta xebatê wisa hêsan nehatiye girtin. Ji bo vê gelek tişt hatin vekişîn, gelek fedekartiyên eyaletê yên mezin jî çêbû. Lê divê heqê dema ber hilanînê jî bê dayîn. Madem evqas zehmetî hat kişandin, evqas zorayî hat jiyîn, şehît hat dayîn, wê demê ji bo berhem girtin jî di nav pêşbirkeke mezin de bin. Di hevalan de ev hinek kêm dibe. Ev hemû ne ji bo zehmetî kişandinê ye, ji bo rê li ber pêşkeftinên girîng vekirin bû û ji bo rê li pêşiya serkeftina demên wisa vekirin bû. Bi hêviya hûn ê hemû li ser vê bingehê fam bikin û serbikevin.

*"Bi awayeke rast bicîkirina quwetê û meşandina wê girîngiya xwe diparêze"*

Çiyayê Sîpan, hûn li me gudar dikin? Ev ji bo we jî derbazdare. Ji bo karê quwet derbazkirinê bi Zaxrosê re hinek axivîm. Bawerim di vê mijarê de hewldaneke we jî mijara gotinê ye. Demsal vedibe û hûn vesazbûnên nû pêş dixin. Hûn dikarin di derbarê rewşa xwe de nirxandineke hîn şênbertir bikin? Hinek wundahî çêbûn, we ji wan agahî girt? Belê, xususên dişibin van...

**Çiyayê Sipan:** Çêbû, Rêberê min. Me di demên dawî de hinek amadekariyên baş kir. Em quweta xwe li gorî pîlaneke diyar belav dikin. Di herêma 2.de bi awayê du cepheyan xebateke me yê rêxistinkirinê heye. Yanî Bakurê wê dibe saha Muşê, Başûrê wê jî dibe saha Mutkî. Ev herdu sahe jî girêdayî xebateke bi sazûman rêve diçe. Yek jî Riya Îpekê heye û rêyeke pir tê bikaranîn, dixwazîn yêkîneyek taybet li wir bicî bikin. Ji hêla din ve jî, xebatên li T. hîn bihêzkirin, bi Botanê re pêwendiyeke bihêz danîn û dixwazin herî zêde jî giraniya xwe bidin sahayên H.,S.,B.,K.,S. Dixwazin beşeke mezin ya quweta xwe li vir bicî bikin û hewl didin şer li vir bidin meşandin. Di vê çarçovê de di nava vesazbûneke diyar de ne. Pêwîstiya me bi quweteke diyar heye. Saha heyî ferehe û dikare hêjmareke zêde quwetê rake. Quweta ji Batona bê, wê di asteke diyar de pêwîstiyên me bicî bêne. Tevîhevbûna hêza vir li gel hêza bê wê bikaribe pratîkeke

baş biafirîne. Asta avaniya vir ya şer di wateyek de lewaz dimîne, lê heke bi hêza bê re bibe yek wê bikaribe gaveke bihêz bavêje.

Me di vê pêvajoya vesazbûnê de hinekan ji peywirên wan girt. Rewşa D. Ya nehatina xetê heye. Me her tim peywir dayê, lê bi xwe vê bi awayeke guncav bikar neanî, nêzîkatiyên wî şaş çêbû. Li ser vê bingehê ji peywirê hatiye girtin. Rapora ku amade kiribû jî nehat qebûlkirin. Dîsa rewşa M. heye. Piştî bûyera bombebaranê şûnde bi awayeke sivik birîndar bibû. Yek jî dixwazin hinek peywir bidin hevalê X. Di vê pêvajoya pratîkê de rewşa wî baş bû. Heke hinek bihêz bikin, di bin venêrîneke diyar de bawerim wê bikaribe kar bimeşîne. Me di mijara alîkariya koordînetor de heval nehilbijartiye. Di vê mijarê de li sahan hevalên guncav hene. Heke rewşa Bi. guncav bê dîtin, dibêjin li ser bingeha hinek bihêzkirinê dikare bibe alîkar. Lê ji bo guncavbûna rewşa wî teredûtên me heye. Ji ber carna derketinên baş dike, carna jî bi paş ve dikeve. Bi taybet li hember asîbûn û êrîşên dijmin bi temamî xwe wunda dike. Serwerbûna wî tam li ser xebatê jî nîne. Wiha aliyên wî yên wisa me dide fikirandin heye.

Yek jî dema koma Şîrvanê dixwaze derbazî qadê bibe, rasterast bi dijmin re tên beramberî hev. Ji dijmin jî wundahiyên zêde heye. Lê me hîn baş agahiya bûyerê negirtiye. Di vê pêvajoya zivistanê de hinek êrîşên veşartî derketin holê. Ev herî zêde bi ser qenala Batmanê re, yek jî qenala…,hewl didin bi awayê du qenalan derbazî hûndir bikin. Dema komeke saxlam tê endameke xirabûyî têxin nava komê. Lê bandoreke van zêde û ziyaneke dabin nîne. Jixwe girtine bin venêrînê û rewşa wan tê lîkolînkirin. Rewşeke wan ya pirsgirêkeke cidî derxe nîne. Ew girtina dawî bawerim wê li Batmanê rê li ber xirakirineke zêde veke. Me hewlda hinek tedbîrên wê bigirin… Me bi perwerdê re gelek kêmaniyên xwe yên berê derbaz kirin. Niha dikarim van diyar bikim.

---.: Başe, hûn dikarin wan helwestan di derbarê ew kesên we qal kirî de pêşbixin. Ji bo alîkarê kordînê yan jî bihêzkirina koordînasyonê dibe pêwîstî bi navên cuda çêbibe. Bawerim divê zêde ecele neyê kirin û hinek din bifikirin. Tabî Bi. wisa ye, yanî zêde bi îstîqrar nabe. Heke bûba, dikarî hinek tiştan bike. Lê dîsa jî tiştên pê bide kirin hene. Wê O jî, weke yedekek, li ser

peywireke guncav bê girtin. Ew, ew kesayetên xwe nahelînine. Ji bo ew kesayet bên helandin, nêzîkatiyeke rastîbîn ya otorîter pêwîst dike. Divê dîqat bê kirin. Diyare ev zêde nayên kontrol û xetê. Lê dîsa wê bê nirxandin û hinek xebat bi van re jî bên pêşxistin. Beriya niha hinek heval hebûn; dibe hinek ji wan pêşkeftîn hîn baştir bidest xistibin. Heke ev nirxandinên dawî bipejirînin wê pir pêşkeftin çêbibe. Dîsa ketina Ma. ya wê helwestê bizanebûne. Îhtîmaleke mezin di serî de tevlîbûneke bi wate çênekiriye. Weke dibêje cihên wisa nîne, wê jê re bê gotin ku rast bixebite. Wê rê ji rewşeke nebaş re veneke. Yên mîna wî, canê wan derbikeve jî em ê wan bigirin nava xebatê û wê di nava xebateke guncav de peywir bimeşînin. A rastî heke bixwaze dikare gelek kar bike. Dema tevlî dibe bi armanceke cuda tevlî dibe û dibe ku bixwazibe ji vê xilas bibe. Wê rewşên van hîn rastîbîn bên nirxandin û di rewşeke guncav de bên girtin… Dîsa li gel we gelek ji adayên nû yên pêşkeftî mirov hene, gelek hevalên hêja hene. Divê ew di mijara rêveberiyê de bên pêşxistin. Nizanim, agahiya ku So. şehîd bûye hat, dibe ku ev rast bin? Hinek nûçeyên radyo gotî hene, dibe ew rast bin?

**Çiyayê Sîpan**: Rêberê min pirsa we fam nebû.

---.: Ji bo So...

**Çiyayê Sîpan**: So. di wê bûyerê de şehîd bû. Min beriya niha navên wan dabû. So. bû, ew hevalê teknîsyen Şo. bû û çar hevalên nû tevlî bibûn. Bi giştî şeş heval şehîd bûne. Hêjmara pazda ya ku dijmin dayî neraste.

---.: Qala ev wundahiyên sê-çaran hat kirin.

**Çiyayê Sîpan**: Ya min qal kirî koma Şîrvanê ye. Me neyekser agahî bidest xistiye, ji komê agahiyeke zelal negirtiye. Dema kom di rewşa meşê de ye ketine nav hev. Hinek dibêjin du kes, hinek jî dibêjin sê kes wundane.

---.: Başe, komên nû tên. Ew koma nû wê ji we re cîhazên pêwîst bîne. Hûn dikarin ji Zaxrosê nav taybet diyar bikin? Ew, dipirsin ka pêwîstiya we bi qadroyên çawa heye. Hûn bi wan re axivîn?

**Çiyayê Sîpan**: Ev du-sê rojin li wan digerin, lê ji bo deng baş fam nedibû me nikarî baxivîn. Ji niha şûnde hewl bidin baxivîn.

---.: Hûn dikarin ji bo xwe navên baş yên di asta jor de diyar bikin? Em dikarin ji wan re bêjin.

**Çiyayê Sîpan**: Di vê herêmê de yek-du hevalên bikariya kar bike hebe, wê hevalên heyî jî perwerde bike û ji nû de bejdarî xebatan bikin. Ji ber hevalên li wir nasnakim nikarim navan bidim. Hevalên bikaribin di herêmê de kar bikin hebin wê baş be.

---.: M.,C. yê ku we jî nas dikir hebû; bawerim komeke ew jî di nav de cî digirin tên. Ev gelek wesfdarin. A rastî diviya ev heya niha bigihiştiban. Dîsa ji bo ava Botanê heval X.ew hene. Ew wir baş nasdikin û bawarim dikarin wir vekin. Em ê niha vê ji van re bêjin. Yek wê destpêkirineke baş ji bo pêngava Bakur çêbe. Him jî dibe bi hêzeke mezin re çêbibe. Hûn jî hinek ji Bakur ve tengav bikin. Vê wisa bi awayeke guncav bikin. Bi vî rengî ew qad dikare bikeve nava rewşeke baş. Li wê qadê gelek mirovên di asta şervantiyeke wesfdar de hene. Dîsa hewl didin hêjmareke mezin yê Başûr bişînin. Hûn dikarin van hemûyan bi nîqaşê careser bikin. Lê dîsa dîqat bikin. Herêma we, li beramberî hêrîşên ne li bendê yên dijmin dikare rista xwe bilîze. Lê dikare vale jî bê derxistin. Yanî qadeke dikare darbeyên pir giran jî lê bide. Bawerim weke demsal jî hûn ketina nava demeke baş. Her wiha tê rewşa qadeke ku bikaribe her şêwayî şer rake. Dikare serweriyeke temamî pêş bixe û hûn şanseke wisa jî bidest dixin. Hinek amadekarî dikare encam bide û heke teqwiye jî di dema xwe de bigihe, bawerim ya dimîne serwerî û venêrîn. Wê serdeçûyîneke baş ji bo vê jî çêbibe. Bi kinahî qadeke ku bikaribe pêşkeftinên baş bidest bixeye.

Li ser bingeha vesazbûnê dikarin birîmên xwe bişînin qadên nêz yên deştê jî. Ne mîna yên E. Dikarin kesên keşfdar û pêwendiyê bişînin. Yek jî newin ji jiyana wir re jî nebin amûr, dikare hinek erkdarên ku bikarin bilez hinek pêwendî-têkiliyan deynin û mirovan bikişînin li wir bidin bicîkirin. Di vê qonaxê de li wir gerîlatî hinek zehmete. Lê dikarin birîmên ku bikarin rêxistinkarên baş, îstîxbaratên baş û adayên nû pêş bixin li wir bicî bikin. Li ser vê bingehê dikarin di derbarê bajaran de xebatan hinek pêş bixin. Dîsa dema tê xwestin li ser bajarek serwerî bê çêkirin, ev bi hêzeke mezin re dibe. Hûn di rewşeke ku bikaribin van pîlanlameyan pêş bixin de ne. Di vê mijarê de hûn dikarin pêwîstiyên divê diyar bikin. Rêxistin di rewşeke bikaribe taqwiye bike de ye. Dîsa em di rewşeke ku bikaribin hemû pirsgirêkên

rêveberiyê çareser bikin de ne. Yê din jî ji we re dimîne. Di derbarê giştî de tiştek din ku bêjin heye?

**Çiyayê Sîpan**: Rêberê min tişteke din bêjîn nîne. Em ê li ser xeta Botanê baş bisekinin. Lê ji hêla din ve jî heval nikarin baş bikevin wê qadê. Heke ji du rexan ve xebat bê pêşxistin wê baş be. Em ê girîngî bidin qadê û li ser bisekinin. Dikarim van bêjim. Yek jî amadekariyên me yên konferansê hene. Di asteke girîng de li herêman civîn hatine çêkirin û amadekarî temam bûne. Di dema pêşiya me de em ê van jî bînin gel hev û hewl bidin raporên xwe yên pêwîst bi riyeke saxlem ragihînin. Dikarim van bêjim.

---.: Fam dibe. Bila ev hemû pêvajoyê bandor neke. Divê di nava xwezayîbûna pêvajoyê û li ser bingeha hêz bide hemû xebatan çêbibe. Divê bi awayê ku rê nede tengaviyan û demê negire vesaz bikin. Bi ser Başûr de çûyîn jî hûn ê gav bi gav û bi şêwazeke encamgir bimeşînin. Wê yên din jî bimeşînin. Êdî werz guncave. Li ser vê bingehê bawerim wê encam bigire. Yek jî hûn dikarin li ser hêmana Başûrê Rojava destnîşankirinek bikin?

**Çiyayê Sîpan**: Rêberê min, di wê mijarê de hinek agahiyên me çêbûn. Lê ez dîsa girêdayî rewşa kordînatoriya wir dibînim. Digihim encama ku ne bitenduriste. Di wê demê de li hember rêxistinê rewşeke wî çêbibû. Bawerim ev pêwendî piştre çêbûn, heta digihe rewşa Fatmayê. Dibe ev piştre pêşketibin. Hinek bingeha xwe ji rewş û helwesta wî digire. Dikarim van bêjim.

---.: Heta di serî de ne di asteke rêxistinkirî de be jî, bi awayeke ruhî rewşa wî hinek wisa bû û xwe dida peytandin, yanî dibêjin nêzîkatiyeke wî li hember rêxistinê bi tendûrist nebû. Temam, em ê temaşe bikin. We li rewşên dawî yên li Başûr temaşe kir û van axaftinan jî girt. Bi giştî hinek pêşkeftin hene û bawarim wê ev li ser wir bandoreke erênî bide çêkirin. Yanî ji avaniya bajarê wir bendewariya veguherînê heye. Ew kesîmên navîn hene; hûn jî dikarin ji wan re name binivîsîn. Ji nû ve efûkirina wan bigirin heta hîn zêdetir alîkarî kirinê, ev rêbaz dikare li wir bikeve meriyetê. Elîteke wir jî heye û divê hûn bikaribin wê elîtê bi ustatî binirxînin. Dîsa dibe ku tevlîbûna çîna navîn zêde bibe. Divê hûn bi nêzîkatiyên tên xwestin bersiv bidin. Divê hûn ji ew meseleya cerdevan û şêxan re nêzîkatiyeke guncav bidin raberkirin.

"*Pêwîstiya me bi raporên hîn şênbertir heye*"

Zaxros, hûn jî li me gudarî dikin?

**Derya Zaxros:** Pêşkeftinên siyasî yên dawî û îtîfaqan di asteke girîng de bandoreke zêde li ser girseya vir kiriye. Heke em hinek din li ser bisekinin, em ê bikaribin bikişînin nava rêxistinê. Nêzîkatiyên wan bi xwe erêniye. Lê yêkbûneke baş jî çênebûye. Di nava pêvajoyê de dema xebat jî hinek hat rûnişkandin, bawerim wê bikaribin bi temamî bikevin bin bandora rêxistinê ya siyasî. Rewşa wan hinek wisa tê dîtin.

---.: Fam dibe. Yek jî (jixwe we qal kir) hûn bi hêzeke sed kesî re bi awayeke qedemeyî bûyera fermandariyê pêş dixin. Yanî li wir wisa bi hêzeke biçûk xwe bi tenê hiştin yan jî bêqedeme bûyîn neraste. Erdnîgariyê jî girtina ber çav kademeyên navber bicîkirin mûmkûne. Dema ev hat pêkanîn, wê fermandariyên ku dijmin wisa zû nikaribe bigihiyê ava bibe. Hinek li gorî vesazbûna biryargehê hûn ê vesazbûna hêza xwe wisa bikin. Yanî êrîşeke dijmin yê muhtemel divê qedemeyên dereceya duwem yan jî sêyem bersiv bidin. Rasterast neketina navendeke pevçûnê girînge. Dîsa ji bo êrîşên hewayî jî, divê her tim stargehên we yan jî cihê lê bicî bibin jixwe heye. Dibe ji nişkê ve êrîşên hewayî çêbin, wê ew wisa bên pêşwazîkirin. Êrîşên ku bejayî bên wê bi pêngavên duwem-sêyem re rûbirû bên. Êrîşên hewayî jî bi hêsanî dikarin li wir bên dîtin. Wê li wir serdehatineke rastî pêş bikeve. Ji ber vê vebûna ber bi Bakur ve girîngiyeke mezin îfade dike. Di vê mijarê de pîlansazî û vesazbûnên we hene. Yek jî pêwîstiyên deverên din jî heye. Çend qadroyên di asta jor de pêwîstin. Hûn dikarin di van mijaran de tiştna bêjin?

**Derya Zaxros**: Rêberê min rewşa hêza vir tê zanîn. A rastî hinek hevalên şer kirine, tecrûbe qezenc kirine hene, lê aliyên wan yên polîtîk zêde pêşkeftî nîne. Yanî hevalên polîtîk kêmin. Ji bo ji destpêkê ve yên li vir bûne herî zêde Botanî bûne. Yanî hêjmara hevalên polîtîk ji bo me jî nebesin. Niha me bi hêjmareke heval re peywirdarkirineke diyar kiriye. Di vê mijarê de bawer nakim tengaviyek derbikeve. Yanî hevalên xwedî ezmûn hene, lê hevalên xwedî asteke polîtîk kêmin. Ji ber vê, em dikarin di mijara hevalên xwedî tevcûbe de alîkarî bikin.

---.: Li gel we ji bo asteke jor zêdebûn heye?

**Derya Zaxros**: Di rewşa heyî de zêde nîne. Rewşa hevalê M. Yê bi me re hatî hebû, bawerim di derbarê rewşa wî de agahiyên

dawî gihiştibû. Jixwe bi xwe jî niha li herêma S. Di rêveberiyê de ye. Rêberê min, heke wê rewşa wî hevalî wisa bimîne, çawaniyek zêde nîne.

---.: Heke hevalê M. ji pratîkê ders derxistibe, di asteke pir jor de nebe jî dikare peywir bê dayîn. Heke li wir jî zêde fonksiyoneke wî nebe, dikare ji bo Ç. Sîpan bê fikirîn. Ji derveyî vê bawerim hevalên pijiyayî hene. Dîsa gelek hevalên ji Başûr hatine hene. Dikare li ser van bê sekinandin. Di vê navberê de wê bi wan re jî bê axaftin, li gorî pêwîstiyan kadroyek bê şandin. Bi kadroyek bihêz re pêwîstiya wir bi taqwiyekirinê heye. Yek jî li wir şervanên Botanî hene û bandoriya van jî mijara gotinê ye. Dikarin hinek şerkerên wisa wêrek û yeman bişînin. Pêwîstiyên wan yên esasî evin. Dîsa dikarin bi wan re nîqaş bikin hinek tiştan bişînin. Yek jî hûn girîngiya meseleya girtina wê navberê dizanin. Hevalên ku wir baş nasdikin hene; X. ew, P. ew, Ro. ew wir baş dizanin. Tişta dixwazim bêjim, yên qadê baş nasdikin hene û wê bi ser de biçin. Divê îsal encameke bê girtin.

Ji derveyî van, li Mêrdînê qala hinek pêşengan tê kirin. Nizanim dibêjin nehatina Ag. ya disiplînê heye. Hûn ê di vê mijarê de wê qadê hinek teqviye bikin. Tiştên tên zanînin; êdî ji biniyetbûnê zêdetir, bawerim naxwazin şêwazê jiyanên xwe yên tên zanin bişkînin û derbaz bikin. Divê hûn hinek li ser Mêrdînê jî bibandor bibin. Dikarin dem bi dem nîqaş bikin. Bi sînordar jî be, divê li ser Mêrdînê serweriyek bê pêşxistin. Em hewl didin GAP jî pêş bixin û wir jî bidîn bikaranîn. Hêz didin lê naparêzin. Bi riya vê xetê dikare li ser wir venêrînek çêbibe. Ji bo Garzanê hinek ji cihazên biçûk û mezin rêkin. Bi wan re baxivin, bi qasî pêwîstiyên wan rêbikin. Bawerim ji bo pêwendiyê pêwîst dike. Fam bû Zaxros?

**Derya Zaxros**: Belê, fambû. Ji bo Mêrdînê tiştên bi wî rengî me jî sehkir. Ji ber vê, koma em bişînin me ji nû ve vesazbûna wan girt dest. Yanî em komeke nêzî deh kesî û hevalên bikaribin rêveberiyê bikin ava dikin. Yek jî, hevalek dikare ji bo alîkarê kordînê bê tayînkirin. Pêşniyara me, birayê hevalê B. hebû, em wî hevalî guncav dibînin. A rastî hevaleke din jî xwedî tecrûbe heye, dibêjîn ew jî ji bo rêveberiya eyaletê guncav dibe. Em ê ji niha şûnde ji nêz ve bi Mêrdînê re hinek eleqedar bibin, ew temame. Ji bo Garzanê jî, arastî me hêza yêkîneyek li wir bicî kiribû. Yanî ne

ji bo şandinê, ji bo girtina wir. Lê ji ber çêbûna hinek zehmetiyan hîn ev mûmkûn nebûye. Li pêşiya me astengek cidî heye. Bawerim agahiya wî hevalî nîne. Dibêjin li wir tevlîheviyeke zêde çêbûye. Bawerim komek li wir heye, weke salên berê şêwazeke xebatê esas digirin. Heke destwerdana wan neyê kirin, li gorî me wê tiştek dernekeve û dibe darbe jî bixwin. Jixwe bi îhtîmaleke mezin di bin kontrolê de dixebitin. Pêwîste ji van mijaran re vekirîbûnek çêbibe.

---.: Ev kîjan kome, koma li Şîrvanê ye?

**Derya Zaxros**: Em komê baş nizanin. Lê li hawirdora gundên S. bicî bûne. Bawerim pêwendiya wan bi merkezê re jî heye. Yanî ev agahî bi riyên cur be cur ji me re hatin.

---.: Başe...

**Derya Zaxros:** Rewşa neserwerbûna li ser şêwaza xebateke rast tê jiyîn. Niha hinek agahî gihiştine destê me dibêjin li wir cî bi cî pertekên gel pêşketine, yanî di vê mijarê de paşkeftineke tê jiyîn heye. Niha nizanin rastîbûna vê mijarê heye yan na. Lê ji hêla wan ve şêwazê jiyaneke dixwazin bigirin, bi taybet bi israr disepînin heye. Tabî dibe niha ev şêwazê jiyanê xwe bide axaftin.

---.: Dikare pêwendî û têkiliyên hîn baştir bê pêşxistin. Em ê jî li ser rawestin. Dibe di dema pêş de em heval Ag. wan bi awayeke demkurt bigirin. Jixwe tendûristiya wî jî hinek ne li ciye. Piştî taqwiyeyek hat kirin şûnde, em ê yên wisa bi israr nayên jiyanê dikarin bifikirin. Lê pêwîstiya me bi agahiyên hîn rastîbûn heye. Divê li ser mijara şêwazê jiyankirina wan agahiyên hîn rastîbîn bê girtin. Ji yên din re jî dibêjim, pêwîstiya me bi raporên hîn şênbertir heye û em ê raporên bi vî rengî bixwazin. A rastî şêwaza rapora me ji hemû koordînasyonê xwestî ev e: Divê rojane rapor di derbarê çawa jiyan kirine û çiqas têkoşîn kirine de pêş bixin. Li gorî min tenê ne koordînasyon jî, ji fermandariyên hîn jêrtir jî divê rojane raporên şênber bên girtin. Wisa ne li gorî îzahên teorîk, rojane çawa jiyan dikin û çawa kar dikin bi awayeke şênber binivîsin. Yanî wisa bi şêwazê "*min evqas perwerde kir, evqas rêxistin kir, wisa jiyan kir, wisa kar kir*" be. Divê nivîsandina raporan bînin rewşa kevneşopiyeke. Mesala, rojê çend demjimêrên xwe çawa dide xebatê, çiqas propaxanda û rêxistinbûn çêdike, çiqas talîmat pêş xistiye, çend pêwendî daniye, rojane kesên pê re pêwendî danîn kine û hwd.

Yek jî me tişteke din jî diyar kir: Kes tena bi serê xwe di nava pêwendiyan de nabe, hemû pêwendî herî kêm bi du kesan re wê bê meşandin. Yanî herî kêm bi du kesan re bimîne û bi du kesan re baxive û hwd. Niha hûn ê vê pêş bixin. Wê hemû fermandar vê tekbûnê rake. Vê jidil destnîşan dikim. Berpirsyarek di çi astê de be divê li gel her yek ji wan alîkareke wî hebe. Hemû xebat bi alîkar re pêş dikeve, bi alîkar re xilas dibe. Ev, rêgeza rêxistinîbûna xebata raste û bi mîsogerî divê bê sepandin. Ji ber, biqasî min bihîstî, hewl didin bi tenê bimînin. Ev, tê wateya hewldana ji bin venêrînê derketine. Ew unsurê li Başûrê Rojava jî wisa kir û tahrîbat jî li ser wê bingehê kur kir. Ev dîsa yê li Stembolê jî kir. Hatina rewşa tenê, yanî tenê mayîn. Dema tenê dimînin ji derveyî venêrînê dimînin. Dema ji derveyî venêrînê jî dimînin hemû nêzîkatiyan derdixin. Bawerim di herêmê de hinek ev heye. Pêşî li riya vê girtin ev e: Tu kes, bi taybet yên rayedar wê bi tenê nemînin, herî kêm wê li gel kesek hebe, dema dirazê diravê hemû tevgerên wî wê bi alîkarek ve bê kontrolkirin. Vê jidil destnîşan dikim. Ev, amûreke girîng yê venêrînê ye. Him jî dema rewşeke tengav çêbû wê alîkar bikeve dewrê û tiştên pêwîst bike, him jî dikare pêşiya hinek kedkarî û rewşên nebaş bigire. Dibêjin ev pir girînge. Bawerim hinek fermandar vê îhlal dikin. Bi mîsogerî qebûl nakin. Vê bidilxweşî diyar dikim. Wê ji yek kesî re cudahiyeke wisa taybet neyê kirin. Wê yêk kes xwe nexe rewşa bi tenê. A rastî me ji ber vê gelek derbe xwar û ziyanê dît. Bi girîngî vê destnîşan dikim ku di vê ji niha şûnde êdî kes vê nedomîne.

Raporên ji me re bên şandin, raporên ji kademeyên jor re bên pêşkêşkirin, divê bi temamî di derbarê jiyana rojane û xebata şênber de be. Yanî şîroveyên teorîk, nirxandinên giştî, darêzgerî û suçdarkirin neraporin. Te çiqas jiyan kir, çiqas zilam perwerde kir, çiqas talîmat dan, çiqas pêwendî danî, çend kes bûn, bi kê rê pêwendî danî, bi kê re çawa jiyan kir û çiqas perwerde da? Em raporên wisa şênber dixwazin. Divê rapor li ser vê bingehê bên pêşxistin. Hûn, hemû kademeyên berpirsyar, çi raporên xwe yên şexsî û çi jî raporên qedemeya jêr bi vî awayî pêş bixin. Ger pêwîst bike pêşnûmeya raporeke nû pêş bixin. Li gorî min hêjaye mirov pêşnûmeya raporeke nû pêş bixe. Li gorî ev tecrûbeyên dawî pêşnûmeya raporeke nû dixwazin. Di raporên heya niha ji

me re dihatin de nirxandinên bi her şêwayî, pir zêde gazinc û pir suçdarkirin hebû. Ev, feraseteke bê berpirsyar ya raporê ye. Em dixwazin ev feraseta raporê ji holê rakin. Li gorî min çi ji bo hemû avaniyê, çi jî ji bo kademeyên qomîteyê pêşnûmeya raporek pêş bixin. Di mijara raporeke rastîbûn divê çi bigire nava xwe di nava xwe de jî nîqaş bikin û li ser vê bingehê ji nû de kargeriya raporê çêkin. Bi vî rengî ji bo ji me re jî raporên wisa rastîbîn bên. Û divê raporên herkesî jî hebe. Henekan raporan jî pêş nexistin. Dubare destnîşan dikim, li gorî serdema nû yên van xususan îhtîwa dikin divê li ser bingeha pêşnûmeya nû raporan pêş bixin. Fam bû Zaxros?

**Derya Zaxros**: Fam bûye Rêberê min.

“**Divê keseke bi tenê jî bêkar neyê hiştin**”

---.: Cuda tişteke diyar bikin heye?

**Derya Zaxros**: Tişteke din cuda bêjîn nîne. Lê dixwazin di derbarê rewşa dijmin de agahî bidin. Nêzîkatiya li hember gundên Gabarê tê zanîn. Ji derveyî vê helwesta li vir hinek li gorî agirbestê tevgerîne. Yanî di vê demê de tevgerek wisa bikeve çav çênebû. Dîsa rewşa hinek qereqolan rakirin heye. Mesela li Qilabanê rakir. A rastî vir şûneke stratejîk bû. Dibêjin wê hinek qereqolên din jî rakin. Li gorî me dibe ev amadekarî ji bo serdeçûyîna taxtîkeke nû be. Herî zêde hêza xwe li merkezê komkirin, siftkirin, ji rewşeke sabît derxistin anîna rewşeke tevgerdar û bi vî rengî dibe taxtîka ji rewşa bûna hedefê derxistin be. Amadekariyeke bi vî rengî heye. Yek jî, di vê qada me de hinek gundên beriya niha hatibûn valekirin hebû. Niha em dixwazin van gundan bikişînin. Jixwe gundî bi xwe dixwazin bên. Hinekan serî li dijmin daye û destur girtine. Yanî bi taybet li Besta dibe hinek deverên cîwarbûnê çêbibin. Ev xusus hebûn. Ji derveyî vê tişteke din nû bêjîn nîne.

---.: Dibe pêşveçûnên bi vî rengî çêbibin. Jixwe dema me daxuyanî da wê fam bikin. Em ê bêjin ku agirbest wê yek alî nebe, em ê bersivên bihêz bidin êrîşên li hember me pêşdikevin, heta em ê êrîşên hemberîdan jî pêşbixin. Em ê diyar bikin ku wê ev ji berê hîn dijwartir bibe. Heke ew di mijara agirbestê de cidî bin û dixwazin hinek gavan bavêjin, bawerim wê zêde wesftirîn bibin. Wê deng ji bicîbûna gundiyan re dernexin. Wê dawî li ev abluqa û tiştên dişibin wê bînin. Dîsa dibe ew rêbazên em dizanin

yên şerê taybet kêm bikin. Dibe ev rewş çêbibin. Tabî ne mîsoger e. Di van mijaran hemûyan de divê di nava çavdêriyek de bibin. Di vê mijarê de alî hinek di rewşa hevdu ceribandinê de ne. Yanî ew me diceribênin, em jî hinek wan biceribênin. Yanî wisa ne lihevkirinek, bi temamî bi îradeya xwe ya azad nirxandina rewşê heye. Bi awayê ew çiqas rastîbînin, em çiqas rastîbînin jixwe nirxandineke giştî jî heye. Herkes hewl dide vê rewşê hinek bibîne û binirxîne.

Weke min gotî, nêzîkatiyên me diyarin. Em di xeta xwe de dimeşin. Di vê navberê de hevgiriya wan dihesibînin. Bi taybet mijara agirbestê girînge. Wê îhlal çawa çêbibin û wê helwesta me li hember van îhlalan çawa be? Ya yekem ev e. Ya din jî, agirbest dibe yan jî nebe xebatên me yên birêkûpêk hene û wê ew bimeşin. Yanî heke agirbestê pêk bênin jî, hûnê li berfirehiya wê belav bibin û bi kûrahiya wê bixebitin. Wê bi awayeke bûna niv-dewlet bimeşe. Venêrîna girseyê, perwerdeya wê, rêxistinkirina wê, rêxistinkirina artêşbûnê; ev hemû pêywirên ku di bin ti mercan de paş ve neyên avêtinin. Hûn ê di rewşeke mezin ya vesazbûnan de bin. Hêza we zêde nehatiye perwerdekirin, hûn ê wan pir perwerde bikin û heya bêjî kur bikin. Gelek xususên dişibin vê hene. Wê serdem ji vê re derfet bide û hûn ê vê binirxînin. Dîsa hêjmareke zêde avaniya jin hebû. Li gorî min wê ew jî li gorî yêkîneyan bên birêxistinkirin. Divê wan jî bênin rewşa yêkîneyên şer. Ew jî ji bûna pirsgirêkê zêdetir, wê veguherin komên alîkariyê didin. Êdî wan anîna rewşa şer, milîtaneke rastî kişandina nava jiyanê û divê li gorî vê vesazbûnek bên çêkirin. Rastiya kesayetên xwe ancex milîtaneke wisa dikarin di nava jiyanê de bibînin.

Divê hêmanên di nava avaniyê de giranî çêdike êdî nemînin. Avaniyê bi temamî xwe li gorî şer amade û vesaz kiriye. Weke min gotî, wê ji herkesî re erk bê dayîn û şervaneke tenê jî bê kar nemêne. Dema mangayek tê vesazkirin, taximek tê vesazkirin, bi qasî karên giştî, wê karên taybet yên ev bînin cî jî hebin. Dê ji bo herkesî di nava yekbûnê de kargeriyek bê dîtin. Destûrnameyên bikitekit yên hûn pêş bixin û talîmat wê bi awayeke herkesî bide xebitandin pêşbikeve. Karên ku herkes bikin hene. Divê em jibîr nekin ku, avanî niha ji sedî not bêkare. Tiştên fêr bûne nadin fêrkirin, nadin sepandin û di asteke mezin de rewşa valederxistinê

jiyan dikin. Belê ev vale derxistin pir bixetere. Ev bi xwe re çiqas bar tîne û rê li bernebaşiyê vedike li ber çave. Di vê mijarê de hinek ser êşandin pêwîste. Ji bo herkesî şêwazê xebata herî berhemdar, di nava yêkîtiyê de herî baş bûyîn û şêwazê jiyînê çiye? Divê bersiveke baş ji vê pirsê re bê dayîn. Yanî kapasîteya wî çibe, erka ku bêne cî çibe, bi mîsogerî divê wê pêşkêş bike. Divê keseke tenê jî bêkar neyê hiştin. Hêzeke pir mezin tê valederxistin, vale tê derxistin û dixin nava bendewariyê; ti tevger nikare vê bi vî rengî rake. Herkesî dana karkirin, rêgeza rêveberiya raste. Û hemû qad berpirsê pêkanîna vê ne. Şêwazê komîteya berê, bûye şêwazê avaniyê dana sekinandin û şêwaza neyê bikaranîne. Bi ti awayî qebûlkirina vêşêwazê nepêkane. Her kêlî û li her derî karên bên kirin hene û dîsa karên herkes bike heye. Yê ku vê rast vesaz dike, tê wateya ku rêgeza rêveberiyê rast pêk têne. Zaxros, fêm dibe?

**Derya Zaxros:** Belê, fêm dibe Rêberê min.

---.: Em xetên giştî xêz dikin û pêkanîna wê ji we re dihêlîn. Belê em ê encama pêkanîna van sepandinan bibînin. Hûn vesazbûna hêza xwe ya mezin dibe bi awayeke rastîbîn li her çar hêlan belav bikin. Yanî belavbûna li ser qadan didomînin. Di vê mijarê de pêwîste ti xeta nebin. Pêwendiya we bi hêza Rojhilat re heye û venêrîn pêş dikeve. Bi awayeke pir rastîbîn û nirxandinên rojaneyî re pêşve dibin. Dikarim van diyar bikim. Tişteke ku hûn bêjin heye.

**Derya Zaxros**: Tişteke din cuda nîne Rêberê min.

---.: Hûn ê ji 44'an jî hêz bigirin. Hûn dikarin li ser rewşa hêza hatî ji we re hinek nîqaş bikin. Wê ew hêz bê ji Derya Dîcle û Derya Sor re; hatin nehatin hûn ê wan bigirin û bi rêyên cuda hewl bidin bigirin hûndir. Dîsa hûn ê hewl bidin bi rêyên cuda hêzên li Başûr bigirin hûndir. Di vê mijarê de jî wê pêwendiyên we çêbibe. Êdî di vê çarçovê de kar dikare pêşve biçe. Ji ev eşîrên cihî jî hêz girtin bidomînin. Bi taybet ji hêla Wanê ve hinek hêz bigirin. Di qada Wan-Çatax de pir eşîretên cihe hene, hûn dikarin ji wan eşîran hîn zêdetir hêz bigirin. Yanî tenê ne ji der ve, ji xwecihiyan jî hinek hêz girtin dibe guncav be. Tiştên diyar bikim ev in.

Derya Kesk, we jî li me gudar kir?

**Derya Kesk**: Gudar dikin Rêberê min.

---.: Me di derbarê rewşa we de hinek nîqaş kir. Li ser vê bingehê vesazbûn tên çêkirin. Dibêjin hinek pirsgirêk derdixin. Rewşa GAP jî dişibe vê. Me ji wan re cîhaz şand, bawerim wê pêwendî çêbibin. Divê êdî mirov wan derbazî ser xeta tê zanîn bike. Hûn bi Zaxrosê re di nava pêwendiyeke baş de ne. Bawerim beriya niha we qala rewşên li B. yê dikir. Jixwe koma G. li wir hatibû girtin. Dibe birîmên we bixebitin. Divê xebatên li deşta O B. yê hinek bên dîqatkirin. Biqasî bigihin Bakur digihinê. Tê gotin ku birîma li dora S. hinek xeter jiyan dike û divê ji nû de bê vesazkirin. Çiyayê Sîpan vê dizane. Raste, ew bîrîm hinek darbe jî xwar. Ew seqet dixebitin, şaş bicî bûn, derbaseya gund û bajaran bixeter bû. Yanî pratîka ji berê ve dihat jiyîn û divê careke din rê ji wê pratîkê re neyê dayîn. Me riya çareseriya wê jî got; dikare keşfdar û rêxistinkar bê rêkirin. Gerîlatî wisa nayê kirin. Bêguman Çiyayê Sîpan tedbîrên vê digire û hûn tedbîrên mîna vê digirin. Yê ku ev jiyana taybet evqas dipejirîne kî ye? Piştî teqviyekirinê şûnde wê ev hinek sererast bibin. Em ê li hember yên bi israr dixwazin ji derveyî ev çarçoveya me gotî jiyan bike, tedbîrên tund bigirin. Fam dibe.

**Derya Kesk**: Raste Rêberê min, fam bû. Tabî qismeke rexneyan raste. Dikarim rewşeke kurt diyar bikim. Me di derbarê wê mijarê de rapor nivîsand, wê di nêz de bigihe. Pirsgirêkên vê eyaletê ji destpêkê ve tên zanin. Bi taybet ji rêveberiyên eyaletê heta fermandarên wan di hemûyan de, ji destpêkê ve rewşa tê jiyankirin, tenê ger heye. Me vê di asteke girîng de şikand. Dîsa di wê baweriyê de me ku me jiyana xwe dispêre gund di asteke girîng de şikandiye. Lê, bi taybet gerên bi maşînan û jiyana xwe dispêre gund pir bi bandorbû û bandora vê hîn heye. Yanî nabêjim me bi temamî şkandiye. Di vê derbarê de tengaviyên me yên diyar hene û li hember jiyana xwe dispêre gund di nava têkoşînekî de ne. Di vê mijarê de zehmetî jî hene. Biçûkbûna birîman û pirsgirêkên me yên rêveberiyê me hinek tengav kir û hîn jî tengav dike. Hinek kesayet hene, bi taybet hevalên me navên wan diyar kirî nûnertiya şêwazê jiyana xwe dispêre gund dikin. Jixwe bingeha pirsgirêkên di navbera me de xwe dispêre vê. Heke di asta rêveberiyê de hinek taqviye çêbibe, bawerim wê pirsgirêkeke me zêde nemîne. Yanî bi wê baweriyê me. Bi kinahî di derbarê vê mijarê de vê dibêjin. Yek jî bi GAP'ê re jî

pêwendiya me heye û pêwendiyên me didomin. Li wir kombûneke berbiçav tê dîtin.

---.: Me jî hinek taqwiye kir, bawerim wê ew tişta tê xwestin bikin. Weke min gotî, dibe ku di dema pêş de hinek ji ber tendûristiyê û hinek jî li ser armanca hêz dayînê heval bigirin gel xwe. Em ê him hinek bihêz bikin, him jî bidin vehesandin. Tabî ne niha di dema pêş de dibe bê fikirîn. Hûn dikarin pêş bixin, çi ev vesazbûna raporan a dawî û çi jî sepandina pratîkî ya li gorî naverokê encam bigire…

Derya Sor, tişteke ku hûn bêjin heye?

**Derya Sor:** Na Rêberê min. Tişteke nû bêjîn nîne.

---.: We jî nevaroka vê çarçovê baş fêm kir na? Yanî hîn zêdetir we rexnekirin pêwîst nake. Ji ber we hemûyan kir. Êdî bi xistina meriyetê re rû bi rû ne. Bawerim hûn ê vê carê nexapin û me jî nedin xapandin. Fam dibe na?

**Derya Sor:** Fam dibe Rêberê min.

---.: Weke min gotî, hûn ê ew meseleya quweta zêde ya karê derbaskirina Garzanê, bi diyaloxên berambar bi awayeke herî baş temîn bikin. Hûn ê ew vesazbûna quwetê pir baş bikin. Bi mîsogerî vesazbûnên mîna berê yên rê li ber revê vedikir çênebe. Ev pir girînge. Heke hûn weke berê sernekeftî bibin dibe dawiya we bîne: Vê bi îhtîmam destnîşan dikim. Heke mîna berê ew fermandar yêkîneyên xwe xerc bikin, wê xwe jî xerc bikin. Divê herkes vê baş bizanibe. Tevlîbûna dildar, tevlîbûna bi zanebûn ya heya dawî şer dike û tevlîbûna jidil û can esase. Ev kar bi disîplînên bê dilê xwe re nameşe. Hûn dizanin vê rê li ber gelek revan û windahiyan vekiriye. Bawerim tedbîrên we yên bingehîn wê encam bigire. Em vê ji we dixwazin.

Deryayên bixwazibin bi me re baxivin heye?

Îro ev nirxandin besin. Di rojên pêşiya me de dibe em yêk-du nirxandinên encamgirtinê bikin. Di vê navberê de dibe hinek hevdîtin pêş bikevin. Êdî diyare nerînên we jî di vê çarçovê de ye. Hema bêjin xebatên li hemû qadan ku di her astê de me venêriye, derket holê ku ji vê hêlê ve mîsoger yêkbûna taxtîk dijîn. Lê divê mirov bizanibe hinek din bikitekit û hinek din afîrînêr be. Beriya niha jî dema me taxtîk diyar kir pêwîst bû we hema fam bikiriba. Bêyî biketiban nava evqas kitekitan jî dikariyan ji hinek helwestan encam derbixistiba. Ev asta we heye. Ji ber vê, pir ji


şûn ve nêzbûn, dibe rê li ber nepêşveçûna hinek pratîkan veke. Nebawerim hûn carekedin vê jiyan bikin.

Aliyê pêşkeftinên heyî û îhtîmalên pêşkeftinan bi awayeke giştî diyare. Di vê ti heval nebêje,(min pêşkeftinên heyî kêm fam kir, ev rê li ber paşkeftinê vekir). Pêwîste xwe jî me jî nexe rewşeke tengav. Rewşeke wisa nîne û hemû tiştên hatin gotin fambarin. Lê taxtîk jî meseleyeke afirîneriyê ye. Di vê mijarê de hûn ê bizanibin xwe biwestînin. Hûn ê hinek bi nîqaşê û hinek jî bikevin nava hûrgiliyê. A rastî heta ev çarçove jî zêdeye û hatina vir wisa hêsan çênebûye. Bi têkoşîneke pir berfireh re hetina vir çêbûye. Ev encama têkoşîneke pir dirêje, divê bi çavê bû-xilas bû neyê temaşekirin.

Em jî her roj xwe tengav dikin. Bi rastî jî zehmetiyên herî mezin di vê demê de jiyan dikin. Ji bo rê li ber xetaya helwesteke neyê vekirin vê dikin. Heke hûn layîqê vê bibin, hûn ê bikaribin encamên baş bigirin. Bi lezgînî xwe komî serhev bikin. Hûn gihiştin kişwereke bêhempa û navendên bêhempa. Jiyana herî baş jiyana hûn jiyan dikine. A rastî divê bi vê jiyanê neyê lîstîn. Bi mîsogerî dibêjim ku, riya jiyanê ya yegane bi rastî di wir re derbaz dibe. Hûn ê bixwe jiyanê di wan qadan de azad birêxistin bikin. Weke min gotî, ne ku biçin li wan deren bigerin, ji bo bibin îqtîdar derketine. Ji bo bi temamî jiyana gel serbixwe û azad bikin derketine. Gihiştin qonaxeke vê ya girîng. Pêşkeftinên heyî êdî pêkhatina vê dide nîşan. Bi kinahî wê layîqê vê bibe û mafê wê bê dayîn. Zehmetî her tim hene. Yanî ev zehmetî piştê rizgariyê jî hene. Ev hemû, divê ji bo me nabe sedema sekinandin û xwe tinekirinê. Tempoya me ya xebatê û afirîneriya me ya her çarê di meriyetê de ye. Mîna her çarî, pratîka qezenckirina tiştên me winda kirî di meriyetê de ye.

Li ser vê bingehê careke din ji we hemûyan re serkeftinê dixwazin. Li gel rêz û heskirinan.

**14 Nîsan 1993**



*“Çi ji bo mafên demokratik, çi jî ji bo mafên netewî di siyasetê de azadbûn, xebatên siyasî yên azad meşandin, rêxistinbûn, partîbûn, enîbûn, ev di ewleya zagonî de û di nava ewlekariyê de pêkanîn çêbe, elbet dê wateya serî li çekan dayînê jî nemîne.”*

*“Ev têkoşîna çekdarî ya ku PKK’ê meşandî ger tundiyek korane ya ku armanca xwe ya siyasî nebûya, li gorî hema bêje koalisyona cîhanê li ser hatiye sazkirin û li hember hêzek artêşê ya giştî ye, nedikariya evqasî li ber xwe bide. Ger nebûya amûra raveyek siyasî, wê teqez ev têkoşîna çekdarî di nava çend mehan de têk biçûya.”*

*Hevpeyvina rojnemevan Hesen Cemal û Remezan Öztürk ya dîroka 15'ê Nîsana 1993:*

**BÊÇARESERIYA PIRSGIRÊKA KURD BÊÇARESERIYA DEMOKRASIYA TIRK E**

**Hesen Cemal**: Pirsa destpêkê tê aqilê mirov çima agirbest û çima bi agirbestê re tabî lêrastanîna dema wê jî dikeve navê.

**Abdulah Ocalan**: Têkoşîna çekdarî, mîna pirî caran hatî gotin, ji bo polîtîka bi amûrên cur be cur tê meşandin mîna amûrek tê tarîfkirin. Bi temamî dîrokî, di çarçoveyeke sosyal û siyasî de heke bi têkoşînek aşitiyane çînek, netewek û heta hindekiyek, îfadekirina berjewendiyên bijarteyek û derfeta meşandina wê nemîne wê çek bên rojevê û bi vî rengî têkoşîna çekdarî, mîna îfadeya polîtîk ya herî giran derbikeve pêşiya we. Dema bûyera agirbestê dinirxînin ez ê balê bikişînim ser vê pênaseyê. Li Tirkiyê tenê ne di çareseriya pirsgirêka netewî de, di mijara çareserkirina gelek problemên demokratîk de jî tundî, ji hêla dewletê ve mîna rêbazeke bingehîn tê pejirandin û li hember lebateke herî biçûk yê demokratîkbûnê weke amûrê bêdengkirinê tê sepandin. Kî çi dibêje bila bêje, li Tirkiyê îdaya demokratîkbûnê çiqas bê gotin bila bê gotin, hîn jî dewlet tundiyê pir zêde dihêwirîne û kirina polîtîkayê asteng dike.

– Yanî hûn dibêjin têkoşîna polîtîk asteng dike?

---.: Belê, bi mîsogerî wisa ye. Di mijara pirsgirêka netewa Kurd de, tenê bi têkoşîna astengkirina rêbaza siyasî re namîne, di heman demê de gelek polîtîkayên ku hebûna netewek dide peytandin, armanckirina tine hesibandina nasnameya wê û li gorî

van polîtîkayeke pir cuda-*ku ji aborî, çandî û civakî bigirin heta di her qadê de siyasetê neqebûlkirin, hemû polîtîkayên hatî diyarkirin*- bi tundî dide sepandin. Bila daxwazên gelê Kurd li vir bimîne, ji polîtîkayeke ku tenê îmhayê raber dike tişteke din nabe mijara gotinê. Divê hema diyar bikim ku, a rastî li hember demokratîkbûna li Tirkiyê jî bûyerên wisa zehmet hene. Dikare li ser vê pir bi berfirehî bê sekinandin. Çi pirsgirêka Tirkiyê ya demokrasiyê û çi jî di çareserkirina pirsgirêka netewî de pêşkeftineke herî biçûk bi cezayeke mezin bersiv girtin, bûye sedema têkoşîna PKK'ê ya çekdarî.

– Belê, heke em ji gotina we bikevin rê, dîsa lêrasthatina vê agirbestê derdikeve pîlana pêş. Yanî çima we di deme wisa de biryara agirbestê da? Tişta vê di we de şiyar kir çibû? We kîjan pêşkeftinan dît?

---.: Têm ser wê. Ji bersiva pirsa gelo wê deriyeke şansê ji polîtîkayê re vebe û ji riya çareseriya polîtîk re deriyeke vekirî bê hiştin, li ser vê me ev gava dawî avêt.  Hewl didin beriya agirbestê, agir tê çi wateyê îzaha wê ji we re bikim. Ev têkoşîna çekdarî ku PKK dide meşandin, heke tundiyeke kor bê armanceke siyasî bûya, hema hema li ser koalîsyona cîhanê hatiye temînkirin û li gorî ku hêzeke artêşê li beramberî wê ye nedikarî evqas li ber xwe bide û heke ne amûrê îfadeyeke siyasî ya pir zêde bûya bi mîsogerî wê ev têkoşîna çekdarî di nava çend mehan de bixeniqîba. A rastî pêwîstiyeke pir zêde bi çareseriyeke siyasî heye. Lê dîsa ev riya çareseriya siyasî evqas bi tundî hatiye astengkirin. Lê PKK'ê jî bi cihê herî girîng girt got; "*madem te vê riyê bi tundî girt, ez ê jî bi tundî vê riyê vekim.*" A rastî ji bo pir di cî de û mafdar bû kariya encam bigire.  Yanî riya siyasî ya bi çekê hatî girtin bi tundiyê bersiv dayîn, cerabandina vekirina wê riyê ye. Li gorî min ev jî rastiyên diyar derxist holê. Ev çibû? Peytandina hebûna Kurd bû. Ev mûmkûn nebû lê têkoşîna leşkerî vê derxist holê. Qebûlkirina nasnameya Kurd bû û ev jî têkoşîna leşkerî pêk anî. Dîsa girêdayî vê meseleya mafên netewiye; ev amûr, vê jî anî rojevê. Tişta dixwazim bêjim, gihand hinek encaman. Weke di demên dawî de hatî dîtin, hawirdorên Tirkiyê yên fermî û heta gelek hawirdorên artêşê neçar dimînin pirsgirêkê qebûl bikin û li ser hinek vebijêrkên çareseriyê dixebitin. Çiqas rast û hevgirtiye; ew meseleyeke cuda ye. Lê pirsgirêkê xwe daye

qebûlkirin. Wiha tam jî di vê qonaxê de em vê dibêjîn: Gelo bêyî ku rê li ber şereke tund yê çekdarî û rageşiyeke pir zêde veke, yanî di wateyekî de hinek jî nermkirin em ê bikaribin vebijarka siyasî pêş bixin? Nabêjim wê bi temamî vebijêrka siyasî rist bilîze; lê bi qasî vebijêrka têkoşîna leşkerî dibe ji vebijêrka siyasî re jî şansê çareseriyê bê dayîn? Ji bo ji vê pirsê re vekirîbûnek bidin qezenckirin me serî li vê ceribandinê da.

"*Li ser bingeha pêşkeftina me jiyan kirî, ji bo şanseke bidin rêbaza siyasî me ev gav avêt*"

– Başe dikarim vê bipirsim? Niha şansek dayîna vebijarka siyasî yan jî nedayîn îsal hat rojevê. Lê we, sala par di van deman de, yanî di Newrozê de bangawaziyeke raperînê kir. Lê beriya wê, yanî dema hikûmeta DYP-SHP hat avakirin, Celal Talabanî pêşniyareke dişibe agirbestê ji we re kiribû. Piştre ev di çapemeniyê de jî hat peytandin. Dîsa ev hikûmet, di wê demê de bi devê serokwezîr qebûlkirina realîteya Kurd hatibû ravekirin. Başe wê demê, yanî beriya du yan jî dusal û niv çima we derketinek wisa nekir? Çima helwesta we ya wê demê îro veguherî vê? Çima we wê demê biryara agirbesteke wisa neda? Bixwazî nexwazî, di nava ev dema derbazbûyî de nîqaşên çima hûn hatin vê tên kirin. Di nava sal û nivek de têkoşîna we ya bi biryar we anî vê radê? Yanî beriya sal û nivek ma hûn bawerdêr nedibûn? Sedema vê çiye? Çima ne beriya sal û nivek, niha?

---.: Fam dibe. Sedemên cuda derdiketin pêş. Beriya hertiştî, wê demê hikûmet nû ava dibû. Dîsa pêşniyara Celal Talabanî ji me re anî ne mîna ya îro bû. Bi awayê "*çekan berdin biçin Enqerê, teslîm bibin, dikarin giyana xwe xilas bikin*" bû. Ya rastî, em neketin rewşek ku girîngî bi vê nedin. Heke dîqat bikin, Demîrel-Înönü wê demê nû hatibûn ser peywirê û me hema wan bi tundî pêşwazî nekir, me şansek da. Me vê bi hinek rojnamevanên bi me re hevpeyvîn çêkirin re danî holê. Lê bersiva ku hikûmet dayî birastî jî pir vekirîbû û li gorî me ne hikûmet, bizat biryara yên şerê taybet didin meşandin bû û ew jî îmha bû; ev ji bo me pir vekirîbû. Hêza me ya wê demê jî hinek lewaz bû. Hemû polîtîkayên pêk dihatin, çi hûndir çi jî derve li ser bingeha PKK'ê di dawiya 1991 û 1992'an de îmhakirin bû. Dema em ber bi Newrozê ve hatin, jixwe hemû zivistanê bi topbaraneke pir zêde derbas bû, ketibûn nava tevgereke termisandinê û derfeta

îfadeyek biçûk jî nehatibû naskirin. Ji derveyî xweparastinê li pêşiya me hertişt girtibûn. Me pir baş dizanî ku, dixwazin hebûna me tasfiye bikin. Ji ber vê pirsgirêkeke wisa nedihat aqilê me. Jixwe têkiliyên cepheyê Başûrê Kurdistanê yê bi Enqerê re bi temamî di bin kontrola Enqerê de û bi Avrupa re jî kirina yek li ser bingeha teslîmgirtina me bû. Yanî derfeta lihevkirinek nedida. Me jî ziravê xwe kire devê xwe hewl da ev pîlana tasfiyê vale derxin. Bêguman ev di Şerê Başûr de hat ceribandin. Ew şer ne tasfiyekirina me, da diyarkirin ku ev polîtîkaya tasfiyê ya di derbarê me de tam negihişt encamê. Hêzên Kurd yên Başûr jî neçar man vê bi vî rengî qebûl bikin. Yanî ne tasfiyekirina şoreşa me, li ser bingeha lihevkirineke nêzîkatiyeke raber kirin. Me vê zivistanê bi awayeke hîn şênbertir dît.

Dîsa hikûmeta Demîrel-Înönü ya bi awayeke awerte giranî didan şerê taybet, derket holê ku di nava wexteke 500 rojî de nagihe encamê. Heta lewazkirina me bi operasyonên hundir û derve re deynin aliyek, ketin feqê ku bi qasî ti deman re nayê qiyaskirin bihêz bûne. Yek jî birastî di encama xebatên me di zivistana 1992’an de kirî û bi taybet bi nirxandinên destpêka 1993’ê re em gihiştin encama ku me hêza xwe parastiye û hêza xwe pêşdixin. Dîsa me dît ku rewşa gel di asta bûna bingeha partî de ye. Dema em dihatin Newroza 1993’an ev nirxandin mîsoger bibûn. Yanî artêş, serkeftina ji şerê taybet dixwest bidest nexistibû. Hikûmetê dît ku, ev polîtîkaya daye meşandin wî aniya radeyek binxistinê. Dîsa serokomarî jî, ji berê de ferq kiribû ku ev polîtîka di nava bêçaretiyê de ye. Hêzên Başûrê Kurdistanê, ketibûn ferqa divê bi me re di nava lihevkirinek de bin. Bawerim raya navnetewî jî qewla dabû Tirkiyê heya bihara 1993 bû. Ji wir jî zextên pêş diketin mijara gotinê bû. Ya herî girîng jî me yêkîtiya gelê xwe çêkiribû; bi pêşengtiya rêxistinê ve hatibûn girêdan. Gerîla baş li çiya bicî bibû û tinekirina gerîla êdî nemûmkûn bû. Wiha me van nirxand û di vê çarçovê de Newrozê hinekdin li gorî bendewariyên gel û bi aşityane derbazkirin bû, dîsa ji bendewariyên hawirdorên Tirkiyê yên demokratîk û raya navnetewî re guncav girtin û ji bo dayîna şansek serî li pêşxistina gavek wisa da.

Hinek vê gavê wisa nirxandine. Bi taybet ziyareta birêz Talabanî ya li Enqerê vê pir destnîşan kiribû: *“PKK di vê mijarê*

*de cidî ye? Yan jî Apo taxtîk dike?*” Halbikî têkoşîn jixwe taxtîke, taxtîk her tim tê kirin. Lê ev taxtîk taxtîkek cidiye û li gorî min xizmet ji polîtîkbûnê re jî kiriye. Di ciheke de xizmet ji zindîkirina polîtîkbûyînê û Tirkiyê jî kişandina nava nêzîkatiyeke demokratîk re kiriye. Ev jî cidîbûna me nîşan dike.

– Niha li vir xaleke balkêş heye. We beriya kêliyek xalek destnîşan kir, hema tême ser. We got ku, “*Rojava jî ji têkoşîna Tirkiyê ya li hember PKK'ê heya bihara 1993 wext dabû. Heya vê wextê encam bigire, piştî wê êdî ev kar tê guhertin.*” Ev nirxandineke çawa ye? Hûn bi rastî ji vê bawarin?

---.: Bi temamî pê bawer nebim jî, bandora vê nayê paşçav kirin. A rastî Rojava, destpêkê di îdaya terorîzmê de li hember me ne wisa bû. Ev, heya meseleya Olof Palme diçe. Ji bo me terorîst îlan bikin gelek provakasyon pêş xistin. Wisa bawer dikim ku, bi bandora devdora van muhafazekaran û partiyên muhafazak re terorîstbûna PKK'ê mîsoger dibe. Lê, gelek derdor dizanin ku ev bawerdêr nîne. Tabî yek jî hawirdorên Kurd gelek piştgirî dan vê. Cepheyê Kurdistanî pêşengtiya vê kir, dîsa gelek komên Kurd yên li Avrupa pêşengtiya vê kirin. Bendewariyên van ji Enqerê hebûn. Bendewariya hêzên Kurdistaniyên Başûr, piştgirîdayîna Enqerê ya federasyonê bû. Bi taybet dema di vê mijarê de tiştên hêvî dikirin nedîtin, wan hinek tengavî kişandin. Dîsa komên Kurd yên li Avrupa dixwestin li Tirkiyê polîtîkaya serbest bikin. Dema ev şans, weke ku dixwestin ji wan re nehat dayîn, konsensûsa li Avrupa pêkanîbûn hinek xira bû. Yanî ev hawirdorên piştgirî didan Tirkiyê ya ji bo PKK'ê terorîst îlan bike, piştî destpêka 1993 şûnde dîtin ku ev alîkariya wan zêde wateyeke xwe nîne, xwe anîne rewşeke tecrîtê, berevajî vê PKK'ê jî hêz qezenc kiriye; her wiha biryara guhertina vê polîtîkayê dan. Hevdîtinên me yên bi birêz Talabanî re jî hinek di vê çarçovê de ye. Komên din jî bi lezgînî dan diyarkirin ku ji bo pêşxistina yêkîtiya bi me re vekirîne. Gelek hêzên Avrupa jî, tevî ku giranî didan rêbaza siyasî jî, diyar kirin ku wê giraniya xwe danin. Bawerim ev hemû di mijara gav avêtina vê de bibandor bû.

“*Ji bo mafên netewî û demokratîk siyasetkirinê bigihînin ewlahiyê wê çek bêdeng bibin*”

– Yanî ji bo giranî ji têkoşîna siyasî re bê dayîn, ji Rojava jî teklîf ji we re hat. Heke em dîsa bên ser mijara me li ser axivî,

dixwazim mijarek ragihînim. Ew jî ev e: Dema li ser agirbestê biryar hat girtin, bêguman ji Tirkiyê jî, ji Enqerê jî hinek bendewarî û daxwazên we heye. Yek, hûn di vê mijarê de hinek babetan çawa şênber dikin? Dîsa li bendêye ku hûn biryara dirêjkirina demekedin agirbestê bidin; dirêjkirina vê agirbestê wê hîn çiqas din bidome? Wê sînoreke vê hebe, yan jî nebe? Wê çi sînorê vê diyar bikin? Yek jî tişta seriyan meşkûl dike ev mabet hene. Yanî heke ez hîn şênbertir bêjim: Dema agirbest tê îlankirin bendewariyên ji Enqerê? Dema agirbest tê dirêjkirin bendewariya ji Enqerê çine?

---.: Bêguman, ji bendewariyan wêdetir diyare wê ev gav Enqerê tengav bike. Heta ku bi Enqerê bimîne, fikirandina bi îradeya xwe ya demokratîk gavek avêtîn wê hinek dilsafî be. Her çiqas îdayên wan yên wisa hebe jî, ev îdayên valene. Ya ku hikûmeta heyî tengav bike, pêşkeftinên di çarçoveya min diyar kirine de ye. Ev pêşkeftin jî me derxistin holê. Tevî vê, hîn jî Enqere di polîtîkayeke kor de îsrar dike. Ji ber vê yekê, wê zêde bendawariyeke me ji vê hikûmetê nebe. Lê bi bawerim ku em ê bikaribin tengav bikin. Dema tengav dikin, dizanin ku wê zêde xwe li ber zextên raya navnetewî û heta raya Tirkiyê nede. Ji ber, pirsgirêkê anîna vê rewşê û bivê şêwayî danîna holê nêzîkatiyên Tirkiyê yên heyî dibe îflasê. Heya niha bihane vekirîbû: "*PKK terorîste.*" Niha ji sitandina ev fersendê ve, a rastî me di asteke girîng de ev desteka wan vale derxist. Em ji riya çareseriya siyasî re çiqas vekirîne niha li Tirkiyê herkes dizane.

– Hûn pê bawerin ku we fersenda "*PKK terorîste*"ji destê Enqerê girtiye, ne wisa?

---.: Bi temamî nebe jî, di asteke girîng de wisaye. Yek jî ev îda hene dibêjin; "*wiha paketa me ya demokrasiyê heye, ji bo ev teror nasekine em nikarin ji ev paketa demokrasiyê re xebatbariyê bar bikin.*" Ji bo ev çiqas di vê de cidî ne bidin nîşan dibêjîn, "*hin ji te re navenda rihet û pakêta xwe ya demokrasiyê pêk bîne.*" Di nava pakêta demokrasiyê de meseleya nasnameya Kurd jî heye. Di vê mijarê de dibêjin "*tu çi didî bide.*" Dîsa mijarên demokrasiyê pêşxistin jî hebû. Di vê de jî dibêjin "*çiqas pêş dixî bixe.*" Him jî vê, heta dawî weke fersendeke guncav û heta weke fersendeke yek alî didin nîşan dikin. Yanî bendewariyên di vê mijarê de, ne ku "*divê hûn îleh tiştek wisa bidin me.*" Jixwe li

cihek ev hikûmet bixwe a rastî li pêşiya pêşkeftina vê demokasiyê xitimandiye û gelek pêşkeftinên ji hêla erênî ve vale derdixe. Tevî ku rastî wisa ye jî, bi wêjeya terorê hewl dide raya giştî bixapîne. Ji bo em vê zelal bikin me vê gavê avêt. Nêzîkatiya destpêkê hinek li ser vê armancê bû, ti bendewariyeke me din ne mijara gotinê bû. Lê niha ev hat îzbatkirin: PKK li ser girseya xwe serwere, heya bêjî bi disiplîne, ji aşitiyê re pir vekiriye û ji pirsgirêkan re riya çareseriya siyasî pêşxistin jî bi îdaye. Dîsa ewqas jî li ser bingehên mafdar tezên xwe ber bi pêş ve dibe. Êdî wê hikûmet ji van re çi bersivê bide? Niha raya giştî di nav bendewariya vê de ye.

A rastî ji bendewariyên me zêdetir, divê em jî hikûmet jî hinek bendewariyên raya giştî hilde dîqatê. Bawerim me hinek bersiv da bendewariyan û em ê ji niha şûn ve jî bidin. Bawerim raya giştî dixwaze hinek din dem bê dayîn û niha teqvîma vê pir tê nîqaşkirin. Bi rastî jî ez jî li ser difikirim, avaniya rêxistina me jî li ser difikire.  Li vir yê hevnegirtî û nêzî nêzîkatiyên rastîbûn nabe hikûmete. Heta pêşniyarên çareseriyê yên partiyên mixalefet jî nîne, pêşniyarên artêşê jî nîne. Birêz Ozal di vê mijarê de dixwaze hinek nêzîkatiyan pêş bixe, lê ji ber bêhêzbûna xwe ew jî zêde ne bi îdaye. Tabî divê kes ne li bendê be ku pêvajoya ji niha şûnde, çi naverok û çi jî wext weke berê bidomînin. Difikirim ku wê di civînê de hîn bi rêkûpêk û berfirehtir rave bikim. Bêguman em ê van xususan hinek din şênber bikin.

A rastî ji vê re gotina agirbestê wêdetir, bêjin pêşxistina riyên çareseriya siyasî. Hema diyar bikim; ne weke gelekan gotî, "*çek tên berdan, ji çiya tên daxistin*." Rewşên wisa dibe întîhar. Nebawerim hikûmet jî vê ji me bixwaze. Hêzên me yên çekdarî, hêzên polîtîkayeke bingehîn bixin meriyetê ne. Yanî ji bo pêkanîna mafên netewa Kurd û mafên demokratîk yên gelê Tirk, hêzên çekdarî yên derketine holê ne. Heta gihiştina van armancan, wê ev hêzên çekdarî bi pêşveçûnê re hebûna xwe bidin domandin û bi ser artêşbûneke hîn bihêztir de biçin. Çima? Ji ber, armanc li holê ye. Bêyî serî li hêzên leşkerî bê dayîn jî çûna ser armancê çêdibû; lê di destpêkê de hat înkarkirin û înkarkirin domiya. Her wiha  têkoşîna çekdarî bû amûra bingehîn ya gihiştina armancê.

Niha rêbaza siyasî, gelo ji bo gihiştina armanca siyasî hat rewşeke pê were bawerkirin? Yanî çi ji bo mafê Kurd û çi jî ji bo

mafên demokratîk yên gelê Tirk li Tirkiyê siyaset kirin, weke amûreke bi ewle hatiye qebûlkirin? Wiha pir tê gotin; li Tirkiyê tamînata makeqanûnî û zagonî hatiye temînkirin? Niha temaşe bikin; çi ji bo mafê netewa Kurd û çi jî ji bo mafên demokratîk yên li Tirkiyê tamînata makeqanûnî û zagonî nîne; yê heyî jî pir sînordare û bêtemînate. Sibe yek bi serî li derbeyekê bide wê bînin çi rewşê jî nediyare. Jixwe artêş çiqas amadeye her tim li holê ye. Yanî di vê de pir mafdar in: Bila siyaset kirin bikeve bin tamînatê, wê demê dê çek bi temamî bêdeng bibe.

Berdin ji bo xwe, heta dikarim vê ji bo Demîrel jî bipirsim: Gelo di nava ewletiyeke baş de siyasetê dike? Bixwe sê teşebusên derbê jiyan kir û bû şahidê wê. Ji bo vê dibêjim; bêyî gumaneke ewlekariyê jiyan neke kariye siyasetê bike? Heke heta ev pirs ji bo Demîrel jî wate îfade dike, ji bo me siyaset kirin çiqas ji ewlehiyê bêpare li holê ye. Wiha meseleya bêdengkirina çekan, ancex dikare tam bi azadiyeke siyasî re mîsoger bibe. Çi ji bo mafên demokratîk û çi jî azadbûna mafên netewî yên di siyaset, xebatên azadiyeke siyasî meşandin, rêxistinkirin, partîbûyîn û cephebûyîn, heke ev li ser bingeha ewlehiyeke zagonî û di nava ewlekariyê de kirin bibe mijara gotinê, tabî wê demê serî li çekan dayîn dê zêde wateya xwe nemîne. Ez, di wê baweriyê de me ku di rejîma Tirkiyê de heta hikûmet jî nikare rihet siyasetê bike.

– Yanî hûn dibêjin, "*li Tirkiyê çarçoveya demokratîk ewqas lewaze û di platformên legal de polîtîka ewqas ji ewlehiyê bêpar tê meşandin ku, di ev mercên ewlahiya partîbûn û rêxistinbûn nîne bi temamî çek berdan yan jî li gor tabîra we bi temamî bêdengbûna çekan nemijara gotinê ye. Di vê wateyê de ji çiya daketin jî di maneyek de dibe întîhar. Lê kengê ev merc hatin bidestxistin û hat rewşeke bi ewle, wê demê em ê jî ev kar bi temamî bikişînin nav platformeke siyasî.*" Û hûn lê zêde dikin dibêjin ku, "*heta Demîrel jî ji ewlehiyeke wisa bêpare*." Niha li vir tişta ez li ser disekinim ev e: Hûn li telkînên di raya xwe de, di raya hûndirîn û di raya derve de tên, li gor guncavbûna rewşê şansek didin û dema ev şans didin jî pêvedemek din jî lê zêde dikin. Dema hûn ev pêvedem zêde dikin jî vê dibêjin: "Ka, *ez ji te li benda hinek gavên dilpakim û di nava vê de pêşemercên wilo wisa rêz nakim. Lê hinek tiştan bike. Ji ber, bendewarî vegeriyaye dawiyê.*" Heke min şaş fêm nekiribe, bangawaziyeke wisa heye?

---.: Rewşek dişibe vê ye.

– Niha we vê heya 15 mehê anî. Piştî pazdeyê şûnde jî mijara agirbestê di wateyek de hûn ê dîsa yekalî bidomênin. Lê, di heman demê de jî îfade dikin ku dixwazin hinek tiştan bibînin. Başe hûn dixwazin çi bibînin? Ji ber wê hinek pirsgirêkên we jî çêbibin; wê demê dixwazin çi bibînin?

---.: Niha birastî jî him zextên netewî û him jî zextên giran yên raya navnetewî heye. Em hewl didin yê para me ketiye bi bawerî bênin cî. Careke din vê destnîşan dikim, dibêjim bila ji siyasetê re şansek bê dayîn. Tabî dema vê dibêjim, heke dîsa vê bêjin "*bila ji çiya dakevin, bên*" wê bibin pêkenokê xwe. Rejîmeke serokê xwe bi dar ve kiriye mijara gotinê ye. Dîsa serokwezîrên bi çend darbeyan ji holê hatine rakirin hene. Û hîn jî xeteriya darbeyê her kêlî di rojevê de ye! Niha heta rewş ji bo yên di asta fermî de wisa be û wexta gava herî biçûk ya ji bo mafên netewî yên gelê Kurd tê avêtin bi îmhayê re rûbirû mayîn li holê be, tevgereke mîna me, bêyî ku xwe bigihîne îfadeyeke siyasî û zagonî devjî çekan berdan tê wateya "*ez mehekim we re min bixeniqîne*." Bi taybet binê vê xêz dikim. Hinek qet naxwazin rewşa rastî fam bikin. Belê em, rastiya mileteke hîn jî nasnameya wê ya netewî tine tê hesibandine. Di asta peyvek herî biçûk de di yek qanûnê de cihê me nîne. Berdin mafên xwe yên siyasî, heta di mijara mafên xwe yên çandî de derfeteke herî biçûk nîne. Derfet bila li vir bimînin, em rojana pêvajoya îmhayê jiyan dikin. Aborî tê talankirin. Belavbûna civakî, rizîbûn di asta herî jor de ye. Hêjmareke zêde nifûsa Kurd li Rojava ye. Avaniyên civakî yên herî paşkeftî bi zehmetî li ser lingan tê girtin. Eşîrparêzî û qabîleparêzî dibe ku herî dawî di me de evqas bihêz bûbe. Bi rastî jî dema ev hemû li holê bin, polîtîka çawa dikare bê kirin? Gengaze ku polîtîka daxin asteke diyar a netewî û çînayetî? Nebawerim wisa mûmkûn bibe. Kesê hinek zanebûna wê hebe wê vê bizanibe.

Li Tirkiyê ji bo pêşkeftina demokrasiyê jî ev wisa ye. Wê jî bêjim, li Tirkiyê çarçoveyek hevgirtî yê demokratîk nîne. Min jî ji salên 1970'î ve li Tirkiyê jiyan kir. Yanî ji navenda Enqerê hatim vir. Mercên ez dame afirandin mercên Enqerê ne; li wir ketim rê û heya van deran hatim. Û niha li vir Enqerê û welat tengav dikim dibêjim, "*ji me re qada polîtîkayê vekin*." Bi taybet vê carekedin

destnîşan bikim: Wê Enqere, bi awayeke rastînî rêyên polîtîka kirinê li pêşiya gelên Tirk, Kurd, gelên hindekayî û hemû çînên kedkar veke yan jî veneke? Heke veke, ez ê pêxas di sînoran re derbaz bibim bêm polîtîka bikim. Bila di vê mijarê de tamînateke bawerdêr bide, wê demê ez ê qet tenezûlê çekê nekim. Di vê mijarê de bibin navbeynkar û bila temînatên bi tenduristî ava bibin, ez jî bêm polîtîka bikim. Lê na heke bê gotin ku "*tu gaveke herî biçûk yê polîtîk navêjî*" min jî çawa ji tinebûnê hebûn çêkir bi van çekan re polîtîkayê dikim û heta min ji sifrê û pir ji kevin de kariye bênim van deran, ez ê ji niha şûnde jî polîtîkaya çekê ya herî baş bikim. Heke tu nasnameyeke netewî û heta gaveke herî biçûk yê demokrasiyê bênî asta tinekirinê, wê demê wê hinek jî rabin bêjîn, "*ez ê jî polîtîkayê wisa bikim*." Yê me hinek wisa bû.

Weke min gotî, ez li Tirkiyê di navenda salên 1970'î de çêbûm. Min dîtin ciwan çawa bi dara darazê ve dihatin dahejandin û dihatin gulebarandin. Min xwest hinek girêdayî van bimînim û ji wir heta vir hatim. Bi vê re dixwazim çi bêjim famkirina vê nezehmete. Yanî heta bi hezaran mirov li girtîgehan tijî bibin, him jî ev li mirovên ciwan bê kirin, li ser xwepêşandaneke herî biçûk û heta li ser şahiyên Newrozê -1'ê Gulanê hîn jî qedexeye- gule bên barandin, weke di mînaka HEP'ê de bûyî partiyeke bixwazibe gaveke biçûk yê demokratîk bavêje bi xeteriya îdamê re rûbirû bimîne, di vê rewşê de em ê agirbestê çawa bimeşînin, bendewariyên me wê çi bibe bawerim ev hemû fehmbarin. Birastî jî dixwazin polîtîka bikin. Ji bo vê heke bêjin daxwaz çine, em ê jî bêjîn bila hema temînata qanûnî û mekeqanûnî bê pêşxistin. Em dixwazin vê bi awayeke vekirî bibînin. Çine temînatên makeqanûnî? Wiha nasnameya Kurd birina makeqanûnê, çarçoveya siyasî ya statûya Kurd di asta qanûnî û makeqanûnî de avakirin û bi vî rengî divê hinek temînata makeqanûnî bê girtin. Yanî ger hûn hîn bixwazin ez dikarim dirêj bikim…

– Bi nasnameya Kurd polîtîka kirin...

---.: Bêguman. Divê nasnameya Kurd bigihe îfadeya polîtîk û zagonî. Yanî li gor wan girseyeke pazde milyon heye. Heta mafê vê yê siyasî derbazî qanûnê nebe wê çawa polîtîka bikin? Nikare polîtîka bike, hemû tiştê bike wê neqanûnî be. Yanî bûyera vesazbûna qanûnî tişteke pir maqûle. Mesela niha nîqaşa

makeqanûnê tê kirin, lê hayê ti kesî ji Kurdan nîne. Ji bo vê dibêjim, nîqaşeke makeqanûnî ya necidî mijara gotinêye. Dîsa qanûn tên pêşxistin, lê ciheke herî biçûk ji hebûna Kurd re nayê dayîn. Hinek partî peyva Kurd di rêzname û bernameyên xwe de diyar dikin, dibînin ku ev partî hema bi makeqanûnî tên girtin. Yanî ewlehiyeke herî biçûk yê zagonî nîne. Divê bûyera Kurd beriya hertiştî îfadeya xwe di makeqanûnî de bibîne. Dîsa diyarkirina statûya Kurd girînge. Kurd wê bigihin statûyeke siyasî ya çawa? Di vê mafên wan di asta çandî, civakî û siyasî de bikevin bin ewlehiyê. Yanî di vê çarçoveya di nav de tevbigerin ya siyasî, aborî, civakî û çandî bê xêzkirin. Tişta makeqanûn raka bêkirin û piştre jî qanûnên bên pêşxistin bên nîqaşkirin. Ev tamînatek girînge. Lê qanûn tenê têra me nakin, divê azadiya rêxistinkirinê heya dawî bê bikaranîn. Dîsa li ser vê esasê alîkariyeke pir zêde pêwîste. Yanî saziyên xwe yên çandî avakirin û xususên çûyîna planlameyeke taybet ya aborî pêdiviyek eşkere ye û pêwîstî bi van heye. Yek jî divê ev di şêwazeke demokratîk de çêbibin. Yanî ne ku ji jor de hinekan da, divê gelê Kurd bi dengê xwe û heta bi hilbijartinê vê bidest bixin. Tişta em dixwazin vesazbûnek demokratîke, ne ku hinek li ser navê Kurd di jor de biryaran bigirin. –Vesazbûneke demokratîk hinek dikarin ji vê re bêjin federasyona demokratîk jî-vesazbûneke di hilbijartina gelê Kurd re derbaz dibe.

Ev tiştên me diyar kirin garantîne. Lê, tiştên beriya vê bên kirin hene. Ev çine? Herkes dizane ku, niha rejîmeke terorê mijara gotinêye. Êdî yê ev rejîma terorê, rejîma şerê taybet nezane nîne. Evqas cînayetên “*kujernediyar*” hene. Her roj li hûndir û derve evqas operasyon tên kirin. Heta Demîrel got; “*ev şer ji şerê me bi Yunanan re kirî hîn tundîtire. Ji şerê Rus yê 1877-78 heta niha ev operasyonên herî berfirehin yên em pêk tînine.”* Wiha divê ev operasyon bên rawestandin. Niha bixwe van operasyonan vesaz dike û dibêje; “*em şer nakin.*” Him tu bi xwe dibêjî “*ji salên 1878’ê ve şerê herî mezin didin*” him jî dibêjî “*şer nîne*!”

– Başe, hûn ji bo efûyeke giştî çi dibêjin?

---.: Tabî, ev jî parçeyeke wî herî biçûke. Yanî heke dixwazî qad vebe, wisa ne bi awayê “*ka wê parlamento qebûl bike, neke*,” divê weke amûreke konsensûsa siyasî ya herî girîng bê rojevkirin û girtîgeh bên valekirin. Dîsa weke min gotî, divê hema îşkence,

ev cînayetên “*kujernediyar*” û operasyon hema bên rawestandin. Berê digotin “*PKK hewl dide li me bide*.” Niha dibêjîn em ê qet li wan nedin, tenê bila neyên ser me. Jixwe şarteke agirbestê jî ev e. Yanî bila neyên ser me û neyên ser gel. Bila gund neyên xirakirin, bajar neyên wêrankirin. Bi kinahî şerê taybet bê sekinandin. Li gorî me kontirgerîla di dewrê de ye û ev ji dewrê bê derxistin. Heke ev merc kêm zêde bên avakirin-yanî hûn dikarin ji vê re bêjîn bendewarî jî- wê demê dê ev agirbest bidome, dirêj bibe biçe. Lê, heke di van mijaran de pêşkeftinek cidî çênebe, wê demê dê ev şer hîn zêdetir bibe.

– Başe dixwazim li vir pirsek bipirsim; heke ev pêşkeftinên hûn qal dikin yek jî çênebe, bangawaziya we ya agirbestê wê hîn yekalî çiqas bidome?

---.: Bêguman vesazbûna wê jî difikirin. Niha diyar bikim; yanî agirbest, wê bêşart û yekalî nemeşe. Heke operasyonên aliyê beramber zêde bibin, wê bersivdayîna me jî hîn zêde bibe. Heke aliyê beramber li gund, bajar û çiyan weke kew bigire, xezal bigire bikeve pey me, tabî em ê xwe bi awayeke çalak biparêzin. Ji bo wê bi rastî jî em ê berxwedaneke ku heya niha nehatî dîtin pêş bixin. Heta nîqaşkirina vê jî şaşe. Em nikarin weke xafilê pê di avê de situyê xwe dirêj bikin. Yanî em ê xwe nexin rewşa Şeyh Seîdan û Seyît Rizayan. Me, ji bo nasnameya xwe, ji tinebûnê hebûn afirand hatin vê rojê. Em nikarin vê înkar bikin. Piştî vê qonaxê şûnde ev nemûmkûne. Nebawerim kes jî vê ji me bixwaze.

*“Agirbest, di encama bihêzbûn û polîtîkaya bixwe bawerbûnê hatiye rojeve”*

– Birêz Başkan, niha we hinek xalan pir vekirî diyar kir. Yêk jî wê bêdengbûna çekan çawa be? We mercên wê pir zelal û vekirî danî holê. Ev mijara yekem a girînge. Ya duwem, hûn dibêjin li ser bingeha hin telkînan yan jî zextên di raya me ya hûndirîn, him hawirdorên Tirkiyê yên din, him jî di raya derve de tên ev wexta agirbestê hinekdin dirêjkirin sûdmende. Di vê mijarê de hûn pê bawerin ku PKK heya dawî bi disiplîn nêz dibe. Li gel bisiplîn nêzbûnê dibêjin ku, “*bila neyên ser min, bila operasyon neyên domandin. Heke wisa bibe wê ev nermbûn hinek din bidome. Lê heke bi ser me de hatinê bidin domandin, em jî nikarin weke xafilê pê di avê de serê xwe dirêj bikin. Wê demê dê*

*dîsa şer mezin bibe.”* Yanî di vir de tişta we gotî ev e: “*Weke PKK û lîderê wê ne ku ji bo em ketin pozîsyoneke lewaz me vê gavê avêt, ji bo em di pozîsyoneke bihêz de bûn me dest bi vê agirbestê kir. Bila ev agirbest weke lewazbûna me neyê hesibandin*.” Tişta hûn dibêjin ev e, ne wisa?

---.: Tabî, ne ku ji bo tenê em nelewaz bûn, him ji bo pir mafdar, him jî hatin rewşeke hinek bihêz û têr em vê gavê tavêjîn. Hinek naxwazin xwe bi vê nirxandinê bidin bawerkirin: Dibêjin; “*PKK pir hêz winda kir û heya bêjî ji gel, ji raya navnetewî hat tecrîdkirin.*” Ez dibêjim, bi temamî berevajiyê vê derbazdare. Heya bêjî me ji gel pirştgiriyek mezin dît û piştgiriya navnetewî jî pir bilez pêşve çû. Li ser vê bingehê me vê gavê avêt. Yanî him bihêzbûna me pir zêdeye û him jî rastiya ku em tê de mafdarin heye. Gelê Tirk jî di nav de, bi awayeke pelîxîner ev hatiye qebûlkirin. Jixwe li ankêtên di çapemeniyê de jî hatibû peytandin. Ji hareketeke terorê wêdetir, tê diyarkirin ku em tevgereke pir mafdar û xwedî armanceke siyasîne. Li ser vê bingehê em bi ser agirbestê de çûn. Ev bi şêvaya şîrovekirina weke bêje; “*em ê darbeyên dawî lê bidin, hinek sozan bidin û ji çiya daxin*” re ez jî, çareseriya Seyît Riza û Şeyh Seît diyar dikim. Ji ber ku ev nêzîkbûn tê wateya; “em ê p*iştre serê hinan jêkin, yên din jî neçarî hevkariyê bikin û vî karî wisa çareser bikin*.” Ev nêzîkbûnek îmhaya leşkerî û tenkîlê ya 70 –beriya wê dema Osmaniyan jî heye- saliye. Ev nêzîkatî pirsgirêkê çareser nekir, veguherand kangrenê. Ne bawerim hikûmetê vê polîtîkayê terikandibe. Niha em dixwazin ev polîtîka bi awayeke vekirî bê rakirin. Jixwe hûn jî bi vê bawerin, heta ku ev polîtîka neyê rakirin wê li Tirkiyê pêşkeftina demokratîk a siyasî pêk newe.

Wê vê polîtîkayê rakin? Wê hêza hikûmetê têra vê bike? Artêş ji vê re vekiriye? Dîsa partiyên din dikarin di vê mijarê de bibin xwedî programek? Ev pirs hîn jî bêbersivin. Bi qasî dibînin hemû kêmin û di rewşeke girtî de ne. Heke bê dîqatkirin, li şûna ku li gel me li çareseriyê bigerin, weke min berê jî gotî divê bi îqtîdar û mihalefeta wê ve di partiyên siyasî û sazgehên siyasî de bê gerîn. Ew girtîne. Bi mîsogerî divê hinek gav ji hêla wan ve bê avêtîn.

– Hinek gavên ku dibêjin divê bi mîsogerî bên avêtin çine?

---.: Min hewlda vê hinek vekim. Artêş, neçare di vê mijarê de rewşa xwe di ber çav re derbaz bike. Dîsa birastî jî parlamento, neçare piştrast bike ku organeke biryarê ye. Parlemento çi di nava xwe de dihewîne? Li wir nêzî 150 parlementerên Kurd heye. Ev parlementer çiqas Kurd in? Ev çiqas di zanebûna Kurdbûna xwe de ne yan jî vê çiqas qebûl dikin? Heke qebûl bikin jî, dikarin di mijara mafên gelê xwe de tasariyeke herî biçûk ya biryaran pêşbixin û pêşkêş bikin? Pir vekirî bêjim; dema cilek netewî yê herî biçûk tê lixwekirin ev dizanin tên çi rewşê. Yanî heta niha statûyeke pir li pişt salên 1920'î heye. Di parlamentoyê de ma pertekeke herî biçûk li hember vê statûyê heye? Di vê mijarê de hikûmet çi pêşniyaran pêş dixe? Ji derveyî pêşniyarên MGK (Desteya Ewlekariya Millî) çi pêşniyareke din heye? Dîsa partiyên din yên siyasî hene, yek ji wan dikare pêşniyareke bawerdêr bêne? A rastî hemû girtîne û her yek ji yê din ditirse. Yêk dibêje; "*bila ew gavek bavêje*," yê din dibêje; "*bila ew gavek bavêje*." Rewşa hemûyan ev e û ji derveyî vê di navbera wan de konsensûzek nemijara gotinêye. Ya rastî em vekirîne, dubare vê destnîşan dikin. Yanî hûn PKK'ê çiqas rexne dikin bikin, lê îdayên wê bihêzin. Bi mîsogerî girêdayî armancên siyasî yê pir mafdar û di cî de xwe dide jiyankirin. Bingeha hêza çekdarî jî ji vir digire.

– Yanî hûn dibêjin ku, "*em vekirîne û li bendêne, yên pêşniyaran pêş naxe hûn in*." Hûn bi partiya xwe ve, bi parlamento, muhalefet, artêş û bi lijneya ewlekarî ya netewî ve di nava tevlîheviyek de ne. Lê birayê min ka temaşeke, em li bendêne, fermo bênin.

---.: Jixwe min vê gotibû: Dibêjin "*Apo wisa terorîste, wiha zilamek wisaye nayê efûkirin*" filan û behvan. Dê em bêjîn ku Apo wisaye, başe bila çi Kurdek bibînin û paketeke pêşniyaran bidin destê ev Kurd e. Ne şerte îlahî Kurdeke bihêz be, îla Kurdeke bi evqas çek hêza xwe piştrast kiribe, bila yek din bibînin. Heke qebûl bikin û rêza wan ji raya giştî û demokrasiyê re hebe, bila ev hilbijartin diyar bikin. Yanî dibêjim bila ji Kurd bipirsin ka, "*çi dixwazin*." Li Tirkiyê yêkî bi vê bawere û hêzeke bixwazibe bibe xwedî çareseriyeke wisa heye? Hinek hevgirtî bibin!

Yanî weke nivîskarek heya dawî bi demokrasiyê bawer û li ser vê bingehê xalên bi israr destnîşan dike, di şexsê we de ji raya demokratîk re dibêjim; pêşniyarên ji rêzê jî di nav de, di hinek mijarên esasî de pêşniyar hene? Heta yê bixwazibe muxatap qebûl bike heye? Niha îdayên mîna PKK yan jî Apo "*wisa xeterin, nizanim yêkî di bin emrê biyaniyan de dixebite*"pêş dixin. Bila ev îda li vir bimînin, bawerim Apo gotin ne hertişt gotine. Bingeha pirsgirêkê ne ez im, hebûna geleke û dîroke. Di derbarê hebûna vî gelî de çareserî pêwîst in. Ez vê hinek dengên vê gur dikim. Jixwe daxwaza hemû pertekan li hember min pêşxistin jî ji ber vê sedemê ye. Yên bê polîtîka, ji derveyî şîdeta kor pişta xwe dayîna polîtîkayeke din nemijara gotinêye. Hewl didin vê jî bi riyên cuda bibin bi gelan bidin daqurtandin. Heta ku ev polîtîka neyê terikandin, wê tenê Kurd xwîn winda neke, wê Tirk jî winda bike. Jixwe heya bêjî xwîn winda dike; heta ku ev polîtîka bidome wê hîn zêdetir xwîn winda bike, hêz winda bike.

– Yanî hûn dibêjin ku, "*pirsgirêka bûna muxatapbûnê berdin, werin tiştek deynin holê. Madem hûn ji min re dibêjin terorîst, ji PKK'ê re dibêjin terorîst, madem îdaya we ev e, wê demê fermo, min muxatap negirin, lê tişteke bi navê demokrasiyê dênin holê."*

---.: Bêguman. Wiha gelê Kurd li holê ye. Berdin bila Gelê Kurd jî civînên xwe serbest çêke, serbest rêxistin bike, serbest hilbijartinek bike, ne wisa? Û ji hinek daxwazên wan bên ronîkirin û hinek daxwazên wan pêşve bibin. Hûn jî tang û top nebin ser wan. Yanî ma di vê de tiştek neyê famkirin heye? Kombûneke gel a bi milyonan heye; berdin bila ev gel xwe hinek îfade bike. Heta heke guncav be bila referandumek bê kirin. Nabêjim bila ev referandum, hema ji Tirkiyê qut bibin û bibe referanduma parçebûnê. Bila ev referandum, di mijara hinek mafên gelê Kurd yên esasî de bibe referandumek. Temaşekin ka gelê Kurd çi dixwaze? Bêguman hinek mafên gelê Kurd yên esasî hene û divê ev bên dayîn. Yek jî di vê mijarê de dilsozî pêwîste. Tên, gel dixapînin; li hember gel rêzdariyek herî biçûk nîne. Dibêjin; "*em evqas trilyon dirijînin, dilovanî didin, nizanim evqas dua ji we re dikin.*" Ev demagojîne û divê bên terîkandin. Êdî kar bi van gotinan nayê îdarekirin.

– Niha li vir taployek pir ecêp derdikeve holê. Li gorî dîtinên min bi dest xistine hûn vê dibêjin: “*Em bihêzin birayê min, li ser bingeha netewa Kurd pirştgiriyeke me pir mezin heye û di vê pozîsyona bihêz de di xalek de dixwazin şansek bidin çareseriya siyasî*.” Telkînên ji Rojava tên jî wisaye, telkînên ji raya me ya giştî jî tên wisane, heya telkînên ji raya Tirkiyê tên jî wisa ye. Em gavek tavêjîn û heke bi tundî bi ser me de neyên em ê hîn bidomînin. Bêguman dema didomînin jî li benda gavanin. Niha vê dipirsim: Wê sînoreke ev pêvajoya didome hebe? Heya niha aliyê Tirk hatiye ser we?

---.: Bêguman hat. Di pêvajoya mehek ya agirbestê de operasyon bi ti awayî qut nebûn. Li hinek deveran pir zêde, li hinek deveran jî hinek siviktîr bû. Divê ez ji we re bêjim, niha jî li Agiriyê bombebaranek pir zêde heye. Bawerim ji bo roja dawiye, bi Serhetê destpê kir û dixwaze bi Serhetê xilas bike. Yanî nizanim, ev mantiqeke çawa ye. Dikariyan ji bo dana diyarkirina niyetek baş jî bisekinîban. Ez ji vê rewşê re zêde îzahek nabînim. Wiha wisa; yanî qet neda sekinandin û kêmbûnek jî çênebû. Hinek çavdêr dibêjin ku, di hinek herêman de, mînak li Botanê kêmbûnek çêbûye. Li gorî min ev, ji bo taqeta wî nemaye li Botanê gav bavêje hinek wisaye. Mesela Mêrdîn hinek deşte; li vir pir girtin çêkir û nêzî 50 gerîla şehîd xist. Dîsa di herêmên din de, bi taybet di qadên deştê yên bikaribe hîn rihet operasyonan bimeşîne, operasyonên pir tund çêbûn. Mesela li herêma Amedê dîsa pir tund bû, him jî bi awayeke nikaribî çavê xwe vekî. Dêrsîm dîsa, li Bidlîs û hawirdorên wê pir tund bû. Yanî birastî jî qet hêdî nebû, li deverên ku dibêjin hinek hêdî bû jî, ji bo hinek bêhêz bû wisa bû.

Gelo di nava ev dema derbaz bibe de wê guhertinek çêbibe? Herî dawî hinek hevdîtinên Birêz Talabanî çêbû. Yanî nerasterast jî be hinek soz dayîn hebû. Di vê mijarê de dibe ew hinek tişt bêjin, ez kesîn tiştek nabêjim. Ez nabêjim wê ji niha şûn ve jî bi heman tundiyê bersiv bidim ev hewldanên me yên bi niyeteke baş, dibe ew jî bi sînordarbûneke diyar re nêz bibin. Jixwe divê ev hinek bê ceribandin. Raya navnetewî jî vê dixwaze; em ê zextan pêş bixin, lê wiha dibêjin; “*hinekdin sebir*.” Bawerim raya Tirkiyê jî hinek sabir dixwaze. Yanî dixwaze hinek hikûmet û artêşê biceribîne. Him zextên vê û him jî guncavbûna vê dibihîsim û

dixwazim. Em bi yekeyên xwe jî şêwirin, fikrê wan jî yê dişibe vê heye.

Niha wê dema vê çiqas bibe û girêdayî kîjan şertane? Jixwe min ji van re hinekêronî kir. Em ê li pratîkê temaşe bikin, heke operasyon hîn tundîtir pêş bikeve, bi mîsogerî em ê jî hinek zêde bikin. Lê heke hatina ser me bê sînordarkirin û bi taybet seferên îmhayê vesaz nekin, dîsa ev cinayetên "*kujernediyar*," îşkence, girtinên gel, valekirina gundan bê sekinandin û polîtîkayeke me wisa taybet ku em şer zêde bikin nabe. Ango ger rewşek mîna neyekser jî be ya agirbestê di meriyetê de ye derbikeve holê, em ê bi baldarî li ser vê rawestin. Em ji bo dirêjkirina sînorê agirbestê tiştek nabêjin. Ji ber, hewl tê dayîn niyeta me ya baş hinek xirab bê bikaranîn yan jî alî beramber vê weke lewazî dinirxîne. Ji ber vê, heke sînor diyar bikin û diyar nekin jî zêde wateyek îfade nake. Yanî herî zêde em ê li pêşkeftinên siyasî temaşe bikin.

Di nava ev meha derbazbûyî de me ji hêla alî beramber ve niyetek baş nedîtiye. Pêvajoya ji niha şûnde jî em ê carek din venêrîn bikin. Yek jî vê jî bidim diyarkirin: Me, hemû tedbîrên xwe girtiye û li hember operasyonên îmhayê yên li hember me bi amadekarîne. Yanî heke hinek tund bên ser me, bi mîsogerî em ê misîllemeyan pêş bixin. Heke bi nêzîkatiya "*emhinek din bi ser de biçin em ê xilas bikin*"nêz bibin, em ê jî parastina xwe ya rewa bikin. Lê na heke dewlet, bi rastî jî ne bawere ev polîtîka bigihe encamê û di çarçoveya min gotî de xebatbarî lê bê barkirin, wê demê divê şerê taybet bide rawestandin û her ku biçe riyên çareseriya siyasî di pratîkê de bide nîşan.

– Di nava vê çarçovê de dixwazim vê bipirsim: Enqere û di çapemeniyê de dibêjin, "*çima Apo di demeke wisa de agirbest çêkir*." Û di vê xalê de tehlîlek wisa tê kirin: Ya yekem, piştgiriya derve nîne; ji ber Rojava destpê kir ku PKK'ê weke terorîst îlan bike. Ya duwem, Surî piştgiriya xwe dikişîne; ji ber Surî dixwaze ji lîsta terorê rizgar bibe. Dîsa Moskova xilas bû, ji ber derdeke wî wisa heye. Yek jî bi Tirkiyê re pirsgirêka wî ya avê heye û ev jî weke meseleyek tê rojevê. Ya sêyem, rewşa Bakurê Iraqê yan jî Kurdistana Başûre. Li vir fersendeke nû heye; wiha Talabaniya wê, Barzaniya wê, Emerikaya wê, Îngiltereya wê, tiştek hevpar dixwazin û ev rewş karê PKK'ê tengav dike. Ya çaremîn, bi operasyonên dawî re di hundir de darbeyek xwar û bi awayê

mirovê Kurd jî êdî jê bêzar bû. Wiha ev faktor hemû hatin gel hev, PKK tengav kir û ew anî vê qonaxa agirbestê. Bi agirbestê re jî dikeve nava têkoşîna siyasî û rêyeke cudatir jî nema. Niha ev şêwazeke şirovekirinê ye. A rastî we, bi tehlîlên heya niha kirî re bersiva vê da. Lê ev pir derbazdare û xususeke bi hinek pêşkeftinên bawerdêr re û ji bo vê jî asta ku hatinê nayê biçûkirin. Yanî di vê wateyê de nayê biçûk kirin; tişta dixwazim bêjim ev e: Kes nabêje ku, agirbest bû tiştek nebaş. Na, berevajî bûyera agirbestê bi her tiştê xwe ve erênî hat pêşwazîkirin. Lê ev wisa têgihiştin, girêdayî nêzîkatî û şêwazê îzaheke wisa kirin jî bihêze. Di vê mijarê de mesela helwesta Surî, dîsa di raya giştî de mohra terorîstbûnê xwarin, bixwazî nexwazî dibe ku ev bibûn faktorên diyarker. Dîsa têm vê pirsê dikim. Ji ber kesîmek zêde bivê rivangê temaşeyî dike. Di vê mijarê de cuda tişteke din ku hûn bêjîn heye? A rastî me di destpêkê de bersiva vê girt, lê tişteke cewaztirîn heye?

---.: Fam dibe. Nêzîkatiyeke seresere ye. Yan ji bo raya xwe winda nekin hîn jî van şirovan pêş dixin, yan jî ji ber pişta xwe didin raporên ne bitendurist vê dibêjin. Ez berevajiyê vê îda dikim. Di alîkariya Surî de, tabî tiştên hûn tabîr dikin dibêjin alîkarî ew jî, ez dibêjim ne weke kêmbûnek, hîn zêdetir bûye. Lê dema vê diyar dikim jî, nirxandineke mîna ku "*Surî berê pir piştgiriya me dikir lê niha kêm piştgirî dike yan jî berê kêm piştgirî dikir niha zêde piştgirî dike*" pêş naxim. Li gorî rewşa heyî, li gorî rewşa rista têkoşîna me di nav de pozîsyona Surî a niha, hîn mayîndetir û di asteke hêzdêrtir de ye. Ji bo Rojava jî heman tişt dibêjim. Polîtîkaya ku Rojava heya niha dimeşand di asta me tengav dikir de bû, dibêjim ji niha şûnde hatiye asteke hîn bi hîmdar, domdar û hêzdartir. Delîlên vê pirin. Me, bersiva polîtîkayên ku bi salan bû hikûmetên Rojavayî li hember me pêş dixin da. Û di sala par de em gihiştin alîkariya herî mezin ya madî û potansiyela girseyê. Ma ev rewş, tevî tedbîra evqas zêde pêş neket? Ma herkes vê nizane? Bêguman dizane. Niha jî ez dibêjim ku, hemû deriyên dewletê û deriyên hikûmetê ji diyaloxê re vebûne. Jixwe girseya me niha ji vê re vekiriye. Wiha bêjim, Serokê Finlandiyê hevdîtin çêkir, wezîrê karûbarên derve yê Hollanda hevdîtin çêkir, Belçîka hevdîtin çêkir, ji parlamentoya Îngilîzan hevdîtin çêdikin, diçin Emerîka. Yanî biçûk mezin ji

gelek dewletên Avrupa, çi wezîr, çi parlementer, çi partî, di her astê de daxwazên hevdîtinê zêdene.

Niha ev hemû tên çi wateyê? Mîna berê PKK'ê ne weke rêxistineke terorîst, weke pêşveçûna muxatabeke siyasî dide nîşan. Girseya me jî li Avrupa zêde bûye, niha du qat zêde bûye. Dema ev li holê bin, başe ez çawa dikarim bêjîm PKK lewaz bûye? Ev, ji bo Îranê jî derbazdare. Dîsa pêşkeftinên li Kafkasya bi taybet di asta me hîn bihêztir bike de ye. Bi hemû welatên Kafkasyayê re pêwendiyên me hene; em dikarin li Azerbaycanê, Ermenîstanê, Gûrcistanê polîtîka bikin. Yanî ev xususên we diyar kirin, li gorî min dikare berevajî bê şirovekirin. Yanî hûn dikarin weke hêz qezenckirina PKK'ê û bi sipartina agirbestê ya vê bi wêrekî tê pêşxistin şîrove bikin.

– Yanî hûn dibêjin di bingeha pêşkeftina agirbestê de bêhêzbûnek nîne.

---.: Ne bêhêzbûn, bihêzbûn heye û di hûndir de jî wisa ye. Piştgiriya gelê Kurd gihiştiye lûtkeyê. Ev rastî di holê de ye. Polîtîkaya terorê, polîtîkaya gel tirsandinê PKK'ê bihêz kir, yan jî lewaz kir. Li şîroveyên raya giştî temaşe kin, li tevgeran temaşe kin, bi awayeke zêde vekiriye ku me piştgirî dîtiye. Dixwazin hilbijartin bikin. Tişta dixwazim bêjim, ji hûndir ve jî hêz bidestxistin mijara gotinêye. Li pêwendiyên li Başûr temaşe bikin. Talabanî niha li beramberî we ye, tişta dixwazin bipirsin. Di kîjan statûyî de bi me re di nava hewldana têkiliyan de ne? Hêzên me di Başûr de çawan in? Li Başûr ji berê lewaztirin, yan bihêztirin? Bipirsin hûn ê fêr bibin. Ez îda dikim ku, em him di warê siyasî de him jî di warê leşkerî de hîn bihêztirin. Qebûlkirina me ya di raya Tirkiyê de jî ji berê bihêztire. Tişta herî zêde tê gotin dibêjin, "*gerîla derbe xwar*." Min ji we re darêja deh hezar gerîla kir. Min ji we re got, li kîjan herêmê çiqas gerîla hene. Niha bejdarbûna rojane 50'î ye, piştî demeke pir kin şûnde wê ev hêjmar bigihe sedî. Ev, mezinbûneke mîna şapê ye. Dixwazin biçin hewl bidin bêjmêrin; heke tiştên dibêjim nerast be wê demê dê rexneyên we mafdar bin. Min navê hemû eniyan yek bi yek da we; Botan, Garzan, Amed, Dêrsim, Serhed, Mêrdîn. Dixwazin em rojnemevanek bişînin û bila bi xwe yêkîneyan jî bibîne. Bi awayeke zêde çiya di destê me de ne. Ev jî, bi awayeke ku bi ti

demê re neyê qiyaskirin bihêzbûna me dide diyarkirin. Agirbestê, wiha him girêdana gel a bi me re, him jî girêdayî bihêzbûna pêşveçûna gerîla, yanî weke encama polîtîkaya ji xwe bawerbûnê hatiye rojevê. Tişta dixwazim bêjim, çi hikûmet dibe, çi jî hawirdorên alî dide wê, li gorî min yan rastiyan li gor raporên şaş şîrove dikin, yan jî vê bi qestî dikin.

"*Heta ku helwesta aliyê beramber ya heyî bidome, wê dijwarî hîn zêdetir bibe*."

– Li vir ev derdikeve holê; hûn dibêjin "*ji bo em bi xwe bawerin, ji bo bihêzbûne şer disekininin, ne ku ji bo tecrît bûne.*" Dîsa dibêjin, "*ji derve jî piştevaniyên me zêde bûn, di hûndir de jî bi awayeke zêde û weke şapê mezin dibe.*" Dîsa dibêjîn me tiştek avêt holê got; "*di vê xalê de me xwest, ji têkoşîna polîtîk re şansek bidin naskirin û ji bo rawestandina ev polîtîkaya dûrkirinê jî, gelo dikarin bigihîn demokrasiyê.* " Yek jî we vê jî got: "*Di nava mehek de rewş nebaş bû û hatina ser me domandin. Di hinek herêman de ewqas bi tundî nebû lê, li hinek deveran jî bi tundî bû.*" Di serdema yekem de, yanî di nava mehek de zêde baş derbaz nebû.

---.: Baş nemeşîn tenê dikare ji bo yêkîneyên şerê taybet bê gotin. Lê xwedî derketina raya giştî ya li meseleyê guncave. Di raya giştî de nêzîkatiyeke qebûlkirinê mijara gotinê ye. Di qada navnetewî de bertek pir erênîne, dîsa bertekên li Başûr pir erênîne. Li gel vê, bertekên di nava hawirdorên demokratîk yên Tirkiyê de jî pir erêniye. Lê, yê ku bersiv nade van hemûyan yêkîneyên şerê taybet in. Êdî van jî anîna rewşek baş, girêdayî bandora hawirdarên beriya niha min gotiye.

– Yanî wê hikûmet dest bavêje vê.

---.: Belê, wê hikûmet dest bavêje vê, artêş bixwe wê xwe sînordar bike, yanî ew jî êdî girêdayî vane. Em nikarin bêjîn "*qet bendewariyên me çênebûn, qet pêşkeftinên lehte çênebûn*" lê dikarim bêjîm, "*gelek pêşkeftinên baş çêbûn.*" Dibe ku ev pêşkeftin rê li ber sînordarbûna şerê taybet a di nava xwe de jî veke. A rastî hinek li benda vê me jî. Lê heke ev pêk neyê jî, tedbîrên me girtî dê wê sînordar bike; vê jî bi awayeke vekirî ji we re bêjîm: Tedbîrên ku me girtine bi mîsogerî wê şerê taybet sînordar bike û me ber bi pêşkeftineke cuda ve bibe.

– Niha tişta li vir dibînim, di we de jî zimanek cuda heye. Qesta min a ji zimanek nû re ev e: Berê uslubeke hîn bi tundtir, hîn bi xedartir bikar tanîn, li vir jî bala min uslubeke hîn xwînsartir dikişîne. Û li vir vê dibînim: “*Em di ferqa hêza xwe de ne, baweriya me bixwe heye, tame. Ji ber wê jî em hatin me li şûnek wisa agirbest îlan kir. Agirbest wê demeke din dirêj bike, niha ji vê re ti sînorek nadênin. Di vê mijarê de em ê li gavên aliyê Tirk yên di qada leşkerî de çawa pêşve biçe temaşe bikin. Heke zêde niyeteke baş neyê dîtin, polîtîkaya îmhayê û helwesta zextê bidome, li gorî wê em ê jî tedbîrên xwe bigirin, bimeşin*.” Li vir, gotina we ya dibêje; “*em ê bi sebir bin*” dîkatê dikişîne. Yanî ez vê hîs dikim. Hûn vê dibêjin: “*Çi di raya navnetewî de be, çi di raya Tirkiyê de be, çi jî di raya Kurd de be, di hemûyan de ev agirbest erênî hat destgirtin û ji vê herkes li benda tiştek bû.Yanî heke em aliyê şerê taybet deynin aliyek, hewayeke baş mijara gotinêye. Li gorî ev hewaya erênî em jî dixwazin hinekdin bi sebir û ev kar hinek bi demê re berdin û li bendê bimînin.*” Yanî di we de jî di derbarê sebrê de jî nêzîkatiya niyeteke baş heye. Hûn ji vê şîrovê re çi dibêjin? Ma pir tengav dikim, yan jî ev helwest mijara gotinêye?

---.: Bêguman di pêşxistina vê helwestê de ji bo bersivek ji raya giştî a demokratîk re bê dayîn û demogojiyên di holê de û rewşên ji derveyî rastiyê bên ronakirin bibandore. Ji ber vê hêza sabir û tehemûlê didin nîşan. Ev sebir, girêdayî feraseta xwediyên meseleyê li meseleyê derbikevine. Vê jî bêjim; em, tenê ji bo xwe, ji bo Kurdan polîtîkayê nakin. Pirsgirêka çareseriya Kurd, divê herî kêm bi qasî Kurdan, weke meseleya Tirkan jî bê dîtin û alîkariya wan jî bidin çêkirin. Ev ji hêla min ve rastiyên nayên nîqaşkirinin. Hemû tiştên min kirine, ji bo hinek bibe berdevkê van rastiyan. Di wê baweriyê de me ku min ev jî têra xwe kiriye. Ji bo wê heke sebir pêwîst bike sebir, çek pêwîst bike hema dest avêtina çekê; min van hemû ceribandiye.

Divê ji vê xalê re jî vekirîbûnek bê çêkirin. Aliyê beramber tenê bi şerê taybet re israrkirin namîne, di heman demê de ti pêşniyarek jî pêş naxe. Weke min gotî ev, rê li ber windahiya madî û manevî ya gelê Tirk vedike, yê gelê Kurd jî hîn zêdetir ber bi windahiyê ve dibe. Bêçareserî û xetimîbûna vê polîtîkayê bênîqaşe. Li hember gava me ya heyî, tenê ne rawestandina şerê

taybet, li hember pêşniyarên me jî di vê aliyê beramber jî hinek pêşniyaran pêş bixe. Şerê taybet rawesta lê, ti pêşniyar nîne; ev ji kar re nabe. Dibêjim pirsgirêk, tenê dikare bi pêşniyar, polîtîka û heta bi pêşxistina qanûnan re tê çareserkirin. Ev, pir girînge! Madem pirsgirêk heye, madem cidî, madem meseleya Tirkiyê ya bingehîne; wê demê di derbarê vê meseleyê de pêşniyarên xwe bênin. Niha rewşa hikûmet xwe tê de digire dest ev e: Him dibêje; "*ez vê meseleyê qebûl dikim*," him jî dibêje "*riya min a çareseriya pirsgirêkê bi temamî serkeftina leşkerî bidestxistine*." Belê, bêçareseriyeke wiha heye.

Bi rastî jî di asta gotin de mesele hinek tê qebûlkirin; lê dîqat bikin, bi awayeke di bin re şerê taybet jî zêde dikin. Ev, înkara pirsgirêkêye yan jî çareseriya rêbaza dûrkirinê ye. Em ê bikaribin vê bidin rawestandin? Di vê mijarê de di derbarê raya giştî de nêzîkatiyên şaş tên sepandin. Heya niha digot; "*PKK fersendê nade, teror fersendê nade*." Niha hin ji te re, teror qet nîne, lê pêşniyarên rast yên PKK'ê pêşxistine hene; tu ji bo van pêşniyaran çi dibêjî? Berdin PKK'ê, daxwazên gelek komên din û hawirdorên din hene; tu ji wan re çi dibêjî? Pêşniyarên te çine? Di vê mijarê de jî dibêjin; "*deka hinek bisekine, PKK'ê biperciqînin, îmha bikin, piştre em ê bifikirin. Kurdan vê pirî caran di dîroka xwe de dîtine û çiqas hatine xapandin jî dizanin*." Her wiha nêzîkatiyên heyî nebawerdêrin. Piştî ku te dest lingê wan şikand şûnde, piştî te berdevkên wan bi awayeke bêrehm perçiqand şûnde, gelo tu yê çiqasî bêjî ez bi niyeteke baş û bi rehm biçin çareseriyê? Dibêjim, di vê mijarê de dîrok û rastiyên siyasî delîl pêşkêş nake. A rastî di demên dawî de xususa ku me destnîşan kiriye; yanî divê em tundiyê bi hev re bidin rawestandin, pêşniyarên di cî de bi hev re pêş bixin û bi hev re ji peywendî danînê neçin paş.

Bi rastî jî van karan-wiha îro weke li Yugoslavya bûyî, heta li Kafkasya bûyî-bêyî veguherînin şêwazên hovane, hîn şarezane çareser bikin. Yanî bila bixwe pêşniyaran ji me re bênin; dibe tiştên dibêjim zêde wate îfade neke, wê demê bila ew ji min daxwazek bikin; tenê bila nebêjin, "*ji çiya dakevin, teslîm bibe, piştre em ê mafê te baş bifikirin.*" Heke wisa gotinê bidomînin, ma bi rastî jî ez dikarim bi vê bawer bikim? Hûn bêjîn, bila gelê Tirk bêje; heke ez hertiştî berdim û ji çiya dakevim, wê demê

hûnê min hûr hûrî nekin? Wê kîjan ji we garantî bide min? Yanî hinek maqûl bifikirin, ji min re garantî bidin, ji çiya dakevim. Dibêjin; “*me soza Osmaniyan da, bawerî bi soza me nayê.*” Lê ez çawa bawerî bi soza te bînim? Di vê mijarê de garantiya saxlam pêwîst dike, em garantiyek dixwazin. Yanî garantiya pêwîst bidin, sibe bên polîtîka bikin. Şêwazên vê diyar bikin, bila makûl bin û ev kar wisa çareser bikin.

Ma niha ev jî taxtîkeke, ma ev jî Apo necidî dide nîşan? Yanî di vê mijarê de birastî jî alî beramber bê pêşniyare. Navê pirsgirêkê nadêne, bawer nake navê wê dêne, bawer bike jî ji bicîanîna pêwîstiyên wê acize. Wiha heta ku ev helwest bidome jî, wê ev pirsgirêk kangren bibe û ev tundî jî zêde bibe. Weke min gotî, her ku Tirkiye lewaz bike wê lewaz bibe, her ku hêz winda bike wê winda bike. Dibe Kurd zêdetir zehmetî bikişînin, lê wê di vî şerî de pêş bikeve û di dema pêş de di ev çarçoveya min gotî de carekedin çareseriyek bisepîne. Em dixwazin ku, ne di dîrokeke pir dûr de, ne piştî gelek xwîn hat rijandin û êş hat kişandin şûnde, bila ev ewilî û niha be. Ya rastî, li gorî min serokên demokratîk, yên hinek bawerî bi siyasetê hene dê vê wisa bifikire û bêyî pir xwîn birije û êş çêbibe çareseriya pirsgirêkan tênin. Peywira rêberan ev e. Lê demagog, yên li bercewendiyên rojane temaşe kirin, nizanim yên dixwazin hikûmet û partiyên xwe yên basît ava bikin, wê rê li ber hîn zêdetir xwînrijandina gelan û êş kişandina wan veke.

*“Bi temamî bi sîlehê encam girtin ji bo herdu aliyan jî zehmet e”*

– Niha mijarek pir zelal heye. Hûn li vir dibêjin ku, rewşa heyî bingeha xwe ji girîngî nedayîna aliyê beramber û bê polîtîkabûna wê digire. Heke tundî bidome wê êş hîn zêdetir bê kişandin û xwîn bê rijandin; lê em ê carekedin bên ser heman xalê. Heke rêber hebe, rêberek rastî hebe, wê ev rêber rê li ber êş kişandina gel û netewan bigire. Ya girîng jî ev e. Lê li vir tiştek ji we bipirsim: Niha we agirbestek pêş xist û ev bû derketinek pir şaşker. Lê wisa jî tê gotin: Ma ev kar ji serê wî derdikeve, yan jî ev senaryoya mezin li Londra, Bonn, Washîntonê hat nivîsandin? Li pişt wî kî heye? Bixwazî nexwazî ev tên hizirîn. Lê we vê teklîfê kir; agirbestê avêt holê û got “*kerem kin.*” Yanî we got; “*birayê min, we heya îro her tim got, ez berê terorê çareser*

*bikim, piştre pêdiviya demokrasiyê pêk bênim;*” û dibêjin “*êdî teror nîne, niha were bike*.” Niha piştî we vê daxuyaniyê da şûnde, di cihek de ji bo we jî bû mijareke guherinê. Yanî li gel teklîfa agirbestê fitlonekeke nû, virajê girt. Li vir arastî êdî Apo jî, PKK jî weke Apo yê kevin û PKK ya kevin nahesibînin; ev guhertineke. Niha hûn, ji niha şûnde, dikarin weke ku tiştek nebûye dest bi teqandina sîlehê bikin? Weke ku ti guhertin çênebûyî dikarin polîtîkaya kevin bi heman rengî bisepînin? Yanî min hewl da bi angaşdarî bifikirim.

---.: Fam bû. Beriya hertiştî vê diyar bikim: Li Tirkiyê teoriyên komployê pir pêşkeftiye. Bi rastî jî bi hemû samîmiyeta xwe ve bêjîm ku, ti merkezeke cidî di vê mijarê de rola wê nîne. Çîroka vê ji we re bêjîm. Hûn dizanin ev agirbest çawa hat aqilê min? Beriya biçim civîna çapemeniyê, min wisa li rastê temaşe kir fikirîm, li çepê temaşe kir fikirîm û di vê pêvajoyê de ev gotin ji devê min derket. Û ev gotin birastî jî rê li ber pêşkeftinên pir mezin vekir. Niha dema vê dibêjim, tabî, bi rastî jî bandora raya navnetewî jî paşçav nakim, dîsa bandora pêşkeftinên di me de paşçav nakim. Bêguman mejî di bin bandora van de difikire. Lê têkiliya wê bi teoriyên komployê re nîne. Hinekan min tengav nekir negot, “*wisa baxive*.” Heta di vê mijarê de bi mîsogerî telkînek jî ne mijara gotinêye. Yanî dema em di nava hewldana derketinek çawa bikin de bûn, rêbazeke wisa hat aqilê me. Bi mîsogerî çîroka vê wisa ye. Ji bo nederbazbûna teoriya komployan bêjim, vê destnîşan dikim. Lê ma qet guhertinek nîne? Bi rastî jî guhertin hene. Bewerim ku, ev pêvajoya du-sê mehan, li Tirkiyê jî dide nîşan ku êdî hinek pêşkeftin hatine ciheke ku nayên vegerin. Di PKK’ê de jî pêşkeftineke nayê vegerîn dide nîşan.

– Ew xal çibû?

---.: Niha vê diyar bikim; xala gihiştinê, weke hûn dihesibînin, ne weke PKK qet serî li sîlehê nade. Heta ku ev merc bidomin wê PKK devji sîlehê neberde û pir şidayî bigire. Lê wê bi qasî vê girîngî bide polîtîkayê jî. Divê guhertin di vir de bê dîtin. Yanî sîleh jî ji bo polîtîkayê ye. Dema min dest pê kiribû vê destnîşan kiribû. Li gorî ku şansê kirina polîtîkayê heye, bêjîn ku çima tenê her tişt û tenê bi sîlehê mîsogere. Ez dibêjim ev bêwateye. Çima vebijarka polîtîkayê zêdetir nexin dewrê? Wiha

guhertin di vir de ye. Wê hîn zêdetir polîtîka bê kirin, hîn zêdetir sînorên zagonî bên tengavkirin, hîn zêdetir lihevkirin û îtîfaq bên pêşxistin, dîsa dîplomasî û diyalox bên pêşxistin. Guhertin di vir de ye. Lê sîleh jî di cihê xwe de sekinîne. Wexta pêwîst bike wê ev sîleh hîn bi aqilane û di cî de bên bikaranîn. Mîna berê wê bi întîharî neyên bikaranîn. Tiştek din jî diyar bikim; wê nêzîkatiyeke me ku em bêjîn bi ser van leşkerên Anadolê de biçin "*êrîş bikin lê bidin*" çênebe. Yanî heke bi israr bi ser me de neyên em ê li van leşkeran nedin û em ê nefikirin ku basqinên taybet pêk bênin îmha bikin. Polîtîkayeke me îmhayê nîne, polîtîkaya me ya parastinê heye.

Heke hûn ji van hemûyan re dibêjin guhertin, ez jî dibêjim ku, rewşeke wisa girîng û berfireh heye. Ji guhertinê zêdetir, ji van re dibêjim pêşkeftinên berfireh. Heta pêşkeftinên ku divê pir cidî bên girtin. Ez biçûk nabînim û xemgîn nabim nabêjim "*vay çima min serkeftineke leşkerî pêk neanî*." Dibe li Tirkiyê hinek hawirdor, xemgîn dibin dibêjin "*çima me xilas nekirin*." Li gorî min, divê ti alî xemgîn nebin nebêjîn bi sîlehan tam encam nehat girtin. Û bi van sîlehan bi temamî encam girtin, ji bo me bi qasî zehmete ji bo aliyê beramber jî zehmete. Nirxandineke min wisa hebû: Dema têkoşîna çekdarî gihişt hevsengiyek diyar wê rêyan çareseriya siyasî jî vebin. Ez, nebawerim li Tirkiyê aliyek li ser aliyê din serdestiya leşkerî pêk bêne û ji vê bawer jî nakim. Ev, ji bo me jî derbazdare. Lê bawer dikim bigihîn hevsengiyeke diyar û di vê rewşa hevsengiyê de biçin çareseriyeke siyasî û ev baweriya xwe hîn jî diparêzim.

– Hûn meseleyê bi awayeke pir vekirî datînin holê. Ji bo wê sîpas dikim. Yanî hûn pir zelal dibêjîn. Li vir yek-du xalên min not girtine hene. We vê got: "*Bêguman sîleh ji bo polîtîkayêye û polîtîka meşandin bi sîlehê dibe. Di vê xalê de wê hevsengiyek bê danîn û wê giranî ji polîtîkayê re bê danîn*." Yanî tişta ji vir derdikeve ev e: "*Wê di desteke me de dîsa sîleh hebe û em ê di heman demê de hîn zêdetir bikevin nava platforma siyasî, bikevin nava îtîfaqan jî û di vê navberê de heke bi ser me de bên, em ê bi taxtîkên xwe yên bisîleh bersiv bidin. Em ê vê bi tundiyê bikin, lê em ê nexwazin leşkerên Anadoluyê bikujîn.*" Li vir xususa bala min kişandî ev e: Girîngî dayîna diplomasiyê, girîngî dayîna îtîfaqan û dema sîleh di dest xwe de digire polîtîka kirin. Hûn

dikarin van hersê xalan hinek vekin? Yek qesta we ya dîplomasiyê, ya duwem qesta we ya ji îtîfaqan re, ya sêyem dema hûn sîleh di dest de digirin qesta we ya polîtîka kirinê çiye? Hûn dikarin van hersê xalan vekin?

---.: Dîplomasî, piştî bihêzbûneke diyar şûnde wate îfade dike. Di tevgera Kurdan de dîplomasiya heya niha, ya ku piranî bi hevkariyê re bi encan bûyî û weke rêbazeke zêde feyda wê nebûye foksiyon girtiye. Yanî dibêjîm zêde ne bi qîmet û encamgire. Lê piştî têkoşîn bi hêza xwe ya hûndûrîn hat vê rewşê şûnde, dîplomasî dikare weke rêbazeke bi bandor fonksiyon bigire. Di ferqa wê de me ku êdî gihane wê rojê û merc jî heya bêjî destdayî bûye. Di vê wateyê de sîleha dîplomasiyê dikare kar bike. Jixwe raya navnetewî bi eleqeyeke mezin temaşe dike û gelek hawirdor di nava lêgerîneke pêwendiyan de ne. Diyare dema vê hatiye. Wê ev bibe derbaskirina pêwîstiyeke girîng ya tevgera Kurd.

Polîtîkayeke îtîfaqê ya ku diplomasî jî girêdayî wê ye heye. Yanî Kurd nedibûn yek û ji bo jî ev sîleha dîplomasiyê zêde nedihat bikaranîn. Di vê mijarê de jî vekirî diyar bikim ku, ev pêwîstî jî hatiye derbazkirin. Yanî polîtîkaya îtîfaqê bi lezeke mezin bi encam dibe. Komên pêwendiyên wan yên cuda hene niha dema dibin yek wê polîtîkayeke hevpar diyar bikin û wê ev jî şansê dîplomasiyê zêde bike. Niha hatina vê astê jî çêbûye. Divê jibîr nekin ku, îtîfaq jî girêdayî pêngava PKK'ê pêşket. Di vê mijarê de daxwaza gelê Kurd mîsogere, ji binî ve gel bû yek û tercîha xwe jî kir. Her wiha kom yan jî partiyên din jî, heke bi temamî naxwazin tine bibin, li ser bingeha daxwazên gel wê yêkîtî û îtîfaqê pêş bixin. Dîsa di vê mijarê de PKK jî hinek kamil bû. Yên din heya niha ji PKK'ê bifikar bûn. Me nelicihbûna vê fikarê da nîşan. Fam kirin û bawer kirin ku em di çarçoveyeke demokratîk de heya dawî girêdayî îtîfaqanin. Ji ber vê bawerim wê bikaribin ber bi yêkbûneke cepheyî ve biçin. Yekbûna cepheyî him di zemîn de û him jî di asta rêxistinî de heya bêjî pêşve çûbû; niha bi beşdarbûna hêzên nû yên ji vê re bawerim wê hîn zêdetir bêpêşxistin.

Weke min got; têkoşîna çekdarî jî, heya ku pirsgirêk bê çareserkerin wê hebûna xwe bi awayeke bandor biparêze. Lê rê ji siyasetê re jî vebûye. Dema dibêjin siyaset, wiha dîplomasî jî

parçeyeke vê ye, îtîfaq jî parçeyeke vê ye. Û dibe partî jî hîn bi hêsantir bên avakirin. Yanî li gorî min derfeta siyaseta legal kirin jî dikare hinek pêş bikeve. Bi vî rengî di wê baweriyê de me ku em di nav nirxandineke rastîbîn de nî. Lê vê jî bêjim; ev pêşkeftinên nû nû derdikevine. Lê tevî vê, destpêkirina qonaxeke nû dide nîşan. Pêvajo hîn baş kamil nebûye. Li Tirkiyê milîtarîzm heye û dibe ev pêşkeftinan berevajî bike û ev pêşkeftinên hîn di asta derketinê de ye biperciqîne. Her wiha mercên şerê çekdarî hîn derbazdarbûna xwe diparêze. Lê ev ne tercîha me ye, sepandina aliyê berambere.

Bi kinahî, pêşkeftin tevlîheve; nabêjim bi mîsogerî yan dê wisa bibe yan jî wisa bibe. Yanî nikarim bêjim yan wê bi şereke zêde ve pêş bikeve yan jî bi temamî bi rêbaza aşityane-siyasî ve pêşbikeve. Herdu jî giraniya xwe diparêzin. Bêguman tercîha me rêbaza têkoşîna siyasî, aşityane û demokratîk esas girtine. Divê hîn kêmtir cî ji sîleh, tundî û xwînrijandinê re bê dayîn. Bi rastî jî vê pir jidil dixwazin û dibêjim lewra di vê mijarê de rastîbînin. Heta ku temînatên baş pêşnekevin, di vê mijarê de heta bi hevdîtinên berfireh re konsensûsek neyê pêkanin, wê ev kar hinek wisa bidomin. Dubare dibêjim rastîbîn bin, yan ne wê xirabî ser bikeve. Destê xwe bidin bin kar û hîn zêdetir dereng nexin. Paşve xistin li dijî gelane, li dijî hêzên demokratîkin û ti sûda yek Tirkek jî di vê de nîne. Weke min gotî, dibe kesayetên dibêjin; “*ez ê çiqas îqtîdara xwe bidomînim, paya xwe biparêzim*” sûdê bibînin, lê gel, hêzên demokratîk, wê berjevendiyên wan yên demdirêj ji vê nêzîkatiyê feyde nebîne. Ev ji bo min zelale.

“Wê di *nêz de civîneke yêkitiya cepheyî pêk were”*

– Başe di vê bûyera îtîfaqê de rewş çawa ye? Beriya niha we di bûyera îtîfaqê de vê got: “*Zemîn bû yek, PKK bihêze, PKK nûnerê gelê Kurd e. Heke naxwazin li devereke tenê bibin, divê ew jî bejdarî vir bibin. Em jî, PKK jî li deverek kamil bûye. Di vê rewşê de dikarin di bin sîwanek de bên gel hev.*” Ji vê hêlê ve gavên erênî hene? Yanî mînak tiştekî ku mirov jê re bêje; “*deklarasyona Şam’ê” ya* bi Bûrkay re yan jî pêkhateyeke ku bi rêxistina wî re pêktînin, weke din gelo civatek hemû nûnerên rêxistinên Kurda bîne gel hev heya an na, yan jî mijara gotinê ye?

---.: Heye. Li ser bingeha wê deklarasyonê hevdîtin tên çêkirin. Bi çend rêxistinên din re xebatên protokolên hevbeş hatin pêşxistin. Di nêz de jî wê civîneke yêkîtiya cepheyî pêk were.

-Dîrokeke wisa heye?

---.: Wê di hefteyên pêşiya me de pêk were û bawerim wê îtîfaq, bi bername û naveke nû xwe derxe qada polîtîkayê. Dibe ku encama xebateke wisa çêbe. Di nava Kurdan de cara yekem him şert û merc ewqas guncaw dibin û him jî ev rastî xwe ferz dike, ya din jî ger ev neyê pêkanîn êdî wê polîtîka kirin ji hemû aliyan ve karmendiya xwe ji dest bide. Ji ber ev rastî tên zanîn di wê baweriyê de me ku ev car wê pêk were.

– Başe di vê mijarê de di vê tişta hatî nivîsîn-xêzkirin de xalek heye. Tê gotin ku, “wê ev bibe weke FKÖ (Rêxistina Rizgariya Filistînê) ya yêkîtiya eniyê.”

---.: Zêde nabe mîna Rêxistina Rizgariya Filistînê. Ji ber Kurdistan pir parçe parçeye. Ji bo giştî Kurdistanê kongreyek tê hizirîn. Di vê mijarê de hinek pêşniyar tên pêşxistin. Ev cudaye, yêkîtiya cephe ya em ji bo qada Bakurê Kurdistanê bi nav dikin cuda ye. Ya ji bo Bakur tê fikirîn tabî wê hinek bişibe Rêxistina Rizgariya Filistînê. Wê rêxistinên cuda di nav de hebe, wê hinek rêxistinek sist bibe; him ji têkoşîna çekdarî re vekiriye, him jî zêdetir giranî dide têkoşîna polîtîk û wê bigehe bernameyeke daxwazên herkesî sentez dike. Dîsa wê hewl bide bigihe îfadeya yêkîtiya taxtîk. Wisa pir bihêz nebe jî, bawerim êdî riya vê vebûye û wê pêş bikeve.

– Yanî li vir bi taybet ya ku hemû herêma Bakurê Kurdistanê temsîl dike û li hemû Tirkiyê bikeve nava xebatek siyasî ya legal?

---.: Belê, wê ev jî bigire. Yanî tenê ne îlegal, wê xebateke wê ya yasayî jî hebe. Bawerim, dixwazî HEP (Partiya Kedê ya Gel) bê girtin dixwazî jî neyê girtin, bi vî navî yan jî bi naveke din pêkhatineke yasayî jî di meriyetê de ye. Wê pêkhatineke hîn bi hawirdor çêbibe, dengên cuda û meylên wan di nava xwe de bigire. Mesela, PKK jî, rêxistinên din yên îleqal jî piştgirî bikin; dîsa reformîst dibe, şoreşger dibe, komên mezin dibe, komên biçûk dibe, heta lîberal dibe, sosyalîst dibe, hêzên wisa cuda dikarin bi awayê partiyeke cephe derkeve holê. Bawerim derfetên

pêkhatina vê û mercên wê heya bêjî destdayiye. Lewra armanceke wisa jî heye.

– Hêzên cur be cur di plana legal de pêkhatineke xwe bide îfadekirine.

---.: Belê, dibe em qala pêkhateya îfadeyeke legal bikin pêk were.

-Niha dema em li îfadeya we gotî temaşe dikin, tabî wê girîngî ji dîplomasiyê re jî bê dayîn. Li vir wisa diyar dibe ku wê şerê çekdarî hîn bi wesfdar bibe û hinek bikeve pîlana duwem. Ji ber, ji bo ew alîkariya dîplomasiyê pêk bêne û bikaribe çeka dîplomasiyê bide bikaranîn bi taybet divê di wateyek de mohra dibê terorîst bê paqişkirin. Yanî di Rojava yan jî cîhanê de bi awayê dîplomatîk muxatap girtin û ji bo bikaranîna çeka dîplomasiyê, di vê wateyê de pêwîste dawî bikaranîna gelek taxtîkên sîlehê bên anîn. Bi awayeke din ev çeka dîplomasiyê bikaranîn wê gelek zehmet bibe. A rastî dema Rêxistina Rizgariya Filistînê jî dest bikaranîna çeka dîplomasiyê kir, sîlehê ji dest xwe dernexist, lê têkoşîna siyasî girt pîlana pêş. Niha li vir jî heman xet diyar dibe?

---.: Li gel hinek şibandinan, yeqîn dikim ku bi heman awayî neyê dîtin.

Mîna wê qet neyê îdakirin ku dîplomasî xwe dispêre têkoşîna çekdarî û wê neyê gotin jî dîplomasî tenê xwe bi sipartina pêkhatinên siyasî yên legal ve pêş bikeve. Lê heke tevgerek evqas bûye malê girseyê û dikare evqas dîtin bêne gel hev, di bingeh de dîplomasî girêdayî vê pêş dikeve. Piştî hat vê qonaxê şûnde, bêguman tê wateya aliyê wê yê siyasî jî pêşketiye. Êdî dikare bê gotin ku hinek gihiştine derfetên çûyîna encamê. Dîplomasî di qonaxeke wisa de dikare hinek rol bilîze. Ji ber wê dibêjim ku, qonaxeke wisa him rastî çarçoveya siyasî di hundir de berfirehkirina dana rûnişkandin tê û him jî xwe dispêre vebûna mercên navnetewî. Her wiha rêbaza dîplomasiyê di vê qonaxê de dikare kar bike.

“*Şerê taybet bidin rawestandin û pêşniyarên xwe li ser hev bikin*”

– Hûnê di civîna çapemeniyê ya roja Înê de agirbestê vebêjin û bidin diyarkirin ku agirbestê di nava merceke diyar de dirêjtir bikin. Dema vê dikin, hûn dixwazin peyamek çawa bidin zilamên

siyaseta sivîl ya Tirkiyê û di heman demê de artêş û leşkeran? Wê peyama we ya esasî ji zilamên siyaseta sivil û leşkeran re çi bibe?
---.: Em ê ji leşkeran re vê bêjin: Şerê taybet bidin rawestandin! Ji sivilan re vê bêjin: Pêşniyarên xwe yên siyasî li du hev bikin! Yanî di çareserkirina pirsgirêkên bingehîn de hema paketa siyasî ya demokratîk pêşkêş bikin! Ez ê ji leşkeran re jî bêjim; ji bo fersendek dayîna vê ev şerê taybet bidin rewestandin.

– Eve peyama we ya roja Înê?

---.: Ev e.

– Bi kinahî, we hemû xal pir zelal vekirin.

---.: Pir vekiriye.

– Me we westand. Bêguman hîn gelek tiştên bên gotin hene. Ji bo vê axaftinê destxeşiya we dikim. Bi rastî jî we bi awayeke pir zelal û rihet danî holê. Yanî dema ez ji vê hêlê ve temaşe dikim, gelek nakokiyên di serê min de zelal bûn.

---.: Yanî di vê mijarê de ji we re bêjim ku, pirsgirêk bi xwe tevlîheve. Ez, bi hemû hêza xwe ve hewl didim vekirî bibim; lê pêwîste nebêjin hûn çima pirsgirêkeke wisa tevlîhev hîn baştir û vekirîtir nadênin holê. Xwezaya pirsgirêkê bi xwe pir tevlîheve. Bi rastî jî tişta para min dikeve bawerim min, li gorî guncavbûna cidiyeta pirsgirêkê û bi taxtîkên herî baş ve pirsgirêkê daniye holê. Divê hema bi çavek nebaş li gotina taxtîk neyê temaşekirin; siyaset bê taxtîk nabe û carna taxtîk pir başin. Bi taybet xala ku ez niha di derbarê hawirdorên demokratîk yên Tirkiyê de bêjim ev e: Hûn jî neçarin hinek çareseriyan pêş bixin. Yanî siyaset kirin tenê ne karê hikûmetane. Heta li gorî min, parlamento û hikûmet ne di rewşa siyasetê bikin de ne. Van xwe girê dane. Ji ber vê, saziyên demokratîk û bi taybet çapemeniya ku parçeyeke wê ye, dikare di mijara çareserî pêşxistinê de risteke bandorker bilîze. Siyaset kirin mafê we hemûyane. Hûn jî herî kêm bi qasî yên din ji gel û welatê xwe hez dikin. Dîsa hûnê nexwazin gel xwîn birijîne û êş bikişêne. Hûn ê bi hinek riyên çareseriya demokratîk bawer bikin. Ez dibêjim ku, van hinek din, bi awayeke hinek paketkirî û rastîbîn bêxin rojevê. Divê ji hikûmetan zêdetir raya demokratîk dest bavêje pirsgirêkê. Ji ber yên herî zêde ziyanê dibînin evin. Demokrasî nayê bikaranîn, ji ber wê mirovê Tirk pêş nakeve û nikarin mafên xwe yên demokratîk bikar bînin.

Li vir ev diyar dikim: Bêçareseriya meseleya Kurd, bêçareseriya demokrasiya Tirke. Û diyare ev jî rê li ber windahiyeke pir zêde ya madî û manevî vekiriye. Enflasyona heyî li ser vê bingehiye; ev xetimandina aborî, anarşiya sosyal û xetimandina siyasî ji ber vê ye. Herî kêm biqasî me, yanî bi qasî Kurdan, pirsgirêk pirsgirêka we ye jî. A rastî pêwîste ez vê li ser hev ji we bipirsim: Pêşniyarên we çawa ye? Çima hûn ji me her tim pêşniyaran dixwazin, agirbest dixwazin, lê ji hêzên xwe yên leşkerî agirbestê naxwazin? Hûn çima ji hawirdorên xwe yên siyasî pêşniyaran naxwazin? Yanî bêjin ku em neteweke paşkeftîne û dîsa weke PKK jî tevgereke zehmet pêş dikevin, dibe gelek ecemî û şaşiyên me çêbibin; wê demê yên gihiştî, mîna geleke hinekê siyasîbûyîn û hûn rewşenbîrên siyasîbûyî, çima pêşniyaran pêş naxin? Hûn bêjin, em bişopînin. Heke yên me şaş bin, hûn rastiyan daynin, bi israr biparêzin û me bikişîninê. Hûn hîn bihêzin û di vê mijarê de derfetên we zêdetirin. Ez jî vê weke îdayeke beramber ji we hemûyan pirs dikim.

– Yanî hûn dibêjin; "*ez samîmî û cidî me*."

---.: Pir vekiriye. Heke wisa nebûyam, min nedikarî di navendeke cihanê yê herî bêhêz de bigihim berdevkiyê. Heke ne cidî û mafdar bûma, her tim henekan serê min tevlîhev kiriba, gelo ma ev mûmkûn dibû?

"*Demokrasiya herî baş demokrasiya sosyalîste.*"

– Birêz Serok di vê navberê de ji bo we dibêjin ku, "*xwe weke Xwedê dibîne, kes nikare li gel wî baxive, wî rexne bike û li beramber pêşniyar pêş bixe.*" Hûn ji bo vê çi dibêjin?

---.: Şahidê vê yê herî dawî hûnin. Ma hêza we ya axaftinê rawestiya? Berevajî, we bi xwe got ku fikir çawa zindî dibe. Heke kesayeteke min wisa hebûya, ev mûmkûn nedibû. Yek jî gelê bê ziman, gelê zimanê wê li zincîrê hatiye xistin kiye? Yê zimanê vî gelî li zincîrê daye kiye? Niha yê van zincîran parçe dike kiye? Bawerim ev pir vekirîne. Bersivên pêwîst ji îdayên dîktatorî û Xwedê re hat dayîn. Di vê mijarê de dikarim vê bêjim: Min têgeha Xwedê jî anî ber lingê mirovahiyê. Yanî çi tiştê mezinbûna Xwedê bilêv dike min wan kir malê mirovahiyê. Ji bo min vê kir, divê kes ji min re nebêje; "*tu xwe têxî şûna Xwedê*." Ji bo me siyasetê xist rojeva şivanê Colemêrgê yê ji rêzê, bila kes nebêje; "*te pîşeyê siyasî yê herî mezin û pîroz evqas xist ber lingan*." Bi

siyasetê re hevnasîn mafê şivanê Colemêrgê ye jî. Ev tişt hemû demokrasiya herî mezine.

– Başe hûn hîn marksîst–lenînîstin?

---.: Niha ez, di destpêkê de jî, weke we di salên 1970'î de kirî û bixwe binav kirî ne ew marksîstim û nebûm marksîstek wisa. Ev marksîstbûnek çawa bû, min ji wê jî pir zêde tiştek fam nekir. Dibêjim ev hinek tiştan dibêjin, başe çima evqas qerebalêxê derdixin. Ez tabloya 1970'î li bîra we bênim. Heke sosyalîzm tiştek evqas xweşike, ma nabe ev hîn baştir bê nîqaşkirin û derbazî jiyanê bê kirin? Ev, şêwaz û nêzîkatiyên xweser yên minê roja yekemin in. Her wiha pozîsyoneke min li gorî şêwazêmarksîstbûna 1970'î nemijara gotinê ye. Lê hûn dizanin ez ji wê navendê bandor bûm, min nîqaşên sosyalîst yên 1970'î pir gudar kir, pirtûk xwend; lê nebûm komûnîstek yerel, yanî nebûm têkildarî pergala sovyetê. Heke em hîn şênbertir îfade bikin, weke ku nebûm şêwazeke TKP yê komînîst, ji destpêkê ve li hember vê nêzîkatiyeke rexneker pêşket. Yanî lihevkirî nebûm. Dîsa gelek kombûnên Tirkiyê yên biçûk mezin çêbû; ne ku ji bo kêfa min gelek ji afirandina koman re tê, ji bo rewşa wan pir ji min re kêm hat, rêbazên wan berevajî hat, min pêwîstî bi serdeçûyîneke cuda dît. Yek jî hûn dizanin, sosyalîzma pêkhatî di cîhanê de paşve ket, lê em her tim bi pêş ve diçin. Başe tu ji vê re çi dibêjî? Dibêjî sosyalîstbûnek çawa?

– Vê bêjim; li ser esasê ku di vê çarçovê de mayîn, xala ku hûn îro gihiştinê, daxuyaniyên didin, yên we mîna yên li Rojava piranîparêze, derfetê dide hemû fikran û alîgirbûna we ya şêwazê jiyaneke piranîparêziya demokratîk datîne holê. Yanî hûn dibêjin ku, yêkîtiya eniyê ava bikin. Wê di nava yêkîtiya eniyê de komînîst jî hebin, şoreşgerên wê jî hebin, ev jî hebin, ew jî hebin. Yek, em polîtîkayeke bikin. Du, polîtîkayeke wisa bikin ku, di vê polîtîkayê de nasnameya Kurd weke heyî derfeta xwe îfadekirinê bibîne û polîtîka bi nasnameya Kurd bê kirin. Ger pêwîst kir biçin raferandumê, heke daxwazek wisa hebe. Hûn van dibêjin û ev hemû di cihek de dibe daxwazên pirparêz û demokrasiya beşdarvanî. Hûn jî êdî aligirê divê lîstîk wisa bê lîstine?

---.: Ne bawerim, nêzîkatiya min ya sosyalîst vê qebûl nake. Li gorî min, cudahiya nêzîkatiya sosyalîstbûnê têne ber çav. A rastî bi avaniyê monotolîk a di sosyalîzma pêkhatî de pêş xistin

gelek tiştan winda kirin. Xususa pirengî, mafê demokrasiyê dana cewaziyan, di sosyalîzmê de dikare hîn zêdetir mûmkûn bibe. Û di vê çarçovê de pêwîste heqê dest û lingan jî bê dayîn. Divê sosyalîzm, weke ya li ser bingeha kedê malavaniya jiyaneke dike, dîsa weke nêzîkatiyeke herî zêde nirx dide fikrê azad bê nirxandin û pêşxistin.

– Yanî hûn dibêjin ez sosyalîstim û bawer dikin sosyalîzm di nava demokrasiyê de bi awayeke hîn baştir pêş bikeve.

---.: Bêguman. Demokrasiya herî baş demokrasiya sosyalîste. Pirengî, pir dengînî, xwe îfadekirina cudahiyan û li gorî keda herkesî nirx dayîn di sosyalîzmê de mûmkûne. Lê sepandina derketiye holê berevajî bûye. Ez di sosyalîzmê de vê mîna sapmayek dibînim. Lê hûn dikarin bêjin ku, "*sosyalîzma hûn difikirin qet pêknehat.*" Ji pêkhatin û nepêkhatinê zêdetir, ji bo min ev meseleyeke baweriyê ye. Ez vê baweriya xwe diparêzim.

– Yanî dibêjin ez sosyalîstekim û vê baweriya xwe diparêzin.

---.: Belê. Di wê baweriyê de me heta ku civak hebe wê sosyalîzma zanistî jî hebûna xwe bidomîne. Yanî difikirim ku "*pêşkeftina civakî daneyeke û îfadeya vê pêşkeftina zanistî jî sosyalîzme.*" Lê dema vê diyar dikim, vekiriye ku wê weke siruştnasiyê nabe zanistek. Niha derketiye holê ku, pêwendiyên avaniya civakan ya jêr û jor, aliyên madî û manevî di sosyalîzma pêkhatî de bi awayeke pir xirab hatiye berevajîkirin. Rastiyên civakî pir xirab hatine bikaranîn. Yanî rejîma monolotîk pir xirab hatiye avakirin. Êdî tu çi navî li vê bikî bike! Niha derketiye holê ku wê çarçoveya civakî û diyardeya mirov vê zêde jiyan neke. Tecrûbeyên sosyalîzmê yên heyî, hemû nebe jî di asteke girîng de çi qebûl neke daye nîşan. Li gorî min, pêwîstî bi pêşxistina çi heye dikarin ji niha şûnde baştir binirxînin. Di vê xalê de jî bi taybet demokrasiya sosyalîst û faktora moral pir girînge.

– Dema dibêjin demokrasiya sosyalîst, gelo li gel we pênaseyeke vê heye?

---.: Bêguman. Me qala xala pirdengî ku jê re tê got kir. Dihizirin ku wê demokrasiya sosyalîst cewaziyan derbixe holê û biparêze. Vaye dîsa em dibînin ku di bin navê çînan ji nîşka ve û lez ji holê rakirinê de, ya rastî hilberînê di radeyeke bilind de têk dibin. Em dibînin ku çîniyatî ji holê nehatiye rakirin û cureyê

çîniyatiyeke cuda li ser bingeha vê tezê hatiye pêşxistin. Yanî di ezmûna Sovyetê de belavebûneke çînatiya dewleta kaptalîst derketiye holê û niha jî bi xîzanbûneke pir xirab re rûbirû ne. Ev şîroveya sosyalîst, a rastî hinek jî derket holê ku sosyalîzîm şîroveya kaptalîzmê ye. Li gorî min, bi awayeke lez hewlda mirovan bişibîne hev, lê niha mirovên herî dijraber li wir derdikeve holê. Diyare ev ne rastîbîne û dide nîşan ku ev hemû nerastîbînin.

Li vir divê mirov bi gelek şêwayan bê destgirtin. Dibînin ku weke dixwazin nikarin biperciqînin û bi tirsandinê bikin sosyalîst. Divê sosyalîzm, hîn xweşbînî, ji cudahiyan re hîn zêdetir mafê pêşveçûnê bide, li gel van mafê kedê jî bişopîne û di vê navberê de hêmana moralê, yanî bi mîsogerî pêwîste pergalek hêmana maneviyetê jî digire ber çav hebe. Yanî bêjin ku, “*berjewendiyên siyasîne, berjewendiyên neteweyîne*” wisa bi awayeke tirsehêz bi ser civakê de çûyîn bi xeter dibînin. Ji fikrên olî bigirin heta exlaqî û curbicuriya felsefîk ji hemûyan re tenê ne mafê jiyanê dayîn, bi girîngî bê destnîşankirin ku ji wan re hîn zêde vekirîbûn dana qezenckirin û azadiya xwe îfadekirinê dana nasîne. Diviya sosyalîzim ji hemû demokrasiyên bi navê kapitalîzma heyî tên pênasekirin hîn zêdetir cî daba van mijaran. Li gorî min, ji bo ev hemû nehatin pêşxistin ev ezmûnên sosyalîzma pêkhatî di asteke girîng de ji hev ket.

– Belê, em gelek sîpasiya we dikin!

“*Bi qasî Kurdan pêwîstiya Tirkan jî bi nêzîkatiyên wêrekî heye*.”

**Ramazan Öztürk**: Ez jî dixwazim pirsek bikim. Niha tê dîtin ku Talabanî di navbera we û Tirkiyê de erka navbeynkariyê hilgirtiye. Bawerim wê HEP jî bigihin civîna çapemeniyê. Heke negihinê jî, ev pêvajoya aşitiyê lewra ger dewlet samîmî be, hûnê guncav bibînin ku parlementerên HEP jî navbeynkariyê bikin? Yanî hûn dibêjin ji dêla Talabanî bike, parlementerên Kurd yên niha di meclîsê de bikin guncavtire?

---.: Li gorî min, yêkî dilê wî bixwaze bila bike. Ez ê sibe ji nûnerên çapemeniyê re jî bêjim; ji bo vê agirbestê, ji bo naybeynkariyê hûn çi dibêjin ev li gel min dibe û heye, bila tenê kar pêşve biçe. Kî kar pêşve bibe, di vê mijarê de hevgirtîbin bila ew bibin navbeynkar. Ne şerte tenê Kurd bibin navbeynkar, Tirk

jî dikare bibe navbeynkar. Hêjmareke zêde hawirdorên Tirk-demokrat sosyalîst, heta gelek hawirdorên cur be cur yên bi cidiyeta meseleyê bawer dikin, dikarin hinek nêzîkatiyan pêş bixin. Ev, tenê ne meseleya min ya şexsiye, tenê ne meseleya hinek Kurdane jî, meseleya gelane. Herî kêm bi qasî Kurdan, divê mirovên gelê Tirk jî pêwendî pêşbixin. Xususeke li ecêba min diçe ev e: Berê digotin; "*tenêTirk bi vê meseleyê difikirin, çareser dikin*" niha jî dibêjin; "*bilatenê Kurd bifikirin çareser bikin.*" Herdu jî nêzîkatiyên kêmin. Herî kêm bi qasî Kurdan, pêwîstî bi nêzîkatiya Tirkan a wêrek jî heye. Di vê mijarê de hûn hemû, tenê ne weke temaşevaneke çapemeniyê, di nava nêzîkatiyeke meslekî ya teng de li pirsgirêkê temaşe bikin, hûn dikarin bi ferzkirina nêrîn û helwestên rast dibînin re hinek tiştan bikin. Li gorî min, rojnemegeriya hevgirtî jî eve, pîvana hevgirtî ya bûna demokrat jî ev e. Ev, qet nayê wateya hûn "*rojnemegerê PKK'ê*"ne. Niha şîroveyên wisa pêş dixin, dibêjin; "*rojnemegeriya Apo*;" tişteke wisa nîne. Li gorî min ev hinek fişalin. Heke di holê de hinek rastî hebin û kî vê bêje em ê sipasiya wê bikin.

– Niyeteke we ya li Bakurê Iraqê bicîbûnê heye?

---.: Bawerim hûnê di civîna çapemeniyê de wê jî bipirsin. Biryarek mîsogerkirî nebe jî, di rewşeke ku merc asayî bibe de dikare bê fikirîn. Bêguman ez her tim welat difikirim. Heta li Rojhilata Navîn mayîn jî, ji bo hinek nêzî welat bim. Yanî cî pirin; lê weke tercîh tenê ne Başûrê Kurdistanê, difikirim Bakurê Kurdistanê jî tengav bikim. A rastî heke xebatên me yên li Botanê baş bimeşe, ez ê di demeke nêz de bêjim çima li wir nebim. Dîsa weke pirî caran hatî gotin heke navenda polîtîk destdayî bibe, di nava wexteke kin de bizat bi navenda têkoşîna polîtîk re, ji bo çûyîna ezê hemû deverên welat tengav bikim. Jixwe êdî çalekiyên me ketina me ya nava welat ferz dike.

– Yanî hedef di zemînê Tirkiyê de xebatên legal meşandine.

---.: Legal nebe, wê bi riya tengavkirinê çêbibe. Ez zêde ne aligirê ku li derve bimînim. Min di vê mijarê de sebreke mezin da nîşan. Çarde salên xwe tijî dikim, sala pazdan jî sînorên welat tengav bikim. Him bi sîlehê, him jî aşityane tengav bikim, Başûr tengav bikim, Bakur tengav bikim. Tabî ez ê bixwe biryara şêweyên wê bidim. Nebawerim hêzek ji derve bikaribe di vê

mijarê de min tengav bike û ji derveyî îradeya min di nava sepandinek de bibe.

– Ez ê tiştek din bipirsim; li Stembolê beriya niha hawirdorên Kurd hinek civîn çêkiribûn. Li wir hinek nêrîn derdiketin pêş. Weke PKK ti sazî û dezgehên Kurd ên ji derveyî sîwana xwe naxaze. A rastî axaftinên we yên beriya niha ji van gumanan re bû bersiv. Hat dîtin ku tiştek wisa nîne û ji herkesî re vekiriye. Hûn dibêjin ku "*kî dixwaze bila derkeve holê, kî dixwaze bila hevdîtin çêke, bila dewlet jî pêşniyarên xwe dêne holê*". Bi vî rengî îdayên li wir jî ronî dibin.

---.: Ew hawirdor heya bêjî subjektîf difikirin. Di wê baweriyê de me ku çalekiyên me pêşkeftinan pêk aniye. Dîsa heke dixwazin siyasetê bikin, bawerim ji bo vekirina riya vê, wê alikariya me biçûk neyê dîtin. Divê xwe ji wan xwegirtîbûnên xwe rizgar bikin. Vê jî destnîşan bikim: Naxwazim di nava nirxandineke xapînok ya mîna "*wê PKK tasfiye bibe yan jî pir tengav bûye, xeşîme, nizane polîtîkayê bike, bi vî rengî têkoşîna çekdarî jî pêwîst nake, niha navend ji siyasedmedaran re vedibe, siyaseta herî baş jî em ê bikin, em hostayî van karene, dem dema me ye*". Yên ku heya vir van karan anîne, wê siyaseta baş jî bikin. Demînan ev li Tirkiyê hebû digotin, yên wisa tenê sîlehê girtine, tenê dixwazin hertiştî bi tundiyê çareser bikin ji polîtîkayê fam nakin, lê ev ji bo me nederbazdare. Sîleh ji bo me, polîtîkaya herî siftbûyî ye. Her wiha em di hêza polîtîkaya herî baş bikin de ne. Ez naxwazim wan veder bikim. Bi rastî jî heke baweriya wan bi xwe hebe û dixwazin fonksiyoneke polîtîk bidest bixin, em ê heya dawî bibin alîkar. Lê weke heya niha sekinîne û nirxandinên weke, "*wiha mericîn, tasfiye bûn, dor tê me, roj bû roja me, êdî em ê encama binirxînin*" kirin nereste û nêzîkatiyên wisa oportûnîst jî bixeterin. Min hinek şiyariyan kiribû û ji bo qadên din jî vê li ser hev dikir. Ji bo hêzên Başûrî kir. Û ji bo hêzên Başûrî vê hinekî fêm bikin, pêwîst dibînin ku bi me re pêwendiyek xurt pêş bixin. Dîsa ji ber komên mîna HEP'ê jî hînekê fêm kirine pêwîstiya piştgiriyê dibînin.

Dubare bêjim, ez ê niha bangawazî ji gelê Kurd re bikim bêjim ku wî kesî yan jî komê destek nekin, ew kes yan jî kom nikarin gavek bavêjin. Yanî yêkîtiya vî gele wisa erzan ava nebûye. Bimirin jî ya rastî wê hinek me temsîl bikin û dikare vê

yêkîtiyê bimeşîne. Ji ber vê her kesê ku bixwazibe polîtîkayeke rastîbîn bike, wê ev yêkîtiya di encama kedeke mezin de çêbûye dîqat bike û hewl bide layîqê wê bibe; wê hewl bide bi parçeyeke wê bigire yan jî alîkariyeke bike. Em ji herkesî re dibêjin cîh heye. Dîsa rêza me ji tecrûbeyên wan re heye. Lê heke xwediyê keda mezin bidin aliyek û daxwazên têqez yên gel pê ve girêdayî bimênin paşçav bikin, bikevin bin polîtîkaya erzan a bajarokan ya pirî caran li Tirkiyê tê gotin wê nikaribin polîtîkayê bikin. Li Tirkiyê dema polîtîkaya wisa kirinê derbaz bûye. Dubare vê bêjim ku, siyasedmedariya hikûmetê ya niha û heta siyasedmedariya partiya heyî ji niha şûnde nikare zêde encam bigire.

Ji we re tişteke din bêjim: Niha hinek nêzîkatiyên Ozal pêşxistine hene û li gorî min hîn li pêşe. Dixwazî li gel bibin û dixwazî li beramber bibin, ji ber ew jî di nava têkoşîneke zêde de ye li gorî min rastiyan hîn ji nêz ve ferq dike û wiha dibêje; “*bi tîpê hizbayatiya kevin re kar nayê kirin.*” Ji aboriyê bigire heya rejîma siyasî di derbarê mijarên cuda de li nêrînên nû digere û dibêje; “*pergala serokatiyê hîn guncavtire û partiyên nû ancex dikarin li ser van armancên esasî pêş bikevin.*” Ev ne gotinên vale tên gotinin. Li Tirkiyê statûkoya heyî, bi rastî jî îqtîdar û muhalefeta wî xitimandiye. Yên wisa di Kurdan de jî, di Tirkan de jî hene. Ev êdî hatine rewşa faktora kevneperestiyê. Ji bo hinek guhertinan em tengav dikin. Hinek jî bawerim Çankaya tengav dike. Dema em vê dibêjin, hema tê gotin ku “*hatin ba hev.*” Mesele ne hevgihîne û li gorî min jî ev nêzîkatî hinekê bi şêweya bertek û bandorê ye. Yek li ser vê bingehê “*nîqaşa komara duwem*” tê kirin. Ez vê nîqaşê jî hinek watedar dibînim. Dibe naveroka wê cuda bê hizirîn, lê bi mîsogerî pêwîstî bi avabûneke ji nû ve heye. Weke min di serî de jî gotî ji nasnameya Kurd heta nasnameya demokrasiyê hertişt li cihê xwe rûniştin, ancex bi teşegirtineke ji nû ve dikare bê temînkirin. Mesela li Fransa komara 5. mijara gotinêye, dîsa li Îtalya qala komara 2.min tê kirin, wê demê li Tirkiyê jî komara 2. hizirîn a rastî ne nêrîneke xayînane ye; ne fikreke pir xiyalî yê entele jî. Berevajî bi rastî vê tengav dikin. Statûkoya heyî jî dewra xwe temam kiriye, divê êdî bê derbazkirin.

Ev hemû tiştên me gotin, bi giştî bersiva pirsên polîtîkayên nû çawa pêktên, li ser vê bingêhê partiyên nû çawa ava dibin û çawa fonksiyon digirene. Ez ji herkesî re pêşniyar dikim ku van pêşkeftinan bigirin ber çav û li gorî wê hewlestên polîtîk diyar bikin. Çi Kurd, çi jî Tirk, rastî û guhertinên girîng hildin dîqatê, bi ser pêkhatinên nû de biçin û di nava van pêkhatinan de jî xwe di devereke rastîbîn de bicî bikin.

– Ev agirbesta yekalî ku we destpêkiribû meheke xwe temam dike. Di nava mehek de bi dewletê re temaseke we rasterast yan jî nerasterast pêk hat? Hat xwestin çêbibe?

---.: Vaye ev navbeynkar hene. Mînak Talabanî heye, mijara rojnemevanan heye. Nizanim, hinek nirxandinên wisa tên û wiha dibêje; “ev gotin yên ku di hevdîtina bi wezîran re yên ez bejdar bûyîme, lewma van dibêjim.” Heke em ê ji van hemûyan re bêjîn navbeynkarî, -jixwe pozîsyona Birêz Talabanî jî dişibe vê-, hinek pêşkeftin mijara gotinêne û bawerim wê di van rojan de ev hinek din lez bibe. Nêrîn û agahiyên herî dawî yên ku min ji yên bi hikûmetê re di nava pêwendiyeke nêz de ne, dîsa bi Çankayê re di nava pêwendiyeke nêz ya hevdîtinê de ne girtine wiha ye. Jixwe min diyar kir ku di vê mijarê de hevdîtinên Birêz Talabanî pêk anîbû nirxandineke berfireh ji me re rava kiribû. Yanî bi temamî ne navbeynkarî be jî, çûyîneke nêzî wê dibe.

– Yek jî ji derveyî Ozal hûn kîjan lîder yan jî partî kî yan jî kîjanan herî zêde nêzî çareseriya aşitiyê dibînin?

---.: Berê dîtineke min hebû; min digot ev pêşkeftin dibe bi taybet di nava artêşê de bibe mijara gotinê. Yanî divê avaniya artêşa heyî ji hinek pêşkeftinan re vekirîbe. Îdaya Ozal ewe ku, artêş jî xwe digire cidiyetê. Lê nizanim. Heke wisa be, wê demê pêwîst dike Ozal hinek gotinên wêrek û pêşniyaran pêş bixe. Tê gotin Demîrel pir newêreke. Tê dîtin ku bi ti awayî ji statukoparêziyê xilas nebûye û di vê mijarê de, tenê ne bi awayê temkînlî, tê dîtin ku pir stewr maye. Zêde statukoparêz û di vê wateyê de di nava nêzîkatiyeke dewletparêz de ye. Jixwe Înonû jî parçeyeke wê nayê qutkirine. Dibînin ku Mesut Yilmaz di vê mijarê de hîn zêdetir dewletparêze û heya rojên dawî jî ev wesfa xwe domandiye. Partiya Refah di nava nêzîkatiyeke cuda de ye; wisa ji pêşniyarên nû pêşxistin zêdetir, hewl dide nêzîkatiya xwe


ya heyî pêş bixe. Rewşeke hêzên çep yên pêşniyareke yekpare pêş bixin nîne; beriya hertiştî xwe ji rewşa bûna hêztiyê derxistine.

Wiha rewş wisa ye. Û vê jî bêjim: A rastî nebûna me ya muxatab, li Tirkiyê pirsgirêkeke muxatap nedîtin heye. Li Tirkiyê pêşengtî di rewşa qrîzê de ye. Jixwe ji nîqaşên rojane jî hûn baş dizanin ku, ka Lijneya Ewlekariya Netewî desthilatdare, yan Çankaye, Civata Wezîran, yan jî parlamento; nediyare. Di vê wateyê de a rastî serokatiyeke nehatî rûnişkandin mijara gotinêye. Li Tirkiyê qirîzeke cidî ya serokatiyê heye. Dikarim bêjim ku kêm zêde ev di me de hatiye çareserkirin. Ji bo ez im vê nabêjim, lê kêm zêde hatiye îzbatkirin ku me alî daye polîtîkaya neteweyî. Lê navenda Tirkiyê ya ji pirsgirêkên sereke re pêşkêşkirina pêşniyaran weke tê xwestin amade nekiriye. Niha heke bêjîn navend Lijneya Ewlekariya Mîlliye, wê li Tirkiyê zêdetirîn bêjin "*na, ne wisa ye*". Heke bêjîn navend hikûmete, wê zêdetirîn bêjîn "*na, ne vire jî*". Başe heke bêjin Çankayeye, wê bêjin, "*na, ew ji xwe re taxive.*" Heke bêjîn parlamento serwerî hertiştiye, wê bêjin "*herkes dizane ew ne wisaye*". Başe ev tê çi wateyê? Saziyeke serokatiyê û her wiha diyar dibe ku nebûye xwedî navenda pêrgaleke pêşniyaran a bawerî pê bêne. Jixwe yek ji sedema tengaviyan jî ev e. Yanî navendeke wisa bifikirin ku, bawerî bi xwe bêne di pirsgirêkên bingehîn de nikaribe pêşniyarên çareserkirinê pêş bixe. Wiha Tirkiye qrîza vê jiyan dike. Ji dêla bêjin em "*PKK'ê yan jî Apo muxatap bigirin,*" ji çareseriya pirsa "*em li Tirkiyê kî muxatap bigirin*" bigerîn wê bi watetir be. Wiha pergala serokatiyê, çarçoveyeke zagona bingehîn, dîsa nîqaşên qanûna partiyan ji bo ev qirîz bê derbazkirin divê bikin rojev. Di çareseriya pirsgirêkan de, çareseriya pirsgirêka serokatiyeke wisa jî heya bêjî dibe bi bandor bibe.

– Hûn her hebin û pir sîpasiya we dikin.

---.: Ji bo ev hevdîtina pir tijî derbaz bû loma ez jî sîpasiya we dikim!

**15 Nîsana 1993**



*"Ne tenê aliyê me, ez nirx didim nêrînên hêzên din jî. Dibe ku ev hêzên Kurd jî bin; hêzên demokratik ên ji Tirkiyê jî dibin, heta dibe ku derdorên fermî bin. Em ê niyet û daxwazên wan jî berçav bigirin û dixwazin vê pêvajoyê pêkve bimeşînin."*

*"Li naverastê êş, xwîn û tengaviyên mezin hene.*

*Pirsgirêkên dîrokî tehemûl nake ku zêde bên taloqkirin.”*

**Hevpeyvîna rojnemevan Rafet Ballı ya di dîroka 15 Nîsana 1993’ de kirî:**

## HERÎ KÊM BI QASÎ XWE ÎDAYA ME YA GUHERTINA TIRKIYÊ JÎ HEYE

**Abdulah Ocalan**: Dayîka min gotiye: “*bila ev gava herî dawî avêtî jî kur bike*”. Baş gotiye. Ji bo bibim kurê dayîka xwe yê herî baş a rastî ez yek ji yên ku kedeke herî xweser dide meşandinim. Hûn vê mijarê zêde dipirsin. Ev ji rêzdariya zêde tê. Girêdana min ya bi rastiya dayîkê ve cihê min yê di têkoşîna azadiyê de ye. Hemû jiyana dayîka min, ji bo ber bi azadiyê ve bimeşim min pir tengav kiriye. Dîsa weke jinek, min tengav kiriye ku girîngî bidim azadiya jinê. Û ev jî girêdana herî rast ya bi rastiya dayîkê ve ye.

**Rafet Ballı**: Başe mijara me mirine. Dema hûn mirina hevalên xwe yên hûn herî zêde jê hez dikin û nirx didinê dibihîsin çi hîs dikin?

---.: Di van mijaran de, ji ber gelek nirxên bêwext şehîd bûyî hene, êdî hêzeke me ya berxwedanê pêş ketiye. Lê min van hemûyan, veguherandiye şêwaza xebata xwe û tempoya xebata xwe. Min tempoyeke wisa afirand ku, êdî çiqas şehîd çêbin jî bîranîna hemûyan di nava vê de ye û tê jiyîn. Min ev êşên mezin hemû, veguherandiye serkeftina vê têkoşînê. Weke din hêzake din ya rakirina şehîdan nîne. Dikarin bêjîn ku, “*te xwe bixistina vê rewşê a rastî xwe ji êşa şehîdan ya mezin hinek dûrxist*”. Êşên

şehîdên Tirkiyê yên berxwedana 1971 tabî şehîdên me yên herî dawî û heta êşa dayîka min, min hemûyan, bi pêkanîndina têkoşîneke mafdar, di cî û serkeftî re derbaz dikim. Bi awayeke din rakirina evqas êş nemûmkûne.

"*Em ê polîtikayek bijare ya Kurd derxîn holê"*

– Başe. Niha hûn dikevin demeke nû û ketinê jî. Li gorî min hûn di qonaxekê de ne. Lê rica dikim ez ji we nirxandineke giştî ya weke *"şer îfadeya lêhûrbûyî ya polîtîkayê ye*" naxwazim. We siyaset, yanî li gorî rastiya peyvê pêvajoyeke ku amûrên siyasî li pêş be daniye pêşiya xwe. Hûn rêxistinek bi sîlehin, hûnê bikaribin siyasetê biser bixin? Mesele ne meseleya Abdulah Ocalan hînê vê ye yan jî ne hînê vê ye. Dema em bi giştî temaşe dikin di dema nû de behreya întîbak ya rêxistinê heye? Wê bikaribe siyasî bibe, polîtîk bibe?

---.: Em ji serî heya binî tevgereke siyasî ne. Aliyê me yê leşkerî weke tê zanîn zêde pêş neketiye. Taybetmendiyên leşkerî bihêzin; lê leşkerîbûn weke me dixwest pêşneketiye, taybetmendiyên erênî bi temamî neketine meriyetê. Siyasetkirina me, ji askerîkirina me nezehmetire. Avaniya rêxistinê zêdetir nêzî siyasîbûyînê ye. Dikarim vê bêjim: Me di PKK'ê de xebatên îdeolojîk kirin, xebatên siyasî kirin û pir pêşxistiye. Û heta me pêşxistina jiyana civakî pir baş bi bingeh kiriye. Leşkertî karek hinek zehmete. Lê em ê wê jî bi ser bixin. Ji ber vê di qonaxa nû de rewşeke me ku siyasetê pêş nexîn nîne.

– Kadroyên we hene? Besin?

---.: Bawerim ji bo di vê îstîqametê de potansiyela wan pir bihêze wê tecrûbe qezenc bikin. Wê bikaribe bibe polîtîkvanê baş-ev tenê ne di nava PKK'ê de- hêjmareke berfireh elîtên Kurd hene. Ji van hemûyan re şanseke polîtîka bi wan dana kirin heye. Çi di nava me de bibe, çi jî ji derveyî me bibe, em ê elîteke Kurd yê polîtîk derxîn holê. Ev jî xebateke xweşike. Û wê ev Tirkiyê jî bandor bike. Yanî arenaya Tirkiyê jî ya polîtîk xitimiye, a rastî polîtîkvanên wan yên yeman nîne. Em ê di nava Tirkiyê de deriyê polîtîkayê vekin. Û dibe di Tirkiyê de jî cureyê şoreşger û demokrat polîtîkvan pêş bikeve. Em di mijara nûjenbûneke wisa de teng nêz nabin. Dixwazin di Tirkiyê de polîtîkvanên baş

derbikevin pêşiya me. Bi kinahî, di van mijaran de amadekariyên me hene.

– Niha, hema piştî agirbestê deklarasyona we ya hevbeş a bi Kemal Burkay re hat. Hema piştre, bi qasî min ji nîqaşên nûnerên komên cur bi cur yên Kurd û fermandarê we Cemîl Bayik fam kir, eniyeke hevbeş yê rêxistinên Kurd yên bi eslê xwe Tirk di rojêvê de ye. Ev xebat di çi qonaxê de ye? Heya niha kîjan komên Kurd û şexsiyetan ji vê bûyerê re gotine erê?

---.: Wê hema hemû bên û wê ji bo ev yêkîtiya cepheyî gavên rast bên avêtin. Bawerim wê ev li gorî hêza heyî pêk were.

– Di vê mijarê de hevdîtinên pêşîn çêbû?

---.: Çêbû, tê çêkirin.

– We, ji derveyî Kemal Burkay bi kî re hevdîtin çêkir?

---.: Hema hema hemû di rewşeke hevdîtinê de ne.

–We bi kî re hevdîtin kir?

---.: Komên di bin navê Hevgirtinê de hatine ba hev hene, min bi hemûyan re hevdîtin çêkir.

– Bi Îbrahim Güçlü û Hatice Yaşar re?

---.: Bi Îbrahim Güçlü, Hemreş Reşo û Ruşen Aslan re çêkir. Di van rojan de yên nû jî tên. Hevdîtin pêş dikevin, astengî nîne û heya dawî rêya vê vebû.

– Di vê kêliyê de dikarin bihesibînin ku we di prensîban de li hev kiriye?

---.: Bêguman. Nîqaşên prensîban nîne. Min hemûyan serbest berdaye; çi binivîsin, binê wê xêz dikim û îmza dikim. Di vê mijarê de pirsgirêka min nîne.

– Ev çeka vekirî ji kî derê tê?

---.: Rewşa heyî tê wateya deriyê vekirî û ji hemûyan re rewşa heman tişt gotin derdikeve holê. Ya ji min re dikeve jî îmza ye.

– Yanî hûn dibêjin “*em di vê mijarê de zêde hûrgilî nabîn*”.

---.: Qet pêwîst nake.

– Wê ev enî kengê ava bibe?

---.: Me wê jî ji wan re hiştiye.

– Texmîna we?

---.: Di nava çend mehên pêşiya me de bê îlankirin.

- Di nava çend mehan de...

---.:  Zû, yan jî dereng?

– Bi awayê ku hîn zûtir bê avakirin hinek tişt hatibûn gotin.

---.: Bêjîn meha li pêşiya me. Wê ji vê hîn zûtir bê fikirin?

– Wê navê wê çi bibe?

---.: Ev negirînge, her çi nav dibe dikare lê bê kirin. Eniya Neteweya Kurd dibe.

– Eniya Neteweya Kurd, yan jî Eniya Neteweya Kurdistan?

---.: Eniya Neteweya Kurdistan. Me ji vê re gotibû ERNK. Heke ne ecibînin, wê naveke din lê bikin.

– Hûn ji wê re jî vekirîne.

---.:  Vekirî me. Yanî di vê mijarê de...

- Rezerveya we heye; yanî ji bo ew bên, ji ber ew nikarin bên?

---.:  Na. Hemû dikarin bên.

– Vejîn jî dikare bê?

---.: Dikare bê, bila "*Vejîn"*jî bê. Di vê mijarê de tengaviyeke min nîne.

– Yanî ti qeyd û şerteke we nîne?

---.: Şerteke min tenê heye; wê xirabûnê nekin, wê ta ji derve nekişîne sist neke. Yanî wê hinek tehn bidin, wê bêjin *"xirabikin*" bila ev nebe, bese. Bila bi xwe bifikirin û biryar bidin. Şartê min ev e.

– Gelo diyare hûn ê li kî derê kom bibin?

---.: Li her deverê dikare kom bibe. Wê li Avrupa, Rojhilata Navîn, Kurdistan û Tirkiyê civîn pêş bikevin. Bawerim dibe li Başûr îlankirin pêk were.

–  Li Hewlêr'ê?

---.: Dibe. Li Hewlêr yan jî çiyayeke.

– Êdî hûn bûn polîtîkvanek, divê hûn di salonek de bikin.

---.: Wê nîv bi nîv li qampan jî bibe, li wir qamp bihêzin.

– Piştî evqas sal şûnde cara yeke bi telefonê bi mirovên rêxistinên Kurd yên di asta serokatiyê de ne daxivin. Başe we çi hîs kir?

---.: Pir normal bû. Yanî heta yên pir zêde me rexne kirin jî…

– Yên we bi ajantiyê suçdar kirine.

---.: Hinek maweyan derfet bidîtana wê li hev bidana, lê di ev dema dîrokî de heta dawî hevdu gihiştî pêşwazî kirin. Êdî ev jî asteke Kurd ya pêwendî û nakokiyê ye. Di vê qonaxê de difikirim ku bi wan re bibim alîkar. Heke eleqe pê tênin û îtîbar dikin, ya ji min re dikeve, wan hinek din nêzî welatê wan kirine. Bila biçin rastiyên xwe nas bikin û hinek xizmet bikin. Bes bila ji min xizmetê bixwazin! Ji derveyî vê tişteke din naxwazim.

– Şarteke we ku bêjin bibim serok heye?

---.: Qet pêwîstî bi vê nabînim.

– Başe di mijara ku berdevkeke eniyê, sekreterê giştî û serokê wê bê hilbijartin de; nîqaşek çêbû?

---.: Di vê mijarê de jî heya dawî vekirîme.

– Ev hat rojevê?

---.: Nehat. Di van mijaran de wê zêde pirsgirêk dernekevin. Weke min gotî, di me de pirsgirêka serokatiyê di asteke girîng de hatiye çareserkirin.

– Hûn dibêjin rihetim.

---.: Dubare bêjim, ez xwe nafikirim. Dewlet bê avakirin jî, wisa weke hûn dizanin xwe serokomar dana îlankirin jî weke tişteke heyrantî bide avakirin nabînim. Şêwazê min yê xebatê ji destpêkê ve rêvebertî ye. Ji dibistana seretayî ve ev wisa ye.

– Humeynî jî di dewleta Îranê de ne serokomar yan jî serokwezîr bû, lê hemû tişt di destê wî de bû.

---.: Ne wisa jî. Ez sazkerekim, ne weke Humeynî me. Îsa jî ne serokê dewletek bû. Yanî hinek şibandin hene. Ez ê xizmeteke dilnizmî bimeşînim. Ez çawaniya xizmetan dizanim, di ferqa hêza xwe de me jî, lê xebata min bi rastî jî weke kedkareke. Heke li çep rastê xwe temaşe bikin, wê bê dîtin ku wisanim.

– Nîqaşên we li ser modeleke ji bo ev eniya rêxistinên Kurd yên bi eslê xwe Tirk çêbû?

---.: Na.

– Wê çi bibe? Yanî wê herkes bikaribe xweseriya rêxistinbûna xwe biparêze?

---.: Dikare biparêze.

– Wê bikaribe biparêze! Lê wê bernameyeke vê eniyê çêbibe. Hûn ê li ser esasê vê bernameyê û di zemînê wê de bixebitin?

---.: Bêguman.

– Xetên giştî jî be, di derbarê bernameya eniyê de hinek xalên sereke di hevdîtinan de hatine destnîşankirin.

---.: Hema ji sedî heştê xususên di bernameyan hemûyan de weke hevin.

– Deklarasyona we bi Kemal Burkay re kirî jî wê bê daxîlkirin, ne wisa?

---.: Bêguman wê bê daxîlkirin. Di wan mijaran de jî em ê nekevin tengaviyê. Hema hema şirîkîbûn di astek de yeke.

– Yanî niha ti pirsgirêk derneket?

---.: Derneket.

– Başe modela FKÖ, yan jî modela eniya Kurdistana Iraqê?

---.: Dibe ji herduyan jî hinek cudatir be.

– Mesela çawa?

---.: Ji ber çawaniya rêxistinan cuda ye. Rêxistinên heyî, weke mîna yên di asta FKÖ de nîne, ne weke rêxistinên di Kurdistana Başûr de ne jî. Ji yêkî pêşdetire, ji yekê jî şûndetire.

– Ji kîjanan pêş de ne?

---.: Ji Eniya Kurdistana Iraqê pêş de ne, lê di warê polîtîk de ji hêzên FKÖ paşdetirin. Di vê çarçovê de dibe yêkîtiya xweser pêş bikeve.

– Başe dibe yek partî bê rojevê? Hûn ê vê bixwazin?

---.: Bêguman, ji min re wisa tê ku mîna partiyeke eniyê yê legal tevbigerin.

– Partiya enî!

---.: Dibe ev di Tirkiyê de weke legal pêşbikeve. Yanî dibe şiyarbûna Kurd a siyasî hewl bide xwe di sînorên zagonî de îfade bike.

– Partiya legal avakirin hat rojevê?

---.: Wê bê rojevê. Mercên wê bilez kamil dibe. Bawerim di mehên pêşiya me de wê partiyek leqal, hîn bi deng, beşdarbûnek berfireh û bi awayeke rêkûpêk bê rojevkirin.

– Wê demê wê ev HEP çibe?

---.: HEP jî di nava vê de tê fikirîn. Jixwe îhtîmala girtinê heye.

– Piştî van pêşkeftinan şûnde bawerim zêde ne li bendê ne.

---.: Ne li bêndê jî be wê xwe bigire. Û bi berfirehkirinê ve wê ji nû ve veguhere partiyekê.

– Niha hevdîtinên min bi berdevkên rêxistinên Kurd yên din re kirî-tabî bi telefonê-, di bernameya xebatê ya eniya Kurd a Tirkiyê de encamek wisa derdikeve holê ku wê pêşîkî ji temasên dîplomatîk yên Rojava re bê dayîn.

---.: Çawa?

– Yanî hinek tiştên wiha gotin; "*em ê eniyeke hevbeş ava bikin û bi awayeke lez di biryargehên Rojava de, li cem hikûmetên Rojava ji bo doza xwe vebêjin bikevin nava xebatekê*". Hûn çawa nêzî vê dibin?

---.: Em ê hinek aliyê hûndir, wê ew jî aliyê derve pêş bixin.

– We peywirdarkirineke wisa çêkiriye?

---.: A rastî ev jî zêde ne bi wateye. Ji ber wê derve jî dengê me pir baş bibihîse. Lê ev pir parçe bûne û bê bandor bûne, her wiha van komkirin tişteke başe. Belavbûna zêde a di hêza Kurd de pir ziyanê dide. Niha wê ev organîze çêbibe. Belê ew pir ji derve mane û tabî wê bikaribin ji derve zêdetir kar bikin. Lê li derve jî em ji wan zêdetirin û bihêztirin. Yanî pirsgirêka me ne ev e. Pirsgirêka me, mirovan bi karên bê wate re ji quwet xistine. Jixwe hêzeke Kurdan a sînordar heye; van di şirîkatiyeke kêm de kirina yeke. Ji ber vê êdî pirsgirêkên kariyerê girîngiya xwe winda kiriye û a rastî pirsgirêkên rêgez jî hatine dahûrandin. Yek jî navenda Tirkiyê di şîdeta berê de nîne. Ji ber van sedeman dibe ku pêşkeftinên heyî hinek pêşve bibe.

– Hûn ê li welatên derve bîroyan vekin?

---.: Jixwe bîro hene.

– Na, li welatên derve li ser navê Eniya Kurdistaniya Tirkiyê, bi wê nasnamê, bi wê tabelayê wê bîro vebe? Di rojevê de tiştek wisa heye?

---.: Bêguman dibe vebe. Dibe bi hêsanî bîroyên hevbeş pêşbikevin.

– Hûn dibêjin tiştek wisa heye.

---.: Yanî xwezayî ye. Wê him ji hûndir ve him jî ji der ve nûnerên komên hevbeş derkevin.

– Başe, beriya niha min bi hemû komên Kurd yên hemwelatiyê Tirkiyê ne hevdîtin çêkiribû, xaleke wan gotibû hebû û her ku diçû dozaja xwe nerm dikirin digotin: "*Em dikarin bi PKK'ê re hevpar tevbigerin. Ev pir xwezayî ye. Li gorî me tevî*

*hinek xetayên wan çêbûye jî, ew jî hêzeke Kurd e. Hêzeke Kurd yê girînge. Lê berê li hember komên Kurd yên welatparêz-ez bi terminolojiya wan dibêjim- tundî bikar anin. Van helwestên pir tund û doxmatîk girt. Divê rexnedaneke bê kirin.*” Gelo ev hat rojevê?

---.: Nebawerim, êdî nikarin vê bidin pêş. Rexnedan pratîka serkeftiye. Heke me rexnedana xwe nedabûya, me nedikarî bê van rojan. Ew rexnedan hatiye kirin. Ez tamînata vê jî bidim we. Heta aniya Tirk jî vê pir zêde dibêje. Lê tevgera yekem ya herî zêde rexnedan daye min. Rexnedan, xwe ji xitimandin û darbendê xilaskirin siyasîbûn kirine. Careya yekem me vê kir.

– Başe xebateke we ya Meclîsa Neteweyî hebû. Li Avrupa hilbijartin çêbû. Bi qasî min ji hevalên we fam kiriye, li Tirkiyê jî tiştên dişibin vê çêbûne, ji bo Meclîsa Netewî hinek nûner hatine hilbijartin. Wê ev çi bibin? Ev xebat hewldaneke we bû. Niha ew çawa nêzî vê bûyerê dibin?

---.: Wê ev jî bê pêşxistin û her ku biçe wê ew jî tevlî bibin. Dema yêkîtî û cephe pêşkeft, bi alîkariya yên din bawerim wê ev jî weke meclîseke eniyê pêş bikeve. Û heta bi tevlîbûna nûnerên parçeyên din dikare ber bi çarçoveya Kongreyeke Netewî ve bê birin.

– Lê dema ez bi Kemal Burkay re axivîm ev got: “*Em destpêkê ji bo Kurdistana Tirkiyê dixebitin. Bêguman heke tişteke wisa bibe, bila ji parçeyên din nûner bên, lê niha nafikirin*.” Wî got, bila herkes têkoşîna xwe bi xwe bimeşîne.

---.: Wê organîzasyonek wisa hevpar xwe bide hîskirin. Nemûmkûne demeke dirêj ev pirsgirêk bê piştguhkirin. Pêwîstiya Kurdan bi organîzasyoneke hevpar heye. Êdî şekil û dema vê xususeke cuda ye. Di vê mijarê de em ê pêşkeftinan tengav bikin.

– Hûn ê weke parlementer beşdarî vê Meclîsa Neteweyî bibin? Hûn weke kes?

---.: Hizmete, yanî heke derfeta min çêbibe, ez ê baxivim. Jixwe vê li her derê dikim.

– Wê navend kî derê bibe, yanî cihê kombûna Meclîsa Neteweyî?

---.: Navendeke herî azadbûyî ya Kurdistanê dibe.

– Mesela?

---.: Li gorî min êdî Kurdistan azad dibe; li Başûr dibe, li Bakur dibe.

– Lê bawerim giranî li Başûr’e.

---.: Ji bo demeke sînordar dibe ku li wir bibe. Lê dibe bilez derbazî Bakur jî bibe. Di vê mijarê de êdî çiya derfeta azadiyekê diyar dide.

- Başe wê komên Kurdan di vê eniyê de û di Meclîsa Neteweyî de di kîjan astê de temsîla xwe bibînin, gelo ev hat rojeve?

---.: Nehat rojevê. Ewqas jî negirînge.

– Li gorî we wê pirsgirêk derbikeve?

---.: Na. Di pirsgirêka Kurd de, weke li Tirkiyê jî bûyî wê hesabên dengan zêde bi bandor nebe. Cidiyet û mercên kar zêde şansê hesabên vê kirinê nade.

– Li pişt deklarasyona we ya bi Kemal Burkay re dema min cara yek bûyera Eniya Kurdistanî ya we xwastî bi komên Kurd yên din re deynin bihîst ez wisa fikirîm: Bi entelijansa xwe ve tevgera Kurd a çekdar dibe yek. Qonaxek dîrokî ye. Di dema pêşiya me de bi taybet dema tên ser meseleya rewşenbîrên Kurd, di vê mijarê de dibînim ku kêmaniyeke we mezin heye. Niha hûn li benda vebûneke çawa nin? Yanî ev têkel, hatina du behre û kombûnan ya ba hev, beriya hertiştî wê kîjan lewaziyên we derbaz bike û kijan avantajên we pêş bixe?

---.: Yên ji bo Kurdeyatiyê, demokratbûnê hewl didin, lê ev mirovên ku vê bi awayeke polîtîk pêş naxin, ji bo di dawiya temenê wan de ev kombûnên wan vale neçe qenalên guncav vebûne. Ez vê fikirim û bi feraseta ku, “*bila bên, bikevinê û bi sûdmend bibin*”nêz bûm. Yan ne ji bo bên pêwîstiya PKK’ê ya bingehîn derbaz bikin. Heke em tengav bikin dibe bikevin rewşeke hîn xirab, ew qabîliyeta me heye; lê ev ne rêyek başe. Tevî hemû kêmaniyan di vê ev mirov bên kişandin. Em ê li hember hemû kêmanî û nexweşiyên wan jî sebir bidin nîşan. Heke aliyên wan yên erênî hebe em ê wan jî bi awayeke azad û weke dixwazin ji bo tevî jiyana polîtîk bibin nirxeke mezin bidin.

Yanî ez gotina “derbazkirina valetiya me ya entellektûel” hinekê şaş dibînim.

–Li gorî we kêmaniya vê nîne?

---.: Hebe jî, nebawerim wisa bê derbazkirin. Besbûna entellektûel saxlamkirina kareke teorîke, divê teorîk pêş bikeve û hinek jî meseleya kesayetê ye. Li gel me derketina entelektûelan, teorîsyenan, heta yên aliyên wan yên siyasî-civakî pêşkeftî, wisa ne ji derve îthal kirin, di cewherê wê de bi kedeke mezin ve mûmkûn dibe.

– Hûn dikarin mînakeke tenê jî bidin min, di dîroka dinyayê de û ji welatên cuda? Wê di bin sîwana partiyeke organîk de danaheveke mezin a rewşenbîran ava bibe?

---.: Lê bi awayeke objektîf gelek taybetmendiyên PKK’ê derxistine holê bi lez…

– Bi awayeke neyekser dibe rê li pêşiya vê vedike. Ew dozeke cuda ye.

---.: Jixwe rê li pêşiya vê vedike.

– Başe we çima rewşenbîran qezenc nekir? Tevî ku hêjmareke zêde rewşenbîr carînan sempatiya xwe li hember we anîbin ziman jî neketin bin emrê we? Qala rewşenbîrên Kurd dikim. Sebeba vê çiye? Di vir de qet xetayê we nîne?

---.: Ne kêrhatîne.

– Yanî qebehet hemû yê wan e?

---.: Hestên welatparêziyê zêde pêşkeftî nînin, berevajî kirine. Me jî li gorî min hinek paşkeftî dibînin. Heta di nava me de jî yên wisa hene. Niha hinek tîp hene ku, sozek heye dibêje, “*ser silê, nikarê rabe ser cilê*”.

– Ev çiye?

---.: “*Sil*”, bi xwe de kirine. Yanî “*ji kirina bin xwe, hêza wî ya li ser xaliçeyê rûne namîne.*” Niha hinek rewşenbîr wisanin. Qala yên di nava me de jî dikim. Ev xwe rewşenbîr dihesibînin, lê hêza wan ya serkeftinê lewaze. Heke tu wan di rewşa wan de bihêlî wê xilas bibin, wê di nava demeke kin de xilas bibin. Dikarim bêjim ku di me de rewşengerî, girêdaneke xwe nêz bi derketina PKK’ê re heye. Dikarim diyar bikim ku rewşengeriya beriya niha heya bêjî lewaz û hêz ji pêşkeftinên siyasî û netewî re neaniye. PKK bi xwe tevgereke mezin ya ronesansê yê. Hûn

dizanin, di gelek qadan de ji nû ve zayînê bi awayeke watedar pêşxist.

– Birêz Ocalan, hûn dibêjin ku “*me ji sifrê dest pê kir, gihiştin hêzeke deh hezarî*” lê hêza we ya rewşenbîran pir lewaz e. Ma li vir pêwîst nake hûn hinek li xwe vegerin?

---.: Yên hûn dibêjin rewşenbîr li kî derê ne?

– Heke qala mirovên xwendine bikin, pir kesên zanîngeh xilas kirin, zaningeh xwendine di pîlana paş de ne…

---.: Heye, di nava refên me de jî hêjmara mirovên xwendine pir zêdeye. Hûn bawer dikin, nivê hêza me zanîngeh û amadeyî xilas kirine.

– Hêjmarek jî gundiyên feqîrin.

---.: Na, em weke ku ji hêla rewşenbîran ve hatine dorpêçkirinîn. Rewşenbîrên ciwan bi awayeke mehitîner li gel me ne. Hûn, di vê mijarê de di nava nirxandineke kêm de ne. Ji hinek yên li kenar koşeyan mayîn re dibêjin rewşenbîr. Milîtaneke me herî ji rêzê dikare çil ji wan rewşenbîrên mîna wan ji berîka xwe derxîne.

– Qala lêkolînvanê dîrokê, helbestvanê wê, nivîskar, sînemager û wênekêşê wê; bikin. Ev qet nînin!

---.: Evên we qal kirî di Kurdan de zêde nîne û yên heyî jî zêde nejêhatî ne. Ji wan re avaniyeke bingehîn pêwîst dike. Niha em wê avaniyê temîn dikin. Hûn dibêjin wêjevan û artîst lê, ew pir jêhatinî dixwaze. Di filmeke Kurd de rol girtin, di wêjeyeke Kurd de tîp diyarkirin bûyereke pir girînge û dahûrandineke kûr pêwîst dike. Ez bi derxistina çavkaniya wê ya bingehîn re mijûl dibim. Hûn ê vê di nêz de bibînin. Mixabin bêsiûdiyek jî di vir de ye; em seriştey pêşkeftinê derdixin holê, hinek jî vê weke marîfeta xwe dihesibînin. Polîtîka çawa bê kirin? Weke vê dîsa sosyalîzm çiye? Demokrasî çiye? Ronakbîrî çiye? Jiyana rast çiye? Mesela pîvanên jiyana civakî ya li ser we serwer wê çawa bê pêşxistin? Hûn ê di dema pêş de fam bikin ku min li ser van çiqasî lêhûrbûn çêkiriye.

– Ez di mijara pirsgirêka rewşenbîran de ji derveyî vê nêzîkatiya giştî di we de…

---.: Bêjîn jiyana bijare yan em ji vê re bêjîn jiyana entelektûel ne wisa? Ez jî dibêjim gelo hûn ferq dikin ku ew çiqasî mijûlin? Heke bêjim ez yêkî pir bijareyî me-tabî bi awayeke şertdar- gelo hûnê bikaribin hinek tiştan fam bikin? Hûn, wisa dizanin ku ez çawa jiyan dikim?

– Zêde nizanim.

---.: Divê heya ku mirov nezane naxive. Hûn rewşenbîrin, divê hûn lêkolînkirinên kûr bikin. Ez ji bo we bidim şermkirin vê nabêjim, heta yên di nava me de jî vê nizanin. Carna dibêjin mijara jinê; niha di mijara jinê de dibêjim ku divê bi awayeke azad nêzîkatî bê çêkirin. Û ma ne mafê mirovek azade ku jinek azad bigre, li ser bingeha azadî pêwendî pêş bixe û heta zêde azad jiyan bike? Hûn dizanin ev di me Kurdan de bûyereke çiqas zehmete. Divê jibîr nekin ku, li çavê hev temaşe dikin û dibêjin temam, xilasbû çû. Heta di destlêketineke biçûk de meseleyên namusê derdixin, zilam tên kuştin. Miroveke mîna min evqas li pey azadiyê dibeze, gelo wê di vê navengê de çawa dest bi kar bike û dawiya wê çawa bêne? Pir alîgirê azadiyê me û pêwendiyên xwe azad pêş dixim.

– Di encaman de diyar dibe ku hûn newisane.

---.: Weke ku min di bûyera Kurdan de gotî, destlêketineke herî biçûk yan jî meyzandinek, yan bi evîndariyeke erzan bi encam dibe û ger bêjin evîndarbûn, yan jî ji me re bêje me bênamusî kir û em ê namusa xwe paqij bikin wisa bi encam dibe, ne wisa? Hûn di ferqê de ne, ez van hemûyan çawa analîz dikim? Hinek dibêjin ku, "*PKK zêde civakî nebûye*," civakîbûn ev têkilî hinek pêşxistine, ne wisa? Ji bo vê hûn dizanin ez kedeke çiqas mezin xerc dikim? Ez karê azadkirinê yê di aqil-xiyalê yek ji yên me û Kurdekî de derbaz nebûyî bi hewldaneke mezin didomînim. Heta Mistefa Kemalê ku hûn pir zêde nas dikin jî, ji bo min têkiliyên wî yên di vê mijarê de pir şûnde ye; di mijara azadkirinê de dibêjim.

– Lêkolînên we li kî derê ne, encamên vê yên teorîk li kî derê ye? Raya giştî van dizane?

---.: Wê di rojên pêş de derbikeve holê. Dikarim vê ji we re bêjim ku, potansiyela min afirandiye bi mîsogerî wê hinek encaman derxe holê.

– Pirsekê bikim: Rewş vê dide nîşan ku, hemû rêxistinên Kurd, di xala pêşveçûna riya siyasî de hemfikirin. PKK çawa pêş ket? Bi sîleh pêşket. Di me de wê hinek derbikevin bêjin; "*em jî ji vê firsendê, ji vê valetiyê sûd wergirin bi sîlehê hêz qezenc bikin?"*

---.: Nemûmkûne. Hizbûllah xwest wê biceribîne got:"*Bi şêwazê PKK'ê valetiya PKK'ê tijî bikin*". Vê jî bi awayeke vekirî îlan kirin. Lê gule teqandin ne xerca her mêrxazekiye. Bila biçin wê ji artêşa Tirk û polîsên Tirk bipirsin. Ji bo biçûk xistinê nabêjim, lê me rêxistinên herî bijare yên çepgir dît, çend mehan li ber xwe dane? Dîsa me îsyanên herî bajere yên Kurd dît. Em yên li Başûr dibînin, çend roj li ber xwe didin? Çalekiya PKK'ê wisa hêsan nayê derbazkirin. Nebawerim bê derbazkirin jî û di vê mijarê de pirolekirî jî nînim. PKK derbazkirin tê wateya 40 ton girar xwarine.

*"Hekeşêwaza min nebûya, nemûmkûnbû avakirina tevgereke Kurd ya wisa çêbûya".*

– Niha ez ê derbazî pirseke hûn pir girîngî didinê bibim. Hûn jî ne yek ji mezinên van rêxistinan bûn. Hîn jî salên 1977-78 li bîra mine; hûn komeke pir biçûk bûn, hûn komeke ciwanan bûn. Bi rastî jî dixwazim fêm bikim; ne bi awayeke pêşdaraz, dixwazim têbigihim û hinek delîlan bidest bixim. Hûn xwe bi xwe çawa ji wir derketin? We çi bidest xist ku ev mûmkûn bû? Yên din çi nedîtin û we çi dît ku karî pêşve biçin?

---.: Hîsên min xurtin.

– Wisa ji min re tê ku ev tenê bi hîsan nayê ravekirin.

---.: Ez polîtîkayê bi espriya beza maratonê dikim. We karî hinek taybetmendiyên min lîkolîn bikin? Hûn dikarin stîla min û şêwaza min bifikirin?

– Temaşekin, beriya 1980'î cudahiya min di we de tezbît kirî, yek ji cudahiya herî esas û girîngev e: Dema hemû komên çepgir yên Kurd û Tirk bi cudahiya di nava tevgerên navnetewî yên sosyalîst û komûnîst re mijûl dibû, di wateyek de enerjiya xwe bi vê re tine dikirin, lê hûn qet neketin nava wê. Ev cudahiyeke. Ya duwem, tiştên we xwestî weke formûla "*dewleta serbixwe*" ku yên din xwe nedidan ber vê bêjin û nedixwestin bêjin, we bi sedema taxtîkên cuda, cara yek vê bi awayeke vekirî eşkere kir.

Ev jî dibe cudahiyek. Wisa ji min re tê ku rastî tenê gotin têr nake.

---.: Raste.

– Lê we vê çawa xist meriyetê? We vê potansiyelê, ev hêz ji kî derê dît? Wiha "*Apo miroveke zekiye, Apo hertiştî dibîne*"; na, ji min re wisa tê ku ev tenê nebese. Kesek nikare qonaxek diyar bike, tesîr dike.

---.: Yanî hûn dibêjin Xwedê li hawarê hat?

– Ji bo min, encamên we derxistî girînge. Tabî ez ê nirxandina xwe binivîsim, ew dozeke cuda ye.

---.: A rastî ez weke tê zanîn zêdetir...

– Çiye ev cudabûn?

---.: Ji gelek hêlan ve aliyên bi hêz yên di şoreşgeran de di min de zêde nîne. Wiha dest avêtina sîlehê, mîlîtantî kirin, xirecir kirin û berjewendiyên kesî qet di min de nîne. Û yek jî, ez keseke wisa bi hêsanî hêcan nabim. Heke we temaşe kiribe, sloxanan min zêde nekişandiye. Lê dikare bê gotin ku bi kurahiya pêvajoyan ve mijûl dibim. Yek eleqeyeke min pir zêde bi cewherê kar re heye; ez pişt wê difikirim û taybetmendiyeke min hema bi carek re pir hêcan bigirim lê asê bimînim û piştre berdim nîne. Bi azwerim, lê min azwariyên xwe heya bêjî bi hesasiyeta rastiyê ve girê da. Şopdarim, bênavberim, berebezim û di mijara dawiya tiştan anînê de jî bê emanim. Bi qasî raman, nêzîkatiyên xwe li gorî vê eyarkirin jî stemkarim. Ez dikarim hinek vê bi taybetmendiyên jiyana xwe ya kesî re îzah bikim. Yanî heke şêwazê min nebûya, te cîhanê jî banîba gel hev tevgereke Kurd wisa avakirin ne mûmkûn bû.

– Girêdayî we ye?

---.: Êdî ji bo pey vê re pêwîstî nayê dîtin.

– Ez di we de gelek tiştan tezbît dikim. Hûn ji ezmûnên welatên cuda referans girtin zêdetir, wisa diyar dibe ku rêbaza ji tiştên kirine encam derxistin dipejirînin.

---.: Bêguman.

– Hûn karek dikin, mînak vê gilasa çayê wisa lihev didin, şekir tevlîhev dibe, cewher tevlîhev nabe. Ne wisa…

---.: Dikarin bêjin li gorî xakê.

– Ev tercîh tercîheke girînge. Ajoya dibe vê tercîhê çiye, hizir çiye, lê deranîn çiye?

---.: Taybetmendiyeke kûre. Ez çiqas feqîr, lewaz, wêran jî bim, min girêdana bi xaka welat û rastiya gel re rast girt dest. Û min vê di pîvanên bingehîn de kir. A rastî dilnizmim, miroveke di ti mercan de xwe tine nakim. Mesela, weke we xwe kirina entelektûel ne îdaya min, ne jî hêza min heye. Heta di van mijaran de rebenim û pir dilnizmim.

– Nabêjim hûn qet dilnizm nayên dîtin.

---.: Lê ez ji hinek hêlan ve dibêjim. Di nava rêxistinê de herkes dikare xwe ji min deh qed bilintir bihesibîne. Lê di cihek de herkes dizane ku, ez îradeyeke felaketim. Ji vê jî kes nikare xilas bibe. Ev ji bo Tirkiyê jî derbazdare. Ez dikarim ji te re bêjim ku di Tirkiyê de jî rûdanekim. Û dikarim bêjim kes jî nikare wisa bi hêsanî ji min xilas bibe. Hesap bipirsim û ev mîsogere. Kes ji we wisa hêsanî ji min xilas nabe. Lê dîsa dikarim ji we re bêjim ku gelek dilnizmim. Ez ê hesap bixwazim, lê hema bi her alî ve divê em vê hesap pirsînê xirap şirove nekin.

– Apo bi serkanan re dixebite, yan jî xwe bi xwe dixebite?

---.: Di van mijaran de ez zilamê hemû saziyan ser û bin dikem. Taybetmendiyeke min din jî ev e: Ez zilamê hertiştî datîxe ber lingê mirovan dide nîqaşkirinim. Wiha ji Xwedayan ew şirûba serdestiyê didizim û dadixim holê. Qurnastiyeke min wisa heye. Siyasetê hinek wisa dizanim.

– Heke tiştek bêjîm hûn ê teng bibin? Heta bûyera we bi xwe jî…

---.: Nebawerim we fam kiribe.

– Min dît ku we kurt û cewherî nekiriye.

---.: Dibe.

– Min ji we ronahiyek hêvî dikir. Bi hêrseke mezin ser bûyerê de çûm ku tiştek bigirim û di tişta binivîsim de wê vekim.

---.: Li gorî min, xweza hinek jî ne li gorî hûn dibêjine.

– Ne waye?

---.: Bêguman ne waye.

– Yanî hertişt bi zanebûn nabe?

---.: Na. Ew tişte. Yanî di feraseta we de ev heye.

– Şematîkî?

---.: Tenê ne şematîkî, îdealîzm jî heye. Ez jî pir bi wê fikirîm; min jiyaneke li ser bingeha îradeyên saxlem, pîlanên saxlem û pîvanên saxlem pir zêde xwest. A rastî min kedeke pir tirsnak jî xerc kir. Nabêjim binketim, lê min piştre temaşe kir ku, avabûna vê cîhanê ne wisa ye, civak jî di nav de sazgeh newisa ye.

– Lê wisa nayê ku hûn rojane jiyan dikin, ji xwe hûn rojane jiyan jî nakin. Diyare hûn her tim pêngavên pêşî hesab dikin û wisa tevdigerin.

---.: Belê belê, ez fêm dikim ku dê wisa neyê jiyîn. Ez divê baweriyê deme ku xweza û civak ji ya tê payîn zêdetir jiberxwe ye. Û ez ne di wê baweriyê de me ku dê hertişt bêrê bê zanîn, bê payîn; ji xwe pêwîstî bi vê jî nîne. Asta min a felsefîk û ez giştimê hinekî tevgerînên min rave dike. Pîvanên niha heyî, qûral, kevneşop li gorî min di asteke mezin de metafîzîkin. Ev pîvanên ku pir zêde bi wan ve girêdayî dimînin bêhna dijbertiya azadiyê ji wan tê. Lê ez ne di wê baweriyê de me ku azadiyeke ji her alî ve jî heye. Rast e, şêwazê tevgerîna min weke ku we got. Yanî hûn dikarin bêjin ne bi pîvan û hesabkirin, zêde zelal jî nebûne. Lê li gorî min, di nava nêzîkatiyê jiyana heyî de dîsa jî yek ji nêzîkatiyên herî xweser in. Û zêde li beramberî rastiyê nebêrêzin. Ez hewl didim vebêjim, hûn jî hewla fêm kirinê bidin. Ez naxwazim li vir bêrêziyê li beramberî rastiyê bikim. Ger hûn bi hinekî din re baxivin, wê pir zêde şêmatîk bibin, wê di asteke awarte de bersivan jî bi we re bigihînin. Ez vê weke bêrêziyê dinirxînim. Berevajî, ez neçarim ku ferqa di vir de heyî nîşanî we bidim. Neçarim bidim diyarkirin ku dibe ji dervî bendewariyên xwe jî hinek rewş mijara gotinê bin. Ev, îfadeya hinekî din rêzdarî ji rastiyê re raberkirine.

– Belê, li gorî uslûbê we guncawe. Ez bawerim min hinek tişt bi we re zevft kir.

---.: Min weke tê xwestin xwe tahlîl nekiriye. Hûn dizanin, ya rast mirov bûyereke pir aloze. Niha, hinek caran pir bi mirov difikirim û metirsîdar dibînim û dibêjim; “*bûyera ku jê re tê gotin mirov bi çi cesaretî bû mirov”* Vekirî bêjim, ger ev qusûrek be jî bi vî rengî jiyankirinê metirsîdar bibînim. Bêguman vana hemû tevgerînên min bandor dikin. Ez, bi rastî jî ne mahkumî qûralan,

qaliba me. Em hinekî hewl bidin bi behremendiyên xwezayî, pîvanên xwezayî yên mirov bifikirin.

"*Wisa diyare ku wê agirbest yekalî nemeşe*"

– Dixwazim tiştekî fêm bikim, hûn hinek caran bê perwa helwest digirin, hinek caran jî ez, hewl didim bi ziravî xwe bigihînim taybetmendiyên kesayetiya we. Ez ê di van mijaran de pirs bipirsim. Nemaze di derbarê her mijarê de ji pirsên ku ez ê bipirsim pêwîste hûn pir dirêj û fireh bersiv bidin. Ez ê derfeta vegotina hemû fikrên we bidim. Li gorî min, ji aliyê we ve yên girîng, yên ku ji aliyê raya giştî a Tirkiyê ve girîngin. Bi sernivîsan be jî ez ê hemû tiştî bidim, ji bo wê em dirêj dirêj daxwuyaniyan nedin. Bi qasî ku ez dibînim dema we jî sînordare. Ji bo vê ez dibêjim, em lez derbas bikin. Ger me di vê rêbazê de li hev kir em derbas bin. Bêguman niha di rojevê de agirbest heye. Ez ê weke ku me civîna çapemeniyê kiriye bûyerê destpê bikim. Xala ku despêkê dixwazim bipirsim ev e: Vaye 15'yê Nîsanêye û 25 rojin agirbesta we bi dawî bûye. Niha hûn ji bo dema nû dixwazin peyameke çawa bidin raya giştî? Biryara we çiye?

---.: PKK, ji despêkê ve xwedî bingehek dîrokî, civakî, netewiye û tevgerek bi armanca çareserkirina pirsgirêka herî bingehîn derkeriye holê. Yekser bêjim, em 20 salan li şûn xwe dihêlin. Me, bingeha vê tevgerê tam jî di van rojan de li Enqerê avêtibû. Xala ku em niha giştinê, di destnîşankirina pirgirêkê de û di diyarkirina rêyên çareseriyê de dide diyarkirin ku gelek mesafe hatiye girtin. Di vê wateyê de, di dema despêkirinê de biryar çiye, niha jî ew e. Em dixwazin pirsgirêkê deynin holê û çareser bikin. Pirsgirêka Rizgariya Neteawî ya Kurdan, ger gelê Tirkiyê û nûnerên wê jî amadebin, em dixwazin bi şêwazekî demokratîk bi wan re çareser bikin.

Ev daxwaz weke ku di serî de nehat qebûlkirin, bi zexteke bê aman û tepisînê xwestin ji holê rakin. Me li bermaberî vê li ber xwe da û bi pêşxistina têkoşîna çekdarî bersivand. Dikare bê gotin ku, dûrxistina ku 70 sale li ser Komara Tirkiyê serwere, polîtîkayên tepisandinê ber bi serkeftinê ve neçûn, me jî serkeftineke tam bi dest xist. Lê ji aliyê me ve destxistina mesafeya siyasî, ji aliyê leşkerî ve xwe gihandina serkeftinên ku divê biçûk neyên dîtin mijara gotinê ye. Em di vê pêvajoya dîrokî de dûbare dixwazin vê bêjin: Gelo muxatabên pirsgirêkê, bêyî ku

zêde îtîbar bi rêbaza çekdarî bikin, xwe amade hîs dikin ji rêya çareseriya siyasî re? Ji bo ku em şans bidin wan me ev gava dawî avêt.

Ji kî derê ve lê tê nerîn bila bê nerîn, tê vê wateyê: Van polîtîkayên zextê rawestînin, pêşniyarê çareseriyê pêş bixin û deynin pêşberî gelan! Û bi rastî bi çareserkirina vê pirsgirêka sereke, bila derketina Tirkiyê ya rastegerê, ketina rêya çareseriya pirsgirêka giran a gelê Kurd jî pêk bê. Vaye ji vê re şans dayîne. Me bi sebrê û ji xwe baweriyê ev gav avêt. Raya giştî ya berfireh çêbûye û em dixwazin ev gav kûrtir bibe. Di vê qonaxê de me niyeta xwe ya baş nîşan da, aliyê din jî divê ku êdî niyeta xwe ya baş diyar bike û bi hinek gavan dixwaze çi bike divê bi awayeke şênber deyne holê.

– Başe, pêvajoyeke 25 rojî ya agirbestê hat jiyîn. Siyasetmedar, pêşengên muxalefetê, heta pêşengên leşkerî, nerînên xwe di derbarê agirbesta we de ragihandin. We, îro ji bo dûbare dirêjkirina agirbestê nîşaneyên niyeta baş ên agirbestê girtin, yan jî hûn bawerin ku we girtine?

---.: Zêde îşaretên vekîrî ninîn. Bi giranî dîsa dixwazin bi polîtikayên kevnar rizgar bikin. Tevî ku hêza me sînordare jî wêrekiya ku me raber kir, yên beramberî me nîşan nadin. Vekiribûna ku me nîşandaye hîn negîştine beşeke wê ya pir bisînor jî. Ez pir vekirî dibêjim; bila çek bêdeng bibin û pêşniyarên çareseriyê bên pêşkêşkirin. Û li pê hev me pêşniyarên xwe pêşkêş kirin. Lê ji aliyê beramber ve deng nîne yan jî pir sînordare. Wekî din qet operasyon renewestandin. Heta roja dawî jî dizanim ku domandin. Yanî xwestin vê pêvajoya agirbestê xirab bikar bînin.

– Lê bi qasî ku ez dibînim, ev ne polîtîkayeke giştiye.

---.: Bi hêsanî dikarim bêjim ku li gelek herêman bikar anîn. Pêşniyarên çareseriyê jî pir şêlo kirin. Ji kî derê lê tê nêrîn bila bê nêrîn, pirsgirêk heta dawî makezagonî û zagoniye, gelek sazî jî di ber çav re derbaskirin û ji nû ve sererastkirin û ji bo vê jî ya pêwîst guftûgoyeke berfireh a siyasî ye. Di vê mijarê de bi rastî jî aliyê beramber pir tirsonek yan jî li pê armancên cuda dixwaze rojê rizgar bike.

– Niha biryara we çiye, hûnê çibikin? Dê bidome?

---.: Ger aliyê beramber dixwaze hinekî li hember rêbaza çareseriyê rêzdar be, di ferqa cidiyeta pirsgirêkê de ye, weke ku pir zêde dibêjin meziniya Tirkiyê û nizanim wisa yekparetiya dewletê tiştên wisa li gorî xwe dixwazin wate bidinê, wê demê divê hinekî me jî fêm bikin û dev ji wan îdayên xwe yê erzan ên dibêjin “*terorîst”* berdin û dakevin cewhera pirsgirêkê. Bala xwe bidinê, hê jî hûn bi xwe tên û ji me re dibêjin, hêza hevdîtineke cidî raber nakin. Dixwaze bila îktîdar û dixwaze derdorên muxalefetê bin, ji şandina nûnerekî xwe û gotina; “*biçin deriyekî goftûgoyê vekin”* xwe şûn de didin. Hevdîtin pêk bê wê çibibe? Bile qet me qebûl nekin û çiqas dijberin bila wê bêjin. Lê qet nebe em dixwazin çi bêjin wê bikaribin bi asanî fêm bikin, li dijberî çine ne dikarin vekirî bêjin û ew bi xwe çi dixwazin dikarin vekirî vebêjin. Di vê mijarê de yên ku dibêjin; “*Min nedît, nebihîst, nizanim”* ew bi xwe ne.

– Niha dixwazim dubare pirs bikim: Agirbest bi dawî bû, yan wê bidome?

---.: Agirbest, weke di dema borî de bûyî, wisa tê dîtin ku dê yekalî pêş nekeve. Ji aliyê din ve jî rawestandina operasyona vekirî derdikeve holê. Û tenê ne rawestandina operasyonan, pêwîstiya pêşxistina pêşniyarên çareseriya siyasî yên şênber jî derdikeve holê. Di vê mijarê de pêwîste em hinek gavên bawerker bibînin. Me niha hinekî xwe ji vê re amade kiriye. Me bi hemû yekîneyên xwe re agahî dayînên pewîst pêk aniye û ev çarçove bi wan re axivîne. Me got ku, em difikirin pêvajoyê hinekî kûr bikin, him raya giştî ya navnetewî, him Tirkiye û raya giştî ya Kurdistanê ji me dixwaze ku em hinekî din şans bidin pêvajoyê, nemaze bi mercê ku aliyê din jî ser me de neyê, bi armanca dîtina pêşketinên dîplomatîk ên siyasî şênber îhtîmaleke mezin bi kûrkirina pêvajoyê em dixwazin bidomînin. Ev feraseteke bi giştî hatiye pejirandin. Lê ji aliyê demê ve dibe, ji aliyê hinekî din kûrkirina naverokê ve dibe, bi rastî jî ez ne di rewşa gotina tiştekî din de me. Tenê ne aliyê me, ez nerînên hêzên din jî bi rûmet dibînim. Dibe ku ev hêzên Kurdî bin, hêzên demokratîk ên Tirkiyê bin, heta derdorên fermî bin. Li berçavgiritina niyaz û daxwazên wan jî, em dixwazin vê pêvajoyê bi hev re pêş ve bibin.

– Hûnê li ser navê xwe çibikin?

---.: Ya rast, li ser navê min çi pêwîst bû bê kirin min kir. Herkes ser min de hat; gotin; “*tu despêbikî”* Min hemû xeterî girtin berçav û da despêkirin. Niha jî dibêjin; “*kûr bike, bidomîne”* dibêjim temam, kûr bikim û bidomînim, lê hertişt bi ser min hiştinê ve nameşê.

– Niha hûnê dem deynin yan jî didomin?

---.: Ez, danîna demê bi serê xwe nikarim tayîn bikim. Ji ber wê min derbaz dike û wê ji bo berjewendiyên kesî jî nebe. Weke min gotî, hinek jî bendewariyên raya Kurd û Tirk girtina berçav, dîsa rastiyên dîplomatîk yên navnetewî anîna berçav û ya herî girîng jî ji hawirdorên fermî çi pêş bikevin li ser wê diyar bikin.

– We hîn dem diyar nekiriye?

---.: Ez ê hewl bidim wê di civîna çapemeniyê de şênber bikim.

– Lêborîna xwe dixwazim, niha dixwazim vê bêjim; wisa bihesibînim ku min vê nirxandinê piştî civîna çapemeniyê kiriye. Yanî hûn dikarin ji vê piştrast bin, ez di vê mijarê de pir…

---.: Ew negirînge. Li gor fikra min, wê hinek hawirdor bên û bi wan bişêwirim. Armanca min ev e, yan ne ku dixwazim ji we veşêrim. Bi rastî jî dixwazim serî li nêrînên hinek hawirdoran bidim.

– Fam dikim. Başe, çi ji axaftinên qadan, çi ji daxuyaniyên rojnameyan, çi jî ji daxuyaniyên di televîzyon yan jî radyoyan de hatiye peytandin, li gorî îşaretên we ji van girtine hûn dikarin siyasiyên Tirk binirxînin? Kî, li gorî we, helwesteke çawa danî? Hûn çawa nav li vê dikin? Mînak, hûn dikarin helwesta Serokomar Ozal, serokwezîr Demîrel, serokên din yên muxalefet, heta artêşê di nava kademeyek de binirxînin?

---.: Hinek dîtinên min yên min ji hevdîtina dawî ya Birêz Talabanî bidest xistî hene û ancex li gorî van dîtinan bikaribim hinek tiştan diyar bikim. Li gorî vê, dîtinên weke Ozal dixwaze hinek gavên bi wêrek bavêje heye; dîsa di Demîrel de jî nermbûnek pêşkeftiye, Baykal hînek din di armanca çareseriyeke radîqal de ye, Mesut Yilmaz jî gotiye; *“cîhanhatiye guhertin, em jî neçarin bên guhertin*” û gelek hawirdorên din jî di nava nêzîkatiyên bi vî rengî de bûne, heta tê gotin ku Ozal gotinên mîna “*artêş jî bi min re di heman nêrînê de ye*” serf kiriye, yanî hemû jî nebe di nava artêşê de jî nêrînên mîna vê hene û bi vî

rengî nêzîkatiyeke ku em bi awayeke erênî di hawirdorên fermî yên siyasî-leşkerî de derketine pêş bilêvkirin mumkûne. Waye di çarçoveya tiştên ji min re hatîne gotin de van dibêjim.

– Di vir de dikarim tiştek ji we bipirsim? Niha, di derbarê agirbesta 17'ê Adarê de hema piştî civîna çapemeniyê di hevdîtina min bi we re kirî re-qeyd hene- hûn di derbarê lîderên Tirk de pir bê hêvî axivîbûn. Yanî weke ku wê ew vê fam nekin û neyên vê. Niha hûn qebûl dikin ku hatine xapandin?

---.: Nebêjim hatime xapandin, lê yeqîn dikim ku ji ber dewletê giraniya pirsgirêkê zêde hîs kiriye, fêmkiriye ku di tengezariyê de îsrarkirin wê zêde ne bi xêr bê. Ev erênî ye. Lê ji vê min bi temamî riyeke derketinê ditiye yan jî serî tûnêlê derketiye, nirkandineke wisa kirin ango gihiştina encameke wisa hîn zû ye.

– Lê Birêz Ocalan, jixwe hûn ne li benda vê bûn: Hema yek carek bêjin; "*eman çiqes baş bû Apo agirbest îlan kir, hema were em ev pirsgirêka Rojhilat çareser bikin*." Ev nemûmkûne.

---.: Raste, em ne li benda tiştek wisa bûn. Heta ne li bendê bûn ev pêşkeftinên heyî jî bi vî rengî bibin.

– We behitand?

---.: Ji behitandinê zêdetir, li gorî min pêşkeftinên balkêşin. Û heta…

– Di heman demê de dikarin bêjin başe?

---.: Ji wê zêdetir, dikarim wisa bêjim: Dikarim bêjim ku pêşveçûna eleqeya yên dûrî meseleyê yan jî yên cuda hatine hoyandin mijara gotinêye. Mirov dikare bêje ji nêzîkatiyeke rast ya ji çareseriyê re û nêzîkatiyeke bingehîn raberkirin zêdetir, eleqe hinekî di asteke pêş de ye….

– Hûn dikarin bêjin ji bo famkirinê hewldaneke bingehîn heye?

---.: Dikarin qala eleqeyeke mezin bikin. Ev bi wate dibînim, tabî di mijara eleqe bi pirsgirêkê anînê de. Lê li gorî min, bi taybet raya giştî gelek dûrî pirsgirêkê ye. Hawirdorên fermî jî, yan dizanin lê naxwazin bêjin, yan jî heya bêjî berevajî kirin ji bo xwe guncav dibînin. Li gorî min, ji bo bên rastiyê hîn mesafeyeke pir zêde heye. Ez hîn jî naxwazim xwe bixapînim bêjim "*di vê*

*mijarê de gavên wêrek tavêjin, nêzî rastiyê dibin*.” Yanî naxwazim dilsaf baxivim.

– Hûn dibêjin pêşkeftin erênî ye, lê nebese.

---.: Nebawerim bi çêbûna rewşa Tirkiyê ya hiquqî-siyasî re ji vê re destûr bê dayîn. Bi rastî jî hemû gotinên tên kirin makeqanûnê derbaz dike. Wê jî ji we re bêjim.

– Li vir hinek esprî bikin: Niha partiya Sosyalîst, ji ber pêşniyarên xwe yên di hilbijartinê de di derbarê meseleya Kurd de kirî hat girtin. Lê piştî du rojan 36 parlementerên SHP’ê (partiya gel a demokrasiya sosyal) belavokek weşand. Ew belavok bi ya SP’ê (partiya sosyalîst) re heman bû.

---.: Bi mîsogerî rewş, derbazkirina makeqanûna heyî, avaniya siyasî û statuya zagonî ye. Rewşeke fiîl û şînber derketiye holê.

– Yanî niha li gorî we hemû siyasiyên Tirk suçê makeqanûnê jiyan dike?

---.: Îhlalkirineke pir zêde ya makeqanûnê heye. Jixwe rewşa min îhlalkirina makeqanûnê ye. Lê hemû hawirdorên Tirk yên siyasî jî têkildar bûn. Ev li gorî min hinek bi xofe.

– Niha hûn îxbara wan dikin!

---.: Bêguman.

– Ji bo îhlala makeqanûnî heye îxbar dikin.

---.: Nizanim. Di dawî de Serokê Dadgeha Zagonî xwest hinek hewldan raber bike. Dîsa serdozger, xwest di vê mijarê de hinek helwestan pêş bixe. Lê bi rastî jî meselê aliyê hiquqî pir derbaz kiriye. Li gorî ku rewşeke muazam ya civakî-neteweyî li holê ye, qanûn pir li paşin. Tengavbûna Ozal, tengavbûna avaniyên din yên siyasî fam dibe. Bi mîsogerî pirsgirêkên zagonî heye û li gorî min, wê kes êdî van zagonan bi vî rewşê cidî nagire. Jixwe qirîza makeqanûnî, pirsgirêka makeqanûnî jî ji ber vê girînge û her ku biçe wê kur bibe. Pirsgirêka ji nû ve statûya zagonî pêşxistinê heye. Û dê bandora vê li ser saziyên siyasî pir zêde çêbibe. Ez naxwazim van zêde vekim. Ger pêwîst bike dikarim vekim. Yanî bi mîsogerî çêbûna zagon û siyasîbûnê xwe kiriye rojev. Rewşa heyî jî delîleke vê ye.

– Helwesta artêşê çiye? Neyekser jî be we îşareteke şênber girt?

---.: Artêş, li hember rastiya me cara yek bi rewşeke wisa re rû bi rû ye. Bi rastî jî ger li hember artêşa Tirk, dewleteke bûna wê pir zû çareser kiriba; yan wê serketiba, yan jî binketiba. Dîsa ger li hember îsyaneke klasîk ya Kurd bûna wê jî pir zû çareser dikir. Ev bûyera ku me pêşengatî kirî, yanî li gorî hinan îsyana 29. mîn, li gorî hinan tevgereke terorê, li gorî me jî derketina gerîla û şerê şoreşgerî, li hember artêşê rewşeke din xêz kir. A rastî artêş kedeke mezin serf kir; operasyonên pêş xistî, heke li hember dewlet bûna, dikarî çend dewletan têk bibe. Lê stîla şerê me û taxtîkên me pir çeprast in. Jixwe bi xwe jî dem bi dem derdiketin bang dikirin digotin;"*kuro Apogerîno, derkevin beramberî me, em li hev bidin.*" Tabî vekiriye ku em nakevin rewşeke weke îsyankarên Kurd yên berê, mîna lihevxistina dewletan.

– Yanî hûn dibêjin ku "*yê me ji îsyanên kevneşop yên Kurd cudatire.*"

---.: Pir cudaye û bi taybet derhênkirina min pir ecêp bûye, pir çeprast bûye. Her wiha artêşa Tirk ne li benda bi rewşeke wisa rû bi rû bê de ye. Di dema operasyonan de xetayên pir girîng kir û ev heya bêjî peyda xwe li me kir. Artêş hinek şermoke û vê jî pir baş dizane ku, şêwazê heyî yê rêxistinbûna dewletan û şêwazê meşandinê pir cudaye. Ji ber vê xwe têxe rewşeke pir zehmet. Kareke pir siyasî weke kareke leşkerî dêne pêşiya artêşê, wê demê dê artêş tine bibe. Û ya dibe jî hinek ev e.

– Başe we helwesta çapemeniyê çawa dît, Birêz Ocalan?

---.: Çapemenî, eniya wê ya wêjeyê jî heye, bi rastî jî dem bi dem bi temamî di bin fermana şerê taybet de xebitî.

–Ji bo dema derbazbûyî nabêjim, we ev pêvajoya 25 rojan çawa dît?

---.: Di nava van 25 rojan de erêniye û fonksiyoneke pir girîng dîtiye. Li gorî min çapemeniya Tirk, ji vê hêlê ve dikarin bêjîn ku cara yek ruştê xwe îzbat kiriye. Azadî û xweseriya xwe daniye holê. Min li deverên din jî got; heke dîsa kontrolek nebe, neyên sistkirin û kişandin, çapemenî bi îradeya xwe van nirxandinan bike, bi mîsogerî ev îşareteke kamilbûn û bûna xwedî hêze.

– Li gorî gelo ev asta demokrasiya li Tirkiyê nade nîşan?

---.: Dîsa di vê mijarê de jî naxwazim zêde mîsoger baxivim. Ji ber dem bi dem bi hinek meşandinan bûm şahidê hinek gav avêtinan. Heke bi rastî jî ev li ser bingeha hêza xwe ya esasî bûye, yanî bi awayê hêza çapemeniyê pêş ketiba û her ku çûba giraniya xwe bi awayeke azad danîban holê, wê demê dibû ku ev bûba hêzeke girîng ya xwepêşandanê.

– Hûn destxweşî li çapemeniyê dikin?

---.: Bêguman, ji ber ev nêzîkatiya wan a ji ev gava me avêtî re sîpasiya wan dikin.

"*Tehemûla pisgirêkên dîrokî zêde ji paşxistinê re nîne*"

– Talabanî gelek gotîbêj li Enqerê kir û hat. Çi şîret li we kir?

---.: Pêwendiyên me yên bi Birêz Talabanî re pêwendiyeke sazûmanî ya balkêşe. Weke min di civîna çapemeniyê de diyar kirî, nêzî 14 sale didome. Ketin nava şereke herî tund jî, lê me tam di nîvê şer de tifaq kir. Ev car nêzîkatiyên me heya bêjî erênî bû. Em bi çûyîna wî ya Enqerê tengav nebûn. Gelek balkêşe;Weke ku Enqere jî ji dîtina min wê zêde rehetsiz nebe, rica kiriye…

– Ji raya giştî re wisa nehat ravekirin.

---.: Lê rewş hinek wisaye; yanî "*tu vî karî bimeşîne*." Bi vê wesîleyê diyar bikim ku, li gorî min hinek jî ji ber pêwîstiya pileyek zêde ji raya giştî re rave nakin. Halbûkî ew dixwazin. Çavdêriyên anî di çarçoveya min qal kirî de ye. Ez vê jî diyar bikim: Tenê ne Birêz Talabanî, gelek hawirdor dikarin bikevin nava rolên wisa. Wiha şandeya HEP'ê tê…

– Na, min pirsî ku çi şîret li we kir. Hat hûn axivîn, ez vê dizanim.

---.: Weke hatî gotîn, rewşeke Talabanî li ser me mîna hêzeke zextê bike yan jî rica-mînet bikin nemûmkûne.

– Min qala şîretkirinê kir.

---.: Em ê her tim pêşniyarên wî dîqat bikin û li şîretên wî gudar bikin. Ev car jî şîretên wî yên wisa çêbû. Girîngiya xebata dîplomatîk, siyasî destnîşan kir û got navendeke hîn nermtir wê ji bo herkesî baş be. Di vê mijarê de nêzîkatiyên hawirdorên Tirk jî ragihand û heta ji bo vê alîkarî jî da. Ev helwesta me ya her carî ye; bi şartê ku dijberiya rêgezên asasî neyê kirin, me jî diyar kir

ku em jî di vê mijarê de vekirîne û nirx didin pêşniyarên wî. Û ev, hîn di vê çarçovê de didome.

– Hûn dikarin tişta Talabanî ji we re gotî, şîreta li we kirî, yanî “kurkirina *pêvajoya siyasî*” hinek rave bikin. Yanî heke *“kûr bikin wê baş bibe*”...

---.: A rastî tenê ne ew, li gorî min Birêz Talabanî bi Tirkiyê re ketibû nava hinek tevgerên giran û di vê de tengezariya xwe dît. Derket holê ku ev ji bo Tirkiyê jî nebixêre. Ji bo ji vê tengezariyê rizgar bibe serî li alîkariya min da û min jî vê alîkariyê bi awayeke watedar nîşan da. Her wiha mesele hinek ji asîbûnê derket.

– Başe çavdêriyên Talabanî ji we re anî ya herî zêde we bandor kir çibû? Weke serpêhatiyekê dikarin ji min re ragihînin? Tabî heke pirsgirêk nebe. Bi mîsogerî niha gelek tiştan ji we re ragihandiye.

---.: Li Enqerê cara yek komên li ser navê Kurdan avabûn, pêşxistina hevdîtinan û hema di her astê de hawirdorên Tirk, hinek nerm bûn, bi wî awayî nêzîkatî raberkirin heta bêjî balkêş û dîrokiye. Tabî hinek biwêj hatine bikaranîn. Mesela “*terorîstbûna min*” zêde nehatiye axaftin. Heta wisa ne ku min karên pir kirab kiriye, hinek kes ji bo min axivîne gotine ku ew karên dîrokî dike. Navên wan nadim.

– Yên ne Kurd?

---.: Kurd jî, nîv-Kurd jî dibe.

– Ez dikarim encama vê Ozal binirxînim?

---.: Bila ew bimîne, ji ber yên nîv di bin perdê de tên dîtin piranî vê dibêjin. Gelek bandorbûn derketiye holê. Gelek hawirdorên din jî dibêjin; “*başe, bila bê kurkirin*”yanî wisa zîndîbûneke ji nû de hatiye jiyîn. A rastî dikarim bêjim di cihek de newêrek dibînim. Min her tim got, heke îla qala hemwelatiyek tê kirin, nêzîkatiya hemwelatiyê ya herî xirap di min de ye. Weke we diyar kirî, şêwazê min, uslubê min yê herî nêzî Tirkiyê ye. Heta li Tirkiyê jî tevlî hevî çêdibe dibêjin; “*bi rastî jî ev çalekî ji bo Kurdaye, yan jî ji bo Tirka ye*”. Bawerim di vê mijarê de nezelaliyek heye. Hinek dibêjin; “*cudaxwaze*,” hinek dibêjin;

"*necudaxwaze*." Niha dikarim vê diyar bikim ku, bandora çalekiya me belkî jî ji Kurd zêdetir Tirk eleqedar dike. Ji destpêkê ve îdaya min ev e. Jixwe em, berhema pêşveçûna Tirkiyê ya şoreşger-demokratikin. Hîn jî îdraq nekirina gelek Tirkan, encama biyanîbûna wane.

– Ez ê bêm ser wir, dê di derbarê wê mijarê de pirsên min yên taybet çêbin. Niha hûn, naxwazin hinek tabloyên ku Birêz Talabanî di hevdîtinên Enqerê de bûye şahid, di vê qonaxê de rave bikin. Lê ji bo raya giştî bûyeran hîn baştir bibîne, nirxandinên bi tendurîst bike, min çend metelokên ku hûn guncav dibînin bêjin. A rastî baş dibû. Yanî we jî digot; "*bila gel bizane, raya giştî bizane*."

---.: Vê bêjim: Weke min li raya giştî didin peytandin nanirxînin. Ji raya giştî re bi awayeke didin peytandin, ji min re jî çavdêriyên cuda didin.

– Ev, ji bo Ozal û Demîrel jî derbazdare?

---.: Herî zêde ji bo Ozal, her ku biçe ji bo Demîrel jî derbazdare û ji bo yên din jî.

– Hûn ev derketina parlementerên SHP'ê (partiya gel a demokrasiya sosyal) çawa dibînin? Ez tiştek bêjim; min hîn tam lêkolîn nekiriye, lê bi qasî min xwendiye, di radyoyan de hatiye peytandin, we deklarasyoneke hevpar bi Kemal Burkay re kirî heye, ji min re weke şibandineke wê hat. Gelo ez şaşim? We lêkolîn kir?

---.: Bêguman hinek şibandin hene. Ew jî derketineke nû ye, lê di mijara hêza sepandinê de dîsa dudilim. Ji ber, di parlamentoyê de gelek parlementerên wisa îmzaya wan di bin belavokê de dikare derxe, lê encam nayên şopandin. Yan na xususên li wir danîne holê girîngin.

– Di serdemeke nû de ne lê.

---.: Di vê hîn zêdetir ew gav bên misogerkirin. Em dikarin van pêşkeftinan hemû bi gotina "*erênîtî*" binirxînin. Yanî hawirdorên Tirkiyê yên fermî bi qasî berê di polîtîkayên tundiya dijwar de bi rik nînin. Lêgerîneke mîsoger heye, lê di mijara çareseriyê de jî nezelalin. Û heta peyvek zêde tê gotin heye, dibêje; "*serê wan gêje*." Yanî ev peyveke Kurdiye. "Gêj" wisa ye…

– Cemidiye nexwe?

---.: Ne cemidî, gêj, wisa têkilhev bûye…

– G-ê-j bi nivîsin?

---.: Bila weke gêj bê nivîsîn. Yanî “*serî tevlîhev*,” tê gotin ku di nava rewşeke wisa de ne. Ev yên biyanî û xwecihî hemû dibêjin. Ez, dibêjim bila êdî serê wan gêj nebe; bila hinek zelal bin, hinek wêrek bin.

– Başe yek ji van partiyan, ne weke hikûmet weke partiyeke siyasî, di nava 25 rojan de bi we re qet ketin nava hewldaneke pêwendiyê?

---.: Na. Lê pêwîstî dibînin.

– Li gorî texmînan; di vê mijarê de wê kîjan partî gava yekem bavêje? Hûn li hêviya tiştek wisanin?

---.: Li gorî we vê diyar bikim: Heke partiyên statûkoparêz bi van rewşan ve xwe bidin meşandin wê biqedin. Min dîqat kir, mesela CHP (Partiya gel a Komarê) bi perspektîfên nû dixwaze bikeve rojevê. Jidilbûna wan, bi qasî îdayên wan, wê gav avêtinên wan yên wêrek bide nîşan. Tê gotin ku hinek pêkhatinên Ozal yên nû hene. Û heta hinek nêzîkatiyên Aydin Menderes yên bi îda hene. Lê ev hemû weke îda dimînin. Yanî ya statûkoyê hinek derbaz dike nêzîkatîne.

– Di dema pêşiya me de wisa bihesibînin ku ev pêvajoya siyasî pêşve diçe. Bi partiyek re îtîfaqa hilbijartinê û kirina tiştên mîna wê pêwîst bikin, hûn kîjan partî niha nêz dibînin?

---.: Hûn hinek pir zêde pirsên statukoperest dikin. Gelo yek ji partiyên heyî ji vê re dest dide? Li gorî min û heke li rewşa heyî temaşe bikin, sazîbûnên heyî nebesin û tengavî jî hinek ji vir destpê dike. Hinek bernameyên lêzêdekirin tên çêkirin, lê ev ne bes e. Hinek rewşên fiîlî tên afirandin, ev jî bi pergalê re nakok dibe.

– Birêz Ocalan, we hema piştî agirbestê nirxandineke pir bê hêvî kiribû gotibû ku,“*wê gav neavêjin, nermbûnek raber nekin*”. Lê îro xala hûn gihiştinê, hûn jî qebûl dikin ku nermbûneke ji bendewariyên we pêşdetire…

---.: Niha ev ne çareseriyeke! Em neçarin hinek rastîbîn bibin. Di holê de êş, xwîn û tangasiyeke pir mezin mijara gotinêye. Pirsgirêkên dîrokî ji paşxistinê re sebir nîşan nade. Ma tu hinekî nermbûyî çi fêde ye? Weke ku pêdiviya me heye em hevdu bi xwepêşandanên biçûk ve têr bikin, yan jî weke ku ev

gengaze nêzîkbûnên tên raberkirin ger ya resen li ber çavê me bide aliyekî wê xeter be. Li gorî min bi pêşengên Tirk re kêmaniyek û heta qirîzek heye. Hûn her tim dipirsin "*ka wê partiyek bike yan na?*" Li gorî min, partiyek nikare vî karî bike. Ev karekî pêşengî û rêbertiyê ye.

– Ev serokatî kî ye, wê kî bibe?

---.: Wiha Ozal dixwaze pergaleke serokatiyê pêş bixe û hûn dizanin bi çi astengan re rû bi rû tê. Dîsa dema serfermandar hewl dide bi bandor bibe, hûn dizanin rexne dikin dibêjin; "*mîlîtarîzm evqas bi bandore*". Jixwe Demîrel newêreke, tê gotin ku zêde nikare bibe xwedî gavên ber bi pêş û guhertinan. Bi rastî jî parlamento xwe ji ereniya nîqaşên hişk xilas nake. Saziyên din zêde pêşniyarên bi îda pêş naxin. Belavbûnek heye, herkes vê dibîne. Di vê mijarê de dibêjim ku, ji nêzîkatiya "*wê PKK muxatab bê girtin yan jî Apo muxatab bê girtin*" zêdetir, ji pirsa ji aliyê beramber ve yanî di hêla Tirk de "*muxatabek bi îda heye*" kirin hîn sotînertir û di cî de ye. Yanî ez muxatabek nabînim. Mesela kar bi kiyan re pêş bixim? Niha dixwazim vê gavê kûr bikim. Bila ji min re muxatabek bidin nîşan û bêjin; "*hûn dikarin kar bi lîderê vê partiyê re yan jî ev organên lîderan re pêş bixin*". Bi yekî re bikevin nav, wê yên din sabote bikin. Halbûkî mesele nazike; qet firsendê ji sabotekirin û valederxistinê re nade. Wiha qrîz di vir de ye. A rastî di avaniya Tirk a siyasî de pirsgirêka pergalê heye. Ji ber wê rewşên fiîlî derdikevin holê. Di cihek de ev jênereve. Dibe muxatabê meseleyê yê rastîn pêşkeftinên di pêşiya me de diyar bikin. Heke di nava xwe de konsensûs pêk bênin, dibe ev baş bibe. Ji hêla me ve zêde problem nîne.

– Yanî hûn bi partiyeke tenê re...

---.: Ne şarte bi partiyeke tenê re. Jixwe eniya Kurd ava dibe. Ew dikare bi hêsanî bê avakirin, wê pirsgirêk çênebe. Di aliyê Tirk de pirsgirêk heye.

– ...Bi hêvîne?

---.: Ev hêvî, hinek dişibe hêviyeke li ser hev reng diguhere. Yanî ji hêviyeke pir cidî zêdetir, min di nava çavdêriyeke ku "*xwe ewqas bêhêvî neke*" de dihêle. Ez her tim xweşbîniya xwe diparêzim.

– Her tim?

---.: Bêguman. Îdayên min her tim bihêzin. Divê vê jî bêjim ku, ez rêbaza siyasî jî herî kêm bi qasî rêbaza leşkerî hez dikim. Ez rêbaza leşlerî zêde napejirînim. Lê hewldan û keda min ya pêşxistina herduyan jî zêde ye.

–Dikarin bêjîn pêşkeftinên dawî alîkarî daye û bihêvî bibin?

---.: Dema aliyê beramber û heta aliyê gel lewaz dibe xemgîn dibim.

– Hûn qala gelê Kurd dikin?

---.: Lewaziyên gelê Kurd jî hene; lê hîn jî ji gihîştina pergaleke daxwazên komîserhev yan jî ji pêkanîna rêxistinkirina vê dure. Yanî di vê mijarê de hêzên din yên Kurd lêhûr nebûne. Aliyê Tirk jî pir biyaniyê vê ye. A rastî dixwazim destpê bikim û bi aliyê Tirk re jî ketina nava nîqaş û biryaran jî bi îdame. Baweriya min pir bi min xwe jî heye. Lê aliyê beramber xwe ewqas tarî kiriye û ewqas bincî kiriye ku, pirsgirêkan bi kurahî girtina dest weke "*biçûk dîtinê*"dibîne. Li gorî min divê ev bê derbazkirin. Biçûk dîtin, girêdayî nêzî pirsgirêkê nebûne. Aliyê Tirk dikare hîn rastîbîn nêzî rewşa Kurdan bibe. Jixwe hemû tiştên dixwazim bikim jî, çawaniya realîteya Kurd danîna holê û ji pirsgirêkan xilaskirine. Ev, ne destpêkirineke xirabe. Ser vê pirsgirêkê girtin û îmha kirin di roja me de ne mûmkûne. Ev hinek fam bû. Wê demê pêwîste gava duwem bê avêtin. Yanî wêrekiya ketina nava rêyên radîqal yên çareseriyê dana raberkirine.

"*Yên li çiya hêza hebûna gelê Kurd in*"

– Niha bi qasî di raya giştî de hatiye peytandin, di daxuyaniyên serokwezîr û wezîran de pirsgirêkek wisa derdikeve holê: "*Temam îlankirina wan ya agirbestê başe, tiştek xweşike. Bi xwe destpêkirin, lê bi xwe jî bidawî kirin tişteke xirab nîne. Dibêjin heke jidilbin bila zilamên li çiya dakevin, heta bên teslîm bibin*." Hûn ê vê pirsgirêkê çawa çareser bikin?

---.: Weke çîroka gur û berxikê… Bila aliyê beramber nebûna xwe ya gur bide nîşan, em ê berxikên xwe ji çiya daxin. Divê aliyê beramber bi min bide bawerkirin ku min naxwe. Bawerim hinek jî ketiye nava kevilê mihê û bi kalînê li benda berxikê ye. Ez xwe ji nirxandina wek guryê xwe xistiye nav kevilê mihê bêpar nahêlim. Bi rastî jî min dixwest ji çiya dakevim. Ji ber wê, pîlanên wan yên me ji çiya daxistin, ne weke mîsala gurê ketî

nava kevilê mihê, bi rastî jî ger bêjin; "*em ê we nexin, werin hinek we fam bikin û dixwazin hinek pêwendiyan vesas bikin,*" bi vî rengî kirin vê wêrekiyê dana nîşan û lewra min di vê mijarê de dixwest bawerdar bibim.

– Ji hêla Ozal ve formûlasyoneke afûyê hat danîn. We vê gudar kiriye. Hûn ji wê re çi dibêjin?

---.: Heke daketina ji çiya û meseleya efûyê bibe mijara gotinê, a rastî pêwîste hinek din ji hinek deveran bên daxistin. Mesela kî suçên mezin kiriye, kî ket nav xwîna mirovên bêguneh? Li gorî min ev jî zêde nediyarkere. Ji vê jî wêdetir kî hebûna pirsgirêkê ji nedîtî ve tê, kî nakeve riyên çareseriyê yên bawerker û kî suçê vê dike? Kî van dike, lewra pêwîstiya wan bi efûyê heye. Ez nebûwerim pêwîstiya me zêde bi efûyê hebe. Me, karên siyasî yên girîng kir; pir zehmetî kişand, me li hember serma û birçîbûnê pir li ber xwe da û pirsgirêkê anî vir. Niha heke hebûna pirsgirêkê tê qebûlkirin, wê demê ji xwediyên vê re, ne bi awayê ku "*me îdam veguherand mûebetê, mûebet jî daxist çend salan*," divê nêzîkatî wiha bibe, "*gunehê me ji yê we zêdetire, kêmaniyên me ji yên we zêdetirin, werin em hevdu efû bikin*" be. Yanî heke wê meseleyeke efûkirinê bibe mijara axaftinê, dibe ku ji ew me afû bikin zêdetir em wan efû bikin. Vê jî bi hemû jidilbûna xwe dibêjim: Gelo em ê bikaribin aliyê beramber efû bikin? Dibe hêza me kêm be û hûn bêjin ku, "*ji bo hûn bibin efûker divê hûn hîn mezintir bin*." Lê ez di warê mirovî de dibêjim. Heke em aliyê beramber efû bikin, ma wê dîrok lanet neke? Ger em aliyê beramber efû bikin, wê demê dê raya Tirkiyê ya şoreşger-demokratîk me tengav neke?

– Niha Birêz Ocalan, divê hincar mirov pratîkî tevbigere. Ez ne polîtîkvanim û ji van karan jî fam nakim, lê niha ketina pêvajoyeke nû çêbû û divê ev pêvajo pirsgirêkeke pir aloz bigiri dest. Her wiha heke dixwazin vê pêvajoyê kur bikin-jixwe we di nava arzuyeke wisa de dibînim,- wê demê neçare hinek formûlasyonên hiquqî jî bên dîtin. Yanî ji dêla berfirehkirineke rêgezî, dîrokî, felsefî, exlaqî, ma bi awayeke hîn pratîkî li meseleyê meyzandin pêwîst nake?

---.: Niha gotina "*dehlîzênteng yên pratîkî derbazkirin çûna çareseriyê jî*" dîtineke, lê ne dîteneke tenê ye. Weke li gelek welatên cîhanê jî hatî dîtin, yên dewletê di destê xwe de digirin,

heke bi cidiyeta pirsgirêk û mafdarbûna wê bawer bin, wê demê dê bi hêsanî bi ser berjewendiyên mirovî de çûyîn çêbibe. Evqas riyên hiqûqî tengavkirin çi wateya xwe heye? Heke pirsgirêk cidî be, netewî be, siyasî be, hemû civakê girtibe berfirehiya xwe, wê demê çima evqas giranî ji riyên hiqûqî yên zirav û xilexwar re tê dayîn...

– Lê we, di deklerasyona xwe ya hevpar a bi Kemal Burkay re efûyek bê şart danî. Ev formûlasyoneke hiqûqî ye. Ma şaş im?

---.: Ev, ewqas negirînge. Yanî heke bawer dikin wê efû çêbibe.

– Niha we ji bo pirsgirêka ev zilamên di çiya de got ku, bila gur temînat bide ku berxikê naxe. Temînata vê çiye? Dikarin çend tiştên şênber bêjîn.

---.: Min gelek tişt got. Yên derketine çiya vale derneketine. Armancên wan yên heta mirinê pê ve girêdayî hene. Yên derketine çiya, belkî jî di ti demên dîrokê de û nebe xismetê ti tevgeran, fedekartiyeke mezin û hêza liberxwedanê dan raberkirin. Ev hêza mezin ya liberxwedanê, ji bo armanceke mezin, namuseke mezin û rêgezeke rûmetê ye. Heke ev armanca wan kêm-zêde bigirin bin ewleyiyê, wê demê dê daketina wan ya ji çiya zû bibe. Çine ev armanç? Ev, nasnameya wan ya netewî hildana bin ewleyî ye. Mesela girtina mekeqanûnê, qanûnê û sazibûn ji nû ve ewlekirine. Sazîbûnên nû ji parlamentoyê tê destpêkirin, bila ji artêşê bê derxistin. Yanî ji desteya wezîran heta partiyan hertişt dikeviyê. Bawerdêriyek pratîkî ancex dikare wisa bibe. Bi vî rengî wê ev kar jî bikevin riya çareserbûnê.

– Niha li vir xaleke zirav tezbît dikim. Çi di hevdîtinên me yên berê de û çi jî di nava çend rojan de sohbetên me bi hinek endamên we yên merkez komîtêre kirî, gihiştim encamek. Di we de bendewarî yan jî fikrek wisa heye: Hûn dixwazin bûyera zilamên li çiya bi dewletê bidin naskirin, yanî bi fermî bên naskirin. Fikreke vê veguherandina hêzeke cendermeyên Kurd heye. Hûn bawer dikin ku ev bê qebûlkirin?

---.: Niha, yên li çiya hêza hebûna gelê Kurd in. Hêzên ku hebûna gelê Kurd bi mirina xwe dane îzbatkirinin. Heke hebûna xwe dabin îzbatkirin, bawerim herî kêm wê bixwazin weke hêza

parastina gelê Kurd jî bimînin. Dixwazim vê bêjim: Leşker Memet diçe Rojava û dema pêwîst dike êrîşên mezin jî diparêze; Kurd jî di nava welatê xwe de û di nava xwe de çima hêzeke wan a parastinê nebe? Ji kî derê ve temaşe dikî bike wê vesazbûneke ewlekariyê pêwîst bike. Em ji vê re bêjîn ewlekariya hûndir.

– Hûn dibêjin em vê temîn bikin.

---.: Bêguman, ev pir vekiriye. Bi hezaran dijminên me hene, şerê eşîr û malbatan heye. Mînak, ez bi vê rewşa xwe bixwazibim di civakê de cî bigirim, bi mîsogerî wê pêwîstiya min bi muhafizan çêbibe. Dîsa wê gelek sazî ava bibin û wê pêwîstiya hemûyan bi parêzvanan çêbibe. Vekirî bêjim, ev hêzên hûndirîn yên ewlekariyêne, bi şeklê hêza parastina gel in. Jixwe di Tirkiyê de jî şiroveyeke mîna artêş herî zêde amûrê ewlekariya derveye. Ev vesazbûneke artêşê ye. Yanî welatê Kurd jî, welatê Tirk jî bi artêşeke hevpar parastin mûmkûne û ev dikare bê vesazkirin. Lê nebawerim quweteke taybet yê polîsan li Kurdistanê bi bandor bibe. Jixwe niha hemû gelek tengavin. Hêza emniyetê neçare ji Kurdan bi xwe be û em jî dibêjin, heke her tê gotin ku ji çiya daxin, bi awayê hêzeke parastinê yan jî hêza emniyetê em ê rola xwe vepaz bikin û dikarim vê weke pêşniyarek bêjim. Yanî ev fikrên minin.

“*Di vê bikaribin ji rastiyên netewî re azadiya tam temîn bikin, lê di vê girîngiya hevbeşîbûnê jî paşçav nekin*”

– Başe heke efûyek giştî a bêşert derbikeve hûnê çi emir bidin zilamên xwe yên li çiya?

---.: Mesele tenê bi afûyê xilas nabe! Divê vesazbûnên nû çêbibin. Ez, qala çareseriya bingehîn a pirsgirêkan dikim. Yanî me ji bo kêfa xwe ev zexmetiyên tirsehêz neda berxwe neçûn çiya. Ev hêzên girêdayî armancên bingehînin. A rastî derketina efûyê yan jî nederketina wê zêde negirînge. Jixwe her roj ewqas şehîd didin, îşkence dibînin. Heke pirsgirêk bi nêzîkatiyeke bingehîn re bê destgirtin, wê gelemşe jî bi awayek hêsantir bikevin riya çareseriyê û wê efû jî bibe parçeyeke vê yê herî biçûk. Yanî heke ji efûyê ev tê qalkirin, wiha tê gotin ku “*wê ji çiya dakevin û bi vî rengî herkes biçe ser karê xwe yê berê*,”ev xapandineke mezine û nemûmkûne. Di vê ev xeyalên ji derveyî rastiyê zêde neyên xwedîkirin. Pêwîstî bi sazîbûnên bingehîn heye. Artêş jî dikeve nava vê û parlamento jî. Bawerim

parlamentoya cihî gaveke din ku bê avêtine. Dîsa pêwîst dike gelek peywirên cihî ji hêla Kurdan ve û ji hêla gel bi xwe ve bê meşandin. Yanî tişta bêjim, çima pergaleke federal pêşnakeve?

– Heke pergaleke federal çêbibe jî hema wisa ji carek ve çênabe.

---.: Ez jî nabêjim bila hema çêbe. Qet nebe, em niha gavên saxlam yên pêkanîna wê tavêjîn. Ev hebûna me ya heyî jî parçeyeke vê ye. Jixwe em di bernameya xwe de hema ji Tirkiyê qutbûnê nadênin. Herî kêm biqasî xwe, îdaya me ya veguherandina Tirkiyê jî heye. Ev peywira me ya enternasyonale. Û dixwazin vê rewşê her ku biçe di Rojhilata Navîn de jî belav bikin. Yanî em ne heyranê hema bi tundî sînorên neteweperestiyê xêz bikine. Dibe li Tirkiyê yên bi vê bawerin pir bin, di Ereban de jî yên pê bawer pirin; dibêjin ji bo xatirê bostek erd me evqas kelax dan, ewqas kelax girtin. Ev hemû wêjeya nebaşe, lafazantiye. Mesela ji bo oxira bosteke erd nizanim ne ev dayîn yan jî nedayîne, li ser van xakan ji bo mirovan têkiliya pergala herî guncav û rejîma herî baş dana rûnişkandine. Em ê di vê mijarê de ji her kesî zêdetir kamilîbûn raber bikin. Yanî ne ku em nizanin neteweperestiyê bikin, ji bo em dizanin riya berjewendiya vê neteweperestiyê nîne, xweşî û kêfxweşiyan nayîne, ji bo di vê mijarê de kamilin em ê wisa bikin. Yan na em jî dizanin pêşxistina neteweperestiyê zehmet nîne. Lê ev, ne feraseteke ku hildibijêrim. Bi pirsgirêkên Tirkiyê re serwextbûn û ji pirsgirêka Kurd re jî aşina bûn ji bo min tişteke xweşike.

–Dibêjin ku, hedefa me federasyon e; dizanin ev ji êvarê heya sibehê jî çênabe, lê ji hêla xwe ve bi gavên bawer û saxlam dimeşin.

---.: Bêguman. Bingeha vê tê avêtin. Yanî ev jî, ne ku di vê qonaxê de merc ji bo serbixwebûnê neguncave yan ji bo sedema nêzîkatiyeke navenda navnetewî, yan jî ji bo Tirk rê nade diyar dikim. Ji vê zêdetir, şekilgirtinên ji bo berjewendiyên mirovan guncav ji bo min hîn zêdetir girînge. Yanî qutbûnên dijwar dikare meseleyê veguherîne çavkoriyê û wê gel ji vê îlham û kêfxweşî nebîne.

– Di Kafkasyayê û Balkanan de...

---.: Bêguman. Awayê pevçûnê yê li Kafkasya ji min re zêde hevgirtî nayê. Dîsa şêwayên pevçûnê yên li Lûbnanê ev welat

veguherandiye wêranê. Em di nava hewldanên şêwayên guncavtir de ne. Ez vê bi awayê pergalek difikirim. Di dîtinên min yên bingehîn de ev heye: Girêdana zêde ya bi sînorên netewî re çiqas bi fikar be, rastiyên netewî înkarkirin jî ewqas bi fikare. Jixwe di ezmûnên Sovyetê de jî înkara rastiyên netewî yan jî rastiyên netewî ji derveyî rastiyan nirxandin dibe sedema van lihevketinan hemû. Yanî rastiyên netewî tine hesibandin yan jî negiranbûna netewiyetê gotin, sedema van hemû aloziyane. Di vê mijarê de "*ne kêmî, ne jîzêdetirin*"dibêje. Ez jî dibêjim divê em ji rastiyên netewî re azadî temîn bikin, lê divê em girîngbûna hevbeşîbûnê jî paşçav nekin. Yanî divê em girêdana vê bi dewleteke mezin yan jî civateke mezin ya netewî re çênekin.

– Niha ez ê, pirseke ne aligîr ji we bipirsim. Ez dizanim ku, ji milîtaneke we yê herî ji rêzê heta sekreterê giştî, yanî heta we ya di dilê herkesî de diraze, Kurdistanek serbixwe û yekgirtiye. Ez nebawerim we dev ji vê hedefa xwe berdabe. Çima devjê ne haberdin jî suçdar nakim.

---.: Li gorî min, serxwebûn tiştek xweşike. Divê herkes serbixwe be; tenê ne netew, divê her mirovek serbixwe be. Lê serbixwebûyîn, nayê wateya ferdperestiyê. Di feraseta min de serbixwetî bûyereke giyaniye, bûyereke ramaniye, erdembûna kese; ji bo netewek yan jî civatên netewî jî îfadeya resentiyên xwe bi awayeke azad bikar anine. Serbixwetî eve. Yanî ez wisa teng nafikirim. Dewleteke min bûye, lê di nav de hemû nelazimî heye, rizîbûn heye; ez vê zêde weke serbixwebûnê şîrove nakim. Ez ev şeklên teng yên serbixwebûnê jî napejirînim. Jixwe pêşkeftinên navnetewî yên heyî dide nîşan ku ev rewş wê pir bi xeter be. Çi di asta pergala felsefîk de bifikirin, çi jî pir pratîkî bifikirin, a rastî pir serbixwetî xwestina me…

– Xwestina we?

---.: Xwestina me yan jî li gorî xwe di nava hewldaneke xweserî de bûyîn, bi temamî di wateya azadî xwestina min de ye. Lê teşeya vê weke ku nirxandinên li Tirkiyê pêşketiye dibêjin; "*em ê ji bo bostek erd welê bikin wisa bikin*" ne di cî de ye.

– Lê niha di hinek kesîmên raya giştî de fikreke wisa heye: Dibêjin; " îro Apo dixwaze bi gelê Tirk re hevpar jiyan bike, lê heke piştre fersand dît wê hema dewleta xwe ava bike."

---.: Bêguman. Heke tu zextê bidomînî, têqez wê ev di cihek de û di hinek deman de bê avakirin. Lê heke tu ji yêkî re piştrast bikî ku çiqas binirxe û jiyan wisa hîn xweştir pêşbikeve, Apo bibe pêxember jî wê nikare vê pêk bêne û pêk jî bêne. Tu xweşikbûna pêvrebûnê piştrast bike û bibe hewrêyê wê, wê demê ji Apo ti xeterî nayê. Yek jî pêwîstî bi vê heye. A rastî heke em rastiyên xwe bi awayeke azad derxin holê, wê demê dê yên baş, rastî û xweşik bixwazibe bi me re bibe yek û em ji vê re jî vekirîne. Em ê di bin ti paşdemayîn û paşverûtiyê de ne pevrebûnê qebûl bikin, ne jî qutbûnê qebûl bikin. Hinek bixwazibin me bi zorî ji hev qut bike jî emê pêsîra wî neberdin. Bixwazibin me bi zorî bênin gel hev, emê yekbûnek wisa nexwazin. Navbange, têkiliyên netewan hinek dişibînin zewacê. Niha min qet qetî bikî, tişteke dilê min nexwaze û bi yekî lihev nekim ezê têkiliya heval û hogirtiyê pêşnexim. Lê heke dilê min jî bixwaze, guncav jî bibînim, wê demê ez ê di pişt de pir bibezim û têkiliya xwe pêş bixim. Yanî ev têkilî hinek dişibe vê.

– Niha hûn rewşa xwe ya bi Enqerê re çawa dibînin? Hûn li pey dibezin, yan jî dibêjin;"*em ê bikaribin li hev bikin?"*

---.: Em di nava nêzîkatiyeke ku "*hevdu wisa negirin dest yan jî bi vê şêwayê ne we ser min*." Nêzîkatî ev e. Yanî hewl didin biparêzin. Bawerim emê piştre tercîha xwe bikin.

–Ma niha îradeyeke we ya yekgirtî nîne? Hûn dibêjin; "*emê piştre tercîha xwe bikin."*

---.: Bêguman em ê niha li hember hinek taybetmendiyên Enqerê pêwendîdar bin. Yanî gotina qet pêwendî pê nadin yan jî tiştên pê peywendîdar bin nîne, wê ji derveyî rastiyê bibe. Di her astê de em ê ji taybetmendiyên hinek baş dizanin, xweşik dizanin re pêwendîdar bin. Û ev ji bûna Kurd wêdetir, weke miroveke çêbûyî bikin. Jixwe di nava wê de ne. Derketina min ji Enqerê çêbû û dubare çûyîna min a ji bo Enqerê jî ez ê bi awayeke watedar û mebestdar bikim. Lê bila ti kes, wisa hêvî neke û nenirxîne ku ji başbûn, rastiyan, xweşikbûnan diçin paş, wisa dadikevin. Di vê ti kes ji me ne li benda daketineke wisa be ku "*wê tiştek pêşkêş neke, zilam tengav bûye, mandî bûye, ji hev*

*ketiye, dixwaze xwe bavêje bextê.*" Ez ê bûna şervanê hinek nîrxên bê hempa me li bîra we bênim. Di wê baweriyê de me ku, şoreşgerên Tirk jî di oxira hestên paqij û armancan de derketin pêkanin. Jixwe em hinek ji wan bandor bûn û hîn jî bîranînên wan didomînin.

– Denîz, Mahir û Îbrahîman.

---.: Belê. Hêjmareke zêde mirov îşkence dît, xwîn rijandin. Ez ê li bîra we bênim ku ew tiştên hatin kirin hemû ne valebûn û zêde formûle nekin jî, bi rêxistin nekin jî, nebîn serkeftinê jî, bûna armancên wan yên divê bên dîqatkirin û ew jî ji bo min weke wesiyeteke, di vê wateyê de ez ê bibin neketina şoreşê û vê li bîra we bênim. Yanî Apo van hemû difikire.

– Yanî hûn dibêjin; "*ez mîratgirê Denîz Gezmişan, Mahir Çayanan û Îbrahîm Kaypakkayanim*?"

---.: Mîratgirê wan heye. Li gorî min ew mirov ne mirovên wisanin ku bên jibîrkirin. Rêbaz û taxtîkên wan çiqas şaş û ne di cî de bin jî, gotinên di dara darvekirinê û xwînê de gotîn û armancên ku xwe ji bo wan feda kirin mîsogerin û ez girêdayî wan im. Bila gumanên kesî ji vê çênebe. Ez ê van di hemû pêwendiyên xwe yên bi Enqerê re bênim ber çav. Heta mirinê ev wisaye. Ji ber vê divê kes neyê ser me û nebêje sosyalîzm tasfiye bû, êdî şoreş kevnar bû. Nizanim, ti wateya me cuda bidin nîşan nîne. Û ez li vir, ji we fikare bikim yan jî li pey hinek tawîzên polîtîk bibezim naxivim. Ez yek ji mirovên herî azad diaxivime.

– Ez tiştek wisa difikirim: Heke pêvajoya siyasî bi niyeta baş ya herdu aliyan ve pêşve biçe, wê demê dê faktorên yêkitiyê, faktorên yêkitiyê xurt dikin pêş bikevin û di encam de ger mirov bi şêweyek bi cors bêje gelê Tirk bi gelê Kurd re bibe yek.

---.: Vê jî ji we re bêjim; niha ji min baştir kes nikare bibe avakerê yêkitiyê. Heke bêjim ez pisporê vê mijarê yan jî hostayê wê me, divê ev weke axaftineke vale neyê nirxandin. Ji ber ez, yek ji yên herî zêde rastiya gel nasdikime.

– Lê ev 15 sale we gelê Tirk nedîtiye!

---.: Na, ma wisa dibe? Bi temamî min bi nirxên wê re kar kir, bi ziman û fikrê wê re pêşketim.

– Heta ev 15 sale hûn ji gelê xwe jî dûrin.

---.: Bawerim hûn ê paşçav nekin ku ez mirovê hemû gel rakiriye ser piyanim. Ger niha bimeşim, bi awayeke ku di dîrokê

de nebe qismetê kesekî wê bi milyonan mirov xwe feda bikin. Lê mesele ne ewe jî. Ez kesek wisame Tirkiyê ji hêla dîrokî û felsefî ve kur dinasim û lewma nexawazim van mirovan tengav û aciz bikim. Jixwe, zehmetî û aliyên wan yên xeternak baş dizanim. Lê bi daketineke nerm û weke daxwazeke jidil xwe bejdarî vesazbûna pêwendiyên wan dikim. Yanî bila gelek fikrên xayînane yên di derbarê Tirkan de li vir bimînin, rewşên min bi xemgînî pêşwazî kirine mijara gotinê ye. Em ê van mirovan çawa ji xeyalên împaratoriyê yan jî xeyalên şovenîstê derxîn? Li ser bingeheke rastînî û di nava pergaleke mayîn de ya kesan de bigirin? Em dixwazin di vê mijarê de rola Kurdan bi wan bidin lîstîn.

– Dubare dipirsim; heke ev pêvajo pêşve biçe û bi awayeke xira nebe yêkîtiyek ava bibe, wê xeyal û xewnên we yên dewleteke serbixwe çi bibe?

---.: Niha ez qet nebawerim ku, dewlet xiyaleke mezine. Berevajî di wê baweriyê de me ku tiştên ji dewletê xweşiktir hene. Bi awayeke vekirî diyar bikim, dewletên heyî, carna weke kemereke ku mirov tifê bike û weke baneyeke xirap dinirxînim; him jî banayeke di nav de tijî şêlanker, talan û ketîne. Yanî bi awayeke teorîk ne bawermendê dewletê me. Mîna li Tirkiyê ji dêla dewleteke min hebe, ez ê bêjim bila qet nebe. Yanî bûyera me ya dewletbûnê wê hinek cuda pêşbikeve. Dewletê bidest bixe û piştre veguherîne amûreke talan û zextê; ez di rêgez de hezar car li beramberî vê me. Di wê derbarê de, heke dewleteke Kurd ya şêlanker û li ser serê gel bela ava bibe, li hember vê dewletê beriya herkesî ez ê şer bikim. Yanî ev meseleya xiyalan a we qal kirî divê bê dîqatkirin. Ez li pey azadiyê me, li pey xweşikbûnê me, ez lêgerînvanê şêweya demokrasî û sosyalîst yê bêhempa me.

– Li gorî min gotina we ya neteweperest li pêşe. Lê hûn dibêjin ez sosyalîstim. Û niha li Enqerê bi awayeke çînî rêveberên ji pozîsyona we cudatir hene. Yanî li gorî termînolojiya marksistê dibêjim; rêveberiyeke kapitalîst heye. Tu jî dibêjî ez sosyalîstim. Ev herdu, wê çawa pêvajoyeke siyasî kur bikin?

---.: A rastî nebawerim li Enqerê kapitalîzmeke hevgirtî hebe. Li Enqerê rewşên weke sosyalîzma pêkhatî mijara gotinê ne. Hûn dizanin heta li gorî pîvanên kapitalîst yên herî bijare pêşnexistine. Yanî pergala heyî neçare bê derbazkirin. Bi rastî jî

kevneşopiya Tirk a dewletê şovenîstiye; elîta Tirk yan jî rêveberiya jor ya siyasî-leşkerî, weke şovenîzmeke eşîretê asta dewletê derdixe holê. A rastî ev, sedema bingehîn ya xetimandina civakî ye. Vê jî ji we re bêjîm; a rastî gelê Tirk yan jî civaka wê pêşkeftiye, heta bêjî kedkar û berhemdare. Lê tebeqeya jor a dewletê dimeşîne ne wisa ye û heya bêjî mihafezekare. Wiha nakokiyeke wisa heye û çareseriya vê pirsgirêke pêwîst dike. Niha tu yê bêjî, "*tu çima şoreşê dixwazî, kî bi vê yêqîn û yan jî bawer dike*". Lê rastî ev e û divê êdî ev bê hîskirin.

Ez di wateya qlasîk de û weke gelek partiyên komûnîst yên li Tirkiyê yan jî tevgerê xwestî, qala şoreşek nakim. Ev xebatên me hemû meşandine şoreşe. Jixwe Ozal bi xwe vê dibîne û dibêje. Karên em dikin şoreşe, bûyera Kurd bi xwe şoreşeke girîng a demokratîke. Bi mîsogerî wê ev, di Tirkiyê de jî rê li ber pêşkeftinên şoreşî veke. Lê ev, wê weke ya di sosyalîzma pêkhatî de bûyî çênebe. Min beriya niha jî vê got û jixwe hinek qutbûna me ya ji çepgirên Tirk jî li ser vê bingehê bû. Di vê mijarê de çepgir çiqas çepgire, rastgir çiqas rastgire; bi rastî jî hîn jî dixwazim vê fam bikim. Dibe ku rastgir, hîn zêdetir nêzî çepgirê be; belkî jî çepgir ji rastgirt hîn zêdetir rastgir be. Gumanên min yên wisa jî hene. Ji ber çepgir çepgirbûna xwe piştrast nake. Heyîn, avaniyên heyî di rewşeke ku qet nikarin hilberînin. Hema hema bişibin bakîreyên şêst salî. Polîtîkayê neafirandin.

– Ez ê bêm ser çepê Tirk. Di demên dawî de di qunciknivîsan de nirxandinek wiha heye: Eman baldar bin. Raya Tirk bangî we dikin: "*Gelek hesasiyet hene, Apo rica dikin van hilde dîqatê*". Vegera Enqerê, "*wiha gelek hesasiyetên wan jî heye. Enqere tu jî di wê mijarê de dîqat bike*". Niha dixwazim destpêkê pirsa pêşîn bikim. Dema hûn teqvîma xwe pîlan dikin û gavên xwe tavêjin, hûn hesasiyetên di raya Tirk, di gelê Tirk û zehmetiyên siyasetvanên Tirk de diqat dikin?

---.: Bêguman. Hûn pir vekirî dibînin ku dîqat dikim, ji guhertina ûslup bigirin heta pêşxistina derûnî.

– Çawa?

---.: Hûn dibînin heta di derbarê pêşkeftinên derûnî de çiqas baldarim. Li gor min çi çepgir çi jî rastgir, ji rêberên Tirk yên herî bijare yê herî zêde hesasiyetan difikire ez im.

– Bi rastî jî hûn di ferqê de ne zehmetiyên siyasiyên Tirk hene?

---.: Ji ber zehmetiyên wan xemgîn dibim. Lê, divê vê jî diyar bikim ku, rêbertî wisa nayê kirin; pênaseya rêbertiyê fam nekirine, derketina ser dikê wisa nabe. Hewlek mezin didin û wisa dizanin ku lîdertî dikin, lê pir kêmin û ev li ser bingehên şaş dibin. Ji vê holê ve ji ber wan xemgîn dibim. Bawerim ji bo hesasiyetên gelê Tirk jî min bersivên baş daye. A rastî ez nirxên gelê Tirk hez dikim. Di refên me de ciwan, keç û xortên ji gelê Tirk tên hene; heta bêjî binirx nêzî wan dibim û nirx didim. Niha ev hemû mirovên ku bi nirxên Tirk hatine hunandinin û qutbûneke herî biçûk nabînim. Ev jî, tê wateya neteweperestek herî biçûk û neteweperesteke pirole nîne. Ew di min de vê dibînin û gelek ji min hez dikin.

– Min di hatina xwe ya beriya niha de nivîsên we girt. Bawerim axaftinên we bi kaleke Kurd re heye, yanî bi mele re. Axaftineke pir neteweperestek pir mezine. Ez ê wî nîşa we bikim.

---.: Mumkûne? Tiştek din jî ji te re bêjim; ew heyranê Hîtlere.

– Lê ev axaftina we ye. Li wir gelek tişt di derbarê Tirkan de dibêje.

---.: Hûn gelek qala azadiyê dikin. Ji mele re jî azadî bidin. Bila meleyek 98 salî baxive.

– Birêz Ocalan, ez tevlî herkes tiştê dixwaze bêje dibim. Ew bûyerek cuda ye. Lê îdaya we heye, hûn dibêjin *“ez li hember neteweperestiya tengim*”. Ez jî dixwazim bi vê bawer bikim.

---.: Ev, nayê wateya Mele weke heyî destek dikim! Heke em Mele weke miroveke not salî bifikirin, divê hûn fam bikin ku naxwazim bi yek gotinê xemgîn bibe. Li gel min dibêje; “*ez ji Hîtler wisa hezdikim, wilo hez dikim*”. Min dîsa gotinek tenê nekir, li hember derketin pêwîst nedît. Ji ber baweriyên xwe hene. Wiha temaşekin, hûn dixwazin min li vir sewqî antî-demokratbûnê bikin. Li gorî min, di vê em zêde têkilî ew cîhana baweriyê nebin. Lê ev nayê wateya ku, weke heyî hemû qebûl bikin.

Ez, bîranîneke xwe din ji we re bêjim: Di rojên nêz de min metropolîtek nas kir û axivîm, metropolîteke Sûryanî bû. Got;

"*tu, bi feraseta xwe ya xizmet û aşitiyê ve pir dişibî Hz. Îsa*." Rastî ev bû mijara manşêtan jî, gotin "*xwe têxe şûna Îsa".* Mesele ne xwe xistina şûna Îsa ye, nirx dayîna gotina yekî wisa ye. Metropolîte, min bi nirx dît. Baweriyên wî hebû û min temaşe kir baweriyên başin. Niha rabim li wir bêjim,"*tu Xiristiyanî, ez jî Misilmanim*" biketibam nav nîqaşeke olî? Na! Min bi rêzdarî bersivdana wê guncav dît.

Dîsa rojek yek ji Yêzidiyan hat, ji min re got; "*ev peyva şeytan hûn bikar tênin Yêzidî jê aciz dibin*." Hûn dizanin min çi got? Di deverên ez peyva îblîs bikar tînim de qala hinek başiyên îblîs dikim. Niha jî dibe Misilman li beramberî min qiyametê rakin. Ez dikarim bêjîm şeytanê Êzidiyan li pey tiştên başe. Yanî rola ew li şeytan bar dikin hinek cudaye. Şeytanê em bi nav dikin û şeytanê di pergala baweriya wan de, cudaye û ez vê bi wate dibînim. Min got; "*ez hinek dişibim şeytanê Êzidiyan*". Weke min diyar kirî vê hevokê jî pir baş şîrove bikin. Şeytanê di pergala baweriya wan de, heya bêjî karên baş dike. Nîqaşa Xwedê-şeytan ya di Misilmantiyê de hinek berfirehe û bawerim ew pirtûka dawî ya "*Ayetên Îblîs*"rê li ber nîqaşan vekir. Niha şîroveya îblîs jî divê hinek îlmî bê pêşxistin. Ji bo min, min hinek şansê şîroveya îlmî ji van re daye, ji min re nikarin bêjin, "*babo niha jî ev xwe dixe şûna iblîs, ma mirovek ewqas nakok dibe.*" Li gorî min, heke dixwazin bibin demokrat…

– Ma hûn ê azadî ji şeytan re jî bidin nasîn?

---.: Hûn ê ji wan re jî hinek azadî bidin. Ev, ne hevnegirtin û oportonîstiye, pêwîstiya bûyîna demokrat bûne.

– Niha we got; "*ez, lîderên Tirk û hesasiyetên gelê Tirk nas dikim, helw didim fam bikim, bi beşeke wê jî xemgîn dibim*". Başe hûn dixwazin Enqere, li hember kîjan hesasiyetên we baldar bin?

---.: Pir zêde nebawerim Enqere hesasiyetên me hilde dîqatê.

– Mesela, gotinên wan yên dibêje; "*Apopir tengav bû, neçar ma ji ber wê hat*" we çawa bandor dike?

---.: Min qet eleqedar nake. Ez keseke ku "*min ji zû ve kevilê xwe li erdê raxistiye*". Baş dizanim ku Enqere min ji zû ve ji çav derxistiye. Bawerim ne keseke wisa saf û bawer bikim ku Enqere di derbarê min de erênî bifikire. Yanî heke derfet bibîne ji bo min di nava kevçiyek av de bixeniqîne wê çi neke. Ji ber wê nebawerim zêde hesasiyetên min dîqat bike. Ez dikarim dîqat

bikim, lê hêza wan ya dîqat bike nîne. Ji ber, li hember rastiyê hêrîşên wan yên bê eman hene. Wê demeke dirêj nexwazibin rastiya min fam bikin. Lê, ez ê dîsa fehma nêz bibim, têgiştî nêz bibim. Weke min gotî, ez li gorî felsefeyeke diyar kar dikim. Weke hînekan kirî bi mîsogerî ne yekî pragmatîstim. Ez dizanim, pragmatîzm yan jî pratîkê pêş bixim, di min de girêdaneke zêde ya rêgez heye. Divê bi ti awayî ev paşçav neyê kirin. Li Enqerê kesayetên wisa zêde nîne. Wê zêde nafikirin ku rêgezeke min heye û di vê hinek li hember vê rêgezê rêzdar bibin; çi leşkerî, çi jî siyasî, ew vê hêzê di xwe de nabînin. Rêgeza wan hêze û li gorî vê perçiqandine.

–Başe ji gelê Tirk hûn li benda çine?

---.: Weke min gotî, bi mirovên ji gelê Tirk tên pir lihev dikin. Min bi gundên Tirkan yên li gel min re baş li hev dikir. Li hember wan wê nêzîkatiyeke min herî biçûk yê dijminahiyê pêş nekeve, ez ê vê nefikirim jî. Wê vesazbûn li gorî pîvanên heqiyê pêşbikeve. Dîsa pir zêde ne heyranê sînoranim jî. Eşîreteke biçûk jî be li hember hebûna maf û baweriyên wan rêz raberkirin pîroze. Dikare şêwayên hîn pêşkeftî derxe holê. Riya vê jî, ne tengavkirin û zordestiye, afirîneriye. Weke min bilêv kirî, tenê ne di statûya fermî ya Tirkiyê de, di statûyên weke statûya wêje û hûner de jî zilamên wisa wate bidin me nîne.

– Hûn pir mezin diaxivin.

---.: Dibe niha eleqe hebe, lê ew hêz hinek lewaze. Dixwazim bihêz bin û ji bo alîkariyê jî amade me. Lê eleqeya didim nîşan bila ji sedî yêk jî ew bidin raberkirin. Û ev, rexneyeke min li wan e. Eleqeya didim nîşan bila ji sedî yêk jî hawirdorên we yên wêje û hûner bidin nîşan. Tabî ji derveyî nêzîkatiyên rojane. Bila min, vexwînin rastiya wan famkiriye bikin; bêyî serî li zordestiyê bidin û bikevin nava hîsên mezinbûnê bi min re hêza nîqaşkirinê bidin nîşan. Ez ji vê re amademe û nabêjim “*li pişt min evqas hêz jî heye*”. Di van mijaran de rewşa min heta dawî weke ku azad pêş dikeve, aliyên beramber di vê mijarê de xwe girêdane. Hêvîdarim hinek gavên nû bên avêtin. Ez ê bixwazim ev hîn bi awayeke radîqal pêş bikeve, veguhere guftugoyeke baş, nîqaş û biryarbûneke hevpar. Ji vê re jî negirtîme. Lê wê rewşeke min ku rica bikim bêjim “*werin evqas pêwîstiya min bi we heye*”çênebe.

Heta min vê li hember dayîka xwe jî nedaye raberkirin, vê heftê dayîka min wefat kir, heta di mirina wê de jî…

*"Baldarîbûn di xwezaya min de heye"*

– Serê we saxbe! Dema we mirina dayîka xwe bihîst çi hîs kir?

---.: Hewldam hinek tişt hîs bikim, lê min nexwest zêde bê ser ziman. Ji bo bîranîna wê nirxandineke kin bikim.

– Yanî di dilê we de hinek tişt, lerzandinek…

---.: Beriya bavê min bimire hinek tişt ji min re got; "*digot kurê min Abdullah, heke bimirim tu yê ji çavên xwe du rondikan jî nebarênî*". Lê vê ne weke ku ez yekî bêxêrim, ne ku ji bo xemgîn dibû, ji bo kesayeta min nasdikir digot. Wî dizanî ez çima rondik nabarênim.

–Dema dayîka we mir hûn girîn?

---.: Negirîm. Giryandina min cuda ye. Herî zêde, nakokî û pêwendiya min a bi dayîka min re tê çi wateyê û mijarên ber dilê wê girtin çawa bibe fikirim. Û hewl didim bersiv bidim van pirsan.

– Hûn qet giryane?

---.: Bi awayê ku hûn dizanin qet negirîme. Hinek car hestyar dibim, lê kes rondikên min nabîne. Di kêfxweşî û fikaran de jî aliyê min yê girî kême, lê bihêrsim. Rondikên min herî zêde diçe hûndir.

– Lê dema dayîka mirov dimire-ev rewşeke xemgîne-girîbûna wê tişteke miroviye.

---.: Raste, feraseta min hîn wetadartire. Min, wê giryandinê ji zû ve pêkaniye. Qutbûna min a ji dayîka min yan jî ji bo min mirin û jiyankirina wê ji zû de xilas bûye.

– Ji bo we dayîka we miriye?

---.: Miriye yan jî jiyan dike. Yanî qutbûna ji gund û çiya ji zû ve çêbûye.

– Ji çi demê ve we dayîka xwe nedît.

---.: Baş nizanim, bawerim 18 sale.

– Qet bi telefonê axivîn?

---.: Qet naxivîm.

– Çima we pêwîstî nedît?

---.: Min pêwîstî nedît.

– Ew qet li te geriya?

---.: Wê jî pêwîstî nedît. Têkiliyeke cuda ya dayîk-kure.

– Başe, hûn fikirîn ku ji bo cenazeyê dayîka xwe gul bişînin?

---.: Ew jî nehat aqilê min.

– Heke we bişandiba ma hîn baştir nedibû?

---.: Ez tiştên bi vî rengî nafikirim. Ya herî zêde difikirim eve: Kîjan taybetmendiyên dayîka min li ser min bi tesîre û min weke kurê baş yê dayîka xwe, wan çawa derbazî jiyanê kir? Mesela, di vê mijarê de ev ramanên min hemû zindî bû: Ev dayîka min a Ûveyş gelek şerker bû û min got; "*gelo ev rewşa min jî hinek dişibe ya wê*". Lê min ji şêwaza wê ya şerkirinê şerm dikir; gelek zêde û bêşêwe şer dikir, ji ber sedemên pir biçûk şer dikir, ji bo mirîşkek şer dikir û bêyî hêza xwe bêxe hesabê şer dikir. Min famkir ku; hêza min jî qet nebû û ketim nava şereke mezin û min bi şêwayên gelek balkêş şer kir. Ev hemû di dayîka min de jî hebû. Lê dikarim bêjîm ku min, piştre bi awayeke pîlan û avakirina hêza şereke mezin re şerokbûna dayîka xwe kûr kiriye. Dîsa dikarim qala tolhildêriya dayîka xwe bikim. Dayîka min ji min re digot; "*heya tu tola xwe ranekî newe malê*". Yanî heke em welat jî weke malbatê bihesibînin, min ew rêgeza dayîka xwe jî xistiye meriyetê. Dayîka min digot; "*biçe, tola xwe ji yên mala te talan dikin rake, wisa were,*"min nedigirt malê, heta berî min da. Ez jî derketim, min dest bi têkoşîneke mezin kir. Hîn jî li ser wê bingehê hewl didim bikevim welat. Yanî heya dijminatiyên li welat xilas bibin şer dikim. Wiha dibe ev jî wesiyeteke dayîka min be.

– Çiqas piştî wefata wê agahiya we çêbû?

---.: Di heman rojê de çêbû.

– Di kêliya destpêkê de mirov tiştek hîs dike; şikestinek, şewatek…

---.: Gelek sivik çêbû. Hîn jî dem bi dem difikirim, bavê xwe jî dem bi dem difikirim. Mesela, min şev cenazeyê wê di xewnê de dît, li gel cenazeyê wê bûm.

– Di xewnê de!

---.: Belê. Di bin pesarê çiyayek de bûn û li jor her tim kevir tên xwar. Lê yek ji van keviran li me nakevin. Û dixwazim rûyê dayîka xwe bibînim; rûyê wê çiqas zer bibû, zer nebibû. Hatina keviran didomiya. Di nava vê fikarê de bi xwişka xwe re wê têxîn

gorê. Bi vî rengî min û xwişka xwe cenazeyê dayîka xwe xist gorê. Cudatir kes nebû. Ev jî eleqedariyeke…

– Diyare we pir bandor kiriye. Yanî ji yên we di hişê xwe de hîs kirî zêdetir.

---.: Balkêşe, min cara yek xewnek wisa dît. Ez zû bi zû xewnan nabînim. Ev xewn jî rastiyek bû.

– Heke hûn vegerin Tirkiyê hûn ê serdana gora dayîka xwe bikin?

---.: Jixwe serdanên min timiye. Yanî dibêjim, min ya herî guncav ji bo hemû şehîdan û pêşiyan kiriye. Min bersivên herî guncav li gorî wesiyetên pêşiyan da. Gor li gel me wisa zêde nediyarin. Dibe niha gora bavê min tine bûbe. Lê heke ji bo civakê sûdmend be, dibe nirxên wisa bên ziyaretkirin, nikarim têkilî vê bibim. Di vê mijarê de dixwazim hinek demokratîk nêz bibim. Tiştên ji bo civakê sûdmend divê mirov têkil nebe. Ger pêwîst bike ez ê jî biçim.

– Li gel we wêneyê dayîka we heye?

---.: Nîne, qet nîne. Yanî çapemenî…

– Gelek girîngî didinê; ma şaşim?

---.: Berpirsyariyeke diyar heye… Naxwazim jiyana wan bidizim û vale derxim. Ji ber ez ê wan pir zêde bandor bikim û her wiha wisa difikirim ku ne bê amadene. Ji ya tê bawerkirin zêdetir aliyên jiyana min yên ji derveyî polîtîkayê heye. Heta kêm zêde pêwendiya min li gel têkoşîna çekdarî heye. Dibe hûn van hemûyan berevajî şîrove bikin, lê min ji hemûyan re cihê pêwîst daye û xwe pir baş tevlî kiriye. Lê weke tîp taybetmendiyên min yên pir cuda hene.

– Tiştek bêjim. Ev bajarokê hûn lê dimînin, devereke Hizbulahên Lûbnanê li ser serwerin û hêzên Lûbnanê tê de cî digirin. Başe ma hûn natirsin ku yek suîqast li we bike? Hûn ji mirinê natirsin? Li vir pênc-şeş kes hene, zêde nîne. Tîmek bê wê karê wan xilas bike.

---.: Heya niha ti tirsên min yên bi vî rengî çênebûn û min karî azad bimînim. Dema zarok bûm li bin darekê gotineke bavê min ji min re kirî hebû, wê gotinê her tim dibêjim: Digot; “*dest nedin Abdulah, li ser eniya Abdulah îşareta fetih heye, ew biçe kî derê wê fetih bike*”. Yanî ev pênase hinek li gorî min e. Di taybetmendiya fetihkirinê de me, wê vekirî diyar dikim.

– Îhtîmala suîqastê nîne?

---.: Qet serkeftî nebû.

– Di heman demê de we pir bi tedbîr dibînim. Mesela, hûn 1982 bi parazvanan digeriyan.

---.: Baldarbûn di xwezaya min de heye. Jiyana min tê wateya baldarbûnek mezin.

– Di çepê Tirk de ev nîne. Di nava vî karî de hinek hêmanên rastiya Kurd hene?

---.: Na. Taybetmendiyên min yên kesî di nava xwe de pir baldare. Hûn dizanin ez miroveke pir hesasim? Gelo we dereceya hesasiyeta di min de ferq kiriye? Bêyî vê fam bikin hûn ê rewşa heyî çawa şîrove bikin?

– Başe tiştek diyar bikim; binavûdeng bûyîn, di navenda eleqeya raya giştî de bûyîn hesteke çawa ye?

---.: Na, dixwazim şuhretbûnî, meşhûrbûnî berevajî bikim. Bi rastî jî hinek îdayên min hene, azwariyên min yên mezin ku di mijara hinek tiştan xistin û hinek tiştan jî her tim bilindkirin heye. Bi taybet di bûyerên girêdayî mirovan de, tiştên gelek kirêt, yên ji şerê çînî û netewî jî wêdetir ew tevgerên xirabûyî ku min dîtine bikim meseleya têkoşîneke mezin. Hûn dikarin bêjîn şerkereke exlak, şerkereke xweşikbûnê, hûner û estetîkê.

–Di civîna çapemeniyê de nêzî sîh rojnameger hebû. Cara yek komek wisa qerebalix hebû. Başe we çi hîskir?

---.: Nexêr. Ne qurebûn, şikestîbûn dibînim. Ez ji şohretbûnê zêde zewqê nagirim. Hinek xûypakîtî, neperçiqandina hinek rêgezan, derxistina hinek semyaniyan min hîn zêdetir bandor dike. Serkeftinên bi vî rengî dikare serkeftina min bandor bike.

“*Di wê baweriyê de me ku ji Rojave re jî ders dayîn pêwîst dike*”

– Hema pirsyareke polîtîk bikim: Hûn parçeyê Kurdistanê yê li Tirkiyê weke metîngeh dibînin. Hûn dikarin di dîroka cîhanê de di derbarê bi hev re jiyankirina mêtîngeh û mêtînger de mînakek bidin nîşan? Mînakeke wisa heye? Ji aliyek ve “*hûn dibêjin dixwazin bi gelê Tirk re jiyan bikin*,” ji aliyê din ve jî “*dibêjin Kurdistan mêtîngehe*.” Mînakek wisa nîne. Wê demê bangawaziya we ya yêkîtiyê, bi awayeke neyekser ma nayê wateya ku Kurdistan ne mêtîngehe?

---.: Ev pêwendî dikarin vebin, ne zehmetin. Pêwendiyên heyî pir ketî û rezîlane ne. Çi keseke ku bêje ez mirovim wê nikaribe têkiliyên heyî tehemûl bike. Başe sedema di nava bêexlaqî û bêşerefiyeke mezin de bûyîn çiye?

– Her wiha , sepandinên heyî yên antî-demokratîk…

---.: Tenê ne ew. Li gorî min, hemû têkiliyên pêkhatine gulma tawanin û çavkaniya hemû kirêtiyane. Mesela, ji nepêşveçûna wêjevanên mezin bigirin heta pêşnekeftina siyasedmedar û filozofên bihêz hemûyan di nava têkiliyên xirap de dibînim û sedemên wê jî girêdayî vir dikim. Û ez li vir dibînim ku, tenê ne Kurd, Tirk jî pir bê kesayet dihêlin. Ez bi vê bawerim û kes nikare min ji vê baweriyê bigire. Ji bo di vê mijarê de baweriyên min yên pir bihêz hene loma ev kurahiya di vê têkoşînê de dimeşînim. Yanî dema van kirêtiyan dibînim, dibêjim; “*Apo tu nikarî van qebûl bikî, tu dikarî hertiştî qebûl bikî, lê tu nikarî xwe têkilî vê kirêtiyê biki*”. Wiha ev rêgez ji bo min şeref û şehnaziye.

– Dîsa pirsyareke polîtîk bikim: Di axaftina me ya beriya niha de we gotibû; “*min ev bangawaziya xwe bi taybet ji bo raya Tirk û hikûmetên Rojava kir û ji lîderên Tirk zêde ne bi hêvî me*”. Me beşa Tirk nîqaş kir. Ji dewletên Rojava ji we re çi sînyal hat?

---.: Di derbarê Rojava de jî xwe îfade bikim. Di wê baweriyê de divê ders ji Rojava re jî bê dayîn. Zilamên Rojavayî bi rastî jî xwe mezin dibînin; him jî tevî ne mezinin û ziyaneke mezin dane mirovahiyê jî.

– Mezinbûna wan dikare bê nîqaşkirin, lê bihêzbûna wan kesîne.

---.: Belê, dibe bihêz bin. Ez li hember bihêzbûna wan jî stemkar disekinim. Û rêgezeke min jî, li hember wan bizanibim bimeşim. Min zêde li Rojava jiyan nekir, bi wan re pêwendiyên min jî nîne. Yên we Tirkan zêdetir heye. Ez ê ji wan bandor nebim. Ev resentiya xwe…

– Ev, ne meseleya îradêye, meseleya şertane. We digot; “*ez ê bi Emerîkayê re pêwendî deynim*”. Dema we bi Emerikayê re pêwendî danî, hûn ê hewl bidin wê bandor bikin, lê wê ew jî hewl bide we bandor bike.

---.: Ez ji bo Tirkan û Kurdan diparêzim. Ji bo yên li beramberî me ji wî zimanî fam dikin ji ber wê.

– Hûn weke amûreke şantajê bikar tênin?

---.: Ji wan têkiliyan pir hez dikin û ji bo ji wan têkiliyan ders derdixin ji bo wê. Yan na heke bi me re têkilî danîban, me dê qet pêwîstî bi wê nedîtiba.

– Pêwendî pêşxistin.

---.: Bêguman.

– Min weke peyamek dît, daxuyaniyên we yên beriya niha we ji hinek lîderên Tirk yên diyar re kir. Yanî hûn xîtabeke mîna "*ger hûn bi me re pêwendî nedênin, em ê jî biçin bi Emerîkayê re pêwendî deynin. Kêm zêde niyetên Emerîkayê dizanin, lingê xwe li gorî xwe bavêjin*" bikar tênin.

---.: Hinek wisaye. Yanî ew têkiliyên Rojava yên hûn pir pê bawerin dikare bi hêsanî li beramberî we bê bikarin. Û ji wan jî, ji me jî zêdetir hûnê ziyanê bibînin. Lê em vê tercîh dikin: Em pêwendiyê bi hev re deynin; ev ya herî raste. Çima di bin siya wan de, di bin baskên wan de pêwendiyan deynin! Seba çi hûn ji wan hêz bigirin bi ser me de bên! Feraseta min ya mêrxaziyê eve: Heke lê bidî jî li ser esasê hêza xwe lê bide; çi wateye tu cîhanê têni ser serê me? Tabî ez ji vê re vekirîme, lê niha polîtîka dikin. Temaşekin, ez ê jî polîtîka û dîplomasî bikim û wê demê jî dê tu gunehê min nebe. Di quralên şer de ev heye: Tu çiqas raqîbê xwe tengav bikî, wê mafê wê jî yê te tengavkirinê biafire. Heke tu pîvanên mêrxasiyê dîqat nekî, tu yê ji hemû ziyanan re jî vekirî bimênî. Em naxwazin bikevin nava vê helwestê; lê nûnertiya Tirk yan jî fermiyeta wê me tengavî vê dike.

– Ji Rojava sînyalek ji we re hat? Piştî îlankirina agirbestê şûnde pertekeke ku gihiştibe heye?

---.: Wê tiştên bi vî rengî pir pêşbikevin. Jixwe Rojava di van tiştan de pir minêkare. Yanî piştî gelek hêzan anîn gel hev şûnde û ji bo yên me jî hinek ev kar hez dikin, wê êdî her tim pêş bixin.

– Hûn qala rêxistinên din yên Kurd dikin?

---.: Belê. Wê pir pêş bixin. Xweşa wan diçe û heya bikaribin bikin bila bikin. Bila li ser navê me jî bikin, ma wê çi bibe? Neyekser jî be ma wê yê me guneh be? Yanî taxtîke, bawerim ji bo xirakirina yên Tirkiye dike hinek guncave. Divê ji vê netirsin; bila ne çepgir bitirsin, ne jî rastgir.

– Fikareke we ji çepê Tirk çêbû? Gumaneke we ji çepê Tirk çêbû?

---.: Na, pir neyênî…

– Yanî dibêjîn; “*Apo niha bi awayeke îradî dihesibîne ku li hember Emerîkayê tedbîrên xwe digire, lê Emerîka hêzek mezine, dê wî kedî bike, dikare bêkedîkirin.*”

---.: Hûn bawer dikin? We ewqas min dît, ma rewşa min pir nezehmete?

– Her çendî zehmet be, ma dîsa jî ji xeteriyên bi vî rengî re nevekiriye?

---.: Na. Ez miroveke pir zehmet bandor dibim. Ji we re vê jî diyar bikim ku zarokek jî min bandor dike. Yanî şêwaza min ya bandorbûnê cuda ye. Nebawerim tu kes, bi awayeke çors û pîvanên pêkhatî yên polîtîk ve min tengav bikin û ji xwe nakin xem jî.

– Hûn dizanin Emerîka PKK’yek çawa dixwaze. Yanî hûn dizanin dixwaze PKK’ê bêne çi rewşê.

---.: Qet nebawerim ku Emerîka PKK’ê fam bike. Niha bawerim yek ji karên ku Emerîka fam nake, karê PKK’ê ye. Xwezka nêzî famkirinê bûba! Heke Emerîka bawerî bi xwe heye, bila bê bi me re pêwendî deyne, ji bo hevdîtinê zilameke xwe bişîne gel me.

– Lê fermandarên we yên li Bakurê Iraqê, bi fermandarên Hêza Çekiç re rûniştine hevdîtin çêkirine.

---.: Bila yek bê min jî bibîne. Dikarin hevdîtin çêkin, ji bo min ew pir zêde negirîngin. Heke baweriya wan bi xwe heye bila yek Emerîkî bê û ji min çi bigire bide nîşan. Başe, min dixeniqînin, nizanim dixwazin bênin lîstikê! Dikarin van bikin, karên dizanine. Lê vekiriye ku ez jî wisa vale namînim û nabin pariyek hêsan… Yanî di çapa cîhanê de gelek xetayên Emerîka hene, gelek bêberpirsyartî û texrîbatên wî hene. Çeka atomê ya di destê xwe de bikar tîne, bi nirxên herî bingehîn yên mirovahiyê dilîze, ji tengezariyeke mezin re malavaniyê dike. A rastî Emerîka hêzeke dilpêêşe, demokrasî fetisandiye.

–Bi navê Hêza Çekiç di asteke mezin de rêxistinên Kurd yên li Iraqê di kontrola xwe de digire. Yanî hemû hebûna wan, niha girêdayî hebûna sîwana Emerîka dirêj kiriye. Naxwazim rewşa rêxistinên Kurd yên li Tirkiyê nîqaş bikim, lê hewl bidim

binivîsim. Niha, di lîsteya destê min de ji derveyî kontrola Emerîka tenê hûn hene. Ez binê wê xêz dikim dibêjim. Li gorî min rewşa we jî hinek xeternake. Hûn bi tenê ne.

---.: Di ferqa wê de me, lê hîn jî têkoşîn xilas nebûye. Pêwîste dawiya nêzîkatiyên Emerîka yên heyî çawa bibe bê temaşekirin. Hîn têkoşîn bidawî nebûye.

– Wê çawa pêşbikeve? Wê ji we çi bixwaze? Hûn ê çi bixwazin?

---.: Em her tim di nava nirxandin û lêhûrbûnê de ne. Jibîr nekin ku Emerîka, hêza ku Tirk û Kurd kirî yek anî ser me ye. Mîmarê Şerê Başûr Emerîka ye. Lê em neperciqîn. Emerîka bêyî eniya xwe bide nîşan ev şer da meşandin; îtîfaqa Kurd-Tirk cara yek li hember PKK'ê pêk anî. Waye hûn rewşenbîr vê zêde nizanin û ji bo ne li gorî we ye jî nanivîsin. Ev îtîfaqa qirêj herî kêm we dikarî bi pirtûkek binivîsin. Belê, berxwedaniya erênî ya me li hember vê dayî raberkirin û hîn jî wisa ye. Weke tevgera herî girîng a di cîhanê de serî netewandî em mane. Nirxandina Emerîka jî wisa ye: Dibêje; "*weke hêza tevgera sosyalîst a tenê li ser linga maye PKK ye.*"

– Rêyek ronak heye.

---.: Zilamê wan jî ket hûndir, him jî bi awayeke zelûl. Niha rewşa wan bi qasî ya me nebihîze. Em niha bi hemû semyana xwe ve hebûna xwe didomênin. Îro sibe çi bibe nizanim. Pozîsyona me ya niha serbûxwe û azade.

–Ji bo Emerîka li hember we helwestek xêrdar bigire, hûn jî neçarin li hember hinek berjewendiyên Emerîka rêzdar bin. Quralê ev kar wisa ye.

---.: Ev, bi hesap ji hev pirsîneke bingehîn re mumkûne. PKK, ji Emerîkayê naxwaze tenê li hember hinek hedefên rêgezên rizgariya netewî eleqe bide nîşan, li gorî Emerîka şêwazê jiyaneke nelirê temsîl dike. Li gorî me, di asta cîhanê de li hember pergala Emerîka û şêwaza jiyanê, di zanebûn, polîtîka, ruh û jiyanê de, di asta herî jor de nûnertiya alternatîfbûnê dike.

– Lê hûn ketin pêvajoyeke nû ya siyasî. Rojavayî…

---.: Ma hûn dizanin me çima evqas pergala jiyaneke cihe pêşxistiye? Dibe ji we re hinek balkêş bê, lê ewqas ekstrel, ewqas jiyana nelirê û şeklê jiyaneke ewqas marjînale ku, wiha li vir hûnê antî-emperyalîzm bibînin. Hûn ê şêwazê jiyaneke cuda di vê

sêgoşeyê de bibînin. Em avaniyê di potansiyelek ewqas tor de digirin û li hember bandorên jiyanê diparêzîn ku, wiha bandorên Rojava û heta bandorên serdema navîn…

–Lê Birêz Ocalan, pêşkeftineke wisa şênber heye: Jixwe di lênûsk û ferhengên rêxistinên Kurd yên Iraqê de gelek ji antî-emperyalîzm wêdetir…

---.: Emperyalîzma ku behs dikin, xwepêşandana hêza Rojava ye.

– Rêxistinên Kurd yên Tirkiyê piştî 1980'î şûnde pir zêde vê nanirxînin. Niha bi awayeke giştî di navbera gelê Kurd de heyranbûnek Emerîka pêş dikeve.

---.: Ew negirînge. Ew dê Emerîka fam nekin. Heyrantiya Emerîka jî antîpatiya wê jî hinek cuda ye. Emerîka jî, hewl dide me hinek şîrove bike.

– We jî bilêvkirin telafûzeke dij-emperyalîst terikand, bi we re nîne.

---.: Tenê mesele ne gotina antî-emperyalîzme, xeterî hîn mezintirin. Xeterî û tengezariyên li ser serê mirov bûne bela, bi rastî jî me pir zêde tengav dike ku mirovahiyê hemêz bikin. Yanî em weke resentiya rêxistinê, tevgereke tenê ya ku dij-emperyalîzmê jî derbaz dike û hewl dide xwe li hember hemû xirabiyan biparêzin. Em hewl didin pir pak bimînin. Ev bi rastî jî dikare weke pirsgirêka xwepakirina ku asta di nav ol'an de jî nîne bê vekirin. Wê têkoşîna me bi Emerîkayê re çêbibe; tenê ne di asta siyasî de jî, em ê şêwazê jiyana wê zêde ne ecibînin. Başûr ji bo me hêsane, em ê di hefteyek de Başûr derbaz bikin. Lê niha mijar nederbaskirina Başûre, mijar cuda ye.

– Li gorî we, niha Rojava ji bo pirsgirêka Kurd çareseriyeke çawa dike rojev?

---.: Xwezka Rojava bikaribe çareseriyeke Kurd biafirîne! Xwe têkilkirin baş bû.

– Bû!

---.: Baş bû, ji ber em ê niha ew dest baştir bigirin bikişînin û hesap bixwazin.

– Hûn weke devereke alîkar dibînin?

---.: Ji bo hesap pirsînê başe hinek din nêzî me bibin. Bûyera Kurd û Rojava anîna berhev baştire.

– Niha, senaryoyek Rojava ya Kurd nîne? Çareseriye wê nîne?

---.: Di vê mijarê de divê zêde tişt nebe. Senaryoyên Rojava a rastî senaryoyên Tirkin; ferqa van zêde nîne. Li gorî Tirk ya herî nêz Rojavayî ye. Yanî Tirk zêde di derbarê plansaziyeke Rojava de ya ku cuhekariya wê heyî nahizire.

– Heke em bêdilbûn û nexwestina Enqerê ya ji erêkirina Hêza Çekiç re bidin dest, di vê mijarê de derdikeve holê ku senaryoyên Rojava û senaryoyên Tirk hev nagire.

---.: Ji bo Tirk di vê mijarê de zêde nefikirin, Emerîkî û bi giştî Rojavayî hinek jî li ser navê wan difikirin, plan dimeşînin.

– Rojava, wê guhertina sînoran erê bike?

---.: Em dizanin pêşiya wê jî bigirin; belê heke nebêje, em dizanin bi riyên din pê bidin erêkirin. Em ê meselê di asta sînoran de jî nedin dest.

– Hûn dixwazin Hêza Çekiç raweste?

---.: Ev ji ber xwe ve nehat avakirin ku, ji ber xwe ve bimîne. Sedemên wê yên girîng hene.

– Hûn pêwîst dibînin?

---.: Pêşkeftineke ji derveyî îradeya me ye. Di hatina wê de bandora me hebû û wê me bandor bike jî. Lê bi qasî hatina wê, em ê ji çûyîna wê jî encaman baş derxin. Di van mijaran de bihêz in.

– Hûn dixwazin biçe?

---.: Ji bo me ne meseleyeke feydê ye û ne meseleyeke xwestekêyê. Ji ber me dixwest vê polîtîkayê bi rastî jî hinek din…

– Hûn çima ji helwest girtinê diçin paş?

---.: Em ê bêjin bila biçe, yanî ji bo me ewqas negirînge! Li gorî we wiha dibêjin bila çepgir "*biçin*" rastgir yan jî alîgirên Emerîka "*bimînin*." Lê mesele ewqas erzan nîne. Me meseleya pêwîste çiqas bên, çiqas derkevin ji zû ve…

– Lê hûn dizanin, ez bûyerê wisa diwestînim? Li vir ez ê hinek derkevim derveyî nasnameya xwe ya rojnamevaniyê wisa bêjim. Emerîka, yanî dewletên mezin têkilî pirsgirêkeke etnîk, pirsgirêkeke herêmî bûn, dibe demek di aliyê ev mirovên rewşa mazlum de bê dîtin, lê di encam de û di tevahiya pêvajoyê de wê Emerîka bixwazibe hûkmê xwe îcra bike. Wê Rojava bixwazibe

plansaziyên xwe ferz bike û ji hemû gelên herêmê re êş bêne. Ez vê wisa dibînim. Ma şaşe?

---.: Erê. Ji wê jî wêdetir, Emerîka yan jî Rojava wê hîn xetertir bibe. We van mijaran heya qirikê jiyan kiriye. Heyraniyên Emerîka, heyraniyên Rojava di we de pir pêşkeftiye. Diyare ku we pir heyran dîtine, lewma jê venagerin. Heyranên me zêde nîne, lê bi we re pir pêşkeftiye. Madem hûn dizanin ewqas xetere, wê demê hewl bidin qut bibin.

– Bi qasî min dîtiye, di dema pêşiya me de di nava tevgera Kurd de, tenê ji bo Tirkiyê nabêjim, wê du xet derkeve holê: Yek xeteke xwe dispêre Rojava, yek jî di nava xwe de xeteke xwe dispêre gelê xwe. Hûn li kîderêne?

---.: Ew vekiriye. Cihê me tenê ne xeta xwe dispêre gele, xeteke hîn mezintir ya xwe dispêre rastiyên mezin yên dîrokê ne. Xeta li gorî rastiya Rojhila Navîn bûyîn û li gor rastiya mirovahiyê bûyîne. Li hember Rojava tenê ne bi awayê antî-emperyalîzm, xeteke li hember hemû şêwazên şêwayên wê yên jiyanê û dîsa li hember gelek şêwayên êrîşên çandî bûyîn, tenê ne bi awayê aborî, bi awayeke giştî li hember pergal û rejîma wê ye. Dema dibêjin li beramber, ne bi awayê em ê hilweşînin û belav bikin, em ê tiştna fêrî wan bikin û em vê baweriyê dijîn. Hûn welateke bijare yê teslîmê Rojava bûne. Bi êşe, lê dîsa jî neçarim ku vê bêjim. Yanî li hember Rojava hûn bawerin hinek xwesertî, dîrokî û rastiyan temsîl bike?

–Di vê mijarê de ez li hember Rojava heya dawî ji avdesta xwe piştrastim.

---.: Nizanim, lê ez weke teslîm bûye dibînim.

– Ez di salên 1985-1968’an de çawa li dijî Emerîkayê bûm, dîsa bi heman awayî dijberim. Lê ji bo çepê Kurd heman tiştî nabêjim.

---.: Bi awayeke jiyanî nabe hûn bibin ketî bin?

- Hûn çima polîtîkayên Tirk yên dewletê bi min re wekhev dikin?

---.: Hûn mina Almanek taxivin. Almanek, tu carî xwe ji dewleta Alman hîsnake, bi wê re nake yek; lê li gorî min, Almanek yeksane dewleteke Alman. Yan na wê bibe mirovek neberpirsyar. Li gorî min, yan tu yê bi dewleta xwe ya layengirê Rojave re tekoşîn bikî, yan jî bibin ketine. Ji ber vê, ji vê hêlê ve

dilê mirov bi rewşa we diêşe. Hêvîdarim bihêz bibin. Ez hîn bibin neketîme. Min got, ez wesiyet û bendewariyên hinek şervanên Tirkiyê yên antî-emperyalîst temsîl dikim. Bin neketîme, çi ji min bikin bila bikin, ez heya niha jiyan dikim.

"*PKK dixwaze li gorî berjewendiyên gelan hevsengiyên guncav ava bike*".

– Piştî agirbestê min bi rêbereke Kurd yê Tirkiyê re hevdîtin kir. Wî, ji min re- ne ji bo şexsê min, di şexsê min de ji raya giştî re- vê got: "*Birayên min netirsin; Emerîka û Rojava naxwaze we û Tirkiyê parçe bike. Ji bo Emerîka bikaribe li hember Îran têkoşîn bike, dixwaze di nav îstîqrarê de be. Pirsgirêka Kurd jî hêmaneke bêîstiqrarê ye. Bi vî awayî dixwaze bêxe riya çareseriya siyasî ku, Tirkiye îstîqrar qezenc bike, li hember Îranê têkoşîn bike.*" Hûn di nav vê şîroveyê de hene? Çima Tirkiye li hember Îranê têkoşîn bike?

---.: Wê bixwazibe bi Îranê re li hev bike. Dibe di vê mijarê de Emerîkî bixwazibin me jî vesaz bikin. Lê em jî, dixwazin him Tirk û him jî Îran sererast bikin. Ev ya rastirîne. Çima hinekdin li hember Îranê, Tirkiyê evqas bikar bêne? Dîsa Îran çima xwe ewqas tengavbûyî hîs bike? Em dibêjîn ku, rastiyên me yên dîrokî û herêmî hene; em destpêkê wan fam bikin û pêwîstiya wan bicî bênin. Çi pêwîstî bi Emerîkaya li pişt okyanusê heye? Bila ew biçe, sucên xwe ji holê rake.

– Ez ê, di rojên pêşiya me û demên pêşiya me de, di vê baweriyê de me ku ji aliyê Rojava ve alîkarî ji tevgerên Kurd yên Îranê re bê kirin.Ma şaşim?

---.: Dibe. Lê em ê wê jî çareser bikin.

– Helwesta we çiye?

---.: PKK di vê mijarê de di rewşeke pir bi îda de ye. Jixwe Rojava ji ber wê xwest me di sala 1992'an de bide îmhakirin. Rojava pir baş dizane ku, PKK heyî, di asteke ku bikaribe hemû pîlanan vale derbixe de ye.

– Wiha di rewşeke wisa de wê rista we çi bibe?

---.: Em tevgera herî baş a ji bo başiya gelan karan veguherîne. Bi qasî ku we neaniya aqilê çepgirên xwe, em xwedî çalekbûneke wisanin avabûnan vedigerînin berjewendiya gelan.

– Ma hûn ê di têkoşîna li hember Tehranê de rist negirin?

---.: Têkoşîna li hember Tehranê deyne aliyek, gelek xeletiyên Tehranê jî sererastkirin, pêwendiyên heyî pêşxistin û nêzîkatiyên Rojava veguherandina berjewendiyên gelan, van hemûyan ji bo gelan vesazkirin û erka me ye wan anîna rewşeke baş. Di van mijaran hemû de em gelek ustane û dikarin bi bandoreke ku pêşkeftinên wê zêde dibe bimeşînin. Di vê mijarê de jêhatîbûna me heye û bila baweriya we hebe ku dikarin gelek karan bikin.

– Yanî heke tevgera Kurd a Îranê dest bi tiştek leşkerî bike ma hûnê nabêjin em piştgirî bidin.

---.: Em ê hewl bidin ya herî baş pêk bênin.

– Hûn dizanin Rojava dixwaze Îranê parçe bike?

---.: Em ê Îranek hîn xweşiktir derxin holê.

– We bersiva pirsa min neda. Niyeteke wan wisa bûyîn…

---.: Hemûyan hesap dikin û em ê ji hemûyan re bersiva herî baş bidin.

– Başe di nîqaşa me ya beriya niha de we got ku, “*îlankirina me ya agirbestê zêde li xweşî Îran û Ermenîstanê neçû*”. Çima?

---.: A rastî baş pêşwazî kirin nepêşwazîkirin xwe dispêre çi û bi rastî jî şerkirina me dixwazin yan ne, ez jî zêde nizanim. Heke kariban derkevin ji derveyî nêzîkatiyên xwe yên milî, wê şer û agirbestê baş famkiriban. Di vê mijarê de dikarim bêjim ku ew nezelalin. PKK, dixwaze karên baş bike; dixwazin hevsengiyên baş yên ji bo berjewendiyên gelan û astên wan ava bike. Di nava van pêşkeftinan hemû de em ê vê hinek din piştrast bikin. Ev şansê me jî heye. Yanî bila gumanên kesî di vê mijarê de çênebe, PKK, di nava serxwebûnî, azadî, wekhevî û hemû xweşikiyan de, tenê ne tevgera neteweke, yê gelên Rojhilata Navîn û her ku biçe bibe nûnerê dêrîn yê gelên cîhanê û nirxeke mirovahî yê ku herkes jê xurur bigire. Ji bo wisa bibe wê hîn zêdetir bê peytandin. Pêwîste ji vê jî kêfxweş bin.

– Başe ez ê ji we tiştek bipirsim. Li Azerbeycan herêma Laçin gelek Kurd dijîn. Heke hûn jî li wir bûna, we yê çi kiriba? Ermenî bi çek hatin…

---.: Diyare wê ev kar hinek din dijwar bibe. Bila dijwar bibe, divê mirov zêde ji wê neçe paş. Pirsgirêkên dîrokî hinek bi xwînê tên çareserkirin. Divê hûn vê weke hemû tiştên Ermeniyan erê dikim şirove nekin. Bila Ermenî jî bi tevger bibin û Azerî jî bi

tevger bibin. Li wir sextekariyên ji sosyalîzma pêkhatî mayîn hene, ew bên derbazkirin.

– Ev şer tiştek başe?

---.: A rastî nebawerim zêde şer jî dikin, lîstika şer dilîzîn. Lê bila Kafkas, Rojhilata Navîn û Îran bi tevger bibin; em dikarin ji wan sentezên nûtir derxin holê. Enerjiya gelan xeniqiye. Bi taybet statûkoyên Rojava û aligirên Rojava, dîroka gelan a bi semyan xeniqandine.

– Bakû, xaka Ermeniyane?

---.: Meseleya Ermeniyan jî yek ji meseleyên herî ecêbe. Ji daxwazên wan yên erd zêdetir, dixazin di van xakan de jiyan bikin an ne ev pir girînge. Divê Ermenî bên qezenckirin. Divê em Ermeniyan bi xakê ve nedin girêdan. Ji bo gelek di qetlîamê re derbaz bûye, belkî jî hevsengiya xwe winda kiribe; divê em ji nû de hevsengiya wê bidin rûnişkandin.

–Niha çû, xaka welateke din îşkal kir.

---.: Bêmêzîniyên heyî mijara gotinê ne. Ermeniyan gihandina yeksengiyê girînge. Heke em vê bi ser bixin wê pir baş be.

– Riya vê di kî derê re derbaz dibe?

---.: Divê em bikişînin gel xwe. Divê em ji çûyîna Emerîka, Avrupa bigirin, bikişînin gel xwe. Sûryanî jî wisanin. Divê heta ji bo biçin li gundên berê lê mane bicî bibin, em bibin alîkar. Heke bên divê em heya dawiyê alîkarî bikin.

– Lê niha motîfê herî serwer yê Ermenîstanê Îsraîle.

---.: Îsraîlîbûyîn! Di wê mijarê de zêde nikarin pêşve biçin, wê li aleyhê wan çêbibe. Li gorî min dikarin bi dostanî çareser bikin. Nêzîkatiyek ji derveyî dostaniyê, bi mîsogerî wê Ermeniyan bedbaht bike. Em, pêşkeftina li ser bingeha dostanî bi Ermeniyan re guncav dibînin.

– Niha bi şêwayek Tirkiye bi Ermenîstanê re bikeve şer, wê helwesta gerîlayên we yên li çiya çi be?

---.: Hedefên me yên dêrîn hene; çi di şer de, çi jî di aşitiyê de, em ê ji van hedefan neçin paş. Em ti carî weke piyonên erzan yên hêzên din tevnegeriyan; ew di havênga me de nebû. Me tiştên

baş û xweş dîti kir. Divê PKK weke hêzeke ku ji pêşkeftinên derdor bandor dibe wisa polîtîka dide guhertin neyê dîtin.

– Lê hûn girêdayî erdnîgariya tê de jiyan dikin, wê ev bandor bike. Ev tişteke jênereve.

---.: Bandor bibe jî, em ê bizanibin rast bikin.

– Pir vekirî bêjim ku, ez ev agirbesta we ya dawî, ne ji bo tengavbûna we ya leşkerî, herî zêde bi tengavbûna diplomatîk ya dorpêçkirina tevgereke Emerîka ve didim girêdan. Ev di asteke mezin de we bandor kir û hûn çûn guhertineke polîtîk. Her wiha erdnîgarî jî we pir bandor dike.

---.: Na, ne guhertina polîtîk, em hewl didin polîtîkayê hîn baştir bidin sepandin û xetimandinên di sepandinê de bidin derbazkirin. Guhertina polîtîkayê nîne.

– Li gorî rewşa mûnasebeta Îsraîlê, wê tevgera Kurd bi Îsraîlê re pêwendî deyne?

---.: Ma dibe Îsraîl bi xwe pêwendî deyne?

– Pir vekiriye, dixwaze.

---.: Çima nayê gel me ava nake?

– Heke deyne dikarin bêjin?

---.: Nikare deyne; bi me re pêwendî danîn pir zehmete. Tenê ne ew, Ereb jî di pêwendî danînê de zehmetî dikişînin. Di welatê wan de û ji Ereban re dibêjin, werin bi me re pêwendî deynin; nikarin deynin. Wiha Surî, pêwendî nadêne.

– Ev 14 salin hûn li van xakan dimînin, ev jî xêra pêwendiya ku we bi Sûrî re –nizanim di çi astê de ye- sazkiriye.

---.: Di asta civakî û xweşbînî de ye, ne di asta siyasî de ye.

– Tevlî nabim. Tevî pêwendiyên xwe li gel Tirkiyê nexweş kir jî, we li vir girt.

---.: Ne wisa. Hîn li vir gelek hêzên cuda hene, komên Tirk jî hene. Meseleyeke Surî a şerefê jî heye. Yanî ji bo Tirkiyê xwest û bi gotina“*ev zilam radestî me bikin*” re, nayê radest kirin. Yanî Surî vê dibêje: “*Bideh hezaran PKK’yî li Avrupa hene, hûn çima yek ji wan naxwazin, PKK’yiyê di welatê min de dixwazin*”. Mafdare, divê şeref neyê hincirandin.

– Ji bo nebêjin; “te ev kir, an yeke din kir?”

---.: Ji bo pêşnûmeyên wisa nezêde ne, ez nizanim ev tasfiyekariya di nava çepê Tirk de, çawa di nava yên ji girtîgehan derketin hat pêşxistin. Lê me pratîka xwe danî holê. Xala herî

zêde dixwazim bê zanîn ev e, dixwazin bi kesek tasfiyekar ê yekser yan jî neyekser ku li vir derketiye, bi vî tîpê tasfiyekar û bi şêvaza jiyanê re rêxistinê pêk neynin, partîbûnê pêk neynin û hêmanên zindî yên hene bi rêbazên têkbirinê ve biçin encamê.

"*Dixwazin bi gelê Tirk re pêwendiyên xwe xweşik vesaz bikin*".

– Di nirxandinên we yên di derbarê çepê Tirk de li gorî min aliyek berevajî û seyîr heye, gelo hûn dikarin rave bikin? Hûn çi tiştên baş yên di çepê Tirk de di tevgerên çekdarî yên 1971'an de dibînin; ji bilî van hertiştê din jî xirab tê dîtin. Di sala 1965'an de rastiyek TIP'ê (Partiya Karkerên Tirkiyê) ya derketî holê heye û ezmûnek wisa bû rêjeyek mezin rêberên gel yên li Tirkiyê girt nav xwe. Gelo we çima pêwîstî bi lîkolînkirina vê nedît?

---.: Kêm-zêde me hemûyan weke danahevek nirxand. Ez, ji wê bawerim ku, hemû danehevên şoreşger-demokratîkên li Tirkiyê bi wesiteya PKK'ê heya roja me ya îro hatine. Û hûn dikarin ji ev pêşkeftina PKK'ê para xwe bigirin. Bi dilsozî girêdan çêbûye û nirx nehatine binpêkirin. Ji gelan re niha weke diyarî tê pêşkêşkirin. Me nirxê ku ji çalekî û keda we hemûyan re bê dayîn daye, parastiye û heya vir aniye. Yek jî divê PKK ji vê hêlê ve jî bê nirxandin. Ew, ala mezin a têkoşînê, tenê ne ji bo rizgariya netewa Kurd, ji bo şerê azadiya gelê Tirk jî baş hatiye hejandin. Û heke niha lê xwedî derkevin wê pir kêfxweş bibe. Bila gelê Tirk vê hîn polîtîk, hîn bi rêxistinî û hîn bi awayeke yekpare bide hejandin. Tişta ji me dixwaze bi awayeke vekirî deyne holê: Biratî dixwazî biratî, piştgirî dixwazî piştgirî, hevpariya eniyê dixwaze, hevpariya eniyê, hevpariya dewletê dixwaze, hevpariya dewletê. Tenê bila di van mijaran de zelal û diyar bin. Dîsa alîkariya ji destê me bê em ê bikin. Neyekser jî be me nirx da bandorbûna wan a ji me. Dixwazim bi xwe jî ji bandora me ya li ser wan çêbûyî nirx bidin, di vê mijarê de ne şoven, birûmet û dilnimz bibin.

– Gelo dibe ku hûn bi çepê Tirk re eniyekê ava bikin?

---.: Ji bo enî bibe, divê wêrekiya siyasetkirinê hebe. Hêzên çep yên Tirk, divê hinek bigihin hostatiya taxtîkê siyaset kirinê. Ji roja destpêkê heya roja me ya îro, em her tim li hember pêşvebirina hevpariya eniyê vekirine. Min di nava kevneşopiya THKP-C (Enî-Partiya rizgariya gel a Tirkiyê) de dest bi ev kar

kir. Yanî heta 1970' min xwest bibim endamê rêxistina wan. Dîsa me xwest 1982'an -li hember faşîzmê eniya yekgirtî a berxwedanî- FKBDC bi nêzî bist rêxistinên Tirk re pêş bixin; bixwe têr nekirin û nikarin bidomînin. Yanî di me de qusur nîne. Em dîsa ji bo hemû şêwayên îtîfaq û piştgiriyê amadene. Li gorî min, di Tirkiyê de vebijêrka gel hîn jî di wateya siyasî de ava nebûye. Ji bo derketina hinek koman hewl didin hinek bibin alîkar.

– We Partiya Gel a Şoreşger vekir, lê tiştek nekir.

---.: Na na, ew weke komeke îdeolojîk hewl didin pêş bikevin.

– Şoreş bi kekîtiya mezin nabe.

---.: A rastî ew ne kekê mezin fîlan û bêvanin…

– Na, hûn kekê wan in. Yanî di dema derbazbûyî de tişta çepê Tirk bi çepê Kurd kir, hûn dixwazin niha li çepê Tirk bikin.

---.: Na na, ti taybetmendiyeke PKK'ê wisa nîne. Kekîtî nêzîkatiyeke ji me pir dûr e. Bawerim wê ew di nava mercên xwe de heya bêjî pêşbikevin. Yanî pêwîstiya me jî bi nêzîkatiyên wisa nîne, çima em kekîtî bikin? Em li hember dewletê disekinin. Hêzek di asteke evqas jor de polîtîka dike, çima kekîtiyê bike? Lê ciwanên Tirkiyeyî…

– Di xebata we ya vê dema siyasî de...

---.: Hûn ê vê çawa bikin Misilman? Hene li gel we yên bixwazin Misilmantî bikin?

– Niha dixwazim giştî bêjim. Di Başûrê Rojhilat de partiya Îslamî, yanî partiya dibêje ez Îslamîme ji sedî bistûpênc dengê wan heye; di mertepolên Tirk de jî di navbera ji sedî pazde û bistûpênc, potansiyeleke gel bidest xistiye. Hilbijartinên li pêşiya me wê radeya vê ya rastînî bide nîşan. Di vê xalê de gotineke Îslamiya yerel ku we pêşxistî heye. Di çepê Tirk de hûn hîn cudatir nêzî vê meseleyê dibin.

---.: Di Kurdistanê de partiya Misilman bi vê rewşê nabe. Heta min wê hinek di dahûrandinan de vekir. Bi vî şeklî li ser navê Misilmantiyê tevgerîn, minaqiftî bi xwe ye. Nebawerim ev zêde Misilman jî bin. Li gorî min, şêwazeke cuda yê şovenîzmê ye. Yanî dema hat xwestin hinek tişt li ser navê komûnîzmê bên kirin jî, a rastî ya hat kirin şovenîzim bû; cilayekbû a şovenîzma Tirkîtî hinek vedişard. Ev Misilmatî jî wisaye. Weke dibêjin zêde

Misilmantî nîne, qilifeke din yê şovenîzma Tirk e. Bi pere hinek tîp tên girtin; heke pere nebe, hêza dewletê nebe, nebawerim bikaribin ciwaneke tenê jî bigirin. Ji ber vê, navê tevgerê li van anîn, weke heqaretek li Îslamiyetê kirin dinirxînim. Di derbarê naveroka Misilmantiyê de em hinek beşan di nava xwe de digirin.

Yanî yê bi rumet û bi namus, yê hinek taybetmendiya wê ya dîrokî heyî, hinek xweseriya wê heyî, hinek naveroka Misilmatiya divê hebe û teşegirtinên wan PKK pir baş datîne.

– Di hevdîtina me ya beriya niha de, we di derbarê Hizbilahê de tarîfek kir, wiha we weke "*berdewamiya kevneşopiya hevkariyê*" dît. Lê Hizbilaha we wisa destnîşan dikir, em piştre fêrbûn ku, we vexwandiye eniya hewl didin ava bikin. Ma ev ne helwesteke nakoke?

---.: Na, kişandina tevgera wan ya rastiyan e. Berevajîkirin heye; dixwazin bi şêwayeke ji wan re fehmbar bê bikişînin rastiyê.

– Heke red bikin! Wê bên?

---.: Bi xwe dizanin. Bila ji me qusur nebe, çi dikin bila bikin. Ji ber ew dibêjin; "*evkafirin, Misilmanandikujin*". Heke em piştrast bikin ku nekafirin û Misilmanan jî weke giyana xwe diparêzin, wê demê dê zêde îdayeke wan ya dijber nemîne.

– Yanî hûn dibêjin her çibe nayên.

---.: Misilmanên heqîqî wê bên û sexteyên wan jî derkevin holê. Yanî yên rast wê bi me re baş derbaz bikin, sexteyên wan jî wê herkes nas bike. Ev tiştekê xweşike. Belê divê ji hertiştî re taxtîk neyê gotin. Heke taxtîk ji bo tiştek baş xizmet bike, ev başe û taxtîkên wisa pêwîste. Taxtîk kirina me divê bi çavek cuda lê neyê temaşekirin. Jixwe polîtîka gotin, tê wateya taxtîk kirin. Yanî tiştek pir xwezayî ye. Ev Misilmanbûna di Tirkiyê de bi rastî jî pir bê wate dibînim û nebawerim Misilmantiyê jî fam dikin.

– Başe qet nûnereke Hizbûlah hat vir?

---.: Na. Pêwîst jî nake. Lê heke bên, deriyê me ji herkesî re vekiriye.

– Di ev bangawaziya we de risteke Îranê heye?

---.: Ji wê re jî vekiriye. Îran jî xwedî hinek îdeane; jixwe her tim dibêjin ji wê re jî vekirîne, heta dikarin biçin îtîfaqan. Yanî

me bangî aligirên rewşenbîrên Rojava jî kir û bangawazî ji Hizbûlahên alîgirê Îranê re jî kir. Dibêjîn; "*azadîxwazin, Misilmanên dûristin*;" wê demê hemû ji gelin û cihê hemûyan jî di nava gel de heye. Şerê min yê rûmetê, şerê min yê azadiyê, yê heq û edaletê şerê hemûyane. Ji Rojava ev fêrbûne, ji Îslamê ev fêrbûne; wê demê bila bên bidin sepandin. Wiha PKK, tevgereke evqas vezene, tevgereke taybetmendiyên mirovî pir dîqat dike. Heke ev aliyê PKK'ê baş bê famkirin û esas bê girtin, wê demê li ser bingehê azadiyeke berfireh gel bên gel hev, baş organîze bibe, wê pêşkeftin bidest bixe. Di heman demê de ev bangawaziyeke me yê di derbarê gelên Rojhilata Navîn de ye. Em, şêwegirtinên heyî li gorî hewldanên gelên Rojhilata Navîn berevajî dibînin û ji bo sererastkirina van jî tişta ji destê me tê dikin.

Hemû tevgerên mezin, destpêkê bi kesek re destpê kiriye. Dema Îsa derket holê pêxwas bû, bi daz de hewariyan re derket. Dema Hz. Muhammed ji Mekkeyê çû tenê li gel çend dostên wî hebû. Lê bandora van hîn jî di çapeke gerdûnî de ye. Em jî ew kevneşopiyê temsîl dikin. Ji ber wê divê kêfxweş bin. Yanî bi atmosfereke polîtîk a xeneqî re nêzî taybetmendiyên mirovî yên bingehîn nebin. PKK, taybetmendiyên mirovahiyê yên bingehîn esas digire. Heke hinek îxanet nekin û berevajî nekin, herî kêm bi qasî ew mînakên dîrokî wê devereke bi wate bigire.

– Hûn dikarin ji vir peyamek ji Birêz Ozal û Birêz Demîrel re bişînin? Herî dawî…

---.: Li gorî ku peyama me cidî negirtine, nebawerim nirxandineke wisa pêwîst bike. Yanî dibê min muxatap "*nedît, nebihîst, nizanim, çi baxivî tu yê ji dîwar re baxivî*". Başe hîn pêwîstî bi peyamê heye?

– Hûn ê ji gelê Tirk re çi bêjîn?


---.: Belê, bi heskirin nêzî gelê Tirk dibin û dixwazin şerê qirêj bi baldarî binirxînin. Bi rastî jî di nava vî şere de naxwazin zarokên Anadoluyê bibînin û qet naxwazin li wan bidin. Dixwazin bi wan re pêwendiyan pir baş vesaz bikin. Yanî di bingeha mirovî de be, dikare bê gotin ku em ê pêwendiyên herî xweşik bi gelê Tirk re deynin. Di vê de jî bi îdane. Bawerim di demên dawî de gelê Tirk, hewl dide me hîn baştir fam bike. Nûnerên wê yên şoreşger-demokrat hene, dîsa nûnerên wê yên sosyalîst hene. Bawerin ji niha şûnde wê ew jî me hîn baştir

bibînin û heya bêjî hêz bigirin. Wisa diyar dibe ku wê pêwendiyên me bi gelê Tirk û nûnerên wê re baş pêşbikeve. Weke ku hatî îdakirin, bila me weke tevgereke teng yê cudaker û neteweperest nebînin. Berevajî em ê, bi realîteya Tirk re pêwendiyên modern yên bi wate pêşbixin. Bila bi bawerî nêzî vê bibin û hinek jî tişta dikeve ser wan hewl bidin bikin. Bila zêde diltirs nebin û xwe bi siyasiyên xwe yên heyî re jî girê nedin. Bila vebijêrkên afirîner derxin holê, avabûnên nû û qada polîtîk dîqat bikin. Ji ew avaniya şaş û standartbûye ya, “*mezinên me çi bêjîn rast dibêjin, çi bikin rast dikin*” xilas bibin. Li ser esasê behreyên xwe bila bixwe jî polîtîka bikin û bisazî bibin. Û ji me çi dixwazin, dixwazin bi me re çawa jiyan bikin bila diyar bikin. Ji bo pêkanîna vê heya dawî amadene û bi gelê Tirk re pêwendiyên hîn baştir pêşxistin ji hemû deman zêdetir bi hêvî û bi îdane. Ne ku em pir hewceyî vê ne, ji bo em vê pir pêwîst dibînin û rast dibînin di vê de israr dikin.

Dîsa nêzîkatiyeke we ji bo rastiya gelan heye û nirx didim ev keda we ya çend caran. Heya ji destê min jî hat me hewlda bibin alîkar. Û destxweşiya we dikim.

– Ez jî spas dikim.

**15 Nîsana 1993**



*"Ji bo rêbaza çareseriya leşkerî pirsgirêkê hîn zêdetir tevlîhev neke, em hewl didin berpirsyar tevbigerin. Ji bo derfet ji vebijêrka siyasî re bê dayîn, em hewl didin hîn zêdetir însiyatîfa xwe xurt bikin. Elbet weke ku li ser me tê ferzkirin, ev ne di şêweyek radestbûnê de ye; em jidil nêz dibin ku ev di mercên azad de bibe lêgerînek aştî û çareseriya siyasî."*

*"Me bi ahenga stranan dest bi vî karî kir,*
*Ya me şerek bi strane."*

*Raportaja rojnemevanê Îtalî Antonio Ferrarî ya di dîroka 15'ê Nîsana 1993'ê de bi Rêber APO re kirî:*

**FAMBÛ EM ÇIQAS SERWER Û GIRÊDAYÎ RÊXISTIN, GEL Û GOTINA XWE NE**

**Antonio Ferrari**: Birêz Serok, hûn ê sibe civîneke çapemeniyê lidar bixin. Pêvajoyeke agirbestê heye, lê bi qasî em dibînin li Enqerê du nêzîkatiyên cuda hene. Wisa tê ditin ku beşek dixweza şer bidome, beşek jî ji bo bi awayeke aşitiyane şer bidawî bibe di nava hewldanê de tê ditin. Di vê mijarê de dikarim bi giştî nirxandinên we bigirim?

**Abdulah Ocalan**: Em ketin pêvajoyeke tevlîhev. Rojên me derbaz kirin ji bo şansek dayîna aşitiyê girîng bû. Di vê mijarê de me pêngava niyeta baş avêt. Ev di çapa netewî û navnetewî de bi sempatî hat pêşwazîkirin. Di encama hevdîtinên Birêz Talabanî li Enqerê kirî de, nêzîkatiyeke nerm tê dîtin. Lê vekiriye ku heya bêjî hewayeke dudilî serwere û ji gihiştina nêrîneke zelal jî pir dure. Ji berdevkên curbecur yên saziyên demokratîk û fermî, daxwaza hinek din dirêjkirina vê rewşê pêşket. Dîsa hawirdorên me jî hinekdin kurkirina vê pêvajoyê guncav dibînin. Lê pirsgirêk, bi me tenê xilas nabe. Weke hatî diyarkirin, li Tirkiyê

kesîmên ku bi israr dixwazin ev pirsgirêk ji aliyê leşkerî ve bê çareserkirin hene. Ev, tenkîla şêşt sal a li ser dîroka Komarê serwere, nêzîkatiya tepisandinê ye. Beşeke giran ji vê polîtîkayê meded hêvî dike. Tabî bi taybet di nava artêşê de nêzîkatiyên ji ber berjewendiyên xwe hene. Yên vê dikin meseleyeke prestîjê yan jî ji bo hêza wan li ser lingan bimîne yên neçarî dibînin hene. Dîsa beşeke statûkoparêz yên di nava bûrokrasiyê de rûniştî heye. Ev dibin aliyek.

Lê tevî van hemûyan, rewşeke fiîlî jî avabûye. Em dikarin ji vê re bêjîn, ya zagona bingehîn jî derbaz dike û rewşeke hîn zêdetire. A rastî bilêvkirinên heyî li gorî zagona bingehîn qedexeye. Jixwe ji ber vê pirsgirêkên makeqanûnî û zagonî heya bêjî xwe dide hîskirin. Yanî polîtîka û avabûn weke divêtiyek xwe ferz dike. Pêwîste zextên navnetewî jî li vê zêde bikin. Em van hemû digirin ber çav, tenê ji bo rêbaza çareseriya leşkerî pirsgirêkê hîn tevlîhev neke, hewl didin bi berpirsyar nêz bibin. Ji bo derfet bidin vebijêrka siyasî hewl didin însiyatîfa xwe bihêztir bikin. Weke li ser me ferz dikin ev ne di şêwayeke tasfiyê de ye; aşitiyek di mercên azad de û ji hebûna çareseriya siyasî re îhtîmam didin nîşan. Di Tirkiyê de jî ji bo bihêzkirina demokrasiyê dihizirîn ku pêwîstî bi vê heye. Ji bo ji niha şûnde, heke operasyonên li ser armanca îmhakirina me pêşnexin yan jî pêşniyarên çareseriya siyasî pêş bixin, em dixwazin pêvajoyê hinekdin dirêj bikin.

– Bi çiqas wext?

---.: Em ê hewl bidin sibe bi şêwirmendan re diyar bikin. Hinek hawirdorên me yên dost hene, divê serî li dîtinên wan jî bên dayîn.

– Heke unsurên serwer yên Enqerê, unsurên herî bihêz bersiveke neyênî bidin ev teklîfa agirbestê û silehê hemêz bikin, wê reaksiyona we ya di vê mijarê de çi bibe?

---.: Min bi hemû yekîneyên leşkerî re hevdîtin çêkir û amadekariyên heyî di berçav re derbaz kir. Heke guncavbûna mercên demsalê jî bigirin berçav, dikarin di rewşeke pir serkeftî de xwe biparêzin. Heke operasyonên îmhayê bixin rojevê, wê demê dê şer bilind bibe. Niha tenê hêzeke gerîla ya digihe deh hezarî heye û heya bêjî ezmûn bidest xistiye. Yanî dibe şereke rastî ji niha şûnde pêşbikeve. Di heman demê de, heke ev rêbaza

siyasî kur nebe, wê bê wateya ku alî dixwazin rêbazên leşkerî hîn kurtir bibin. Jixwe, di Newrozê de ji bo pêşiya vê bigirin me ev xwepêşandana niyeta baş kir. Heke bi rastî jî nêrîna serdest weke vebijêrka leşkerî ji niha şûnde xwe bide axaftin, wê xwînek ji ya heya niha hatî rijandin tenê di sala pêşiya me de zêdetir biherike. Di vê mijarê de hîn jî hewl didin bi berpirsyar nêz bibin. Lê ne di rewşek tiştek têqez bêjim de me.

– Heke li Tirkiyê aliyê demokrasiyê zêde ne li pêş bûya aliyê leşkerî li pêş bûya, turizm jî di nav de, planeke we yê lêdana gelek deverên Tirkiyê yên girîng rast bû?

---.: Heke weke di derbazbûyî de jî bûyî li ser hedefên sifil serdeçûyîn bidome, gund bên valekirin, bajar bi sepandinên tund re rû bi rû bên, wê demê dibe ev hemû bibin. Di riya leşkerî de israrkirin, bi mîsogerî dibe hemû hedefên ekonomîk, civakî û siyasî bigire nava xwe û kaos kûr bibe.

– Birêz Serok, a rastî di derbarê dirêjkirina vê agirbestê de qeneateke Tirkan jî heye. We di nava vê pêvajoyê de li hember teklîfa xwe ya çareseriya polîtîk bi awayek yekser yan jî neyekser bersivek yan jî gudarvanek dît?

---.: Civata guhdarvan heya bêjî pêşkeft. Lê pêşniyar pêşneketin yan jî pir bêxem man. Di mijara pêşxistina ramanên baş û pêşniyaran de mihafezekarin. Bawerim tiştek mîna rewşeke derbazbûnê tê jiyîn. Pêşkeftinên nû hene. Lê ji pêşxistina pêşniyaran pir durin, tenê rewşa li pirsgirêkê xwedî derketin heye.

– Raste wê sibe Kemal Burkay û Talabanî ji bo civîna sibe bên?

---.: Belê, li gorî agahiyên dawî me girtî wê bên. Dîsa wê heyeteke ji pênç parlementerên HEP’ê pêk tê bên.

- Birêz Serok, nizanim agahiya we ji daxuyaniya wezîrê karê hûndir ya ji rojnameyekê re dayî, ya rastîn ji Îsmet re kirî, dibê; “*Kemal Burkay dikare destê xwe bihejîne bê?*” Hûn vê daxuyaniyê çawa dinirxînin? Li gorî we ev, sînyaleke ji we re dişîne? Yan jî ji bo Burkay bi we re bibe navbeynkar dixwazin niha bikar bênin? Yanî dixwazin navbeynkarî bike?

---.: Li gorî min ne ew, ne jî ya din. Yêkitî pêş dikeve; dibe jî bixwazibin bikişînin gel xwe pêşiya vê bigirin.

– Li ser vê, ji sibe pê ve di wateya polîtîk de hûn bawerin ku di pêşengatiya we de yêkîtiya Kurd pêşbikeve? Bawerim ji wan protokolon xebera wan nîne.

---.: Bêguman pêşkeftinên zêde hene. Di vê mijarê de me bi gelek hawirdaran re hevdîtin çêkir. Îradeyeke wan a biçe bereyeke yêkîtiyê heye. Îhtîmaleke mezin di meha pêşiya me de îlana eniyê bê kirin.

– Cara yekeme hûn vê dibêjin.

---.: Belê, cara yeke vê dibêjim.

– Di dema derbazbûyî de, dibe niha jî, ji hêla Enqerê ve ji we re terorîst dihat gotin. Lewra em dizanin ku, têkoşîna ji bo azadî û gelan û terorîzm tiştên cuda ne. Ji ber di pişt yêkî de gel heye. Lê ji we re terorîst gotin, di wateya kesanî de we nerehet kir?

---.: Na. Vê baweriya min a bi xwe bi ti awayî nehejand. Lê ji bo berevajikirina têgehek tengav bûm. Bi rastî jî terorîzim heye; lê ew, herî zêde polîtîkayên dewletê digire nava xwe. Hemû daxwazên min, kiryarên guncaw ên li gorî pênaseya terorîzmê kîne fêm kirina wan e. Heke terorîstê rast diyar bûba, ez ê ji vê pir kêfxweş bûbam. Di vê mijarê de tengaviyên min hene.

– Ez ê niha pirseke taybet bikim. Ji aliyek ve hûn li vir jiyan dikin, ji aliyek ve diçin deverên cuda. Her tim tevgerek heye. Ev dişibe navenda berê Arafat lê jiyan dikir. Di nava vê navendê de hûn xwe çawa hîs dikin? Tengaviyek yan jî hûn çi hîsdikin?

---.: Jiyana min a li vir bi temamî 14 salên xwe tijî dike. Aliyeke vê yê zêde di parçeyek biçûk yê erd de derbaz bû; yê din jî wisa di navbera malan de heya dawî bi tevger derbaz bû. Ev, tê wateya jiyaneke bi naverok. Hewl didim vê derbaz bikim, lê weke tiştek di nav de mayî. Ji vê re nebêjim çerxa bêweç, ji ber encamên pir baş diafirîne. Lê dixwazim xilas bibim û qad bidim guhertin. Dixwazim serokatiya şer yan jî aşitiyê di cî de bidim meşandin.

– Dikarin di derbarê têkiliyên xwe yên bi hikûmeta Surî û Lûbnanê re tiştek bêjin?

---.: Her tişt di asteke zêde de ji derveyî fermiyetê tê. Yanî min nebihîst, nedît û nizanim!

– Yanî bawerim rojek bixwazin vegerin, biçin Tirkiyê. Baş e di pêşerojê de, dema em ev xebatên polîtîk jî didin ber çav vegera we ya li Tirkiyê, yanî hûn dixwazin rista xwe û xwe çawa

bibînin? Ji ber ev demeke dirêje hûn li dervene, dema vegerin bi welateke qet nasnakirin re rû bi rû hatin gelo dê we nede tirsandin?

---.: A rastî xebatên me yên heyî du Tirkiye derxist holê: Yek Tirkiya bi min re, yek jî Tirkiya bi yên mayîn re. Lêrasthatina herduyan wê ecêb bibe. Jixwe rewşa Enqere jî di nav de heya bêjî vê dide hîskirin. Ev rewş bibû mijara pêkenoka rojnameyek û gotibûn; "*ev zilam bê em ê çi lê bikin, bikeve girtîgehê em ê çawa ji bin derkevin*". Ji vê piştrast im; ji Mêrdînê derkevim û meşeke ber bi Amedê ve diçe bikim, bi hêsanî di nava hefteyek de wê çend milyon mirov bigihin hev. Li bendê mayîneke pir mezin heye û eleqeyeke pir bilind heye. Ev rewş dikare rê li ber serûbinbûnên pir girîng veke.

– Birêz Serok, çend caran xwestin we bikujin? Yanî serî li suiqastkirinê dan? Çend car?

---.: Bi qasî di çapemeniyê de hatiye peytandin, bawerim di Hûrriyetê de hat peytandin, di vê mijarê de qala deh caran hat kirin. Tê gotin ku suîqast ji sê aliyan ve çêbûye, lê hemû jî nekêrhatî derketine. Di vê mijarê de dikarim bêjîm heya bêjî xwedî şansim. Gelek suîqestvan heta kêlega min hatine, îhtîmaleke mezine destên xwe jî nerakirine. Di vir de dibe risteke girîng ya şiyarbûna min hebe. Bi taybet şêwaza tevgera min ji vê re zêde destûr nade. Weke pîlankirina çend teşebusan pêşnakeve. Şêwaza tevgera min ya guhêrbar bawerim di vê de roleke girîng dilîze. Ozal jî vê diyar kir dibê; "*ji nîşkê ve xuya dibe, ji nîşkê ve winda dibe*". Pir hewldanên kuştinê hatine fikirîn.

– Li vir, Lûbnanê hewldanek çêbû?

---.: Dibe li çend deveran hatibe fikirîn. Rêbazek din jî ev bû: Di nava rêxistinê de bi pêşxistina provakasyonên bi awayeke neyekser bê bandorkirin. Yek ji nêzîkatiyên herî esasî ev bû û pişta xwe jî pir bi vê girê dabûn. Wiha "*Apo xistina bin kontrolê û rêxistinê ji destê wî derxistin bû*." Ceribandinên di vê derbarê de pir hene. Û di wê baweriyê de me ku rêbaza herî pişta xwe danê ev bû.

– Evqas guhertinên di cîhanê de dibin û di demeke Marksizm winda bûyî, hûn hîn xwe nêzî Marksizmê hîs dikin? Yanî hûn Marksist in?

---.: Pir zêde girêdayî nostaljiyê me. Li ser navê sosyalîzmê gelek nostaljî hene. Lê ez, dikarim bêjim ku naşibim ew sosyalîstên di dema derbazbûyî de pêkhatine. Stêrka min ti carî bi sosyalîstiya pêkhatî re li hev nekir. Jixwe ji dema derketina min ve di nava têkoşînê de me. Min xwe û avaniya rêxistinê li ser vê bingehê bi teşe kir. Divê ev pir bi baldarî bê dîqatkirin. Li gorî min felsefe û feraseta min a sosyalîst heye. Lê vegotina vê wê dirêj bike. Li gel pergaleke sîstematîka raman, çalekiyê dimeşînim. Û min, xwe nesipart sosyalîzma pêkhatî wisa polîtîka nekir, berevajî min ji sosyalîzma reel pir astengî dît. Ji bo min, di çarçoveya ramanên xwe de kar pêşxistin hîn hêsantire.

– Wiha hûn wisa bawerin ku di pêşarojê de sosyalîzmin vegere?

---.: Wisa bawerim rewşa heyî rewşeke pir giran a tengezariyê ye. Mesela, bi qasî min fam kirî li Îtalya tengezarî pir berfirehe. Û bi nêzîkatiyên ji rêzê û guhertinên hikûmetê re nayên derbazkirin. Bawerim ev rewş her ku diçe belav dibe. Li gorî min, ber bi salên 2000'î ve ji bo mirovahiyê pêwîstî bi nêzîkatiyên bingehîn heye. Tenê ne di warê vesazbûnên civakî de, parastina xwezayê jî pirsgirêkeke mezin ferz dike. Dîsa tehdîda nûkleer rakirin, bûyera dibêjin exlaq ketina dewrê, bi ti awayî derneketina pêşiya zêdekirina nifûs, van neteweperestan xistina riya rast, li pêşiya feraseta civaka serfkar girtin yan jî derbazkirina wan pir girînge. Pirsgirêkên dişibin van hîn pêşdikevin. Ev hemû me dibe feraseta pergaleke nû û sepandinan. Ji vê re bêjîn sosyalîzma nûbûyî, derketina olên nû û yan jî tiştek din bêjîn. Dibêjim heya ku mirovahî jiyan bike divê nêzîkatiyên berfireh jî bên pêşxistin.

– Ev pirsa dawî girêdayî pêşerojê ye. Hûn di pêşerojê de Kurdistaneke azad, federasyonek, yanî jiyankirineke bi Tirkiyê û hemû herêmê re dibînin? Di pêşerojê de çi dibînin?

---.: Serxwebûnxwaziyeke zêde him zehmete, him jî ji bo alozên wê pirin, zêde ne sûdmende. Lê feraseta yêkitiyên niha jî ji wê hîn xetertire. Hemû dane, dide nîşan ku serdemeke federasyonbûnê wê hîn pratîkî be. Di Rojhilata Navîn de parvekirina Kurdistanê ya di navbera çar netewan de jî, wisa diyar dibe ku federasyonbûna heyî wê di çarçoveya Rojhilata Navîn de pêşbikeve. Di heman demê de dikarin bêjîn ev e, di Rojhilata Navîn de tê wateya dema demokratîkbûneke berfireh. Ketina

Kurdistanê ya demeke wiha, tê wateya Rojhilata Navîn jî dikeve serdemeke wisa ya demokratîkbûnê. Ev girînge. Mesela li Avrupa jî pêşkeftina feraseteke yêkîtiyê heye. Dibe bi qasî wê nebe lê, ji bo yêkîtiya Rojhilata Navîn û bingehên demokratîk a di mercên azad de, Kurdistan alîkariyeke pir mezin bide. Kurdistan bilindbûnek mezin ya demokrasiyê ye. Di vê wateyê de ez dibêjim, çalekiya PKK'ê, çalekiya herî mezin ya demokrasiya Rojhilata Navîne. Dijbertiya zextên netewî û bermahiyên serdema navîn vê gelekî bihêz dike. Di vê wateyê de hîn ji niha ve fam dibe ku xwedî bandoreke mezin ya navnetewî ye.

– Dixwazim di mijara Papa de pirsek bipirsim. Bêguman ev bûyereke cihana hemû Katolîkan hejandiye. Di vê mijarê de dîtinên pir cuda hene. Hûn di vê mijarê de tiştek dizanin?

---.: Du tezên min hene. Rejîma 12'ê Îlonê li Avrupa du provakasyonên mezin pêk anî. Yek provakasyona Papa, hewldana cînayetê, ya din jî cînayeta Olof Palme bû. Astên van hewldanan yên navnetewî jî hene. Bi taybet du bûyerên dixwestin di dema Reagan û Thatcher de bikar bênin. Ji bo rejîma 12'ê Îlonê van destûr dabû. Wê demê hawirdorên çepê Tirk diçûn Avrupa. Pêwîstiya rejîma 12'ê Îlonê hebû ku, li Avrupa mohra terorîstbûnê li van bikeve. Jibîr nekin ku, ev bi deh hezaran penaberbûn û têkoşîna demokrasiyê ya bidabûna meşandin jî wê rejîma 12'ê Îlonê pir tengav kiriba. Her wiha hemû hawirdorên demokratîk terorîst îlankirin, wê karê rejîma 12'ê Îlonê pir hêsan kiriba. Kesê M. Ali Axca, Abdî Îpekçî kuştiye. Bi wî re navenda Tirkiyê ya demokratîk şêlo kir û demek wisa ber bi kaosê ve bir. Ew bûyer, kevirê herî mezin yê rejîma 12'ê Îlonê aniye. Dema Turkeş di hûndir de bû, di derbarê Axca de îdayek dike û dibêje; "*ev zilamê we ye*". Tûrkeş jî dibê, "*ew ne zilamê me ye, zilamê Nurettin Ersin Paşa ye".*

– Leşker îdayeke wisa dikin? Yanî dozger?

---.: Belê dozger, meqamê îdayê. Nurettin Ersin zilamê duwem yê 12'ê Îlonê bû; fermandarê hêzên bejayî ye û yê herî paşverû ye. Dîsa jibîr nekin ku, Axca di dema rêveberiya awarte de bi temamî ji Girtîgeha Leşkerî ya Maltepe serbest tê berdan. Hûn dizanin Maltepe, girtîgeke wisaye çivîk nikarin di ser re bifirin. Bi mîsogerî li gorî zincîra emir-qomîte hatiye berdan.

Dema tê berdan hema bi Bulgaran re dikeve nava pêwendiyan. Bawerim ew dem ji bo pergala Sovyetê daxîlê vê provakasyonê bike bû. Yanî ji bo provakasyonê li ser vê pergalê bihêle, bi awayeke taybet bi Bulgaran re xistin nava pêwendiyê. Di bûyera bazirganiya şirketên Mît û Bulgaran de pêwendiyên wan yên ketibûn nava hev jî hebûn; bi taybet di bazirganiya çek û afyonê de. Bi rastî jî Axca çû Bulgarîstanê û pêwendî li gel îstîxbareta Bulgarê danî. Bawerim ji bo Papa bi eslê xwe Polonyayî bû, hedefgirtina wan ya Papa mûmkûne; ev mêl hat hîskirin. Axca xwe yekî pir Îslamî dide nîşan, dîsa dijminatiya Hiristyantiyê jî di wî de pir zêdeye; ev aliyê wî jî hat dîtin. Dibe Bulgaran ji pêşniyara wî re ronahiya kesk pêxistibe. Lê di bin meseleyê de derhênkirina MİT'ê heye.

– Ji van tezên we ya yekemin, di derbarê ku rejîma leşkerî sazûmaniyek wisa çêkirî de ye. Başe, wê teza we ya duwem çibe? Ji ber we qala du tezan kir.

---.: Teza min a duyem, hewldana bikaranîna pêwendiyên Bulgaran bû.

– Mesela hinek nûçe û deklarasyon heye ku, heta ji CIA' yê jî bingeha xwe digire…

---.: Ez ê bêm ser wê jî. Mîmarê van pîlanan hemû CIA ye. Li gorî min, îhtîmala ku CIA dimeşîne pir zêde ye. Ev, ne bûyereke wisaye ku MÎT'ê Tirk bi serê xwe bide maşandine; lê di nav de ye. Bi pîlankirina cinayeta Papa re wê çi hedef bikin? Encamên wê çi bibe? Niha jî bêm ser wê. Bi vê re, wê di alema Hiristiyanan de rê li ber hêrseke mezin veke, dîsa wê li hember pergala Sovyetê hêrs û kînek mezin pêşketiba. Di wê demê de pir giranî didan karê hilweşandina pergala Sovyetê. Di wê qadê de şereke pir zêde mijara gotinê ye. Her wiha wê risteke pir bandorker bilîstiba. Axca Misilmaneke Tirke. Dîsa di wê demê de çûyîneke pir zêde ya Tirkan ji bo Avrupa heye. Bi vê bûyerê re di alema Hiristiyanan de wê îmaja "*terorîstên bi eslê xwe Tirk*" belav bûba û bi vî rengî hêjmareke mezin yên çûyîn Avrupa weke terorîst hatiban nirxandin û têkoşîna ku van daba meşandin hîn di serî de birîndar bûba. Yanî hawirdorên demokratîk yên li Tirkiyê wê bi awayek şikbar bên nirxandin û bi vî rengî kampanyeya li hember rejîma 12'ê Îlonê serkeftî nebûya. Bi kinahî rawêja min ev e.

- Başe di vê mijarê de ti delîleke din gihişt destê we? Yanî hûn dikarin delîlek bidin?

---.: Ez, xakên Axca lê mezin bûyî baş dizanim. Bi mîsogerî keseke ji hêla dewletê ve tê meşandin û endameke kontirgerîla baş perwerde kiriye. Yên wisa bi giştî ji bo muhalîfan bimelisînin bikar tînin. Mesela, bi cînayeta Abdî Îpekçî re raya demokratîk a di Tirkiyê de bi erdê re kir yek. Ji derve jî, bi serdeçûna Papa re dîsa heman fonksiyon dît. Li gor min, armanca CIA ya li çapa cîhanê û armanca rejîma Tirk li hev ket û ev bûyer pêk hat.

Bên ser bûyera Palme, ew hîn tevlîhev û hîn balkêştire. Wexta bi bûyera Papa re hemû hawirdorên demokratîkên-çep û pergala sosyalîst tê hedefgirtin, xwestin bi bûyera Palme re tevgera Kurd a PKK pêşangtiya wê dike hedef bigirin. Daxuyaniyeke Palme beriya kuştina wî tê bîra min; nerazîbûna xwe li hawirdora xwe dike dibê "*çima dixwazin min têkilî ev karê PKK'ê bikin*". Bi israr li ser disepînin jê re dibên; "*PKK'êli Îsvêçê terorîst îlanbike*". Ew jî dibê vê nakim. Û heya wê demê ji devê Palme di derbarê "*PKK terorîste*" gotinek dernakeve û li Îsveçê jî li hember PKK'ê hewayek neyênî nîne. Ji ber wê ev gotina ku hema beriya kuştina xwe kirî girînge. Niha kesayeta Palme baş binasin. Di şerê Vietnamê de li hember Emerîka derketibû, bi awayeke vekirî piştgirî dabû gelek tevgerên rizgariyên netewî, ji bo çûyîna gelek hêzên welatparêz yên weke penaber diçûn Îsveç risteke mezin lîstiye. Dikare bê gotin ku Îsveç anîbû rewşa bûheşteke penaberan; ji Asya, Afrîka, Latîn Emerîka hemû tevgerên rizgariya netewî qada ku herî rihet lê diman wir bû. Diyare Emerîka û dîsa hawirdorên NATO yên paşkeftî ji vê polîtîkayê tengavin. Rêveberiya Reagan bi mîsogerî antî-Palmeyî bû.

Em dizanin ku, wê bixwazin Avrupa li pey Reaganizmê bişînin. Li Tirkiyê rejîma 12'ê Îlonê pêkhatiye, li Îngilterê Thatcherizm û li Almanye jî rêveberiya Kohl hatiye pêşxistin. Guhertinên gelek hikûmetên dişibin van pêkhatine. Lê li Îsvêç rêveberiya Palme astenga herî girîng ya li pêşiya vê polîtîkayê ye. Ev rastiyên objektîfin. Aliyê di derbarê me de jî ev e: Îsveç welatê herî zêde penaberên Kurd digirt. Dîsa rejîma Îsveç, rejîma herî zêde piştevaniya Kurdan dikir. Bi rastî jî ji bo Kurd henaseyek

bigirin fersendeke mezin didin. Ji ber vê 12'ê Îlonê ji bo rejîmê, li Avrupa pirsgirêkek sereke bû. Yanî PKK'ya ji bo rejîma 12' Îlonê pirsgirêke, li vî welatî çaleke û ji ber wê ew jî dibe hedefeke rejîma Tirk. Her wiha , ji bo Emerîka û Tirkiyê lihevketineke nû dibe.

Ji hêla Emerîka ve bi xistina Palme re wê muhalîfeke pir girîng yê sosyal demokrat tesfiye bike. Jixwe ew ceribandina Îsveç piştî wê rojê şûnde birîn bû û bidawî bû. Û niha jî Îsveç daxilê NATO yê dibe. A rastî bi wê bûyerê re xeta Îsveç bidawî bû. Dîsa meşûre, xwestin cînayeta Palme bavêjîn ser me. Raya ewlekariyê ya Stockholm hebû, navê wî dê li bîra min neyê, ew pir zêde li ser vê xebitî. Piştre girêdana wî ya li gel CIA hat nîqaşkirin. Teoriyeke mîna "*dewsa PKK'ê*" pêşxist, lê ev mijûlahiyeke taybet bû. Waye PKK ji vê birîn bû. Ji ber gelek mirovên me di lêpirsînê re derbaz kirin. Ev çîroka me ya "*terorîstbûnê*" bi kuştina Palme re destpê dike û li Avrupa qebûlkirina vê jî bi vê re girêdaye. Bi rastî jî li ser vê xwestin gelek deq li tevgera Kurd jî bidin. Yanî wateyeke wisa ya van provakasyonan heye.

– Dixwazim pirseke bi agirbestê ve girêdayî bipirsim. Piştî we vê agirbestê îlan kir şûnde, bi qasî em dizanin nêzî pêncî gerîla hatine kuştin. Lê helwesta we nehat guhertin. Di derbarê van kuştinan de nirxandinên we çine?

---.: Helbet; em neçarbûn hevgirîtibûnê piştrast bikin. Neçarbûn ji rêxistin, gel û soza xwe ve çiqas girêdayî û serwerin bidin nîşan. Li gorî min ev fam bû. Lê heke ji niha şûnde operasyon zêde bibin, wê demê dê bersiv hîn tundtir bibe. Li vir xususeke taybet hûn bixwazibin fam bikin heye?

– Na, pir vekiriye. Sîpas dikim. Min dixwest bi we re bi demjimêran baxivim, lê dizanim hûn gelek mijûlin.

---.: Ez jî sîpasiya we dikim.

– Ez jî sîpas dikim.

*"Em alîgirin ku pêvajo hîn zêdetir bê dirêjkirin. Em diyar dikin ku bi hinek mercan re, heta daxuyaniya duyemîn em dikarin agirbestê bêdem bidomînin. Mercên vê destnîşan dikim. Berî her tiştî agirbest yek alî nabe. Ji bo vê pêwîste operasyonên bi armanca îmhayê tên kirin bên rawestandin. Divê dawî li zextên giran ên li ser gel, girtin û kuştinên kiryarên wan nediyar bê anîn."*



*"Avakirina mirovê sosyalîst, ji avakirina dewletê zehmetire."*

*Civîna duwem a çapemeniyê*

## BILA BIDEH HEZARAN MIROV NEMIRIN

Endamên çapemeniyê yên hêja, pêşî xêrhatina we dikin. Di derbarê pirsgirêka agirbestê ya beriya niha mehekê me dabû nasîn de ku di serî de raya Tirk û Kurdistanê, eleqeya gelek hêzên welatparêz yên navnetewî û Kurdistanî pêşketî û di nava piştevaniyekê de bûn, careke din we dîtin û hinek daxuyanî dayîn em xweşhal kirin.

Beriya hertiştî ev hewldana agirbestê rê li ber encamên girîng yên dîrokî vekiriye. Agirbesta me îlan kirî, pêvajoyeke nû daye destpêkirin. Ya ji me hatî xwestin, hinekdin kurkirina vê pêvajoyê ye. Bêguman berpirsyartiyên me giranin. Gelê Kurd di dema dîrokê ya herî zehmet re derbaz dibe. Gelê Kurd, bi awayeke yekalî di bin zexteke giran de ye û ev êrîş heta nîjadkujiyê diçe. Rewşeke me, em wisa ji ber xwe ve atêş bikin nînbû. Hemû tiştên me kirî ji bo hebûna netewa xwe riya pêşkeftineke azad vekirin bû. Di vê mijarê de derfet bidestxistin bû. Di vê wateyê de, ji bo riyek din ji me re nehiştin, me dest bi têkoşîna çekdarî kir û heta vê qonaxê anî. Meseleya Kurd di bingeh de meseleyeke Kurd û Tirke. Têkoşîna me, ji raya Kurd û hawirdorên fermî yên Tirk re hatiye xala qebûlkirina nasnameya Kurd. Hebûna Kurd naskirin û bi xwe pirsgirêkê çareserkirin weke divêtiyek tê dîtin. Di vê wateyê de, ji me jî aramîkirina navendê tê xwestin. Bi taybet raya

giştî di vê mijarê de bi daxwazeke hîn zêde li bendê ye. Me niyeta xwe ya baş da nîşan û ev serkeftin çêbû. Bi taybet di pêvajoya Newrozê de guleyeke tinê jî nehat avêtin û di nava mehek de li leşkereke tenê jî nehat xistin. Lê yêkîneyên Tirk yên şerê taybet operasyonên xwe bê navber domandin. 30 gerîla û 11 kes jî ji gel, bi awayeke giştî 41 kes qetil kirin. Tevî vê jî me bi awayeke bêkêmasî bersiv da agirbestê.

Dîtina xwe ya niha rave dikin: Em alîgirê kurkirina pêvajoyê ne. Bi hinek mercan re heya daxuyaniyeke duwem agirbestê dîrêj dikin. Mercên vê diyar dikim. Beriya hertiştî agirbest yekalî çênabe. Ji ber wê pêwîste operasyonên xwe yên li ser bingeha îmhayê bidin sekinandin. Pêwîste dawî li zextên li ser gel, girtin û kujerên nediyar bêne. Bi kinahî ji bo agirbestê vê diyar dikim. Heke bi awayeke bê sînor operasyon bidomin-çi sê roj bin, çi jî sê meh be-, em ê jî mafê xwe yê parastinê bi awayeke pir xurt bidin meşandin. Xususa yekem vê diyar dikim. Di derbarê daxistina gerîlayên li çiya, hinek daxwazên hikûmetê hene. Hêzên li çiya, ji bo armancên xwe yên siyasî divê hertiştê xwe dênin holê li çiya bimînin. Ji bo hebûna netewî û riya çareseriya azad li wir in. Heke ev armanc bên cî, wê bi awayeke bawerker pêwîstiyên wê bicî bê û mercên wê bên amadekirin, wê meseleya hêzên çekdarên li çiya bi awayeke hêsanî çareser bibe. Ji vê hêlê ve, di derbarê yên li çiya ti pirsgirêkek nîne. Ya duwem, di pêvajoya vê agirbestê de hinek daxwazên me yên lezgîn hebû. Min di serî de qala rawestandina operesyonan kir. Tenê ne li hember gerîla, di vê operasyonên li hember gel jî bên rawestandin. Ya sêyem di vê efûyek giştî bê derxistin. Em xwe bi awayeke suçdar qebûl nakin, lê divê em li bendê bimênin ku heta girtî tên berdan. Dîsa li bendêne hinek mafên çandî jî bikevin meriyetê. Ev mafên çapemeniya azade, weke radyoya Kurdî, televîzyon, rojname, pirtûk û hdw. Bi kinahî di vê ji zimanê Kurdî re serbestî bê dayîn. Dixwazin gelê ji gundên wan qut kirine careke din li gundên wan bicî bikin û ziyanên wan bidin. Di vê navberê de li bendêne ku rewşa rêveberiya neasayî bê rakirin. Dixwazin cerdevanên gundan bên rakirin. Em jî ji bo cerdevanên gundan, ji bo alîkariyek ji çareseriyê re çêbibe efûyek îlan dikin. Yanî heke çekên xwe dênin, em ê dest nedin wan. Dixwazin ji rêxistinên Kurd re legalîte bê naskirin. Mafê rêxistinbûna serbest û polîtîka kirin

şerte. Bi kinahî, ev bi awayeke lezgîn tiştên bên pêkanîne û bendewariyên navêndê hîn zêdetir nermkirine.

Ji niha şûnde gava duwem a bê avêtin jî, nasnameya Kurd ya hatî qebûlkirin bê zagonîkirine. Ev him li makeqanûn û him jî bi awayeke tê xwestin li zagonan bê peytandin. Dîsa ev hemû, tê wateya ku di riyeke federasyona demokratîk de gavên tên avêtine. Dixwazin ji nîqaşên wisa re jî rêzdarî hebe û navend vekirî bê hiştin.

Bi kinahî, tiştên bênim ziman ev in. Bawerim, di têkiliyên Kurd-Tirk de ji dêvla serdema zextê, li hember rastiya netewî, nasnamê rêzdarî raber bikin û li gel nîqaşkirineke azad ji riyên çareseriyê re bi awayeke aşityane nêzîkatî raberkirine. Wiha bi rêbazeke demokratîk re derfeta derketinê afiriye yan jî herî kêm dixwazin bi vê bawer bikin. Dîrokeke hevpar ya hezar salî heye. Kurdan, ji Tirkan re gelek xizmet kirine. Û heta têkiliyên wan mîna bira nirxandin. Lê birastî jî, me weke mileteke ji vê hevpartiyê gelek ziyan dîtiye. Dixwazin ji vê ziyanê vegerin. Dixwazin pergaleke li birayan tê, bê pêşxistin. Ji ber vê çi dibe bila bibe em, merceke qutbûnê ferz nakin. Lê pêwîste di mercên azad û wekhev de ji yêkîtiyê re jî navend bê vekirin. Vê him ji kesîmên dewletê dixwazin û him jî li bendêne ku di vê mijarê de gelê Tirk nêzîkatiya xwe ya demokratîk û hewldana xwe pêş bixe. Di bingeh de hêza çareseriyê gel bi xwe ye. Ji gelê Tirk re û ji nûnerên wê yên demokratîk re gelek peywir dikevin. Dîsa ji çapemeniya ku îşleveke demokratîk dibîne re jî peywirên girîng dikeve. Di wê baweriyê de me ku di nav ev meha derbazbûyî de çapemenî kargeriyek pir sûdmend dîtiye û di hizûra we de we sîpas dikim. Ji bo kurkirina vê pêvajoyê jî li benda alîkariya we ne. Careke din ji we hemûyan re sîpasiya xwe raber dikin.

Mêvanên xwe bidin naskirin. Ji bo we nasdikir min di serî de nedan naskirin. Birayê me Ehmet Tirk, Serokê Giştî yê HEP'ê ye. Xwestin ji bo ev pêvajoya çareseriyê me ziyaret bikin. Armanca wan, bi vê agirbestê re pêvajoya aşitiyê û riyên çareseriya siyasî lêkolîn bikin û alîkarî raber bikin. Bi vê wesileyê di huzura we de ji wan re dibêm ev gavek dostaneye û di derbarê vê pêvajoyê de li benda alîkariya wan im.

Dîsa yê beşdarî civîna me bûye Sekreterê Giştî yê Partiya Sosyalîsta Kurdistanê hevalê binirx Kemal Burkaye. Di huzura

we de xêrhatina wî jî dikim û alîkariya wî ya di derbarê pêvajoyê de pir binirx dibînim.

Jixwe Mam Celal Talabanî nas dikin.

Hevalê Hamreş Reşo, Serokê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê -Hevgirtin- ye. Ew jî beşdarî xebata me ya yekîtiyê bûye. Alîkariya wan ji bo vê pêvajoyê heya bêjî binirx dibînin û destxweşiya wan dikin.

**Celal Talabanî:**(Bi İngilizî axivî.)

**Ehmet Tirk**: Endamên çapemeniyê yên hêja!

Pêşkeftinên di welatê me de me hemûyan ji nêz ve eleqedar dike. Bi salane gelê Kurd bi tundî û şîdetê re rûbirû maye. Em cîhaneke bê tundî û şîdetê dixwazin. Tirkiyeke gelê Kurd bikaribe bi awayeke azad xwe tê de îfade bike dixwazin. Em weke partiya siyasî berpirsyartiyên me yên girîng li hember gelê me hene. Him weke partiya siyasî û him jî weke hêmaneke vî gelî armanca me, bêriyên me, gelê Kurd bênin asteke bikaribin hemû mafên xwe yên demokratîk bikar bêne. Cihaneke ji tundî û şîdetê xilas bûye dixwazin. Di nava ew cîhana azad de azadiya gelê Kurd dixwazin. Bi hêvîne ev feraseta ku li hember feraseta me ya azadiyê xilas bibe.

Em îro serdemeke ferasetên aşitiyane derketiye pêş jiyan dikin. Armanca me her tim aşitiyeke mayînde ye. Ji ber di wê baweriyê de ne ku, dema aşitî serwer bû wê gelê Tirk jî, gelê Kurd jî hîn zêdetir kêfxweş bibe. Wê ev ji bo fêda gelê Kurd-Tirk bibe, wê Tirkiyê jî bêne asteke rêzdariyê. Di vê demê de ji bo feraseteke wisa derbikeve holê, heya bêjî ked raber kir. Armanca me her tim mayîna vê navendê ye. Ji yên eleqedar re bangawazî dikin! Him ji dewletê re, him jî ji PKK'ê re: Aşitiyê derxin pêş, ji bo aşitiyê destê xwe dirêj bikin, ji bo aşitiyê jî cîhanek ava bikin. Min lênûseke diyarî Birêz Ocalan kir. Armanceke vê heye: Ji bo çek rawestin, lênûs baxivine. Aşitî, mirovê me, gelê me kêfxweş dike, vê kêfxweşiyê heq kirine. Bawerim wê herkes şiyarî raber bike.

**Kemal Burkay:**Xebatkarên Çepemeniyê yên hêja!

Ji bo Birêz Ocalan agirbestê dirêj kir ez vê bidilxweşî pêşwazî dikim û ji bo wêrekiya wan ya vê mijarê destek dikim. Di derbarê pêşkeftinan de min di demên dawî de dem bi dem nêrînên

xwe bi raya giştî re parve kir. Ji ber vê civînê jî dixwazim çend gotin bikim: Li gorî min ev fersendeke dîrokî ye. Dibe serdemeke aşitiyê ku ji hêla Kurd û Tirk ve bê destpêkirin û bi rastî jî ev birîna sedî salane xwîn dibe bê girtin. Ji bo herdu aliyan fersendeke wisa erênî derketiye holê û divê ev neyê berdan. Li gorî me, di vê mijarê de berpirsyartiyên herî girîng ji dewleta Tirk re dikeve. Dîsa li gorî me herdu Milet dikarin li ser bingeha wekheviyê bi hev re jiyan bikin. Ji bo wê li gorî rastiya welat, jiyana welat a polîtîk, jiyana çandî û jiyana meşandina îradî ji nû de vesazkirine. Esasên vê me beriya niha li gel Birêz Ocalan di protokolekê de danî holê. Beriya hertiştî ji bo çareseriyeke aşitiyane û demokratîk divê rê vebe. Ji bo wê daxwazên me yên lezgîn di sê xalên bingehîn de kom dibe. Pêwîste şîdet bi awayeke dualî raweste. Li gorî ku aliyek şer sekinandiye û ji bo bi temamî şîdet bisekine divê aliyê Tirk jî gav bavêje. Ji ber agirbesteke yekalî a demdirêj negengaze. Pêwîste gavên demokratîk yên pêwîst û mecbûrî bên avêtin. Ji ber wê efûyeke giştî ku herkesî bigire nava xwe, serbestkirina hemû partiyên siyasî, hemû partiyên Kurd,-yanî partiya me, ya PKK'ê û partiyên din yên bira hemû- pêkanîna navendeke demokratîk ku hemû bikaribin tê de serbest bigerin û dîsa ev zextên giran yên îro li ser ziman, çanda Kurd bê rakirin, azadîbûna Kurdî di qada perwerdê, weşanê û kirariyên fermî de şarte. Dema em pêşkeftinên serdem û roja xwe tênin ber çav, lewra ev daxwazên lezgîn, ne daxwazên mezinin, daxwazên rastîbînin. Ji ber vê em, bang li hikûmeta Tirk jî dikin ku rastîbîn bibe, bi wêrek bibe û gavên hemdem bavêje. Ji bo aşitî û demokrasiyê vê fersendê neberdin. Di dawî de tişta min xwest bêjîm ev e. Sîpas dikim.

**Hamreş Reşo**: Ji bo demek dirêj ji Tirkiyê qut bûme dibe ku zimanê min ê Tirkî têrê neke.

Xebatkarên Çapemenî yên hêja!

Weke dibînin, Sekreterê Giştî yê PKK'ê Birêz Abdulah Ocalan, ji bo ev pêvajoya aşitiyê hîn baştir bicî bê, ji dewleta Tirk re fersend bê dayîn, ev pêvajoya aşitiyê carek din tê dirêjkirin. Em, weke Hevgirtin-Partiya Demokratîka Kurdistanê- ji bo ev pêvajoya aşitiyê çi ji destê me bê dixwazin bibin alîkar. Yek ji armanca partiya me jî ev e. Partiya me ji bo xebatên demokratîk bide meşandin ava bûye. Di riya aşitiyane û demokratîk de ji bo

mafên gelê Kurd yên netewî û demokratîk bidest bixe dixebite. Lê diyare wê ev bi yekalî jî çênebe. Yek ji me, partiyên din yên Kurd, li gorî daxwazên xwe neçûne Îngîlterê. Makeqanûna heyî, qanûn, heta qanûna partiya siyasî rê li ber vê vekiriye. Ji bo li Tirkiyê demokrasî pêk bê, divê mafên Kurd yên netewî û demokratîk bên naskirin. Di wê baweriyê de me ku wê ev ji bo hemû gelên Tirk rojên xweş bêne. Bi taybet hêvî dikim ku gelê Tirk ji bo hatina demokrasiyê alîkarî bike. Weke hevalan jî diyar kirî, divê ev guhertinên makeqanûnî çêbibin û nasnameya Kurd bibin vê makeqanûnê. A rastî ev, di Lozanê de weke Îsmet Înönü gotî, gelê Kurd û Tirk, li Tirkiyê du unsurên bingehîne. Piştî Demîrel çû ser hikûmetê şûnde danasîna realîteya Kurd a rave kirin, lê heya niha nehatiye cî. Li gorî min parlamentoya Tirk bi hesap xwestineke 500 rojî re, lewra teorîka wê jî girtina ber çav, wê li ser nîqaş bike. Ev pêvajoya hatiye destpêkirin jidil destek dikin. Dizanin risteke mezin ya çapemeniyê heye. Destxweşiya we hemûyan dikim.

**Abdulah Ocalan**: Niha em bi awayeke kin li benda pirsên we ne, dixwazin ji kî pirs bipirsin dikarin bipirsin.

(*Ji bo pirs ji dengê qeyt dûrbûn nehatin famkirin. Ji ber wê pirsan derbaz dikin tenê bersivan diweşînin*).

– **Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Dîrokeke diyar nîne. Kêm-zêde mercên aşitiyê bi awayeke diyarker hatiye danin. Heke van mercan pêk bênin wê demeke din dirêj bike. Yan na heke ev pêvajo bê paşguhkirin, yanî xirab bê bikaranîn, gelek şêweyên ne asayî yên weke komkujî, her cûre operasyon û girtinên ku raya giştî, heta gelek derdorên hikûmetê jî ne li bendê ne bên pêşxistin, loma wê ev kar betal bibe, pêvajo wateya xwe winda bike û em ê jî pêvajoya têkoşîna xwe ya asayî hîn berfirehtir pêşbixin, heta bi lêhûrbûnek hîn kurtir ve berdewam bikin. Bi vê vesîleyê vê diyar bikim: Gerîlayên me gelek amadekarî kirine. Hêjmareke nêzî 10 hezarî gerîla weke fedaî ji bo hemû peywiran amade ne. Beriya bêm ev civîna çapemeniyê ez bi hemû biryargehan re axivîm bi awayeke giştî hemû li benda emrin. Heke aşitî dixwazin di vê çarçovê de, şer dixwaze dîsa wê di vê çarçovê de pêşbikeve. Bi temamî li gorî pêvajoyê diçin, dixwazim vê diyar bikim. Û hemû jî di asta şer pêşbixin de ne. Heta asta me ya amadekariyê di asta

ku bikaribe bilancoya şerê sîh sale didin meşandin derxe holê de ye. Vê weke tehdîtek nabêjim. Nirxandinên weke PKK lewaz ketiye, wiha di Şerê Başûr yê dawî û operasyonan de hêzeke xwe girîng winda kiriye, ji bo wê agirbest qebûl kiriye bi mîsogerî ev nerastin. Cara yeke bi awayeke rêkûpêk amadekariyeke ji bo şer, di bihara îsal de biser ketin. Vê bi baldarî diyar dikim. Dixwazim raya giştî û hûn çapemenî jî baş bizanibin. Bi rastî jî heke ev şer hîn bê kurkirin, heke heya niha 5.000 kes çûbin, wê bîlancoya îsal ji 10.000 kêmtir nebe. Dixwazim ev jî bê zanîn. Agirbest, bi rastî jî dikare piştî salek din jî bê rojevê. Wê demê dê bideh hezar kes vale bimire. Em dixwazin pêşiya mirina van deh hezaran bigirin. Ji dêvla aşitiyeke piştê du salan bê, niha ev pêvajoya aşitiyê, bêyî ziyaneke bidin hev, dixwazin bêyî serî li tehdît û êrîşên dibê, "*em di warê leşkerî de pir xurtin*" bidin pêk bênin. Hemû niyeta me ya baş ji ber vê ye. Hêvîdarin hikûmet fam bike, raya giştî fam bike û herkes tişta dikeve ser milê wê bike.

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Ya yekem bawer dikim agirbest erênî derbaz bûye. Bi taybet raya Tirkî di serî de, gelê Kurd, hawirdorên hikûmeta navnetewî, hevirdorên cuda yên demokratîk, xwestin ev pêvajo bidome, fersend bê dayîn û yek jî ji bo çareseriyê merc hinek din destdayî bibe. Heta hikûmet jî di vê mijarê de neyekser jî be, sînyalên heke ev pêvajo hinek din bê domandin wê pêşkeftinên erênî çêbibe da. Me van bes û erênî dît. Li ser vê bingehê biryara dirêjkirina vê hat dayîn.

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Heke bê dîqatkirin bi xwe daxuyaniyên cur bi cur dan çapemeniyê. Serdana Birêz Mam Celal a Enqerê hebû. Li Enqerê di serî de Birêz Ozal, hemû endamên hikûmetê yên li pêş, serokê parlamentoyê, hemû serokên partiyên siyasî, dîsa hawirdorên berfireh yên karûbarên derve, heta bi hinek hawirdorên emniyet û leşkerî re hevdîtin çêkiriye. Me van hevdîtinan weke sînyaleke erênî nirxand. Bi taybet zêde naxwazim navaroka wê vekim. Ev hema hema bigiranî nûnerên Tirk yên siyasîne. Dixwazin îtimad pê bênin, yanî dixwazin bawer bikin ku ev gotin ne gotinên valene. Bêguman em ê vê hildin cidiyetê. Hinek hawirdorên hikûmet û rojnemevanan vexwandibûn, hinek raportaj kirine. Bi vê wesîleyê hinek daxwaz

û pêşniyazên xwe diyar kiribûn. Em nirx didin van jî. Û ji hêla me ve îşaretên hîn dişibin vê hene. Her wiha dibêjin niha têrkere.

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Gerîla ji bo armancên dîrokî yên netewî li çiya dimînin. Armancên wan yên dîrokî û siyasî di wesfike civakî û netewî de ye. Heta ev daxwaz tên cî, dîsa di vê mijarê de gavên cidî û merc bi awayeke bawermendî derbikevin holê, wê li wir bimînin. Gerîla parêzvanê disiplînêye û heta bêjî hêzek hatiye perwerdekirine. Tenê ne di şer de, heta di aşitiyê de jî hêzeke dizane xwe bi awayeke hîn bihêztir li ser lingan bigire. Yanî ji bo şer nebû gerîla jevnakeve û ji rê dernakeve. Berevajî wê perwerdeyên xwe, rêxistinbûnên xwe hîn pêşdetir bibin. Û wê li hember pêkanîna armancên siyasî miqate bin û bişopînin. Heke bênin cî wê ewleyî bigirin. Heke neyênin cî jî wê şerê xwe bidomînin.

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Na na, bi çi mûnasebetê! Yên li Bakurê Iraqê (Başûrê Kurdistanê) wê biçin Bakurê Kurdistanê. Rê heya dawî vebûye. Tenê ne venihêr, ew hêza meşandinê ne. Yanî hêzên meşandin û ewlehiyê ne.

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Gerîla ne li hûndire ku ji bo wan efû derkeve. Ew hêzên azadin. Rewşeke wan bên efûkirin nîne. Yek jî ew parazvanên saxlamkirina efûyê ne.

**– Pirs: ...**

**Celal Talabanî**: (Bi Îngilizî axivî)

**– Pirs: ...**

**Kemal Burkay**: Pirsgirêk ne pirsgirêka vegera min a tenê ye. Ez li ser partiyekê me. Yanî dema vegeriyam ez ê bikaribim bi serbestî polîtîka bikim? Wê partiya min bikaribe bi serbestî bixebite. Wisa bihesibînin ku, ez wêneçêkerekim. Ez ê vegerim Tirkiyê, lê ez ê nikarim wêne çêkim. Ev ne vegerek azade. Ez siyasetmedarim. Ji ber vê pêwîste ev qenal vebin. Heta ku ev qenal nevebin, wê vegera min tiştek îfade neke. Lê heta wê jî baş dibînim. Bi rastî jî divê hikûmet qenalên legal veke. Heke dixwaze em weke mirovên azad vegerin… Lê belê piştî sê meh din careke din bikevin girtîgehê yan jî neçar bimînim biçim derveyî welat, daxwazeke wisa bi serê xwe têr nake. Li hemberî

yê beramber di me û baweriya me de jî lewazbûnek heye, em derbazbûnê dizanin. Dizanin rêberên Tirk çawa bi bangawaziyên wisa (baş) re dane xapandin. Divê gavên cidî bên avêtin. Gotinên niyeteke baş tenê têr nake. Heke bi rastî jî niyeteke baş hebe, wê ev di pratîkê de bê peytandin, di qanûnan de bê peytandin. Tena bi serê xwe ne pirsgirêka Kemal Burkaye.

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan:** Wê xebatên siyasî bi awayeke xwezayî bidomin. Di vê navberê de vê jî diyar bikim; xebatên me yên yêkîtiyê pêşve diçe. Îhtîmaleke mezine di nêz de ji bo Bakurê Kurdistanê îlana eniyek çêbibe. Bi giranî rêxistin bi yêkîtiya îradeyeke siyasî, bi awayeke hevpar gihiştinê. Di mijara Meclîsa Netewî ya Kurdistanê de jî pêşniyar tên pêşxistin. Xebatên xwezayî tên meşandin. Dîsa partiya zagonî, mînak HEP xebatên xwe didomîne. Jixwe hemû şêweyên xebatên me yên siyasî, legal yan jî îlegal wê bibin û bimeşînin. Yên mercên wî yên legal hebe wê legal bike, yên mercên wî yên îlegal hebe wê îlegal bike. Yanî ji bo xebata me ya agirbestê ne astenge. Yek xususa tenê ku hûn ji vê agirbestê fam bikin ev e; em ne hêzeke êrîşêne. Bi taybet di salên derbazbûyî de êrîşên raya giştî jî xistî rewşeke tengav, me jî xistî rewşeke tengav wê pêk neyên. Heke ji bo armancan pêwîst bike em ê bikarin 40 sal din li çiyan bimînin. Lê bi lezgînî dibêjîn ku, gelek armancên me yên girîng yên siyasî hene. Em mafeke mafdar, heqeke hemû cîhan guncav dibîne, gelê Tirk jî pir guncav dîtî ji bo biratiyê dixwazin. Bi taybet pêwîste çapemenî vê baş fam bike. Biratiyek wisa bifikirin ku, yê yekî 300 radyo heye, yê din radyoke tenê jî nîne. Bi milyonan pirtûkên wan hene, yek pirtûkeke tenê yê birayê din nîne. Ev bira nikare di radyoyê de stranek tenê jî bêje. Hûn ji birayeke wisa bawer dikin? Wijdanê we vê çawa qebûl dike? Ji ber vê pêwîste bi ser de biçin. Ev daxwazên kêm û dilnizm pêwîste hikûmet beriya kêliyek bicî bêne. Heke pêk neyne hûn baş dizanin ku, yê bikeve rewşeke nebaş wê ew bi xwe bin. Yanî bila hinek mirovî nêz bibin. Pêwîste her kêlî nebêjin; “*hêza me heye, quweta me heye, hûn çi bikin em ê we bitepisînin*”.Dixwazin hinek li hember pêdiviyên biratiyê rêzdar bin. Ez bawerim ev xususên heya dawî vekirîne.

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Nebaşe. Wê di nêz de ragihînin. Hêvîdarin bi hev re radyoyan vekin. Dixwazin bi hev re bên vekirin.

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Bixwe, tenê li vir hatibûn ziyareta me. Heta vê jî gotin; di diyarkirina wê de astengî nîne. Hatiye gotin, "*ew îllegalin, gelo hûn bi hev re li ser masê rûnin wê tiştek bibe*?" Qasidek Tirk gotiye. Li gorî min bêwate ye. Yanî heke wê Kurd bi hev re nerûnin, wê ev ji bo wan bibe bêrêzî. Madem hikûmet dixwaze niyeta xwe ya baş bide nîşan, divê ji hatina Kurdan a gel hev kêfxweş bibin, li hember vê rêzdar bin. Bixwe ji me re protokol neanîne. Lê em weke hêza dost dibînin. Neguncave, yanî di navbera rêxistineke legal û rêxistineke îlleqal de protokol çênabe. Lê dostanî dibe. Hêjmareke mezin ji we jî bi me re dostin. Bi hev re wêne dikişînin, bi hev re di nava civînê de ne. Nebawerim aloziyek çêbibe.

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Vekim; min pirsa we fam kir. Birêz Îsmet Înonî meseleya cerdevanên gundan wisa dibêje. Dibêje ku, "*raperîna1991 ya li Başûrê Kurdistanê pêk hatî 'cehşan', yanî di wateyek de cerdevanên gundan serî kişand. Ketin nava raperîneke mezin. Gelo yên ku Tirkiye weke cerdevanan xwedî dike wê xeterî ava bike*?" Jixwe bi hêjmareke zêde re pêwendî heye. Pere û çekên didin wan jî hinek ji me re tên. Yanî ev hikûmet jî dizane. Rayedarên hikûmetê ji Birêz Celal Talabanî re gotibûn; "*agahiya me jî heye*". Belê, hatiye gotin ku "*7.000 ji PKK'êre dixebite*". Niha divê em van mirovan zêde tengav nekin. Dubare diyar dikim; ji bo wan me carekedin prosedûra efûkirinê daye destpêkirin. Di nava vê pêvajoya agirbestê de pêwîste ev jî bê nirxandin. Divê hikûmet jî cerdevaniya gundan hema rake û van neyne ser me. Heke herdu alî wisa hêsantî çêke, wê ev jî ji ev rewşa zehmet rizgar bibin. Bêguman ev di rewşeke pir tengav de ne û rê li ber rewşên pir trajîk vedikin. Yek jî bi rastî jî asayîş bi van re nayê girtin, berevajî pir xirab dibe. Rê ji şerên eşîran yanî nearamiya civakî re jî vedikin. Kûlfeteke pir zêde ya madiye û pereyê tê danîn vale diçe. Heke bi vî pere jinek anîbin li jina du, sê xerc dikin. Ev pêşxistina birînên civakîne. Ji bo dawî li van hemûyan bê, pêwîste hikûmet beriya kêliyek van rake. Weke min gotî, em jî wisa hêsantiyê çêdikin. Bawerim ev jî daxwazeke

lezgîne. Li gel rakirina rewşa awarte, bawerim dê ew jî bên rakirin, niyaza me ev e.

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Bêguman. Yanî rewşeke wan pir xirab heye. Pereyê ku ev ji dewletê digirin diyare wisa bikar tînin.

**– Pirs: ...**

**Celal Talabanî**: (Erebî bersivand)

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Heke eniya Bakurê Kurdistanê teşekûl bibe, nebawerim lihevnekirinek weke Başûrê Kurdistanê bijîn. Çi netewî, çi jî di daxwazên demokratîk de şibandineke mezin heye. Heke di derbazbûyî de gavên mîna vê hatine avêtin negihiştibe serkeftinê, hinek sedemên vê hene. Mercên objektîf zêde ne ferzker bû. Dîsa di asta subjektîf de kêmanî û şaşî di asta jor de bû. Lê piştî evqas pêşkeftinên mezin şûnde asta ku gihiştinê, êdî di derbarê meşandina yêkîtiyeke wisa de sedemên pir bihêz derdikeve holê. Herkes van mijaran bi awayeke vekirî destnîşan dikin. Weke xususeke ku ji ber xwe ve hatiye pêkanîne. Me tenê îmzaya xwe li binê vê danî. Bi hêvî me ku di nêz de pêk were. Hewldan didomin. Dema tên ser têkiliyên bi eniya Başûrê Kurdistanî re, wê dostanî pêşbikeve. Em dixwazin bi wan re di asta kongreyek netewî de pêşniyareke yêkîtiyê pêş bixin. Yanî di çapa hemû Kurdistanê de, îfadeya yêkîtiyê ya fermî-qanûnî bibe flatforma kongreya netewî. Di vê mijarê de hevdîtin hene, pêşniyar tên pêşxistin. Weke gava duwem ev tê hizirîn. Gava yekem Bakurê Kurdistanê ye, gava duwem Başûrê Kurdistan yan jî parçeyên din yên Kurdistanê ne. Hêvîdarim ew jî di nava demeke kin de pêşve biçe û bikeve riya serkeftinê.

**–Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Ne xwestek, xwest hinek pêşîkî bide vê. Lê fam bû ku ev ne meseleyeke di serî de bê destgirtine, hevalên binirx yên em bi wan re rûniştine jî îfade kirin. Ev ancex di dawiya pêvajoyê de dibe. Meseleyeke wisa dibe bê nîqaşkirin. Yanî her tim dibêjim; gerîla ji bo armancên siyasî, hêza azadiyê ya li wir tê dîtine. Armancên siyasî tên cî neyên cî, wê gerîla xwe li gorî mercên aşitiyê ji nû de vesaz bike. Ji destpêkê ve sepandina daxwazeke wisa ya hikûmetê, kar tengav kiriye. Ev ne meseleyek ji destpêkê ve bê destgirtine, bi pêşveçûneke baş a pêvajoyê re

dikarî bê rojevê. Şertê wê, daxwazên siyasî ketina meriyetê ye. Ev daxwazên siyasî daxwazên asgarîne. Bi cî tên bi cî nayên dibe ji nû de dest bi vesazbûna gerîla bê kirin yan jî nîqaşek pêş bikeve.

**– Pirs: ...**

**Kemal Burkay**: Em, ji hêla tevgerên rizgariya netewî ve, çek guneh nahesibînin. Mileteke di bin zilm û zextê de dikare çek bikar bîne. Cudahiya di nerînên me de, ne dema bikaranîna çekê bû. Lê dibe nerînên rêxistinên din cuda be. Her wiha hatina me ya gel hev tenê bi wê mijarê re sînordar nîne. Agirbest bibe yan jî nebe, beriya wê me dixwest têkiliyên xwe bi rêxistinên din û di serî de jî bi PKK'ê re baş bikin. Bangawaziyên me hebûn. Dema ji wan jî bersiv erênî hat, bi vî rengî astengiya di navberê de rabû.

Em di kîjan xalan de li hev bikin, em ê di wan xalan de li hev bikin û bi hev re bimeşin. Îro jî dixwazin ev fersenda aşitiyê baş bikar bênin. Yanî wisa ku carekedin şer çênebe. Bila ev pirsgirêk çareser bibe. Em vê birastî jî dixwazin. Lê heke aliyê Tirk bersiva van daxwazên kêm nede, ev tê wateya ku, wê şer bidome. Ev tê wateya ku, şer nasekine. Ev tê wateya ez ê vê "*pirsgirêkê tenê bi hêza polîs-artêşê çareser bikim*". Di rewşek wisa de em jî nikarin polîtîkaya berê bidomînin. Min vê çend caran got. Em nikarin polîtîkaya aşityane ya 18 sale dimeşînin bidomînin. Ji ber wê dibêjin bila ev fersend ji dest neçe. Tişteke ji vê zêdetir bikin nîne.

**– Pirs: ...**

**Ahmet Tirk**: Pirsgirêk ev e: Li wir pirsgirêkeke Kurd heye. Daxwaza gelê Kurd min jî eleqedar dike... Partiyeke siyasî ya di zemîneke legal de polîtîka dike, wê têkoşîna afirandina navendeke legal a demokratîk bide. Ji ber vê îro pêşkeftinên erênî hene. Weke Partiya Gel a Kedê, alîkarî ji van xebatên erênî re dayîn, ferasetên aşitiyane derxistina pêş û wê xebatên me yên divê mijarê de hesasiyeta xwe deyne holê çêbibe û di vê zemînê de ked raber bikin.

**– Pirs: ...**

**Abdulah Ocalan**: Jixwe Birêz Mam Celal dibêje. "*Niha mercên agirbestê heye; dikarin xebatên siyasî bi awayeke serbest bikin*". Li Başûr û Bakur jî. Ti rewşeke li pêşiya wan bibe asteng nîne. Ev dîtin raste. Bi rastî jî giranî ji meşandina têkoşîna siyasî re tê dayîn. Dema agirbestê ye. Bi vê vesîleyê, em 2.000 mirov li

Başûr heta hetayê nagirin. Hêjmareke zêde jinin. Vê jî diyar bikim; nêzî 600 jin hene. Wê ew li wir çi bikin? Bêguman wê biçin nav mercên welat. Ew wê ji bo xebatên siyasî biçin. Pêvajo destpê kiriye. Wê bi riyên guncav biçin. Yanî ne bi riya korîdor vekirinê, riyên çiya hene. Ev bi ser riya Îranê re jî dibe, wê ji wir bikevinê. Têkiliyên vê bi Mam Celal re jî nîne. Şîrovekirina hikûmetê ya vê jî li gorî min bê wateye. Gelek riyên me yên çiya hene, riya me ya leşkerî heye.

**– Pirs: ...**

**Kemal Burkay**: Dixwazin bi hêvî bin. Dixwazin xweşbîniya xwe biparêzin.

**Abdulah Ocalan:** Raste, tevlî dibim.

**Kemal Burkay**: Hinek jî girêdayî vê ye, yanî hinek jî girêdayî helwesta rewşenbîrên li Tirkiyê, hêzên xwedî aqilê selîm, siyasetvanên berpirsyar, hûnermed û herkes.

**Celal Talabanî: ...**

**Abdulah Ocalan**: Mam Celal ev dibêje: “*Bi hevî bin ji bo karên bixêr, wê ev bixêr bicî bên*”. Ev, hadîsa pêxemberane. Tevlî dibin.

Heke pirsên we cudatir nebe, careke din li ser navê hemû hevalan destxweşiya we hemûyan dikim.

Min hinek we tengav kir. Di wê baweriyê de me ku hûn jî bi berpirsyartiyeke diyar ve hatine. Ev me kêfxweş kiriye, sîpas dikin.



*"Xala ku pêwîste bê fêmkirin, ger aliyê beramber mercên vê agirbestê pêk neyîne, nexasim li hember gerîla û gel operasyonan pêş bixe, weke berê zext, îmha û îşkenceyê berdewam bike, wê demê em ê jî hîn zêdetir bi amadekarî ji ya berê hîn berfirehtir bersivê bidin."*

*"PKK ne tenê tevgera neteweke ye,*
*her ku diçe dibe nûnerek hîmdar ê gelên Rojhilata Navîn,*
*gelên cîhanê ye û nirxek mirovî ye*
*ku her kes pê şanaz be."*

*Axaftinên têlsizê yên di 16 Nîsana 1993'an de bi Fermandarên ARGK'ê re hatî kirin:*

**JI DERVEYÎ SERKEFTINÊ TI RÊYEK DIN LI HEMBER DÎROKÊ NEKARE ME BIDE EFÛKIRIN**

Bi kinahî ji we hemûyan pêşkeftinên dawî bigirin. Em ê encama çapemeniyê bi awayeke kurt bidin. Piştre wê bi awayeke berfireh ji we re bê ragihandin. Belê, destpêkê pêşkeftinên dawî gudar bikin û xususên bixwazin ragihînin hewl bidin ragihînin. Derya Andok, destpêkê li we gudar bikin. Rewşa dawî çiye?

**Derya Andok**: Dembaş, silav û rêz Rêberê min. Rewşa dawî, hevalên cepheyî di gundek de anîn qomployê û du heval şehîd bûn. Ev bêçek bûn. Nîvro dema di malekê de ne tên dorpêçkirin. Û xanî tê bombebarankirin, wisa şehîd dibin. Ev hevalên C. û Y. bûn. Ev bûyer heye. Yek jî li Başûr hinek bombebaran çêbû. Lê me hîn agahî negirtiye. Dema me girt em ê encamên wan ragihînin.

---.: Ev ê li Gençê kiye? We got cepheyî ye.

**Derya Andok**: Belê, du hevalên cepheyî bûn.

---.: Li gund çi digerin? Ew li gund dixebitin? Gundîne, yan jî milîsin?

**Derya Andok**: Hevalin. Diçin gundekê, wê li wir karê xwe xilas kiriban çûban yêkîneyên xwe. Di wê navberê de dijmin

agahî girtiye. Îxbar hatiye kirin. Yanî rewşeke anîna komployê heye.

---.: Ew tiştên li Gençê bûyîn hûn her tim dibêjin bûyerên wisa yên komployê çêdibin. Lê dîsa bi heman awayî dikevin malan. Cepheyî jî be nikare wisa biçe li malan bimîne. Bi vî rengî ev windahiyên çendemîne? Rêbazên komplogeriyê diyarin. Heke ev neçin li wan malan nemînin weke bimirin. Heke vê pir zêde dikin, divê li pêşiya wê bigirin. Yek jî ev komploger kî bin, bi heman şêwayî wê bersiva wan bê dayîn. Hîn jî ev nêzîkatiyên keyfî nekêmin, di xebatên we de ev derdikeve. Yanî pir jê kêfxweş dibin. Wê li pêşiya van bê girtin û ji wan re bê gotin ku, "*ger dixwazî bixebitî, weke zilaman bixebite*". Bawerim ji bo navend jî hinek sist bû, yên ku bikevin nava wan rewşan wê pir çêbibe. Lewra ev bi temamî şaşe. Gelek hîn ne di ferqa rastiya têkoşînê de ne. Evên ku yêk-du dixebitin bi hovane tên qetilkirin û wê vê hîn zêdetir bikin. Li ser hev ji wan xebatkaran re jî bêjin. Ji derveyî vê pêşkeftineke cuda heye?

**Derya Andok**: Rêberê min, pêşkeftineke din girîng nîne. Xebatên me didomin. Tevlîbûn jî zêde ye.

---.: Her ku diçe tevlîbûn zêdetir didomin...

**Derya Andok**: Belê, di rojê de hema nêzî komînek tevlîbûn çêdibe.

"*Pêwîste ev hemleya siyasî baş bê meşandin*".

---.: Pêwîstî bi diyarkirinê nake, evên tên bi perwerdeyeke baş û quralan amadekirin girînge. Lê wê gelek zilamên kêfî jî derkevin. Derfeta serdeçûnê bi awayeke hîn berfirehtir heye. Yek jî pêvajoyê hinek kamil dikin. Bila kes vê pêvajoyê xirap nenirxîne, nekevin provakasyonan. Navend ji ya tê texmînkirin zêdetir guncave ji bo siyasîbûnê. Vê zêde dirêj nekin, tiştên tên zaninin. Ji derveyî vê, bawerim xebatên we yên beriya niha hatine gotin pêşve diçe. Wê xebat di derbarê Başûr û Bakur de pêşbikeve. Bi pêvajoya nû re erkên girîng dikevin ser qada we. Nizanin, wê peytandina wê çawa pêşbikeve. Bi taybet ev pêngava siyasî divê hinek baş bê meşandin. Ew cînayet hebûn; divê ew jî bên çareserkirin û bawerim wê zêde pêşnekevin. Ya herî girîng jî, ev pêvajoya agirbest jê re tê gotin, dikare ji bo gelek nokeran bigire gel xwe bê bikaranîn. Yek jî bawerim di wê herêmê de ji niha şûnde ev bên rewşeke hîn meyldar. Ew qadên negihiştinê ji

niha şûnde bi hêsanî bigihinê. Ev xususên giştî yên tên zanînin. Xususeke ku hûn bidin diyarkirin heye? Çi di derbarê deryayên din de çi jî di derbarê pêşkeftinan de, tişteke diyar bikin heye? Lewra em ê daxuyaniya çapemeniyê bidin.

**Derya Andok**: Na, Rêberê min. Çend tişt hatiye gotin. Tişteke din ku diyar bikin nîne.

---.: Çiyayê Sipan, hûn çawanin? Rewşeke nû heye?

**Çiyayê Sipan**: Silav û rêz Rêberê min. Deng fam dibe?

---.: Dengê we baş, zelal tê. Keremkin li we gudarî dikin. Rewşeke nû heye?

**Çiyayê Sipan:** Li gel me rewşeke nû nîne. Me bi hêzên herêmê re civîn çêkir; me talîmatên dawî yên Rêbertiyê ragihand û dîsa nirxandinên di derbarê agirbestê de nîqaş kir. Me di derbarê gelik qadan de peywirdarkirin û şêwazê xebatê diyar kir. Di qadê de keşfên dijmin hene. Ji derveyî vê ti rewşeke din nîne. Bi kinahî van diyar dikim.

---.: Dibêjin operasyon nîne. Tevlîbûn pêşdikeve?

**Çiyayê Sîpan**: Tevlîbûn destpêkiriye. Her ku biçe jî wê bidome.

---.: Başe. Ez ê daxuyaniyê giştî bidim, hûn ê gudar bikin. We bi Zaxrosê re pêwendî danî û pêwîstiyên wan diyar kir. Bawerim bikari bin ji niha şûnde bi hêsanî bigihin hev. Merc niha li wir pir destdayî ye. Meseleya cerdevanek hebû. Em ê niha ji bo cerdevanan daxuyaniyek bidin. Bawerim wê encameke baş bide. Cuda tişteke din diyar bikin heye?

**Çiyayê Sîpan**: Rêberê min niha rewşeke diyar bêjin nîne. Em ê bi Zaxrosê re hewl bidin bi ser wê qadê re bigihin hev. Wê dem bi dem têkilî û temasên me bidomin.

---.: Yek jî, tiştên me di derbarê Sêrt û Batmanê de gotin hene. Divê hevsengiyek ava bibe. Wexta tecrûbeyên heyî digirin berçav, wê ji niha şûnde sazbariyek li şêwazê xebata wir jî bê barkirin. Weke di salên derbazbûyî de bûyî, wir xirab bikaranin rê li ber windahiyên zêde vedike. Bawerim hûnê bikaribin ji niha şûnde şêwazek li gorî mercên wir guncav pêşbixin. Heman tişt ji bo yên li deştê jî, dîsa ji bo peravên Wanê jî derbazdare. Ji bo wir nêzîkatiyên xweser pêwîst dike. Weke hatî qalkirin, di bin navê xebata cephe de carna rê liber ketina rewşên pir nebaş vedibe. Bêguman potansiyeleke wir girîng heye û kişandina wê

potansiyelê mumkûne. Bawerim wê ji niha şûnde lez qezenc bike. Hûn dikarin ji kesîmên wir yên ciwan jî zêde bigirin. Çêbû, hûn jî hewl bidin vehesin.

Zaxros, deng tê we?

**Derya Zaxros**: Belê Rêberê min, deng tê, gudar dikin.

---.: Rewşa we ya dawî çawa ye? Tişteke diyar bikin heye?

**Derya Zaxros**: Li vir tiştek girîng nîne… Xebatên me yên asayî didomin.

---.: Rewşa operasyonan çawa ye?

**Derya Zaxros:** Rewşek nîne. Bawerim ji bo keşfê hinek teyara digerin. Rewşeke din nû nîne.

---.: Derya Şîn, hûn çawa ne?

**Derya Şîn**: Silav û rêz Rêberê min. Rewşa me jî başe...

---.: Min fam nekir. Hûn dibêjin hevalek şehîd bûye? Ew rewş çibû?

**Derya Şîn:** Na Rêberê min,… birîndar bû.

---.: Hûn dizanin li wir pir mayîn hene. Hûn dikarin bi Başûr re pêwendî deynin? Di meseleya hêz girtinê de dibe zehmetî bikişîne?

**Derya Şîn**: Rêberê min fam bû.

---.: Bêyî hûn ji Başûr hêz bigirin qenalên we çawa ye?

**Derya Şîn**: Rêberê min, beriya niha hinek hevalên we jî hêjmartî hatibûn. Di wê derbarê de hinek xebatên me pêşket.

---.: Me got, divê hêza li wir a zêde biçin hûndir. Niha em ê hevalê Ha. jî pêşniyar bikin. Ha. ew pir li wir man. Li gorî me, bi hêzeke mezin ve çûna wê ya Serhed yan jî Xarzanê wê guncav be. Yanî ji bo parvekirina ew ezmûn û tecrûbe wê hîn guncavtir bibe. Hûn ji vê pêşniyarê re çi dibêjin?

**Derya Şîn:** Rêberê min, ji hêla me ve wê nebe pirsgirêk. Guncave.

---.: Hûn dibêjin guncave?

**Derya Şîn**: Belê Rêberê min, wê zêde pirsgirêk çênebe.

---.: Dîsa bawerim hevalê A. ji bo temsîliya meyla şoreşger û di nava têkiliyek nêz de mayîn ji bo Başûr bê nirxandin wê baş be. Jixwe ji bo têkiliyên Bakur hêjmarek eleman di destê we de heye. Dîsa ji bo cihê hevalê Ha. gelek hevalên li wir peywir bigirin hene. Jixwe bawerim wê bi hev re lêhûr bibin. Dîsa weke min gotî, êdî pirsgirêkên kesayetê nîne, wê ew bên derbazkirin.

Hûn dikarin vesazbûneke wisa pêşbixin. Di derbarê vê mijarê de tişteke din diyar bikin heye?

**Derya Şîn:** Na Rêberê min, tişteke diyar bikin nîne.

---.: Derya Sor, rewşa we çawa ye?

**Derya Sor:** Silav û rêz Rêberê min. Li ser pêşkeftinên dawî bi avaniya hevalan re civîn tên lidarxistin. Lê rewşeke nû nîne.

---.: Ha. hûn e...

**Derya Sor**: Raste Rêberê min.

---.: Hûn dizanin rewşa Başûr zêde bi fonksiyon nîne. Yanî em hinek giranî didin karê derbazkirina hûndir. Bawerim di nêz de wê ji 44 hêzek bê gel we. Ji van û ji yên li gel xwe hêzek bi qasî yêkîneyek (ev hinek bi nîqaşkirinê re dikarin bên diyarkirin) bigirin, ber bi Serhet yan jî Xerzanê ve çûyîn li gorî me wê guncav be. Hêza bê girtin, pêwîste di asta bikarin li hûndir hinek kar pêşbixin de be. Dibe hema niha nekeve tevgerê, lê dema merc destdayî bû tevgerek wisa baş dibe. Yanî li wir girtina hêzek zêde guncav nabînin. Hûn ji vê pêşniyarê re çi dibêjin? Fam bû?

**Derya Sor**: Fam bû Rêberê min. Li gor me jî tiştek wisa guncave.

---.: Lê di navbera herdu deran de nikarim hilbijartinek bikim. Bi taybet di derbarê bihêzkirina kordînê de pêwîstiya herdu deveran jî heye. Hûn hinek nîqaş bikin, em ê jî hinek baxivin. Di nava çend hefteyên pêşiya me de amadekariyek wisa bi awayeke bi ostayî pêşxistin pêkane. Hûn dikarin hilbijartina hêza biçe herdu qadan bikin. Ji bo wan deran hêza baş heye. Bawerim wê pir berhemdar bibin. Dikarim van bêjim. Hûn dibêjin li gel me rewşeke nû nîne.

**Derya Sor**: Na Rêberê min, rewşek nû nîne.

---.: Hûn ji bo A. çi dibêjin? Hevalê A... tiştek diyar dike?

**Derya Sor**: Na Rêberê min, ...

---.: Dibe. Dikarin hevalek ji Bakur bidin gel wî. Bi hevaleke ku bikarin bi hev re di nava agengekê de bi awayeke kolektif tevbigerin tevlî nava xebatên Başûr bibin. Bi awayeke bîrimeke ku hinek ji polîtîkayê fam dike, ji nêz ve Başûr nasdike bê avakirin û ev xebat dikare di bin venêrîna Derya Şîn de hinekdin bê pêşxistin. Dibêjin guncave.

44,dengê me tê?

**44:** Rêberê min deng lewaze, fam nabe.

---.: Li gel we çi heye çi nîne? Li we gudarî bikin.

**44:** Deng zêde fam nabe. Li gel me rewşek cuda nîne.

---.: Em çûyîna H. ya ji bo koordînatoriya Xerzanê hinek guncav dibînin. Ji wir ji bo çûna Xerzanê herî kêm bi qasî hêza di asta yêkîneyekê de tevgerbûna wî guncav dibînin. Hûn çi dibêjin?

**44: ...**

---.: Başe. Hêzeke bikaribe alîkarî bide wir başe. Wê di hefteyên pêşiya me de ev amadekarî bên pêşxistin. Li gel vê, heke ji bo Derya Şîn pêwîst bike wê ew jî bên amadekirin. Lê nebawerim valetiyek çêbibe. Jixwe tişta pêwîst be ku bê kirin hûn ê bikin. Tiştek din cuda heye, di derbarê rewşa hêzên Başûr de tişteke nû heye?

**44:** Ev hinek pirsgirêk derdixin. Bi taybet di sînorê PDK'ê de hinek pirsgirêk derdikevin… tên dixwazin hevdîtin çêkin. Di vê navbarê de ev hikûmet jî digere. Em di vê demê de çûyînê zêde guncav nabînin. Yanî hinek… heye. Dikarim vê diyar bikim.

---.: Dema dibêjî "heval"qala we dike?

**44:** Belê belê.

---.: Wê bê gotin di asta jor de hevdîtin çêdibin, bi Rêbertî re hevdîtin çêdibin. Lewra bi pêşkeftinên siyasî yên heyî re rewş ji destê wan derdikeve. Bawerim hinek ketin pîlana duwem. Ji ber wê ew daxwazên wan heye, dibe ji bo wê bên. Hûn ê bêjin; "*di vê qonaxê de karên me pir zêde ne. Jixwe heval bi Mam re dimeşînin. Di vê mijarê de fonksiyonek min ku bilîzim nemaye. Min rola xwe lîst*". Li gel vê, hûnê bêjin; "*nûnerên me li wirin, jixwe daxuyanî tên dayîn; em dostin, bi hev re baş derbaz bikin*". Dibe tengaviyên wan zêde bike. Ji ber di aliyê Tirkiyê de zêde qîmeta wan namîne. Yanî dibe hinek jî ji ber vê be. Ev tengaviyên ku PDK bide çêkirin jî zêde wateya xwe nîne. Yanî rewşeke wan me bêxin tengaviyê nîne. Lê dibe hewldanên komplo, heta bide ku serî li tundiyê bidin. Pêwîste di vê mijarê de şiyarî hebe. Ew karê duwem wê kengê destpê bike? Hemû amedekarî temamin?

**44**: Kîjan xebat?

---.: Xebata kongreya jinê.

**44:**Amadekariyên me yên li vir tên domandin.

---.: Me hemû tiştên ku bêjîn gotiye. Di vê mijarê de çawaniya pêkhateyê, raporên hatine amadekirin û belge pêwîste hema bigihin me. Êdî bawerim wê bimîne piştî kongrê. Yek jî

divê belgeyên we jî gihiştiba me, yanî pêwîst bû encamên konferansa we lidar xistî gihiştiba me. Ew hinek dereng dimînin. Bawerim hûn ew qurye bikar nayînin. Hinek astengî hene. Dixwazin ji vir jî dostan bişînin, qebûl nakin, hinek dereng têxin. Bawerim bi hevdîtinên vir ve girêdayî ye. Lê dibêjim wê bimeşin. Bi kinahî, divê pergala quryetiyê pêşbikeve. Dikare hinek hêz ji Rojhilat re jî bê dayîn, heval dikarin li Rojhilat têkiliyan hîn zêdetir pêş bixin. Tenê bi wan ve girêdayî mayîn dibe neguncav be. Weke min gotî, divê ev qenal vekirî bên hiştin, qenalên herdu aliyan jî vekirî bên hiştin. Çûyîna sînor jî pêwîste bi qenalên guncav re çêbibe. Ev hêza we gotî hûnê hêdî hêdî derxin, ew hêz dikeve tevgerê. Hêza din jî wê piştî kongreya jinê. Jixwe wê rapor ji me re bê, heya rapor bên pêwîst nake hûn wê hêzê belav bikin. Dema encamên kongrê gihişt me, em ê hewl bidin di derbarê erkdarkirina wan de helwestek raber bikin. Fam bû 44.

**44**: Belê, baş fam bû.

---.: Çiyayê Sor, hûn çawanin?

**Çiyayê Sor**: Silav û rêz Rêberê min.

---.: Rewşeke nû heye?

**Çiyayê Sor ....**

---.: Di van pevçûnan de windahiyeke me heye?

**Çiyayê Sor**: Na Rêberê min, ti windahiyeke me nîne.

---.: Heke pêkan be ji bo van qenalan kesek bişînin bajarê mezin. Hinek bajarên bingehîn hene; di vê çarçovê de pergaleke quryeyê derxin. Pergala quryayê dikare ji niha şûnde di nava vê arasteyê de bixebite. Heke hinek bi aqilane û tedbîr bibin, wê pêwîstiyên we di asteke girîng de derbaz bibe. Bawerim wê operasyon jî wisa bi bandor çênebe û divê hinek jî kêm bibe. Yanî ji bo we ji niha şûnde navendeke pir destdayî heye. Lê mecal nedin van şêwazên jiyana erzan a ku xwe dispêre gund. Divê em jibîr nekin ku ev her tim pir aloze û wê bikaribe rê li ber windahiyan veke. Yanî destgînan ji dest neberdin. Hûn di qonaxeke encam bigirin de ne. Wê hemû pêwîstiyên we bicî bê û beşdarbûnên we zêde bibin. Hûn jî li me gudar bikin. Cuda tişteke diyar bikin heye?

**Çiyayê Sor**: ...

---.: Başe. Derya Serhad, li gel we pêşkeftineke nû heye? Ew operasyona dawî çibû?

**Derya Serhad**: Silav û rêz Rêberê min. Bombebaranên hewayî hene. Operasyona hewayî heye...

---.: Di vê operasyonê de windahiyeke we çêbû?

**Derya Serhad**: Na Rêberê min...

---.: Başe ev rewşa li Tendûrekê diqewîme dibe ku çibe?

**Derya Serhad**: Di derbarê rewşa Tendûrekê de me agahiyeke mîsoger negirt.

---.: Îro jî dewam kir?

**Derya Serhad**: Belê, pir zêde didome.

---.: Operasyonên bejayî jî hene?

**Derya Serhad**: Em nizanin li Tendûrekê operasyona bejayî heyeyan ne. Lê ya hewayî heye.

---.: Yanî li beramberî we pêşdikeve?

**Derya Serhad**: Belê, raste.

---.: Ev bingeha xwe ji bicîbûna Artêşa 3. a sînor digire?

**Derya Serhad**: Him ewe, him jî li beramberî me ye.

---.: Hûn ê bikevin rewşeke cidî, yanî wê rewş cidî bibe? Rewşa we ya xweparastinê çawa ye?

**Derya Serhad**: Rewşa li gel me erêniye. Lê niha agahiya me ji hevalên Tendûrêkê nîne.

---.: Li gorî texmîna we wê windahiyeke cidî hebe?

**Derya Serhad: ...**

---.: Tevgera pêwîst wê pêk were. Heke pêwîst bike dikarin Rojhilat biceribînin. Ger pir tengav bibin, dibe. Wiha bi awayeke pir baldar. Li gor texmîna min, tengaviya we ya amûretê nîne. Di demeke nêz de wê li Rojhilat heval bi we re bikevin nava pêwendiyê. Bawerim li gel we jî tevlîbûn pir baş didome. Hûn ê hewl bidin tevlîbûnên li Herêma 3. bigirin. Fam bû?

**Derya Serhad**: Fambû Rêberê min. Bawerim em ê wan di nava yek-du rojan de bigirin.

---.: Jixwe pêwendiyên we bi bajaran re heye.

**Derya Serhad**: Belê Rêberê min, heye.

---.: Başe. Rewşeke cuda heye?

**Derya Serhad**: Na Rêberê min. Hevalên li vir li ser talîmata dawî nîqaş dikin.

---.: Başe.

Navîn Derya, deng tê?

**Navîn Derya...**

---.: Derya Kesk, hûn çawanin?

**Derya Kesk:** Silav û rêz Rêberê min.

---.: Li gel we pêşkeftineke nû heye?

**Derya Kesk:** Na Rêberê min, pêşkeftineke girîng nîne. Dijmin hinek operasyonên hevayî pêk tîne...

---.: Ev qetilkirina welatparêzan dibe girêdayî çibe?

**Derya Kesk: ...**

---.: Dibe ev çavkaniya xwe ji Hizbulahê bigire?

**Derya Kesk:** Raste Rêberê min...

---.: Vê dîqat bikin. Pêwîste ev çênebin, şiyar bikin. Hûn ê bêjin, "*ger nesekinin, em ê jî bi ser we de bên*". Yanî heke bi zanebûn bimeşînin, dibe dem bi dem li hember wan bersiv bê dayîn. Pêwîste destûr ji cînayetên yek alî re neyê dayîn. Dibe operasyonên li wir hinek rawestin. Heta yên li ser gel jî. Divê hinek bi baldarî bê çavnêrîkirin. Li wir pir ziyan dan gel. Bi taybet ev rewşa li ser gel dana derbazkirin pir girînge. Pir hewl hat dayîn ku gel li wir bitermisînin. Bawerim ji niha şûnde wê ev hewaya şerê psîkolojîk hinek belav bibe. Lê dixwazin bi provakasyonan vê qut bikin. Ev pêvajoyeke divê pir bi baldarî bê nirxandine. We ji GAP'ê agahiyek girt?

**Derya Kesk:** Me ji GAP'ê agahî girt...

---.: Fam bû.

Derya Zelal, tiştekî dibên?

**Derya Zelal**: Silav û hûrmet Rêberê min. Tiştek em bêjin nîne.

---.: Tişteke nû nîne?

**Derya Zelal**: Na Rêberê min, tişteke nû nîne.

---.: Hûn nikarin ji aliyê Perwarî ve bi Xerzanê re bibin yek?

**Derya Zelal**: Dibe Rêberê min.

---.: Li ser vê baş rawestin. Xwe bikin yek. Bi Çiyayê Sipan re baxivin û li ser rawestin. Divê bibin yek û pêwendiyên we yên rojane hebin.

**Derya Zelal**: Başe Rêberê min.

---.: Derya Dîcle, hûn çawa ne?

**Derya Dîcle**: Silav û rêz Rêberê min.

---.: Tişteke nû heye?

**Derya Dîcle**: Na Rêberê min, tiştek nîne.

---.: Pêwîst bû ji bo we komek hatibûya. Ji bo hinek zehmetî hene nikarin bên. Hûn jî bi her çar aliyan re pêwendiyên xwe dênin. Lê lîstîkên PDK'ê dîqat bikin. Her tim û li her deverê şiyar bin. Wê li gel we jî pêşkeftinên nû çêbibin. Wê di ev pirsgirêka bazirganî, îrtîbat û cerdevanan de pêşkeftinên pir nû çêbibin. Ji ber wê pêwîste hûn bi temamî li ser serweriyê çêkin. Di pêwendiyên bi gel re (bi girseya bajêr re jî) dibe pêşkeftinên balkêş çêbin. Di van mijaran de newin xapandin. Her tim şiyar bin û hinek encamên bihêz bigirin. Wê bi ser pirsgirêka cerdevanan de çûyîn çêbibe. Wê ew pirsgirêk jî hinek çareser bibe. Her wiha hûnê pirsgirêka Qilabanê ji ya berê baştir çareser bikin. Bila hemû îrtîbat di destê we de be, ji gelek hêlan ve pêwendiyan pêş bixin. Yanî bila serwerî bi temamî û heya dawî di destê we de be. Heke pere pêwîst be bigirin. We girt Derya Dîcle?

**Derya Dîcle**: Fambû Rêberê min. Tiştên we diyar kirine dîqat bikin.

---.: Deryayeke din ku li me gudar dike heye? Deryaya Navîn, hûn deng digirin?

**Derya Navîn:** Deng tê Rêberê min.

---.: Niha em ê ji hemû Deryayan re peyama xwe ya hevbeş pêşkêş bikin. Hewl bidin bigirin.

"*Girêdayî şartên me diyar kirine, em ê pêvajoya agirbestê bidomînin.*"

Careke din bangî hemû Deryayan dikim. Hevalên hêja, fermandar û şervan!

Beriya niha mehek, weke nîşandana niyeteke baş û dîsa encama bi xwe bawerbûnê me di derbarê agirbestê de ceribandinek kir. Ev ceribandin, di çapa netewî û navnetewî de pir deng veda, pir vekirî tê dîtin ku weke gava pêşkeftineke dîrokî tê nirxandin, piştgiriyeke mezin kom dike û însiyatîfeke mezin pêk aniye. Zemîna girseyê girtiye, qada dîplomatîk a navnatewî jî girtiye nava xwe. Dîsa bûye vesîle ku di asta netewî de ji bo yêkîtiya cepheyî gavên girîng bên avêtin. Bi kinahî ev pratîka mehekê derbaz dibe, weke pêngava herî girîng ya partiya me û şerê me yê rizgariya netewî di dîrokê de cihê xwe dîtiye. Xebatek ji her hêlê ve qezencên wê zêde û aliyê wê yê windahiya heta dawî kême. Îro di derbarê kurkirina vê pêvajoyê de em gaveke nû

û pêşkeftî tavêjin. Ez ê hewl bidim navaroka ev gava tê avêtin bidim. Hema diyar bikin ku, tiştên tên kirin ne xususên nayên zanîn û ne li bendê bûn. Di riya xeta me ya serkeftinê de bi kurkirina hewldaneke dewlemend a pratîkî re xistina meriyetê ye. Bi giştî pêşkeftinên xeta partiyê yên siyasî û leşkerî meşandine. Partiya me ji destpêkê ve têkoşîna siyasî leşkerî esas girtiye. Lê çi wexta ku hat xwestin hemû riyên pêşkeftinên siyasî bên qutkirin, hat xwestin ber bi pêvajoya îmhayê ve bibin, wiha wê demê me di pêşxistina bexwedaniya çekdarî de didiliyek tenê jî jiyan nekir. Û têkoşîna çekdarî ya kur dibe diyar kir ku wê rê li ber gihiştina encamên girîng veke.

Dema derbazî pêngava 1993'ê dibin, xeteke şoreşger ya ji her hêlê ve serkeftinê bidest dixe û aliyê wê yê şerê çekdarî heye. Di vê qonaxê de di encama bawerî bi xwe anîn, me ceribandineke agirbestê kir. Niha aliyê beramber, yê gelek bêmaf divê dawî li şerê xwe yê qirêj yê ku bi ti awayî nayê qebûlkirin bêne.

Pêwîste yêkîneyên xwe yên şerê taybet, qontra û ev operasyonên îmhayê bide rawestandin, dibêjin li gel van hemûyan qebûlkirina pêvajoya hinek daxwazên lezgîn û xistina wan ya meriyetê yan jî herî kêm di vê mijarê de bi raberkirina niyeteke baş re, ev agirbest dikare bê kûrkirin. Heke rewşa awarte, yêkîneyên şerê taybet yên dide meşandin, êrîşên cerdevanan, êrîşên tîmên taybet û hemû şêwayên operasyonên artêşê bide rawestandin û li gel van efûyek giştî, serbestiya hemû şêwayên xebatên siyasî, mirovên ji gundên wan hatine qutkirin li gel dayîna tazmînatek diyar carekedin li gundên xwe vegerîn, qedexeyên li ser çand û ziman rakin, azadiya çapemeniyê û daxwazên dişibin van yên nayên paşvexistin bixin rojevê, bi kinahî rêveberiya siyasî di şêwazeke demokratîk de li ser kargeriyê astengî çêneke, em jî girêdayî van şertan diyar dikin ku, pêvajoya agirbestê dirêj bikin.

Ev car dem diyar nakin. Xususa divê fam bibe, heke aliyê beramber rîayet bi van mercan nede û bi taybet operasyonên xwe yên li hember gerîla û gel pêşbixe, mîna berê îmha, zext û îşkence bimeşîne, wê demê em ê jî ji berê bi amadetir û bihêztir bersiv bidin. Yanî tenê ne xwe parastin, em ê bi êrîşê bersiv bidin wan. Dema vê jî nîne. Yanî heke ew di nava van sê rojan de êrîşên xwe wisa bidomînin, em ê jî di nava van sê rojan de, heta di nava rojek

de biqasî heq kiriye bersiv bidin. Pêwîste ev pir baş bê famkirin. Yanî li gel me dem nîne, dem girêdayî wan e. Heke li gorî mercan tevbigerin, wê ev kar di vê çarçovê de bimeşe. Lê heke van mercan binpê bikin, em ê jî şer bi awayeke hîn berfirehtir û bi pîlan pêş bixin. Wateya agirbestê ya herî girîngev e. Wiha li gel van daxwazên siyasî yên me hêjmartine em ê van pêşkeftinan bişopînin. Heke di aliyê erênî de pêşbixin û niyetên xwe yên baş di pratîkê de piştrast bikin, em ê jî heya ji destê me bê bi vê pêvajoyê re bibin alîkar. Di vê mijarê de em ê derfet ji provakasyonên rû bidin re nedin. Ji derveyî vê wê xebatên giştî bimeşin.

Bi nêzîkatiyeke zaroktî dixwazin bi hesabên ku "*em ê gerîla çawa ji çiya daxin*" pêş bixin. Gerîla vale neçûye çiya; ji bo mercên bê eman û pêvajoya mirin mayînê, pêşî li îmhaya netewî û gel bixe riyeke azadiyê derketiye. Heta ku ev armanca pîroz pêk were, wê ev armanca siyasî, li gel binyata xwe ya aborî û civakî bikeve riya çareseriyê, wê gerîla rista xwe ya ewleyiya hebûna netewî, parêzvanê wê û rola pêşxistina wê bidomîne. Ji ber wê dê xwe perwerde û têr bike. Wê xwe bi her rê û rêbazê xurt bike. Çi wextê hemû mercên siyasî û makeqanûnî li ser bingeheke azad û wekhev anîn rewşeke guncav ya pêwendiyan, di vê mijarê de gavên bawerker yên pratîkî hat avêtin partî, gerîla û hemû gel tadmîn bû, wê demê dibe ji nû de gerîla – ev nayê wateya ji nû ve vesazbûn sivîlbûnê-, weke hêza gel ya parastinê vesazbûna wê bikeve rojevê. Jixwe ev jî ne pirsgirêkeke lezgîne. Lê dibe bibe encama gelek pêşkeftinên girîng. Heta ku ev pêvajo erênî pêşdikeve rist û wateya gerîla wisa ye. Weke min beriya niha jî diyar kirî, wê rista xwe ya siyasîbûn, rêxistinbûn û parêzkariya gel bidomîne. Dîsa weke rêxistin wê rista xwe ya parêzkarî û pêşdebirinê bidomîne. Wê rista xwe ya bûna ewlayiya gel, hebûna netewî parastin û azadkirinê bidomîne.

Diyar dibe ku, ev daxwazên me pêşkêş kirine mafdarin û hemû kesên ku dibêjin em bi îdane ku ji pirsgirêka siyasî, demokratîk re çareseriya aşitiyane bênin û di vê navberê de ger hikûmeta Tirk jî di vê îdayê de be bêguman ev daxwazên di vê hikûmet pêk bênin. Bi vî awayî ev niyeta baş a ji destê me tê, datînin holê. Her wiha di serî de gelê me, gelê Tirk û raya navnetewî baş dibîne ku kî herî zêde hawara xwe digihîne terorê,

kî alîgirê ku bi riyên aşitiyane, siyasî, demokratîk encam bigire û wê hîn jî bibîne. Polîtîkaya tunda kor a tengav bûyî wê hîn tengav bibe û bê rewşeke nikaribe bixebite. Dîsa vekiriye ku, polîtîkaya me ya gelek mafdar tenê ne ji bo gelê me, me ji bo hemû hêzên dost û raya navnetewî daniye holê. Yêkîtiya netewî û demokrasî çiye û wê çawa pêk were? Me wê jî nîşan daye. Li ser wê bingehê me mafdarbûna xwe ya mezin daye nîşan.

Bêguman em ne xeyalperestin. Em rewşa yên beramber baş dizanin. Dibe bixwazi bin ev niyetên me yên baş weke taxtîk binirxînin. Ew jî taxtîk dike, bêguman em ê jî taxtîk bikin. Her taxtîkek nexirabe. Ev, taxtîkek başe. Heke dixwazin ji taxtîkwêdetir veguherînin stratejiyê, ew jî karek li ser wî maye. Helwesta herî baş û ya herî rast ya ji bo dostaniyê, ji bo biratiyê, ji bo yêkîtiyê ya me ye. Di nava hêzên dost de yên rexneyên wan ji bo me hebûn, em bi wan jî didin nîşan ku yêkîtiyeke herî baş çawa pêktê. Bangawaziya yêkîtiyê ya me ji bo wan jî kirî derbazdare û bi vê wesîleyê ketine serdema herî çêbûyî ya bikeve meriyetê ye.

Xususên me di derbarê hêzên Başûr û hemû hêzên Kurdistanê ku di bin sîwaneke giştî de kom bibin kamil bûye. Tişta ji bo yêkîtiya netewî, ji bo demokrasiyê, ji bo yêkîtiya hemû hêzên demokratîk bê kirin, ancex evqas vekirî dikare bê pêşvebirin û kirin. Partiya me ya ku heya dawiyê mafdar û xwedî helwesta ji xwe bawere, careke din bi destnîşankirina van rastiyan re, tenê di riya rast de bûyîn û ya rast dike bide nîşan re namîne, di heman demê de di çareserkirina pirsgirêkên bingehîn de jî helwest û nêzîkatiya xwe raber dike. Hêvîdarin hemû hêzên dost vê bişayanî binirxînin. Hîn zêdetir riyên neder kur nekin. Wê riya aqil, riya aşitiyê, riya mezinbûna siyasetê esas bê girtin. Wê bi xwîn û êşeke hîn kêmtir re navenda wekhevî û azadiyê amade bike. Dîsa xeyalperest nînin, lê dixwazin xweşbîn jî bibin. Em pir rastîbînin. Lê em dizanin her tim xweşbîniya xwe jî biparêzin. Vê dixwazin û li benda vê ne.

"*Dipirsgirêka Kurdistanê de yên xwedî ristên bêxêr pêwîste ji vê biçin paş*".

Ji derveyî vê, dixwazim di derbarê cerdevan û nokerên din de bangewaziyeke kin bikim.

Me beriya niha ji we hemûyan re got ku efûyek taybet bênin. Me di ev daxuyaniya çapemeniyê de van jî diyar kir. Di demeke nêz de li gel rewşa awarte pêkane cerdevan bên rakirin. Ji bo di ev rewşa zehmet de nemînin, em difikirin ji bo wan efûyeke nû derxin. Dikare bi bangawaziyên cur be cur re ev rewşa efûyê ji wan re bê ragihandin. Dikarin çekên xwe berdin, biçin mal û gundên xwe. Heke di vê mijarê de dostaniyên xwe piştrast bikin, bi mîsogerî em ê nêzî wan nebin. Hêvîdarin hikûmet wan tengav neke û neyne ser me. Bi vî rengî, bêyî ku birînek hîn kurtir bikin em ê çareser kin. Yek jî vê, ji hemû hevkarên din re jî dibêjin. Bi sedemên cur be cur yên ku di pirsgirêka netewî de di ristên xwe yên bêxêr de israr dikin pêwîste ji vê biçin paş. Êdî hikûmet jî, ev hevkartiya wan ji bo berjewendiyên xwe guncav nabîne. Bêyî ku pişta xwe bide wan, divê ew hema beriya kêliyek bikevin riya xwe efûkirinê. Pêwîste li hember rêxistinê nêzîkatiya rast raber bikin û li gorî guncavbûna polîtîkaya yêkîtiya netewî xwe bênin rewşeke ku bidin qebûlkirin. Ev bangawaziya me di derbarê wan de ye jî û pêwîstiya van bicî anîn bêguman ji bo berjewendiya wane. Berevajî, li hember dîrokê wê xwe ji rewşeke bi lanet û jiyankirina encameke xirab rizgar nekin.

"*Bi armanc û erkên xwe re pir girêdayî bimînin*".

**Ji Hemû Hevalên Hêja Re!**

Bi kinahî, naveroka daxuyaniya me ya îro wisa ye. Bi vî rengî me naveroka daxuyaniya çapemeniyê da we. Bawerim bi awayê giştî ji bo hûn lîkolîn bikin wê bi awayeke nivîskî ji we re bê ragihindin. Lê cewherê wê wisa ye. Yanî hûnê di encam derxistinê de zehmetî nekişînin. Dema we bi temamî lîkolîn kir, hûnê bi awayeke herî berhemdar diyar bikin ku çawa bixin meriyetê. Dubare dibêjim, ev pêvajo, ne ku pêvajoyek nayê famkirine. Qonexeke ku bi peywirên xwe, şêwazê xwe yê kar û tempo bi awayeke vekirî û rêkûpêk, di çapa hemû welat û baldariyeke navnetewî de bê domandin. Bi berpirsyartiyeke bilind re nêzbûyîn û di encama têkoşînek evqas bê eman de, têkoşîna ku bi şêwazeke hîn zirav bê meşandin, pêwîste ji niha şûnde heqê wê zêdetir bê dayîn. Hatina vir wisa hêsanî çênebû û ev wisa hêsan nayên bidestxistin. Ji ber vê, pêwîste xîmeta wê pir baş bê zanin.

Rexneyên me bi giştî kirine tên zanin û pêwîstiyên bicî anîna rexneyan jî baş tê zanîn. Ketina pêvajoyeke kamil çêbûye û hûn

hemû dikarin xizmetên wê bicî bênin. Ji bo herkesî derfetên karkirinê heye. Şervaneke ji rêzê bigirin heta erkdarê di asta herî jor de hûn hemû, ji niha şûnde bi wayeke berhemdar, şêwazê xebateke afirîner û bi feraseteke peywirê re wate bidin xebatên xwe. Heya ku ket bê dayîn mirovê pêş nekeve nîne. Derfet û riyên ji bo welat û gel sûdmend bin hene. Siyaseta şoreşgerî vê daniye pêşiya me. Hûn wisa ji xwe ve û wisa erzan negihiştine vê posizyonê. Her wiha hûn bi daneheveke hezar salî û bi xebata me ya bîst salî ya herî dawî re, bi şêweya mîrasa dîrokî û mîrasa xebatek şoreşgerî lêhûr dibin. Hûn ê têkarî ji vê danahevê re bikin; hûn ê wê pêşve bibin û veguherînin jiyanê. Roj tenê ne ya xwe parastine, di vê wateyê de roja têrkariyek pêşkêşkirine. Peywirên ku we heya niha bi awayeke rêkûpêk bicî naniye ji niha şûnde bi wayeke hîn bi wate û serkeftî bicî bênin.

Jibîr nekin ku, em hîn di destpêka kar de ne. Tenê ne hilweşandina astengên dijmine, di heman demê de di nava înşaya peywirên netewî de ne. Em bi înşaya aborî, siyasî, civakî, çandî û di her astê de rûbirû ne. Ev hemû, ji me hewldaneke zêdetir dixwaze. Heya niha teng li peywiran hat nêrîn û nêzîkatiya roj xilaskirin bû. Dibe hinekan xwe bi vê re xilas kiribe, lê mesele ne xwe xilaskirine, peywirên netewî xilaskirin û di xebatên siyasî yên şoreşgerî de serkeftin bidestxistine. Ev girînge. Jixwe evqas zehmetî jî ji bo wê hatiye kişandin. Dîsa dibêjim, wisa bi hêsanî hatina vir çênebûye. Tenê ne keda me ya rêxistinê, bi kedeke baş û nebaş ya hêjmareke zêde kes û rêxistinê re hatina vê astê çêbûye. Dîsa bi hesab xwestina dîrokeke serberjêr a hezar salî re hatine vir. Bi mîsogerî em ê vê fam bikin; em ê rast fam bikin, têrker fam bikin û em ê tenê bi famkirinê re nemînin, yek jî ya bê kirin bikin. Yanî çiqas zehmet jî bin, madem erkeke wisa bi şeref me ditiye, wê demê emê jî ya bê kirin bi şeref bicî bênin. Ev ne kedeke valeye, kedeke di nirxê zêr de ye, kedeke herî pêwîste. Bi vê re mirov ancex dikare bibe û ancex bi vê re bê jiyîn. Heya niha ev hat kirin û ji niha şûnde wê hîn baştir bê kirin.

Bêguman dîsa zehmetî hene. Wê dijmin dîsa hewl bide vale derxe û tasfiye bike. Lê em jî partiyeke herî bi rêkûpêk dibe yek, rêxistinbûyî dibe û em partiyeke wisa ya pêşengatiya tevgera rizgariya netewî dike. Û di qada navnetewî de jî tevgereke mirovî a bi îdane. Her wiha ji bo bîranîna evqas şehîd jî heke bi

têkoşîneke wisa serkeftî re bersiv bê dayîn mirov dikare xwe bi awayeke wujdanî rihet bike. Ti tiştek din, ji derveyî riya serkeftinê riyek din nikare me bi dîrokê bide efûkirin. Em ê vê jî bizanin û xebata dana efûkirinê bi serkeftî bicî bênin.

Li ser wê bingehê di wê baweriyê de me hûn ê bi ser pêvajoya pêşiya me de biçin û serkeftinê bidest bixin. Hûn ê pêşengatiya partiyê di her astê de saxlam bikin. Artêşbûnê bi her awayê saxlam bikin. Li ser bingeha mezinbûn, kurbûn û dahûrandina her pirsgirêke pêşve biçin. Wê li gorî talîmatên tên zanin û guncavbûna esasên rêznamê serkeftinên mezin bên bidestxistin. Bi yêkîtiyeke nû a cepheyî re wê cepheya gel hemle bidest bixwe, di asta legal û îlegal de tesîr ava bike. Wê eniya yêkîtiya netewî hîn zêdetir berfireh bibe û ji niha şûnde giraniya xwe hîn zêdetir deyne. Li ser vê bingehê wê ji niha şûnde raya navnetewî desteka xwe bide tevgera rizgariya netewiya Kurdistan û daxwazên wê yên mafdar.

Girêdayî armanc û peywirên xwe bin. Bila dawî li helwestên em pir rexne dikin, ferdperestî, keyfî û jiyana ji derveyî quralan bê û şêwazê jiyana bi xeta û şaş bê derbazkirin. Em partiyek ne ji bo xwe, ji bo armancên pîroz jiyankirinê û jiyankirinek guncav a layîqê dîrokê heq dikin. Dibê her kes bizanibe bibe layîqê vê. Yên bişayanî girêdayî van armancan dimînin bilindin, pîrozin û dêrînin. Ev jî ji bo me xelata herî mezine. Li ser vê bingehê em heqê keta xwe dixwazin. Yanî heke em di bilindbûn, pîrozbûn û dêrînbûnê de mesefa bigirin, jixwe me ya pêwîst qezenc kiriye. Ji derveyî vê wê daxwazeke me çênebe. Pêşengên bijare yên Partiyê teqeze ku wê ji bilî vê ji ti jiyanên din re eleqe nîşan nedin. Bêguman dibe dîsa xeta hebin, kêmanî hebin, lê dê weke berê nebe. Wê di peywiran de zehmetî çêbibe, lê wê mîna berê nebe. Ji niha şûn de wê hertişt, bi kêmtirîn kêmanî û xeletî bê kirin, zêdetirîn bi rastiyan û serkeftinê re bê bicî anîn.

Demeke dirêje rexneyên berfireh ên ku em li we dikin, li ser esasê rexnedayîn û darêzê ji demê re xwe amadekirin, bi vî rengî bi ketina pêvajoyeke nû wate dîtiye. Lêpirsîna li ser bingeha rexne û rexnedana ji bo amadekariyên dema pêş ku bi we re dikin, bi ketina qonexeke nipnû re wate bidest xistiye. Ev pêvajo, wê ji her holê ve bibe pêvajoyeke pêşveber, tehlîlker û encamgir. Ji bo

herkes mafê vê bide, bi hewldaneke mezin û hesteke berpirsyar re rayeya xwe baş bikar bênin, ji derveyî serkeftina peywira xwe li hember ti jiyaneke din eleqe nede raberkirin, bi her tiştê xwe ve bûna zilamê peywirê û wê di peywirê de jî pêwîstiyên berpirsyartiya xwe pêk bêne. Dema em li ser vê bingehê bimeşin, pirsgirêk çi li ser bingeha şereke hîn dijwar çareser bibe, çi jî bi rêbaza aşityane-siyasî re çareser bibe, wê qet ne di xema me de be. Mesela serkeftina armanca ne. Weke ku PKK bi serbilindî derketiye ser dika dîrokê, rola xwe ya dîrokî jî bi serkeftî heya vir aniye. Bêguman hûnê ji vir û pê de bizanibin serbikevin. Li ser vê bingehê ji we hemûyan re serkeftineke baş; ji bo serkeftinê parastin, lêhûrbûn û perwerdeyek baş, bi hewldanên rojene pêwîstiyên wê bicî anîn, dîsa pratîkeke saxlam ya hemû astengiyan derbaz dike û ji bo serkeftinê hertiştê xwe danîna holê û li ser van bingehan çûyîna serkeftinê dixwazin.

“*Bi serkeftinên zêde di bin re, pêvajoyê pêşve bibin*”.

Tiştên vê gavê bêjim ev in. Carekdin li we gudar bikim. Ev tiştên me gotine fam bûn? Dibe ku piştî demeke din şûnde çarekdin nîqaş bikin. Weke min gotî, wê daxuyaniyên çapemeniyê bi awayeke berfireh ji we re bên ragihandin. Dibe rojnameyeke dost bixwazibe nerînên hinek biryargehên me bigire. Heke rewşek wisa çêbibe, hûn dikarin nêrîn û niyazên xwe li ser bingeha pêvajoya agirbesta mehek ji hêla me ve çawa hat sepandin, me talîmatan çawa pêk aniye, operasyonên aliyê beramber çine û wê ji niha şûnde çawa pêş bikeve diyar bikin.

Fam bû Derya Andok? Hûn çi dibêjin?

**Derya Andok**: Belê, fam bû Rêberê min...

---.: Baş fam bû ne wisa? Yanî heya bêjî guncave. Bi awayeke herî berhemdar hûnê hewl bidin encam bigirin. Fam dibe?

**Derya Andok**: Fam dibe Rêberê min.

---.: Çiyayê Sîpan, we jî fam kir?

**Çiyayê Sîpan**: Ji hêla me ve hat famkirin Rêberê min...

---.: Derya Zaxros, we çawa dît? Baş fam bû?

**Derya Zaxros**: Fam bû Rêberê min. Di cî de û erênî dibînin.

---.: Yanî hûn dibêjin baş û guncave.

**Derya Zaxros**: Raste Rêberê min.

---.: Derya Şîn, hûn çawa dibînin?

**Derya Şîn**: Rêberê min, bi qasî me fam kirî guncav û erêniye...
---.: Derya Sor, we...
**Derya Sor**: Rêberê min ji hêla me ve jî fam bû.
---.: 44, hûn...
**44**: Rêberê min, deng fam nabe.
---.: Hûn ê ji cihên din bigirin.
Çiyayê Sor, we gudar kir?
**Çiyayê Sor**: Rêberê min, deng fam nedibû, qut qutî dihat.
---.: Hûn ê jî hewl bidin bigirin. Wê ji we re hîn berfirehtir ragihînin. Di çarçoveya me beriya niha vegotî de ye. Yanî ji bo pêşniyar û bendewariyên we guncave. Piştre hûn ê bi awayeke berfireh bigirin. Başe?
**Çiyayê Sor**: Rêberê min fam bû.
---.: Derya Serhad, we girt?
**Derya Serhad:** Belê, me girt Rêberê min. Berfirehe. Em ê li ser vê bingehê xebatên xwe bimeşînin.
---.: Derya Kesk, we....
**Derya Kesk:** Me fam nekir Rêberê min, nedihat famkirin.
---.: Derya Zelal, we girt?
**Derya Zelal:** ...
---.: Derya Dîcle, we girt?
**Derya Dîcle**: Me girt, Rêberê min.
---.: Derya Navîn, we...
**Derya Navîn:** ...
---.: Derya Sipî, we...
**Derya Sipî**: Rêberê min me hemû negirt. Bi qasî me karî bigirin erênî û girînge.
---.: Tişteke din nû hûn bêjin heye?
**Derya Sipî**: Rêberê min tişteke din nû ragihînin nîne. Lê me hemû axaftinên we negirt.
---.: Hûn ê piştre bigirin. Jixwe naveroka civîna çapemeniyê hemû wê di demeke nêz de bi awayeke nivîskî ji we re bê ragihandin. Ji derveyî vê, ew kom ji we re hat?
**Derya Sipî**: Rêberê min fam nabe. Koma nû hîn negihiştiye me.
---.: Rewşeke nû heye? Hûn ê jî hinek bi wî bajarî re eleqedar bibin.

**Derya Sipî**: Belê Rêberê min eleqedar dibin.

---.: Dibêjim rewşeke nû heye, rewşeke neyênî?


**Derya Sipî**: Rêberê min, niha rewşeke neyênî nîne. Karên me başin.

---.: Başe.

Hemû Derya, axaftinên min li vir bidawî dibe. Weke min gotî, nirxandinên me kirî berfireh bû. Wê encamên wê di çapemeniyê de bê peytandin. Lê careke din destnîşan dikim; ji her hêlê ve ketin pêvajoya xebateke berfireh. Bi mîsogerî divê ev neyê wateya sistbûn û rihetbûnê; pêwîste bê wateya hîn zêdetir berpirsyarî, hîn zêdetir ked, hîn zêdetir baldarî û hîn zêdetir serkeftin. Bi vê wesileyê divê tu kes, hewldanên heyî berevajî rave neke yan jî nekeve nava rewşeke bi awayek hişk rave bike. Bi rastî jî pêvajo pir zehmet hatiye girtin. Bi her awayî baş nirxandin û berpirsyartiya herkesî ya di serî de tê, peywira şoreşgertiyê ye. Bêguman wê xweparastin jî bê dîqatkirin. Serdemên wisa dibe xafil jî bê bikaranîn. Dibe hinek vê bikin sedema sistbûnê. Bi mîsogerî wê ji van re destûr neyê dayîn. Berevajî, hîn zêdetir karkirin, hîn zêdetir berpirsyarî, hîn zêdetir disiplîn û di hemû eniyan de hîn zêdetir bihêzbûn têgihiştin, divê di artêşbûn, partîbûn û enîbûnê de bihêzbûn bê destgirtin. Pirsgirêkê ji aşitî, çareseriya siyasî û pêşkeftina demokratîk re vekirî hiştin ne lîstîke, me bi dost û dijmin da nîşan ku xususeke ji destpêkê ve di oxira wê de şer dikin. Xeta partiya me, cara yek û bi awayeke rêkûpêk bûye malê raya netewî û navnetewî. Weke min gotî, wisa bi hêsanî nehatine vê qonaxê. Û em ê bi serkeftinên hîn zêdetir re bidomînin.

Li ser vê bingehê ez carekedin serkeftinê dixwazim, silav û rêzên xwe raber dikim.

**16 Nîsana 1993**




*"Îdîayên min ji xwe bawer ên weke yên di Komîna Parîsê de nehatine serxistin û di şoreşa Sovyetê de nehatine serxistin, ez ê çima ser nexim hene. Heta îdîayên min ên ku ez ji rewşên di şoreşa Îslamê de derketine holê re di asta Rojhilata Navîn de yên nû bi serve bikim hene."*

*"Dibêjim bila çek bên bêdengkirin û*

*pêşniyarên çareseriyê bên pêşkêşkirin."*

Hevpeyvîna rojnameya Özgür Gündemê ya di dîroka 20'ê Nîsana 1993' de hatî kirin:

## AGIRBEST DI ÇARESERIYA SIYASÎ DE BÛ DESPÊKEK BINGEHÎN

**Özgür Gündem**: Destpêkê qala girîngiya ev herdu civînên çapemeniyê bikin. Ev herdu civîn bi awayeke lez ket rojeva raya netewî û navnetewî. Hemû hawirdorên siyasî li ser pêşkeftinan ketin nav pozîsyonên nû, pêşxistina spekûlasyonan û avakirina projeyan. Ji vê hêlê ve destpêkê hûn dikarin qala têkiliya têkoşîna siyasî û têkoşîna çekdarî bikin, dîsa hûn dikarin qala cudahiyên di navbera têgihên agirbest û çekberdanê de bikin?

**Abdulah Ocalan**: Beriya hertiştî, ez kêfxweşim ku Özgür Gündem careke din dest bi weşana xwe kiriye. Û di xebata wan de serkeftinê dixwazim. Hinek encamên vê qonaxa girîng bi mebesta hatina we, carek din destgirtin girînge. Em dixwazin bi wesîleya hatina we rewşê careke din ji her hêlê ve vekirî ji raya giştî ya eleqedar re ragihînin û vê ji xwe erk dibînin.

Bi rastî jî ev pêvajoya me bi du civînên çapemeniyê destpê kirî û her ku diçe kûr dibe, ji her hêlê ve rojeva Tirkiyê diyar dike û pêşxistina projeyên nû yên siyasî datîne holê. Ev biqasî ji bo dewletê dibe, ji bo gelek hawirdorên civakê yên cur be cur jî wisa ye. Ev tenê ne ji bo pirsgirêka Kurd e, ji bo pirsgirêka

demokrasiya li Tirkiyê jî tê wateya serdemeke nû. Lê şaşî û hewldanên wan yên daxuyaniyan cuda dana nîşan jî pir geşedan dide nîşan. Ji vê hêlê ve, me pêwîstiya hîn berfirehtir bûyîn û daxuyaniyên xwe bi nirxandinên hîn berperfireh re ravekirin pêwîst dît.

Girêdana di navbera têkoşîna çekdarî û têkoşîna siyasî de famkirin weke ne zehmete, bi taybet van di çapemeniyê de şaş ravekirin li gorî me bi armanc bû. Agirbest, di destpêkê de nayê wateya çekberdan. Û heta nayê wateya hêdîkirina xebatên artêşbûnê jî. Wateya wê pir vekiriye, lê carekedin destnîşan bikin. Weke pir cara hatî gotin, riya demokrasiyê vekirin û ji bo pêşxistina aşitiyê vesazbûneke me çêkiriye. Girseyên berfireh û kesîmên demokrat kişandina atmosfera têkoşînê ye. Ji vê re dizayn kirin tê gotin. Afirandina rewşeke wisa ye. Li gel girtina rexneyên kesîmên berfireh rewşên nû afirandin û ji bo quwetê bi awayeke bihêz xistina tevgerê bû.

Hema diyar bikin ku, ji çepê Tirk jî rexneyên bê wate tên. Tevî ku çek nehatine danîn, diyar dikin ku çekdanîn çiqas tirsnake. Bawer nakim yên vê dibêjin bizanin ku me di têkoşîna çekdarî de çi jiyan kiriye û fêm bikin rewşa rasteqîn çiye. Lê tenê dinivîsin. Reformizm çiye, şoreş çiye? Nebawerim di nava nirxandineke vê ya rast de bin. Rexne û dîtin heya bêjî serensere. Dubare destnîşan bikim; ev gava me avêtî, gaveke ji bo şoreşê jî gelek pêşkeftinan hêvî dide. Li helwestên hawirdorên fermî temaşe bikin. Tevî ku me daxwazên xwe li ser bingeheke hevpar û nerm pêşxistiye jî, hatiye dîtin ku hawirdorên fermî nêz nebûne û polîtîkayek herî biçûk neafirandine. Madem em ber bi reformîzmê ve çûn, em lihev dikin; wê demê çima aliyê beramber gav navêje? Dixwaze bila gav bavêje dixwaze bila navêje, rewşa me ne li ber çerxa rastgeriyê ve diçe, ne jî ber bi reformîzmê ve diherike. Pir vekiriye ku em dixwazin berevajî wan derdê xwe bi şêweyek hostane bi rojev bikin. Hata demokrasiya-şoreşger û sosyalîzma pir ji çavan ketî xistina rojeva Tirkiyê û hêz dana wê ye. Jixwe, her reform jî nexirabe. Heta ya li beramberî me hikûmeta herî paşverû-kevneperest jî be, daxwaza asgarî anîna cî, helwesteke heya bêjî encamên baş diafirîne û ji şoreşê re jî xizmet dike. Mînakên vê li gelek welatan heye. Dîsa di dîrokê de gelek pêşkeftinên mîna vê dibin mijara gotinê.

Agirbest, bi temamî bersiv negirtibe jî, di leza operasyonan de kêmbûn çênebûbe jî, dîsa wate dîtiye. Encamên girîng yên siyasî derxistiye holê. Rê li ber hinek berevajîkirin, hengameya têgehan girtiye. Mînak, ji diyardeya terorîzmê re vekirîbûn aniye. Kî ji terorê hêvî dike, kî her tim ji çareserkirina pirsgirêkên siyasî dûr dimîne, kî li hember demokratîkbûnê girtiye û kî berevajî bersiva rêbaza aşitiyê daye derketiye holê. Tenê ne raya Tirkiyê, raya navnetewî jî pir baş dîtiye. Heya gelek hikûmet, li ser vê bingehê polîtîkaya xwe di ber çav re derbaz kirine ketine nava pêvajoya têkiliyên nû danînê. Polîtîkayên KT yên fermî pir tengav bûye. Raya Tirkiyê ya PKK'ê weke cudakar dide nîşan û propaxandayên mîna "*PKK ji derveyî şîdetê tiştek din fam nake*" bi erdê re bûye yek. Yanî di hûndir de jî pir tengav bûye. Ne ku ev pêşkeftinên negirîngin. Bi taybet polîtîkaya me ya yekîtiyê jî pir rastîbûn dana nîşan, rê li ber gelê Tirk jî pir eleqedar û sempatî temaşe bike vekiriye. Demîngirtinên di çapemeniyê de jî pir şikestiye. Pêşkeftinên bi vî rengî hîn zêdetir dikare bê hêjmartin. Weke ku pirsgirêka Kurd wisa dane nîşan, ne ku pirsgirêkeke "*şevreşke*", dîsa ne pirsgirêkek ji bo kevir deyne pêşiya Tirkiyê ji hêla hawirdorên biyanî ve hatiye afirandin, berevajî pirsgirêkeke demokrasiyê ya herî girînge, ger Tirkiye vê pirsgirêkê çareser bike wê hîn bi tendûristî pêş bikeve û pêkanbûna vê jî derketiye holê. Di vê mijarê de ji her demê zêdetir ferasetên erênî pêşdikevin.

Carek din dubare diyar bikim ku, pirsgirêkeke weke pirsgirêka daxistina yên li çiya nîne. Hebûna yên li çiya, heya hinek armancên siyasî bicî tên wê him mezin bibe û him jî bê rewşeke hîn wesfdar. Dîsa mijareke ku dixwazin berevajî bikin, meseleya federasyonê ye. Berevajî xweseriyê ye, yan jî ji wê çûyîna paşe? Na. Federasyonbûnek di şêwazê demokratîkbûnê de bê pêşxistin, ne ku berevajî xweseriyê yan jî ji wê çûyîna paşe, şêweya pêkanîna wê îfade dike. Ev jî pir şênber fam dibe. Dibêjim hinek pêşkeftinên dişibin vê dîtin pêkane. Her wiha ev gavên tên avêtin, bandoriya wê herî kêm bi qasî şerê me yê çekdarî kûre. Hinek ji vê re dibêjin aşitî yan jî êrîşa siyasî. Ya rastî pêngavek li gorî vê pênaseyê ye. Û li gorî min, wê bandoriya xwe li ser gel û bi taybet jî li ser rêxistinên demokratîk-şoreşger

bide nîşan. Ev pêvajoyeke û hatiye destpêkirin. Ji encamên wê jî bi hêvî ne.

*"Piştî Şerê Başûr şûnde hêza me duqatî zêde bû".*

– Xeletiyên hûn hewl didin rave bikin, yek ji rastiyên di civakê de tê hilberandin, nirxandina Şerê Başûre. Tê gotin ku, di ev şere de "*PKK, di warê leşkerî, fizikî, moral û siyasî de binketiye*." Di vê wateyê de ne mezinbûn, taxtîka biçûkbûnê anî rojevê. Lewra rewşa nû ya we di herdu civînên çapemeniyê de vegotî, bi awayê taxtîka pêşveçûnê ye. Di wateya leşkerî de artêşbûn û di wateya siyasî de jî vekirina qenalên nû anîna rojevê ye. Yanî hûn dibêjin PKK hîn zêdetir bi ser proje û qenalên mezin de diçe. Başe di Şerê Başûr de çibû?

---.: Pirsa we fam dikim. Dixwazin van pêşketinan bispêrin vê îdayê. Dibêjin ku, "*di Şerê Başûr de pişta PKK'ê şikand, me zivistanê pir perciqand, rêxistin hat rewşek henase negire. Bi piştgiriyên bi derve re jî tişteke ku PKK bike nîne. Ji bo teslîm bibin pêwîstiya wan bi bangawaziyek hebû û hikûmet jî vê bangawaziyê kir. Bi awayeke şermokî dixwazin bi civînên çapemeniyê re bersiv bidin vê.*" Ev nêzîkatiya di dilê hikûmetê de derbaz dibe û dixwaze hinek bixemilîne ji raya giştî re pêşkêş bike. Min jî bi awayeke pir bi delîl nîşan da ku, rewş berevejiye. Şerê Başûr, di çapa Kurdistanê de serdema pevçûnî bi dawî aniye û bû şerê vekirina gelek pergalên îtîfaqbûnê. We pir baş dît ku, Birêz Talabanî li gel min bû û bersiva gelek pirsan jî da. Rewşa me ya li Başûr niha hîn baştire, him di warê leşkerî, him jî di warê siyasî de û him jî di asta gel û rêxistinan de me pozîsyoneke bihêz bidest xistiye û heta avaniya jê re tê gotin, "*dewleta federe*" di çarçoveya polîtîkaya PKK'ê de pêşkeftiye û hawirdorên polîtîk yên li Tirkiyê jî dizanin. Ev hikûmet bi xwe jî dizane.

Bi kinahî, me di Şerê Başûr de hêz winda nekir, berevajî me hêz qezenc kir. Me şehîdên dan diyar kir, nêzî sed û siye. Weke du hezarî kirin malê min; ya rastî min divê mijarê de di hevdîtineke xwe de got; "*heke tedbîr nehatiban girtin dibû bûba duhezar*". Wan bi awayeke "*dibû, bû*" nirxandin. Lewra ev berevajîkirineke. Bîlançoya wê heye, nav hemû diyarin. Li gorî me qismek jî bingeha xwe ji şaşitiyan girt. Yan na me yê di vî şerî de hêjmara şehadetan di bin sedî de bisekinandiba. Ya herî girîng, ev şer tecrûbeyeke pir mezin bi me da qezenckirin. Bi taybet ev

şer li ser gelê Başûr prestîjeke mezin hiştiye. Aliyê meselê yê manevî jî qezenceke pir girînge. Wargeha Başûr pir baş tê bikaranîn; ev jî pêşkeftineke başe. Hîn jî xebatên didin meşandin hene û ev pêşkeftinên girîngin. Dema li van temaşe dikin dibêjin, "*me pişta wan şikandiye*" ez jî dipirsim dibêjim başe hikûmet wê vê çawa rave bike yan jî çawa xwe bi vê bide bawerkirin.

Ji bo operasyonan jî nirxandineke şaş mijara gotinê ye. Bi rastî jî ev operasyon bê bandor bûne. Bi qasî hêjmara tiliyên destek gerîla îmha nekirine. Di serî de Dêrsim, Agirî, Amed, Botan, Xarzan û Mêrdîn hema li her herêmê operasyon pêkanîne. Mesrefeke bi qendî trilyonan hatiye kirin. Lê, bi rastî jî encamên hatine girtin ne bi qasî misqalekê ne. Piştî Şerê Başûr şûnde refên me qadeke din mezin bûye. Yanî duqetî ya berê bûye. Yek jî heke çekdarbûn û pêwendiyên wê yên girseyê zêde bikin! Ez mezinbûnê dibînim û min vê jî pir vekirî got. Her wiha ez gotina hikûmetê ya dibêje; "*gerîla hêzeke mezin winda kir, hat rewşeke nikaribe li ber xwe bide, ji ber vê wisa dikin*" ji derveyî rastiyê dibînim.

Di mijara piştgiriya nevnetewî de jî berevajiyê wê mijara gotinêye. Welatên Rojhilata Navîn jî di nav de, li Avrupa, Emerîkayê hatine asteke ku dîplomasiyeke serkeftî bimeşînin. Hûn dikarin Qafqasya jî daxilê vê bikin. Hema di her welatî de giraniya me bi qasî şandeya Tirkiyê heye. Di saha navnetewî de kî dever ji me re teng bûye û em nikarin li kî derê bixebitin. Pêwîste hikûmet vê piştrast bike. Tişta dixwazim bêjim, bi mebesta roja pênsedî pêwîstiya hikûmetê bi hinek daxuyaniyan hebû û bi taybet mijara ku digot terore de dixwest xemla serkeftinê bidê: Operasyonên li hember Dev-Sol'ê pêkanîne jî li gorî wê serkeftiye. Dibe bangawaziyên me yên agirbestê bi awayê "*min terorê bêdeng kir, herî kêm serî pê da tewandin*" bikar bîne bike wesîleya bîlancoyeke baş. Lê rastî weke min diyar kirine. Bi rastî jî me pozîsyoneke leşkerbûn û siyasîbûnê ya bi rêkûpêk bidest xist. Û bandora wê pêl bi pêl, tenê ne li Kurdistan û Rojhilata Navîn li cîhanê jî belav dibe. Ya herî girîng jî, Tirkiyê jî dikişîne nava vê wergiriyê.

*"Meclîsa li Bakur wê demokratîk û gelparêz be".*

– Pêngava nû ya siyasî yan jî yek ji sazibûnan, ya ji nîqaşê re vebûyî û pêşkeftinan bidest dixe meseleya Meclîsa Netewî ya

Kurdistanê ye. Ev li ser kîjan pêwîstiyê teşe girt û wê di rojên pêşiya me de kargeriyek çawa bibîne?

---.: Min beriya niha di vê mijarê de jî hinek nirxandin kir. Li gorî min aliyeke wê zêde mereq bê kirin jî nîne. Ya rastî pêşkeftina dawî ya herî girîng, pêşkeftinên di mijara yêkîtiya cephe de ye. Bi taybet protokola yêkitiyê ya me bi Sekreterê Giştî yê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) Birêz Kemal Burkay re kirî, tê wateya bingehê yêkîtiyeke cephe hatiye sazkirin. Û di nêz de dibe dizayneke mîna vê pêk were. Li gel pêkhatina vê bawerim wê meseleya Kongreya Netewî jî şênberbûnê bidest bixe.

Kongre, ji ber pêwîstiyeke dîrokî ket rojevê. Pirsgirêka her tevgereke netewî ya kongrê heye. Yan dema destpê dike, yan di nîvê de, yan jî dema ber bi encambûnê ve diçe tê rojevê. Divê li şerê rizgariya netewa Tirk bê temaşekirin. TBMM (Meclîsa Mîllî Ya Mezin a Tirkiyê) bi awayeke berfireh beriya şer hatiye înşakirin û xwe nasipêre şoreşeke cidî. Û heta, ji nûnerên ku em dibêjin eşraf û komalên Camiyetên Mûdafa-i Hikukî ava bûne. Bi awayeke giştî, xwe nesipartiye tevgereke gel. Lê meclîseke girînge û di dîroka Tirkiyê de jî xwedî roleke pir girînge. Mînakên cudatir jî hene; Kongreya Netewî a Afrîqa, dîsa weke Kongreya Partî a li Hindistanê gelek rêxistin wisa ava bûne. Em nabêjîn dê ya me jî heman wisa be; li gel me ji destpêkê ve avabûna partiyê heye. Partiyeke xebatên xwe yên siyasi-îdeolojîk pir baş pêş ve dibe heye. Tevgera xwe ya partiya netewî pir baş pêş xistiye û bi serhildanan re jî gihiştiye qonaxeke nipûnû. Yanî tevgereke gel ya rastîn afiriye. Ji ber vê jî, diyar dikin ku wê bingehê kongrê bêkêmasî be. Gelek çîn û tebeqe kişandiye nava kar. Kêmaniyeke wê, rewşa komên din û rêxistinên din bû. Kêm zêde ber bi yêkîtiya wan ve diçin. Wê demê piştî van mercan şûnde çûyîna tevgera Kurd ya kongrê him rastîbîne, him jî wê pêwîstiyeke dîrokî pêk bêne. Wisa difikirim ku gelek rêxistin jî xwe ji bo vê amade dibînin. Partiya legal jî di vê mijarê de ne astenge, weke amûreke destek bide wê difikirin. Di roj û mehên pêşiya me de, dibe ev kongrebûyîn hîn zêdetir pêşveçûn bide nîşan. Êdî em dikarin ji van re bêjîn Kongreya Cephe. Di giştî Kurdistanê de her tim pêwîstî bi kongreyek heye. Lê bi giranî ya di pratîkê de pêk we re kongrebûna li Bakurê Kurdistanê ye.

Weke gava yekem vê dibînin. Em ê danasîna pêşkeftina şêweya kongreya eniyê pir watedar bibînin.

– Bi taybet di raya giştî de yek tişta tê meraqkirin jî, çawaniya Meclîsa Netewî a Kurdistane. Wê Meclîsa Netewî ya Kurdistan di warê zagonsazî, rêvebirin de çawa bimeşe? Dîsa wê meclîseke kedkaran çêbibe? Jixwe diyare wê meclîseke sosyalîst çênebe. Weke meclîseke netew-demokratîk, dê cudahiya wê ji meclîsên burjuva yên demokratîk çawa be? Ji niha ve dikare destnîşankirinek bê kirin?

---.: Bêguman, dikarin mînaka vê meclîsa li Başûr bidin. Ev meclîs, meclîseke feodal-burjuvaye. Însiyatîfa kedkaran sînordare. Meclîsa li Bakur –pir vekirî bêjîm- wê bibe meclîseke demokratîk û gelparêz. Bêguman wê yên ji kesîmên kevneşopên eşraf û axayan jî di nav de cî bigirin, lê li gorî min wê para wan pir sînordar be. Pêkanîna pêşengatiya van bila li aliyek bimîne, heta vebeyîna van şanseke. Yên ku mil bidin tevgerdariya heyî kedkarên xîzan û kedkarên burjuvaya biçûk yên bajarane. Palpişta civakî ya tevgera li Bakur ev in. Her wiha peytandina wan ya di parlamentoyê de misogere. Dibêjim wê di alî rêxistinê de zêde pirsgirêk dernekeve. Yanî divê her rêxistin dengê xwe derxe, demokratîk bibe, pirdengî bibe. Di vê mijarê de em ê hewl bidin heya dawî bitolerans bin.

– Yanî li ser bingeha netewî-demokratîk pirparêziyek tê armanc kirin?

---.: Belê. Bingeha girseyê li gel me ye. Ev veguherandina hêza deng, dengê yên din kêmkirin weke nêzîkatiyeke rast nabînin. Hêza me ya leşkerî heye; bi vê ve, naxwazin li ser yên din zext bidin avakirin. Li vir hêmanên esasî yên em bişopînin hene. Tevgera netewî ya li Bakur tevgereke gele û heya bêjî demokratîke. Heke li hember van rastiyan rêzdarî hebe, wê demê pirdengînî mîsogere. Şansê dîtinên cur be cur xistina nava xwe heye. Lê wê ev hesab nekin: “*Derfet çêbû, têkoşînê paşçav bikin, însiyatîfa kedkaran kêm bikin. Ji qendî me heq kirî zêdetir mewzî bigirin. Entrîkayan pêş bixin*”. Ev hesabeke xirabe û berevajî bibe. Lê heke şûnên xwe baş tayîn bikin, bi mîsogerî wê bikaribin tevlîbûneke bi wate bidin raberkirin. Em vê ji bo hêzên Başûrê

Kurdistanê jî dibêjin. Em hebûna wan înkar nakin, lê heke pêşiya însiyatîfa gel bigirin, yanî antî-demokratbûnê bidomînin, wê demê dê pertekên me jî pêş bikevin. Jixwe yek sedama vî şerî jî ev bû. Pêwîste hinek ji însiyatîfa gel re vekirîbin. Divê ji xebata serbest û siyasetkirinê re destûr bidin.

Heke komî serhev bikin; di tevahiya Kurdistanê de meclîs, wê ne tenê meclîsa feodal-komprador ya burjuva bibe, ne jî ya sosyalîst bibe. Li gorî min herdu jî, zêde bersiv nade rastiyên heyî. Di Kurdistanê de feodalîzm û kompradora kapitalîzmê nemûmkûne mohra xwe li tevgereke wisa ya şoreşgerî bide. Wê ev hewldan vale biçin. Lê wê rê li pêşiya meclîsa sosyalîst jî veneke. Ger meclîseke sosyalîst bibe jî, li gorî me demokrasiya sosyalîst jî pir bidenge. Lê ger wisa bibe jî vê bi awayeke meclîsek sosyalîst-demokratîk îlankirin hîn zûye û pir zêde ne li gorî rastiyên heyî ye. Yanî bi xetên qalind meclîsa Kurdistanê meclîseke gel e. Kêmnetew jî daxilê vê ye. Bêyî ku xebatên wan li beramberî şoreşê hebe, ji demokrasiyê re vekirîbin û ne antî-sosyalîst be dibe bejdarbûneke zêde ya hemû çîn û tebeqeyan çêbibe.

– Beriya niha min di nîqaşê de qala wê kiribû; li vir xaleke xeternak heye. Destkeftiyên li ser zemîneke şoreşgerî bi teşegirtinên nû re windakirin heye bibe mijara axaftinê? Li gel van şerpezeyan, girêdayî çêbûna teşeyên nû ye jî. Di dîrokê de mînakên vê jî pirin. Meclîsa Netewa Kurdistan, ma wê ji hêzên xwe nû dikin re biyanî nebe? Dikare li pêşiya xeteriyeke dîrokî çawa bê girtin?

---.: Heke li hember çavkaniya bingehîn a şoreşê nêzîkatî raber nekin di nîqaşa ku wê ew şoreşê bixin, yan jî wê şoreş wan bixe, hêza ku şoreşê dimeşîne heke îxanet li şoreşê neke, biyanîbûn û hişkbûna saziyên bi vî rengî zehmete, bi pêngaveke nû ya siyasî re bi hêsanî dikarin derbaz bikin. Ev, ji bo HEP'ê jî derbazdare. Heke çavkaniya HEP xwe dispêrê berevajî binirxîne, bi nêzîkatiyên kesî yên pir ji rêzê (li gorî me ev pir zêde ye) û armancên demkurt yên weke ez xwe çiqas qut bikim, ewqas ji min re kare bidomîne, wê pir bi hêsanî belav bibin. Çavkanî pir bi coşe û ev qirêjiyên bi vî rengî zêde di nava çavkaniya xwe de nahewîne. Çavkanî pir xweşik diherike; wê ev xilteya pazgirtî bigire bavêje. Rewş hinek wisa ye. Her wiha şiyar dikim. Heta

hikûmet jî dixwaze me bikar bine. Lewra, wê bixwazibe bikar bine; wê gelek hêz bixwaz bin bikar bine. Lê divê kes jibîr neke ku mafê şoreşê jî yê bikaranînê heye. Û bikarîna herî mafdar jî şoreş dike. Ji vê re mafê herî zêde yê wê heye. Li bendê me herkes vê bibîne. Di vê mijarê de jî li ser hev şiyarî dikim… Şoreş xilas nebûye û quralên wê heye. Li ser Tirkiyê jî îdaya şoreşê xilas nebûye. Baldarbûna hemû hawirdoran ji vê re fêdeyeke jiyanî heye. Nexwe wê dîsa veguhere pevçûnên tund. Şerê Başûr dibe li Bakur jî pêş bikeve. Naxwazin vê bikin, lê heke bi israr bixwaz çavkaniyên şoreşê ziwa bikin, berevajî bikin, bi hişkbûnek diyar re berevajî cewherê xwe bikevin nava helwestên birokratîk û axawarî, wê demê dê rê li ber pevçûnê veke. Û aliyê winda bike li gorî me neşoreşe û windakirina wê jî ne mîsogere.

– Li hember meclîseke wisa wê pozîsyona we ya kesî çi bibe? Hûn ê weke Rêbereke manevî bi cî bibin?

---.: Li gorî min li vir xizmet girînge. Jixwe ji destpêk heya dawî riya wê vedikim û dimeşînim. Lê ger pêwîst bike û derfeta min çêbibe ez ê axaftinek jî bikim. Alikariyên dişibe vê bimeşînim, lê rista wan cudaye, rista endameke meclîsê cuda ye. Wê ew wisa bisazî bibin. Lê pêwîste neyê fikirîn ku tevgereke îdeolojîk, tevgereke şoreşger xwe di nava meclîsekê de bigire nava xwe. Riya wê vekirî hiştin û şansê meşandinê bihêzkirin tişteke cuda ye. Lê saziyên serokatiyê hene; serokên îdeolojîk, dîsa serokên çîneyatî û civakî girîngin. Bawerim ev erkên hîn zêde tên xwestinin.

*“DiRojhilata Navîn de federasyonbûn pir îdeale”.*

– Yek jî meseleya federasyonbûnê heye. We di axaftineke xwe de gotibû,“*di Rojhilata Navîn de federasyon, şêweya rêxistinbûnek pêwîste”*.

---.: Behsa min ya ji bo federasyonê, çi di asta yekeyên netewî de be, çi jî yekeyên netewan yên parçebûyî be û heta hinek beşên netewan yên cudahiya çandan digire nava xwe, van bi awayeke azad birêxistinkirin (jixwe ji van re rêxistinbûna siyasî û heta rêxistinbûna dewletê jî di nav de ye) û kirina xwedî kesayetiyên berjewendiyên polîtîke. Bila xwe di nava feraset û hêzeke, “*di her astê de hêza me wisaye û li gorî van berjewendiyên me him di warê siyasî û him jî di warê leşkerî de birêxistinkirine. Lê naxwazin vê wisa pir cudakar û ji hemûyan*

*qut pêşbixin. Bi yên din re jî yêkîtiyê dixwazin. Ev dibe bi komên çandên din re, bi parçeyên netewên din û netewên din re dibe*” bibînin. Ramanên di bin federasyonê de ev e. Ji kî derê ve tê temaşekirin bila bê temaşekirin, avaniyên heyî yên dewletên ûnîter neteweperestin. Mînak, li Tirkiyê nasnameyên çandeyî, kêmnetew, netew û heta hinek cudahiyên mezhebî û herêmî yên netewa Tirk jî hene. Mînak ji bo Behra Reş, dibe weke li Avrupa, Almanya, Emerîkayê eyalet bên avakirin. Û ev bûrokrasiya li Enqerê pêşdikeve rê li ber xitimandineke mezin vekiriye. Qala meclîsên di cî de û rêveberiyên di cî de dikin. Em ji vê re bêjin pergala eyaletan; ev ji bo heman netewê îro li gelek welatan tê sepandin. Niha evqas kêmnetew hene, evqas realîteyên herêman hene; ji bo van pergala eyaletê pêwîste. Kurdistaneke pir mezin heye; hinek kêmnetew jî di nav de, ji eyaleteke hîn wêdetir dikarin weke birîmeke îdarî, weke birîmeke siyasî li vê temaşe bikin. Û em dikarin ji vê re bêjîn federasyon.

Her wiha federasyonbûn heya bêjî nêzîkatiyeke rastîbîne û di gelek qadan de tê sepandin. Îro çiqas bêjin tê parçekirin bila bêjin, di Sovyetan de dîsa vesazbûnek wisa heye. Li Avrupa yekîneyên nû ava bûne hene; ev jî şêwazeke federasyonbûnê ye. Dibe hîn pêşbikeve. Yanî şêwazên yêkîtiyê pêwîstin. Li Tirkiyê ev hîn zêdetir pêwîste. Ji hêla pirsgirêka netewî ve weke pêwîstiyeke felaket xwe dide nîşan. Di Rojhilata Navîn de jî pêwîste. Îran encex dikare bi federasyonbûnê hebûna xwe biparêze. Jixwe Ereb kêm zêde federasyonbûna xwe jiyan dikin. Bûyera Kurd jî rastiyeke di nava sê netewan de cî digire. Li Îranê federasyon, li Iraqê federasyon, li Tirkiyê federasyon, yeksane di Rojhilata Navîn de federasyon! Federasyonbûna ku Kurd bi sê netewên bingehîn re ava bike federasyonbûna Rojhilata Navîne û li gorî min pir îdeale. Yek jî li vê erdnîgariya Kurdistanê, ger çavkaniya wê ya mîna avê û hinek çavkaniyên wê yên mîna petrolê lê zêde bikin, wê rewş hîn baştir fam bibe. Wê herkes bixwaze sûd ji van bigire. Erdnîgariya Kurdistanê, di Rojhilata Navîn de weke derbazgeke hemû netewan digihîne heve. Ev hemû, dide diyarkirin ku wê Kurdistan di federasyonbûneke bi vî rengî de rista girîng bilîze. Yek jî federasyonbûneke xwe dispêre şoreşê, federasyonbûnek di tevgerên demokratîk de pêşdikeve di heman demê de wê di Rojhilata Navîn de bibe gaveke mezin yê

demokrasiyê. Federasyonbûna demokratîk, piştî Şerê Cîhanê yê Yêkemin şûnde pir lewaz û li ser bingehên neteweperst ava bûye. Û ev herêma ku bi ti awayî demokrasiyê jiyan nekiriye, di demokratîkbûna dewletan ya hevgirtî de jî dikare gavek mezin bavêje. Him di riya xweserîbûn, him jî di riya demokratîkbûnê de gaveke pir girînge. Em li ser vê bingehê şoreşa li Kurdistanê pêşdixin. Berê dema me digot: "*Bingehek jibo federasyona Rojhilata Navîn*" me qala van rastiyên girîng dikir.

"*Dibe çareseriyeke wekhev û vîna azad bê qebûlkirin*".

– Di civîna duwem a çapemeniyê de we got: "H*eya daxuyaniyeke din em bi hinek mercan re agirbestê didomînin*." Û we mercan rava kir. Di nava van de daxwaza serbestiya zimanê Kurdî û di her mijarê de avakirina çarçoveya makezagonî û zagonî hebû. Li vir du pirsên qirîtîk heye. Ya yekem, dibe mêleke çareseriya pirsgirêka netew, daxistina pirsgirêka çand û ziman hebe? Pirsa duwem; dibe tenê weke vesazbûna zagonî bê famkirin. Bi van daxwazên lezgîn re di navbera riya diçe federasyonê û ji hêla dîtinên we yên bingehîn ve ev tiştên xeternak wê çawa bên derbazkirin?

---.: Hikûmet, dixwaze pirsgirêkê bi şêwazeke paşverû ser bigire. Dixwaze gel ji nêzîkatiya însiyatîfeke şoreşger-demokratîk dûr, qedera xwe bidest bixe, tenê radyo, televizyonek bidin û nasnameya Kurd jî bixin navê, bi vî rengî bi yek-du qanûnan re pêk bênin digirin dest. Ev şîroveya hikûmetê ye. Hinek hawirdorên lîberal yên burjuva jî dixwazin wisa bi encam bibe. Lê nêzîkatiyên me, bi awayê şekil û nevarok pir cuda ye. Dubare bêjim, rakirina zextên li ser çandek heta ne refomeke cidî ye jî. Mafeke xwezayiye, riya pêşkeftinê vekirî hiştine. Nasnameya Kurd xistina qanûnan jî wisa reformeke mezin nayê hesibandin. Ji bo nexweşikiyên xwe û neqebûlkirinên xwe yên di qada navnetewî de ji holê rakin, dibe vê bikin. Bêyî ku me muxatab qebûl bikin jî dikarin bikin, lê ev, wê nabe çareseriya pirsgirêkê. Çareseriyeke ku bê qebûlkirin, bi rastî jî him wekhev, him jî çareseriyeke vîna azade.

Çareseriya realîteya Kurd a demkin ku nayê îtîrazkirin, ne bi pergala Tirk a siyasî re, girêdayî vîna xwe ya azad û girêdayî însiyatîfa gel a bi naveroka azad û demokratîk ve pêşdikeve. Yek jî divê wekheviya siyasî, leşkerî jî lê bê zêdekirin. Yanî dibêjin;

"*bila yên li çiya dakevin, ti hêzeke ewlekariyê nebe*". Weke tişteke mîna "*bila ti hêzeke wan siyasî nebe, tenê hinek çanda xwe bi serbestî pêşdixin, di qanûnan de navê wê heye û hertişt beriya niha li Tirkiyê hatiye çareserkirin, bila bên bikevin nav*". Ji vê re nêzîkatiya dewleta ûnîter tê gotin ku, ev ji destpêkê ve çareseriyê paşve dixe. Mînak di Kurdan de gerîla, wê weke hêza ewlekariyê bê vesazkirin. Wê partiyên wan yên siyasî û parlamentoya wê ava bibe. Dê hikûmeta xwecihî û federasyon ava bibe; yanî hêza meşandinê. Lê em dibêjin ev ji yekbûna bi Tirkiyê re amadene. Parlamentoyeke federal dikare bê fikirîn. Dîsa hikûmeteke federal dikare bê fikirin, artêşek dikare bê fikirîn. Sazîbûnên hevpar yên ji du netew û kêmnetewan pêkhatî dikare li ser bingehên nû û bi riya demokratîk bê pêşxistin. Qala zagonîkirineke vê hildana parastinê dikin. Heta tu yê makeqanûnê jî li gorî vê vesaz bikî; behsa min ya ji bo legalbûnê ev e. Ev, li Tirkiyê di qanûnan de bi reformê, di edaletê de bi reformê re mûmkûne. Li hember reformên bingehîn vekirîne, min xwest vê destnîşan bikim. Di vê mijarê de terzê min yê pirsgirêkê danîna holê pir vekiriye. Vê bi awayeke din dana nîşan yan jî bi awayeke giştî "*şoreşhat berdan, ber bi reformîzmê ve çû" gotin* (ev rexne di tevgerên çep de tê kirin), tê wateya nirxandinên heyî famnekirine. Yanî li gorî min hikûmet hemû dibêje û çep jî wê dubare dike. Çep, ji yên hikûmet dibêje zêdetir tişteke din pêşnexistiye. Kurbûna kar, aliyên wê yên heya bêjî ji bo pêşkeftinê vekirîne ji bo dîtina wê ne çepê Tirk nêz dibe(hemû nexin navê) û ne jî hikûmet.

"Herku *gerîla mezin bibe wê bidomîne".*

– Dîsa we di civîna xwe ya çapemeniyê û hinek axaftinên xwe de got wê artêşbûn bidome. Bi qasî me fam kiriye pêşkeftinên çendanî û wesfî bi şêweyeke din, pêwîst dike hilpeke asteke bilind. Tê ravekirin ku bi ser deh hezarî re gerîla heye û ji sedî sîh jinên gerîla ne. Ji Avrupa, herêmên din yên Kurdan, ji netew û kêmnetewan ava dibe, weke mozaîyek tê tarîfkirin. Di artêşê de wê cudahiya di rewşa îro û ya sibe de çawa bibe?

---.: Gerîla, bi rastî jî qadeke azadî û demokratîkbûnê ye. Qadeke perwerde, rêxistinbûn û ewlekariyê ye. Qadeke kesayeta xwe dîtine. Gerîla weke hêzeke leşkerî nirxandin jî nêzîkatiyeke tenge. Di me de gerîla(min di destpêkê de jî got) bi temamî rêxistinbûneke siyasî ye. Bi rastî jî qada ku mirovê me xwe lê

dibîne û demokratîk dibe. Lewra jin jî dikevin nava vê, kêmnetew jî dikevin nav, yên bi eslê xwe Tirk jî dikevinê. Dema hatin vir weke ku hemû bêxwedî bin. Bêjîn jiyana ku bêrî kirine. Ya rastî "*di nava rêxistineke hişk a leşkerî de bûyîn*" qet nayênin aqilê xwe. Hema hema demokratbûyîneke xwezayî heye, weke qada kesayeta xwe ya xwezayî dîtine, nirxandine. Ger bê xwestin, bi yên bejdarî vê pêkhatinê di bin re ev dikarin bên axaftin.

Me, di dahûrandinên xwe de her tim qala jiyana di nava pîvanên pergalê de kir ku ev bi rastî jî jiyaneke dibe tengezariyê ye. Pêwîstî bi jiyaneke nû heye. Dibêjin heya kesayetên nû pêkneyên wê pêşkeftin çênebe. Wiha îfadeyeke vê herî şênber gerîlaye, navê wê dibêjin gerîla. Lê artêş, ji gerîla cudatir dişibe gelek tiştan; vê jî hema diyar bikin. Hinek wir weke dergeha nîqaşê dibînin, hinek jî dixwazin xwe weke axa bibînin. Yanî herkes weke qada pêkanîna xiyalên xwe dinirxîne. Lê nizane, vir hinek jî qada leşkeriye, lewra dema tê vê teng dibe. Bilez fermandarok pêk tên; yê dibe fermandar, dixwaze xwe hema weke axayan bibîne. Yanî di xeyalên kî de çi hebe, çi hêvî dike, weke xwe hema di nav de bibîne hewl dide xwe bide jiyankirin. Niha dixwazin weke saziyeke pir bi navarok-berfireh bigirin. Ji bo gelê Tirk jî (ji bo îro li Tirkiyê jî gerîlayek nîne) pêwîstiya xwe ya gerîla, di vê wateyê de mîna saziyek pêwîstiya wan ya demokratbûn û azadbûnê derbaz dike ava dikin. Lewra wê ev pêşbikeve û ev bi antî-demokratîkbûn û terorê re ti eleqeyeke xwe nîne. Bûyereke mîna Sovyetê ye. Hema hema meclîseke me gel jî ava dibe; gel dike xwedî kesayet, zana dike, birêxistin dike. Gelek erkên din yên pir bi wate dişibin vê hene.

Weke min gotî, gerîla weke hêzeke leşkerî girtina dest, wê nêzîkatiyeke pir teng be. Weke encama van hemûyan wê li gel me gerîla mezin bibe bidome. Gel di asteke girîng de bandor bûye, wê hîn zêdetir bandor bibe. Heta wê ber bi Tirkiyê ve çûyîn jî çêbibe. Bi mîsogerî têkiliya xwe bi bê asayîşbûnê re nîne; berevajî hêza asayîş û emniyetê ye. Niha ger ew nebe, li Kurdistanê wê ji berê zêdetir pevçûn rû bide. Hebûna gerîla, hîn ji niha ve pêşiya gelek pevçûn, dozên xwînê û tawanan girtiye. Yanî heta ji bo îstîqrareke civakî û hiqûqî gerîla hêzeke pir girînge. Dibe hikûmet bi xwe vê qebûl bike, bibîne. Dozên hiqûqî bi qasî bêjin nîne kêm bûye. Gelek pirsgirêkên civakî dahûrandiye. Di vê

mijarê de bandora wê heye. Ev, vê daye nîşan: Saziyeke wê di dema pêş de jî bandora wê li ser jiyana civakî û hiqûqî jî çêbibe. Ji nû de vesazkirin jî ji vê hêlê ve girîngiyeke mezin ferz dike.

Bi kinahî tişta dixwazim bêjim, divê teng lê neyê temaşekirin. Çi ji hêla demokratîkbûnê ve be, çi ji hêla emniyetê ve û çi ji hêla îstîqrarê ve be, erkên ku gerîla bicî bêne hene. Em ê baldariyeke mezin li hember vê bidin nîşan. Ji ber vê, min bi awayeke pir kin perwerde, rêxistin û mezinbûna wê vekir. Lê hinek bi îsrar dipirsin dibêjin; "*ji çiya daketin wê çawa bibe, pirsgirêka yên li çiya çiye*?" Pirsgirêka yên li çiya perwerdeyek baş, rêxistinbûnek baş û mezinbûne. Ev prensîbên çawanin. Ji derveyî vê ti pirsgirêkeke din yê wan nîne. Berevajî, di çareserkirina pirsgirêkan de hêzeke mezin yê moralê ne.

– Başe dema artêşbûn çêbû, di cewher de wê heman fonksiyona we diyar kirî bibîne, lê wê di şekil de çi cudahî hebe?

---.: Hinek dibêjîn artêşa gel. Em vê artêşê, wisa weke artêşên qilasîk û tenê weke hêzeke nîşandanê nagirin. Lê bi mîsogerî wê dernekeve ji derveyî çarçoveya siyasî û rewşeke dij vê. Girêdayî berjewendiyên gel di nav siyasetan de ye. Di pratîkê de ne hêzeke li ser gele, hêzeke bi wê re di nav hev de ye. Di hilberînê de ne qute û ne hêzeke bi ser wê re ye, hêzeke bi wê re di nav hev de ye. Yanî di wateyek de, arastî artêşa derbazkirina artêşê ye. Yanî di wateyekê de, ya rast artêşa derbaskirina artêşeke. Dibêjin ku di sosyalîzmê de bêdewletbûn destpê dike, di artêşbûna me de jî bê artêşbûn destpê dike. Gelek cidiyetên artêşê ji holê radibe. Ev, di wateyek de nêzîkatiya kevneşopî ya artêşa heyî binpêkirine. Ti artêşeke cidî (di wateya burjuva û feodal de dibêjim), wisa pevxistî nabe. Feraseta me, elternatîfbûnek ji artêşbûna qlasîk re û helwesteke wê derbaz dike. Demokrasiyeke pir berfireh heye. Bi dilxwazî esase. Yanî ji bo dixwaze herkes di navavî karî de ye. Disiplîneke bizorî nîne.

– Yanî bervajiyê artêşa qilasîk û cewherê wê ye? Ne yê ji derveyî civakê, yê li ser civakê û yê biyanîyê wê, yê di bin fermana wê de, badek û pratîkeke her ku diçe xwe jî tine dike. Yanî ji aliyê teşe û cewher ve berevajî artêşa klasîke. Ji derveyî civakê û di ser de, ne ya ku jê re bêgane dibe, di fermana wê de û her ku diçe pratîk û pevxistineke xwe tine dike.

---.: Bêguman. Em bi tundî li hember feraseta him di avabûna siyasî ya em pêk bênin, him jî avaniya artêşê de, ya dibêje; "*heza siyasî bixe destê xwe, di nava avanî û civakê de cuda birokrat avabike*". PKK di vê mijarê de jî şereke bihêz daye. Fermandarekî artêşê, dema ku pêwîst kir hate serûbinkirin pergaleke wê tenê lêşkerekî xwe jî li gel xwe nebîne em pêş dixin. A rastî kesek dikare çend kesan bixapîne. Ji ber vê nebûna hêzek li ser civakê û biyaniyê siyasetê nebûn pir girînge. Bawerim me vê pir pêş ve biriye. Bi şêwayê axatiyê şer neveguherîna saziyekê pir girînge. Weke saziyeke demokratîk pêşxistin û dîsa weke amûreke artêşa qilasîk ber bi tinebûnê ve birin jî girîng dibînin.

– Dikare bê gotin ku we ev referansên bingehîn ên di daxuyaniyên xwe de, mînak sekna xwe ya sosyalîstî ji rexneyên biyanîbûna ji Komina Parîsê, ji diyardeya anîna ser erk û paşvekişandinê girtibe?

---.: Ne pêwîste gotin bi gotin bê girtin. Lê di cewher de heman rewş tên jiyîn. Dibe mercên Kurdistanê yên şênber hinek cuda bin. Lê ev hêza milîtan, pir bi wate weke saziyeke şoreşê pêşdikeve. Mînak, ji her çîn û tebeqeya mirov, bi taybet jî jin wisa çek girtina dest, bûyereke mezin ya demokratbûnê ye. Ti şoreşê evqas çek nedaye destê ti jinê. Çek girtina destê xwe, tê wateya hêza xwe dîtine. Du bizin nedixistin bin emrê gundiyek ji rêzê. Lê niha gelek ji wan çek girtine destê xwe û heta gelek fermanderê komîn, taxim û bi rayeyên di aqilê wan re derbaz nebûyî digerin. Ev, derfeteke mezin ya bilindbûnê dide wan. Ev, dibe demokratîkbûna xêzaniya Kurd. Niha heke bê dîqatkirin, di vê wateyê de di me de artêşbûn, bingêheke mezin yê demokratbûnê ye. Lê ev bi pevçûn dimeşe. Axatî peytandina xwe li artêşê jî kiriye. Lê li hember vê jî gelek xebatên bihêz dimeşînim heye. Yanî tedbîrên min yên hemû şêwayên hêmanan bi erdê re bike yek û pê henase nede girtin heye. Îdayên min yên jixwe bawer ku dibêje; "*yên di Komûna Parîsê de nehatî biserxistin, yê di şoreşa Sovyetê de nehatî serxistin çima bi ser nexim*" hene.  Ev, girêdana xwe bi feraseteke şoreşê ya domdar û dînamîk re heye. Yek jî ji vê hêlê ve ev hêza me ya şoreşê lîkolînkirin girînge. Bûyereke tenê bi awayê pevçûn û agirbestan nîne. Ev, aliyeke sînordar yê

meselê ye. Çarçoveya rastî bi awayê min gotiye û wisa diyar dibe wê ji nîşkê ve pêşbikeve.

"*Pirsgirêka jinê pirsgirêka bingehîn ya şoreşê ye*."

– Hema li vir, em derbazî nava tevkariya pêvajoya artêş û azadiya artêşbûnê ya mijara azadiya Kongreya Jin û azadiya jinan a li van qadan bibin. Yanî Kongreya Jinê a Netewî ya hewl tê dayîn bê komkirin…

---.: Kongreya Jinê li gel hinek wateyên sembolîk, me xebatên jinê li gel xwe xist pêvajoyeke girîng ya pêşkeftinan. A rastî me, li gorî hinan dest bi pêvajoyên pir xeternak kiriye. Min pêvajoyeke azadiya jinê wisa derxist holê ku, nediyare mesele ber bi kî derê ve here! Gaveke azadbûnê hat avêtin; lê wê ev li kî derê xilas bibe? Her kes vê dibêje: "*Wê di nava ev kar de zewac çawa bibe, têkiliyên du kesî çawa bibe*?" Pirsgirêkên mîna çiyayan derketiye… Û me tenê navaroka wê kurkiriye; me got divê jin wisa azad bibe, nêzîkatiyên zilam pêşveçûnek wisa raber bike. Hûn ê têkiliyên nû û kur çawa pêşbixin? Yan têkiliyên pir riyakar pêşdikevin, (lewra ev hema tê rewşa darizînê) yan jî nêzîkatiyên pir înkarok tên dîtin. Bikurtî niha veguherî pirsgirêkek pir baş. Yanî pirsgirêka di hemêza civakê de, niha di şênberiya PKK'ê de gihişt îfadeyeke mezin, anî rewşa pirsgirêkê û ber bi riyên çareserkirinên girîng ve bir.

Dibe hûn dixwînin jî; hinek hewldanên me yên cuda yên şoreşan anîna rewşa şoreşa jinê heye. Yanî şoreşa netewî veguherandina şoreşa civakî, şoreşa civakî jî veguherandina şoreşa jinê yan jî serdeçûneke me ya di mijara rizgarkirina jinê de anîna rewşa şoreşek girîng. Ev girînge. Di gelek şoreşan de, heta ev di şoreşên sosyalîst de jî, nehatiye aqilê kesî yan jî hiştine piştî şoreşê. Çend jin derketine; li ser evînê, li ser azadiya jinê yek-du tişt gotiye. Lê li gorî min, zilamê wê hinek feodale, hevsera wî jî burjiwaye. Naxwazim darizênim lê, di wê baweriyê de me ku gelek serokên sosyalîst jî, di vê mijarê de di asteke girîng de burjuvatî, feodalîzm û kapitalîzmê jiyan kiriye. Li gorî min îhtîmala hebûna xetayek li pêşe. Ez dîsa, di wateya suçdarkirin yan jî biçûkxistinê de nabêjim, lê kîjan serokî bigirî dest bigire, di mijara jinê de bi kevneşopiyên feodal re, hinek jî bi makyajwariya kapitalîzmê pêşxistî û hinek jî cilaya sosyalîst dikişîne re qaşo

îdaya wan ya ji pirsgirêkê re çareserî anîn heye. Ya ez dikim hinek cuda ye.

Min vê pir cuda girt dest. Di vê mijarê de, herî dawî min ji bo bîranîna dayîka xwe nirxandinek kir; hûn dikarin bi awayeke giştî ji Serxwebûn bigirin. Têkoşîneke min hîn ji zarokatî ve heye; min pozîsyona dayîka xwe weke pozîsyoneke dayîksalarî nirxandibû. Yek jî pozîsyoneke xwe di nav malbatê de pir bihêz didît. Nakokiyên me yên malbatê çêbûn. Piştre, di damezirandina partiya me de têkiliyên me bi jinek din re çêbibû. Bi wê re jî şereke me pir dijwar çêbû. Nêzîkatiyên cuda yên siyasî, civakî heta zayendîtiyê, şereke pêvçûnên cuda kirina rojev bû. Piştre jinê, ber bi qadeke berfireh ya faliyetên peywir, perwerde, rêxistin û kişandina nava şer hebû. Û niha devera em gihiştinê jî, hewl didin ji pirsa bi jinê re çawa bê jiyîn bidin. Dibe ev neyê aqilê yên li Tirkiyê. Dibên bi jinê re çawa bê jiyîn, diyare; “*dê wisa bê girêdan, wisa destgirtî bibe, wisa bizewice û ev kar wisa xilas bibe*”. Em pirsgirêkê wisa erzan nabînin. Îda nakim ku bi destê hev girtinek û macîkirinek re ev pirsgirêk hatiye çareserkirin. Hûn dizanin niha temenê min ber bi çilûpêncê ve diçe. Divê têkiliyê de hîn jî şev-roj li ser nêzîkatî û teşeyên nû difikirim. Li gorî min civak ji ber vê pir tişt winda kiriye. Jin winda bûye. Watedariya têkilî û balkêşiya wê pûç bûye. Her wiha windakirina jinê, wekheviya di têkiliyên jinê de û windakirina azadiyê, di civakê de rê li ber serdestiya zilam, zextê û kedxwariyê vekiriye. Vê jî rê ji şeran re vekiriye. Ev rewş civakê bi zincîrkirinê ve dibê, bi pirsgirêkên hawirdor ên nayên jiyîn ku girêdayî kapîtalîst-emperyalîstê ne û bi rêjeya nifş re têne astek xeniqandinê. Wiha pirsgirêka jinê bi van ve girêdaye. Li gorî me pirsgirêka şoreşê ya bingehîne. Mesele wisa ji pirsgirêka têkiliyeke cinsî xilasbûn û têkiliyên fehma pêşxistin nîne; em wisa teng nêz nabin. Pêşiya pirsgirêkê vekirî hiştin, li ser bingehên dîrokî girtina dest, bi hemû çîn û tebeqeyên civakê, girêdana wê bi rastiyên civakî-çandî re danin, heta pêwendiya wê bi exlaq, şer, aşitiyê re danin, girêdana wê bi têgiha xweşikbûn-nexweşikbûnê re danin û hewl didin girêdana wê ya di navbera jiyana bê qebûlkirin û neyê qebûlkirin de deynin. Mijar evqas berfireh tê destgirtin. Lê bi temamî ji bin dernakevin. Gundiyê me yê ji Colemêrgê wê ji pirsgirêkên evqas tevlîhev re çawa çareserî bêne? Ciwanê nû yê

çend pirtûkan xwendî, wê pirsgirêkê çawa fam bike? Lewra ev jî pirsgirêkê hîn girantir dike.

Tevî vê, em di vê de bi îdane: Civaka Kurdistanê civakeke nêzî dayîksalariyê ye; dibe, ev bibe çareseriyeke bingehîn jî. Di vê mijarê de hêviyên xwe muhafeza dikin. Şoreşa me jî şoreşeke pir radîqale. Her wiha , rastiya civaka nêzî dayîksalariyê ya şoreşeke bingehîn jiyan dike, dikare ji bo pirsgirêka çareseriya jinê derketineke bingehîn bike. Divê em ev şans binpê nekin, nehilweşînin. Nîqaşên vê hene.

Niha hema li her derê xebatên pir zêde yên bejdarbûna jinan heye. Parçeyê vê yê herî girîng jî Kongreya Netewî ya Jinê ye. Hewl tê dayîn bi şeşsed jinên çekdar ve xebata kongra jinê pêk bênin. Wiha me got pêwîste heya dawî nîqaşên azad bên kirin. Heta bêyî ku bi ti zilam, malbat, sazî û kesî ve girêdayî bimînin, çi dibêjin bila bêjîn û dixwazin çawa jiyan bikin bila jiyan bikin! Bila xiyanet li şoreşê nekin, bila li azadiya xwe xiyanet nekin, lê li ser rastiyê, li ser têkiliyên rast çi gotinên azad hebin bila bêjin, biryar çibe bila ew biryar bigirin, helwest çibe bila bikevin nava wan helwestan. Sînordarbûnek tenê heye: Îxaneta li cewherê jinê, îxaneta li şoreşê ye; heke nekevin nava vê, em sînorên azadiyê pir vekirî dihêlin. Ev, pêşkeftineke pir bi îdaye. Bandora wê hîn bi awayeke sînordar derketiye holê. Pir kêm li Tirkiyê hatiye peytandin. Ji niha şûnde dibe ji eniya jin jî pêşkeftinên bi bandor derkeve holê. Ev rewş tenê ne hêzên rizgariya netewî, wê ji nêz ve raya Tirk ya demokratîk jî eleqedar bike û wê Tirkiyê jî hinek bigire bin bandora xwe.

– Hinek têgihên we bikar anî dişibin serdestiya zilam, îqtîdara wî û têgihên femînîzmê. Hûn femînîzmê çawa fam dikin?

---.: Nêzîkatiyên min ji yên femînîstan hîn kurtire. Ez di nêzîkatiyên femînîstan de tengbûn dibînim. Ez wan bi awayeke giştî neheq suçdar nakim û nabêjim hewldanên wan ne di cî de ye, lê pirsgirêkê tenê weke pirsgirêka jinê dîtin jî teng dibînim. Pirsgirêka jinê, pirsgirêkeke cidî ya civakî, çandî, siyasî û heta leşkeriye. Mesela, ti jinek negirtina nav artêşê yan jî pir kêm, bi qasî xeml girtin ger ne pirsgirêkeke leşkerî be çiye? Li siyasetê temaşe bikin; hema hema jinê di saziyên siyasî de cî negirtiye. Ger ev ne pirsgirêkeke siyasî be çiye? Heman rewş ji bo saziyên civakî-çandî jî derbazdare. Kesîmeke nîvê civakê, yê weke

parçeyeke jiyanê tê teheyûlkirin, ger ji civakeke zayend evqas bê vederkirin, gelo wê ew civak çiqas bi tendûrist be? Ger evqas ji hêza biryar, hêza çalekiyê derbikeve, gelo wê di wê saziyê de xêr bimîne?

Bêjim, di vê mijarê de ez zilam di rewşeke şepirze de dibînim. Rewşa we hemûyan gelek evdalokî dibînim. Ez, jinên fêrî jintiya erzan bûne pir evdalî dibînim. Bi rastî jî di vê mijarê de pîvanên min yên xweser hene. Hîn jî xwe na ecibînim. Têkiliyên hûn jiyan dikin mirov tengav dikin. Nêzîkatiyên heyî pir kirêt dibînim. Ev di min de peytandina xwe li bijarteya şêwaza exlaqî jî daye. A rastî heke femînîst bikarin di mijara balkişandina ser pirsgirêkê de bi ser bikevin, li ber xwe bidin bila bimeşînin, lê nebawerim ew jî ji xefika zilam rizgar bûne. Û piştî demeke kin şûnde dihesibênim ku teslîmbûna wan ya ji bo zilam çêbibe. Nêzîkatiyên nerastînî yên ji pirsgirêkê re wê bi teslîmiyetê bi encam bibe. Kêfa min ji jina teslîmê zilam bûyî re nayê. Tevî ku ez zilamekim jî vê dibêjim, tevî zilameke biqûtretim vê dibêjim. Ji rastiya jina teslîmê zilam bûyî nefret dikim. Pîvaneke herî zêde jê nefret dikim jî, fehlên zilam yên zilamtiyê ne. Ev hinek dîktatortî li bîr dixe; bi tundî li hemberim.

Zilamtiya sexte, li gorî min sedema gelek xirabiyane. Heman tişt ji bo taybetmendiyên jintiyê jî derbazdare. Ji gelek taybetmendiyên jiniktiya heyî nefret dikim. Ger ji min bipirsî, ez ê bêjim bila wêje hinek bi van mijaran re mijûl bibe. Taybetmendiyên jiniktî yên sexte çine? Wêjevanek vê cudahiyê pêş dixe? Ger wêjevanek bihatiba minê vê nîqaşê kûr pêşxistiba. Karekterê taybetmendiyên zilamtî nexweşike. Hûn vê tesewir dikin? Dikarin bi awayeke wêjeyî bilêv bikin? Têkiliyên nexweşik dikin kîjanin; hûn dikarin van cudahiyan pêşbixin? Têkiliyên xweşik dike, yanî têkiliyên divê bên mezinkirin kîjanin; ev cudahî kariye bê pêşxistin? Na! Her wiha tevî li ser têkiliyên jin-zilam gelek tişt hatine gotin jî, heta niha di derbarê ev xususên girîng de ti cudahiyek nehatiye xêzkirin. Di vê wateyê de nebawerim ku wêje fonksiyona xwe girtibe. Dildariyeke mezin ya wêje mijara gotinê ye. Heta li gorî min wêjeya nexweşikiyê jî heye. Yanî ji bo bidestxistina wê mesefeyek pir zêde heye. Vê jî bêjim; min dem bi dem got, civaka Kurdistanê jî hinek kiriye jinek. Ji wê jî wêdetir ev pirsgirêkeke gerdûniye, belkî jî

pirsgirêkeke mirovahî ya di qirnê 21'an de herî pê re mijûl bibeye. Hawirdore, jine; yek jî ev bi hev ve girêdayîne. Dibe çend sedsal jî wisa derbaz bibe. Lê, qet nebe jî hinek hêmanên pirsgirêkê yên bingehîn ku me danîna holê weke nêzîkatiyeke bi wate dibînim.

"*Xweşikbûn û heskirin nikare bike milk*".

– Diyare hûn di vê mijarê de pir lêhûr bûne û têr tejîne. Başe di jiyana partiyê de şêwaza vê ya jiyankirinê çawa dibe? Pêxweşbûn, evîn, heskirin…

---.: Pratîka tê jiyîn zehmetir derbaz dibe. Mesela di xwe de, riya azadbûnê vedikim, lê hîn jî di nava lêgerîna ku kîjan têkilî bin bikeve, kîjan bê bilindkirin de me. Di vê mijarê de, ji nêzîkatiyên muhefizekar dûr dikevim. Gelikan, jina herî bijare yan jî zilamê herî bijare, hema dibe têkiliyek bi awayê *"têkiliyek hov*" bikin mijara suçdarkirinê. Ger ez mijarê dîqat nekim, heta dibe jiyana min ya polîtîk bixin nava xeteriyeke mezin. Yanî em dikarin, vekirîbûnên azadî, evîn, hezkirin û nêzîkatiyên pratîkî pir pêş bixin, lê civak ji vê re nevekiriye, avanî ji vê re nevekiriye, yek ji hûn nevekirine. Ji we re bêjim; ez ê di têkiliyên xwe de hêzê bidim rûnişkandin, xweşikbûnê bidim rûnişkandin, azadiyê bidim rûnişkandin û ya herî baş bidim rûnişkandin. Dema hat rûnişkandin şûnde divê têkilî pir xweşik bê jiyîn. Û ya herî bihêz, yê herî xwe xweşik dike, yê dibêjin xwe herî ecibandiye û xwe aniye rewşa pîvanên xweşikbûna ku qal dikin, bila xwe bi awayeke bê sînor deyne holê, hez bike, xwe bide hezkirin! Jixwe bingehê hezkirinê jî wisaye. Bila ev derkeve holê; li gorî min ev, dikare civakê hîn zêdetir pêş bixe û demokratîktir bike. Gotinê bi wateya kaptalîzmê jî bêjim, dikare bixe nava rekabeteke mezin. A rastî cewherê meseleyê demokrasiya sosyalîste û ev jî di mijara jinê de nîne. Jin hinek pêş dikeve, hewl dide xwe bazar bike; zilam hinek pêşdikeve hewl dide bibe dîktator. Ez bi van rewşan re di nava têkoşînê de me.

Jixwe di nava avaniya rêxistinê de jî nêzîkatiyên teng, kevneşop, têkiliyên yoz yan jî dema derfet dît xistin û nexweşikirin pir li pêşe. Vê pir vekirî diyar bikim. Û rojane jî dişopînim. Dibêjim ev têkilî xweşike, ev têkilî nexweşike, ev têkilî dikare wisa bê jiyîn û ev têkîlî wisa nayê jiyîn. Jiyana min hinek wisa derbaz bûye. Bawerim jiyaneke bi wateye û bangî

herkesî jî dikim ku hinek din mijûl bibin û têkoşîn bikin. A rastî bang dikim ku hinek din fehmdar bin, erzan neyê jiyîn û erzan nedin jiyîn. Dîsa bang dikim ku fehma bin. Bang dikim ku pirsgirêkê mîna pirsgirêkeke cinsî ya ji rêzê nebînin, dîsa tenê weke pirsgirêkeke rêxistinê nebînin, bizanin ku ev kar hîn berfirehtirin, dîsa bi texmînkirineke erzan lihevkirin û hema bi awayê redkirin nenirxînin. Ji ber di rewşek pir biêş û ezyed danê de ye. Ji ber vê dîsa bang dikim ku têgihiştin, pirsgirêkê ji zayendîtiyê wêdetir bigirin dest, kes di rewşeke rêzdar û hezkirin de bigirin dest, hezkirin û bi rastî şoreşê di kesayeta xwe de dana rûnişkandin bi wê ve girêdayî mayîn, hûrbijêr bibin û di vê mijarê de li ser ajoyên xwe serwer bin. Bi vî rengî pêşniyar dikim ku cîhaneke xweşik pêşbixin, ji bo wê jî hewldanên xwe zêde bikin.

– Gerîlayên jin-zilam yên li çiya xwedî şansê jiyankirina ev tiştên we vegotine?

---.: Pir lewaze. Bi awayeke objektîf ji azadiyê re vekirîne, lê azadiyê di vê qonaxê de û bi vê rewşê ve tamkirina wan pir zehmete. Ev pir ked dixwaze, têkoşîn dixwaze. Yanî di cihek de di şoreşê de şoreş dixwaze. Bi rewşên xwe yên heyî jiyankirina wan ya azadiyê pir zehmete û ji vê jî loma nakim. Ev kareke têkoşînkirinêye, şoreş jî karê şoreşê ye. Yanî tu yê şoreşa têkiliyan, şoreşa hezkirinê, şoreşa rêzdariyê û şoreşa lebatê çêkî. Ev jî ked dixwaze, felsefe dixwaze, rêxistin dixwaze, têkoşîn dixwaze. Di vê mijarê de hesasim û bi kinahî bi ya rast dikim jî bawerim.

– Aliyeke we yê bi vî rengî tê dîtin: Hûn mijarên pir tabû jî dinivîsin, xêz dikin. Ev mijar, ne ji bo pergalê, ji bo sosyalîstan jî hîn tabûyeke. Hûn dikarin bi mîlîtanên rêxistin, qadro, gerîla re ji derveyî nivîsandinên teorîk van pirsgirêkan bi awayekî kesî yan jî komî nîqaş bikin?

---.: Hewl didim navenda vê amade bikim. Heke dîqat bikin bi gelek jinan re jî nîqaş dikim. Asteke baş yê van nîqaşan rê li ber bilindbûnê vekiriye. Gelek jinên binirx jî derketine holê. Niha bêjîm, dibe raya giştî û bi taybet jî kesîmê şoreşger hinek meraq bikin; ez di hezkirinê de zêde sînor nasnakim. Ez şervanê hezkirinê me. Ez cudahiya jina vê, hezkiriyê vê jî zêde cidî nagirim. Bêguman pêwîste ji vê encameke şaş neyê derxistin…

– Yanî hûn milk û tabû qebûl nakin?

---.: Qebûl nakim. Xweşikbûn nayê mûlkirin, hezkirin nayê mûlkirin. Ev sloxanên pir bi îdane. Hezkirin, him felsefe, him siyasî, him rêxistinî, him jî di warê pratîka şer de, li gorî min nîrxeke ji ya herî haq kirî re biherikê ye. Me di radeya azadiyê de ji hezkirinê re cî vekir. Me wê mezin kir û me gihiştina wê pîroz dît. Milên vê yên felsefî hene. Ez van hemû vale nabêjim. Gelek aliyên wê yên cidî yên rêxistinî-leşkerî hene. Taybetmendiyeke min din jî, li hemberî meseleyan kevneşop nebûyîne. Yanî ez nabêjim nêzîkatî wisa - bi vî rengîne, ezê jî milek li vê zêde bikim wê xilas bibe- biçe. Na, ez pir kur dikevim pey pirsgirêkan. Ya weke mirov min eleqedar dike, bêguman milê jinê ye. Di mijara jinê de ez ê weke we nebim. Ez xwe mezin jî nakim, xwe nagirim jî. Dibêjin "*girtina jinê*;" zilam jî hatiye sergirtin. Ji ber sedema ez zilameke azadim ez xwe nagirim û vekirîme. Weke min nexwastiye ti jinê biradim divê ti jinek jî min negire. Ev gotinên pir bi îdane. Û bi îdame jî. Ya rastî ferasetên li hember min pirin. Jin zêde nevebûne. Dibe li Tirkiyê hinek xwe pir azad hîs bikin, tîpên wisa pêşdikevin. Weke min gotî, bi feraset nêzî vê mijarê bibin. Hinek din azadiya nîqaşkirinê bidin naskirin. Helwestan jî wisa erzan nekin, nexin nava têrbûnên erzan. Bi mezinbûna jinê bawer bin, lê ketina wê ya nava nexweşiktiyê jî bibînin. Ji jinê hez bikin, lê bizanin hezkirin çawaye û girêdayî çiye. Di vê mijarê de li hember hemû nêzîkatiyên erzan nêzîkatiyên rexneker raber bikin û weke min gotî, hev dîtin, lihevkirin û weke meseleya zewacê jî nebînin. Bi mîsogerî bêrêziyê jî nekin, bi ti awayî serî li zordariyê jî nedin. Xwe bispêrin hêza xwe ya madî, hêza xwe ya otorîter wisa mirovan bandor bikin. Di van mijaran hemû de heke her kes tişta dikeve ser milê wê bike, wê demê afirandina têkiliyên pir bi wate û cîhaneke xweşikbûn tê de bejn bide bidestxistin pêkane.

– Ya rastî pirsgirêka jinê, di heman demê de dibe pirsgirêka azadiya zilam jî, ne wisa?

---.: Li gorî min, herî zêde pirsgirêkeke zilame. Heman weke di têkiliyên serdest-bindest de bûyî.

*"Nêzîkatiyeke me yê şoreşî yê bi îda heye".*

– Hinek jî li rewşa mirovahî û di nava wê de li rewşa sosyalîzmê temaşe bikin. PKK di bernameya xwe de dibêje ez sosyalîstim. Li gorî we di cîhanê de ji rewşa ku sosyalîzm di nav

de ye û weke sosyalîstek divê ji dîrokê dersek çawa bê derxistin? Ev ji bo vê jî pêwîste; li ser pêşkeftinên dawî li Tirkiyê rexneyên mîna, “*wiha dev ji sosyalîsmê jî tê berdan, devera ku neteweperestî bigihiyê vire*”tên kirin.

---.: Sosyalîstên Tirk vê dibêjin? Ey yarebî!.. Diyar dikim ez rumeta ku niha ez ji vê îdaya xwe ya bi awayeke hîn bihêztir pêşve dibim jiyan dikim: Li gorî pêşveçûna ev tevgera me şoreş jî xilas nebûye, sosyalîzm jî xilas nebûye; berevajî di cihê dibêjin xilas bûye me derketineke mezin kir û em dikarin di vê hêlê de pesnê xwe jî bidin. Xetimandinên mezin yên sosyalîzma reel li ber çavê me ye û di demeke watedar de ku tevgera me pêşkeftiye şikestina wê, me xemgîn nekiriye, me ber bi kêfxweşî û mafdarbûna serkeftina me ve biriye. Mafdarbûna serkeftina me bidest xistî derketiye holê. Bi mîsogerî divê diyar bikim ku em di merciya sosyalîstbûnê de ne. Di salên 1970’î de tevî me feraseta sosyalîzmê ya serenser dizanî jî, em girêdayî utopyeya sosyalîzmê bûn; niha em xwe hîn rastîbîn û bihêz hîs dikin.

Pergala li Tirkiyê, kapitalîzmê, li gorî gotina dawî hewl didin bazarê weke serkeftina kaptalîzmê bidin daqurtandin. Ez berpirsyarê tevgereke bi pergalê re şer dikim. Yanî bi temamî red nakim, nabêjim kaptalîzm mir, wê qet nikaribe jiyan bike, lê, divê bêjim ku serdestiya me jî pir diyare. Li pişt wî cihan heye, li pişt min jî feraseta min ya mirovî hebû. Ya serkeft, feraseta min ya mirovahiyê bû. Rejîma ku hemû cîhana paşverû destek dikir serneket. Serkeftina min li vir bidest xistî, serkeftina di azweriya kes de ye. Sosyalîzma di Sovyetê de hilweşayî jî di nav de, Avrupaya wê, Emerîkaya wê û paşverûya Rojhilata Navîn jî di nav de, hêzeke xwedî pirşgiriya hêza hemû statukoparêz, başverû û berpirsyarê pirsgirêkên hemû mirovahiyêye ya li beramberî me. Û weke di 1992’an de bûyî, koalîsyona hûndirîn, koalîsyona derve temam bû û bi rastî jî PKK bi awayeke zanebûn “*weke rêxistineke terorîst*” hat qebûlkirin. Ev biryar hat girtin û fermana hikûm jî ji hêla NATO yê ve hat dayîn. Aliyeke din yê Şerê Başûr jî ev e. Generalê NATO got: “*PKK êdî nayê hewandin*” û şer destpêkir. Lê me li ber xwe da. Sosyalîzmê ne bi awayeke giştî, weke şêwazeke jiyanê dijîn, pêşdixin. Em hatine ber deriyên Tirkiyê. Ev di cihek de dişibe vê: Çawa ku Tirkiyê demek xwe hilpesart ber deriyên Bizansan, me jî bi sifata sosyalîzme xwe

hilpesartiye ber deriyê kapitalîzma heyî û didizin. Nêzîkatiyeke me şoreşî yê wisa bi îda heye.

Niha, di sosyalîzmê de demokrasî çiye? Li gorî min demokrasiya herî pêşkeftiye. Demokrasiyeke hemû cudahiyên mirov azadbûyiye û di asteke hîn jortir de çareserî bilind dibe ye. Ne rejîmeke zextê ye, divê wisa neyê şîrovekirin. Li ser komên din xwe sipartina serweriyê, nîqaşeke kême. Dibe li ser yên bêmaf, paşverû, çînên antî-demokratîk yan jî kesîmên netewî zext çêbibe; ev aliyeke meselêye, belkî jî milekê wê yê pir bisînore. Sosyalîzm navê pergaleke ji bo nîqaşeke berfireh ya ji bo pirsgirêkên sedî salî yê mirovahî, vebijêrkên pir hêldar, kesayet, rêxistinbûn û helwest raber dike. Ya di ezmûnên Sovyetê de hatî afirandin, li ser van taybetmendiyan hemû rengek reş yan jî spî şikandin, bi şêwazeke "*demokrasiya proleter ev e*" bû. Û ev, xeta bû. Li ser çînên kevin zext, li ser girseya gelê xwe jî betonkirin… Ya emperyalîzm dorpêç kiriye, bermahiyên kaptalîzmê ne. A rastî dewlet dîwareke, betone, beton belav kir. Ji sedî yêk li beramberî derve, ji sedî notûneh li ser gel ava bû. Piştre sosretek derket holê û behetî man. Hîn jî jevketineke kes bawer nekirî tê jiyîn. Li gorî min aliyeke vê neyê famkirin jî nîne. Ev di sosyalîzmê de nabe. Me sosyalîzm weke îdeolojiya azadbûnê girt; tenê ne ji bo ji zextan rizgar bibin, me weke jîndarkirina behreyên me yên hatine çewsandin binav kir. Henase girtin, şoreş, mesela di mijara jinê de jî nêzîkatiya xwe ya herî azad derxistina holê, ya herî xweşik bidest xistin yan jî xweşikbûna libata xwe danîna holê ye. Ji van hemû re demokrasî pêwîs dike. Feraseteke rekabetê ya demokrasiya sosyalîst jî heye. Wê bikeve nava rekabetê jî. Lê çi hat kirin? Got: "*Bêdeng be tercîhek neke*." Civakeke ji îradeyê hatiye birîn, îradeyên hatine çikîn, rihên mirî û ji giyanên mirî ava bûye!

– Weke tişteke "bûye mijara romana Gogol a bi navê "giyanên mirî" ku tiştan digirin û difiroşin."

---.: Ha wisa? Min nexwend. Belê giyanên mirî, civakek ji giyanên mirî ava bûyî. Demokrasiyeke mirî û encam. Ecêbe, ne wisa? Ev sosyalîzm jihev dikeve lê dengek dernakeve. Heke giyan wisa bimirin… Û rastî jî tişta tê jiyîn, rewşek dişibe vê ye. Di vê mijarê de nêzîkatiyên me pir cuda ne. Em sosyalîzmê, weke rejîmek herî zêde li ser tê axaftin, çareserî diafirîne, bêguman

weke disiplînek navxweyî, lê mixabin jêhatiyên mirov weke azadiyek sînornenas dide pêş dinirxînin. Yanî rewşeke me kaptalîzmê jî wisa bi hêza şûr rakirin nîne. Li gorî min riya herî bandorker ya derbazkirina kaptalîzmê, di afirandina mirovê sosyalîst re derbaz dibe. Û mirovê sosyalîst afirandin jî, ji avakirina dewletek zehmetire. Ev mirov nehatiye afirandin. Berevajî, vê mirov aniye rewşa dilrenciyê. Tu ev mirov biafirîne, tu yê partiya sosyalîst ya herî mûkemel jî biafirînî û tu yê dewletê jî biafirênî. Wê demê peyamên kaptalîzmê yên pêşve bibe jî namîne. Jixwe gerdûnê jî veguherandiye sergoyê û niha ne di rewşeke îdayan pêş bixe de ne. Lê heke bêjî wê sosyalîzmek wisa çawa çêbibe, ev xewna sosyalîzmê ya berê ye û neçare pêk bêne. Dibe di ceribandinek, du cerabandin û sê cerîbandinan de neçûbe serkeftinê; lê ji vê zêdetir jî alternatîfeke din yê mirovî nîne. Vebijarga dibêjim sosyalîst, bi rastî jî heke mirov dixwaze weke mirov jiyan bike yêk alternatîfe.

Tîpê ku ez şev-roj di jiyana xwe de pê re mijûl dibûn, tipê ji bo sosyalîzmê guncav bibeye. Bi rastî jî ji bo min pir girînge. Berê olan vê dikir, wiha çil sal çîle dihat kişandin. Heta rahîb hebûn, wiha ayetulah hene. Ev di cihek de bi avakirina eniya manevî re mijûl dibin û ez nirx didim van. Vê jî bêjim, ji wê jiyanê re jî rêzeke min pir mezin hebû. Sosyalîstan çikir? Xwe kirin depoya mezaxê. Di exlaq de sînor nasnekirin, di metaryalîzma çors de sînor nasnekirin û valetiyeke mezin ya maneviyetê û valetiya exlaq wan bir. Yek jî di ev eniya, eniya exlaqî-manevî de divê soz û çalekiya sosyalîzmê pêk were. Çima Îran evqas bihêze; divê ev bê fikirîn. Çima li ser sosyalîzma reel raserî pêşdikeve, heta di Sovyetê de jî çima ew şêweyên em paşverû dibînin pêşdikeve? Ji ber hinek qusurên sosyalîzma reel yên pir cidî hene ku ev pêşdikevin. Yan na sosyalîzm li wir şoreş çêkir û di destpêkê de jî pir bihêz bû. Lê piştre kêmaniyên xwe nedît, kêmbûnên xwe temam nekir. Bi birokratîk bû, bi tebeqe bû, rewşek ji kaptalîzmê hîn xiraptir li wir hat astek ku neyê qebûlkirin. Heta termê wê veguherî rewşa miriyeke ku kes nexwaze rake.

–We diyar kir ku demokrasiya sosyalîst nehatiye famkirin. Ma di vê de pêşxistina yek partî û yek zilamî, di nava partî û civakê de rista sazîkirina vê nebû?

---.: Ger ji min bipirsin, ji yek partîbûnê wêdetir, divê hinek partîbûn jî bê jiyîn. Partîbûnek mîna çiyan, dewletbûnek mîna çiyane. Û ev jî berevajiyê cewherê sosyalîzmê ye. Partîbûna di sosyalîzmê de, divê weke partîbûna di kaptalîzmê nebe. Dibe fêrkariya Lenîn ya partiyê bê rexnekirin. Ez ji partiyeke şoreşê fam dikim, ji partiyeke tund û otorîter ya şoreşê jî fam dikim, lê vê partiyê anîna rewşa ku di şoreşa Sovyet-ezmûnên wê de bûyî jî qet fam nakim. Partiyeke di dîkta hevpar de, veguherandina zext û terorê û ji derveyî wê hertişt anîna helwesteke ketûm jî fam nakim û vê jî weke nêzîkatî û jirêderketinek pir xeter bifikirim. Bawerim wisa hatiye windakirin. Taybetmendiyên Lenîn yên nîqaşker binavûdenge, di ramanên wî de zordarî nîne; darizandin, dîsa rewşeke bi dadgehan re hinek nîqaşan ji holê rakirin nîne. Sîxûrtî tiştek cuda ye. Azadiyeke mezin ya nîqaşkirin û grubûnê heye. Piştî gihişt serkeftinê şûnde, ne ku partî mezinkirin pir qala partî ji partîbûnê derxistin dike. Ji dêla bigihe partiyê û pirsgirêkê wisa deyne holê, li ser bêpartîbûnê disekine. Em dikarin ji vê re bêjîn demokrasiya belavbûyî.  Bê partî bûye, lê yekser rewşeke gelek taybetmendiyên cuda û cewazî bikarin xwe birêxistin bikin derketiye holê; dema behsa berfirehbûna demokrasiyê dikim, vê destnîşan dikim. Qala rewşeke herkes xwedî nêrîn û îradeye dikim. Hinek ji vê re dibêjin demokrasiya girse. Li gorî min teşeyek divê qet nebûya, ya tê jiyîn ezmûna Sovyetê ye. Di vê mijarê de kaptalîzm dîsa hinek tişt ji demokrasiyê fam dike, lê li gorî min pir tenge û divê ew jî bê derbazkirin.

Niha çi nav dikare li vê bê kirin? Hûn dikarin bêjin demokrasiya sosyalîst, dikarin bêjîn demokrasiya girse yê. Dîsa dikarin bêjin demokrasiya partiyan, demokrasiya hawirdor yan jî koman. Li gorî min, divê em demokrasiya partiyan jî derbaz bikin. Di dema derbazbûyî de gotineke Kaddafî hebû digot; “*demokrasiya qebîlan*”. Ev dibe, nabe; meseleyek cuda ye. Lê demokrasiya koman, hawirdor, cemaet ne rewşeke wisa piştçav bê kirin û basît bê girtine. Çima gelek partî bibin, lê pir cemaet çênebe? Li gorî min di vê mijarê de sosyalîzm ji kaptalîzmê bi îdîatire. Heke kaptalîzmê pir partînî afirandibe, wê sosyalîzm ji wê deh qet zêde bersiv biafirîne. Yan jî divê wisa bibe. Lê ev hemû nayên wateya anarşîzmê, nayê wateya demokrasî ne bijarteye, nayê wateya demokrasî ne otorîteyeke. Nîqaş dikare bê

kirin. Bila sosyalîzm wisa bimîne, dibe hûn ber dilê xwe bigirin, lê ez dibêjim ya li Tirkiyê tê jiyîn "*jiyana avzêmke*". Hûn hemû Tirkiyê li ser min tapo bikin jî, ez ê nexwazim wisa jiyan bikim. Ger ji min re bêjin, "ji bo li Tirkiyê bijî *tu yê vegerî, tu kî dera Îstambol, Enqere diecibênî*" ez ê bi vê rewşê ve ne ecibênim û nevegerim jî. Ez ê veguherînim, bênim rewşa ecibandinê, dibe wê demê bêm lê bijîm.

– Fonksiyon, disiplîn û îşleyîşên partiyên şoreşger yên ji şoreşgerbûnê tên hene. Bi awayeke din şoreşa siyasî, civakî û komelî nabe. Lê piştî şoreş çêbû şûnde ev organîzasyon, ji dewletê bê dewletbûnê, ji malbatê bê malbatbûnê, ji partîbûnê bê partîbûnê, bi kurtasî ji rewşek derbazî rewşa din nebûn…

---.: Li wir pêwîstî bi şoreşên nû heye. Mesela min di şoreşê de got şoreş. Heta niha di mijara jinê de jî pêwîstiya meşandina şoreşê dibînin. Qala şoreşek nakim, divê qala pêvajoya şoreşeke pir siftkirî bikin. Otorîtebûn di cihek de pêwîst dike, lê di cihek de jî dikare rewşeke pir xeter bigire. Yek rastiya biêş tê jiyîn jî ev e. Dema digihe asta ku bibe otorîte, deka em bêjin ji pirsgirêkekê re dibe bersiv. Lê wê wisa giştî dike ku, di qadeke divê qet ne otorîter be de vediguhere bûyerek tirsehêz. Divê ev bê dîtin. Li gorî min mirovê sosyalîst, mirovê bikaribe pêşiya vê bigireye. Otorîte çima û ji bo kî tê pêşxistin? Li hember çî û bi kîjan pêvajoyê ve girêdaye? Heke ew merc derbaz bûbin û li hember çibe hatibe çareserkirin, wê demê tu yê vê hema derbaz bikî. Lê di Sovyetê de çibû? Berevajî, pir bi tirsehêz ser de çûn û pergaleke dewletê hat afirandin. Bê exlaqên nayên naskirin û qestek nayê naskirin derket holê. Yanî ma li pêşiya vê nedikarî bê girtin? Li gorî min otorîteya pêşiya vê bigire otorîteya sosyalîste. Pratîka pêşiya vê bigere jî pratîka sosyalîst a şoreşêye û her tim pratîka şoreşê ye. Li gorî min di vê mijarê de sosyalîzm dikare pêşbixe. Yanî teşeya partiyê ya jibo demek pêwîst, weke pirştre jî bûyî meşandin ne qedere û ne sosyalîsbûyîne jî. Partî ava bûye û pîroze; lê pîrozbûna partiyê ancex bi tiştên pêk anî re wê bê pîvandin. Yan ne komake bê exlaqan, xwe bi sipartina vê rêxistine û li ser dewleta hatî avakirin serdestiyê ferz bike, bê exlaqiya herî mezine. Sucê ku li hember pîroziyê hatî kirin wê demê tê bê meydanê. Di vê mijarê de pêwîste hinek afirînêr be. Sosyalîst jî mirovê herî afirînere, mirovê her roj xwe di ber çav re

derbaz dikeye. Heke ayetullaha li Îranê vê dike, rahîbek her roj xwe li ber şîroveyan digere, çima sosyalîstek vê neke? Çima sosyalîstek bi qasî wan bi maneviyat nebe, girêdana bi nirxên exlaqî û demokratîk re nede nîşan? Li vir qilopilok heye, kêmbûn heye. Divê ev bê derbazkirin. Ez tenê bi aliyê teorîk yê bûyera me ya şoreşê re mijûl nabim, bi pratîka wê re jî pir zêde mijûl dibim. Dîsa divê hema û bi awayeke vekirî diyar bikim ku, pratîka min pir kêm bi şerê min yê dervere eleqedare; beşeke wê herî zêde şerê derxistina mirovê sosyalîste. Ez serokatiya xwe, di vê qonaxê de, bi taybet bi awayê serokatiya kesayeta sosyalîst derdixe holê dinirxînim.

*“Li Tirkiyê siyasetmedarê sosyalîzmê kî ye?”*

– Dîmeneke wisa heye; PKK xwe ava kir, di nava perasanekê de tê van rojan, hewl dide ji têkoşîna çekdarî wêdetir tiştna pêşbixe. Aliyê vê yê herî tê dîtin jî, komên Kurdan di eniyek de komkirine. Lê ji aliyê din ve jî bi tevgera sosyalîst a Tirkiyê re jî pêwendiyek nayê danin. Heta dema wisa tê temaşekirin dikare qala vebûna mesefeyek jî bê kirin. Dibe ev, ji bêşepirzetiya tevgera sosyalîst a Tirkiyê be. Lê ev rewşek şênbere. Ji niha şûnde ji bo derbazkirina vê rewşê divê çi bên kirin? Ne li beramberî hev rexnekirin û ji bingeha enternasyonel ve mesafe veke, ji bo qebatkirinê divê projeyeke çawa bê pêşxistin? Ma pêşkeftinên dawî ji bo vê jî ne derfeteke?

---.: Raste. Di demên dawî de, di dema borî de yên ku me pir rexne dikir û bi komên ku bûyerên nexweş pêşdixistin re em di nava biryardariya pêşxistina yêkitiyê de ne. Û li gor pîvanên diyar komên Kurd komî serhev bû. Heta dikarin bigihin yêkîtiyeke cepheyî jî. Min di vê mijarê de daxuyaniyan da, jixwe civînê serbendê vê jî da. Ji ber vê dubare nakim. Jixwe di vê mijarê de, bi yên di nava kar de cih digirin re jî hevdîtinan çêbikin. Yanî dikare bê gotin ku kêm zêde di eniya Kurd de pêşkeftin di riya baş de ye. Tevî hemû kêmbûn û kêmaniyên wê yên berê, di vê qonaxê de destpêkirinên nû û pêvajoyeke nû pêkane.

Hûn heman tiştî ji bo çepê Tirkiyê yan jî ji hêla hêzên demokratîk-şoreşgerên Tirkiyê ve çima nikarin bikin yan jî wê bandoriyên di vê mijarê de çi bibin, dipirsin. Bi taybet diyar bikim ku, em jî ji nav wê çepê hatine. Ji nava atmosfera nîqaşên 1970’î derketin. Û me bi rexnekirina hinek kêmaniyan dest bi kar

kir. Hûn dizanin, ev rexneya pirsgirêka netewî bû û rexneya ji bo kemalîzmê bû; demokrasî jî dikare bikeve nav, ji ber çepê Tirk hinek despotîk bû. Dibe niha bi lîberaltiyeke zêde re gunehê xwe dide, lê ev şêwazeke pir xirap yê dayînê ye. Û ev car ya tê jiyîn likîdasyone, heta ne liberasyone. Nêzîkatiyên berê yên pir dîktator yan jî li ser ya xwe nehatina xwarê, niha rewşeke ti quraleke rêxistinê nasnekirin û nehatina ti rewşeke otorîteyê girt. Heta ev ne lîberalîzme jî, bi têgiha Lenîn bikar anî re tasfiyekariye. Bêguman ev hemû girêdana xwe bi nêzîkatiya pirsgirêka netewî rast nedanin û têkiliya kemalîzmê rast nedanînê re heye. Girêdana xwe bi nêzîkatiyeke rast li hember demokrasiyê rabernekirin û tipî mirovê sosyalîst dernexistina holê re heye. Ev hemû hatin rexnekirin û PKK jî gihişt çareseriyek. Bi rastî jî PKK, di dîtinê de rêxistineke Kurd û Kurdistanê ye, heta dibe hinek ji vê re bêjîn rêxistineke neteweperest, lê li gorî min rêxistineke pir enternasyonalîste. Kesên di nav de ji dêla xwe ji netewek bihesibînin, xwe ji dîtineke cîhanî hesabkirin eses digirin. Pir vekiriye ku ev bi netew re jî nehatiye çarçovekirin. Yanî yê dikeve nav û jiyan dike dizane.

Niha tevî van hemûyan hawirdorên sosyalîst yên li Tirkiyê, komên şoreşger-demokratîk, ev tevgera ku derbazbûneke wê pir dirêj heye dikare ji nû de pêşbikeve. Di derbarê vê de nirxandinên we yên dawî çine û wê bêjin bangawaziyeke we heye? Ez ê jî bêjim heye. Pir kin be jî, li gel hinek nirxandinan dikarim hinek bangawaziyan bikim. Weke me tim xwestiye bikin, divê ev tevger bizanibe xwe hinek rexne bike. Ya rastî ev rexne hene û pir berfireh jî dimeşe, lê ji tevdebûnî û pêşxistina encamê dûre. Rexne hinek jî li ser esasê kurkirina înkarê tê pêşxistin. Alternatîfê dernaxe holê. Te xirabiyê rexne kir, kêmaniyê rexne kir, başe alternatîf li kî derê ye? Di vê mijarê de devgirtî nêz dibin; bi awayê nizanim, nabihîsim, nabînim. Lêwra ev jî, nederiyê kurtir dike. Rexneyên bêberpirsyar hene. Destnîşankirina hinek kêmaniyan heye, lê dema hilberîna pratîkî, hilberîna polîtîk tê gotin, mirov ti pêşkeftinan nabîne. Yanî li cihek çepê Tirk dişibe bakîreya şêşt salî; hilberîna wî ya siyasî nîne. Çima nahilberîne, çima wisa bû? Ev meseleyek cuda ye. Lê dîtin ewe ku, polîtîka çênekiriye, rojeveke bi tendûrist nedaye. Niha neçarin sedama vê lîkolîn bikin bibînin.

Partiya Refah hema hema li Stambolê bû partiya yekem. Ya yekem çima partiyeke olparêz-paşverû li devereke modern mîna Îstambolê dibe partiya yekemin, çima partiyeke çep ya pir radîqal, hemdem û modern nabe yekemîn? Bi êşe, lê rastiye. Raserî di Partiya Refah de ye, yan jî di şêwazê xebata Refah de ye? Na. Di vê mijarê de bi rastî jî çep jî tercîhên xwe, helwestên xwe bi awayeke bê berpirsyar terikandin, rewşên bêyî ku hesabên wê bide tên jiyîn. Halbûkî evqas xwîn rijandin, îşkence kişandin. Pêwîstbû dozek, tevgerek (em ji vê re bêjîn tevgera sosyalîst, tevgera demokratîk) evqas bêxwedî nehatiba hiştin. Ez vê biêş dibêjim, lê weke rastiyek jî dibînim. Ger şeqamek li mirovek bidin, dê hesabê wê bipirse. Bised hezaran mirov hatin îşkencekirin, bideh hezaran kes hatin qetilkirin! Başe wê hesabê vê kî bide, kî bipirse? Sozên mezin yên li ser navê gelan hatî kirin, peyvên mezin yên demokrasî û wekheviyê li kî derê man? Xwediyê wê li kî derê ye? Tê gotin ku xatirê qehweke telh yê çil salan heye. Heta doxmayên olî jî li Tirkiyê rê li ber nîqaşên mezin vedike. Nîqaşên hawirdorên olî, komên Îslamî hene. Ev sosyalîzm çawa wisa ji çav ket? Ma bi qasî wan jî nirxê wan nînbû? Ger hebe, wê demê dê xwedî lê derbikeve. Bi taybet tevgera sosyalîst, tevgera polîtîke. Li Tirkiyê polîtîkvanên sosyalîzmê kîne? Niha dikarin bêjin, “*her tim nîqaşdikin û hîn ji bin derneketine*.” Wisa nîqaş nabe. Ev nîqaş salek dibin, du sal dibin. Yek jî berhem dide. Pirsgirêka yêkîtiyê tê nîqaşkirin, ma şeş meh têr nake? Pirsgirêka demokrasiyê tê nîqaşkirin, şeş meh têr nake? Ma em evqas paşverûyên superin? Qet nebe ma em nikarin di nava çend salan de teşeyek bidin nêzîkatiyên sosyalîzmê yên nû? Di cîhanê de ti îdeolojî evqas ji şêlobûn û nezelaliyê re nayê terikandin. Yan jî em, super paşketine ku çareseriyeke rast nabînin? Rexneyên mîna van hîn dikarin bên zêdekirin. Li gorî min pirsgirêk ne evin jî. Pirsgirêka bingehîn, hêza nêzîkatiyek rast ji erkên rêxistinî û polîtîk re neanîne ango nedana raberkirine. Yan jî bi awayeke teorîk pirsgirêk fam dibin, lê di pratîkê de xwe nedanê.

– Yanî di wateyek de dibêjin pêşengtî û pirsgirêka însiyatîfê.

---.: Bêguman. Qadroyeke pêşeng yê herikbar û yek jî çend kesên pêşeng pêwîstin. Serok pênc-deh kes nabin, çend kes dibin. Pêwîstî bi wan heye, vê dubare bêjim. Pêwîstî bi qadro jî heye. Qadro çendsed dibe, bi hezaran nabe. Aligir bi hezaran dibe,

girseya wê milyon dibe; ev tişteke cuda ye. Lewra li Tirkiyê rêberên herikbar nînin. Dîsa qadrobûneke xwe bi temamî dide ev kar jî nîne. Pirsgirêk ne pirsgirêka danehevê ye; daneheva li Tirkiyê, sedqad ji daneheva di nava me de zêdetire. Radeya entelektûel çil qad ji ya me wêdetire. Bingehê wê yê girseyê kêm nîne. Ev hemû hene. Pirsgirêk, ne pirsgirêkên madî, sîleh û hwd. ne. Pirsgirêk kombûna rêberek û qadroyên pêşeng yên bi biryar ku xwe ji bo ev kare razandine. Pirsgirêka bingehîn dîsa rêxistiniye û taxtîkên polîtîk diyarkirine. Dikarim van hemûyan hema bêjim. Yê daxwazkarê vê be nîne. Ma heye?

Li ser vê bingehê ez ji bo şoreşger û sosyalîstên Tirkiyê bangawaziyek bikim: Hevalên ku dibêjin em ji bo vî kare hene her kî be, çend kesan ji min re bişînin, çendsed qadro jî bişînin. Wargehên me hene, em ê wan perwerde bikin. Lê bila bi niyeteke baş bibin talîbê ev kare. Bila kombûna namzeteke dibêje; "*bi rastî jî me ji tevgera sosyalîst-demokratîk ya Tirkiyê bawer kiriye, serî jî daniye ber*" bila bên. Yek jî bila bêjin; "*em dixwazin vê tevgerê biherikînin û îdayên me yên pêşengtî kirinê heye*". Pêwîstiya me bi zilamên ku li xwe bigirin bi me re nîqaş bikin heye. Ez dîsa bi şoreşa Tirkiyê re têkildarim. Şoreşa me dîsa bêjin şoreşa Tirkiyê. Sosyalîstbûn dîsa sosyalîstbûn. Bila hinek me û xwe cidî bigirin. Ma em ê hêj çi bikin? Ger pêwîst bike ez pereyê riya wan bidim. Lewra xwarin vexwarina wan jî li min.

– Yanî ev, ji bo sosyalîst û şoreşgerên li Tirkiyê ji bo pêşxistina projeyek dibe bangawaziyek şênber.

---.: HEP jî hatin gel me û qala zehmetiyên xwe dikirin. Min got çi zehmetî; yê bingeh çêkiriye emin, mûçeyê digirin jî li ser vê bingehê tê pêkanîn, hûn weke qralan jiyan dikin û hîn jî nazên xwe dikin. Elîta li Tirkiyê jî hinek dişibe vê. Her tişt amade pêşkêş bikin jî ji peywirên bingehîn re eleqe nadin nîşan. Heta di quralên jiyana kaptalîzmê de jî jiyankirin wisa nîne. Heta di quralên jiyankirina axayan de jî ev nîne. Axa jî mirovên birêxistinîne. Ez dikarim ji vê re bêjim pêşveçûna sistbûn û modela lewaztiyê. Rêber ne di kaptalîzmê de, ne di feodalîzmê de û ne jî di sosyalîzmê de qet wisa nabin. Weke navê xwe dizanim ku, heke rêberên wisa bibin jî, wê di dema pêş de serkeftî nebin. Ez dixwazim we hinek bi têgihîn pêşwazî bikin. Mesela we got ku, di vê mijarê de wê hewlek, bangawaziyeke we çênebe? Heke

hinek rêzdariya wan hebe, bila hewl bidin me fam bikin. Weke hûn dibînin di temenê min de hêzeke bê sînor heye. Bi rastî jî di warê madî û manevî de hêzeke mezine. Ger ji milyonan re bêjin rabe ser xwe wê rabe; bêjin bimire wê bimire. Bideh hezaran şervan hene. Pereyê bigehe trilyonan jî dikarin eyar bikin. Tevgera me ya şoreşgerî ev sînor bidest xistin. Ev tecrûbeyek rêz jê re bê dayîne. Dibe berê zêde me gudar nedikirin, lê bila niha gudar bikin. Hinek dizanin ev kar çawa tê kirin. Dikarin bêjin ku, te xwe anî rewşek neyê naskirin, mehfkir, wisa kir, welê kir. Rêber jî kesayetên divê hinek wisa bin.

– Yanî rêber şaşomaşo dikin û her tim di nava bezê de ne.

---.: Bêguman. Rêber, kesayetên xwe ji rewşeke awarte ber bi rewşên awarte ve dibine. Ji bo serkeftinê pir çavsor dibin. Diafirînin û qrizê derbaz dikin. Lê ev, weke pir carî hatî kirin, bi nîqaşên erzan re nayê kirin; bi nêzîkatiyên kêm û reşkirinê nabe. Ger ji me kolektivîzm bixwazin ez amade me, heta bixwazibin rol bidin min jî li gorî hêza xwe ji wê re jî heme. Perwerdeyeke beramber dixwazin, bila ew bên ji bo ev kar min perwerde bikin, ji bo şoreşa Tirkiyê jî ez wan perwerde bikim. Bi qasî ew rêzdar bin ez jî rêzdar bibim. Di vê mijarê de ji bo xwe jî bi mîsogerî cudaxwaziyek nasnakim. Niyetek min kekotî jî bikim nîne. Ez ê tenezûl jî nekim. Di ferhenga min de ji kekotiyan re cî nîne. Lê hiquqeke hevaltiyê heye; ji wê re rêzdarim, ez ê pêwîstiyên wê bikim û bidim kirin. Piştre bila nebêjin ku, “*çima ferz dike*”. Bi mîsogerî ne wisa ye, ez ê pêk bênim, bidim pêkanîn jî.

Ev kar wisa belaş nehatine qezenckirin. Çima wê bê pêşkêşkirin? Bawerim min erzan qezenc nekiriye û erzan jiyan dikim. Nebawerim mirovên li Tirkiyê jî erzan jiyan dikin. Di wê baweriyê de me divê rêber jî di nava yekbûna wan de bin.Û ne li bendê me nûçeyên wisa derkevin holê. Yêkî daxwazkerê wê hebe bila bê, em ê bi hevaltî heya dawî alîkar bin. Bila nebêjin; “*PKK hinekrewşên rêxistinî li ser me ferz dike*,” tiştek wisa nîne. Bila bên nîqaşa azad, bila xwe bi biryar bikin û ez li bin îmza bavêjim. Tenê, bila fam bikin, ev xizmeteke gele, tevgereke gele. Bi tişta pir rexne dikin re wisa antî-emperyalîst, wisa antî-kaptalîst, wisa demokratîk, wisa sosyalîst… Bila binivîsin ku ez li bin îmzaya xwe bavêjim. Min ji bo ev eniya Kurd jî heman tişt got. Min got binivîsin, yê têkildar çû nivîsî; min peyvek neguherî û îmzaya

xwe li bin da. Bila komên li Tirkiyê ji min alîkarî bixwazin; em ê bi wan re pêwendiyên şênber pêşbixin, çi di asta bernamê de be, çi di asta madî de û çi jî di asta girseyê de be. Bingehê girseya xwe ya bi milyonan bikin bingehê girseya sosyalîzma Tirkiyê. Hêza xwe ya leşkerî bikin hêza sosyalîzm û demokrasiya li Tirkiyê. Heta hêza xwe ya madî jî li ser bingeheke maqûl ji bo pêşkeftinê pêşkêş bikin.

Wê ji me hîn çi bê xwestin? Dîsa "*qusurên PKK'ê, dîsa bila PKK wiha bike, wisa bike*!.." Tu ji aliyê baş ve ji PKK'ê sûd bigire. Di wateya pêşvebirina kar de wî bikar bîne. Ji vê cudatir çi dixwazin? Were tu jî vê cidî bigire, alî bide xwe, xwe bixwe nav rastiyeke saxlam. Tembeltiya mezin, bê îradebûnê derbaz bike, ji bo gel bibe hêza çalekiyê!

Nabêjim ev di nava çepên Tirkan de qet nîne. Çalekvanên mezin hebûn, serokên wê yên wêrek û fedekar hebûn. Rêbertî senteza wane; wisa bibe, were, tu yê biser bikevî. Ev hemû pirsgirêk rast danîne. Dema tên ser meseleya îdeolojiyên din, nîqaşa îdeolojîk bi mirovahî re destpê dike, bi mirovahî re xilas dibe. Polîtîkayên cuda, lezgîn, bi mîsogerî pirsgirêkên xwedî lêderbikevin hene. Pêwîstiya me bi peywirên rêxistinê yên bingehîn û şêwazê xebatê heye. Dibêjim xwedî li wê derkevin.

"*Agirbest pêngava bangkirina yêkîtiya gelên Tirk û Kurd e*".

– Hûn dibêjin pêvajoya bi bangawaziya agirbestê re destpê kirî, dibe di warê têkîlî bi şoreşgerên li Tirkiyê re danîn û di mijara derbazkirina pirsgirêkan de bibe destpêkek.

---.: Ger bikin başe. Pêwendiyên me ji Kurdistanê zêdetir bi mercên Tirkiyê re heye. Mercên legal, mercên çapemenî dikare ji van kara hemû re xizmet bike. Li gorî min bihêsanî dikare bûyera partiyeke nû ya legal bê bidestxistin. Avabûnek pir şoreşger-demokrat jî dibe. Bila hema bikevin nava ev kar û em bi hemû hêza xwe ve destek bikin. Pêşkeftinên çapemeniyê hene; bila hema bikevin nava wan, heya ji destê me bê alîkarî bikin. Heke eniyek hevpar dixwazin, em ji bo eniya hevpar jî amadene. Li gorî min ev hemû fam dibin û karên hişwerin. Ez bangawazî ji yê şopdarê vê re dikim: Derkevin holê! Ger dixwazin hevdîtin bikin, bila bên hevdîtin bikin. Vê jî diyar bikim ji bo vê astengek qanûnî jî nîne. Êdî mercên li Tirkiyê ji vê re dest dide. Roj, heke li

hember gelê Tirk rêzdar bin bêyî hinek tiştan paşve bixin roja destpêkirin û serxistinê ye. Hûn hatin, dubare destnîşan dikim; ji bo xatirê vê rojê ji min çi bixwazin ez ê bikim. Wê komek bê hevdîtin çêke, nîqaş bikin, ger pirsgirêkeke bernamê hebe em ê alîkarî bikin. Weke min gotî, heke bingehê girseyek pir pêwîst dibînin, wê partiyeke legal bê avakirin em ê bixin bin emrê wî yan jî ji bo bikin bingehê wê tişta bikeve ser me em ê bikin. Lê bila ew jî hinek tenezilê ev kar bikin.

Bila bibînin ku ev kar, weke pir carî kirîn bi rexneyên gelenperî yên xizmet ji ti şênberiyan re nake yan jî bi nîqaşan nehatine vesazkirin. Di vê mijarê de li gorî min divê hinek ji tecrûbeyên PKK'ê ders bigirin.

Dibe kar pêşve biçe, ez dîsa diyar bikim ku bi hêvî me. Ji niha şûnde jî ez ê hîn zêdetir pêwendîdar bim. Dîsa bi gelek koman re hevdîtin bimeşînim, nerînên xwe yên di derbarê van mijaran de hewl bidim dem bi dem rave bikim. Dixwazim diyar bikim ku, çi kevin çi jî nû nirxek mezin didim kesên sosyalîst-demokratîk û heya bêjî bi wate û bi berpirsyar nêz dibim. Ger bixwazin em ê hîn zêdetir destek bikin. Bila ev biryara me dawî girtî û vebûnan jî, serê kêliyê weke reformîzmê mehkum nekin. Dibe ev herî zêde ji bo wan xizmet bike. Dibe hêz bide vebijêrka wan ya şoreşgerî. Bila ji vê hêlê ve, derfeta vê jî lîkolîn bikin. Ev hinek jî gava vebûna ber bi Tirkiyê ve ye, gava bangawaziya yêkîtiya gelê Tirk û gelê Kurdistanê ye. Dîsa gava paşvexistina şovenîzmê ye. Ev hemû jî ji bo şoreşê gavên pir girîng in. Bila pirsgirêkê hinek ji vê hêlê ve binirxînin. Bila qet mereq nekin, her ku diçe çek bi artêşa xwe û hêjmara xwe ve zêde dibe, bila tenê bixwazin.

Paşvexistin qet nîne, weke dibêjin wisa ber bi reformîzmê ve çûyîn jî nîne. Ev agirbesta me kirî heta şiyariya ji bo hikûmet jî divê li hember şoreşê rêzdar be û zererê nediyê. Û hema heye çek jî ji nû de biteqin; wê demê bila me rexne nekin. Dixwazim wê jî dîqat bikin. Ger çek bikar bên, wê zêdetir biteqin û pir zêde xwîn birije. Lê berpirsyarê vê kiyê, tenê ne şoreşger-demokratên li Tirkiyê ne, pêwîste gelê Tirk jî baş bibîne. Kî ji çekan hêvî dike, kî şovenîzmê kur dike, kî pirsgirêkê neder dike? Bivê wesîleyê bila vê baş bibînin. Gotina "*PKK teslîm dibe*"çiqas şaşe, wexta hema ji carek ve çek hat rawestandin jî nebêjin; "*ev jî nebaşe*".

Bila hinek din rastîbîn bin. Bila li gel heq-hiqûqê helwest bigirin; dîsa bila li gel riyên çareseriya siyasî û aşitiyê helwest bigirin. Tişta em ji gelê Tirk û hemû nûnerên wê yên demokratîk-sosyalîst hêvî dikin eve. Ez bi vê wesîleyê û li ser vê bingehê rêz û hezkirinên xwe raberî wan dikim. Ez milîtaneke yeman yê ev şere derketim û ji niha şûnde jî vê wisa bidomînim. Dixwazim ev jî bê zanin.

"*Banga min ji bo sosyalîstên Tirkiyê ev ku polîtîka bikin".*

Yek jî hûn vê pirsê dikin; dibêjin hûn çima bi tevgerên Tirkiyê yên şoreşger-demokratîk û sosyalîst re eleqedar nabin. A rastî min eleqedariya xwe bi awayeke pir berfireh meşand. Bi yek-du mînakên derbazbûye re rave bikim: Devrimcî Yol, di 1980'î de di nava demek kin de hatibû girtin. Hêjmareke wê pir kêm xilas bibû. Me wê jî kişandibû saha Rojhilata Navîn û me bangî Taner Akçam jî kiribû daku ji Avrupa bê. Hinek mêl li Avrupa qezenc kiribû û hewl dida me bikişîne Avrupa. Dibe encameke vê be, yek tişta kirî, kar paşdexistin bû. Digot; "*ger Dev-Yol nebe hûn nikarin tiştek bikin, hûn hewcedarê Dev-Yolê ne, neçarin girêdayî wê bimînin*". Min jî li wir, ev tişt gotibû: "*Ger Riya Şoreşgerî nebe, em ê jî karên xwe bi Serfermandariya giştî re çareser bikin*". Min vê di 1982'an de got. Temaşeke, rastî û pêşkeftin çi teqez kir? Em karan di asta Serfermandariya giştî re digirin dest. Serokê Serfermandariya Giştî Gûreş, di dema derbazbûyî de li cihek, dibêje; "*ev zilam…*" Ji bo min ev peyv bikar tîne. Yanî bûne muxatab. Bi kinahî hina Tanerê Dev-Yolê li kî derêye, nizanim; heta pêjna wî jî nayê bihîstin. Lê me, meseleyan bi Serfermandarê giştî re anî asta nîqaşan. Bi hikûmetê re, nerasterast jî be di rewşeke nîqaşê de ne.

Niha çepê Tirk xwe ewqas mezin dibîne ku, dibêje; "*bê me tiştek nabe*". Lê evqas pêşkeftin li Tirkiyê çêbûn; ev rewş çi dide nîşan? Çepê Tirk (giştî nekin, bi taybet ji bo hinekan dibêjim) her ku çû hatin derbaskirin û çewsandin, ma li Tirkiyê hertişt çênebû? Gotin kaptalîzm nikare wisa pêşve biçe, yekdestî pêşve biçe, bandora Emerîka wisa pêşve naçe, lê temaşe kin ma hertişt pir baş pêşneket? Kesên vê digotin niha li kî derêne? Bi xwe nebûn yekî tine? Yanî di navbera tiştên dibêjin û tiştên dikin de biqasî çiyan ferq heye. Lê em, weke min gotî, hinek girêdayî gotina xwe man. Me li hember hemû koalîsyona emperyalîsta cîhanê şer kir.

A rastî Şerê Başûr, ne şerê me û PDK'ê bû. Heya ku vê diyar nekim derbaz nabim. Birêz Yalçın Küçük baş rave dikir û vê digot: "*Piştî restorasyona mezin ya 1815 şûnde li Yûnanîstanê li hember Împaratoriya Osmaniyan îsyanek çêbû*". Dîsa mirov dikare yek-du mînakên dîrokî yên dişibin vê bide. Di vê demê de jî, piştî hilweşandina sosyalîzma reel şûnde û piştî restorasyon di capa cîhanê de serwer bû şûnde, tevgera ku tenê henaseyek girt tevgera PKK'ê bû. Em vê tenê weke bûyereke Kurdistanê nabînin. Dibin navê "*nîzama nû*" ya cîhanê, "*nîzama nû*" ya Emerîkaya statûko û Sovyet jî di nav de li her derê serwer bû. Heta li Sovyetê jî nêçîrvaniya terorê hat kirin. Lê PKK'ê, derketineke dîrokî û bi bandor tam jî di van salan de kir. Hîn jî bi îdaye. Yek jî li Peru tevgereke Aydınlık Yolê heye. Lê li gorî min, pir li pêş vê tevgerê jî gihiştine pozîsyonek hîn baştir. Ev, heya bêjî pêşkeftinek bi wateye. Şoreşa Kurdistanê niha pêşengtiya potansiyeleke girîng ya pêşkeftinan dike.

Sosyalîstên Tirkiyê mînakên cîhanê pir nîqaş dikin, lê li kêlega wan ezmûnên mezin yên Kurdistanê hene û paşverûtiya navnetewî hewl dide wê îmha bike, di derbarê wê de nirxandinek pêş naxin. "*Wisa cudakare, wisa netewepereste, wisa reformparêze*" digirin dest. Şeklê nîqaşeke pir ecêbe! Tu yê tevgereke evqas enternasyonal li kî derê bibînî? Dibe ji gelek tevgeran re neteweperest bê gotin, lê ji tevgera li Kurdistanê pêş dikeve re nabe netewe perestî bê gotin. Me dît neteweperestan çi kir, bi hikûmeta Tirk re li gel hevbûn. Yek jî divê neteweperestiya paşverû bê gotin. Yanî, dîsa nirxandinek bi tendûrist pêş nexistin. Di dîrokê de jî nirxandinên şaş pir zêde bûn. Tişta dixwazim bêjim, divê herî zêde şoreşgerên Tirkiyê ji ezmûna PKK'ê ders derxin. Ji ber ev, hinek jî di pratîkê de wan eleqedar dike. Ji ber, hertişt ji dest çû. Pêwîst bû çep hinek hilberîn bikiriba, divê bikarîba vê derbaz bike. Dikarî îfadeyên hîn xweşik, hîn azad, helwest û heta polîtîkayan afirandiba. Niha vê daxwaz dikin.


Birêz Doğu Perinçek jî hat vir. Me got: "Polîtîka çawa tê kirin?" Got; pêşniyariya min ya polîtîkaya pratîkî, wiha weke di ezmûna HEP'ê de bûyî, parlementeran avakirin û parlamentoyê bandorkirine. Jixwe bi xwe jî sîh sal bû ji bo vê dixebitî. Min got, merkezeke şoreşê heye, were bibe berdevkê wê yê parlamentoyê. Ev tişteke xweşike û wateyeke wê heye. Heke berdevkeke

parlamentoyê hebûya, wê pevrebûniya gelê Kurd-Tirk jî pir baş pêşketiba. Kî biratiyê naxwaze? Serî kêliyê ji me re dibêjin neteweperest; tevgereke ji enternasyonalîzmê re nihîni raber dike we di welatê we de û di navendeke şoreşê de weke namzeteke parlementeriyê pêşniyar dike netewepereste, yan jî yê xwedî nêzîkatiyeke xwe pir jor de dibîne û tenezilê vê neke netewepereste?

Û min zêde biwate nedît. Em ji navên de nerevin, ji çêbûna partiyeke hevpar jî nerevin; me got hûn dikarin bên cî bigirin. Bila ji bo herkesî partiyeke cuda ya Kurd çênebe. Tenezil nekirin. Gelek koman çî girtibûn, hinek komên din yên Tirk jî cî girtibûn, lê wan tenezil nekirin. Temaşeke, heke polîtîka dixwazî, wiha polîtîka tê kirin. Ger ketiban nav, wê parlamenteriyeke eslê xwe nivî Tirk di parlamentoyê de şereke demokrasiyê pir xweşik dabûna meşandin. Heke li Tirkiyê birêxistin bûban, dibû rêxistinek pir baş yê eniyeke yekpare yê demokratîk ava bûba. Tenezûl nekirin, yanî anîn rewşa “*naxwazin polîtîka bikin*”. Lê dema di tekelan de, di şaravaniyan de li kar geriyan, weke mevziyek mezin qezenc kiribin hemû dikevin nava pêşbirkê. Ger tu sosyalîst bî, demokrat bî, hinek mevziyên polîtîk qezenc bike, hinek hilberina polîtîk bike! Di tekel û şaravaniyan de karmendiyek dane te; ma ne şerme? Ma ev, di nasnameya te ya sosyalîst û paşeroja te de, ne xirabûne? Belê xirabûne. Rêxistina xwe ya demokratîk ava bike, bi wê re heya dixwazî polîtîka bike, meydanan dagire! Tu yê dîsa bixwî, vexwî û weke dixwazî jiyan bikî.

Vê dibêjin, navê me dibe “*cudaxwaz*”.  Yanî dişibe bûka dibêje; “*cihê min tenge, naxwazim bilîzim*”. Hevalê min, tu naxwazî polîtîka bikî. Tu tênî asta ku “*ez di vî karî de nînim*”. Wê demê rastiyê bêje! Bi rastî jî heke bihatiban ez ê kêfxweş bûbam. Yanî bangî ew hevalên xwe yên bist salan jî dikim. Min qala Doğan jî kiribû; di Zanîngeha Zanistên Siyasî de hevalbûn. Min İlhami li wir dît. Heta pir baş tê bîra min, em hatibûn mala me. Hevalan hinek eprax çêkiribûn, wî her serî kêliyê digot; “*ev eprax pir xweş çêbûne*”. Başe eprax xweş çêbûne bixwin, lê polîtîka jî xweş dihat kirin, divê hûn hinek jî wê bixwun. Ji bo niha polîtîkayeke xweşik bikin bangawazî dikim. Dîsa Nasuh ew hebûn. Me wan weke bira didît. Em ne birane, lê bila bixwe weke

bira bên rewşa me bipirsin. Lewra heke dixwazin polîtîka bikin. Ne pirsgirêke û ji bo gelê Tirk jî pir tiştên xweşik dikare bê fikirin. Yanî heke naxwazin me "*cudakar*" bikin û ji Tirkiyê veder bikin, wê demê karên hevpar yên em bikin hene. Em jî di vê mijarê de bi îdane; em ê tiştên baş, xweş bikin û dikin jî!



*"Rewşa agirbestê lez û bez hukmê xwe winda dike û cihê xwe ji navendek bi pevçûnek hûrûkûr, germ û ragêşî re dihêle. Bi rastî jî ev ji bo me jî zehmete, ji bo gelan jî zehmete. Lê belê ji bo pirsgirêkan nebûna hêza çareseriyê ne pirsgirêka min e, ev pirsgirêka hukumetê ye."*

*"Dihizirim ku divê ez ewqasî ne saf bim ku*

*dê Enqere di derheqê min de ji xêrê ve bihizire.”*

Civîna sêyemin a çapemeniyê ya di 8’ê Hezîrana 1993’ê de li Bar Eliasê çêbûyî:

**EM JI ŞEREKE HERÎ ASTA JOR RE AMADE NE**

Xebatkarên Çepemenî yên Rêzdar!

Ev demeke dirêje mîna rojaveke yekem bandora xwe li Tirkiyê didomîne û di roja me ya îro de jî hatiye qonaxeke girîng. Lewra bûyerên di hawirdora PKK’ê de çêbûne, pêvajoya nû vegotin û li ser vê bingehê bersiva pirsên we dayîn ev care sêyeme û hinek jî li ser daxwazan vê civînê lidar dixin.

Pêvajoyek tenê ne gelê Kurd, ji nêz ve gelê Tirk jî eleqedar dike û îhtîmala jiyankirina pêşkeftinên wê pir zêdeye aşkere kirin, raya xwe ya giştî ji nêz ve agahdarkirin, dîsa ji rayadarên fermî re bêjin em çine, em ê çikin, em çi dixwazin bi awayeke vekirî û carek din bi awayeke bandorker bênin ziman, loma ev civîna bi we re pir girîng dibînim.

Tevî ku, me xwestiye ev rewşa dibêjin agirbest bikin bingeha pêşkeftinên siyasî jî, hikûmetê bi taxtîka lêdanê bersiva vê da û di derbarê vê de hinek biryarnaman pêşxistin bêşansî bûye. Rewşa me ji berçavgirtin û daxwazên me dana destpêkirinê zêdetir, bi şêwazeke hîlebaz û tasfiyekarî bersiv dan. Her çiqas pêvajoya agirbestê hemû nermbûnek bibe mijara gotinê jî, di hinek herêman de operasyon nesekinin û lewra ev jî ji me re zêde bawerker nehat. Bûyera Çewligê ku hûn pir dipirsin jî weke encama vê pêşket. Ev çend rojin rewşeke pevçûnan pir zêde tê

jiyîn, bi temamî rewşeke şer mijara gotinêye. Dibe hûn ev şer bi hemû aliyên wê ve neşopînin, lê operasyonên 10-15 eniyan eleqedar dike û pevçûnên pir zêde mijara axaftinêye. Ev, ne pirsgirêkeke weke pirsgirêka Bosna-Hersek û Azerbaycan Karaboax û ne jî bi wî şêwayî rewşeke pevçûnê ye. Rewşeke pevçûnê yê qed bi qet zêdetir, heta bi pevçûnên hîn zêdetir û tund re her ku biçe li nava Tirkiyê jî bê peytandin bê jiyîn.

Weke keseke ji nêz vê dîroka partiya me nas dike, dîsa weke keseke pêngava 15'ê Tebaxê heya roja me henase henase jiyan kirî, diyar dikim ku wê ev pêvajoya nû ji yên heya niha hatin jiyîn zêdetir cuda be û berfirehtir pêşbikeve. Weke hawirdorên hikûmetê xwestine bidin peytandin, ev ne pirsgirêkeke piştî agirbesteke gerîla lewaz ketiye û PKK hêza xwe winda kiriye pêşketiye. Helwesta me xwestî dênî holê eve: Gelo ev pêvajoya ku pir zehmet derbaz bibe, bi awayeke siyasî nikarin mukûn bikin; ji dêla aliyê leşkerî aliyê wê yê siyasî derxistina holê, li gor berjewendiyên gelê xwe riyeke çareseriyê yê hîn demokratîk û aşityane vekin? Ev hat nirxandin û xwestin helwesta me ya bi niyeteke baş bi "*poşmaniyek bişeref, poşmaniyek teslîmkarî*"re bigirin dest. Tiştek bi navê "*teslîmkariyeke bi şeref*" di cîhanê de nîne. Hemû teslîmkarî rewşeke beredayî ye. Ger şoreşgerê wê, dij şoreşgerê wê, çepgirê wê, rastgirê wê jî teslîm bibe, ev ketîbûnê îfade dike. Heta nemûmkûne zarok jî bi vî rêbazî bên xapandin. Lê li gorî min, hawirdorên hikûmetê, di şerê palkursî de û dîsa ji bo partî koalîsyonê bimeşînin ev taxtîk esas dîtin; yan na ne weke şarteke çareserkirina pirsgirêkê ye. Ji bo koalîsyonê bidomînin û hinek jî kursiyên xwe winda nekin gotin: "*Me wisapirsgirêka Kurd çareser kir, pêşkeftina herî girîng me bidest xist*," di raya giştî de xwestin vê bikin sedema komkirina pileyan.

Bêguman tevgereke mîna me ku şereke pir berfireh dide meşandin, wê vê nêzîkatiyê bi pertek bigiri dest. Û pîlana duwem ya me qet nexwastî jî, wê riya çareseriya çekdarî bi awayeke berfireh bêne rojevê. Niha tişta bê rojevê jî careke din berxwedaniya çekdarî û heta vê kurkirin, kirina bingehê riya çareseriyeke siyasî ya em nizanin wê kêngê bê û çawa bê. Yanî careke din aliyê derbikeve pêş wê bibe aliyê leşkerî, aliyê siyasî bikeve pîlana duwam û ancex di demeke pêş de bikaribe derkeve

pîlana pêş. Li ser vê rewşa agirbestê bilez serweriya xwe winda dike û cihê xwe ji navendeke pir bi pevçûn, germ û hêrsdar re dihêle. Ev, bi rastî jî ji bo me jî pir zehmete, ji bo gelan jî zehmete. Lê ji pirsgirêkan re nebûna çareserî, ne pirsgirêka mine. Ev pirsgirêka hikûmetê ye. Meseleya cidiyet û acîliyeta Kurd di holê de ye. Çi muxalefet, çi jî partiyên îqtîdarê naxwazin çareseriyê pêş bixin.

Ya rastî vê jî diyar bikim; me ev rewşa agirbestê, hinek jî ji ber gotina birêz Ozal ya dibêje; "*dixwazim di dawiya temenê xwe de di meseleya riya çareseriya Kurd de alîkarî bikim. Gelo PKK hinek nerm nabe? Di vê mijarê de wê hinek gavan navêje, wê fersendê nede?*" Me ev peyama wî hilda dîqatê û dest bi vê pêvajoyê kir. Demîrel û İnönü jî xwestin pirsgirêkê bi rêbazên kevin, yanî bi rêbazên bavê xwe re; Erdal İnönü bi rêbaza bavê xwe re, Sûleyman Demîrel jî bi rêbaza siyaseta xwe ya 30 salan re vê pirsgirêkê çawa çareser kiribe, dîsa dixwestin bi heman rengî çareser bikin û me jî vê dizanî. Her wiha muxatabê agirbestê yan jî asta pêşkeftina wê Çankaya bû. Dîsa biêş bûye û me jî biêş dît. Hîn di ser civîna me ya çapemeniyê re hefteyek derbaz nebûyî mirina Ozal ya ji nîşkave û axaftina wî ya wê rojê ku gotibû; "*xeternak jî be piştî nîvro ez ê çend gavan bavêjim*" hebû û bêyî fersend bibîne jiyana xwe ji dest dan, lewra pêvajoya me xwestî pêş bixin hinek asteng kir. Ji dêla ku Demîrel û İnönü vê pêvajoyê binirxînin, xwestin xirab bikar bînin. Û weke dizanin operasyonên ser hev, girtin û li hember vê bikaranîna mafê xwe yê bersivdanê, rê li ber rewşek wisa pêşkeve vekir.

Di derbarê Ozal de bi kinahî dixwazin van bêjin: Bi me re şerê herî berfireh da meşandin; eniya wî ya dîplomatîk, aborî, heta siyasî îdare kir; heta taxtîkên herî guncav fêrî leşkeran kir alî da pêşvebirina şer. Lê tevî vê, fêm kiribû ku êdî pirsgirêk bi riya leşkerî nayê çareserkirin, yanî bi riya tepisandinê nayê çareserkirin, divê ev kar bi siyasetê bimeşe û li gorî min wê hinek gavên wêrek jî bavêtiba. Ev, ne rewşek nebaş bû. Ev, xwe gihandina rewşa ferasetê ya aliyên ku şer dikine. Mixabin bi mirina wî re ev şans tine bû.

Partiyên nû wê kengê bên asteke wisa ya siyasî? Di vê derbarê de zehmete tiştek bê gotin. Lê hikûmeta heyî, yek direve diçe Çankayê, yek ji partiyê, ji serokatiya wî îstîfa dike, weke ku

li ser tiştên kirî yan jî kêmaniyên xwe bigire, di vê mijarê de dîsa pêvajoyeke nediyar û heya bêjî xirab derbaz bibe tê destpêkirin. Ez wisa bawerim ku, rastiya di bin gotina İnönü de ya dibêje; "*ez ê ji serokatiyê veqetim*" ev heye. Yanî di meseleya Kurdan de dibe ji derve jî di bin zextan de bin, bixwe dixwaze gav bide avêtin, lê ti amadekariyeke wî li hember vê nîne, cidiyeteke wî jî nîne û dixwaze bi revê xilas bibe. Demîrel jî xwe avêt Çankayê û DYP jî di ew xeta muhafizekar de girt û dixwaze demek dirêj ser pirsgirêkê bigire. Bi vî rengî bi rastî jî pirsgirêk muxatabê xwe nabîne. Muxatabê pirsgirêkê hikûmete, Çankaye, artêşe, niha nediyare; wê herkes pirsgirêk bavêje ser yê din û di holê de hêzên şer dikin bimînin; wê ev jî bi qural-bê qural, bes-nebes bi ser hev de biçin. Di salên derbazbûyî de bihezaran mirov mirin, di dema pêşiya me de dibe xwîna deh hezaran kes bê rijandin. Wê ev ji me jî çêbibin, ji aliyê beramber jî çêbibin. Û bi rastî jî bi hêzeke nêzî deh hezar gerîla ve, bi ewqas milîs û bejdarbûnên heroj ji gel çêdibin em ê ev şer bimeşînin. Heke dixwazin me tine bikin, -weke hawirdorên hikûmetê gotî- koka me bikolin, ev tê wateya ji me herî kêm mirina 15-20 hezarane; ji aliyê din jî bi qasî wê, heta tê maneya mirinên zêdetir; ev jî hêjmar dibe deh hezarî. Wê aboriya Tirkiyê, avaniya wê ya siyasî çiqas bikaribe vê rake? Dîsa Kurdistan hatiye rewşa wêranbûnê; çalekiyên bikeve nava Tirkiyê wê Tirkiye çiqas xwîn, giyan û mal winda bike? Muhasebeya van hemûyan, bi navbeynkariya we endamên çapemeniyê re, ji raya Tirkiyê û nûnerên wê yên siyasî re dihêlim.

Ji vê em berpirsyarin? Na! Em mafên herî dilnizm yên mirov û netewa xwe dixwazin. Madem nasnameya Kurd tê qebûlkirin, yek ji tişta herî erênî ku bê kirin, wiha dikariya radyo-televizyoneke Kurd biketiba meriyetê. Ev nêzîkatî, ji ew biryarnameya dawî derxistin hîn bi mantiqe û dibû bibe nêzîkatiya piştgiriya gel bigire. Ji dêla pêşxistina qanûna poşmaniyê, weke îfadeya herî xwezayî ya naskirina Kurd, zexta li ser çand û ziman rakirin û weke jestek jî radyo, televizyon li Kurdî vekirin, li gorî min ev dibû gavek herî erênî. Dîsa, em ê ji vê re nebêjin efû, ev mirovên esîr girtine dikariyan hema serbest berdin. Dixwazin vê jî bi awayê qanûna poşmantiyê bidin guhertin. Ev jî pêşkeftineke bextreşe. Hinek seferên ekonomiyê vesazkirin. Mesele ne ekonomîke, siyasiye. Ji dêla ji ekonomiyê

dest pê bike-di wê mijarê de jî zêde pêşkeftin nîne-, mafê serbest yê rêxistinbûna siyasî, ji siyasetê re xebatbarî dana qezenckirin û heta heke baweriya wan pir bi xwe heye û îla dibêjin; “*bila bê, azadiya siyaset kirinêheye*” wê mafê serbest siyaset kirinê bidaban. Dibû ev biban gavên cidî yên siyasî. Lê di yek ji van de, yek gaveke erênî nîne. Ji dêla vê, teslim bibin, piştre çi ji me bikiran, pêvajoyek nediyar ferz kirine. Lewra em ne xafilê pê di avê de yî, serê xwe li ber vê dirêj kin. Dixwazin bikişînin nava navendeke teslîmkariyê ya pir bê kesayet û me vê qebûl nekir; û di pêş de jî bila bizanin emê vê qebûl nekin. Heke mafê mirovan, mafê netewî, mafê azadiya gelek pêwîst bike ger bi sîlehê jî be me biryardariya bikaranîna mafê xwe yê parastinê bi ezmeke mezin riya wê ya xebatê tercîh kir.

Niha ev çend rojin ez, pir zêde li ser vê disekinim. Sengergirtina hêzên me heya bêjî berfireh bûye. Min destnîşan kir ku divê hema bilez rehaweta pêvajoya agirbestê derbaz bikin. Dîsa me gerîla li hemû qadên çiyayî bicî kir. Pêvajoya di pêşiya me de ji bo şereke pir berfireh bê meşandin amadekarî hene. Û jixwe di rojê de pêvçûnên dibe malê jiyana 20-30 kasan heye. Dibe di rojên pêşiya me de di rojê de bîlançoya vê bi sedan jî bibe. Pêvajoyek zehmete; dikarim bi rihetî diyar bikim ku bêyî biçewsin, bin kevin, aliyê serkeftinê zêdeye. Wiha emê di tempoyeke ji pêvajoyeke nû ya siyasî re jî derfet amade dike bimeşînin û di vê mijarê de jî ji xwe bawerin. Bi mîsogerî bila kes nekeve nav xeyalan; hêza heyî ji çiya daxistin, hîn îmhaya wê ya di salên 2000’î de, heta -em mezin nebin, pêşnekevin jî- ev nemûmkûne. Avaniyê baş nasdikim; ev amadekarî, heta yên li çiya dikarin bi hêsanî ev şer heya salên 2000 bibin. Jixwe heroj pêşkeftinên mezin hene, tecrûbe hene, derfetên hûndir û derve yên pêşdikevin hene; weke ku em ê ev şer heya salên 2000’î bibin, dikarin hîn zêdetir bikin. Wê ji Tirkiyê re çi bîne, çi bibe; weke min gotî bila muhasebeya wê raya giştî bike, bila rayedarên dewleta Tirk bike. Bi rastî jî em naxwazin li leşkerê Anadoliyê bidin, em wî nêzî xwe dibînin. Lê yê wî dibe şer kiye? Yê ew şer pêş dixe û siyaseta ku rê ji vê re vedike siyaseta kiye? Kî ji vê berjewendî hêvî dike; kursiyê kî, berjewendiyê kî mijara gotinê ye? Pêwîste gelê Tirk vê bibîne. Raya Tirkiyê, yên dibêjin demokratim, mirovên sosyalîstim û raya giştî ya dibêje li gel

mafên mirovanim divê bikaribe vê bibîne û bikaribe ji vê re bêje bisekine. Ev bêçareseriya heyî kî bi israr ferz dike?

Xebatkarên Çapemenî yên birêz; hûn ji bo pirsgirêkên bingehîn yên nasnameya gelek çareseriyeke çawa pêşniyar dikin, ez wê qebûl dikim. Gelek heye, nasnameya Kurd hat gotin û hat qebûlkirin. Wê demê bi awayeke lezgîn pêwîste em ji ev gel re çi bidin? Û ji bo sekinandina ev şer divê bi lezgînî çi bikin? Di wê baweriyê de me hûn li hember hinek mafên mirovan, netewan û mafên nasnameyên gelan rêzdarin. Hûn jî pêşniyarên xwe bênin gel min û riya pejirandinê bibînin. Lê hûnê nikarin ji hikûmeta xwe denga erê bigirin. Ev jî bi awayeke vekirî datîne holê ku kî mafdare kî bêmafe. Heke bi awayeke fermî navê gelek nehatiba naskirin, heta zextên li ser ziman û çanda wê didome -nebawerim di cîhanê de ji derveyî gelê Kurd mileteke din vê jiyan bike- û heke gotin di cî de be lawir dikarin bi awayeke azad deng derxin, lê dema gelê me ji wê jî bêpar dimîne, başe rewşek evqas beredayî em çawa bipejirînin ku bikarin teslîmyetê qebûl bikin? Nebawerim hûn jî qebûl bikin. Her wiha aliyê ji çareseriyê direve ne emin. Dîsa em ne tevgerek wisa nezan, weke zarok bên xapandin û bi îmhayê bên tinekirine. Bêçaretî karê yê berambere; ew kur dike û şer xistiye pêvajoyeke bibe malê jiyana deh hezaran.

Min nedixwest ji we re tabloyek wisa reşbîn xêz bikim. Lê rastî wisa ye. Heya ji destê min bê ez ê dubare hewl bidim têkoşînê bi awayeke aşitiyane, demokratîk û pilatformeke siyasî ve bimeşînim; lê ez ê hewl bidim bi awayeke onur, wekheviya gelan û pevretiyeke azad îfade bike, bikim. Bila kes, di bin mercên zexteke giran de dîsa li ser bingeheke bêmafiyek giran ne li benda pevretiyek û pevretiyeke zorî be. Derdeke me bilez Tirkiyê parçe bikin yan jî rê ji cudakariyek re vekin nîne. Wisa bawer dikim ku em ê demek dirêj bi Tirkiyê re rê bigirin, di nava hevbeşiyek azad û bê jiyankirin de bibin. Lê pêwîste ev jî bi awayeke şeref, yê wekheviya gel dîqat dike û divê ev jî bi awayê avakirina îradeyeke azad pêşbikeve. Pêwîste ji vê re rê û rêbaz vekirî bê hiştin. Aliyê beramber ji vê re çiqas bitolerans be ji dêla îmhaya leşkerî, ji çareseriya siyasî re vekirî bibe, wê ji hêla min ve jî ewqas vekirîbûn û di PKK'ê de jî ewqas rihetî pêşbikeve. Di vê de bila gumanek tenê jî nebe. Pêwîste ji gelê Tirk re jî nebêjin;

"*em ê PKK'ê tine bikin, bi operasyonek kin re xilas bikin*". Ev tiştên pir xirabin. Ger dixwazin biçin eniyan bibînin. Werin em we bibin eniyan û heta werin bi amûrên teknîkê (cîhazên agahî girtinê) rewş bi we bidin gudarkirin. Rewşek wisa nîne. Soz didin û dibêjin; "*em ê bi vê operasyonê koka wan bikolin*". Ev nerastin û wê hîn zêdetir xwîn, giyan, mal bi herdu aliyan bide windakirin. Divê polîtîka bê kirin, lê pêwîste li ser bingehên rastîbîn û vekirî bê kirin.

Mafê gelê Tirk jî bi awayeke vekirî û zelal heye ku bizane polîtîka çawa bê kirin. Dixwazin ev bên kirpandin.

Di civînên çapemeniyê yên derbaz bûyî de we hinek rastiyan danî holê; min jî vê bi awayeke erênî nirxand û ji we re sîpasiya xwe raber kir. Li ser vê bingehê ji bo dubare hatina we ya vir nirx didim. Di wê baweriyê de me ku ger ev nirxandinên hatine kirin bi riya we ji gelê Tirk û hemû deverên eleqedar re bê ragihandin wê alîkariyeke wê ji bo çareseriyê çêbibe. Bi vê wesîleyê bawerim hûn jî westayîne û di nava hewldana xizmeteke pir binirx de bûn. Dubare ji bo keda we sîpasiya we dikim.

Niha tenê dikarim van diyar bikim. Bi pirsên we re dikarim rewşê hîn baştir ronî bikim. Belê li benda pirsên we me.

– Birêz Ocalan hûn vê...

---.: (Em ji bo we dikarin axaftineke nû bikin. Nabe? Em ê ji bo we jî civineke biçûk çêbikin) Belê keremkin.

– Birêz Ocalan, di civîna we ya yekem û duwem de li gel we Celal Talabanî hebû. Pirşte Kemal Burkay hebû. Niha ne li gel we ne.

---.: Yanî hûn dixwazin bêjim ku di şer de tenê hatim hiştin. Rêza min her tim ji yên mezin re heye. Birêz Talabanî wê her tim bixwazibe di riya aşitiyê de û dostaniya xwa ya bi Tirkiyê re ji me sûd bigire. Wê dubare bixwaze sûd werbigire, li gorî min wê bixwaze ji Tirkiyê re jî xizmet bike. Min jî daxwaza wî neşikand, ji bo miroveke bi edaletim, min got em dikarin heya dawî pêvajoya aşitiyê bi hev re bimeşînin. Ew jî bi vêmebestê heya vir hatibû. Lê niha navbera wî û şer zêde xweş nîne, navbera wî şoreşê zêde xoş nîne û wê nexwaze navbera xwe Tirkiyê jî xira bike. Ji bo wî nexim nav rewşeke tengav min jî bangî wî nekir, heta min hevdîtin jî çênekir. Min vê bi însiyatîfa xwe pêşxist. Bi rêxistinên din yên Kurd re pêwendiyên me hene, hevdîtinên me

hene. Wan jî got: “Yê agirbestê xira kirî, qanûna poşmantiyê derxistî hikûmete”. Her wiha gotin em li gel we ne.

– Dibe ku di dema pêş de rêxistinên din yên Kurd di asta eniyê de bejdarî şer bibin?

Dîtinên ku min di derbarê rêxistinên din yên Kurd de bidest xistî û di protokolên me bi Birêz Kemal Burkay re pêşxistî, dîtin û nîqaşên wan yên weke ger ji wan daxwazan re bersiv neyê dayîn, rêbazên operasyon û tepisandinê bidome ji bo me vêbijêrka sîlehê tenê dimêne, hebû. Li gorî hêza xwe dikarin tevlî bibin.

Operasyon destpê kir. Bûyerên Çewlikê di dawî de di daxuyaniyên leşkerî û dewletê de tê gotin ku, me PKK’ê di wê herêmê de tine kir, niha jî diçin Başûr. Di nûçeyên duh de digotin ketine Başûrê Kurdistanê. Yanî di vê rewşê de di navbera daxuyaniyên we û daxuyaniyên dewletê de cudahiyek pir mezin heye. Ew dibêjin; “*em ê PKK’ê tine bikin, jixwe dawiya wê hatiye*”, hûn jî dibêjin ku, *“em mezin dibin*”. Gelo li vir em ê rastiyê çawa bibînin?

---.: Niha operasyona herî mezin li deverên em weke Amed tabîr dikin Diyarbekir, Çewlik û Mûşê kirin. Hemû hêza xwe xistin wir. Û agahiyên me îro ji cîhazê girtin bi konvoyek seyaran ya 300’î ve û bi 7 helîkopteran ve operasyon dikin. Hinek windahiyên me çêbûn. Heya niha nêzî pêncî windahiyên me çêbûne. Li gel vê windahiyên wan jî ji vê kêmtir nîne. Bawerim ev operasyon herî kêm 1 trilyon mesref daye. Hêjmara gerîla ya li Amedê nêzî 1500’î ye. Pêncî kesan jiyana xwe ji dest dabe, sed gerîla jiyana xwe ji dest dabe di cewher de nayê wateya ti bêhêziyê. Ev tenê rewşa li Eyaleta Amedê îfade dike. Bi rastî jî operasyonek mezin lidar xistin. Dibe hîn zêdetir pêş bixin. Tevî ev operasyonên zêde hêza gerîla heya bêjî bi awayeke saxlem li wir sekiniye; dixwazin biçin, bibînin. Îmhakirina çend birîman qala îmhakirina bi sedan bîrîm kirin rastiyê îfade nake. Dikarim diyar bikim ku ew di pozîsyoneke darbeyek hîn zêdetir û berfileh lê bidin de ne. Tinekirina Amedê tenê wê salan bigire, ger hemû artêşa Tirk wir dorpêç bike jî. Niha bi 5000 leşkerî ve li Dêrsîmê operasyon kir; encama bidest xistî sifre, li yek kesek tenê jî nexistine. Me çend derban li wan daye. Xerzan, yanî ev eniya em jê re dibên Bitlîs bi balefir û hêza bejayî ve êrîş kirine. Li vir jî windahiyên bi me dane 7 keçin -ev yên nû bejdar bûne û pir bê

tecrûbene-, nêzî 15 windahiyên wan çêbûne. Şervanên ecemîne, weke min gotî jinin. Ji derveyî vê wan jî li wir darbe xwariye. Serbaz jî di nav de herî kêm windahiyên wan jî ewqas heye. Ji derveyî vê hêjmareke nêzî 500 gerîla, di wan çiyayên xweş yên heya bêjî saxlam de bicî bûne û her ku diçe mezin dibe. Li çiyayê Agirî operasyon kirin. Operasyoneke mezin li hemû Agirî û Tendûrekê belav dibe. Windahiyên me yên li wir şehîdek û birîndareke. Weke dibêjin ne 150 ye. Windahiyên wan jî bi qasî dehî ye. Me çend sîleh jî rakiriye. Xwestin li eniya Botanê operasyonek berfireh pêk bênin, xwestin bi çend çengan ve bikevinê. Yên me bersiv dan û nekarin pêşve biçin. Hêjmareke mirî û birindarên di ser 40'î re dan şûnde vekişan û dikarim bêjim di van rojan de bi bombebaraneke balefiran dixwazin ev kar bimeşînin. Li hawirdora Botanê nêzî 3000 gerîlayên me hene. Tenê tinekirina wê eniyê wê çend sal bigire. Lewra heke em qet pêşnekevin, rewş wisaye û tê zanin, heroj bi dehan kes bejdarî nav gerîla dibe. Tevgera hemû yêkîneyên artêşê wê çiqas têra vê bike? Dema em li pratîka 9 salên derbazbûyî temaşe dikin em ê vê hîn baştir fam bikin. Ji derveyî vê eniya Mêrdînê heye; bi hêjmareke 500 gerîla ve her roj çalekiyan dikin, tenê çend windahiyên wan hene. Dîsa herêma GAP'ê heye û li vir jî nêzî 250 gerîla di faliyetê de ye. Windahiyeke wan cidî nîne. Di nava amadekariyên çalekiyan de ne. Dîsa Başûrê Rojava heye, ev dibe Toros û eyaletên Antep, Samsûr, Meletî û Mûşê digire nav xwe. Gerîla li wir jî ketiye tevgerê. Ji derveyî vê dibêjin wê li Başûrê Kurdistanê operasyon bikin. Ger bikin wê sipiyan bigirin; êdî ji vê re çi dibêjin bêjin. Bi tedbîrên me girtin re bi rastî jî wê vê carê yek kes tenê jî nebînin. Em ê bi şêwazê tevgera xwe re û herî zêde jî bi rewşa xwe ya Bakur ve derfet nedin vê. Wargeheke me hebû, li wir jî hêzeke gerîla ya diyar nemaye. Jin hebûn, siyasî hebûn, birîndar hene. Dikarim rewşa eniyan hîn berfirehtir ji we re vebêjim. Lê bi awayeke cewherî rewşa eniyên me wisa ye.

Di nêz de wê amadekariyên me bandora xwe nîşan bide. Û derketineke bihêz ya şerê gerîla mijara gotinê ye. Dixwazin rojavayê Tirkiyê jî bejdarî vê bikin. Bi taybet bombebarana li ser gundan û dîsa Kurdistanê anîna rewşa xirbeyê, dibe bi ser de çûyîna hinek hedefên ekonomiya Tirkiyê bê rojevê. Di vê mijarê de dibe sabotaj pêş bikevin. Yan wê bombebarana gundan û

texrîbata Kurdistanê rawestînin, yan jî wê hêdî hêdî li Tirkiyê misîllemeyên beramber pêwîst bike. Wê ew bi hemû tiştên xwe ve me wêran bikin, pêşkeftina ekonomiyê pûç bikin, gundan vale bikin, lê em ê bi ser de neçin! Êrîşeke wisa yek alî nabe. Em ê jî hinek bi ser Tirkiyê de herin. Dibe her ku biçe pêşbixin jî. Û bi vî rengî wê şer belav bibe.

– Hûn ê di bajaran de sabotaj bikin?

---.: Hemû rêbaz daxilê vê ye. Aliyê beramber çeka kimyawî jî di nav de hertiştî bikar tîne, qobre, kobreya sûper bikar tîne. Heroj bomba, tank û top bikar tîne. Çi bikeve destê me lewra em ê jî bi wî re şerkin.

– Başe min hêza we ya leşkerî fam kir, lê li beramberî we artêşek bi nîzam heye. Hêza we ya têra vê bike heye, ji bo bi artêşek re bikevin nava şer yan jî ji bo têrê bike?

---.: Herî kêm amadekarî ji bo salek hatiye kirin. Ev şer bi mîsogerî dikare bi rewşa xwe ya lojîstîkê ve salek bimeşînin. Niha çar hêlên Kurdistanê vebûye, lojîstîk ji her derê tê, lewra em jî vale nasekinin, her tim bi ev kar re eleqedar dibin û van pêwîstiyan pêşwazî dikin. Niha bûna artêşa bi nîzam, nayê wateya ku wê pir serkeftî be. Artêşa bi nîzam li Kurdistanê nameşe. Ev qobreyên sûper çima tên girtin. Qobreyên Rus çima tên girtin? Ji ber leşker nikarin gavek bavêjin ji ber wê ye. Dixwazin bi lêdana xelkê medenî şer bimeşînin, gel bihelînin. Em ji artêşa bi nîzam natirsin. Artêşa bi nîzam di rewşek perîşan de ye. Halbikî bi 10.000 gerîlayan ve artêşa bi nîzam a heyî hingavtin û xistana rewşên pir biêş ne ma negengaze. Serfermandariya giştî vê baş dizane. Zehmetiyên ku serfermandarê giştî di nav de divê hinek fam bikin. Zehmetiyên leşker di nav de divê hinek fam bikin. Em ê bi şerê gerîla û bi dana rûnişkandina hinek quralan re, dibe ji we re cuda bê, lê em dikarin artêşa Tirk bixin nav tengaviyek mezin. Li gorî min, hinek din bi kurkirina nederiya artêşa Tirk re dibe çareseriya siyasî bê rojevê. Ez, çareseriya siyasî ne ji sivîlan, dibêjim wê bingeha xwe ji rewşa artêşa zehmetî dikişîne bigire. Weke min gotî pirsgirêka me ya lojîstîkê nîne. Em dikarin bi hêsanî vê bidest bixin. Heta dikarin ji artêşê bixwe bigirin. Pirsgirêka me ya leşker komkirinê jî nîne. Bejdarbûna rojane 50'î ye û niha ev tevlîbûn ber bi sedî ve diçe. Yanî rojane 50 kes jî ji me biçe, dîsa 50 kes zêde bejdar dibin. Ev girînge. Ev jî dide

nîşan ku mîsogerî wê artêşa me mezin bibe. Ev hêjmarên mîsogerin.

– Başe dema hûn dibêjin pirsgirêk ji artêşê bingeha xwe digire hûn dikarin wê hinek vekin…

---.: Niha bi îqtîdara siyasiyan û mixalefeta wê re hûnera çareseriyê nîne. Zêde hêza wan ya siyasî jî nîne. Dîroka Komara Tirkiyê, li cihek demokrasiya leşkeriye. Komareke gotina leşker giraniye. Artêş xwest bi polîtîka tenkîl a kevneşop re encamek demdirêj bigire. Niha li Kurdistanê pir zehmetî kişandiye. Bi rastî jî pir tengezar bûye û pir jî hêz winda dike. Operasyoneke wî trilyoneke. Bila bîlançoya ev operasyona 10-15 rojan derxe. Enflasyon bingeha xwe ji van operasyonan digire. Sedema bihabûna jiyanê bi mîsogerî ev operasyonin. Siyasetmedar vê pir baş dizanin. Artêş dikare ev kar çiqas bimeşîne? Li gorî min bi vî nêzîkatiyê re em ê hinek din girîngiya pêvajoyê bi artêşê bidin hîskirin. Wê demê dê artêş tevlîheviya meseleyê bibîne, bi mîsogerî wê bizane çareseriya leşkerî ne çareseriye. Hîn ji niha ve di vê mijarê de hinek vexuyan hene. Hinek yên muhefezekar û êrîşkar jî hene. Lê dikare bê rewşek wisa ku, çareseriya siyasî ya herî raste. Wisa difikirim ev xal wisa pêşbikeve û wê pêvajoya me ya çareseriyê jî nêz bike. Dibe şaş bim lê, dikarim bêjim wê gerîlayek bihêz, artêşê bêne riya çareseriya siyasî.

– Di van têkoşînan de li pişt rêxistinan her tim hinek hene. Alîkariya çek dikin. Hûn ev alîkariya sîlehê yan jî alikariya finansmanê ji cihek digirin, yan jî bi hêza xwe vê pêş dixin? Yanî mesele Rusya alîkarî dide we?

---.: Bi mîsogerî me ji yek ji wan guleyeke tenê, qureşek tenê alîkariya pere negirtiye. Niha dema em bên ser meseleya hêzên derve, hinek dîtinên min yên min di ev dema dawî de ji tecrûbeyên xwe yên dîplomasiyê bidest xistine hene. Ji we re vê bi awayeke vekirî rave bikin. Çi DYE, çi jî Rojava, heta hinek welat agirbestê naxwazin. Heke wisa pir dibêjin; “*em aligirê çareseriya siyasîne jî*,” li vir destnîşan dikim ku ev dirûtiyeke. Rojava vê pir baş ferq kiriye: Tirkiyeya ku ji hêla PKK’ê ve tê tengavkirin, Tirkiyeya heya dawî bi Rojeva ve tê girêdane. DYE di polîtîkaya xwe ya Rojhilata Navîn de vê pir baş tesbît kiriye: Herku ji hêla PKK’ê ve tengav bû wê Tirkiye hîn zêdetir DYE’ê

hemêz bike. Almanya jî vê baş dizane. Û bi mîsogerî hêzên xwe di mijara çareseriya riya siyasî de bikar neanîne. Dirûtî kirine.

Ji ber li gorî wan, wê Tirkiye PKK tengav bike, PKK hevceyî Rojava bibe; PKK Tirkiyê tengav bike, her wiha Tirkiye herî zêde jî li ber Rojava bigere. Bi kevirek li du çûkan didin. Çima piştgirî bidin agirbestê! Divê parlamenterên Tirk jî vê hinek fam bikin. Tenê ji bo îdaya PKK "*terorîste*"bimeşînin tawîza ku nedane Rojave nîne. Tenê ji bo Almanya "*PKK'ê di rewşek terorîst*"de bigere tawîzeke ku nedabinê nîne. Li Almanya ev ji Tirkan re şeref anî? Rêz anî? Na! Dibe hikûmeta Alman di Asya Navîn de hinek berjewendiyan bidest xistibe. Dibe li Anadoliyê hinek berjewendiyan bidest xistibe. Lê mîsogerî ji bo gel hîn zêdetir xwîne, hîn zêdetir biçûk xuyakirine û hîn zêdetir hestên neteweperest yên pêşdikevine. Bi mîsogerî DYE jî di nav vê de ye. Lobiyên li DYE'ê, wê ne PKK'ê, dibe DYE Tirkiyê bixe tengaviyê bixwazibe hinek tawizan ji wan bigire. Avrupa dirûtî dike. Franse jî wisa ye; polîtîkayeke pir sînsî dimeşîne, dixwaze Tirkiyê bi xwe ve bide girêdan û di mijara ji Tirkiyê tawîz girtinê de meseleya Kurd bikar anî. Nizanim wê Tirkiye jî, bi meseleya Kurd çiqas Rojava têr bike. Bi tawîz dayîneke zêde re wê bikare çiqas meseleya Kurd çareser bike? Divê bêjim ku ev ne riyek raste, polîtîkayeke pir tawîzkare, polîtîkayeke Osmaniyan ya sedsala 19. Encam Tirkiye -Osmanî- wê demê belav bûye. Ev polîtîka, wê biratiyeke Kurd-Tirk jî xira bike. Û Rojava vê dixwaze. Divê hûn vê hinek fam bikin. Ez vekirî dibêjim; heke siyaseta Rojava alîgirê çareseriyê bûna, dikariyan giraniya xwe deynin. Çavdêriyên min bidest xistine; PKK'ê hinek din tengav bikin, Tirkiye "*hûn hinek din bi ser de biçin*." Çima? Ji ber ev ji bo berjewendiyên wan guncava ji ber wê. Divê ev bi baldarî bê nirxandin. Ji ber wê, min nêzîkatiyên wan pir bi rêzdarî negirt. Heta dibêjin; "*şer bidomînin, pêş bixin*." Lewra weke min gotî, heke Tirkiyê ne ji bo Avrupa agirbestê xwestiye û sepandiye, heke bi îradeya xwe ya azad bi armancek siyasî bikar anîba, wê ev pir baş bûba. Di vê mijarê de tişta ji destê me hat me kir. Lê rewşa heyî, mixabin ne li gorî berjewendî herdu gelan û welatane. Ji ber vê ji van hêzên derve ne alîkarî girtin heta bala wan kişandin û ji daxwazên wan yên hevdîtinan re jî zêde naxwazim bi pêwendîdar bersiv bidim. Dîsa dixwazim xwe bispêrin hêza

xwe ya cewherî. Û raya Tirkiyê hinek din bikevin dewrê û heta artêşa Tirk ji bo çareseriyê tengavkirin hîn zêdetir guncav dibînim û weke rêbazeke pê îtîbar dikim dinirxînim.

Dengê wan dernayê. Û bi dîrektîfên ji hikûmetê girtine ev helwestên xwe didomînin. Ew di ferqa kar de ne. Tirkiya tengav dibe, Tirkiyeya pir girêdayî xwe kirine. Tirkiyeya girêdayî xwe kirine ji bo berjewendiyên wan yên di Rojhilata Navîn de Tirkiyeke pir başe.

Di nava vê pêvajoya hatî destpêkirin de tevî operasyonên di herêmê de hatine kirin, koçberî û mirinan, him di vê herêmê de, him jî di Tirkiyê de rihetbûnek hatiye jiyîn. We jî vê îfade kir. Bi taybet mirovên Kurd jî ketibûn nava hêviyek. Raya Tirk jî hîn germtir nêzî bûyerê dibûn.

- Hûn hewl didin girîngiya biratiya Kurd-Tirk destnîşan bikin. Divê gelê Tirk bûyerê bibîne û rastiyê nasbike. Niha nîqaş herî zêde di vê astê de pêşdikeve: Dema ji bûyera Çewlikê dikevin rê, gelo PKK, raya Tirk çiqas digire rojeva xwe?

---.: Di vê mijarê de bûyera Çewlikê bêşansî bûye. Û wisa-weke hatî gotin- bi taybet di pîlansaziya min de pêş neketiye. Bêjin, lê hema diyar bikim ku rewşa raya giştî jî ketî nav nerastîbîne. Heman rewş me xirabtir jiyan kir. Beriya niha çend rojan 15 gerîla di pevçûnek pir xirab de hatibûn îmhakirin. Û dîsa her roj gund tên valekirin. Min gotibû wê li hember vê bertek pêşbikeve, mîsîleme çêbibe. Heke ew yêkîneyên li wir hinek din bi baldarî tevgerîban, wê ev bûyer pêk nehatiban. Heke ew yêkîne -yêkîneyên operasyonê- nebûna, dîsa wê ev bûyer nehatiban jiyîn. Ji ber wê divê bûyer bi awayeke objektîf bê destgirtin. Bi mîsogerî berîhevdan ji aliyê yê dijber ve hatiye destpêkirin. Lê bi vî rengî rûdan min jî zêde bi wate nedît. Û pêvajo çi bi şer bê kurkirin, çi jî bi agirbestê bê kurkirin min hinek zû û bi awayeke mezinî nirxand. Lê heke alî di çareseriya bingehîn de bi israr bûna, wê ev bûyer neqewmûya û di dema pêş de dibe bûyerên bi vî rengî zêdetir pêşkeve. Ji dêla raya giştî di vê mijarê de yekalî daraz pêşbixe, ji dêla bêje wisa tol rake, bila me jî hinek fam bike. Gundên me jî tên valekirin, hêjmarek zêde mirovên me tên qetilkirin. Wiha bi xwe dibêjin; me li vir li 150 kesan da, nizanim li wir li çend kesan da. Ev jî mirovin. Û tên dorpêçkirin. Mesela windahiyên dawî yên Sîlwanê di bin dorpêça tangan, dîsa bi

qobreyên sûper hevalên me di geliyek de qed qedî dikin. Û termê wan parçe parçe ye. Niha li gelek şûnan jî qala dewsên çekên kîmyawî dikin. Raya giştî çima vê nabîne? Niha rondik divê ne ji bo yê aliyek be, ji bo herdu aliyan be. Hêvî, tenê ne ji bo gelek divê ji bo herdu gelan be. Pêwîste raya giştî bi nêzîkatiyeke şoven yê yekalî temaşe neke û li gorî min divê çapemenî jî di vê mijarê de pirole nebe. Windahiyên ji herdu hêlan ve çêbûna êş daye, pêwîste bê gotin ku divê herdu aliyan jî windahî nedaban. Wê ev helwesteke hîn baştir be. Yê para me dikeve dikarim wisa îfade bikim. Em ji vê bûyerê kêfxweş nebûn yan jî ne çavsorî xwîn rijandinêne. Bi mîsogerî rewşeke teslîmyetê ya neyê qebûlkirin heye û rewşeke kişandina jovaniyê heye. Ev ji bo me ji mirinê xirabtire. Ji vê zêdetir, riyeke din ya binamûsî û bişerefiyê nîne. Divê gel vê fam bike, gelê Tirk jî fam bike, rayadarên dewletê jî vê fam bikin û ji me re riyeke çareseriya mirovî ya hîn baş û birûbet vekin. Dibêjim heta pêşniyarên we jî ji hêla me ve girîng in.

Ev qanûna derxistin qanûna me jihêz xistine. Aliyê vê yê erênî li kî derêye? Yên derketine çiya, giyanên xwe danîne holê derketine û heya bigihin armancên xwe jî wê li çiya bimînin. Vekirî dibêjim, heta rojê yêk jî teslîm nabe. Heta li gorî min, bêyî îmha bibin dikarin esîr bibin; lê heta esîrbûnê jî qebûl nakin. Bi van biryaran re kes ji çiya danakeve. Ji dêla vê gavê, min pêwîstiya gavên hîn bi îstiqrar çawa bên avêtin di serî de gotibû. Naxwazim dubare bikim.

Ger bûba dibû hîn baştir bibe. Di vê wateyê de -min got ku-bêsiûdî bûye. Bendewariyên min jî di vî alî de ne.

– Başe ger we bizanîba wê operasyonek wisa çêbibe, hêza agahî dayînê jî hebûya û gotibûna “*em amadene 33 leşkeran bikujin, birêz Serok. Em operasyonê dikin*” wê rewş hîn cudatir bûba?

---.: Taxtîkî…

– Na, di wê kiliyê de şansê we yê asteng kirinê hebûya.

---.: Taxtîkî. Min vê bi awayeke rexne ji wan re jî ragihand. Madem çalekî dikin, amadekariyên xwe temam bikin. Çalekiyên nikarin ji bin derkevin çima bêwext û di şêweyên neguncav de dikin. Ev rexneya mine. Ez vê rexneya xwe li vir jî didomînim. Ez polîtîka vekirî dikim. Hema ji hemû eniyan re rexneyên min

yên tund hene. Pirsgirêkeke gotin gudarnekirin nemijara gotinêye. Rewşek wisa nîne. Hinek nav di çapemeniyê de tên peytandin. Cemîl Bayik, nizanim Şemdîn Sakik. Cemîl Bayik li vire, weke dixwazin dikarin hevdîtin bikin. Ji bo bersivdana pirsên we hatine. Bi Şemdîn Sakik re jî kengê bixwazin dikarin we bibin bi têlsizê baxivin. Li wir komeke tenê gerîla ku gotin gudar neke nîne û heta ji min zêdetir talîmatan pêk tênin. Wiha vê jî bivê wesîleyê dibêjim. Lê ji aliyê hinek yêkeyên me ve, hinek tevgerên wan yên ku em xeter dibînin pêşdikevin û ev jî rê liber îmhaya wan vedike. Asta pêşkeftineke baş jî bidest xistiye. Em ê ji niha şûnde şereke rêkûpêk, cara yek bi kontrol pêş bixin.


Mîsogerî nêzîkatiyên dewletê, di riya çareseriya polîtîk de ne gaveke. Bi qanûna poşmantiyê re, bi berfirehkirina wê re ne gaveke nû ye bikeviyê; wiha di mijara çareseriya polîtîk de weke gavek nanirxînim. Ev bi awayê polîtîk teslîmkarî, bi awayê leşkerî jî gava paqijkirinêye. Dikarim vê hîn zêdetir vekim. Yanî ger bersiva min nebes be. İnönü jî berê ev rêbaz sepand. Li Dêrsimê xistin, li Agiriyê xistin, hema piştre hinek efûyên bişert derxistin. Yê hatiba bidarvekirin hat bidarvekirin, yê teslîm bûba teslîm bû û li ser meseleya Kurd jî hat betonkirin. Ez bawerim, ger berxwedaniya me nedome, ji bo careke din meseleya Kurd vejîn nebe wê li ser bihatiba betonkirin. Tenê ji bo pêşiya vê betonbûnê bigirin vê çalekiyê dimeşînin. Ji bo me ev meseleyeke mirin-mayînê ye.

– Li gorî we çima beriya niha nekirin?

---.: Dixwestin şer di aliyê xwe de bi encam bikin, ji bo wê taxtîkeke. Hikûmet, li gorî emrê ji kontragerîla girtî taxtîk dike. Rewşeke bingeha xwe ji îradeya hikûmetê girtibe nîne. Hûn dizanin biryarnamê Desteya Ewlekariya Milî (D.E.M) derxistiye. Bingeha xwe ji askeriyê digere û taxtîkeke askeriye. Ne gaveke siyasî ye.

Naxwazim dem diyar bikim. Amadekariyên me bi rewşa heyî ve heta zivistanê dikare pêvajoyê kur û araste bike. Yanî amadekariyên lojîstîkê yên deh hezar gêrîla bide jiyîn û rewşa wê ya meşandina şer heye. Cara yekem amadekarî ewqas berfireh, rêkûpêk û demek dirêj digire. Em her roj jî derfetên dirêjkirina şer pêş dixin. Heta rewşa agirbesteke din derkeve holê jî yan jî derfetên çareseriya siyasî pêşbikevin, dê ev pêngav bidome. Ger

nîşaneyên çareseriyê yên cidî, yanî rêya çareseriya siyasî vebe, dîsa ne agirbesteke yekalî rewşa agirbesteke dualî, derfet û mercên wê derkeve, bawerim wê ev şer zêde nebe. Yanî heke em ji aliyê din, di mijara kurdan de nîşaneyên rêya çareseriyeke hevgirtî bibînin û agirbest jî ne yekalî be, dîsa vîneke wan jî derkeve holê, yêqîn dikim ku ev car pêvajo hîn kûrtir, berfireh û bi riya hevdîtinên rû bi rû ya ku şer tê de dikeve pîlana duwem yan jî hêdî hêdî tê sînordarkirin, wê bikeve qonaxa li şûna vê rêbazê çareseriya siyasî pêş dikeve. Ji bo vê dem diyar nakim. Heke heta payîzê operasyon encam nedin, dê hikûmet bikare li ser piyan bimîne? Ger em zêdetir hêz qezenc bikin û teqez bi riya leşkerî ji holê ranekirina me derdikeve holê, wê artêş bikare giraniya xwe dane? Gelo di nava artêşê de dê beşek helwest diyar bike? Ger pêşketineke wisa pêk bê, dibe ku leza ev şer kêm bibe û bikeve pêvajoya siyasî. Wê aboriya Tirkiyê rê li ber rewşeke siyasî ya giran veke, bawerim dê çareseriya meselê ya bi riya siyasî jî xwe ferz bike. Rewşeke wisa derkeve holê, lewra ev niyaz başin. Û ji bo em ji eniya xwe ve vê ronî bikin, ji bo rê vekirî bihêlin em ê bersivên herî baş bidin û heta hûn jî vê pêvajoyê bişopînin. Ji ber ku niha mijara herî balkêşe. Me û aliyê din tengav bikin. Ji bo navbênkariya agirbestê li şûna rêxistina polîtîk filan û bêvan, yên ji vî karî re herî zêde hewl didin, heta weke kesên xwîn didin rist lîstina we li gorî min guncave. Navbênkarên herî baş hinekî jî damezrînerên weşan-çapemeniyê ne. Ji ber ku yên herî zêde nêzî raya giştî ewin, yên ku herî zêde raya giştî dibihîzin ewin. Min jî tengav bikin, wan jî tengav bikin. Me jî ji bo agirbestê tengav bikin wan jî. Ji bo çareseriya polîtîk me jî tengav bikin, wan jî. Di vê mijarê de her tim daxwazên xwe ji me re ragihînin. Ez divê baweriyê de me ku weke saziyeke cidî divê nirx jê re bê dayîn. Hinek endamên çapemeniyê xwestin hinek ristên wisa bigirin. Li gorî min bi awayeke berfireh meşandina vê guncave. Yanî ne weke peyam ji wan girtin ji me re anîn, ji me girtin ji wan re birin, gel vê dixwaze. Di nûçeyan de vê bikar bênin, şîrove bikin. Dem bi dem serî li me bidin, hûnê bibînin ku ji aliyê me ve ti neyênî yan jî rewşeke girtî nîne, hûn dikarin ji vê piştrast bin.



*“Serxwebûn daxwaza her miletî ye. Serxwebûn jî weke cihekariya bi dewletê re sînordarkirin ne rastbînî ye. Wê rojek bê, netew di nava yek civaka siyasî de bin.*

*“Heta niha ji hatina kuştinê netirsiyam û pir azad mam.”*

*Em Hevpeyvîna ku Oral Çalişlar kiriye bi vesaziya wî ve diweşînin.*

**RASTIYA OCALAN FÊM NABE**

**Oral Çalişlar**: Di rojnameyan de nûçeyên weke, piştî Abdulah Ocalan, agirbestê îlan kir şûnde nikare zilamên xwe kontrol bike pêşket. Tê gotin ku çalekiya Çewlikê jî ji derveyî kontrola Apo pêkhatiye. Dîsa şîroveyên mîna yên vê çalekiyê kirine, hûn ê nikarin ji niha şûnde tiştek bi wan bidin kirin hene.

**Abdulah Ocalan**: Rastiya Abdulah Ocalan, yek ji diyardeyên herî kêm fam dibe. Min ji bo vê tenê ne raya giştî, ji bo avaniya rêxistina me ronî bikim, li ser rastiya Rêbertiyê çend berg nirxandin kir. Em berdin raya giştî, nebawerim hevalên me yên partiyê me baş fam kirine û şîrove kiribin. Lê ev jî rastiyeke, girêdaneke di ti rêxistinan de nehatî dîtin, heta ji min zêdetir bi cesaret û fedekartiyeke mezin xwe nezîrkirin, dikarim bêjim di hemû hevalan de tê dîtin. Ev bûyerek zêde balkêşe. Evqas kêm fam bike, lê evqas balkêş xwe bidê.

– PKK'ê agirbestê îlan kir û got ku, ger hatina ser me çênebe em ê êrîş nekin. Di raya Tirkiyê de, baweriya wê dewlet bersiveke erênî bide zêde bû. Lê bi çalekiya dawî ya Çewlekê re hat gotin ku gerîlayan li Abdulah Ocalan guhdar nekirine. Abdulah Ocalan

dixwest agirbestê bidomîne, lê ji ber kontrolê winda kir ev bûyer pêkhat, lê piştre neçar ma xwedî lê derkeve.

---.: Gelek caran vê pirsîn û gotin. Bûyer hinek cudatire. Talîmateke me yê giştî habû û me gotibû ger artêş êrîşî ser me bike, hûn dikarin mafê xwe yê misîllemê bikar bênin. Heta me di derbarê Amedê (herêma Diyarbekirê) de gotibû, we pazde gerîla winda kir, hûn neçarin misilemeya vê bikin. Bawerim dibe ji vê bandor bûbin. Sepandinek wisa derxistin holê. Lê bi awayeke taybet, ger gotiban çalekiyeke wisa heye, em çi bikin, minê jî gotiba şêwazeke cudatir pêş bixin.

– Mesela?

---.: Dikarîn di demeke cudatir de kiriban.

– Ez dibêjim ku, Abdulah Ocalan dikarî wisa bike: gotiba birayê min, me dema agirbestê dirêj kiribû lê dewleta Tirk tê ser me, em vê ji vê kêliyê şûn ve radikin. Bêyî ev bê gotin, pêkanîna çalekiyê li gorî mantiqê xwe hûn dikarin rast bibînin?

---.: A rastî li dijberî me bikar anî.

– Ger we wisa kiriba ma wê hîn hevgirtî nebûya?

---.: Li duv îlaneke fermî pêşkeftiba bêguman wê hîn bi wate bûya. Ev hemû dikare weke pirsgirêkên taxtîk bên destgirtin. Bingehê meseleyê eve: Dewlet sond xwariye me ji çiya daxe û bi pêşxistina qanûna poşmantiyê re teslîm bigire. Cewherê meseleyê eve: Piştî ev polîtîka nehat guhertin şûnde, çi îro çalekî çêbû, çi jî sibe, yan mezin bûye, yan jî biçûk, ya bi çek, yan jî bê çek ti girîngî îfade nake. Bi giştî di polîtîkayê de guhertin nîne.

– Ma we di helwesta dewlata Tirk de guhertinek hîs nekir?

---.: Guhertin, ji hêla çareseriya siyasî ve bi xeter û bê wate bû. Me beriya niha kêliyek di radyoyê de biryarnamê gudar kir. Niyeta wî eve: Bila yên li çiya bên, wê bêku pêketinek li pê wan çêbibe biçin malên xwe. Piştre operasyon pir xurt pêş dikeve, dibêjin yên danekevin wê îmha bibin. Wê piştre meseleya Kurd, li ser bingeha operasyonan çareser bibe. Di vê meyzandinê de polîtîkaya tenkîl ya Komara Tirk a 70 salî heye. Dixwazin heman bisepînin. Heta li Başûr rejîma Iraqê, otonomiyê jî da û gelek qanûnên afûyê yên dişibe vê derxist. Piştî neteweperestiya îlkel jî otonomiyê qebûl kir şûnde, radîqalbûna di çareserkirina pirsgirêka netewî de tine hesiband û qala teslîmkariyeke bi şeref dikin. Ma bi şerefbûna teslîmkariyê heye, ev mijareke cuda ye. Bi

vê re dixwazin raya xwe ya giştî têr bikin. Ev rû nêzîkatiyeke rûreşiye. Û ji bo tehrîkirina me ye.

– Ji aliyê Tirk ve hizrek wisa heye: Bi îlankirina Apo ya agirbestê re, operasyonên ku wê dewletê bimeşandiba da sekinandin. Bi vê riyê wext qezenc kir, wê careke din dest bi çalekiyan bike. Divê ev operasyon bên domandin û bêyî fersend ji Apo re bê dayîn şer bidome. Raya giştî, wisa bawere ku wê operasyona dawî PKK'ê tine bike û bi bandoriya perteka xwe ya li hember êrîşa Çewlikê, piştgirî dide operasyonê. Ma tehdîteke wisa ya tinebûnê heye?

---.: Hûn dibêjin piştgiriyeke wisa ya raya giştî heye?

– Nebêjim teqez piştgiriyek heye, herî kêm bendewariyeke wisa heye. Bi vê operasyona dawî re, bi qasî me li nûçeyên îro gudar kirî bi Îranê re îtîfaqek ava dikin. Tê qalkirin ku Îran jî dest bi operasyonan dike.

---.: A rastî wargeheke me li Îranê nîne.

–Li gorî we helwesta Îranê çiye?

---.: Şêwaza me ya pêşkeftina xwe dispêre têkiliyên derve piroleye. Dixwazim pirsa yekem, yanî nêrîna dibêje bendewariyên raya giştî bibersivînim. Tê gotin ku "*bawerin artêşa me îsal pir bi amadekariye, bi operasyona havînê re wê PKK'ê xilas bike.*" Ez jî dibêjim ku bila rojnamevanên objektîf bên biçin li Kurdistanê bigerin û em jî wan li hemû eniyan bigerînin. Ka biçin temaşe kin, hêzên bi operasyonek yan jî bi pênc operasyonan ve heya sala 2000 bên tinekirinin? Yan jî hêzên pir zêde mezin bibine? Wê demê hûnê bibînin û ji raya giştî re ya rast ragihînin.

Biçin û jixwe rojnamevaniya herî baş wisa tê kirin. Niha, tişta herî heyecan dide mirovan rojnamavanî ye. Ji qada navnetewî jî gelek tên. We li hemû eniyan bigerînin. We ji lûtkeyên Agiriyê, heya qûntarên Munzurê, ji Binboxayan, heta Torosan hema di hemû qadên de, ji çiyayên Botan, Xarzan heta Çewlikê bigerînin. Wê demê hûnê bigihin nêrîneke objektîf û dîtinên xwe binivîsin. Bersiva vê jî wisa tê dayîn. Nêzîkatî û çeperên artêşa Tirk jî bibînin, yên me jî bibînin, wê demê ez ê bêjim zanyariyên rast bidin raya giştî. Lewra raya giştî jî bikeve nava bendewariyeke rastîbîn. Her wiha naxwazim li vir îda bikim. Lê ger îla dixwazin fêr bibin, dibêjim heya sala 2000

bingehê artêşeke baş ya gerîla hatiye avêtin. Û her ku biçe wê mezin bibe. Dîsa pêşkeftinên wê yên siyasî wê di astên baş de be. Wê girseya xwe jî pir baş birêxistin bike. Wê asta xwe ya çalekiyan jî pir baş pêş bixe. Çeperên xwe yên derve jî pêş bixe. Dûr nêz, em ê wan bênin asteke ku bêjin ev kar kareke pêwîst bû me bi riya siyasî çareser kiriba.

– Hûn dibêjin di dawiyê de wê careke din çareseriya siyasî bê rojevê.

---.: Belê ew misogere. Ev çareserî çawa tê astengkirin, çîroka wê girînge. Li gorî min yên armanceke wan ya siyasî nîne, yên ji ber kursî û metirsiya berjewendiyên xwe yên kesî, li pêşiya vê astengin. Wê kî bibe Serok-komar, kî bibe serokê filan partiyê, kî hilbijartinên xwecihî qezenc bike. Hemû polîtîka li dora vê dizivire. Ji bo ev jî bihêz diyar bibin weke Wezîrê Karên Hundir jî kirî, dibêje; "*min evqas serî jêkir*." Yek din dibêje; "*ez ê hemû tedbîrên radîqal li hember terorê bigirim*." Yeke din dibêje; "*di vê mijarê de helwesta ji hêla yêkîtî û yêkbûna milî ve ji dewletê zêdetir ya me ye.*" Di vê mijarê de hemû di nav pêşbirkê de ne. Lê pirsgirêkên Tirkiyê jî wisa berfirehin ku bi berjewendiyên kesan û partiyan nayê girtin. Her wiha pêwîstî bi serokên asoyên wê berfireh û ji berjewendiyên kesî dûr heye. Qirîza Tirkiyê hinek di vir de ye.

Li vir erkeke ya gelê Tirk jî neçare hinek bicî bêne heye. Lewra dibêjin, her gelek lîderê layîqe xwe, rêveberiya xwe dibîne. Lê li gorî min gelê Tirk ji niha şûnde ji bo çareseriya pirsgirêkan, layîqê rêberên berendame. Yan jî divê wan rêberên biafirîne.

Pêwîstiya Tirkan jî bi xweserbûnê heye.

– Hûn ê Kurdistaneke serbixwe ava bikin?

---.: Xweserbûn daxwaza her mileteke. Xwesertî jî wisa bi cudakariya dewletê re sînordarkirin, nerastîbîne. Wê roj bê, hemû netew di nava yek avaniya siyasî de bibin. Lê wê statûyeke herî xweser jî jiyan bikin.

– Mînak li Tirkiyê dibêjin ku: "*Çi heye birayê min dabeşkari bê kirin. Hemû maf ji Kurdan re tê dayîn, piştre dikarin hertiştî bikin. Ev hîn, dibêjin em ê dabeş bibin dabeş bibin derdikevin beramberî Tirkiyê*."

---.: Mantiqeke înkarker û nêzîkatiyên apolîtîk yên naxwazin rastiyên siyasî fam bikine. Heta rastiya Tirk jî, xwe tam serbixwe

nekiriye. Li gorî min, bi seriyê tanzîmatê û bi seriyê uyduyê li beramberî Rojava jiyan dikin. Pêwîstiya wan jî bi xwesertiyê heye. Serxwebûn wekheve nayê wateya bûna xwedî dewlet. Dema serxwebûnî dibe devji yêkîtiyê berdan jî çênabe. Gelên serbixwe, mirovên serbixwe, mirov û gelên herî baş tên ba hevin. Heta li gorî min yên ne serbixwe û azad, ji mafê bikarîna anîna ba hev jî bêparin. Yên ku îradeya wan nebe ma yekbûna wan tê fikirîn? Dikarin qala yekîtiya koleyan bikin? Dikarin ji yêkîtiya efendiyê koleyek re bêjin yêkîtiyek cidî? Hinek biaqil bin, di vê mijarê de rewşenbîrên Tirk, bi rastî jî tam di kar de nehiştin. Heke yêkîtiyê dixwazin, ev hinek di azadiyê re derbaz dibe. Di yeksaniya maf re derbaz dibe. Yanî ji bo Kurd hinek serbixwe bûn bila nêva wan neqete. Heke serbixwe bibin wê bi rastiya Tirk re hîn bi tendûristî, berhemdar û bikevin naba helwesteke berjewendiyên hevdu esas bigirin.

– Gelên Tirk û Kurd xwedî dîrokeke hevpar yê pir kevnin. Di herêmên Tirkiyê yên Rojava de şêniyeke girîng yê Kurd jiyan dike. Mînak, li Îstembol, Çukurova û Egeyê şêniyeke girîng yê Kurd heye. Heke cudabûn çêbibe, ma wê ev yêkîtî çawa ji hev belav bibe?

---.: Ez ji cudabûnan zêdetir, girîngî didim têgînên xweserî, azadî, wekheviya yêkitiyê. Ez zêde têgîna bila cuda bibin bikar nayînim.

– Hûn vê weke taxtîkek polîtîk bikar tînin? Yan jî bi rastî jî ji bo we tezbîtek wisa kiriye dibêjin?

---.: Serbixweyî, ji bo gelên di nav hev de jiyan dikin diyardeyeke bê pêşxistine. Serbixwetî, ji bo ti mirovî, ji bo ti gelî, ji bo ti netewî netirsin. Di nava heman dewletê de jî mirov dikare serbixwe be. Hûn nikarin serbixwetiyê nîqaş bikin. Yê ku fikrê wê serbixwe be, yê ku polîtîkaya wê serbixwe be, wê yêkîtiyên siyasî baş bike. Lê ma li Tirkiyê mejiyê vê fêm bike heye? Ew wisa dihesibîne ku hertişt bi serdestî û girtina bin otorîteyê re çareser bike. Heke îradeya yê beramber tine bihesibîne, yêkîtiya millî û tekparetiya wî fam kirî pêkhatiye. Heke hûn bivê mejî re jiyan bikin hûn ê hîn pir pirsgirêkan mezin bikin. Hûn ê bênin rewşeke ji bin dernekevin.

*"Asta we ya polîtîk bi qendî ku bi herkesî re pêwendî deyne bihêze."*

– Diyardeya Emerîka, weke li hemû cîhanê bûyî di Rojhilata Navîn de jî hêmanek girînge. Bi derketinên PKK'ê yên dawî re qala paralelbûnek ya di navbera lêgerîna istiqrarê ya Emerîka ya herêmê de tê kirin. Tehlîlek wisa heye, PKK hinek li Emerîkayê temaşe dike wisa nêz dibe. Çine têkiliyên we yên bi DYE re?

---.: Min hîn Emerîka fêm nekiriye. Hinek komên çepgirên Tirk dibêjin "*PKKRojavayîbûn dibe*."

– "*Tê gotin ku ketine bin kontrola Emerîka*."

---.: Xwezka Emerîka nêzî me bûba. Herî dawî ew dostên me çûn Emerîka. Aqilê dayî wan ev bû: "*Ji PKK'êdûr bisekinin*." Em destê xwe dirêj dikin. Ew naxwaze bigire. Ditirse.

– Hûn dixwazin bêjin ne pirsgirêka me ye, ya Emerîkayê ye?

---.: Vekirî bêjim. Ji bo baweriya me bi xwe heye, bi herkesî re dikarin îtîfaqê deynin. Bila Emerîka bê em ê pêwendî pêş bixin. Vê vekirî dibêjim. Pêwendî pêşxistina me, nayê wateya me şerkirina bi emperyalîzma Emerîkayê re berdaye.

– Emerîka, serî emperyalîzma cîhanê ye. Hûn jî ji çanda sosyalîzmê û daneheva wê tên. Bawerim hîn jî sosyalîzmê diparêzin.

---.: Ne hîn, di asta rêber de me.

– Wê demê, ji ciwaniya me ve emperyalîzma Emerîka ya me li hember têkoşîn dikir çû kî derê?

---.: We pir qalkir, sloxanên wê bikar anî, bixwe nekir. Me kêm sloxan got lê pratîka wê baş dikin.

– Wê demê vê pirsê ji we dikim: Çibû ku PKK ya dibêje bi emperyalîzma Emerîkayê re têkoşîn dikim, hêvî ji Emerîkayê dike?

---.: Jibîr neke ku, Emerîka di cîhanê de rêxistina herî bi xeter û sosyalîst PKK'ê dibîne. Vê jî weşandiye. Dibêje; rêxistina herî bi xof û ya herî ortodoks-marksîst. Heke çepgirên Tirk temaşe nakin ma ez çi bikim. Serî kêlî dibêjin PKK nêz dibe, PKK çû Emerîkayê. Ev şêwazê nirxandinên kesên bê serûberin. Zêde nayê cidî girtin. PKK rêxistinek pir radîqale. Heke lîkolîn bikin û bi vî rewşî bimeşînin, tevgereke hemû pîvanên îdeolojiyên heyî û polîtîk serûbin dike derdikeve holê. Rojava di vê mijarê de pir bi îhtiyate. Heta naxwaza fam bike. Nexweşiya sinir digire.

– Wê demê tabloyek wisa derdikeve holê. Emperyalîzma Emerîkayê heye. Rojava heye. Dewleta Tirk heye, Surî heye, Iraq

heye. Hûn di nav van hemûyan de hebûna xwe çawa didomînin û bidin domandin?

---.: Dîsa pêşdikevin. Evên li beramberî me, ji aliyek ve jî dildayî me ne. Nikarin dev ji me berdin.

– Di dema dawî de Surî nêzî Emerîkayê dibe. Dîtinên gelek hawirdoran yên hevpar eve; piştgiriya Şamê ya di hebûna PKK'ê de risteke girîng dilîze. Heke sibe Surî, bi Emerîkayê re hevkarî bike devji PKK'ê berde, wê PKK bikeve rewşek pir zehmet û wê nikare ev kar bimeşîne. Bersiva we ya ji ev teze re çiye?

---.: Gelek tiştên bangî min bikin hene. Asta me ya polîtîk bi qendî bi herkesî re têkilî ava bikin bihêze. Yek jî rewşa welatê me jî ji bo bicîbûnê guncave.

– Hûn dibêjin biçim welatê xwe?

---.: Ez ê biçim herderê. Me ew xala qrîtîk derbaz kir. Tercîh dikim hinek ji van qadan dûrkevim.

– Me îro di radyoyê de li daxuyaniyeke we gudar kir. Hûn dibêjin dikarim vegerim Tirkiyê. Ev çûyînek çawa ye?

---.: Dibe rojek bi awayê rih, fikir û weke têkoşîna siyasî vegerim. Di welatê xwe de yê herî bihêz ez im. Tenê fîzîka min kême. Dibe ew jî rojek çêbibe.

– Hûn difikirin ku rojek weke lîdereke PKK'ê, şer kirî, wek mirovek ji têkoşîna gerîla re serokatî kirî, di parlamentoya Tirkiyê yan jî Tirkiyê de weke keseke meşrû yê siyasî jiyan bikin?

---.: Vegera min a li Tirkiyê, ji nêz ve bi veguhertina Tirkiyê ve girêdayî ye. Pêşeroja Apo bi Kurdistanek, Tirkiyek û Kurdistanek ku makezagona Tirkiyê guhertiye, qanûnên wê guhertiye, di saziyên wê yên bingehîn de guhertinên pirreng ava kiriye. Veguhertin,veguhertina Tirkiyê û veguhertina statûya Kurdistanek tê pejirandine.

– Ev îtopyake. Hûn dibêjin wê wisa bibe. Li gorî we bi awayeke dîrokî guhertinek wisa wê çiqa dem bigire?

---.: Ji utopyayê zêdetir diyardeyeke roj be roj bi pratîkê re pêk tê ye.

– Yanî hûn dixwazin bêjîn wê ev di demeke kin de pêk were?

---.: Girêdayî xebata me ye.Ger em bi vî tempoyê bidomînin, heval jî kêmasiyên cîdî nekin, ne xeyale û ne jî mijareke ji dîroka fî re bê talokirine.

–Li Bakurê Iraqê, yanî li Başûrê Kurdistanê rewşa we çiye?

---.: Hengameyeke li Başûrê Kurdistanê çêdibe heye. Pirsgirêka Kurd bi hev re girêdaye. Herdu wê ji nêz ve hevdu bandor bike. Bawerim, wê di vê hengamê de mêlên şoreşgerî pêşbikevin. Bêçareseriya tê ferzkirin, wê Kurdan hîn zêde ber bi şoreşgeriyeke radîqal ve bibe. Ev jî tê wateya giştîbûna şoreşa Kurdistanê.

– Dema li Bakurê Iraqê operasyon kirin Barzanî û Talabanî bi Tirkan re hevkarî kir. Niha hûn li wirin. Dibe hûn sibe dîsa bi rewşek wisa re rûbirû bên?

---.: Hemû tedbîrên vê hatine girtin. Xwezka li Başûr operasyon çêbe, bikin. Nikarin yek kes tenê jî bibînin.

– Hat gotin ku di dema operasyonê de we rexne li birayê Abdulah Ocalan Osman Ocalan kiriye gotiye te çima li wir kişandinek bi rêkûpêk nekir, bûyî sebeba xusaran.

---.: Min kir. Pir berfireh...

– Bingehê rexneyan çiye?

---.: Başûr sabît bikar anîn. Giran bikar anîn. Bi şêwazeke vekirî yê legal, bibe hedef û bi şêwayê gund bikar anîn. Nikarin gerîla hemêz bikin. Nikarîn li hember zehmetiyên gerîla li ber xwe bidin. Me li hember vir rexne pêşxist û mafdar jî bûn. Tirkiyê ji vê firsend dît. Ne ku ji bo hêzên Başûr rê li ber derneketinê vekirine, di bingeh de ji bo rê li ber gerîlabûna me girtiye li beramber derketim. Û beriya wê bi mehan li beramber derketibûm. Min rexneyên pir xurt jî kir.

– We Osman Ocalan rexne kir...

---.: Tenê ne Osman, min yên di wê qadê de cî digirtin hema hemûyan rexne kir.

– Başe çi bersiv dan?

---.: Rewşeke wan ku tiştek bêjin nîne. Rastî di holê de ye. Ev ferasetên bi vî rengî dibe îmhayê. Hemûyan dît. Li ser midaxeleyên me hat sererastkirin. Li ser xeteke hîn baştir hat rûnişkandin. Niha pirsgirêkek wisa nîne. Ne hevkariya PDK û Tirkiyê dikare me careke din tengav bike û bêne wê rewşê, ne jî avaniyeke kesayeta me heye ku careke din bikeve vê xetayê. Yeksaneye. Kîjan hêz bê bila bê, wê bikare xwe biparêze. Jixwe hemû talîmatên tên dayîn, divê gerîla bi lebat, weke li kî derê

çawa êrîş bike nediyare, hertiştê wan girêdayî tevgera wane û wê rojê 24 demjimêran di nava şêwazeke tevgerê de bin. Bi talîmateke mîsogerkirî re ev di asteke bilind de tê sepandin. Her wiha PKK weke berê li deverek dîtin û lêdana wê mûmkûn nabe.

– Operasyonên dewleta Tirk yên niha destpê kirî xilas bû. Di encama vê de du eltarnatîf hene. Alternatîfek PKK bi bin ket. Alternatîfa din PKK bi bin neket. Piştî derket holê ku PKK bi bin neketiye wê Abdulah Ocalan, bikaribe bêje "*em ji aşitiyê re hene*?"

---.: Wê agirbesteke rastînî çawa pêşbikeve? Bi operasyonên hatin kirin re girêdana agirbestek çawa ava bibe. Li gorî min agirbesta ku me yekalî pêşxistî, dewleta Tirk şaşo maşo kir. Xist nav teşqelê. Xwestin tiştna bikin, ev jî pir kêm bû. Û wisa me xistina nav xeteriyek wêdetir rê ji encamek re venekir. Wê şer kûr bibe. Mîsogere. Sala derbazbûyî, heke bi hezaran kes ji me û aliyê beramber çûn, di dema pêşiya me de pêwîste qala deh hezaran bê kirin. Wê bixwîn bibe. Lê hêjmar wê misoger neyê dayîn. Dibe ji windahiyên salên derbazbûyî zêdetir bibin. Şeş meh, salek, lê wê demê dê ne PKK xilas bûyî, berevajî PKK ya ku di warê leşkerî de binkeftina wê negengaz be derkeve. Dibe bi rastiyeke ku sergirtina pirsgirêkeke netewî nemûmkûn be, êdî alî meşrûyeta hev qebûlkirin û kar birina platformeke siyasî wêdetir careyeke din wan nemîne. Bawerim wê alî di encama vê pêngavê de yan jî bi operasyonên nû, asta pêşkeftina hemleya me ya li beramberî vê temaşe bikin, bigihin nirxandineke bi vî rengî.

– Di mijara Ozal de hinek qeneatên we di çapemeniyê de hatibû peytandin...

---.: Ozal, bi awayeke pir dijwar bi salan li beramberî me şer kir. Li gorî min Ozal koordînetorê şerê taybet jî bû. Lê bi taybet piştî salên 1990'î şûnde fam kir ku wê bi rêbazên tenkîlên şer pirsgirêka netewî çareser neke û Tirkiye pir xwîn winda bike, ne avaniya wî ya siyasî, ne jî aboriya wî wê bikaribe vê rake, dît narake û bi ser lêgerînên nû de çû. Ozal ji wê demê ve ji me re jî peyam dida. Birêz Güneri Cıvaoğlu jî, hinek bibîrxistinan dabû. Weke em ê agahî bişînin.

– Bi rastî jî peyama Ozal ji bo we çêbû, we peyamek vekirî girt?

---.: Ji şêwazê tevgerîna Ozal, ji beşekî wê me peyamên ku baldar û bi bandor pêşwazî dike girt. Êdî ev nexweşiyên din hene. Encama wê ye, yan jî encameke têkoşîna me xistiyê, pir zêde nizanim. Hewl dide weke me bi taxtîk bibe.

– Em bên ser mijara komara duwem. Dibêjin ku, "*Apo bûye komarparêzê duwem.*"

---.: Me got dibe derketina komara duwem biwate be. Komara yekem xeniqiye, me vê nirxandinê ji zû ve kiriye. Nirxandinên me yên di derbarê komara yekem de piştî salên 1980'î pir berfirehin. Di pirtûka me ya "*Faşîzma 12'ê Îlonê û berxwedaniya PKK'ê*" de ev hene. Her wiha beriya Ozal, nirxandina komara duwem xususeke me dixwest bênin zimane. Berevajî têkoşîna me çiqas ev tinebûn saz kiribe, Ozal jî ev dît û dest bi pêngavek nû kir. Min jî bersiva erênî da vê.Hevalekî rojnamevan yê ku em baş nasdikin bi destê xwe îşareta sutû jêkirinê kir.

–Ev lebat tê çi wateyê?

---.: Ozal çû, mixabin bi rastî jî çû. Dibêjin bi nexweşiyê çûye. Li gorî min dewletê wî ji çav xist. Yan jî komarparêziyên yekem wî ji çav derxistin. Bêtedbîrtiyên di mirina wî de di astek pêş de bû. Yek jî wê rojê bi xeter jî ba bi rastî jî dixwest di mijara meseleya Kurd de hinek tişt bike. Û vê, di nava dewletê de hinek hêzan xist nava panîkê. Êdî di vê mijarê de nîqaşa çû, yan jî birin zêde wateya xwe nîne. Lê Ozal wê di asteke qirîtîk de, di derbarê meseleya Kurd de hinek gav bavêtiba. Wisa yan jî wilo neavêt.

– Dema komara duwem tê gotin tabloyek wisa derdikeve holê: Hûn dizanin dibêjin li Tirkiyê yên komara duwem diparêzin ji rê derketine. Abdulah Ocalan jî weke marksîstek bi van donekan re komara duwem difikire, hûn vê bihevrebûnê çawa rave dikin?

---.: Komara duwem ya ez difikirim, li cihek komara duwam ya bi têkoşînê re pêk were ye. Ne komareke giranî kaptalîzma yekdestdar ya Tirkiyê, komareke zêdayî gel. Komara duwem, komara gele.

– Yên îro li Tirkiyê komara duwem diparêzin, hûn dizanin hawirdorên herî zêde nêzî sermayeya mezinin.

---.: Ferasetên wan yên komara duwem herî zêde li gorî orîjineyên çînên wan cudane, komara me ya duwem xwe dispêre gel, nemaze komara şoreşê anî cuda ye.

Tenê şibandina navan heye. Komara yekem a statûkaparêzan jî zêde necûda ye. Vê jî antî parantez diyar bikim. Komareke xitimiye, emareyên xwe yên jiyanê tine kirine û bêzarbûnê têne. Êdî ji derveyî nexweşî û tengezariyê berhemeke wê din nîne. Alîgirê tesfiyekirina wê me. Li gorî min yekdestdar, li gorî statûkoparêzan fonksiyonek hîn pêşdetir dibînin. Lê çareseriya me ya gelparêz jî bêguman dikare fonksiyonek bibîne.

– Hûn dibêjin ne heman tişte.

---.: Bêguman. Pir vekiriye. Ji bo hinek sloxanan bikar tînin, nêzîkatiya weke hevbûn kirin berevajîkirine. Nexweşiye. Bingehê çîna komara duyem, çawaniya wê ya demokratîk û çareseriya ji bo pirsgirêka netewî bêne wisa diyar dibe ku heya bêjî wê di çarçoveyeke cuda de bigiri dest. Ji ber wê êdî ji kesên rêderketî re jî komarparêziya duwemin gotin nêzîkatiyek pir tenge. Divê ku mirov şer û spî, dox û kayê ji hev cuda bike û bifikire. Bi mantiqê teng fikirîn wê ji raya giştî re jî sûd neyne.

Li ser jiyana rojanî…

– Hinek jî ji derveyî mijarên siyasî li ser mijarên çandî û jiyana Abdulah Ocalan ya rojane baxivin. Hema hertişt ji we pirsîne, di derbarê we de hertişt hat nivîsîn.

---.: Ev raya giştî Apo çawa dinirxîne?

- Mînak nirxandinek: Bawerî bi Abdulah Ocalan nayê. Got agirbest, piştre çû 33 leşker kuşt.

---.: Heke di cîhanê de miroveke tenê bawerî pê were hebe ew jî Abdulah Ocalane.

–Lê ev nirxandina we ya kesî ye.

---.: Biçe vê ji dostan bipirse. Heta dijmin jî dizane ez çiqas dirûstim.

– Bersiva hûn ji îmaja bawerî bi Apo nayê bidin wê çibe?

---.: Tu bêjî Apo nayê lîstokan û nayê xapandin baştire.

Heke bêjin “em xwedî kevneşopiya dewleteke pir kevin û polîtîkayê ne. Em ê li dor zilameke mîna Apo bikevin bênin lîstikê, wê demê bi rastî jî bi Apo nayê bawerkirin û zû bi zû nayê xapandin. Lê pirsgirêkan bi awayeke bingehîn girtina dest, bi rastî jî bi niyeteke baş li ser bingeha rêzdariya girêdana bi rumet û

azadiya mirov re, heke bêjin bi Apo re kar dibe, lewra hûn dikarin heya dawî pê bawer bin.

– Em ê vê pêşkêşî raya Tirk bikin. Wê raya Tirk, nêzîkatiyan bişopîne biçe biryarek.

---.: Ez amade me. Bila gelê Tirk çareseriyeke ji bo onur wekheviya mirov bipejirîne; gelê Tirk çareseriyeke ji bo vê guncav bipejirîne; bila ji min re bêje bi vê riayet bike, heke min milîmek derbaz kir bila di derbarê min de biryara xwe bide… Ez amade me serî xwe dirêj bikim. Ma ji vê zêdetir hîn çi bêjim? Binpênekirina min a rumeta mirov û daxwaza min a hinekî bûyîna gelekî azad xirab pêşwazî nekin. Ev li nîjada mirov tê. Heke ev hemû sexte bin, min misqalekê derbaz kiribe, hûn çi dikin bikin. Yanî bibin celat bêyî ev li stûyê me bike îfadeya me bigirin.

Apo xwe çawa dinirxîne?

– 20-25 sale Abdulah Ocalan dinasim. Ji dema SBF ya xwendekariyê ve dişopînim. Dema li pişt xwe dizivirin temaşe dikin xwe didin ber lêpirsînê dibêjin min him di warê siyasî him jî bi awayeke kesî van xetayan kir?

---.: Jixwe nivê hevpeyvînên bi rojnamevanan re nîqaş di derbarê kesayeta min de bûn. Yanî min xeta kir, ango poşmanim?

– Nabêjim hûn poşmanin. Poşmanbûn tiştek cudaye. Yanî dema hûn xwe dinirxînin. Mirov dem bi dem xwe diwezîne.

---.: Bi xwe re şerek pir tirsehêz dimeşînim. Sozeke min heye. Yanî dibim zilamê zilma herî mezin li xwe dike. Bi xetayên xwe re şer dikim. Ger hûn bêjin yê ku nakeve nava pêşdarêzan, ji pêşdarêzên xwe, li beramberî ecibandinên xwe yên ku herî zêde derdikeve kiye, ew jî ez im.

Xwe na ecibînim. Ji bo xwe bênim astek biecibînim heke bêjin yê hertiştê xwe datîne holê kiye, ew jî ez im. Li dora rastiyê diçim têm. Li pey mûkemelbûnê me. Mîsogerî bi objektîfbûnê re pêwendiya xwe qut nakim.

–Mînak hevalên te we rexne dikin? Mesela Cemil Bayık.

---.: Rexneyên hevalên min li min dikin, li gorî rêbazên xwe ne. Pir rexne dikin.

– Çawa rexne dikin?

---.: Xususên herî rast dizanim berevajiyê wan xistina jiyanê. Ev rexneyek mezine. “*Apo tu çi dibêjî bêje, 40 carî bêje, rastiyeke*

*me jî heye. Em ê nebes, bikêmasî, weke dizanin bikin*.” Ji vê mestir rexne nabe. Û ev serwere. Hûn dizanin helwesta min ya herî mezin çiye, hîn mezintir xizmet kirin. Ji heft bîran av anîn wan îqna kirin. Ji vê mezintir demokratbûn û hevaltî nabe.

Apo çiqas demokrate?

– Di rêxistinên sosyalîst de kevneşopiyek heye. Rêbereke partiyê dibe. Qala rêgezeke navendparêziyeke demokratîk tê kirin. Di pratîkê de navendparêzî dimeşe, demokrasî naşixûle.

---.: Di me de berevajî heye. Mixabin. Ji pirseke pir balkêş re bersiveke pir balkêş bidim. Yê pêşnakeve merkeze. Yê pêş dikeve demokrasiya muthîşe. Çawa dibe? Ez vê hinek bi demokratbûna xwe ve didim girêdan. Nû nû vê ferq dikim. Tu kesek çawa wisa bi otorîterî ku, heval Cemîl jî dizane. Hîn jî merkeza me ava nebûye.

– Cemîl hûn çi dibêjin? (Cemil Bayık bi devlikenî bersiv dide.)

---.: Bila hevalên min baxivin hûn ê bibînin. Ew ezmûneke we hebû, (qala azmûna ronahiyê -Aydınlık- dikin)ji bo ji wê re vekirîbûn bênin, azmûna me li gorî wê pir balkêşe. Li ser navendparêziyê, min di 1985’an de nirxandinên sernivîsa wê Dahûrandinên Adarê kir, ji deh bîran av kişand, çima neçarin navendparêz bin, çima neçarin bibin navendeke baş, qet fam nebû. Xala kûr bû ev e: Wê herkes rastiya xwe, tişta dizane bike. Wiha ev bi temamî demokrasiye. Ev demokratbûne. Min jî demokrasiyê kişkişandiye.

– Lê wisa diyare hûn ji vê rewşê nerazîne. Ji bo tiştên dibêjin gudar nakin hûn gilî dikin. Piştre hûn dibêjin ev demokratbûne. Hûn vê taybetmendiya xwe weke taybetmendiyeke baş difikirin, yan jî weke zaafek dibînin? Yanî ev taybetmendiyeke başe?

---.: A rastî min vê xwestiye. Yanî kesayet taybetmendiyên xwe, nasnameyên xwe demdirêj parastin bi demokratîzmeke bihêz re pêkane. Diyare taybetmendiyeke min vê dikişkişîne ku, ev jî vê jiyan dikin. Yan na heke kesayeteke min pir hişk, pir merkezî hebûya axaftina van tiştan nemûmkûn bû. Her wiha yên we hinek despotin. Zêde nedemokratin. Merkezin lê pir zêde navendîbûn dibin, hêza demokrasiyê nîne, ji bo hêza demokrasiyê nîne rêxistin pêşnakeve. Li gel me berevajiyê vê heye. Tevî otorîteyek gewre teşkîl dikim jî, tevî helwdana min ya

navendîbûnê jî, ev bi demokratîzmeke bi hêz re ancex bûye û nexwestina min ya pêwendiyên xwe qutnekirin jî; ji bo pêşkeftin bixwe hinek demokrate, ji bo pêşkeftin hinek di pêşkeftina demokrasiyê re derbaz dibe, ez jî neçarim aliyê demokratîkbûnê esas bigirim. Nasname û azadiya hêzan dîqat dikim. Ji vê re bêjin heya dawî telerans, girêdayî dimînim, encam PKK dibe gel, PKK dibe rêxistinek şer dike. Û otorîteya min jî di vê navberê de pêş dikeve. Bawerim hinek rastî hene û hatine sepandin. Gelek encamên em jê derxin hene.

**Rageşî**

– Hûn serokê şereke pir tundin. Li gel vê hûn li ser rewşê wisa serwerin ku dikarin rojaneyî şer bimeşînin. Ev rewş jiyana we ya rojane çawa bandor dike?

---.: Beriya hertiştî rageşiyeke mezin diafirîne. Ji ber wê hinek tenduristiya min tengav dike. Di warê esebî de tenduristiya min tengav dike. Xew nakim. Lingên min dişidîne. Henase nagirim. Çavên min di dîtinê de zehmetî dikişîne.

–Hûn rojê çiqas radikevin?

---.: Xew dikim, divê ji vê re xewa kêvroşk bê gotin. Nîv razayî, niv şiyar. Henase nagirim. Qet bên nagirim. Bawerim ev ji lêhûrbûnê tê. Bêjin ku di encam de ev jiyan min anî rewşa nuqteyek. Lê tengav jî nabim. Bi azwariyeke mezin li ser karim. Di hinek mijaran de min hûnereke pir mezin qezenc kiriye, di hinek mijaran de jî ji zarokan lewaztirim.

– Çawa mesela?

---.: Mesela zarokek ji min baştir dikare hinek xususan têbigihe.

– Hûnera we ya têgihiştinê xirab nîne.

---.: Di hinek mijaran de dibêjim. Mesela dikare formûleke bîrkariyê ji min baştir çareser bike. Mesela dikare zimanek çilcar zêdetir ji min baştir fêr bibe.

Apo: Kurdî fêr nabim.

– Nûçeyeke Apo fêrî Kurdî bû derketibû, we karî fêrî Kurdî bibin?

---.: Qet fêr nabim. Kurdiya min pir lewaze. Keseke ji rêzê di vê mijarê de ji min bihêztire. Hinek zanistî danehev hene. Di vê mijarê de hafizeya min lewaze. Di hinek mijaran de jî hafizeya min pir bihêze. Bi taybet di mijara xususên min girtî bin kontrolê,

dîsa di mijara xususên mirovî de pir bihêze, tiştek ji destê min xilas nabe. Yanî xususeke min girtibe dest, heke tenê di mijara jiyanê de fersendek bê dayîn, mîsogerî ez ê bigihim encamê.

**Jin û cînseltî**

– Di jiyana her mirovek de, di nava jiyana rojene de her ku teng bû bêriyên dibêje biçim peravê, bi destê heskiriyê xwe bigirim, li deverek hinek aram jiyan bikim.

---.: A rastî rewşeke min ya çûyîna peravan jî heye. Deverên pir guncav yên dibêjin koşk jî hene. Di vê mijarê de tengaviyeke min madî nîne. Lê bikar nayînim. Dîsa gelek hevalên binirx jî hene. Tîpê bigirim baremberî xwe pêwîste pir azad be. Destgirtina me ya ev kar weke ya li Tirkiyê nezivike.

– Di vê mijarê de nêzîkatiyeke we çawa heye?

---.: Pîvanên min gelek azadin. Gelek bi ser pîvanên nêzîkatiyên Tirkiye jiyan dike, tenê ne Tirkiye, bi ser pîvanên qada navnetewî jiyan dikin re ye.

– Mînak di Komîteya Merkeza PKK'ê de jin heye?

---.: Bûyîn nebûyîna jin hinek formalite ye. Niha ger bêjim hêjmara gerîla ji sedî 30 jine bêguman ev hêjmarek mezine.

– Di asta rêveberiyê de jin heye? Bêguman jin di her têkoşînê de cî digirin. Ma hûn vê weke kêmaniyek qebûl nakin?

---.: Di giştî de rêveberî nîne. Feraseta me ya rêveberiyê hinek cuda ye. Hinek caran kesên herî nedin meşandin zilamin. Ji ber wê destgirtina min ya pirsgirêka jinê pir berfirehe. Min di vê mijarê de pirtûkek nivîsand. Xwezka we xwendiba. Dixwazim hûn hinek lêkolîn bikin. Di van mijaran de pir bi îdame. Di dahûrandinan de heta bêjî xususên pir kur min bidest xistine hene.

– Mînak, heval di Komîteya Merkeza PKK'ê de jin nîne, hûn vê weke kêmaniyek bilêv dikin?

---.: Tenê di vê mijarê de...

– Ma ev ne kêmaniyeke?

---.: Ji bo di vê mijarê de cudahiya xwe deynim holê, deverên lê dimînim hêjmareke mezin ji jinan hildibijêrim. Ev tê çi wateyê?

– Ev ne tiştek pir girînge.

---.: Na, rêbertiya partiyek bi komek jin re xebat meşandin ji bo civaka me gavek pir mezine. Heta nirx dayîna me dide nîşan. Di civaka me de wê bandoreke zincîrkî bide afirandin. Şoreş ji bo

jinê riyek derketinê ye. Dema tên ser mijara Komîteya Merkezê min beriya niha jî got, hertişt li ser merkeza me dikare bê gotin.

Komîteya Navenda PKK'ê

– Her ku hatim gel we ez ê pirsa di Komîteya we ya Merkezê de jin heye bipirsim.

---.: Beriya wê, tu yê bêjî bûyera jê re komîteya merkezê tê gotin ma bûyereke cidiye. Min got hawariyên Hezretî Îsa hene, halîfeyên Hezretî Muhemed hene. Ev polîtbûro bûn, yan jî komîteya merkezê bûn?

– Bawerim polîtbûro tê hesibandin!

---.: Ya polîtbûro bû, ne wisa? Başe di komîteya merkezê de kî hebû?

– Di salên avabûna Îslamê de meclîseke şêwirgeh ya jê re şûra dihat gotin hebû. Yê we dişibe wê?

---.: Ev meclîsa şêwirgehê ye. Komîteya merkezê zêde nîne, lê bandora Îslamyetê 1400 sale pir bihêz didome. Yanî ev komîteya merkezê, meseleyên polîtbûro sosyalîzma pêkhatî req kir. Ez qet ne aşiqim. Ka komîteya merkezeke baş heye yan ne!.. Ez ji otorîteyê bawer dikim. Ji vesazkirina kabîliyeta kar bawer dikim.

– Hûn jî di zewacek re derbaz bûn.

---.: Ji ber vê jin di komîteya merkezê de heye an ne ji vê zêdetir, jin azad bû, jin hat dahûrandin, jin cihek digere, weke we gotî hêza xwe dide axaftin?

– Di Yêkîtiya Sovyetê de nîqaşeke dişibe vê hatibû kirin. Rêveberiyên partiyê digotin, ka temaşe bikin di gelek deverên civakê de jin hene. Lê rêveberî di destê zilaman de bû.

---.: Ger bibin rêveber wê çi bibe! Mîsyona rêveberiya zilam bigire bide jinê. Ev nayê wateya jin bûye reveber.

Ger Tansu Çiller bibe serok

– Li gor min jî ber nakeve.

---.: Wateya jin bûna rêveber, bi dîtina hemû nasnameyên xwe yên dîrokî û dîtina hêza xwe re mûmkûn dibe. Dewlemendiyeke jinê heye, rastiyeke wê heye. Vê him derxistina zanebûnê him birêxistinkirin, him jî bi rastî jî ger ev rêveberî bi tevlîbûna jiyanê re ava bibe, wateyeke wê rêveberiyê heye. Mînak, Tansu Çiller bibe serokê we, ma ev tê wateya li Tirkiyê jin wekheve, jin raseriyek mezin bidest xistiye?

– Bêguman nayê.

---.: Serokwezîrbûna Çiller, jin xwe xirab dana bikaranîne.

– Li gorî min dîsa jî bûyana serokwezîr a jinek gaveke.

---.: Zêde nikarim cidî bigirim. Hûn neçarin çareseriya pirsgirêka jinê pir bingehîn bigirin dest. Bi jinê re wekhev, azad jiyankirin, ne mil dana milê heve. Hûn rewşa min bixwe dipirsin. Ji bo hinek din fam bikin dibe sûdmend bibe. Bûyera hezkirinê weke bûyera şer digirim dest. Pir bi alî ye.

– Di demên dawî de gotineke eşq anarşîste bikar tînin heye.

---.: Bûyera eşqê, ma hezkirin tê gotin, welhasil çi tê gotin bila bê gotin, wê bûyerê bi temamî bi hûrbijêriya zanist re…

– Eşq ewqas nayê hûrbijêriyê!

---.: Li gorî min desteka hestên pîroz heye. Qanûnên hezkirinê hene. Ez difikirim. Bi rastî jî li ser jinê fikirin, jinê bi azwerî girtina dest pir girînge. Lê carna, niv demjimêr nikarim bi jinek re bimînim. Şêt dibim.

– Çima?

---.: Nikarim bimînim, ji ber hinek nêzîkatiyên wan.

– Dibe jin jî nikare we tehmûl bike!

---.: Ji bo wê dibêjim. Nikare pêkve bimîne. Karên di mijara jinê de bên kirin hene. Ez hinek pîvanên we cidî nagirim. Bi awayeke vekirî pîvanên we yên zewacê, pîvanên we yên evînê, pêvanên we yên hestan erzan dibînim.

– Çima erzan? Li gorî we têkiliyên jin-zilam yên hîn pêşkeftî ku hûn difikirin çine?

---.: Difikirim, her roj şîroveya wê dikim. Aşiq bûyîn, xususeke ku gelek ji me nizane. Gelek evînê weke hestek pir ferdî tarîf dike. Yê min hîn cudatire. Mîna afirandina asta jinê, ji bo min kêşeyeke. Ji bo pêkhatîna bûyera evînek yan jî bûyera hestek divê alî pir gihîştî bin. Mesela pêwîste pir bihêz bin. Yê ne bihêz be nikare aşiq bibe.

– Başe, ma hûn aşiqin?

---.: Aşiqê jinê bûyîn meseleyeke hêzê ye. Min her tim bi awayeke vekirî di dahûrandinan de jî got. Jina ku hêza wê hebe bi min re jiyan bike heye?

– Ma ev hinek nabe hûn xwe ser jinê re dibînin?

---.: Bêguman ez ê xwe raser bibînim. Ez ê çawa bi jinek evdal re aşqê jiyan bikim?

– Jinek zekî...

---.: Ya ji xwe bawer bila derkeve. Ocalan li vir bi wişkowişko diaxive. Jina ji xwe bawer bila bê hewl bide aşqê bi min re pêk bêne. Mesele ewqas ji rêzê nîne. Apo ne keseke wisa ye di vê mijarê de xwe wisa hêsan bixapîne. Di navbera dahûrandinên vê mijarê de ne dahûrandin jî.

– Ev her tim bersivên giştîne.

---.: Çima bersivên giştî. Divê em jinê di şêwazeke hîn berztirîn de bigirin dest. Bi rastî jî ev zayenda jin perçiqiye. Hatiye parçekirin. Pir lewaz hatiye hiştin. Hekaret lê hatiye kirin. Pir cahîl hatiye hiştin. Em dixwazin vê derbaz bikin.

– Ev rastiyên giştîne.

---.: Rastiyên giştîne lê, pêwîstiyên wê çiqas tênin cî? Bi jina kolê re evîn çênabe. Bi jina kolê re girêdanên hezkirinê nayên pêşxistin.

– Jina şer dike jina azade. Hûn fermandarê şerekêne. Wê demê hûn bi jinên ne kole re ne.

---.: Ji bo ez jî ji hezkirin û hest re eleqeyek mezin nîşan didim hewl didim bûyera jina şer dike derxim holê. Ev jî rastbûna min dide nîşan. Ti gerîlayek, ti şoreşgerek, kariye evqas jin beşdarî nav gerîla bike?

– Ev tiştek cuda ye. Ev meselê çareser nake.

---.: Jixwe diyare çareser nekiriye, azwarî û eleqeyek diyar dike. Ez di vê mijarê de ewqas berfireh, binirx, azwerî û bi mezinbûnê ve girêdayî me ku…

"*Jin nikarin cesaret bikin ji min re bêjin em aşiqê te bûne*."

-Bêguman rêveberî, îqtîdara we heye, bihêzin, dibe gelek jinên aşiqê we bibe derkeve.

---.: Nemûmkûne. Kes li beramberî min cesaret nake!

– Wê demê li vir şaşiyek heye. Divê jinek bikaribe ji zilamek re bêje aşiqê te bûme.

---.: Kes nikare cesaret bike. Mesela ji bo Atatürk hinek ketin nav wan lîstokan û azweriyan. Hevala min a jin ya herî berketî, di vê mijarê de nikare ji min re vê bêrêziyê bike. Girêdaneke wan pir mezin heye.

– Mesela nikare bêje ez aşiqê te me?

---.: Rêzdariya wan ya mezin, pir bi edep û helwestên wan yên dirûst hene.

– Yanî jinek nikare aşiqê we bibe?

---.: Li gel me qanûnên aşqê hene. Yanî weke şêwazê li Tirkiyê dibe kes aşiq nabe.

– Jinek bê ji we re bêje ku, “*Abdulah Ocalan, ez aşiqê we me, ji te hez dikim hûnê jî bibin hevparê wê*?”

---.: Ew pir baş dizane ku, ji Apo re gotinek wisa kirin hunereke mezin dixwaze.

– Jineke wisa jêhatî nîne?

---.: Bila bêje, qet xwe nede paş. Ez ê hema mercên xwe ferz bikim. Ez ê bêjim ABC ya hezkirina min wisa destpê dike. Heke bidomîne, ez ê ji wê jinê re bravo bêjim.

– Çiye ABC ya hezkirina we?

---.: Bila jinek bê. Ez ê rêzkim. Bila komplo li min neke.

– Çima jin li we komplo bike?

---.: Dibêjim bila entrîka, şantaj neke. Wê jî weke dixwaze bibim.

– Ma jin wisa nabe. Mirovê hezke çi jin, çi jî zilam, heke bi eşq bi hev ve bên girêdan ne ji bo şantajê ji bo hezke wê hezbike.

---.: Ez ê bêjim bravo heke jinek wisa derkeve.

– Ma jinek wisa nîne? Heya niha derneket?

---.: Ger jinek wisa derkeve ez ê kêfxweş bibim.

– Laqî jinek wisa nehatin?

---.: Digerim. Ne ketiyê vê me.

– Ev ne ketîbûneke ku… Ev taybetmendiyeke miroviye…

---.: Berevajî nirx didim. Lê di vê mijarê de bi rastî jî pîvanên min hene, dixwazim hindavê bigirim.

– Hûn eşqê pir razber dikin. Sewiya eşqê ewqas nebe. Eşq eşqe.

---.: Ez tevlî wê nabim. Bi jinek kole re…

– Qala jinek kole nakim. Qala jinek xwedî kesayet dikim.

---.: Ez yek cirkeyê nikarim bi kesên ku pirsgirêkên wan yên kesayetî hene re bijîm. Şêt bibim.

– Hûn her tim tîpê jina neyênî xêz dikin.

---.: Ez taybetmendiyeke xwe din libîr bênim; mesela têkiliyeke gelek ji we bi hêsanî pê re pêwendîdar bibe -têkiliya cinsî jî di nav de-, ez carna şerm dikim, dibêjim çima wisa dibe.

– Encama vê heya hebin, hûn ê bê zewac bimînin, nikarin têkilî deynin. Bê eqş bimênin.

---.: Na, di vê mijarê de ez yekî xwedî azwerim.

– Başe niha azweriyek wisa heye?

---.: Bêguman heye… Nirxek mezin didim cewherî jinê.

– Tiştên we gotî xeyalîne.

---.: Hewldana azadger azweriyeke mezin diafirîne. Dema ku tu temaşe dikî ku jin azad bûye bûyera hezkirinê pêşdikeve. Pir girînge, ji bo min ji zewacê jî girîngtire.

– Ev ji pirsa min re nebû bersiv...

---.: Tu yê ti carî wê bersivê negirî. Nebawerim hûn li gorî pîvanên Tirkiyê bersivek bibînin.

– Pirsên min bi pîvanên Tirkiyê re têkiliyeke xwe nîne.

---.: Bila yek ji xwe bawer derkeve, bê baremberî min… Dibêjin bila jinek derkeve bê, ez jî dibêjim bila bê rûne.

– Em bêjin ku heya niha jinek derneketiye cesaret nekiriye. Ma hûn cesaret nakin? Bêjin ku we jinek xweşik dît, hestên wê li gorî xwe hîs kir, wêrek, azad û xwedî kesayet… Ma hûn ê nikarin eşqa xwe îfade bikin?

---.: Ez wê pir muthîş dikim.

– Ez aşiqê yekî bibim ez ê biçim jê re bêjim, ya herî xwezayî jî ev e.

---.: Ji we re bêjim, hemû jinên hûn pê re dizewicin, ji hev berdana wan zewacan bigirin, heya ji yekkirinên nû yên azad re heme.

–Ev sozên pir bi îdane. Ev îda di têkiliyên jin-zilaman de ne derbazdarin.

---.: Hêvîdarin gav bi gav nêzî Tirkiyê bibin, ew jinên di malên wan beg û paşayan de û wan keçan hemû ger nebim bi awayeke din nexim nav pevgihandinek cuda bila ji min re jî nebêjin Apo. Hêjmareke zêde ya zewacan sextekartî, hêjmarek zêde ya eşqan sextekartî. Xapandin û bi taybet jî li dijî jinê ye. Dirûtiyeke mezine.

– Ne li dijî me...

---.: Yeqîn dikim ez ê vê bi qanûn û quralên nû ve çareser bikim.

– Ev tiştên tu dibêjî çareseriyek teorîke.

---.: Ez ê çêkim? Heke pirsgirêk di asta teorîk de be, çawa dikarî ji min pratîkek çar çar bixwazî… Ma hûn bi teoriyê bawerin?

–Bawerim.

---.: Ji bo çareseriya vê pirsgirêkê jî hûn girîngiya xebata teorîk jî dipejirînin. Raste ez di mijara jinê de zêdetirîn teorîk mame. Ez ê ji hinek hevalan re wiha bêjim: Ez dibêjim mirov dikarê di vê qonaxê de bi jinê re flort bike. Dibe ku li Tirkiyê ev peyv şaş fêm bibe.

–Folort tê wateya bihevrebûn û bi hev re razanê jî.

---.: Na tişta ez dixwazim bêjim, nêzîhevbûnek li ser bingeha dostanî ango hevnasî. Ez ji vê re bêjim hevnasî. Flort nebêjim, dibe şaş bê famkirin. Min got dikarin di asta hevnasînê de bin. Jinê tu kiyî, li kîderê bû, çi dixwazî, bi te re dikare çi bê kirin, em bi hev re ancex dikarin di rewşeke hevnasînê de bin.

– Ev nêzîkatiyek exlaknase.

---.: Lê lêkolîn dikim, ka rastiya wê çiye. Tenê ne teorîk, hemû ekonomîk, çandinî, berfirehiya wê ya dîrokî lêkolîn dikim. Jinê bi taybet bi pozîsyona wê ya di nav malbatê de pir baş lêkolîn dikim, di encam de dîsa ya herî baş ji bo jinê, hewl didim bigihim çareseriyeke nêzî azadiyê.

– Çareserî çiye?

---.: Niha çareserî ne ev e; em pir bi feraset, pir bihêz, pir muthîş hevdu hez dikin; ji bo min çareseriyên wisa nîne.

–Lê nabe, ev kar wisa dibe.

---.: Wisa nabe. Ji bo min ferqa di navbera şer û pevxweşbûnê de pir kême.

– Başe ji vê re îtirazeke min nîne.

---.: Ev jî encama felsefeya mine. Him pir nirx didim him pir şer dikim. Girêdayî avaniyê.

– Eşq jî şereke. Li hevketina hestên mirov yên li beramberî hev.

---.: Jinek Alman ji bo min vê got: “*Tu vî karî bi eşq dikî*.”

– Ew tiştek cuda ye.

---.: Di wateya bi azwarî kar hemêzkirin. Raste, herkes dibêje *“tu di vê mijarê de teorîk dimênî, zêde pratîka xwe nadênî holê*.” Ez pratîkê ji hevalên xwe re diberdim, dibêjim hûn serbestin. Hûn li çiyê bi jinê re ne, nekevin nav têkiliyên we ji şer bihêle, we ji erkên şoreşgeriyê bihêle, we ber bi teslîmkariyeke bê şeref ve bibe, ji derveyî vê ez ê ji hemû eşq û girêdanên we yên mezin ku hûn pêş bixin re li çapkan bixim.

– Mesela jinek gerîla yan jî zilamek bi hev re ne, lê jin yan jî zilam yeke din diecibîne û bi wê re dibe…

---.: Li gorî min pîvana vê ev e; azweriya peywir û armancên partiyê.

– Bêjin ku ev pêwendî ne dijberî yek ji wan e. Jinek şerker...

---.: Heke ji bo serkeftinê pîvana wê ya xizmetkirinê baş be bila tişta dixwaze bike. Ez zilamek biçûk nînim, bihesidim. Camêr ger hevsera min jî be wisa bike ez ê nehesidim. Min vê jî di dahûrandinan de anî ziman. Bila biçe, yê diecibîne bibîne. Ez jî xorteke bihêzim. Heke xwe bispêrim hêz û otorîteya xwe yekî li gel xwe bigirim ez namerdekim. Heke taybetmendiyên min nebalkêş bin ez ê jinek cirkeyek tenê jî li gel xwe nehêlim. Xwe bi sipartina pere û hêza xwe ve jinek girtin bêexlaqiye. Civaka we bi van tîpan tejiye. Bêmirêz dibînim. Esef ji vê jinê re jî, ji vê zilamî re jî. Ez jinek xweşik hez dikim.

– Lê ev nayê maneya bê eşqbûn.

---.: Erê fam dikim. Ez ne bê eşqim.

– Min negot hûn bê eşqin.

---.: Di vê mijarê de pîvanên min yên exlaqî mêzin hene. Heke nizanin hewl bidin lêkolîn bikin. Di warê cinseltiyê de him bihêzim û him jî bi pîvanim. Serwerim. Di vê mijarê de min keseke heya dawî xwe perwerde kiriye. Ji bo pêşkeftina aliyê beramber ez bi hemû hêza xwe ve ked didim. Eleqeyeke zêde ya jinan heye. Azweriya jinan mezine. Ez jî rêz ji wan re digirim. Di vê mijarê de zêde nerazîbûnên min û pirsgirêkan çareser nekim nîne. Azweriya min, hîn zêdetir balatiya nifşê jinê, cinsê wê derxistina holêye. Li gorî min jin hebûneke bê dewlemendkirine.

– Ma mezinkirina zilam nepêwîste?

---.: Raste, ji bo zilam jî derbazdare. Divê em jinê bihêz bikin. A rastî jin gelek di bin asta bigire de ye. Heke mejiyê jinê, fizîka jinê pêşbikeve wê jiyan pir dewlemend bibe. Jiyan dibe berbikeve bê jiyankirin.

– Di ev gotinên we yên zilam jinê pêşxistinê de, yanî weke îfadeyeke serdestî dibînim.

---.: Na.

– Carna jî cinsê jinê ji bo guhertin û pêşxistina zilam alîkarî dike. Femînîst dibêjin; cîhana serdestiya zilam cihana jinê edem kiriye û di encama vê de diyar dikin ku xwe jî edem kirine.

---.: Di vê ramanê de jî rastî hene. Edembûna cihana jinê edembûna cîhana zilame jî yan jî razberbûna jinê ya di jiyanê de, jiyanê bi awayeke giştî neyênî bandor kiriye. Lê çareseriya vê pirsgirêkê jî tenê ne pirsgirêka jinê ye. Pirsgirêk zêdetirin pirsgirêka zilame. Ji ber wê heke dixwezin li Tirkiyê hinek tiştên pêşketî çêbikin, divê ji dêla herkes ev kar wisa çelpeçelp, bi fesadiyên eşqê re, nizanim bi nêzbûnan re çareser bike, divê kes rêzdar nêzî hev bibin. Eşq ne mafê herkesî ye. Herkes nikare eşqê jiyan bike. Eşq kareke erdemiye. Aşiq karê balatiyê ye. Aşiq karê mezinbûnê ye.

– Dema evqas razber dibe zêde şênberbûn û pratîkbûna wê namîne.

---.: Mîsogerî razber nakim. Eşq karê hewldanê ye, karê kedê ye. Zilam nizanim ji kî derê pere ketiya berîka wî, diçe jina herî xweşik dibe. Heke ji destê min bê ez ê biçim wan jina hemû ji destê wan xilas bikim. Û hêvî dikim derfeteke min ava bibe. Hûn wê demê Apo bibînin. Hûn wisa dizanin ku Apo tenê bi polîtîkayê re mijûle. Hûn wisa dizanin ku qayîşokî nizane, xweşikbûnê nizane. Bi azwerim û xwedî hêzim. Dema ez di cemaeteke jin-zilam de rûnim, karê destpêkê bê bîra jinan dibe berdana zilamên xwe. Ev taybetmendiya min e.

**Îslamiyet**

-Em derbazî mijara îslamiyetê bibin.

---.: Min lêkolînên we bi baldarî xwend. Hûn çalekî û nêzîkatiya Îmam Alî di çarçoveya çînayetî hinek jî bi awayê çîna navîn dinirxînin?

–Ez Îmam Elî weke serokeke Îslamê yê reformparêz dibînim.

---.: Hûn dibêjin Xariciyî jî xwe dispêrin kesîmê jar.

– Belê, hîn radîqal û hîn wekhevîxwaze.

---.: Muaviye jî nûnerê kesîmê arîstokrate.

– Berdevkê mêla Îslama dibe dewlete.

---.: We kesayeta Îmam Elî hinek din ji nêz ve lêkolîn kir?

– Min pêvajoya dîrokî lîkolîn kir. Hûn ji eslê Şafii ne?

---.: Min ji zû ve koka xwe derbaz kiriye. Ji Îmam Elî re mêleke min kesî hebû. Xwe bi xwe perwerde dikim. Min nimêj kir, min hewlda bibim Misilmaneke baş.

– Raboriyeke Cemil Bayık jî ya Îslamê balkêş heye. Got ku di raboriya xwe de Misilmaneke sift û radîqal bûye.

---.: Nizanim. Lê divê Îslamiyetê nîqaş bikin. Li Tirkiyê kemalîst pirsgirêkên bingehîn ewqas yek alî dinirxînin ku… Bi rastî jî nêzîkatiyek dîrokî a bi tendûrist û civakî nehatiye serxistin. Layîqtiyek hat îcatkirin, ji Rojava hat kopî kirin. Kesê jî tiştek fam nekir. Rûyê xwe veke, serê xwe veke; wisa hat nirxandin. Nirxandinên mîna poşî şerîete, ezan xwendin şerîete hatin kirin. Ne ew tişta kirî fam kir, ne jî aliyê beramber ya kirî fam kir. Di vê mijarê de serî Tirkiyê tevlîhev bû. Ne yê li dijî Misilmantiyê karî çiqas dijbere diyar bike, ne jî parazvanê Misilmantiyê karî bide nasîn ku çiqas Misilmantiyê diparêze. Misilmanên li Tirkiyê jî Misilman nabînim. Ewqas komên eware hene ku. Wan weke kesên Îslamiyetê fam kirine nanirxînim. Ne poşî lixwekirin fazîlete, ne jî derxistin fazîlete. Wan weke fasarya dibînim. Bi qedexeyan nabe. Heke qala erdembûna kes dikin, tenê ne poşiya wê, divê bikare hertiştê xwe pêşbixe. Hûn dizanin ez ê ji bo jinek li çi bigerim? Li xweşikbûna rihî bigerim, li xweşikbûna fizîkî bigerim, li hêza fikir bigerim, li livasê pir lê bê bigerim. Ez ji bo jinê wisa şer dikim. Poşiya wê heye nîne! Tu çawa dikarî nîqaşên evqas biçûk, evqas bê pîvan bi min bikî? Ma ez bûdale me bikevim nava nîqaşeke wisa? Nakevim nav.

**Hizbullah**

– Hûn ji bo Hizbullahê çi dibêjin? Li Başûrê Rojhilat weke pirsgirêkek girîng derket holê. Hat gotin ku dewletê ava kiriye. Dîsa hat gotin ku PKK bi Hizbulahê re hevdîtin kiriye û protokolek bi hev re înza kirine. Eslê ev kar çiye?

---.: Hizbullahiyan hinek dibînim. Hinek caran dixwazim wan vexwînim cidiyetê. Di dema pêş de em ê Xwedê jî ji van re îzah bikin. Divê moralê wan zarokan neyê xirakirin. Baweriya wan ya ji bo Xwedê û navaroka Îslama bawer dikin zêde nizanin. Dewlet hewl dide van bikar bîne. Dibe hêzên derve hewl didin bikar bênin. Pir jî xirab hewl didin bikar bênin. Demek Yêkîtiya Sovyetê TKP'ê wisa bikar anî. Min Tirkiyê jî şiband vê. Ha TKP'ê li Hizbulahê bide, yek ji yêkî xirabtire.

–We got hev dibînin. Hinek tişt di çapemeniyê de hat peytandin. Berê we bi Hizbulahê re şer dikir.

---.: Meseleya Hizbullahê ne meseleyek olî ye. Kesîmên eşîrger feodal yên hinek ji PKK'ê zirar dîtin hene. Ji van hêz digirin. Bawerim Îran, ferqkir ku di Kurdistanê de valetiyek heye.

Helandina kemalîzmê dît. Dibe xwestibe piştgirî bide hinek mêlan. Ji vê hêz girtin. Yek jî dema dewlet bixwe dît ku êdî kemalîzm nayê girtin, van tarîqatan, herî dawî jî li ser bingeha olî Hizbulahê xist dewrê. A rastî ev mesele wisa derket holê. Sê şêwayên Hizbulahê hene. Bêguman bandora Îranê hewl didin cuda binirxînin. Bi rastî jî radîqalên ji Xwedêyê xwe bawer hebe wê cuda dinirxînin. Ji bo berjewendiyên eşîretên feodal tên dîtin lewra heke yên xwe dispêrin Hizbulahê hebin wan cuda dinirxînin. Yek jî Hizbulahên dewletê ava kirin hene, wê jî cuda dinirxînin. Her wiha hewl didin bi awayeke giştî rastiya ol binirxînin. Ev hemû dide nîşan ku pir berfireh nêzî pirsgirêkê dibin. Weke yên din kirî nakevin nav nîqaşên layîqîn ne layîqin, ji kîjan tarîqatêne, em Misilmanên radîqalin yan na. Mele Abdulaheke girêdayî ola xwe heye. Yê herî baş min fam dike û bi rastî jî Misilmaneke paqij yê Kurdistanê yê herî rêzdar û teslîm nebûye. Pevretiyek pir baş afirî. Meleyên pir binirx hene. Wan ji milîtaneke herî baş binirxtir dibînim. Misilmanên olî jî tên, bi wan re jî dikarin li hev bikin. Lê hinek xerifiyên dewletê bikar anîne jî derdikevin. Li gorî min ev çi faşîsta MHP'ê, çi jî faşîstek wisa ferq nake. Em di rewşeke ku bersiva hemûyan heq kirî bidin dene.

– Yanî hûn dibêjin li gorî mêlên cuda helwestên cuda digirin.

---.: Bêguman... Heke Hizbulaha xwe dispêre Îranê hebe, neçare destpêkê bibe antî-emperyalîst, bibe antî-kemalîst. Dema wisa bû neçare bi me re li îtîfaqê bigere.

– Hûn dixwazin bêjin wê bi xeta Îranê nêzî we bibin?

---.: Bêguman... Heke neke diyare sextekare. Ji hemûyan re bi nêzîkatiyên guncav bersiv didin, bawerim wê ev helwesta me meseleyê çareser bike.

– Ji van daxuyaniyên we dikarin bêjin di dema pêşiya me de wê Hizbulah çalekiyên bi vî rengî nedomîne?

---.: Bêguman. Bixwe dizanin. Heke di pîvanên min gotî de bin wê hinek bidomînin, hinek nedomînin. Wê Hizbulaha aligirê dewletê bidomîne, yên girêdayî ola xwe û antî-emperyalîstên li gel Îranê nedomînin. Yê welatparêz dê bê bi me re îtîfaq dêne.

– Bi yên aligirê Îranê re pêwendî heye?

---.: Bêguman wê di vê çarçovê de pêwendî bên dahûrandin. Rastiya me berfirehe. Di qayîşoyîkiya ku herkes li gor rastiya

rewşê bibersivêne ye. Nebawerim di vê mijarê de em zehmetî bikişînin bikevin nava xetayek di derbarê çareseriyê de.

**Eniya Kurd**

– Di eniya Kurd de bi agirbestê re guhertinek çêbû. Bi yên ku beriya niha têkiliyên we bi wan re xirab bû û wan di derbarê we de, we jî di derbarê wan de tiştên pir xirab digot û helwest digirt hatin gel hev. Agirbestê jî tabloyek nû derxist holê. Ev tablo çawa derket holê, ji niha şûnde wê çawa pêşbikeve?

---.: Me hewl da rewşa fiîlî fermî bikin. Heke dîqat bikin di navbera pir nêrînan de zêde cudahî nîne. Li ser pirsgirêka netewî, statûya Kurdistanê, hedefên wê û heta li ser têkoşîna wê. Me ev pevratiya heyî bi protokolê meşru kir. Min ji bo gelek rêxistinan jî heman tişt got. Min got bejdarî hinek nerînên we dibim û bixin belgenameyê, ez ê îmza bikim. Yê hat xistê min îmza kir, yê hat xistê min îmza kir, di encam de ev meseleyên pevretiyê derket holê. Yanî me cudahiyeke zêde dabin kir. Bêguman di hinek mijaran de cudahiya nêrînên min heye. Lê ji bo wekhevî çêbibe heya dawî esnek nêz bûm. Weke cureyê kevin neketin nav hesabên wisa erzan yên, "*bilaev hevok wisa be, bila radeya temsîla min wisa be*." Bi tolerans, heya bêjî bi nêzîkatiyeke avaker li hember hemû rêxistin û kes heman helwest meşand. Encam, niha herkes neçare bejdarî hevretiyên bi vî rengî bibin. Ji niha şûnde jî heke mûmkûn be ji bo bibin yêkîtiyeke cepheyî ked didin. Wisa fam dibe ku di vê mijarê de ji ber çeşîddariya partiyan dibe zêde pêşnekeve, lê yên dixwazin hinek tiştan pêş bixin, yên ku naxwazin bê helwest, bê polîtîka bimînin, bihevrebûneke wisa weke enî jî bê binavkirin fermî û mayîndekirin di bin vî navî de be jî ez bawerim wê polîtîkayên xwe serkeftî bimeşînin. Di dema pêşiya me de jî di vê mijarê de wê îlaneke cepheyî pêk were.

– Piştî bûyera Çewlikê şûnde di nava eniyê de, di navbera rêxistinên Kurdan yên hûn bi wan re di nav pêwendiyê de bûn problem derket?

---.: Na na, derneket. Herkesî baş dizanî ku Tirkiyê ji derveyî poşmantiyê li ser kesî tiştek din ferz nekir. Xwest meseleya Kurd tasfiye bike, bi rêbazên xwe yên kevneşopî yên dûrkirin û teslimgirtinê re biçe encamê. Di vê mijarê de zanebûna wan ya pêwîst heye. Hebe hebe, dibe di warê teknîk de rexne bikin. Û hinek jî wisa bû. Lê wan jî vê digot; heke Tirkiye polîtîkaya xwe

neguhere di protokola me bi Birêz Burkay re kirî gotibûn, em jî neçarin têkoşîna çekdarî bifikirin, heta di vê mijarê de hinek amadekariyên me heye. Rêxistinên jî din pir zêde wisanin. Û heta ketine nav navendeke hîn erênîtir.

– Yanî hûn dibêjin piştî Çewlikê bi rêxistinên Kurd re pirsgirêk nîne?

---.: Dibe yêkîtiyek hîn erênî, hîn leztir pêk were.

**Talabanî**

– Wisa diyar dibû ku di dema agirbestê de Talabanî roleke girîng dilîst, niha bi rewşa nû re wisa fam dibe wê di civîna çapemeniya îro de Talabanî nebe. Piştî bûyera Çewlikê şûnde bi Talabanî re temaseke we çêbû? We helwesta wî hîs kir?

---.: Talabanî, tengaviyên xwe ji têkoşîna çekdarî û bi taybet jî ji bûyera Çewlikê anî ziman. Ew bi temamî ji bo ji Tirkiyê piştgirî bigire, dikeve nava helwesta polîtîk. Bi me re jî dikeveyê, bi Tirkiyê re jî dikeveyê. Û vê jî dewamî dike. Ji niha şûnde jî wê bixwaze koza PKK'ê bikar bîne. Wê zû bi zû devji vê jî bernede. Êdî çiqas sûdmende û çiqas bikar tîne wê ewqas sûd bigire bikar bîne. Em ê jî Talabanî di meseleya Kurd de heke kêrhatinek erênî bibîne bikar bênin. Lê em di qadên cuda de polîtîka dikin. Cudahiya mekan heye. Cudahiya bernamê û zemînê civakî heye. Ew herî zêde dixwaze di dîplomasiyê de kar bidest bixe. Em xwe dispêrin hêza gelê xwe. Her wiha car be car hatina me ya gel hev çêdibe. Lê ji bo em di pozîsyonên cuda de ne wê car bi car bêpêwendî û nelirêtî derdikeve.

– Piştî bûyera Çewlekê şûnde qet temaseke we çêbû?

---.: Her wextî temas dibe yan jî nabe. Vê zêde girîng nabînim. Dema kar pêwîst kir hatinên ba hev zêde zehmet nîne. Lê dema pozîsyonên polîtîk cuda bin, wê ew li cihê xwe bimîne, ez ê li cihê xwe bimînim.

**Mûzik-hûner**

– Hûn ji gudarkirina mûzîkê zewq digirin?

---.: Fam bûye, pêwîstî bi destnîşankirinê nake. Jiyana me bixwe şêwayê mûzîkek cuda îşaret dike. Dema rastiya Kurdistanê dibe mijara gotinê, stranên qilasîkên berê li şoreşa nû anîn, ew dengê nû pêşdikeve, her ku diçe ew aliyê xwe jî derdixe holê, stranek nû ye. Jixwe li ser wê bingehî hîn ji niha de derketina ewqas stranan, aliyê têkoşîna me ya ku çiqas nêzî pêşkeftinên

mûzîkêye datîne holê. Lewra, jiyan jî di heman demê de ji bo me mûzîkeke. Jiyana min, heta bi awayeke giştî pêşveçûna PKK'ê gelek dişibe bilêvkirina stranek. Me bi ritmê stranek dest bi ev kar kir, wisa didomînin. Yê me şerek bi strane.

– Hûn mûzîka qlasîk gudar dikin?

---.: Gudar dikim; belê belê…

– Di nav van de kîjan mûzîk ji bo we hîn balkêştire?

---.: Xwe bi dest mûzîka Rojava ya qlasîk ve jî diberdim.

– Mînak ji bestekaran herî zêde kîjan bestekar diecibînin? Beethoven yan jî Mozart?

---.: Qet ne girînge. Ji bo min ritm girînge. Dema min ritim girt, ez ê xwe berve berdim. Ev ji bo mûzîqa Ereban jî derbazdare. Ez sed carî kilamên Ümmü Gülsüm gudar bikim jê aciz nabim. Mûzîka wê girînge, peyvên di nav de qet negirînge. Rîtma li Îranê gelek girînge. Dikarim ritma li Hindistanê, Asyaya Dur, Latîn Emerîka jî bihesibînim. Asteke min mûzîkê heye. Xwe ber bi ritmê ve diberdim. Di bûyera Kurd de jî wisa ye, di bûyera mûzîka Tirk de jî wisa ye. Aliyeke mûzîkê heya bêjî pêşdikeve. Jiyana me, jiyaneke ji nêznê ve bi mûzîkê re girêdaye.

– Tu Îbrahîm Tatlîses çawa dibînî?

---.: Îbrahîm nas dikim, guhdar jî dikim. Lê Îbrahîm ji aliyê siyasî ve xwestin îstîsmar bikin. Hinekî jî li ser derketina PKK'ê ferz dikin, bi taybet jî dixwazin weke kesê ku nirxê çanda Rihayê îfade dike binasînin. Meşhûrbûna wî di ragihandina PKK'ê re despêdike. Li gorî min ew ji aliyê siyasî ve hat bikaranîn. Kelecana gel, her çiqas weke tê xwestin teysîna xwe li ser pêvajoya rizgariya netewî nekiribe jî, vaye di bin navê arabeskê de bi muzîkekê ve ji bo ku naveroka wê vala bikin xwestin bikar bînin. Artîstên ku dişibin vî, bi kesayetiyên ku bala civakê bikişînin xwestin gel ji kanalîzebûna şoreşê dûr bixin.

– Tu dengê wî diecibînî?

---.: Weke deng guhdar dikim. Çi arabeskê wî, çi jî klasîkên wî dengekî ne xirabe. Tiştekî ku ez ji muzîka wî re bêjim nîne. Ez dijberî îstîsmara wî ya siyasî me.

– Ez nirxandina te ya hunerî pirs dikim.

---.: Zarokê axa me ye.

– Hemşerîne…

---.: Zedetir bûyereke ji têkiliya stran û lorîkan pêk tê ye. Di wî de bandora Ereb, Tirk û Kurdan bihêze. Yek ji sedemên ecibandina wî jî eve. Kûrkirina çanda gelan îfade dike. Ji wî re gotina arasbesk jî zêde ne biwateye. Lê ne şêwazekî şoreşgeriye. Xirab bikar tîne, ew jî mijareke cuda ye. Aliyê wî yê gelerî heye. Aliyê gelerî yê hunera wî heye.

– Ferdî Tayfûr guhdar dikin?

--.: Ew jî di vê mijarê de bawerim, li gorî we çi îfade dike?

– Ferdî Tayfûr ji Edenê ye. Mijara wî zêde êşe.

---.: Belê, ez bawerim êşa ku kedkar dijîn tîne ziman. Xirab nakim. Lê tenê êş anîna ziman, coş, berxwedanî ne anîna ziman koletî derbasnekirina wî dide diyarkirin. Daxwaza mirovên di nava mercên Çûkûrovayê de tên eciqandin îfade dike.

– We strana Ferdî ya “*emoğlu*” guhdar kiriye?

---.:Na.

– Yaşar Kemal?

---.: Di vê mijarê de min nirxandin kir. Yaşar Kemal mirovên derketine dervî civakê dike roman. Yên cuda dike roman. Bêgûman ev jî ji ber ku pêleke bi hêz a şoreşê nîne bi vî rengiye. Îsyanê dike roman. Karekî xirab nîne. Lê li gorî min gelek nebese. Rexneya sereke arasteyî wî bê kirin eve. Ger ev bi vî rengî pêk anîba dikarî rê li ber romaneke bi hêz vekira, ya rast di Çûkûrova de veguhertineke civakî tê jiyîn. Ev hinekî dîtiye û di romanên xwe de peytandiye. Ev jî bûyereke pir tê dîtine. Bawerim ji ber ku wî bagereke bihêz a şoreşgerî jiyan nekiriye yan jî nedîtiye di romanê de teng bûye. Cudabûn buhurandiye û bikar aniye. Nemaze nekarî bihêzbûnê pêk bîne. Pêşniyara min dîtina wî ya ser û binbûnên mezin ê şoreşê ne. Yaşar Kemal ji aliyekî ve jî Kurde. Ez ji pênaseya Yaşar Kemal re aliyekî wî bi xwe jî nedîtiye alikariyekê bikim. Ger aliyê wî yê Kurd nebûya nedikarî bibe roman nivîsek. Ji kesekî bi eslê xwe Tirk romanivîsekî wisa dernakeve. Wisa weke wî di Çûkûrova de gelek zarokên Tirk hebûn. Lê romanivîsiyeke wisa nayê aqlê wan jî. Ji bo ku tu bibî romanivîsekî wisa pêwîste tu bibî kurdekî Çûkûrova nasdike. Nakokiya Yaşar Kemal eve: Taybetmendiyê netewî yên Kurd û ji wan qutbûn, senteza li Çûkûrova mezinbûnê ye.

– Ez nirxandina we yên di derbarê Yaşar Kemal de bêheq dibînim.

---.: Pêwîste ev pênase baş bê kirin. Yaşar Kemal, motîfên netewî yên Kurd, bi motîfên ku li Çûkûrova pê re rûbirû tê, berhemê dewlemendkirina şêwazên ku ev taybetmendî bigirine. Çima di vê mijarê de zêde zanistî nayê fikirinadin? Tu rastî bixwazî bîranin ango hevpeyvîna wî ya ku bi rojnamevanê Fransî re kiriye heye. Ew dixwaze wî fêm bike, lê Yaşar Kemal bi xwe wî rast nabersivîne. Ya rast fêm jî nake. Hêza wî ya bersiv dayînê nîne. Jê dipirse û dibêje, sedemên civakî yên ku rê li ber nivîsandina romana te vekir çibû. Dixwaze reseniya wê bibîne. Di wir de disekine. Min xwe di wê *“çîroka vejînê de”* vegot, weke ku min ji birayê me yê Yalçin Kuçuk re vegot, derbaskirina me ya wê pênazeya zarokatiyê, destnîşankirina min a xwe gihandina kesayetiyeke siyasî, civakî, îsyanger bi taybet ji bo ku ji dahûrînên bi vî rengî re bibin alîkar kir. Wî bi xwe jî dikarî tabloyekî wisa raber bikira. Bi Tirkî dinivîsîne, mînakên wêjeya Tirkî jî pêşkêş dike, ne tiştekî xirabe. Lê divê ku bikare taybetmendiyên pêkhatinê jî vebêje. Di vê mijarê de dikare wêrek be. Ji hemû aliyan ve dikare rastiya Tirkan weke tirkekî baş bîne ziman. Yaşar Kemal romanivîsekî cûrekî dine. Ew hinekî jî dixwaze ji rastiya netewa Kurdan hinek tiştan bide. Lê ji ber tam jê qut bûye nikare vê bike. Dixwaze weke Tirkekî vê bide, lê ji ber ku ne Tirk’e jî naxwaze vê bike. Li gorî vê bi şêwazekî xweser li gorî xwe, xwe derxistiye holê. Ev bala Rojava jî dikişîne, hinekî nirx didinê. Lê ez dixwazim ku hîn zêde pêş de bibe. Mesele dikare ser û binbûna Kurdan lêkolîn bike. Ez ji bo wî jî derketina sereke di vir de dibînim. Ger xwe bigihîne veguhertina Kurdan dikare di qada wêje de pêngaveke nû veke. Bi rastî jî di bûyera Kurdan de serûbinbûnên mezin tên jiyîn. Bala we hemûyan dikişîne. Hûn nivîskarin. Ma hûn serûbinbûnên mezin ku tên jiyan guhertinên ku di rihê mirovan de vedikin naşopînin. Eleqeya we li beramberî parçebûna pêwendiyan û pêwendiyên nû yên tên pêşxistin nîne. Ji ber wê pir xirabe. Ji bo rewşenbîr, nivîskar û xêzkerên Tirkiyê. Hûn çawa dikarin ewqas nazok (kısır) bibînin, bê sewiye bimînin, aqlê min nagire. Ez vê tenê ji bo rewşenbîrên Kurdan nabêjim, rewşenbîrên Tirkan jî dikarîn pir tiştan bikin. Dahûrîna mijara Kurd kirin xezîneyeke

wêjeyê ye. Bi rastî jî wê nefes bide sitendin û di qada navnetewî de jî dikare ber bi îdabûnê ve bibe. Lê ev çanda Kemalîzmê ya înkarger bandor li we hemûyan kiriye, hûn kêm dibînin, bi qasî ku hûn kêm ango biçûk lêdinêrin, hûn bi xwe biçûk tên dîtin. Hûn ê bejnkurt bimînin. Ger gengaz be her wejeyekî di eniya wêje de, bi qasî ku ji serûbinbûnên mezin ên civakî re bibe bersiv wêje ye. Dibe ku biêş be, dibe trajîk be, divê ku hemû bên karanîn.

– Yaşar Kemal, piştî mirina Mûsa Anter di derbarê pirsgirêka Kurd de di rojnameya Cumhuriyetê de gotareke du rojan dewam kir nivîsî. Ger we ew nivîs nexwendiye ez ê ji we xwendina wê nivîsê bixwazim. Nivîseke pir girîng bû, di derbarê meseleya Kurdan de nerînên vekirî yên Yaşar Kemal hene.

---.: Hîn jî dikare bê pêşxistin. Di navberê de hûn dikarin derketinê wisa bikin. Hewl bidin hêza bondorgeriya mirov a di ser û binbûnên civakî de bigirin û heta bi huner zirav bikin, bi huner hinekî din wî xweşik bikin, şêwazê divê ku bibe tesbît bikin da ku hinekî din xwe bigihîne hestî û goşt. Ji bo ku bikaribe xwe ji zêdegavî û neyêniyan biparêze. Karîgeriya huner jî ev e.

– Karîgeriya ku hûn qala wê dikin. Ziraviya huner û estetîka wî heye.

---.: Ziraviyên huner ev in: Hûn dixwazin min bikin mêvanê nîqaşeke hunerî. Jixwe ez vê dikim. Huner karekî cidî ye. Lê li Tirkiyê hema bêje huner derketiye dervî atmosfera siyasî- civakî, weke mijûlbûna talî ya yên ku henaseya xwe qutkirine tê fikirandin.

– Ez tevlî vê nerîna we nabim. Dema ku huner rastiyên civakî ne peytîne bersiva xwe nabîne. Em bêjin ez xwe bi xwe hunermendim û min hinek tişt nivîsandin. Ger nirxeke vê hebe...

---.: Bêgûman her tişt civakî ye. Ez vê gelemperiyê nakim. Gelemperiya ku ez dikim aliyê giştî ku divê civak bi huner bê destnîşankirin heye. Li Tirkiyê li ser mirovên 12'ê Îlonê hilweşêneriyên mezin hene. Kê ev girt û nirxand? Em romeneke Kurdan binivîsînin.

– Romanên mezin wisa dema tên xwestin nayên nivîsandin.

---.: Lê 12'ê Îlonê veguhertineke mezin îfade dike.

– Roman ne tiştekî ez bixwazim, ango tu bixwazî bibe ye ku…

---.: Na hunermend bi tiştên din re mijûl bûn. Bi gelek pirsgirêkên çêkirî re mijûl bûn. Bi xirabkirina kesên şoreşger re mijûl bûn. Rexneya kesên şoreşger tê kirin. Temsîlnekirina kesayetên şoreşger ya jiyaneke ne tendurist jî dikare bê kirpandin. Aliyên wî yên ku siyaseteke baş nake, teng dimîne û bi rastî jî bê çare dimîne, jiyanê temsîl nake ji hemû aliyan ve dikare bê kirpandin. Lê encama ku ji vê bê derxistin ne înkarkirina şoreşê û diviya ne bilindkirina jiyana 12'ê Îlonê aniye bûya. Di vê mijarê de hûn hinekî din çavdêriyên xwe pêş bixin, hûnê bibînin ku encamên ku hûn gihiştinê, beşekî girîng, ne yekser be jî xizmet ji pergalê re dike. Divê ku rexneyeke bi tendurist ya pergalê bê kirin. Ji ber ku 12'ê Îlonê hilweşînên pir mezin ji civakê re anî.

– We pirtûka Nîhat Behram a bi navê " *hechecîkên temenê lanetkirî"* xwendiye?

---.: Ez nabêjim tenê civakê xirab bikin, tenê ji bo xirabkirinê em pêşbirkekê bikin qala şîroveyeke wisa jî nakim.

– Vê weke rexneyekê û ji ber ku romaneke rasteqîne vê dibêjim. Yek ji romanên herî xweş a piştî 12'ê Îlonê ye. Hinekî jî ji ber vê ji çavan dûr ma. Niha wergera Elmanî kirine. Bawerim wê eleqeyekê bibîne. Roman ji Başûrê Rojhilat çîroka jiyana zarokekî biçûk digire dest.

---.: Dibe. Mînakên wisa dikarin bên pêşxistin. Hineka xwestiye nîşan bidin, lê zêde bi bandor nebûye.

– Hûn romana dixwînin?

---.: Ez ji xwendina romanê zêdetir, romaneke rast çawa dikare bê pêşxistin li ser vê lêhûrbûn dikim.

– Romana Yaşar Kemal a bi navê "*Deriyê Qelê"* derket. Ji bo vê romanê nîqaşên ku romanek Kurd e tên kirin. Ya rast min bi xwe hîn roman nexwendiye, ez qala tiştên ku li ser hatine nivîsandin dikim. Mînak divê ku hûn vê romanê bixwînin. Pêwîste hûn romana "*hechecikên temenê lanetkirî"* bixwînin.

---.: Raste di vê mijarê de ji bo ku ez bikarim hinek tahlîlan pêş bikim bêgûman dê sûdmend be. Ger derfetê min hebe ez ê binirxînim, lê rista ku ez ji xwe re diyar dikim him bûyîna çêkerê romanekê him jî veguhenêrê vê romanê ye. Wisa diyare ku min hinekî karmendiya romanê fêm kiriye. Roman, bi awayekî giştî wêje, di bingeh de dibe ber bi kî derê ve araste bibin min ferq

kiriye. Vê di bûyera PKK'ê de di asta pêşnûme de be jî, bawerim di demeke nêz de wê weke berhem derkeve.

– Hûn li ser romanê lêkolîneke dikin?

---.: Ez ji vê re dibêjim pêşnûmeya romanê.

– We roman nivîsandiye?

---.: Niha bi pêşnûmeya wê re mijûl dibim, roman nivîsandina min naşibe yê hinekî din. Pêwendiyên balkêş ên ku min rê jê re vekirine, rewşên rûhî, sazîbûn mijara gotinê ne. Ez ê hewl bidim wan bidim jiyîn.

– Ceribandina romanê?

---.: Roman, kurahiya ruh, divê ku bihevketinên mezin di nav de bên girtin. Tê wateya fêmkirina pêvajoyeke dîrokî ya ku derketiye holê. Li Tirkiyê romaneke wisa nayê nivîsandin ku… Ez dibêjim ez ê di vê mijarê de rexneyeke bihêz bikim.

– Di hevpeyvînê de we gotiye ger ez roman binivîsînim ez ê ji Yaşar Kemal xweştir binivîsînim. We gotineke wisa kiriye.

---.: Ji xweşikbûnê wêdetir ez ê mijareke balkêştir hilbijêrim.

– Ew dibe gotar, ne roman. Roman nivîsandin karekî dine.

---.: Roman ne weke ku hûn dibêjine. Roman dikare li ser esasê pirsgirêkeke sereke jî, dikare xwe bispêre pirsgirêkeke siyasî jî û bê pêşxistin.

– Ez ji vê re îtîraz nakim. Lê roman di encam de hunereke.

---.: Vaye xala ku hûn jê re dibêjin huner jî ez dibêjim. Cesed, ger tenê bi peyvan neyê îfadekirin, şoreşek jî tenê îskelete. Ev bi goşt kirin karê hunere. Ez ewqas girîngî didim karê huner. Aliyê xweşik ê jiyanê pêk tîne. Mozayîka navxweyî ya vê pêk tîne. Pêwîstiyeke devjêneger a jiyanê ye. Em bêjin, şoreş tenê ji aliyê leşkerî, bi rêyên siyasî nayê kirin, bi rêya hunerî jî divê ku bê înşakirin, pêdiviya mirovê Tirk jî ji nû ve kirina hunerekî wisa heye. Ez kirêtiyên mezin ê di nava Tirkan de dibînim. Ez vê hinekî bi şoreşê rexne dikim. Dixwazim bi nêzîkatiyên balkêş ên hunerî jî rexne bikim. Romana Kemalîzmê nehatiye nivîsandin. Kemalîzm di nava dîrokê de çi îfade kiriye tenê pesnê wê hatiye dayîn.

– Romanên Kemal Tahîr û pir nivîskarên din ên ku Kemalîzm rexne kirine hene.

---.: Ne bingehînin. Ne temamker û hevgirtîne. Kemalîzm ji aliyê Kemalîstan ve jî nayê fêmkirin. Heta ku hûn Kemalîzmê bi

aliyên wê yên rast ve destnîşan nekin hûnê nikarin xwe pênase bikin. Ez vê ji we re bêjim.

– Temam li ser rexneyên di derbarê Kemalîzmê de nîqaşek dikare bê kirin.

---.: Ger hûn tahlîla Kemalîzmê ji hemû aliyan ve rast nekin, hûnê nikarin li ser bingehekî rast teşe bidin mirovên li Tirkiyê. Di vir de karê herî zêde jî dikeve ser milê huner.

"*Derfetê xwendinê nabînim*."

– Herî dawî we kîjan roman xwend? Weke fermandarê artêşekê, Serokê partiyekê û rewşenbîrekî pêdiviya we bi xwendinê heye. Mînak pêdiviya we bi xwendina roman, gotarên siyasî heye, hûn dixwînin?

---.: Derfetê xwendinê zêde nabînim.

– Ev ne kêmasiyeke?

---.: Bêguman kêmasiye.

– Ma pêwîst nake rêberek roman bixwîne, bi wêje re eleqeder bibe?

---.: Mîna romanê bûyer, diyardeya dîrokê dişopînim, hinekî jî encam derdixim. Yanî nebesiya min a fêm kirinê ne mijara gotinê ye.

– Ne di wateya fêmkirinê de, wêje, huner tiştên ku mirov dewlemend dikene. Muzîk jî wisa.

---.: Bi qasî ku ez dikarim ji xwe re bêjim dewlemend asta min a fêmkirinê heye. Ya rast ez vê pêdiviya xwe pêşwazî dikim. Bi mirovekî re bi qasî ku bikarim dewlemendiya jiyanê bimeşînim hêza min heye. Ev bi wêjevan re dibe, bi leşker re dibe, bi siyasetmedar re jî dibe.

– Dizanim asteke we ya bi hêz a fêmkirinê heye. Lê em li şoreşgerên mezin dinêrin…

---.: Ez di vê mijarê de pir bijare me. Girîngiyeke mezin didim bilindiya kalîteyê. Sebra min yên ji rêzê re nîne.

– Em li şoreşgerên mezin dinêrin. Mesela Lenîn….

---.: Ew aliyê min lewaze. Ew aliyê min zêde pêş neketiye. Lêkolînvanên pir başin, xwênerên pir başin.

– Hema bêje Lenîn hemû wêjeya cîhanê xwendiye.

---.: Ew hêza min nîne, bi min re pir lewaze. Pêvajoya ku ez dijîm zêde derfet nade vê. Ji aliyên fîzîkî ve jî pirsgirêkên min hene.

– Hûn di vê mijarê de dikevin nava hewldanên xwe guhertinê? Qet hûn ji xwe re dibêjin ez wêjeya Tirkan yan jî wêjeya cîhanê bixwînim?

---.: Weke min got çavê min nagire. Pirsgirêkên min ên tenduristiyê derfet nadin vê yekê.

– Hûn di xwendinê de zehmetiyên dijîn? Çine?

---.: Hişkbûna damaran heye. Vaye titşekî wisa. Xestbûna jiyanê derfet nade vê. Ger na pir dixwazim.

– Ez biyaniya xestbûna jiyanê qebûl nakim. Bê lêkolînkirina huner, wêje, bûyera muzîkê nabe.

---.: Şêwaza wê ez diyar dikim. Xestiya îfade ya wê ya hunerî digirim. Li gorî xwe rêbazeke min heye. Baş fêm dikim, karên ku mirov dikin, karê jiyan dikin. Ji bo ku rûmeteke baş a hunerî îfade bike divê çawa be wê jî baş dizanim. Hêza min a şîrovekirina artîstekî Yeşîlçamê jî heye.

– Ger hûn fîlman temaşe nekin wê çawa be?

---.: Fîlmek bese. Dem bi dem temaşeyî fîlman dikim. Temaşe dikim.

– Hûn qet temaşeyî fîlmê Tirkan dikin?

---.: Bêguman. Dema ku maçeke fitbolê dinêrim aliyê wê yê artîstîk hîs dikim. Spor jî hunereke. Hêza min a dîtîna hemû aliyên artîstîk heye. Hîskirin di vê mijarê de jî hinekî heye. Ev mijar min îdare dike.

**Galatasaray**

– Em dizanin hûn Galatasayî ne. Îsal Galatasaray bû şampîyon. We şampiyontiya wê çawa pêşwazî kir?

---.: Hemû şampiyontî başe. Her şampiyontî ji aliyê moral ve hêza mirov bandor dike. Ez di hemû qadan de ji bo şampiyontiyê dilîzim û li gel taximên şampîyonim.

– Sê sale Beşîktaş dibe şampiyon.

---.: Me wê demê rexne dikir.

– Galatasaray?

---.: Yên ku ji bo şampiyoniyê dilîzin dizanin divê ku çawa bixebitin, çawa şer bikin. Maşellah di demên dawî de hinekî fêr bûn ku çawa şer bikin.

– Galatasaray di vê demê de başbû.

---.: Potansiyela xwe weke tê xwestin veneguhestibûn sahayê. Taximekî taybetmendiyên xwe yê pêşkeftinê hebû. Rêveberên wê, bi taybet antrenorên wê.

– Ger hûn berpirsyarê Galatasarayê bûna we yê çawa tevbigerîba? Qet hûn bi vê fikirîn û we got, ez bibûma berpirsyarê Glatasarayê?

---.: Ez dixwazim berpirsê her taximek şer bim. Ez li ser hemû taximên vî şerî û têkoşînê dimeşînime û di navê de me. Dibe ku ev koma muzîkê be, dibe taximeke fitbolê be. Holika sporê be jî. Yekîtiya wêjevanan jî dibe. Tenê bila di jiyana xwe de pir herikîner, lez û emcamgir tevbigere.

– Çalak û têkoşer be, felsefa jiyanê xwe bispêre çalakgeriyê.

---.: Balkêş, rakişwer, baldar û xweşik be. Şêwazên din ên jiyanê ji rêzê dibînim û bijare me.

**Apoli Tirkiyê dibe parlementer?**

– Em bêjin ku li Tirkiyê pirsgirêka Kurd çareser bû. Êdî ne weke şerkerekî hûn weke siyasetmedarekî vegeriyan welatê xwe. Ez ji rawêjeke wisa tevdigerim. Hûn vegerîn, bûn parlementer, ketin parlementoyê. Hûn pêşerojeke wiha çawa dibînin?

---.: Her kesê ku tê li ser bûyîna min a parlementeriyê radiweste.

-Di encam de ev rewşa ruhî hêdî hêdî dikare veguhere tiştekî din?

---.: Nabe. Ma ev dibe? Em bi we re li ser şoreşê axivîn. Şoreşgerek wisa hêsan nakeve rewşên wisa. Ketina nav jî pir balkêşe. Wisa hêsan beşdarî pergalê nabe. Dihejîne. Bi hilweşandin û şikestinan re rê ji nûbûnan re vedike.

**Sosyalîzm**

– Me dîmenên Yekîtiya Sovyetê bi hev re şopandin. Li Çîn û Kubayê tiştên ku em ê texmîn nekin diqewimin. Di nava van rastiyên ku hatine jiyîn de sosyalîzma ku hûn xeyal dikin li kî derê ye?

---.: Ez hîn jî azweriya xwe ya sosyalîzmê, çoş û zanistiya xwe pêşdixim û didomînim. Û dema ku bi rûyê sosyalîzma pêkhatî derdikevin pêşberî min, min bertek nîşan da. Lê sosyalîstbûyîn jî min pejirand. Sosyalîzma pêkhatî ya Sovyet ez himêz nekirim. Ruçikên wî yên Tirkiyê. Jixwe her tim dûr sekinim.

– Ez dizanim ku hûn demekê nêzîkî TKP’ê (Partiya Komînîsta a Tirkiyê) bûn.

---.: Na… Her tim bûye mijara rexnê. Ez tevlî coşa ciwanên Tirk bûm. Lê nîqaşên ku di derbarê sosyalîzmê de dikin bê wate dibînim. Hê jî dibîmin. Min weke şêwazekî aliyê xwe yê zimanbazî li pêş, heta dawî ruxêner, qelebalix nirxand. Lê di dijberî muhafazekariya civakê de dîsa jî weke tevega ku divê mirov tevlî bibe nirxand. Ji xwe biryara xwe ya di vî alî de jî min da; ji sala 1970’yan ve jî didomînim.

– Di derbarê sosyalîstên Tirk de hûn rexneyên pir tund dikin. Ev gotinên we di çapemendiyê de jî cîh digirin. Hûn dibêjin: “*ev nabe camêr.*”

---.: Nînin nînin. Bi sosyalîstên wisa bifikirin ku, despêkê karmendiya şarewaniyê girtin. Wê îdealên te hebin, azweriyên te yên mezin hebin, ji nişkê ve xwe di nava karên herî qirêj yên pergalê de têr bikî! Ev kesayet xetere. Rexnekirina me ya vê kesayetiya xeter jî wisa ye, nikare pir xirab, dijwar bê nirxandin. Li ser sosyalîzmê şêwazê jiyaneke wisa înşakirin, tê wateya dujîn ji çanda nîjadê xwe re dayîne. Bêrêzî kirine. Ez hîn jî sosyalîzmê tevî hemû nebesiyên xwe yên pratîkî, kirêtiyên wê jî, weke kombûneke nirxan digirim dest. Mîlîtanên bijare yên sosyalîzmê bi rêzdarî bibîr tînim. Dibêjim ku pêwîste ewqas neyên tawanbarkirin û gemarkirin. Kuba jî dikeve nava vê, Lenîn jî, Stalîn jî. Ekola sosyalîzmê hêviyeke mirovatiyê ye, azweriye. Her di nava dîrokê de hebûye. Ez di nava Îslamiyetê de tevgera ku Îmamê Elî nûnertiya wê dike weke sosyalîzmê dinirxînim. Ew hevbeşiya wî, milîtaniya wî, girêdana wî bi wan nirxên pîroz re kesayetiyeke sosyalîst îfade dike. Li gorî demê wisa ye. Muavîye tekperesteke. Saltanatgere. Bêguman hûn ê bêjin Xerîcî proleterya sosyalîzmê temsîl dikin. Dibe. Çepgirên herî dijwar ên şoreşa Fransayê komînîst bûn. Li wir jî sosyalîst hebûn, di şoreşa burjuva de jî. Di serdema yekem de jî hevbeşiyên wekheviyê yên pir girîng hebûn, dibistanên wan hebûn. Îtopya sosyalîzmê fikreke ji dîroka mirovatiyê qut nebûye. Di Yekîtiya Sovyet de di asta destkefteke pir mezin de pêş ket. Tevgera Robert Owen ya koperatîfan ya rast tevgereke sosyalîst bû. Lê ev, di çarçoveya koperatîfan de pêk hat. Di Sovyetan de di çarçoveya welat de pêk hat. Dibe ku pêngaveke nû di çarçoveya berfirehiya cihanê de

dikare pêk were. Li gorî min sosyalîzm zanista pêşxistina kesayeta mirove. Nemaze zanistê pêşxistina civakê ye. Ne yê welatan, netewan, pergalan, bi taybet ne yê dewletane. Divê ku pêşketina dewletan, pêşketina welatan zêde sosyalîzmê eleqeder neke.

– Hûn di derbarê nîqaşên di mijara dîktatoriya proleterya de çi difikirin?

---.: Tiştên ku ez ê bêjim bi baldarî bişopînin. Beriya her tiştî sosyalîzm mijareke exlaqî ye. Tenê ev weke meseleyeke siyasî, aborî fikirandin îcada kî bû? Divê ku mirov li ser bifikire. Li gorî min mirovê sosyalîzmê pergalên koleger jî di navê de herî dawî li beramberî pergalên kapîtalîst-emperyalîst divê ku parastinê rave bike. Ne merce ku di asta dewlet, şoreş û dîktatoriya proleterya de be, ev parastin. Çima Misilmantî hê jî pêşdikeve? Çima li Îranê Ayetullahparêz ewqas bihêzin? Wan bi salan bi nefsên xwe re şer kirin. Her tim çanda Ayetullahiyê pêş xistin. Ev çand bû îktîdar. Niha li Tirkiyê sosyalîzm weke şêwazeke jiyanê hilbijartin û yên ku li gorî wê arasteya jiyana xwe diyar dikin kêmin. Sosyalizm weke şoreşeke siyasî, yan jî weke mijareke geşedana aborî dîtina min her ku diçe kêm dibe. Û heta dikeve pîlana duwemîn. Belê sosyalîzm divê îktîdarê bike hedef, divê dewletê desteser bike, lê divê ev hemû ne ji bo bilindkirina îktîdarê û bilindkirina dewletê be. Jixwe damezrênerên wê jî vê dibêjin. Her ku çû diviya dewlet bitemirandina. Diviya li ser vê rawestiyana. Dema ku ev rewş jî wisa bû vaye netewê min, welatê min, dê wisa mezin bibe, em wisa pêşbirkê bikin, nizanê wê bi çi derbas bibe, ev liyaqdîtinin. Li gorî min sosyalîzm jî di vir de winda dike. Diviya ku ev pêk anîba: Mirovê ku min afirandiye mirovê herî hêja yê cîhanê ye û diviya rastiya wê jî hinekî wisa bûya. Hemû pêşkeftinên çandî yên mirovatiyê fêm kiriba. Li ser vî bingehî nûneratiya wekhevî û azadiyê bikira. Hemû mirov, mirovên ji her netewekî girtiba berfirehiya xwe. Wan daba rehetkirin. Bi kurtî diviya selametî pêşxistiba. Rewşên ku di vir de windakirine hene. Yanî niha em dibêjin Çîn. Pêşxistina netewekî mezin ê Çînê ye. Hûn ê bêjin, temam enternasyonalîzme. Ji ber ku netewa Çîn pêşbikeve mirovatiyê jî pêşkeve. Ev di gotin de wisa ye, di pratîkê de ne wisa ye. Wê netewa Çîn pêşkeve, pêşkeve, mîna ku di Sovyetan de bûyî piştre jî brokrasiyeke navendî, klîkeke biçûk a navendî

her ku biçê dê şefek bigre destê xwe. Wê bê exlaqiya herî mezin di jor de bilîze. Di encam de dibe ku Çîn weke dewleteke şoven-emperyalîst bibe bela serê mirovatiyê. Dibe ku Çîn niha baş pêş ve diçe, dibe ku hinekî sosyalîst jî bimîne, lê divê ku vê sosyalîzmê bi mirovatiyê re par ve bike. Him jî bêyî ku başde bixe. Yanî divê parve bike.

– Çawa mesela?

---.: Çawabûna wê nîne. Wê li ser Çîn'ê nefikire. Wisa geşedana Çîn, leza geşedana Çîn divê danekeve binê ji sedî deh, wisa xweşikiyên Çîn, wisa mezinbûnên Çîn; wê vana rêz neke. Wê hinekî Çîn jibîr bike. Nabêjim bila ji binî ve înkar bike.

– Ev gengaze?

---.: Aliyekî sosyalîzmê yê enternasyonalîst heye. Enternasyonalîzm bi gotinên zûwa nameşe.

– Lê heyfe ku heta niha di gotin de ma.

---.: Ji ber ku di gotin de ye, ti ezmûneke sosyalîzmê ya cidî jiyan nekir. Kuba jî wisa. Mirovê Kuba wîsa ye, Kuba wisa bihêze, Kuba wisa zîreke, Kuba wisa bi hev şadibe, Kuba wisa bi coşe! Vana şovenîzmê îfade dikin, ne sosyalîzmê.

– Dibe ku ev jênerevek be.

---.: Ez dibêjim devji kar û barê xwe berde were, pê gelên din keve! Ya ku ez li vir dibêjim li şûna ku sosyalîzma Kuba wisa be, divê ku hinekî pirsgirêkên mirovahiyên ên sereke bigire dest. Dibe ku ev di rojekê de neyên çareserkirin. Qet pêwîst nake. Herî kêm bi qasî eleqeya îro Îran di çarçoveya xwe de ji enternasyonalîzma Îslamê re nîşan dide sosyalîstan ev eleqe nîşan bida. Dibe ku Îran ji welatê Îranê zêdetir li dîkat dike û tevî pir zêde tê hedefgirtin jî dimeşîne.

– Min tahlîla we ya di derbarê Îranê de fêm nekir.

---.: Dixwazim bêjim feraseta xwe ya Îslamî belav dike.

– Yani enternasyonalîzma Îslamî?

---.: Bêguman.

– Îran jî dixwaze serweriya xwe belav bike.

---.: Bila belav bike, lê bila Îslamê belav bike, ez ê ji wê re jî rêz bigirim.

– Lê Rûsya jî demekê mîna Îranê li pê serweriyê bezî û sosyalîzm ji armancên xwe re kir amûr.

---.: Ez tiştên ku demekê Yekîtiya Sovyetê ji bo gelan kir înkar nakim.

– Lê piştre xwe belav kir û navê enternasyonalîzmê lêkir.

---.: Vaye ez dijberî vê me. Niha qet nebe Îran jê bawer dike û Îslamê belav dike, ne dewletê. Dibêje Îslam eve tevdigere. Di vê de jî hinekî cidî ye. Vaye îro faşîst pêşdikevin. Di welatên Rojhilatê Avrupa de. Ev jî ji aliyê sosyalîzma pêkhatî ya sexte ve hatiye avakirin. Tenê yekî rumeta sosyalîzmê diparêze di welatên Rojhilatê Avrupa de hene? Derketiye holê ku ev sosyalîzm, ne sosyalîzme. Derketiya holê ku sosyalîzma her tim ji min re ye. Çawa derket, çawa pêş ket, ev meseleyeke dine. Rexneyeke cidî jê re pêwîste.

– Dema ku em paşerojê dinirxînin divê ku pirsgirêkên çawa mirov ji nû ve bigre dest?

---.: Niha Kurdistan welateke, tevî ku gelê Kurd mileteke nabêjim şoreşa me ji bo Kurdistanê ye. Di kesayetiya mirovê Kurd de hinekî xwe bigihîne mirovatiyê ez ê çiqas pê şad bibim.

– Hemû şoreşger dema ku despêdikin wisa dibêjin.

---.: Na, ne ewqas. Ez pesnê xwe nadim, pesnê Kurdan nadim. Ya ku em dikin, “*vaye ev jî mirovin, ev jî dikarin bi şeref û rumet bibin*” wisa gotine. Di vê mijarê de bi israrim. Şerê min heye. Sosyalîzmê ji cewher winda nekir, di pêkanînê de winda kir. Li gorî min dikare pêngaveke din bike. Lê yên ku di sosyalîzmê de israr dikin teqez divê xwe di ber çav re derbas bikin. Li Tirkiyê ger yên ku bi awayekî cidî dibêjin em ê sosyalîst bimînin hene, teqez divê ku xwe bi xwe bigrin dest. Di gelek mijaran de divê ku em bigrin dest. Ger sosyalîstek bilez ber bi rast û çep ve berba bikeve, di binê vê de rizîna felsefî, kesayetî û exlaqî heye. Aliyên bi faşîzmê re hev digrin hene. Ferqa di navbera sosyalîst û faşîstekî de hema bêje hinek caran ji holê radibe. Û îro ji bermahiyên sosyalîzma pêkhatî bermahiyên bihêz ên faşîzmê derdikevin holê. Encama ku ji vê derdikeve ya rast çanda sosyalîst yan jî kombûn xwe ji mohrên kapîtalîzmê rizgar nekiriye. Sosyalîzma dewletê pir dişibe faşîzmê. Ev rêbaz çiqasî rêbazekî bi tenduriste. Bawerim di dema pêş de wê pir bê nîqaşkirin. Divê ku nêzîkatiyên wê yên ji îktîdarê re di ber çav re bên derbaskirin. Nêzîkatiya xwe ji enternasyonalîzmê re, nêzîkatiya xwe ji xwezayê re di ber çav re derbas bike. Divê

nêzîkatiya xwe ji exlaq û ol re di ber çav re derbas bike. Mijara geşedanê ji nû ve bi dest bigre.

**Sosyalîstên Tirkan**

–Weke ku hûn di derbarê sosyalîstên Tirkan de henekê xwe dikin, wiha dîmenekî wisa derdikeve holê. Çima hûn gotineke wisa dikin?

---.: Faşîzm wê ewqas bitepisîne, mêtîngeriya li ser kedê ewqas li pêş be, tê tevgereke parastin û berxwedaniyê pêşnexî! Çima pêşnakeve?

- We di axaftineke xwe de gotiye ku, em ê rêyên ku bikarin behremendiyên xwe yên rêbertiyê pêş bixin nîşan bidin.

---.: Mesele ne ew e. Ez ji wê re tenezûl nakim. Pirsgirêka zanîna xwe li ber çav derbaskirinê ye. Ger gelê te, çîna te ya karkera di vê rewşê de be, tu nikarî tiştekî bikî wê demê tu asteke saxte dijî. Ev alîkariyeke sosyalîstî ye. Armanca wan rexneyan ev bû: Pêdiviyeke pir cidî bi dahûrandina rêbertiyê heye. Gelek tîpên sosyalîstên Tirkan pir ji xwe razîne û sergirtina nebesiyên xwe rexneya şoreşgerî dihesibînin. Tu binketî. Rêxistin pêşnakeve. Têkoşîna sendîkayan jî nikare pêşve bibe. Di mijarên herî sereke de navê çînê nîne. Yan jî ger navê wê hebe, nerîneke xwe ya rêkûpêk nîne, lê di maqilê de jî xweliyê nahêle. Ev hinekî ji min re mîna hevnegirtinê tê. Ez ji rastiya gelê Tirkiyê jî bawer dikim. Ji rastiya wî ya çînî jî bawer dikim, lê rexneyeke cidî û tahlîl pêwîste. Li gorî min kesayeta sosyalîstê Tirk divê ji nû ve li ber çav bê girtin û bê pêşxistin. Bila bên, dema ku em dibêjin bi wan re bibin alîkar, dixwazim vê bêjim: PKK'ê hinekî ev kar tahlîl kir, di kesayetiya Kurd de pêşkeftineke bikaribe têkoşîn bike dikare pêk bîne. Em vê ezmûnê ji endamên Tirk re jî vebêjin. Bila li beramberî çawatiya vî karî rêzdar bin. Di nava xwêdan û xwînê de encamekî em giştinê heye, bila bi balbarî fêrî wê bibin. Pêşkeftinên ku hatine destxistin bila ji bo berjewendiyên xwe bikar bênin. Alîkariya min, pişgiriya min di vê çavçovê de ye. Derdeke min wisa Tirkekî biafirînim nîne. Ev kar bila neyê serê min.

–Dema ku min di Ozgur Gundemê de nirxandinên we yên di derbarê sosyalîstên Tirkan de xwend, ji van axaftinên we encamekî wisa derdikeve, we xîtabeke wisa bikar aniye bila bên

em sosyalîstên Tirkan bikin camêr. Çima hûn ewqas ji jor de lêdinêrin?

---.: Na na, ji ber ku hûn ji dûr ve lêdinêrin wisa dibêjin. Ji bo min ew barekî girane. Lê ger bi mirovên Tirk re jî eleqedar nebim wê demê jî hûnê bêjin netewpereste. Ji bo ku bidim diyarkirin ku ez ne neteweperestim, dibêjim bila werin em di heman tifikê de xwe germ bikin, xwerin bixwin, lê li ser rastiyên kar jî nîqaş bikin, yanî dixwazim bêjim ku ez ewqas sosyalîstim. Ez dixwazim di serî de bi Tirkan despê bikim. Mixabin eleqe nîşan nadin. Belê aş pêwîste, lê sosyalîzm û siyaset jî pêwîste. Beşeke zêde hevalên min Tirkin. Pêwendiya me nequte. Li Tirkiyê hêjmareke zêde dostên min hene, alîgirê min hene. Mirovên ku ji wan hezdikim rêz didim hene. Ez Tirkan ji kurdên me jî jordest dibînim. Pîvanên wan ên pêşketî jî hene. Lê li gorî min, ew vanê temam nakin. Dikarin hinekî din dewlemend bikin, pêbigihînin. Dikarin çareserker bin. Min bi vê armancê ew peyv gotin. Yanî ji ber ku dixwazim pir baş bin ji bo vê min ew hişkbûn bikaranî. Hûn dizanin mirov dema ku dixwazin bînin asteke baş pir bi zêde ser de diçin. Divê ku ev berevajî neyê şîrovekirin. Ez berevajî hevalên xwe yên kevin neketim. Bi taybet di nava têkoşeriya nêvenga piştî 12'ê Îlonê de bûm. Min çanda berxwedêriya wan domand. Hûn dizanin ez di girtîgehê de jî mam. Bi piraniya wan re xweş-bêş bûm. Û min bîranîna wan heta roja îro jî anî. Sosyalîzm, berxwedanî, têkoşîna çekdarî, şerê gel, gêrîla, piraniya wan qemîsê sor li xwe dikir. Niha wê alê em dihejînin. Me bîranînên wan bilind kir. Ger berê xwe nedabin xirabiya herî xirab bandorek pir mezin a van çalakiyên me heye. Me sêdare dan rawestandin. Qanûna înfazê çalakiyên me derxist holê. Kar û barên wan başe. Pergal weke bêrê êrîşî wan nake, tawîz dide. Hûn dizanin derfeta Apo tenê li Kurdistanê kar nabîne, li Tirkiyê jî kar dibîne. Ev jî li beremberî yên ku me ji wan girtiye yên ku em didine. Mirov dixwaze ku hinekî din ji pirsgirêkên bingehîn re eleqe nîşan bide. Hinek hevalên me yên ji zanîngeha siyasetê hêjî bandora xwe didomînin. Hinekî din li pê xebatên rêxistinî yên homojen bibezin. Îktîdarê jî şayanî xwe bibînin, jiyana nû jî şayan bibînin, xweşikiyê jî şayanî xwe bibînin. Hemû bermahiyên faşîzma 12'ê Îlonê hemêz nekin, pêwîstî bi vê nîne. Ji bo damezrandina cîhaneke nû bi qasî coş û hewesa wê demê dibe

eleqe hebe. Û bi qasî dahûrîna vê ya teorîk divê hûn bikarin weke me di pratîkê de jî hinekê xwe ber çavan re derbas bikin û em ê ji bo tevkariya xwe jî berdewam bikin. Ez hêjî bi îda me, em ê ser Tirkiyê de jî biçin.

“*Ez ê ber bi Rojava ve biçim*”

–We demekê di nava axaftina xwe de qala berê xwe dana Rojava kir. Ev berê xwe dana Rojava çiye?

---.: Bi zorê jî bixwazin me ji hev qut bikin, ezê cuda nebim. Hesabên ku ez bipirsim hene. Li Stenbolê hesabên ku ez bipirsim hene. Dibe ku hûn bêjin yaw ewqas ber bi vir ve neyê, lê ez ê xwe bighînimê.

–Hûn ê çawa xwe bigihîninê?

---.: Dema ku dibêjim hesabên ez ê bibipirsim hene. Nirxên ku li Stenbolê kombûne hene, mêtîngeriya kombûyî heye, qirjiyên kombûne hene, êş hene û xweşikî hene. Ez ê bi ser de biçim ger hêza min têr bike.

–Dema ku dibêjin bi ser de biçim, di salên borî de li Bakirkoy çalakiyek hatibû lidarxistin û hêjmareke zêde mirov miribûn. Bi serdeçûneke wisa?

---.: Ne ew. Ez qala wê nakim. Ez serdeçûyîneke wisa zêde bi wate nabînim. Şêwazê min ê serdeçûnê pir bingehîne. Ez ê bi ser Rojava de biçim, bila ti gumana we ji vê nebe.

–Wê serdeçûneke çawa be? Serdeçûna Kurdistanê hûn derdikevin serê çiya. Di bajaran de derketina çiya nabe. Gêrîlatiya bajaran dibe?

---.: Birayê me yê rêzdar Yalçin Küçük Xoce ji xwe dibêje; divê ku Apo bê rojavayî kirin, Tirkiyeyî kirin. Wî hinekî hîs kiriye. Ez ê bi ser de biçim. Ji mirovên Tirkiyê re li ser vî esasî peyama min heye. Yên ku li ser Tirkiyê ne ji Tirkiyê zêde qutbûne, berevajî Tirkiyê jî û gel jî ketine û ez dibînim ketine rewşa koman, rewşa sîxûr-komikan. Şayanî wan nabînim. Ji bo ku gelê Tirkiyê bikare ji wan hesab bixwaze û ji vê hesab xwestinê re alîkarî bikim ez ê bi ser de biçim.

–Tiştekî çawa dixwazin hinekî din vekin.

---.: Di her astê de ez ê serde biçim.

–Di wateya xebatên çandî de?

---.: Na na. Di hemû qadên çandî, ruhî, civakî, siyasî rêvebirî, aborî û leşkerî de.

– Jixwe hûn di Stenbolê de ne birêxistinkirî ne?

---.: Ji hemû aliyan ve. Bi hinek tiştên cuda, di her astê de. Ez ê bikevin nava mirovên Tirk û serde biçim. Tenê ne weke PKK'ê. Hûn ê pêşkeftinên vê di demên pêş de bibînin. Em ê vê Tirkiyê ji kesên ku neşayanin, fêm nakin re nehêlin. Xweşikiyên Tirkiyê jî hene. Em ê vê ji wan re nehêlin. Ev xaleke pir girînge. Tirkiya xweşik ku divê mirov bi dest wan bernede, gelê Tirkiyê yê xweşik heye. Tê famkirin? Bi qasî ku hûn bi Kurdistanê re eleqeder dibin, ez jî dixwazim bi Tirkiyê re eleqeder bibim. Ger hûn dibêjin Apo cudaxwaziyê neke, hevgirtinê bike, ez jî bersiv didim. Ji bo bi hevrebûna xweşik-yekîtiyê ez ê bêm. Yên ku vê asteng bikin ez ê wan bigirim, nizanim bi kîdera wan bigirim û çi ji wan bikim. Ew bi şêwazekî din hatin Kurdistanê, ez ê bi şêwazekî din werim. Ez ê li gorî sosyalîzmê biçim. Meraq nekin ez ê weke neteweperestekî Kurd neçim. Heta ez ê ji Tirkekî yamantir weke Tirkekî biçim. Li bendê bin hûn ê bibînin. Bi meraq, kelecan, dostanî.

**Kemalîzm**

Hinekî Kemalîzmê li ber çav derbas bikin. Yê ku ji we baştir jî M. Kemal fêm dike ez im. Rêzdar Bîrand pir zêde ji min dipirsî. Digot; "*Hûn Atatürk çawa dibînin, hûn Atatürk bi xwe re qiyas dikin.*" Ne ji bo qiyaskirinê. Atatürk bi artêşan dest bi kar kir, min bi deyn. Tenê çekeke min jî nebû, tenê dostekî min jî nebû. Lê ji ber ku rastiya M. Kemal ji nêz ve dizanim di kesayetiya xwe de, baş dizanim. Leşkereke û teqeze ku payeya xwe xistibe. Di kesayetiya wî de bandora rayeyê mezine. Hûn mercên ku rayeya wî afirandine dizanin. Salên ku împaratorî belav dibe, êdî çareyeke din wi nemine. Neçar bû bibe netewperestekî hişk. Wê ev jî bi şêwazê paşagerî kiriba. Bi xwe sipartina asta herî jor kiriba. Pêwistiya rutbeya wî ev e. Neteweperestiya wî jî wisa, li gorî pêdiviya dema wî ye. Ez van mijaran ji bo tawanbarkirina wî nabêjim. Lê M. Kemal kirina tevahiya dîrokê, pêşeroja hemû civakê, bê rêziye li beramberî axa Tirkiyê, axa Anadolê. M. Kemal ne ewqas mezine. Ez bi xwe jî di nav de, pêxember jî di nav de ti mirovên Serok nikarin ewqas dorpêçker bin. Em dikarin ji vê re bêjin hegemonyagerî jî. Em naçarin vê bibînin: Rastiya Tirkitiya Anadolê ji M. Kemal mestire. Rastiya mirov ji serokan

mestire. Ez serokan înkar nakim. Li gorî min zêdegavî hat kirin. Rewşa M. Kemal li ser civakê zêde hat mezinkirin. Di nava dîrokê de cihê wî hat zêdekirin. Pir li pêşerojê û hemû paşerojê hat belavkirin. Derxistin asta tabûyê.

–Girîngiya vê nîne, encamên fîkrî girîngtirin.

---.: Çawa nabe. Hûn îro di asteke pir bêçare de ne. Komara Tirkiyê bêçare ye. Mirovê Tirkiyê bêçare ye. Pêwendiya vê pir zêde bi Kemalîzmê re heye. Ger hûn dahûrandina Kemalîzmê ji nû ve nekin, li gorî rastiya Kemalîst hûn ê nikarin qeyrana komara me ya îro derbas bikin. Min gotina Komara duwem nekir. Yê herî di jor de kir. Heta niha jî nîqaşeke mezine serê xwe girtiye û diçe. Ger nîşaneyên xetmînê nebûna, ev nîqaş dernediket holê. Ev jî heta ku kesayetiya Kemalîzmê neyê dahûrandin rê zêde li ber derketinê venake.

Ger nîşaneyên xetimandinê nebûna, ev nîqaş dernediket holê. Heta ku ev kesayeta Kemalîzmê neyên dahûrandin dê zêde rê li ber derketinekê veneke. Ev ne biçûkirin, bê rûmetkirina Mistafa Kemale. Gelekî qala Kemalîstgeriya rojnameya we dikin. Rojnameya we jî encax bi rexnekirina Kemalîzmê dikare rista xwe ya erênî bidomîne. Rêzdar Îlhan Selçûk, hewl dide pir baş Kemalîzmê bîne ziman. Bi taybet aliyên wê yên erênî dixweze derxîne holê. Lê li gorî min divê ku hinekî rexneya wê jî bike. Rexnekirin li gorî min ji bo we yekane çare ye. Mixabin ger nikare vê bike ev jî lewaziyek bi navê wî ye. Her tim wisa bi pesndayînê derbas kirin li gorî min ji Kemalîzmê re nebaşî ye. Ez di vê baweriyê de me ku hinek erkan temsîl nake. Divê ku bê rojeneyîkirin. Mîrateya wî ya erênî, binekî jî berevajî ketina taybetmendiyên wî yên sereke û derbaskirin derxistina holê modelekî pêşketinê ye. Teqez tu pêwendiya vê bi fitlonekî û şoreşgertiya-dijber re nîne. Dem bi dem rexne pir pêwîstin. Dîroka Marksîzmê jî dîroka rexnekirinê ye. Pêşveçûn jî encax wisa derbikevin holê. Divê ku rexneya Kemalîzmê rasteqîn were kirin. Ev di bin navê yekîtî û hevgirtina Tirkiyê de bi qedexeyan, ser girtinan nayê kirin, jixwe gihandina rewşeke wisa divê ku mirov dûr bisekine. Mîsak-î mîllî jî ji bo mirove, hevgirtin û yekîtiya Tirkiyê jî ji bo mirove. Heke ev têgeh mirovan tengav dikin, bejnkurt dikin, li beramberî hev ber bi şovenîzmê ve dibin, gelan nerehet dike, divê ku ev têgeh jî bên nîqaşkirin. Ji ber ku ew

jî ji bo mirovên Tirk in. Mirovê Tirk ne ji bo van têgeha ye. Civaka Tirk, mirovê Tirk yan jî jî bo yên ku li Tirkiyê dijîne. Îro ev têgeh di destûra bingehîn de, di zagonan de îşkence, qedexe û girtinin; wê demê divê ku mirov pê bifikire. Bi van têgehan re nêrînek qirêj heye. Bi van rexneyên me re dibe ku bihevrebûnên nû bên pêşxistin. Jixwe ger Kemalîzm di dîrokê de cihekî xwe hebe, bi qasî ku ji vê rewşê re bibe pêlekan dikare wate îfade bike. Rica dikim hinekî tiştên ku ez dibêjim fam bikin.

Ez di rexneyên xwe de rêbaza xirakirinê nahilbijêrim. Ez berpirsyariya xwe pêk tînim û vana dibêjim. Li beramberî Kemalîzmê jî hewl didim şerê herî mezin bimeşînim. Lê rastiya Kemalîzmê divê ku çawa bê destgirtin jî ji Kemalîstên herî baş jî baştir ez dikim. Wan nazok kir, teng hiştin, evcar jî wan qencî bi Kemalîzmê nekirin. Ez pir zêde vê ji xwe dipirsim. Ger Mûstafa Kemal li pêşberî min bûya minê ev kar baştir pêşve biriba. Ew bi xwe hebûna, bi dahûrandina, rexneyan û şêwazên pêwendiyên rû bi rû me dikarî pêvajoyeke erênî bidin destpêkirin. Li ser navê Kemalîzmê mixabin bejnkurtên Kemalîst pêvajoyê dixetimînin. Kîdera Demîrel nûnertiya Atatürk dike. Paşa çiqasî dikarin nûnertiya Atatürk bikin? Dem bi dem ji xwe re dibêjim ev encax dikarin bibin karîkatorê wî, nikarin bibin ew bi xwe. Di pêşiya çareserkirina pirsgirêkê de astengên cidî ne. Yên ku eleqeya xwe li beramberî wî di asta herî jor de ne, ji bilî şîroveya wî ya rast ber bi roja me ve veguhezînin, dibe ku ji bo çareserkirina pirsgirêkan serbendê bidin.

Wekî din divê ku mirov aliyên din ên Kemalîzmê jî rexne bike. Nerîna wî ya ol, ya laîktiyê, dîrokê, netew rexne bike. Ji van hemûyan re sererastkirineke nû ya projeya civakî dikare bê derxistin. Difikirim ku ev baş be. Ji bo di dema pêşiya me de di derbarê ji nû ve avakirina komarê de min nerînên xwe gotin. Kurd jî, Tirk jî dikevin nava vê, çandên kêmnetewan jî dikevin navê. Wê ev Tirkiyê dewlemend bikin. Dikara gelê Tirkiyê jî bigihîne asteke pê re jiyan bêkirin. Modelekî ewqas Kurdan ditepisîne zêde nikare bijî. Û dê mirovê Tirk jî hinekî bejnkurt bihêle, ji bejnkurtiyê rizgar nebe, ji gerîna derve rizgar nake. Ez li ser vî esasî nêzîk dibim. Modela yekîtiyê li Tirkiyê ya rast rêzgirtina ji rastiyên dîroka anadolê re di nava xwe de dihewîne. Rêzdariyê ji

mezinahiya gelan re dihewîne. Eleqeya bilin a li beramberî yekîtiya jiyana xweşik dihewîne.

**Emperyalîzm**

Ez hê jî ji diyardeya emperyalîzmê bawer dikim. Bawerim di van demên dawî de di vê mijarê de jî hinek mehandin hene. Emperyalîzm nîne! Pergala Cîhana nû heye? Yan jî emperyalîzmên dema borî ji holê rabûn! Raste. Dibe ku emperyalîzma dema borî nemabe, lê li gorî min weke ku emperyalîzmê rewşeke cuda girtiye hebûna xwe pir bibandor didomîne. Emperyalîzm bû diyardeyeke hundirîn, nizanim di dema borî de mêtingeriyê di hinek mijaran de bi burjuvayan dihat meşandin, niha çîn afirand, hundirîn kir. Divê ku mirov vê rêgehê hinekî din wisa pêş bixe; tenê ne di asta gelan de, di asta kesan de emperyalîzm takekesî bû. Li Tirkiyê emperyalîzm takekesî bû. Ez di wateya pêgiştina çîna karkeran de nabêjim, ket nava girseyan. Bi taybet bi çanda xwe ve. Yanî emperyalîzma çandê bawerim pêşkeftina dawî ya piştî salên 1980'ê ya ne. Emperyalîzma çandê, emperyalîzma bê exlaqiyê, pir bibandor bû û mirovatî perîşan kir. Ez ji êrîşên vê yên leşkerî, siyasî, aborî zêdetir êrîşên çandî û exlaqî xetertir dibînim. Bawerim ev jî karekterê 10-15 salên dawî îfade dike. Bi taybet pir zêde êrîşî ser pêşeroja mirovahiyê dike, erîşî ser exlaq dike. Êrîşeke dijwar li ser çanda kevneşop dike. Ev car Emerîka dijwartir erîş dike. Êrîşa wan a li ser xwezayê jî derketiye holê. Ji hemû aliyan ve êrîşa wan li ser dîrokê derketiye holê. Li gorî min ev bandoreke mezin dike. Ez vê xeteriyê wisa, filan welat dagirkir, nizanim ji aliyê siyasî ve wateya wê cuda bû nanirxînim, wê jî derbas dike. Pêwîste dahûrandina kapîtalîst-emperyalîst hinekî ji vî alî ve bê pêşxistin. Û ji bo mirovahiyê xeter, cinawarbûne. Modela civaka berxerciyê ya civaka ku ava kiriye bi tena xwe zincîrên xwe qetandine. Hemû azweriyên xeter ên mirov, hemû taybetmendiyên heywanî di asta herî jor de û bi şêwazên cuda rêxistinkirine, êrîşkarî ye. Bala xwe bidinê, mirov di roja me de pir zêde ketiye rewşa neyê zevtkirin, her ku diçe xwezayê jî, hemû pîvanên civakî jî dehdît dike û giştiye asteke wisa. Niha wisa weke demên borî ji van aliyan ve takekesî kirin weke biyanî girtina dest, weke berê êrîşên siyasî nînin, êrîşên leşkerî nînin, vaye weke berê ji aliyê aborî ve jî mêtingeriyê nake û bi vî rengî xwe ne xapîne. Raste jî, ev gelemperî bû, belave bû,

kûr bû, gerdûnî bû û asta xeteriyê jî berfireh bû. Vaye pêwîste sosyalîzm bi şanazî û li ser esasê rexneyên kapîtalîst- emperyalîst di ronahiya pêşkeftinên nû de vê bike. Lêkolîn û nerînên min di vê mijarê de sînordarin. Lê ez dibînim ku ev bi vî rengiye.

– Hûn filmên Emerîkayê temaşe dikin?

---.: Pir heyf dibînim. Ez ji çanda Emerikayê pir tengavim. Neku ji bo dihesidim, ne ku ji bo ew modelên jiyana bi semyan nakişînim, min sond xwariye ku vê modela jiyanê bixim bin erdê. Dibe ew jî li hember kesayeta min ewqas dijminin. Ez vê ji bo mirovahiyê xeter dibînim. Emerîka weke dewleteke kapitalîst-emperyalîst pir xetere. Hêrîşî kevneşopiya mirovahiyê dike. Hêrîşê nirxên bingehîn yên mirovî kiriye mirov dike. Mafê Emerîka yê vê nîne. Nabe Emerîka evqas jordest be. Şêwazê jiyana Emerîka ne jiyaneke wisaye evqas pesnên wê bê dayîn. Ev tê wateya pêşkeftina nexweşiyên mirove. Tê wateya kurbûna aliyên nebaşe. Tê wateya mirovahî veguhere dema xweya hov. Ez nikarim vê rakim. Dubare dibêjim: Neku dihesidim, ji bo destê min nagihiyê û alîkariya min nake. Weke pergalek nikarim qebûl bikim. Di salên dawî de li Tirkiyê xwezî pê anîneke pir zêde heye. Biêş digirim dest. Wiha xweşikbûnên Anadolê ji vê binirxtire. Bêguman van pêşnexistine, hor tê dîtin. Bi tundî rexne dikim. Û divê hûn hewl bidin dîroka xwe û nirxên gelê xwe bibînin. Ji Emerîkayê zêdetir divê jê hez bikin. Ev texlîta Emerîkayê çiye? Dema xwezî bi Rojava tênin, qala xulamtiya emperyalîzmê nakim. Anadolu jî bûna antî-emperyalîst tê wateya li beremberî vê xulamtiyê ye jî. Bila deng bi guhê Îlhan Selçuk bikeve. Van gotinan bi heman rengî jê re ragihîne. Erêniye. Bila baş şer bike. Bila şervantiya me ya baş jî bibîne û li gorî wê di derbarê me de rast baxive, virde wirde naxive. Bila bizane em çiqas li hemberî çine, çi çiqasî qebûl dikin. Yanî me di Anadoluyê de weke yê cudaxwaziyê kur dike, ne li hember çanda Anadoluyê ye, neke mijara nirxandinên şaş yên pirole. Bêyî me nasbike, bizane, bi rexneyên bêserûber nenirxîne. Em ji têgihiştina wî zêdetir antî-emperyalîstin. Û em şerê vê yê germ jiyan dikin. Ji wî zêdetir Anadoluyîne. Ji wî zêdetir dikarim bi zarokê Anadoluyê re lihev bikim. Dikarim bi keçeke Anadolu re pir baş derbaz bikim. Ev Anadolbûna min dide nîşan. Dikarim bi Tirkmenên li Torosan re lihev bikim. Nêzîkatiya min a bi vê re nêzbûna min ya li

hember gelê Tirk dide nîşan. Û wisanim jî. Bila vê tesbît bike, li gorî wê rexneya xwe bike. Çiqas rexne bike bila bike, ez naçim paş. Lê hinek rastiyan înkarkirin, nêzîkatiyên erzan yên weke "*cudakare, xwîn dirijîne*" kirin jî rast nabînim. Ev rexneyên me ji bo rewşenbîrên Tirkin. Li hember antî-emperyalîstbûnê, ji rastiya çanda gelan re, xwedî li dîroka wan derketin heya dawî henin. We Tirkiyê pir bi emperyalîzmê ve da girêdan. Gelê Tirk jî pir kir xulamê ber deriyan. Vê heyf dibînim. We demek di bin emrê Îslamê de leşkertî kir. Niha jî di bin emrê Rojava de askertî dikin. Heta gêzîkvanî kir. Îro rezîltiya li Almanya çiye? Bi vê wesîleyê dest bidimê. Ev jî encameke emperyalîzmê ye. Ji ber hewcedariya têkiliyên qirêj yên we bi emperyalîzmê re danî mirovan li wir tijî kir. Bêguman Alman evqasî qebûl nakin. Lewra hinek feraseta serdestiya nîjadî jî heye. Û hinek jî ev welat yê wan e. Heke tu wisa bê pîvan biçî, îşgal bikî, bi her hincetê şevdanîna Tirk tijî bikî, tu yê rê li ber perteka wan vekî.

– Niha ji bo Kurdan heman tişt li Stembol û Enqerê mijara gotinê ye…

---.: Raste, ev jî şaşe. Ez wê jî şaş dibînim. Ev jî encamekî polîtîkayên metîngeriyê bûn. Hevnaskirin bi varoşên Stembolê ve, di malên şevînî de û Stembol qirêjî bû. Rexne dikim. Ber bi Avrupa ve veguhestin. Ev mirov bi bazirganiya koleyan ve ber bi wir ve veguhestin. Ti pirsgirêkeke wan a cidî li ber çav negirt. Nexwestin rastî bên famkirin, tenê bi hêrsa kara zêde, dovîz û hêza karê erzan ev kirin. Niha bûyerên tirajîk tên jiyîn. Mixabin di vê de jî îqtîdar tewambarin, tewanbarên giranin. Ji bo Kurdên li Stembolê jî tewambarên giranin. Hîn ji ber bi Rojava ve vediguhezin. Li ser têkoşîna çîna karkerên Tirkiyê jî bandorekî neyênî dikin, li ser têkoşîna gelê Kurd jî bandoreke neyînî dikin. Em Tirkiyê evqas bi Rojava ve girê nedin. Hûn nirxên herî xweşik yên Tirkiyê pêşkêşî turîstên Rojavayî dikin. Ez bawerim yên ku li perevan dijîn hemû bêgane ne. Nekin, vane nexweşikîne. Ez dijberî vanim. Mafê we yê sefilkirina Tirkiyê jî nîne. Mafê we nîne ku hûn ewqas xweşikiyên vî welatî pêşkêş bikin. Ez miroveke hevgirtî me. Weke we nabêjim em jî lê dijin ew jî. Ez şerkerê rêgezê me. Di van mijaran de ti carî xwe naxapînim. Ez bi xwe re hevgirtîme. Vane tevgerên pêşkeşkirina gelê Tirkiyê ne. Tevgerên firotina welatin. Dijberim. Ez bi sekna

xwe dij emperyalîzmê yan jî girêdayî mafê jiyanê û azadiya gelanim. Welat tê pêşkêşkirin. Ji ber ku ez vê bi baldarî dibînim berxwedaniyê dijwar dikim. Vê berxwedaniya me, tenê bi şêwazên cudaxwaziya Kurd fêm nekin.

**Yêkîtiya sosyalîstan**

Peywirên cepgiriya Tirkan, şoreşgeriya wan pêk nanîne êdî hewl didim pêk bênim. Ev jî niha li ser milê me bareke mezine. Li Tirkiyê çareserkirina me ya îqtîdarê pir bar li me bar dike. Pêwîste gelê Tirk pirsgirêka îqtîdarê çareser bike. Nemaze niha karê wî jî ez dibînim. Zehmete, lê ez ê hewl bidim bibim. Li ser vê bingehî emperyalîzmê neyînî dinirxinim. Dibêjim ku Tirkiye pir girêdayî ye. Dibêjim emperyalîzm di asta ferdî de gihandine şêwazê çand û exlaqa serwer. Dibêjim welat zêdetir tê pêşkêşkirin. Di vê mijarê de çepgirên Tirkiyê, rewşenbîrên wê nikarin rast tevbigerin. Serê kêliyê carekê, dibêjin PKK tevgereke teng netewparêze! Îdaya ku bi israr ji aliyê tevgera ku beriya niha hûn jê hatibûne. Ez wan weke neteweperestên teng dinirxînim. Xwe jî heta dawî weke enternasyonalîstekî pêşketî, yê ku li ser vî esasî PKK pêş xist weke rêxistinekî dinirxînim. Rewşenbîrên Tirkan bixwe cudaxwazên tengin. Di vê mijarê de bihevrebûna wekhev, azad, bigirîngî em pêş dixin. Bila hîn bi pîvan nêz bibin. Sosyalîst bi taybet ger dixwazin bûyera PKK enternasyonalîste bikin bila rastiyê weke heyî bibînin û rexneyên xwe pêş bixin, heta bila bi me re têkoşîn jî bikin. Lê bila tiştên rast ji nedîtî ve neyên. Rêya bihevrebûyîna astek nekin. Bi vê wesîleyê jî daxwaza xwe ya bi çepgirên Tirk re xebitînê bi riya we dubare dixwazim îfade bikim. Bi wan re jî em dikarin rêzehevdîtina pêk bênin. Têkoşîna me ew jî fêrî pir tiştan kiriye. Dê baştir jî fêr bike. Pir tişt pêşkêş kiriye. Dê zêdetir jî pêşkêş bike. Têkoşîna me ji bo wan jî niha sêdare hilweşand. Me bi pêngava 15'ê Tebaxê re rê li ber sêdara Denîzên nû girt. Ew hîmên 141-142 yên meşhûr hatin çirandin. Li gorî min ew hukmêndin ku li ser wan ferz dikirin hatin derbazkirin. Piraniya wan gihiştin azadiya xwe. Vane bandorên me yên neyekserin. Divê ku neyên înkarkirin. Lê ya ji vê jî girîngtir em difikirin ku ji niha şûn ve ji aliyê erênî ve, di şerê ber bi îqtîdarê meşînê ve baştir alîkariyê bidin wan. Teqez ev ne biratî miratiye. Di navbera sosyalîstan de ne biratî, pêwîste

ku pêwendiyên hevrêtiyê yên beramber bên pêşxistin. Vane bi hev re ne li ser esasê mezinbûn an jî biçûkbûnê, dikarin wekhev, azad nêz bibin, alîkarî bi hev re bikin. Lê divê ku ew hîn baştir me fêm bikin. Eşkereye ku şerê me karê wan gelekî asan kir, lê divê ku ew hinekî hev bigirin. Dixwazin bila enî be xwe bigihînin yêkîtiyekî. Hêzên xwe yên ku kom kirine bila di îstiqameta hedefekî de bimeşînin. Di vê mijarê de derfetên me binirxînin. Ji hemû rêxistinên biçûk anjî mezin; legal, îllegal ji hemû rêxistinan re bi awayeke rêk û pêk careke din destnîşan dikim. Pêdivî bi tevgera eniyeke berfireh heye. Pêwîste rexneyên berê bên derbazkirin. Yanî tu çiqas sosyalîstî, tu çiqas oportonîstî, ji gotinên bi vî rengî zêdetir bi karîgerkirina yêkîtiyê, uslubê têkoşîna hevbeş lez dike bê serwerkirin. Di vê mijarê de gavên ku bên avêtin, bi taybet jî xalên ku di uslup de bên guhertin hene, gav hene.

– Hûn ê di dema pêş de bi komên çepgir ên Tirkiyê re hevdîtina pêk bênin?

---.: Bawerim rewşek wisa çêdibe. Di vê mijarê de hinek pêşniyar hatine. Rêzehevdîtinên bi komên Kurdan re lidarxist, ceribandinên bi hev re tiştek kirinê ji bo komên Tirkiyê jî em difirin. Hîn jî rêxistinên dost hene. Niha ji nû ve bi taybet di vê qonaxa pêşkeftina dîrokî de di encam de bawerim em ê ber bi çareseriyeke siyasî ve biçin. Vê tenê ne li ser esasê rastiya kurdan, li ser esasê rastiya demokrasiya Tirkiyê em dixwazin bimeşînin. Vaye ji bo vê bila rêxistinên Tirkiyê xwe amade bikin, bernameyên xwe yên demokrasiyê, heta bernameyên sosyalîstî deynin holê. Amadekirina vê li gorî min girînge, berpirsyariyeke dîrokî ye. Em di zanîna vê de ne. Di vê mijarê de teqez pêwîstiya PKK'ê bi mutefîkan heye, ji ber pêdiviyeke wisa divê ber bi nêzîkatiyeke wisa ve neçin. Berevajî her tim li ser me rexne hebûn. Ez niha baştir dibînim. Pir baş nirx didimê, em dixwazin pir baş di nava hevkariyeke bi beramber de bin. Em dibêjin em amadene. Divê ku hûn jî weke sosyalîst hinekî wisa me fêm bikin. Ev peyama me jî bi wesîleya rojnameya we li ser vî esasî divê ku hûn rabigihînin.

– Ji ber ku we ev defreta hevdîtina dirêj da me em sipas dikin.

---.: Ez jî ji ber ku hûn heta vir hatin, weke kesekî di beşa siyasî de, kesên ku ew kursî bi hev re parvekirine, şadim ku îfadeya hevaltiya me zindî bû. Ji hemû hevalên wê demê re silavên xwe dişînim. Hêviya dilşadiyê ji wan re dixwazim. Wekî din spasiya te dikim.